T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

**Mazlum YILMAZ**

# MELA EBDULMECÎDÊ GULORDÎ'NİN ŞİİRLERİ (METİN VE İNCELEME)

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**MUŞ-2023**

**T.C.**
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Mazlum YILMAZ**

# MELA EBDULMECÎDÊ GULORDÎ’NİN ŞİİRLERİ (METİN VE İNCELEME)

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ YÖNETİCİSİ**
**Doç. Dr. Ayhan TEK**

**MUŞ-2023**

**K.T.**
**ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN**
**ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ**
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Mazlum YILMAZ**

# HELBESTÊN MELA EBDULMECÎDÊ GULORDÎ (METN Û LÊKOLÎN)

**TEZA MASTIRÊ**

**RÊVEBIRÊ TEZÊ**
**Doç. Dr. Ayhan TEK**

**MÛŞ-2023**

## İÇİNDEKİLER

**İÇİNDEKİLER** .......... **I**
**ÖZET** .......... **III**
**ABSTRACT** .......... **IV**
**KURTE** .......... **V**
**PÊŞGOTIN** .......... **VI**
**KURTEBÊJE** .......... **VII**
**DESTPÊK** .......... **1**

**BEŞA YEKEM**

**MELA EBDULMECÎDÊ GULORDÎ**

**1.1. JIYANA MELA EBDULMECÎDÊ GULORDÎ** .......... 4
**1.2. KESAYETIYA MELA EBDULMECÎDÊ GULORDÎ YA EDEBÎ** .......... 7
1.2.1. Ziman Û Şêwaza Gulordî .......... 7
1.2.2. Mexlesên Wî .......... 11
1.2.3. Edîbên Ku Bandor Li Mela Ebdulmecîdê Gulordî Kirine .......... 15
1.2.4. Hin Têbînî Li Ser Helbestvanîya Mela Mecîdê Gulordî .......... 31

**BEŞA DUYEM**

**METN Û LÊKOLÎN**

**2.1. JI ALIYÊ NAVEROKÊ VE TAHLÎLA HELBESTÊN GULORDÎ** .......... 35
2.1.1. Helbestên Dînî Û Çavkaniyên Wan .......... 35
2.1.2. Hîkayetên Menzûm .......... 54
2.1.3. Helbestên Civakî .......... 55
2.1.4. Helbestên Evînî .......... 61
2.1.5. Helbestên Li Ser Xwezayê .......... 64
**2.2. JI ALIYÊ RÛXSARÎ VE TAHLÎLA HELBESTÊN GULORDÎ** .......... 69
2.2.1. Serwa (Qafîye) .......... 69
2.2.2. Paşserwa (Redîf) .......... 73
**2.3. HUNERÊN EDEBÎ** .......... 74
2.3.1. Întaq (Peyîvandin) .......... 75
2.3.2. Îqtîbas .......... 75
2.3.3. Kînaye .......... 76
2.3.4. Mubelexe .......... 76

2.3.5. Nîda (Bangewazî) ........ 77
2.3.6. Telmîh (Bîranîn) ........ 77
2.3.7. Tenasub (Guncanbûn) ........ 78
2.3.8. Teraduf (Hevwateyî) ........ 79
2.3.9. Teşbîh (Şibandin) ........ 79
2.3.10. Tezad (Dijberî) ........ 80
**ENCAM ........ 81**
**ÇAVKANÎ ........ 83**
**PÊVEK ........ 86**

# ÖZET

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**MELA EBDULMECÎD GULORDÎ’NİN ŞİİRLERİ**

**(METİN VE İNCELEME)**

**Mazlum YILMAZ**

**Tez Danışmanı: Doç. Dr. Ayhan TEK**

**2023, 680 sayfa**

Klasik Kürt Edebiyatı, 16. yüzyıldan sonra gelişim göstermiş olup günümüze kadar geleneğini sürdürmektedir. Kürt Edebiyatı’nda bu gelenek çerçevesinde eserler üretilmektedir. Mela Ebdulmecîdê Gulordî (resmi adı Mela Abdülmecid İliş) de Klasik Kürt Edebiyatı’nın şairi olup, klasik tarzda şiirler yazmıştır. Mela Ebdulmecîd Gulordî 1948 yılında, Yüksekova ilçesine bağlı Gulord köyünde dünyaya gelmiştir. Gulordî klasik tarzda şiirler yazmayı sürdüren şâirlerdendir. Onun Latin alfabesiyle yazılmış Kürtçe şiirleri genellikle dörtlüklerden oluşup beyit birimiyle yazdığı şiirleri de mevcuttur. Şimdiye kadar Mela Ebdulmecîd Gulordî’nin yaşamı ve şiirleri üzerine özgün ve kapsamlı bir çalışmanın yapılmamış olması, biz bu çalışmayı yapmaya yönelten temel etken oldu. Biz bu çalışmamızda Mela Ebdulmecîd Gulordî’nin yaşamını ele alıp, şiirlerini içerik ve şekil yönünden değerlendireceğiz. Böylece bu çalışmamızda Mela Ebdulmecîd Gulordî’yi Kürt Edebiyatı alanında tanıtmak ve onun şiirlerini de Klasik Kürt Edebiyatı geleneği çerçevesinde analiz etmeyi amaçlamaktayız.



**Anahtar Kelimeler:** Mela Ebdulmecîd Gulordî, Klasik Kürt Edebiyatı, Klasik Şiir.

# ABSTRACT

**MASTER'S THESIS**

**POEMS OF MELA EBDULMECÎDÊ GULORDÎ**

**(TEXTS AND RESEARCH)**

**Mazlum YILMAZ**

**Advisor: Assistant Prof. Ayhan TEK**

**2023, Page: 680**

Although the main stage of Classical Kurdish Literature generally dates to the 16th century, we still can see the reflections of this tradition in the Modern Age. Some poets in Kurdish literature still write their works in classical style. Undoubtedly, the writing of such works in the Modern Age shows the attraction and influence of the Classical Kurdish Literature. Mela Ebdulmecîd Gulordî is also a poet of the Classical Kurdish Literature and wrote poems in the classical style. Mela Ebdulmecîd Gulordî was born in 1948 in Gulord village in Yuksekova district. Gulordî wrote many poems in the classical style and continues to write. His poems, which are written in the Latin alphabet, usually consist of quatrains, and there are also poems written as couplets. The fact that an original and comprehensive study on the life and all poems of Mela Ebdulmecîd Gulordî has not been conducted on behalf of Kurdish Literature is a decisive reason for us to carry out this study. In this study, we had the opportunity to deal with the life of Mela Ebdulmecîd Gulordî and to evaluate his poems in terms of content and technique in an orderly manner. The aim of this study is to introduce Mela Ebdulmecîd Gulordî in the field of Kurdish Literature and to ensure that his poems take their deserved place among the other works of the Classical Kurdish Literature.



**Key Words:** Mela Ebdulmecîd Gulordî, Classical Kurdish Literature, Classical Poetry.

**KURTE**

**TEZA MASTIRÊ**

**HELBESTÊN MELA EBDULMECÎDÊ GULORDÎ**

**(METN Û LÊKOLÎN)**

**YILMAZ, Mazlum**

**Şêwirmend: Doç. Dr. Ayhan TEK**

**2023, Rûpel: 680**

Edebîyata Kurdî ya Klasîk piştî sedsala 16ê geş bûye û heta roja îro ev kevneşopîye berdewam e. Di edebîyata Kurdî de hêj jî berhemên bi tarzê klasîk hatî nivîsin dihêne dîtin. Bêguman di vê serdemê de berhemên ku bi vî rengî dihêne nivîsîn tesîra Edebîyata Kurdî ya Klasîk nîşan dide. Mela Ebdulmecîdê Gulordî jî yek ji van helbestvanên Edebîyata Kurdî ya Klasîk e ku helbestên xwe bi terza klasîk nivîsîne. Mela Ebdulmecîdê Gulordî di sala 1948an de li gundê Gulordê yê girêdayê Geverê hatiye dinyayê. Mela Ebdulmecîdê Gulordî bi tarzê klasîk gelek helbest nivîsîne û hêj jî karê xwe yê nivîsandinê didomîne. Helbestên wî piranî ji çarînan pêk tên û helbestên ku bi beytan nivîsînî jî hene. Heta niha xebateke taybet û berfireh li ser jîyan û hemû helbestên Mela Ebdulmecîdê Gulordî nehatiye kirin. Me jî di vê xebata xwe de bi awayekê rêkûpêk jiyana wî daye nasandin û helbestên wî ji alîyê şikl û naverokê ve nirxandine. Armanca me bi vê xebatê ew e ku Mela Ebdulmecîdê Gulordî di qada Edebîyata Kurdî de bidine nasandin û helbestên wî di nav mîrasa Edebiyata Klasîk de binirxînin.

**Peyvên Sereke**: Mela Ebdulmecîdê Gulordî, Edebîyata Kurdî ya Klasîk, Helbestên Klasîk.

# PÊŞGOTIN

Her edebîyatek deyndarê nûnerê xwe ye. Ev gotine bi taybet bo edebîyata Kurdî ya klasîk derbasdar e ku gelek ‘alim û edîbên Kurd li ser xîmê edebîyata Kurdî ya klasîk, edebîyata Kurdî gehandine roja me ya îro. Bi sedan sal e ev pêvajo berdewam diket û di vê pêvajoyê de gelek malbat û kesayetîyên girîng bi xebat û berhemên xwe yên payîdar li ziman û edebîyata Kurdî xwedî derkeftin. Ji van malbatan yek jî malbata Gulordîyan e ku di nav çanda medreseyan de gelek ‘alim û mela jê rabûne. Mela Mecîdê Gulordî jî melayekê ji malbata Gulordîyan e.

Gulordî, nûnerekê edebîyata Kurdî ya klasîk e ku bi tarzê klasîk gelek helbest nivîsîne. Cara ewil e ku bi awayekê berfireh li ser jîyan û hemû helbestên Mela Ebdulmecîd Gulordî xebateke bi vî rengî tê kirin. Ji bo xebata me ya tezê Mela Ebdulmecîd Gulordî helbestên xwe bi me re parve kirin. Ji bo amadekirina helbestan me gelek caran bi Mela Ebdulmecîd Gulordî re hevdîtîn pêk anîn. Mela Ebdulmecîd Gulordî helbestên xwe li defterê nivîsîbûn. Me bi awayekê rêkûpêk helbestên Mela Ebdulmecîd Gulordî li gor mijaran sinifandin û derbasî kompûterê kirin. Piştî van hazirîyan, me dest bi nivîsana teza xwe kir.

Wekî her nivîsarekê tezê, em jî di pêvajoya nivîsîna tezê de rastî gelek zehmetî û arêşeyan hatin. Ji bo amadekirina vê xebatê gelek kesan alîkarî da me. Di serî de spasîyên xwe yên herî bi minet ji şêwirmendê xwe birêz Ayhan Tek re pêşkêş dikim. Bi sebreke mezin zanîn û tecrubeyên xwe bi min re parve kirin û nêzîkatîyên wî yên xweşbînî ji min re her tim bû moral û motîvasyon. Pêvajoya tezê ji destpêka lîsansa bilind dest pê diket ku di vê pêvajoyê de brêz Mehmet Emin Purçak gelek alîkarîya min kir. Spasdar im ku bi zanînên xwe rêya min ronî kir. Herwiha ji Mela Mecîdê Gulordî re gelek spas û hurmet dikim ku derê mala xwe li me vekir û di amadekirina tezê de pirsên me bersivandin û ji me re bû alîkar. Alîkarîya xwedîyên weşanxaneya Sîtavê; brêz Servet Özkan û Qahir Bateyî jî gelek gehişte min. Spasîyekê ji bo wan jî li ser xwe heq dibînim. Dîsa gelek spasîya hevjîna xwe dikim ku gelek caran berpirsyarîya min girte ser milê xwe û şert û mercên xebatê ji min re ava kirin.

**Muş- 2023** **Mazlum YILMAZ**

**KURTEBÊJE**

| | | |
|---|---|---|
| Çev. | : | Çeviren |
| (E) | : | ‘Erebî |
| (F) | : | Farisî |
| hej. | : | Hejmar |
| hwd. | : | Her wekî din |
| r. | : | Rûpel |
| s. | : | Sayfa |
| TDK. | : | Türk Dil Kurumu |
| TDV. | : | Türkiye Diyanet Vakfı |
| (T) | : | Tirkî |
| Weş. | : | Weşanxane |

## DESTPÊK

Ji hin qewimînên dîrokî guhertinên mezin pêk tên û ji bo gelan dibe destpêka serdemên nû. Guhertina ku pêk tê tesîra xwe li ser hemû nirxên civakê yên maddî û manewî dike. Ev guherîna ku bi dirêjîya demê ve girêdayî, mohra xwe li ser nasnameya civakan dide. Rengê nasnameya civakekê xwe di edebîyata wê civakê de nîşan dide. Ji van gotinan meqsed edebîyata Kurdî ye. Geşedanên civakî, polîtîk û sîyasî her tim seyra edebîyata Kurdî guherandîye. Ji ber van geşedanan jî edebîyata Kurdî ji gelek qonaxan derbas bûye. Piştî derkeftina dînê Islamê serdemeke nû ji bo edebîyata Kurdî dest pê kiriye û bi tarzê klasîk berhem hatine dayîn. Di berhemên helbestvanên edebîyata kurdî ya klasîk de unsurên dînî, erebî, farisî û çanda Îranê tên dîtin. Dîsa di sedsala 13an de ji alîyê Moxolan ve hilweşandina dewleta Ebbasîyan û hilweşîna hukumetên Kurdan ji bo Kurdan destpêka serdema mîrektîyan bû. Li gor nêrîna Adak: "Mîrektîyên herî girîng ên Kurdan û bi taybetî yên kurmancan piştî êrîşên Moxolan hatin avakirin û heta bi nîveka sedsala 19an li ser pîyan man. Ev serdem ji bo edebîyata Kurdî ya kurmancî serdemeke zêrîn e (Adak, 2015: 183)." Lewra li gorî qaîdeyên edebîyata klasîk cureyên edebî yên nû li edebîyata Kurdî zêde bûn û di vî warî de berhemên serkeftî derkeftine holê. Ew berhemên ku di serdema mîrektîyan de hatîne nivîsîn bandora xwe li ser şaîr û berhemên piştî xwe jî kirine. Di vê serdema modernîzmê de li ser navê edebîyata Kurdî ya klasîk gelek nivîskar hêj jî îlhama xwe ji berhemên edebîyata klasîk ya wê serdemê digirin.

Di geşedanên dîrokî de bandora qadên din (sîyasî, aborî, leşkerî hwd.) ya li ser qada edebîyatê hêjayê lêkolînan e. Di nav geşedanên dîrokî û sîyasî de şerê di navbera Sefewî û Osmanîyan de jî li ser edebîyata Kurdî ya klasîk bandoreke xwe ya mezin heye û dibe ku ev serdeme ji bo edebîyata Kurdî ya klasîk wekî mîladekê were dîtin. Dijberîya navbera Sefewî û Osmanîyan bi şerê Çaldêranê (1514) encam bû. Ev şerê di navbera van her du dewletan de Kurd kire du parçe. Kurdên Başûr ji ber mezheba Şiîtîyê xwe pêhtir nêzî Sefewîyan didîtin û pişgirî didane Sefewîyan. Li alîyê din li hemberê Sefewîyan, Kurdên Bakur hevkarîya Osmanîyan dikirin. Lêbelê wekî ku Hêzil jî dibêje: "Di şerên navbera her du dewletan de zerera mezin Kurdan dît. Nifûsa Kurdan kêm bû û bajarên Kurdan kavil bûn. Ji hêlên sîyasî, aborî û çandî ve dûratî kefte navbera wan (Hêzil, 2015: 67)." Li alîyekê jî rol û mîsyona mîrektîyên Kurdên Bakur zêde bû. "Di vî şerî de, bi piştgirîya Kurdên Bakur dewleta Osmanîyan bi ser ket. Piştî vê tifaqa

di navbera Kurd û Osmanîyan de mîrektîyên Kurdan heta dereceyekê gihîştin îstiqrareke baş. Vê yêkê jî ji edebîyata Kurdî (Kurmancî) re bingeh û atmosfereke guncaw ava kir (Adak, 2015: 197).” Lewra heta destpêka sedsala 16an mîrektîyên Kurdan xwedî otorîteyeke xurt nebûn. Ji ber vê ye ku tifaqa di navbera Kurdan û Osmanîyan de hem ji bo bihêzbûna mîrektîyên Kurdan û hem jî ji bo edebîyata Kurdîya Kurmancî ya klasîk cihekê girîng digire. Di vê serdemê de mîran qedr û qîmet dane zimanê Kurdî û ji bo pêşvebirina edebîyata Kurdî roleke mezin leystîne. Di heman demê de sîstema patronajê jî di vê serdemê de derkeftîye. Di vê serdemê de li gelek cihan medrese vebûn û ligel zimanê Erebî, bi zimanî Kurdî dersên ‘ilmî û dînî dihatin dayîn. Gelek ‘alim û şaîrên Kurd ji van medreseyan derkeftin. Ji ber vê jî tesîra medreseyan li ser pêşkeftina edebîyata Kurdî ya klasîk gelek e. Piştî têkçûyîna mîrektîyan jî ev kevneşopîya medreseyan heta dawîya sedsala 20an dewam kiriye. Derheqê vê mijarê de Hêzîl jî wisa dibêje: “Piştî avabûna Komara Tirkiyeyê medreseyan bi şiklekê nîv-veşartî perwerdehî dida, lê sal bi sal lawaztir bûn, ta ku di salên 1980î ku wê demê temamî ji holê rabûn (Hêzil, 2015: 68).”

Bêguman rol û mîsyona mîran ji bo pêşkeftina edebîyata Kurdî bêhempa bû. Lê di vê pêvajoya dûr û dirêj de ji bo pêşvebirina edebîyata Kurdî keda hindek malbatan jî kêm nîn e. Lê mixabin heta roja îro pir kêm xebat li ser wan malbatan hatine kirin û hêj jî em ji gelekan bêxeber in. Xebatên ku di vê mijarê de pir kêm in û mijarên bi vî rengî li benda lêkolînerê xwe ye.

Malbata Gulordîyan jî ji yêk wan malbatan e. Kerem Engin li ser sê ‘alim û helbestvanên malbata Gulordîyan tezeke mastirê amade kir û paşê wekî kitêb çap kir. Di nav vê tezê de beşek ji bo jîyan û (34) helbestên Mela Ebdulmecîdê Gulordî veqetandîye. Lê Gulordî 227 helbest nivîsîne ku hêj li çu cihan nehatine çapkirin. Ji bo vê yêkê me jîyan û hemû helbestên Mela Ebdulmecîdê Gulordî kiriye mijara teza xwe û bi awayekê berfireh em li ser xebitin. Girîngîya vê tezê jî ew e ku cara ewil e li ser jîyan û hemû helbestên Mela Ebdulmecîdê Gulordî xebateke bi vî rengî tê kirin.

Helbestên Gulordî ji alîyê naverokê ve hem folklorîk in û hem jî klasîk in. Lê ji alîyê teşeyê me di çerçoveya folklorîk de nirxand. Lewre çû helbestên Gulordî bi kêşa arûzê nehatine nivîsîn. Hemû helbestên Gulordî bi kêşeya heceyê hatine nivîsîn. Helbestên Gulordî bi gelemperî çarîn in û helbestên ku bi beytan jî nivîsînî hene.

Helbestên Gulordî yên dînî bi exlêb bi beytan hatine nivîsîn. Gulordî, helbestên xwe bi alfabeya latînî nivîsîne û helbestên wî ji çarîn û beytan pêk tên. Hemû helbestên Gulordî bi zimanekê zelal û xwerû hatine nivîsîn. Mela Ebdulmecîd Gulordî di helbestên xwe de ji hêmanên folklorîk pir istifade kiriye û helbestên Gulordî ji alîyê şiklî ve pêhtir nêzî helbestên Feqîyê Teyran in.

Helbestên Gulordî li defterê bi awayekê berbelav hatibûne nivîsîn. Dema ku me ew destxetên helbestan derbasî kompitûrê kirin, me ji alîyê rastnivîsê ve li ber çavan derbas kir û redaksîyona wan kir. Lê me qet dest bi peyvên devokî an jî yên ku di helbestê de hatine nivîsîn nekirin û çawa hatibe gotin me wisa hişt. Paşê me helbestên Gulordî li gor mijarên helbestan bi awayekê kronolojîk sinifandin. Jixwe Gulordî bixwe jî di nav vê pêvajoyê de bû. Di heman demê de ji bo helbest û jîyana wî, Gulordî ji bo me çavkaniyeke sereke bû. Sê caran rûbirû û bi dehan caran zêdetir jî li ser telefonê danûstandina me çêbû. Bo pêzanîna derbarê jiyana wî û helbestên wî de gelek alîkariya Gulordî gehişte me. Ev hebûna wî jî ji bo me derfeteke pir mezin bû. Ji bilî vê, me ji bo teza xwe ji hind çavkanîyên sereke sûd wergirtin.

Teza me ji du beşan pêk tê: Beşa yekemîn di nav xwe de vediqete du binbeşan. Di vê beşê de em li ser jiyana Gulordî û kesayetîya wî ya edebî rewestane. ‘Alim û edîbên ku li ser Gulordî tesîr kirine di vê beşê de hatine nirxandin. Dîsa hind têbinîyên li ser helbestvanîya Gulordî di dawîya vê beşê de hatiye kirin.

Me di beşa duyemîn de jî helbestên Gulordî ji alîyê naverok û şiklî ve bi awayekê berfireh nirxandine. Me ev beşe jî di bin sê binbeşan de rave kiriye.

Herî dawîyê hemû helbestên Gulordî bi awayekê birêkûpêk wekî ‘pêvek’ li tezê hatiye zêdekirin.

# BEŞA YEKEM

# MELA EBDULMECÎDÊ GULORDÎ

## 1.1. JIYANA MELA EBDULMECÎDÊ GULORDÎ

Mela Ebdulmecîdê Gulordî (bi navê resmî: Abdulmecit İliş) 7ê Kanûna Paşî sala 1948an li gundê Gulordê ku girêdayê navçeya Geverê ye, hatîye dinyayê. Navê babê wî Mela Elî ye û navê dayîka wî jî Fatma ye. Ew bi navê Mela Mecîd tê nasîn. Mela Mecîd bi eslê xwe ji eşîra Doskîyan e. Eşîra Doskîyan eşîreke mezin e û niha piranî li Îraqê û li devera Geverê niştecih in. Li gorî hind riwayetan eşîra Doskîyan ji Farqînê hatine û bi dem re li Cizîra Botan û li Başûr belav bûne. Heta roja îro jî gelek gundên Doskîyan li Geverê û Başûrê Kurdistanê hene. Eşîra Doskîyan ji şeş babikan pêk tê û navê van babikan ev in: Katolî, Himbî, Çêyî, Çîyayî, Oremarî, Hesedaxayî. Mela Ebdulmecîdê Gulordî jî di nav eşîra Doskîyan de ji babkê Katolîyan û ji malbata Gulordîyan e.

Binemala Hesê Pîra yek ji malbata Gulordîyan e. Dayîk û babê Mela Ebdulmecîdê Gulordî her du jî ji binemala Hesê Pîra ye. Binemala Hesê Pîra binemaleke melazade bûye û gelek ‘alim û seyda jê rabûne. Mesela Mela Evdurehmanê Şagulordî bapîrê Fatmaya ku dayîka Ebdulmecîdê Gulordî ye. Mela Evdurehmanê Şagulordî ‘alimekê zor zana bûye. Ji alîyê zanîna xwe ve di nav gel de binavûdeng bû. Dîsa bab û bapîrên Mela Ebdulmecîdê Gulordî jî ji ber zanîna xwe meşhûr bûn. Mela Ebdulmecîdê Gulordî di malbateke wisa de mezin bûye. Babê wî ji birayên xwe hemûyan mezintir bû. Heta ku daweta xwe diket di malê de zarok nebûn. Malbat çend salan bê-zarok mabûn. Lewma xwudêdayîna Mela Ebdulmecîdê Gulordî keyfxweşîyeke mezin bi xwe re înaye. Ji alîyê dayîk û babê xwe û mamên xwe ve bi hezkirin tê mezinkirin. Berîya ku Mela Ebdulmecîdê Gulordî biçe dibistanê, perwerdeyê li ber destê babê xwe Mela Elî dibîne. Babê wî pêşîyê fêrî elîfbêyê diket û paşê dersên *Qur‘an*ê didetê. Mela Ebdulmecîdê Gulordî di heft salîya xwe de, anku di sala 1955an de dest bi dibistana seretayî kiriye. Wê demê li dibistana gundê Gulordê nêzî 50-60 xwandekar hebûn û ew jî yek ji wan bû. Li gel perwerdeya dibistanê, ji babê xwe dersa *Qur‘an*ê jî dibîne. Piştî ku pênc salê dibistanê xilas kirin, ji bo Mela Ebdulmecîdê Gulordî pêvajoyeke nû dest pê kiriye. Lewra heta wê çaxê babê wî û mamê wî bi hev re dijîyan û malê xwe lêkve nekiribûn. Mamekê Mela Ebdulmecîdê Gulordî li gundê Sûsyanê dijîya. Piştî ku Mela Ebdulmecîd dibistana xwe xilas dike, diçe li ba mamê xwe Mehemed dimîne. Zarokatîya Mela

Ebdulmecîdê Gulordî heta sêzde salîyê li gundê Gulordê (Bostancık) derbas bûye. Du salan piştî hingê jî, di sala 1962an de babê wî Mela Elî ji birayên xwe yên gundê Gulordê cuda bûye û mala xwe birîye gundê Sûsyan (Çatma). Mela Elî pênc kur û pênc keç hebûn û Mela Ebdulmecîdê Gulordî ji hemû xwîşk û birayên xwe mezintir bûye. Ji ber vê jî karûbarê malê hemû li ser milên wî bûye. Li gor gotina Gulordî di wî temenê xwe yê biçûk de gelek zor û zehmet kêşaye, lê dîsa jî xwe ji xwandinê dûr nekiriye. Di nav wî karê dijwar de li nik babê xwe xwandina xwe domandîye û dersên ‘ilmên şerî‘etê dibîne. Babê wî di mijarên wekî tefsîr, hedîs û fiqhê de gelek pispor bûye. Herwiha babê wî di dersdayînê de zor bi micid û rêkûpêk bûye. Mela Ebdulmecîdê Gulordî heta dawîya salên 60an perwerdeya xwe li ber destê babê xwe dibîne. Mela Ebdulmecîdê Gulordî li gel zimanê Kurdî, zimanê Erebî, Farsî, Tirkîya Osmanî û Tirkî jî baş dizane.

Mela Ebdulmecîdê Gulordî sala 1967an de zewicîye. Xanima wî Fatma jî ji eşîra Doskîyan, ji binemala Hesê Pîra ye. Keça Mela Mehemed Selîm e. Mela Ebdulmecîdê Gulordî babê sê keçan û sê kuran e. Navên zarokên wî jî ev in: Yaşar, Nîhat, Mehmed Elî, Gulê, Nûrcan û Zerîfe. Salekê piştî zewaca xwe diçe leşkerîyê. Leşkerîya xwe du heyvan li bajêrê Samsunê, şeş heyvan li Îzmîrê û şazde heyvan li navçeya Tuzlayê, ku navçeya Stenbolê ye, dike. Mela Ebdulmecîdê Gulordî dema ku li leşkerîyê jî di xwandina xwe de serkeftî bû. Piştî du salan, anku sala 1970an leşkerîya wî xilas dibe. Piştî leşkerîyê qaymeqamê Geverê yê wî demî ji Mela Ebdulmecîd Gulordî re daxwaz dike ku di nexweşxanê de bibe karmend. Lê ji ber karê malê babê wî destûr pê nedaye. Babê wî nexweş dibe û ji ber temenê xwe jî êdî nedikarî karê malê bike. Karûbarê malê hemû ji Gulordî re dimîne. Ew jî dilê babê xwe nahêle û dîsa karûbarê xwe yê malê berdewam dike. Jixwe piştî hingê babê wî sala 1975an diçe hecê û sala 1976an jî emrê Xwudê diket. Dema ku babê wî emrê Xwudê kirî ew 28 salî bû. Êdî piştî wî temenî ji xwe yê bêminet bû, dikarî hemû karan biket. Ji hêz û taqetê ve têra xwe dikir. Jixwe birayên wî yên ji wî biçûktir jî êdî mezin bûne û hevkarîya wî kirine. Li gundî heta sala 1980an bazirganîya heywanan kiriye. Di kirîn û firotina heywanan da mala xwe pê xwudan kiriye. Di sala 1980yan de mala xwe ji gundî Sûsyanê biriye navenda Geverê. Axirî nozde salên xwe li gundê Sûsyanê derbas kiriye. Wisa diyar e ku li gel kirina ew qas karûbarê malê, hêj jî kela Mela Ebdulmecîdê Gulordî ya ‘ilm û zanînê neşikênandîye. Çawa li navenda Geverê bicih bûye, qesta Mela Husênê Doskî (1898-

1993) kiriye. Ji bo xwe daxwaza perwerdebûnê ji Mela Husênê Doskî kiriye. Mela Husênê Doskî jî ev daxwaza wî qebûl kiriye. Mela Husênê Doskî ‘alimekê navdar bûye. Di Komara Kurdistanê ya 1946an de wezîrê dad û ‘edaletê bûye. Mela Ebdulmecîdê Gulordî sê salan li ber destê wî perwerdeyê dibîne. Lewma tesîra wî jî li ser Mela Ebdulmecîdê Gulordî gelek bûye. Herwiha Mela Husênê Doskî û Mela Ebdulmecîdê Gulordî gundîyên hev bûne, hev nas dikirin.

Li gor gotinên Mela Ebdulmecîdê Gulordî şol û emelê malê li pêşîya xwandina wî dîsa astengî derxistîye. Ji ber wan astengîyên aborî jî tenê sê salan li dev Mela Husênê Doskî perwerde dîtîye. Di wê demê de li Geverê dest bi karê înşaatê kiriye û nêzî danzdeh salan ew karê înşaatê berdewam kiriye. Dema ku mala xwe ji gundî înaye navenda Geverê hêj ew û birayên xwe malek bûn. Ew û birayên xwe di sala 1990an de malê xwe lêkve kirine û jêk cuda bûne.

Ji bo melatîyê di sala 1995an de li dîyaneta Colemergê miracaet kiriye. Sala piştî hingê ji îmtihanê bi awayekê serkeftî derbas bûye. Lê ji ber hindek arêşeyan biçûk melatî nedanê. Ji bo ku pêşiyê li vê neheqîyê bigire serî li dadgehê daye. Piştî pêvajoyeke dirêj ev doze qezenç kiriye û di sala 1998an bûye mela. Ji bo ku bibe mela gelek ked dabû. Ji ber vê jî dema ku melatî jê re hatî gelek keyfxweş bûye. Lewma cara pêşî bi awayekê fermî derê ‘ilmê jê re hatibû vekirin. Mela Ebdulmecîdê Gulordî li mizgefta Hecî Ubeyd melatî kiriye. Ji bo demên kurt li hind mizgeftan peywîr kiriye, lê melatîya wî piranî li mizgefta Hecî Ubeyd derbas bûye. Di serdema melatîya xwe de gelek çalak bûye. Beşdarî gelek konferansan û civînan bûye. Ji bo mizgefta ku lê dima gelek xizmet kiriye. Gulordî di sala 2013an de teqawid bûye û tevahî pazdeh salan melatî kiriye. Lê piştî ku teqawid bûye dîsa li cihê xwe nerûniştîye. Mizgefta ku lê peywîr dikirî xirab kiriye û di heman salê de çar qat çêkirine. Du qatên binî ji bo cihê destnivêjê, dukan, tazîye û qursa Qur‘anê vebirîye û her du qatên jorî jî ji bo cihê nivêjê hêlaye. Qasê ku ji destî hatiye hizmet kiriye lê ji ber ku berpirsyarîya mizgeftê kevte destê melayekê dî, nehêlaye temam biket. Wî destê xwe ji vê xizmetê kêşaye. Jixwe di wê salê de dayîka wî çûye rehma Xwuda. Ji ber vê jî sala 2014an ji bo wî saleke bi êş bûye. Pir li ber mirina dayîka xwe kevtîye. Ew bixwe jî di sala 2015an de pir nexweş bûye û ji ber vê nexweşîya xwe çûye bajêrê Enqere û Stenbolê. Nêzî du heyvan ji bo tedawîya xwe li van her du bajêran maye. Sala 2015an û 2016an ji bo wî pir dijwar derbas bûye. Lewra van her du salan bi nesaxîya xwe ve mijûl bûye.

Bi rastî salên 2015-2016ê ji bo me hemûyan salên bêyom bûn. Gelek bajêrên Kurdan hatin talankirin, malên wan kavil bûn. Ruha wan li serê wan bû bela. Bi hizaran mirov ji mal û warên xwe revîn, li der û kolanan perîşan bûn. Gelek mirov bêçune hatin kuştin. Heta îro jî ev birînên ku di nav gel de hatine vekirin hêj jî necibirîne. Ew hêstên wî demî jî tu caran ji binbîra wan de dernakeve. Di wê serdemê de Gever jî ji van bajêran yêk bû. Wekî hemû miletê Geverê, malbata Mela Ebdulmecîdê Gulordî jî tesîr ji wan bûyeran girtîye. Berîya ku şer dest pê biket her kesek ligel malbata xwe qesta bajêrekê yan jî gundekê kiriye. Mela Ebdulmecîdê Gulordî jî malbata xwe înaye bajêrê Wanê û heta demekê li Wanê mane. Piştî ku şer disekine dîsa vedigerine navçeya Geverê û niha jî mala wan li wir e.

Ji zarokatîyê heta temenê xwe yê pîrîyê meyla Mela Ebdulmecîdê Gulordî li ser xwandin û zanînê bûye. Di salên dûr û dirêj de hindî ku firsend dîtîye wextê xwe bi xwandinê derbas kiriye. Van salên dawîyê û pê de derfet dîtîye ku wan zanîn û tercubeyên xwe bi rêya helbestan birêje ser rûpelan û di dîroka edebîyata Kurdî de cihê xwe biket. Gelek helbest nivîsîne û hêj karê xwe yê nivîsînê didomîne. Du‘aya me jî ji Xwuda ew e ku ji bo mala xwe û zarokên xwe sax be û siheta wî xirab nebe.[1]

## 1.2. KESAYETIYA MELA EBDULMECÎDÊ GULORDÎ YA EDEBÎ

### 1.2.1. Ziman û Şêwaza Gulordî

Qaîde û çarçoveya edebîyata klasîk dîyar e. Şaîrên edebîyata klasîk jî li gorî qaydeyên edebîyata klasîk helbestên xwe nivîsîne. Dibe ku helbestên wan ji alîyê ziman û şêwazî ve nêzî hev xuya bikin, lê bikaranîna ziman û şêwaza her şaîrekê ji hev cuda ye. Lewma her şaîrek xwedîyê şêwazeke xweser e. Şêwaza şaîran, xet û nexşên şexsî ne. Herwiha ziman û şêwazê ku şaîr bikartînin derîyekê ji bo nasîna wan jî vedike. Cîhanî jî têkilîya di navbera jîyana nivîskar û berhema wî de destnîşan diket û li ser vê mijarê wisa dibêje: “Her kesê ku xwe di gel wêje û toreyê mandî bike, dê bizanibe ku helbest û bi giştî berhemên her nivîskar helbestkarekî neynûka jîyan, têhizrîn û çawanîya ruhî, rewanî û cîhanbînîya wî nivîskar yan helbestkarî ye (Cîhanî, 2019: 104).” Mirov dikare bêje ku bi awayekê taybet ziman û şêwaz, bi giştî kesayeta şaîran ya edebî di helbestên wan de kifşe dibin.

[1] Me ligel Mela Ebdulmecîdê Gulordî gelek hevdîtinên rûbirû û li ser telefonê pêk anîn. Ev agahîyên ku me di vê beşê de dayîn hemû di van hevdîtinan de hatin bidestxistin. Hemû hevdîtinên ku me bi seyda re kirinî wekî deng hatîye tomarkirin û di arşîva me de ne.

Mela Ebdulmecîdê Gulordî nûnerekê edebîyata Kurdî ya klasik e ku di serdema nûjen de bi tarzê klasîk helbest nivîsîne. Gulordî hemû helbestên xwe bi zimanê Kurdîya kurmancî û bi alfabeya latînî nivîsîne. Di helbestên xwe de zimanê xeberdanê bikar înaye. Ji ber zimanê wî yê sade û xwerû fêmkirina helbestan bi sanahî ye. Ji bo ravekina vê mijarê me hewcehî bi du pirsan heye: Gelo di helbestên wî de bikaranîna zimanê xeberdanê nîşaneya çi ye? Zimanê ku di helbestên wî de hatîye bikaranîn em dikarin bi kîjan sedeman ve girêbiden? Ev her du pirsên ku hatîne kirin têkilîya di navbera çanda devkî û çanda nivîskî radêxe pêşîya me. Di helbestên Gulordî de em rastî gelek hêmanên folklorîk tên. Gulordî, di helbestên xwe de ji keresteyên çanda devkî gelek sûd wergirtîye. Hêza xwe ya nivîsînê ji çanda nivîsînê pêhtir, ji çanda devkî digire. Herwiha mijara helbestan jî tesîra xwe li ser zimanî wî kiriye. Ji ber vê jî bixwaze nexwaze di helbestên wî de zimanekê sade û xwerû derdikeve holê. Gulordî, li gor zimanê Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî zimanekê siviktir û zelaltir bikar anîye. Ji vî alîyî ve helbestên Gulordî pêhtir dişibin yên Feqîyê Teyran. Em ê di binbeşa “Feqîyê Teyran” de bi nimûneyan mijarê baştir ronî bikin.

Em heman şêwazê di romanên Kurdî yên ewil de jî dibînin. Nivîsakaran di berhemên de zimanê rojane bikar înane. Berevajîyê hevokên girîft û alagorîk, di berhemên xwe de zimanekê sade û xwerû bikar înane. Pala xwe dane çanda devkî û ji hêmanên folklorîk sûd wergirtine.

Metnên edebîyata Kurdî ya klasîk di bin tesîra devokên herêma helbestvanan de hatine nivîsîn. Di nav helbestên Kurdî yên klasîk de hinek ji van devokan zêde derketine pêş. Beyter jî van devokan ji bo helbestên Kurdî yên klasîk wekî zimanên standart dinirxîne û wisa dibêje: “Di serdemên klasîk de digel devoka Botî, devoka Hekkarî û Badînî rengên xwe zêdetir dane helbestê û em dikarin bêjin ku ev devokên han di edebiyata klasîk de bûne zimanên standart (Beyter, 2012: 36).” Gulordî jî nûnerekê edebîyata klasîk ê herêma Colemêrgê ye û bi devoka Colemêrgê helbestên xwe nivîsîne. Di helbestên wî de em rastî devoka herêmeke din nayên. Herwiha Gulordî di helbestên xwe de ji xeynî Kurdîya kurmancî, peyv û têgehên zimanê Farisî, Erebî û Tirkî jî bikar anîne. Ev peyv û têgehên ku bikar anînî di jîyana rojane de gel bikar dîine. Bi rêzê; herî pêhtir peyvên Erebî, paşê yên Farisî û herî dawî peyvên Tirkî bikar înane.

#### 1.2.1.1. Hêmanên Farisî û Tirkî

Di nav helbestên Gulordî de em rastî çu malik an jî beytên ku bi zimanê Farisî hatibine nivîsîn, nehatin. Gulordî di helbestên xwe de tenê cih daye peyvên Farisî. Herwiha ji bilî sê yan çar heban, em rastî peyv an têgehên zimanê Tirkî nehatin. Ji ber vê jî me nexwast cih bidene serenavekê din, me hêmanên Farisî û Tirkî bi hev re dan.

Nimûne ji bo Tirkî: Evdeş (hem-malî), savaş (şer).

Nimûne ji bo Farisî: Ab (av), ateş (agir), çeşm (çav), ebrû (birû), leb (lêv), mah (meh), nadan (nezan), nalan (zarîn), pabeste[2], sîne (sing), şeb (şev), zeban (ziman) û hwd.

*Şu'leya[3] **ateş**ê eşqê dil li min kir kebab*
*Xistme çengala eşqê bûm sûcdarê bêsewab (Xwezî Carek/7)*

*Eql û zehn li min kir talan*
*Çehra **ebrû** û hîlalan*
*Nazik û gerdenşepalan*
*Fikr û xiyal wê herifandin (Cewher Elmasan/4)*

*Pêş wîrûsê man **pabeste***
*Hero hizaran tên xeste*
*Mirin ser me qet naweste*
*Mesura Îsrafîl tê bîr (Qorona Wîrûs/4)*

*Min nav **sîne** hebû dilek*
*Ew jî li min bir dîlberê*
*Di şûnê da çandî kulek*
*Beden tev êxist xeterê (Nava Sîne/1)*

#### 1.2.1.2. Hêmanên Erebî

Di helbestên Gulordî de piştî Kurdîya Kurmancî, herî pêhtir peyv û têgehên zimanê Erebî hene. Zanîna wî ya zimanê Erebî ji ya zimanê Farisî gelektir e. Lewma

[2] Kesê ku dest û pêyên wî hatine girêdan.
[3] Şu'le ('E): Ronahî.

bixwe jî mela bû, têkilîya wî ligel zimanê Erebî pêhtir bû. Zimanê Erebî hem bi malikan bikar anîye û hem jî gelek zêde cih daye peyvên Erebî.

Bo nimûne: Eslîh (çek), bedr (ronahîya heyvê), beser (çav), beşaret (mizgînî), bu‘sed (ji cihê hatî), texyîr (guhartin), terîq (rê), te‘xîr (paşveman), te‘dîd (terbîyekirin), turab (ax), cerh (birîndarî), cinan (biheşt), hey (sax), hilm (nazik), xefir (efûkirin), sa‘il (xazok), şaqî (rêgir), şu‘le (rewneq), ‘ebes (bêfayde), ‘efîf (narîn), ‘iqab (ezîyet), kenz (xizîne), metar (balefirgeh), meta’ (serwet), memat (mirin), menbe’ (jêder), mucesem (cism), muhît (derdor), muxteser (kurtahî), mufsid (fesadker), nezîr (hişyarker), zecr (êş), zenb (guneh) û hwd.

*__Şu’le__ya ateşê eşqê dil li min kir kebab*
*Xistme çengala eşqê bûm sûcdarê bêsewab (Xwezî Carek/7)*

***Husn zerîf xulqê letîf ‘efîf zat** e*
*Ew **heq resûl e fexrê ka’inat** e (Qesîda Mewlûdê/18)*

*Mirna heq li min peyda bît*
*__Zecr__a giran ser min rabît*
*Beden ji derdan reha bît*
*Xilas bim di vê qeydê da (Dilê Birîn/12)*

Nimûne ji îqtibasên ayetan:

*Ez Xerîb im ku Ebdullah*
*Min qeseme b’ismê Ellah*
*Dê bêjim **qalû înnalillah***
***We îleyhî racî’une**[4] (were Bira/16)*

*Çend bi isyan û xetab im feqîr im umêd heye*
*Na-umêd nabim çu car **lateqnet û xitab**[5] heye (Dad û Feryad/5)*

*Yêt wesa nin dîn dabûne bi ‘emel*
***Ulaîke ke‘l-en‘am bel hum edall**[6] (Derdê Me)*

[4] Ev ayeta Qur‘anê ye. Dibêje ku em ji dev Xwuda hatine û dîsa em ê bizivirine ve dev wî.
[5] Lateqnetu xitab: Ayeteke Qur‘anê ye. Xwuda kerem diket: “Bêhêvî nebin ji rehma min.”

### 1.2.2. Mexlesên Wî

“Di derbarê pênaseya ‘mexles’ê de, di ferheng û ansiklopedîyan de pênaseyên pir nêzî hev hatine dayîn: 1. Navê kesekê yê duyê. 2. Leqebên ku şair di berhemên xwe de bikar tînin (Erzen, 2017: 42; Parlatır, 1998: 1486).” Dîsa li gor Kurtoğlu: “Têgeha “mexles”ê peyveke Erebî ye ku ji wateya “cihê rizgarbûnê, cihê hewînê” pêhtir, wekî termeke edebîyatê hatîye nasîn (Kurtoğlu, 2006: 71).” Wekî ku tê zanîn kevneşopîya bikaranîna mexlesê cara pêşî di edebîyata ereban de derkeftîye holê û piştî hingê ev kevneşopîye derbasî edebîyata miletên wekî; Farsan, Tirkan, Kurdan û hwd. bûye.

Di tarîxa edebîyata Kurdî de qasê ku tê zanîn cara ewil Baba Tahirê Uryan mexles bikar înaye. Adak derbarê vê mijarê de hişyarîyekê diket û wisa dibêje:

> *Lêbelê divê bê gotin ku ji Baba Tahir heta bi Mela Perîşan di edebîyata Kurdî ya hewzeya Îranê de rawestaneke edebîyata nivîskî heye û di vê hewzeyê de edebîyata Kurdî ji Mela Perîşan şûn de çalak bûye. Ji ber vê jî dema em Mela Perîşan esas bigirin, em ê bibînin ku ji Mela Perîşan û vir ve tradîsyona bikaranîna mexlesê nêzî 600 salî di edebîyata Kurdî ya klasîk de bê rawestan dom kiriye (Adak, 2018: 24).*

Piştî edebîyata Kurdî ya bi zaravayê lorî û goranî, di edebîyata kurmancî de jî cara ewil Elîyê Herîrî mexles bikar anîye. Em dikarin bêjin ku nûnerên edebîyata Kurdî ya klasîk bi gelemperî xwedî mexles in. Kevneşopîya mexlesê tesîra xwe li ser hemû şaîrên edebîyata Kurdî ya klasîk kiriye û heta roja me hatiye. Şaîrên Kurd di helbestên xwe de hewce dîtine ku mexlesekê yan jî ji yêkê zêdetir mexles bikar bînin. Ji bo me ya muhim ew e ku sedema bikaranîna mexlesan çî ye û bikaranîna mexlesê di derbarê şairî de çi qenaetê bo me çêdike? Em ê hewil bidin ku bi kurtasî van her du pirsan bersiv bidin.

Mexles, di edebîyata klasîk de mohra şaîrî ye. Bi gotineke din, nasnameya şaîran ya edebî ye. Ji bo ku bi demê re helbestên wan winda nebin yan jî kesekê din xwe lê nekete xudan, mexlesên xwe bikar diînan. Dibe ku sedema sereke eve be, lê tenê sedema bikaranîna mexlesan ne eve ye. Şaîran ji bo ewlehîya xwe jî car caran mexles wekî amûr bikar înane. Nexwastîye şahekê yan mîrekê bi aşkera rexne biket û ji bo vê jî mexles bikar înaye. Ömer Faruk Akün (1994: 395-396) sedema bikaranîna mexlesan bi yazde serenavan tasnîf kiriye:

---

[6] Ayeteke Qur‘anê ye. Wate: Wekî heywanetî ne û ji heywanî kêmtir in.

1. Mexlesên ku rewşeke derûnî dîyar dikin.
2. Mexlesên ku libatekê dîyar dikin.
3. Mexlesên ku angaşta serdestîyê bi xwe re dibîne.
4. Mexlesên ku xwe layiqê biheştê dibîne, xwe ji meqamê îlahî re nêz dibîne.
5. Mexlesên ku ji xwezayê hatîne girtin.
6. Mexlesên ku xwe kêmdîtinê, halê keftinê dîyar dikin.
7. Mexlesên ku li dora têgehekê hatîne komkirin.
8. Mexlesên ku ji navê şexsekê yan jî ji navê babê xwe hatîne girtin.
9. Mexlesên ku ji navê peywîra xwe girtinî.
10. Mexlesên ku tenê wekî navekê ji rêzê hatîne girtin.
11. Mexlesên ku navê xwe ji cih digirin.

Wekî helbestan, mexlesên şaîran jî ji bo zanîna wan ya hizrî amûreke girîng e. Lewma car caran mexlesên şaîran ji bo cîhana wan ya hundirîn derîyekê ji me re vedikin. Bi taybetî mexlesên derûnî, nîşaneya halê wan yê hundirîn e. Derûnîya wan ya li hemberê tiştekê, kesekê, hizrekê, cihekê û hwd. hemû di mexlesên wan de veşartîne. Ji bo vê jî bi saya mexlesan em dikarin xwe bigehinine hind agahîyên şaîran.

Mela Ebdulmecîdê Gulordî, 227 helbest nivîsîne. Di van helbestan de 145 caran mexlesên wî derbas dibin. Bi tevahî 6 cure mexles bikar anîne. Gulordî di helbestên xwe de cara ewil mexlesa “Xerîb” bikarînaye. Di hemû cureyên helbestên xwe de (dînî, xweza, eşq û hwd.) ev mexlese zêde bîkar înaye. Mexlesa bi navê “Ebdullah” jî piranî em di helbestên wî yên dînî de rast tên. Gulordî, Sûsyan û Gever jî navê cihên ku lê jîyara xwe borandiye. Ji bo vê jî di helbestên xwe de ev cihe wekî mexles bikar înane. Armanca Gulordî jî bi vê ew e ku cîhê lê jîyaye were zanîn. Ji ber van sedeman jî mexlesên ku Golurdî bikarînanî zêde derdikevine pêşîya me. Lê ev mexlesên ku bikarînanî bi demê ve girêdayî nînin, bi curêyê helbestê ve girêdayîne. Ji bo vê em dikarin bêjin ku hemû mexlesên xwe bi awayekê çalak bikar înane. Ji bo ku baştir were fêmkirin em mexlesên wî bi rêzê, ligel mînakan rave bikin.

#### 1.2.2.1. Xerîb

Mela Ebdulmecîdê Gulordî di helbestên xwe de 127 caran mexlesa “Xerîb” bikar înaye. Anku herî pêhtir bi vê mexlesê emilîye û di dawîya helbestan de hatîye bikaranîn. Bi rastî dema ku em helbestên Gulordî dixwûnin em baştir fêm dikin ka ji bo çi ev

mexlese ji xwe re hilbijartîye. Di helbestên wî de jî dîyar dibe ku vê dinyayê fanî dibîne û wekî cihê "hatin û çûnê" dibîne. Xerîb, xwe xerîbê vê cîhanê dibîne. Ev mexlesa wî nîşaneya "xemgînîyê" ye. Bi gotineke din, dijberê peyva "aramî"yê ye. Di zêdetirîn helbestên wî de derûnîya xemgînîyê serdest e. Ji ber vê jî di wateya derûnî de mexlesa bi navê "Xerîb" neyînî ye. Di gelek helbestên xwe de xwe aciz dibîne û ji Xwuda şefaetê dixwaze. Bi gotineke din ev mexlese ji bo Gulordî li hemberê rehma Xwudê xwe-şikênandinek e. Bo nimûne:

*Min du'a ye j' Wî Sebburî*[7]

*Ji rehma Rebbê Xefûr î*

*Gunehan li me biborî*

***Xerîb** l'mehşer nebît feqîr* (Tahir/13)

*Tebesûmê ji dûr biket*

*Dergê dilê min dê veket*

*Her çi hes ket ew dê biket*

***Xerîb** nîn e inkar jê ra* (Du'a Min/10)

#### 1.2.2.2. 'Ebdullah

Ev mexlese 8 caran bikar înaye. Ev navê bapîrê wî ye. Li gor gotina Gulordî, dayîka wî gelek caran bi navê "Ebdullah" gazî wî dikir. Navê "Ebdullah" navekê axretî ye. Gulordî jî di helbestên xwe yên dînî de mexlesa "Ebdullah" bi kar înaye. Bo nimûne:

*Ya Reb **'Ebdullah** 'ebdê te*

*Bûme seyê 'eshabê te*

*Ez 'efû bim li dergê te*

*Xilas bibim ji zehmetê* (Were Gelo/16)

[7] Navekê Xwuda ye.

#### 1.2.2.3. Gulordîyê Jar

Ev mexlese 4 caran bikar anîye. Ji alîyê derûnî ve dişibe mexlesa "Xerîb". Ev mexlese xwedî atmosfereke negatîf e. Bo nimûne:

*Ya Reb tu bo xatra xwe ke*

*Ji sûcdaran hisab neke*

***Gulordîyê Jar** dûr neke*

*Nebin ruswa li mehşerê (Rabe di vê demê/40)*

#### 1.2.2.4. Xerîbê Gulordî

Ev mexlese di nav helbestên Gulordî de 3 caran derbas dibe. Gulord navê gundê Mela Mecîdê Gulordî ye ku Gulordî sêzde salan li gundê Gulordê jîyaye. Bo nimûne:

*Çi b'ket **Xerîbê Gulordî***

*Mam daxwaza gay û cotî*

*Bûn muhtacê kûtek sotî*

*Girde û kade l'min bûn bezr (Hatî Bihar/13)*

#### 1.2.2.5. Xerîbê Sûsyanî

Ev mexlese 2 caran derbas dibe. Di yekê de wekî serenavê helbestê derbas dibe. Mela Mecîdê Gulordî ji gundê Gulordê diçe gundê Sûsyanê û nozde salan li gundê Sûsyanê dijît. Di helbestên xwe de jî gundê Sûsyanê wekî mexles bi kar înaye. Bo nimûne:

*Rabe **Xerîbê Sûsyanî***

*Bi wî aqlê xwey nezanî*

*Behran dikeyn melevanî*

*Tu dê xerq bî di awê da (Xerîbê Sûsyanî/1)*

#### 1.2.2.6. Xerîbê Gewerî

Em tenê carekê rastê vê mexlesê hatin.

*Sê roj ji tîrmehê maye*

*Sal du hizar û nozde ye*

*Bêtab* ***Xerîbê Gewerî***

*Berew malê dizivirî (Nexweşxane/10)*

Di 227 helbestên Gulordî de tenê 83 helbest bêmexles in. Li gor dîtina Gulordî mexles, mohra şaîran e. Dîyar e da ku helbestên xwe ji windabûnê biparêze, pir girîngî daye bikarînana mexlesê û di encamê de gelek mexles bikar înane.

### 1.2.3. Edîbên Ku Bandor Li Mela Ebdulmecîdê Gulordî Kirine

#### 1.2.3.1. Melayê Cizîrî

"Melayê Cizîrî (M.H.1040?/M.1640?), yek ji navdartirîn şaîrê edebîyata Kurdî ya klasîk e (Tek, 2019: 17)." Li Cizîra Botan hatîye dinyayê, lê ji bo temenê wî em nikarin tiştekê esseh bêjin. Di derheqê serdema ku Melayê Cizîrî tê de jîyayî agahiyên cuda hene û lêkolîner di vê mijarê de hemfikir nînin. Di vê mijarê de Abdurahman Adak, agahîyên lêkolîneran didete berhev û sedsala 16an û 17an zehftir nêzî rastîyê dibîne (Adak, 2015: 215).

Lêkolînerên edebîyata Kurdî, sedsala 16an ji bo edebîyata Kurdî ya klasîk wekî serdemeke zêrîn dibînin. Lewma di edebîyata Kurdiya kurmancî de cara ewil berhemên birêkûpêk di vê serdemê de hatine dayîn. Melayê Cizîrî jî di vê serdemê de bi rê û rêgezên edebîyata klasîk dîwanek nivîsandîye ku heta wê gavê li ser navê edebîyata Kurdîya kurmancî ya klasîk kesê berhemeke wisa bi rêkûpêk nenivîsandibû. Ji ber vê jî dîwana Melayê Cizîrî ji bo edebîyata Kurdî ya klasîk çavkanîyeke sereke tê hesibandin. Herwiha li gor nêrîna Tek: "Di edebîyata Kurdî ya klasîk de ji alîyê ihtişam û hêza zimanê metnê, dîwana Melayê Cizîrî wek berhemeke bijarte tête qebûlkirin (Tek, 2019: 31)." Melayê Cizîrî di mijarên wekî tasawûf, astronomî, rewanbêjî, ayet û hedîsan de şareza bû. Ev şarezatîye di helbestên wî de dîyar dibe. Edîb û melayên ku piştî wî berhem dananî ji dîwana wî sûd wergirtine yan jî di bin tesîra helbestên Melayê Cizîrî de mane. Wekî ku Tek jî dibêje: "Di encama vê yêkê de jî dîwana wî wekî metneke kanonîk hatîye dîtin (Tek, 2019:24)."

Babê Mela Ebdulmecîdê Gulordî mirovekê xwanda bû û di warê 'ilmê şerî'etî de zêde pêşkeftî bû. Haya wî ji şaîrên edebîyata Kurdî ya klasik jî hebû. Cara ewil Mela Ebdulmecîdê Gulordî diwana Melayê Cizîrî li dev babê xwe dibîne. Babê wî gelek caran diwana Melayê Cizîrî ji bo wî bi deng xwandîye. Wê demê zarok bû û heskirina

wî ya ji bo xwandinê wê demê dest pê kiriye. Ew mereq û hezkirina ku babê wî di wan salan de pê re çêkirî, dîyar e ku li ser hemû jîyana wî tesîr kiriye. Piştî ku fahma dibe ji xwe re diwana Melayê Cizîrî selem diket. Ji gundîyekê xwe, ku navê Ebdulhadî ye, ji pêş hindek dexlî ve dîwana Melayê Cizîrî werdigire. Bi vî awayî êdî bixwe dîwana Melayê Cizîrî dixwîne. Hêj di vî demî de tam û lezzeta helbestên Melayê Cizîrî digire. Ji ber ku helbestên Melayê Cizîrî li xweşîya wî diçûn, di jîyana rojane de wek ceribandin hevokên wisa bi miqam saz dikirin. Ev pêngave ji bo eleqeya wî edebîyatê destpêkeke girîng bû.

Gulordî, di sala 1982an de (wê demê li dev Mela Husênê Doskî bû) dest bi nivîsandina helbestan kiriye. Wê demê babê wî çûbû rehma Xwuda û ji ber ku birayê mezin bû, hemû berpirsyarîya malê li ser milê wî mabû. Ji ber van şert û mercan jî karê nivîsandina helbestan nabete serî. Dema ku melatî jî dikir bi karûbarê mizgeftê ve mijûl bû. Ji ber vê jî wan salan tenê 15-16 rûpel helbest nivîsîne. Jixwe wê demê inyeta wî ne ew bû ku pirtûkekê binîvîse. Sedema nivîsandina wî tenê hewes bû û keyfa wî bi helbestan dihat. Helbesta wî ya ewil "Were Dîlber" e. Ev helbesta wî ya ewil wisa dest pê diket:

*Wer dîlber bi bejna şirîn*
*Bibînim ez cemala te*
*Dîwana Xerîb aşiq in*
*Binivîsim bi eşqa te*

*Ji eşqa te ez ê dîn im*
*Hero carek te nabînim*
*Xeman gel te birevînim*
*Şev û roj bi xiyala te*

*Şev û roj tu li min xiyal*
*Were şirîn dosta delal*
*Diyar bikin ew zulf û xal*
*Min daxwaz e dîtina te (Were Dîlber)*

Gulordî, piştî ku demeke dirêj navber daye nivîsîna helbestan, dîsa di sala 2017an de dest bi nivîsîna helbestan diket. Hind helbestên wî yên li ser eşqê helbestên Melayê Cizîrî li bîra me tîne. Lê nayê wê wateyê ku ji wî hilgirtine. Helbestên wî hem ji alîyê

zimanî ve û hem jî ji alîyê şiklî ve ji helbestên Melayê Cizîrî vediqetin. Berevajîyê zimanê Melayê Cizîrî yê giran, wî bi zimanekê sivik û xwerû helbestên xwe verêsane. Di hind helbestên xwe de jî ji alîyê naverokê ve di bin tesîra Melayê Cizîrî de maye. Bo nimûne:

*Melayê Cizîrî*

***Li yetmeînne qelbî, 'eynu'l-yeqîn** dibexşit*

***'Eynul 'iyan** divêtin, kafî nehin riwayet (Doskî, 2018: 200)*

*Gulordî*

*Yêt wesa nin dîn dabûne bi 'emel*

***Ulaîke ke'l-en'am bel hum edall**[8] (Derdê Me/22)*

Wekî ku tê dîtin Gulordî jî mîna Melayê Cizîrî ji hunerên edebî sûd wergirtîye û bi ayeta Qur'anê iqtibas kiriye. Dîsa:

*Melayê Cizîrî*

*Binê nûnên li ser sadan ku katib goşe lê badan*

*Seraser qafî ta qaf e rumûza hikmet'il-'eynê (Tunç, 2021: 452)*

*Gulordî*

*Ji esrara îlahî kes neşêt jê b'ket xeberdan*

*Menbe'a[9] 'ilmê xeybê li nik Xaliq e wê bizan*

*Kes neşêt ji zanîna siran xeber detin çu car*

*Ji 'alim û zana şêx û welî ta Pêxemberan (Esrara Îlahî/1-2)*

Di beytên jorî de jî îşareta sirên Xwuda dikin ku kes nikare van siran beyan biket. Her du şaîr di vê mijarê de xwedîyê heman fikrê ne. Herwiha di helbestên Melayê Cizîrî de wateyên kûr hene ku bi rêya eşqa mecazî xwe dixwaze bigehîne eşqa îlahî. Ayhan Tek di derbarê vê mijarê de nêrînên xwe wisa beyan diket:

[8] Sureya 'Eraf/Ayet 179. Wate: Wekî heywanetî ne û ji heywanan kêmtir in.
[9] Menbe' ('E): Jêder, serekanî.

*Di çarçove û bingeheke wisa estetîk de, Melayê Cizîrî eşqê wek cewherê/kakilê wucûdê (hebûnê) dibînît û vê meseleyê bi argumanên felsefeya tesewwûfê îzah diket. Ew li ser yekbûna hebûnê vî kakilî (eşqê) wek unsûreke bingehîn dibînît û her tiştî di vê yekbûnê de şirove diket. Lewra li gor wî ji mertebeyên eşqê jî (mecaz û heqîqî), tezahûrên van mertebeyan jî (ʻilme'l-yeqîn, ʻeyne'l-yeqîn, heqqe'l-yeqîn) di nava yek daîreyê/dewrê de ne. Lê dîsa jî ji bo tezahûr û fêmkirina eşqê û keşfkirina sirrên wê, pêdivî bi dîtina cemalê heye. Ji bo gehiştina vê dîtinê jî eşqa mecazî rêber e (Tek, 2019: 26).*

Wekî ku me gotî helbestên Melayê Cizîrî û yên wekî wî di alîyê fêmkirinê de dijwar in. Ji bo ku helbestên wî werin fêmkirin, divê haya mirovî ji felsefeya tesewûfê, meseleyên kelaman û çavkanîyên edebîyata klasîk hebe. Nexwe helbestên wan baş nayêne fêmkirin an jî dê xelet werin fêmkirin. Behsê xeberî dema ku Mela Ebdulmecîdê Gulordî cara pêşîyê meseleya Şêxê Sen'anî dixwîne, heyîrî dimîne ku çawa şêxekê wisa xwedî-murîd li pê jineke fele dikeve û xwe jibîr diket. Ev mesele gelek tesîrê li ser wî diket û pê xemgîn dibe. Gulordî piştî hingê rastî helbesta Melayê Cizîrî tê û meselê fêm diket. Beytên Melayê Cizîrî yên jêrî ji bo keyxweşîya Gulordî dibin wesîle:

*Mey nenûşî Şeyxî Seʻanî xelet*
*Ew neçû nîv Ermenistanê xel*
*Mislê Musa wî tecelaya te dî*
*Ê tu dî kanê xeta hanê xelet (Zivingî, 2013: 477-478)*

### 1.2.3.2. Ehmedê Xanî

"Ehmedê Xanî (1651-1707) li gundê Xanê yê bajarê Colemêrgê hatîye dinyayê. Babê wî Şêx Îlyasê Xanî, dayîka wî Gulnîgar Xanim e. Li gor nêrîna Dost, Xanî di temenê pêncî û şeş salîya xwe de li bajarê Bazîdê wefat kiriye (Dost, 2010: 18)."

Ehmedê Xanî, bi navê *"Nûbihara Biçûkan"*, "*Eqîdeya Îmanê*"û "*Mem û Zîn*" sê berhem nivîsîne ku di edebîyata Kurdî ya klasîk de cihekê girîng digire. Ji van her sê berhemên bi qîmet, mesnewîya wî ya bi navê *"Mem û Zîn"* pêhtir tê naskirin. Lewra wekî ku Adak dibêje: "Di tarîxa edebîyata Kurdî de yekem mesnewî ye ku bi awayekê rêkûpêk hatîye nivîsandin (Adak, 2015: 256)."

Ehmedê Xanî, ligel Kurdîyeke rewanbêj, zimanê Erebî, Farisî û Tirkî jî baş dizanî. Lê bi tenê zimanê Kurdî berhemên xwe nivîsîne. Heta ku di mesnewîya xwe de behsê vê çendê jî diket. "Ji bilî zimanê Kurdî, zimanên edebî yên wê serdemê wekî zimanên

serdest dinirxîne û wan zimanên serdest dişibîne şereb û zêrê saf, zimanê Kurdî jî li şûna şerebê dişibîne gerodeyê û li şûna zêr û zîvî jî dişibîne baqirê (Tek, 2018: 17).” Xanî, di van şibandinan de dixwaze bêje ku heta niha zimanê Kurdî zêde nebûye zimanê edebîyatê. Ji ber vê jî zimanê Kurdî wekî dureke xam dinirxîne û mesnewîya xwe bi zimanê Kurdî dinivîse. Pêşîya Ehmedê Xanî bi zimanê Kurdî mesnewî hatibûn nivîsîn lê ji hêla edebî ve wekî metna *“Mem û Zîn”*ê serkeftî nebûn.

Ehmedê Xanî ku xwedîyê şêwazekê estetîk e, li gor Melayê Cizîrî zimanekê sade û xwerû bikar înaye. Rewanbêjîya wî ya di vehûnandina helbestan de gelek tesîr li ser şaîrên piştî xwe kiriye. Gulordî jî ji van şaîran yek e ku di helbestên xwe de zimanekê fesîh bikar înaye. Gulordî, hêj di salên xwe yên ciwanîyê de Ehmedê Xanî nas diket û mesnewîya wî ya bi navê “*Mem û Zîn”*ê ji xwe re selem diket. Wekî ku tê zanîn Ehmedê Xanî hem Xwudê-tirs bû û hem jî xemxwarê ziman, çand û qewmê xwe bû. Ji ber vê jî di gelek beytên xwe de cih daye şîretan, da ku rêya rast û heq bi miletê xwe bidete zanîn. Ev şîretên ku Xanî kirinî, em di helbestên Gulordî de jî dibînin. Lewra Gulordî jî ji bo başî û qencîyê di helbestên xwe de cih daye şîratan. Bo nimûne:

*Ehmedê Xanî*

*Huşyar bî! Ku nekî ‘umrê xwe bêhasil telef*
*Lew ku nakit fayde mal û genc û ewlad û xelef*
*Maceraya Xidir û dîwarê yetîmi bû selef*
*Vî zemanî her kesek mî’marê dîwarê xwe ye (Varlî, 2004: 256)*

*Gulordî*

*Qîmeta wextî bizane*
*Da tu nebî pêşîman e*
*Guh de soz û hedîsan e*
*Hêj zeman nebû êvar e*

*Qîmeta wextî girîng e*
*Min nemane dest û ling e*
*Heft dert hene min gel ceng e*
*Kerb vebûn ji eqlê berê (Rabe di vê demê/34,35)*

*Ehmedê Xanî*

*Safî şemirand vexwarî durdî*
*Manendê durrê lîsanê Kurdî*

*Înaye nîzam û întîzamê*
*Kêşaye cefa ji boyi ‘amê*

*Da xelqi nebêjitin ku Ekrad*
*Bê me'rîfet in, bê esl û binyad* (Bozarslan, 2005: 170)

*Gulordî*

*Hişyar ken hûn evî qewmî*
*Ziman b’ken lîsanê fermî*
*Pêşve biben pêkve hemî*
*Şirîn e zimanê Kurdî*

*Şirîntir e j’qend nebatê*
*Biken rehber bo heyatê*
*Hûn b’ken xizmeta civatê*
*Şirîn e zimanê Kurdî (Zimanê Kurdî/8,9)*

*Ehmedê Xanî*

*Mem ger çi ku zêde* pirrgunah *e*
*Lê ‘aşiq e, ‘işq-i padişah e*

*Hukmê tu meke li padişahan*
*Zulmê tu meke li bêgunahan* (Dost, 2010: 544)

*Gulordî*

*Bi nezera heq çaw lê vebin*
*Qetl û kuştin ser kes nebin*
*Pêkve bijîn dijber nebin*
*Nekujin bi silah û şûr (Qorona Wîrûs/12)*

*Ehmedê Xanî*

*Zînhar! Mebe muhub xiraban*
*Ne dost, ne dujmanê kilaban*

*Ger dost bî dê biken te mirdar*
*Wer dujmin î dê biken birîndar*

*Ev hîmmete xasê 'aşiqan e*
*Ev mertebe rahê sadiqan e (Şemrexî, 2022: 454)*

*Gulordî*

*Bi hizaran sal 'umir bît akubet her mirin e*
*Malê Qaron[10] te di dest bît malbirin her kifin e*

*Teşbihê xewn û xiyalan dê biçît wek yêk dem e*
*Nîn e keyf û lezzeta wê kul û derd û elem e*

*Kewtne hewesa jiyanê me mirin naête bîr*
*Se'y[11] û xîrêt me çu nînin sûc û curm gunhê kebir (Pîş û Kar/2,3,4)*

Wekî ku di helbestên jorî de dîyar dibin, Gulordî jî mîna Ehmedê Xanî di helbestên xwe de cih daye şîretan. Di helbestên her du şaîran de; qîmeta wextî, girîngîya 'ilm û zimanî, zulm û zorî, fanîbûna dinyayê û hwd. bûne mijara şîretên wan.

#### 1.2.3.3. Feqîyê Teyran

Feqîyê Teyran helbestvanekê edebîyata Kurdî ya klasîk e ku di navbera sedsala 16an û 17an de jîyayê. Li ser dîroka ji dayîkbûna wî gelek agahîyên cuda hene. Navê wî yê rastî Mehemed e, lê di nav miletî de bi navê Feqîyê Teyran meşhûr e. Bi eslê xwe xelkê Miksê ye. Feqîyê Teyran di edebîyata Kurdî de xwedîyê cihekê girîng e. Adak dibêje: "Bi qasê ku tê zanîn Feqîyê Teyran, di tarîxa edebîyata kurmancî de yekem helbestvan e ku derheqê hinek çîrok û serpêhatîyên çanda tesewûfî de menzûme nivîsîne. Ji bilî van menzûmeyan gelek helbestên wî yên curbicur jî hene (Adak, 2015:

[10] Eqrebayekê Hz. Musa bû. Gelek dewlemend bû û xwudanê gelek zêr û zînetan bû.
[11] Xebat, kar.

238).” Di helbestên Feqîyê Teyran de evîn û xweza temayên bingehîn in. Herwiha Xalid Sadinî naveroka helbestên Feqîyê Teyran wisa bilêv diket:

*Feqîyê Teyran di gelek babetên jîyana mirovahîyê de helbest vehonandine. Nemaze di babetên dîrokî û jîyana civakî de helbest gotîye. Wî di warê şîretên dînî, pesnê Yezdan û Pêxemberê wî, tesewûf, bawerî, wahdeti'l-wucûd, îbadetkirina ji bo Xwedê, têgehiştina Yezdanî de jî helbest nivîsîne (Sadinî, 2020: 63).*

Wekî ku me di beşa pê de jî behs kirî, Feqîyê Teyran di helbestên xwe de zimanekê sivik û xwerû, anku zimanekê rojane bikar înaye. Perwîz Cîhanî jî di derheqê vê mijarê de wisa dibêje:

*Zimanê Feqî sade û sakar e, ku pir nêzîkî zimanê axiftina rojane ya gelêrî ye. Gava em helbestên Feqî digel helbestên helbestkarên serdema wî didin ber hev, em dibînin ku Feqî berevajîyê wan ne bi zimanê dîwanî yê giran, lê bi zimanê gelêrî yê sade helbestên xwe vehûnandine. (Cîhanî, 2019: 105)*

Helbestên Feqîyê Teyran zêdetir ji çarînan pêk tên. Helbestên xwe bi wezna kîtekêşîyê nivîsîne. Bi gelemperî helbestên wî ji risteyên kurt pêk tên û bi qafîye ne. Ev taybetmendîye jî xwandin yan jî jiberkirina helbestan sanahî diket. Di helbestên Feqîyê Teyran de dîyar dibe ku hêza xwe ya vegotinê ji çanda devkî digire. Gulordî jî di helbestên xwe de xwedîyê heman taybetmendîyan e. Ji alîyê ziman, naverok û şeklî ve helbestên Gulordî dişibin yên Feqîyê Teyran. Di nav şaîrên edebîyata Kurdî de ziman û şêwazê Gulordî herî pêhtir nêzî ziman û şêwazê Feqîyê Teyran e. Lê ji hêla estetîk û edebî ve helbestên Gulordî ji yên Feqîyê Teyran naborît. Gulordî jî mîna Feqîyê Teyran di helbestên xwe de cih daye çend heb çîrokan. Tesîra Feqîyê Teyran ya li ser Gulordî li jêrî bi mînakan dîyar e:

*Feqîyê Teyran*

*Guh bidin vê nuqê aşiqan*
*Da ez bixwînim vê xetê*
*Hemd û senayê Xaliqê*
*Subhan ji şahê qudretê (Sadinî, 2020:239)*

*Gulordî*

*Bikeyn behsekê ji pêşîn e*
*Tu 'ecêbîyan jê bibîne*

*Eqlî bide şolî binêre*
*Insanî ka çi heye pê ra (Mûsa û.. /1)*

*Feqîyê Teyran*

*Guh bid’ne pîrê deftera*
*Da ez bixwînim vê xetê*
*Mazin bibî Baxo me ra*
*Li cindiyê di xizmetê (Sadinî, 2020: 337)*

*Gulordî*

*Were bira tu guh bidê*
*Ji insanêt vî zemanî*
*Yêt keftne xewa xefletê*
*Wan jibîr kir muslimanî (Li ser Kirinên.../1)*

*Feqîyê Teyran*

*Şeva tarî şemal hilkir*
*Dil û mêlak li min kul kir*
*Tijî nar û tijî pel kir*
*Ji eşqa wê delalê da (Sadinî, 2020: 479)*

*Gulordî*

*Cewhera berq û elmesan*
*Dîlbera dildar û xasan*
*Xemilî berg û libasan*
*Cîsm û can li min helandin* (Cewhera Elmasan/1)

*Feqîyê Teyran*

*Dêm şûşe ye nûr qefes e*
*Mecaz ne işq e hewes e*
*Dil ji surrê naket bese*
*Can ji meya meweddetê (Sadinî,2020: 243)*

*Gulordî*

*Eşq miraza dildara ye*
*Qetrek ji huba Xwuda ye*
*Evîn dilê temîz da ye*
*Têt ji rehma Rebbê Barî (Çûna Seyranê/9)*

Di wan her du çarînên jorî de Gulordî jî wekî Feqîyê Teyran pênaseya eşqê kiriye. Dibêje heskirna di dilê temîz de parçeyek ji heskirna Xwuda ye û heskirin ji rehma Xwuda têt. Dîyar e ku her du şaîr jî gehiştina heqîqetê di eşqê de dibînin.

### 1.2.3.4. Melayê Bateyî

Melayê Bateyî nûnerekê girîng yê edebîyata Kurdî ya klasîk e. Derbarê sala hatiye dinyayê de lêkolîner hemfikir nîn in. Zîver, nêrîna hin lêkolîneran wisa rave diket: "Li gorî hin lêkolînerên wekî; Sadiq Behaeddin Amêdî, Qanatê Kurdo, Muhemmed Emîn Zekî, Bazil Nikitin, Minorsky, Elaeddîn Seccadî ew di sala 1414 an di 1417an de hatîye dinyayê û di 1491an an jî di 1495an de wefat kiriye (Zîver, 2013: 5)." Lê hin lêkolînerên wekî Marûf Xeznedar, Abdurahman Adak û Feqî Huseyîn Sağnıç û hwd. ev xeletîye sererast kirine û bi delîlan nîşan dane ku "Melayê Bateyî dawîya sedsala 17an hatîye dinyayê û heta bi nîvê serdema duyem ji sedsala 18an de jîyaye (Adak, 2015: 272)." Bi gotina Hêzil: "Navê wî Huseyn e û ji gundê Bateyê ye. Herwiha qebra wî jî li heman gundî ye. Bate gundekî li gelîyê Tiyarê yê li Culemêrgê ye (Hêzil, 2015: 52)."

"Melayê Bateyî du menzûmeyên dînî (*Mewlûd û Zembîlfiroş*), berhemeke pexşan (*Hemail*) û helbestên curbicur nivîsîne (Adak, 2015: 277)." Wekî ku tê zanîn Melayê Bateyî di nav gelê Kurd de bi mewlûda xwe meşhûr bûye. Mewlûda Melayê Bateyî ku bi zimanê kurmancî nivîsandî, hem di medreseyan de wekî pirtûka dersê dihat dayîn û hem jî heta îro li civatan di rojên pîroz de tê xwandin. "Ev mewlûdnameya Bateyî di tarîxa edebîyata Kurdî de yekem berhem e ku di vî warê xwe de hatîye nivîsandin (Adak, 2015: 278)." Ji ber ku di warê edebîyata Kurdî de cureyekê ewil e û di nav gel de heta roja îro jî rastî eleqeyeke mezin hatîye, mewlûda Melayê Bateyî di edebîyata Kurdî de xwedîyê cihekê girîng e.

Di edebîyata Kurdî de ev kevneşopîya ku ji alîyê Melayê Bateyî ve hatîye destpêkirin tesîr li ser 'alim û şaîrên piştî xwe jî kiriye. Mewlûda Melayê Bateyî ji wan re bûye çavkanîya îlhamê û wan jî mewlûd nivîsîne. Zîver ji van kesan hindek mînakan

didet: "*Mewlidî Nebî* (Şêx Muhemmed Emînê Heyderî), *Mewlûda Şerîf* (M. Zahit Kardeşlik), *Fêkiyê Narencî Mewlûda Kurmancî* (Ehmed Nas) û *Mewlûda Şerîf* (Mela Muhemmed 'Elî Fudeylî) (Zîver, 2013: 3)."

Mela Ebdulmecîdê Gulordî jî ji vê kevneşopîya "*mewlûdname"*yê para xwe girtîye. Hind serpêhatîyên ku berê jidayîkbûna Muhemmed Pêxember û di dema zarokatîya wî de nivîsîne. Ev serpêhatîyene ji heft serenavan pê tê ku ew jî ev in:

1- Qesîda Mewlûdê (1): Di bin vê serenava destpêkê de behsê zewaca 'Ebdullah û Amînê diket ku piştî zewaca wan mizgînîya xwudêdana Muhemmed Pêxember bo tê.

2- Qesîda Mewlûdê (2): Di bin vê serenavê duyan de jî behsê Setîhê kahin ya ji bo zanîna hatina Muhemmed Pêxember tê kirin.

3- Qesîda Mewlûdê (3): Di bin vê serenavê de behsê kahina Zerqayê tê kirin. Zerqa navê jineke sêhrker bû û piştî ku dizane dê Muhemmed Pêxember were dinyayê ji Yemamê[12] tê bo Mekkehê. Di bin vê serenavê de jî behsê vê serpêhatîyê têt kirin.

4- Mûcîzata Nebîyê Axir: Di bin vê serenavê de li ser serpêhatîya di navbera mêrekê bi navê Xelîfe û jineke bi navê Xwudaneyê disekine.

5- Babê Reş Kurê Spî: Piştî ku Xelîfe û Xwudane bi hev re dizewicin, Xwudane du sê zarokan tîne dinyayê. Zarokê ku dawîyê anîye dinyayê rengê babê xwe û her du zarokên din nedida. Xelîfe ji Xwudaneyê gumanan dibe ku ew zarok ne yê wî ye. Serpêhatî li ser vê mijarê kemilîye.

6- Hukmê Ebdulmutalib: Di bin vê serenavê de pirsgirêka xwe dibene dev Ebdulmutalib ku çareser bike. Ebdulmutalib bapîrê Muhemmed Pêxember e.

7- Hukmê Muhemmed: Di vê serenavê dawîyê de Muhemmed Pêxember pirsgirêkê çareser dike û Xwudaneyê ji bêbextîyê xilas dike. Muhemmed Pêxember wê çaxê heft salî bûye ku her di wî temenê xwe de sifatên pêxemberîyê tê de dîyar kirine. Ev serenave jî li ser vê mûcîzatê ye.

[12] Navê herêmeke welatê 'Erebîstanê ye.

*Mewlûda Melayê Bateyî* li ser kêşa arûzê hatîye nivîsandin. "Ji alîyê terkîban ve di bin bandora Erebî, ji alîyê sernivîsan di bin bandora Farisî de ye. Manzûm e û di şiklê mesnewîyê de hatîye nivîsandin (Zîver, 2013: 10)." Gulordî jî ev serpêhatîyene li ser wezna kîtekêşîyê nivîsîne û derveyî beşekê, şeş beş bi yazde kîteyan hatîye nivîsandin. Beşa bi navê *"Qesîda Mewlûdê (2)"* li ser danzde kîteyan hatîye nivîsîn. Gulordî zimanekê fesîh bikar înaye û bi zimanê xeberdanê nivîsîn. Hêmanên Erebî tê da hene, lê ne bi qasê ku metnê dijwar bike. Ev serpêhatîyene menzûm in û di şiklê mesnewîyê de hatîne nivîsîn. Bi qalibê arûzê nehatîne nivîsîn, lê her beyteke wê di nav xwe de hemserwa ye. Wekî Adak dibêje: "Ji ber ku di mesnewîyan de du misrayên her beytekê di nav xwe de hemserwa ne, ji vê cureyê re *mesnewî* hatîye gotin. Lewra peyva mesnewîyê di zimanê Erebî de tê wateya dido dido (Adak, 2015: 417)."

Her sê beşên pêşîyê *(Qesîda Mewlûdê - 1,2,3)* li ser serpêhatîyên berîya ku Muhemmed Pêxember were dinyayê hatine nîvîsandin. Her çar beşên dawîyê jî li ser serpêhatîyên dema zarokatîya Muhemmed Pêxember hatîne nivîsîn. Serpêhatîyên ku Gulordî nivîsînî em nikarin wekî mewlûdeke serbixwe binirxînin. Lewra cureyê mewlûdê bi dorê, ji hind beşan pêk tê. Ev beş (pesnê Xwudê û Pêxember, armanca xuliqandina 'alemê, mîrac, wefata Pêxember û du'a) tê da nînin. Tenê li ser çend serpêhatîyên dîrokî nivîsîye û ev serpêhatîyene jî bi awayekê kronolojîk dane. Bo nimûne:

*Melayê Bateyî*

*Ḥemdê bêḥed bo Xudayê 'alemîn*
*Ew Xudayê daye me dînê mubîn*

*Em kirine ummeta Xeyru'l-Beşer*
*Tabi'ê wî muqtedayê nam(i)wer*

*Ew Xudayê Malîku'l-Mulkê 'eẓîm*
*Daye me mîrasa Qur'ana Kerîm (Zîver, 2013: 59)*

*Gulordî*

*Hatî wextê nûra mubîn bo dinê*
*Ev nûre dê biçît bo nik Amînê*

*Paş daweta ʻEbdullah û Amînê*
*Rehmetek nazil bû ser ehlê dinê*

*Zor ecaîb çêbûne hem harîqe*
*Ji fedl û hikmeta Rebbê Xaliq e (Qesîda Mewlûdê, 1)*

*Melayê Bateyî*

*Hem ji* ***ʻ****Ebdulmuṭṭelib bû ḥamîle*
*Faṭîme hem muddeteş bû kamîle*

*Jê bû ʻEbdullah bi ḥukmê sabîqe*
*Nûra Eḥmed der cebîneş barîqe*

*Meẓherê nûra Muḥemmed hate ew*
*Pak û nûranî muʻeyyed hate ew (Zîver, 2013: 75)*

*Gulordî*

*Piştî Amîne bo Ehmed bû hamîle*
*Eqlîmê ereb ʻelamet bûn kamîl e*

*Kewtine nava goftûgoyan xas û ʻam*
*Ebdulmutalib bo tîcaret çûbû Şam*

*Pirsa hebîbê ekber ji Setîh kirin*
*Ewî sirêt xwe hemî bo ispat kirin (Qesîda Mewlûdê, 2)*

*Melayê Bateyî*

*Eḥmeda! çavê te ma zaġe****ʼ****l-beṣar*
*Yek îşarata te înşeqqe****ʼ****l-qemer*

*Hukmê tu carî ji* ***ʻ****erşî ta bi ferş*
*Ey ji nûra te munewwer ta bi* ***ʻ****erş*

*Ateşê Mûsa çi bû? ruxsarê tu*
*We****ʼ****ḍ-ḍûḥa nûra dilê hişyarê tu (Zîver, 2013: 126)*

*Gulordî*

*Guh bidêrin xwudanêt ehlê mahir*
*Sir û kirametêt nebîyê axir*

*Bi heft salî ew bû xwudan kiramet*
*Bi xulqê mehmûd*[13] *bû laîq nibûwet*

*Hêj sebî*[14] *sir û welayet zahir kir*
*Xwudan-eqlan d'zanî nebîyê axir (Mûcîzata Nebîyê Axir,1,2,3)*

### 1.2.3.5. Mela Husênê Doskî

Wekî ku me di beşa pêş de jî gotî, Mela Ebdulmecîdê Gulordî heta bîst salîya xwe li dev babê xwe xwandina xwe domandîye. Gulordî di sala 1980yan de mala xwe dibete navenda Geverê. Piştî ku li navenda Geverê niştecih dibe, nêzî sê-çar salan jî li ba Mela Husênê Doskî perwerdeyê dibîne. Mela Husênê Doskî gelek eleqê nîşanê Gulordî didet. Li gel dersên dînî, dersên edebîyata Farisî jî dibîne. Cara ewil Mela Ebdulmecîdê Gulordî berhemên Se'dî Şîrazî yên bi navên *Bostan* û *Gulistan*ê li dev Mela Husênê Doskî dixwûne. Di navbera dersan de car caran Mela Husênê Doskî mesnewîya Mewlana Celaleddînê Rumî ji wî re dixwand. Heta ku Mela Husên qaseteke dengê xwe ji Gulordî re dikete dîyarî. Ev qasete ji xwandina mesnewîya Mewlana Celaleddînê Rumî pêk dihat. Lê ji ber tirsên sîyasî û eskerî, Gulordî jî wekî gelek kesan, pirtûkên xwe û vê qasetê diveşêre lê pişt re winda diket.

Mela Ebdulmecîdê Gulordî di sala 1982yan û pê de dest bi nivîsandina helbestan diket. Tişta balkêş ew e ku wê salê li dev Mela Husênê Doskî perwerde didît. Em bêjin ji bo helbestnivîsandinê tesîra Mela Husênê Doskî li ser Mela Ebdulmecîdê Gulordî zêde heye, dê gotina me di cih de be. Gulordî, sê helbest "Serguzeşta Seyda", "Seydayê Min", "Dilbirîn" li ser Mela Husênê Doskî nivîsîne. Her sê helbest jî piştî wefata Mela Husên hatine nivîsandin. Lê helbesta bi navê "Seydayê Min" heyamek piştî wefata Mela Husên (1993) dinivîse. Piştî ku Mela Husên wefat kirî Gulordî wî di xevna xwe de dibîne. Ev xevne jî ji bo nivîsîna vê helbestê "Seydayê Min" dibe wesîle. Her du helbestên din jî di sala 2017an de nivîsîne. Berîya ku em mînakan ji van helbestan bidin, di derheqê Mela Husênê Doskî de çend tiştan bêjin dê baş be.

[13] Mehmûd ('E): Kesê ku xelk jê razî û pesnê wî bi başî û qencî didin.
[14] Sebî ('E): Zarokê nêr, law, gede.

"Mela Husênê Doskî, di sala 1898an de li devera Doskîyan, li gundê Gulordê yê hatîye dinyayê. Navê babê wî Ebdulezîz e. Bapîrê wî Hecî Xelîfeyê Xanemîr e. Navê dayîka wî Terê ye (Engin, 2019: 6)." Mela Husênê Doskî 'alimekê zêde bi navûdeng bû. Lê dîsa jî di derheqê jîyana wî de em rastî çavkanîyên nivîskî nayên. Herî dawî Kerem Engin di xebata xwe ya li ser malbata Gulordîyan de cih daye jîyana Mela Husênê Doskî.[15] Gulordî jî Mela Husên baş nas dikir. Lewra nêzî 3-4 salan li dev wî perwerde dîtîye û ji heman binemalê ne. Gulordî derheqê Mela Husên de wiha dibêje:

> *Seydayê min Mela Husên caran bo me behsê xwe dikir. Birayekê wî yê ji wî biçûktir hebû, navê wî Mela Hesen bû. Min ji seyda gulê nebûye, belê dibêjin xwûşkeke wan jî hebû. Di dema seferberîyê de di bin keprê de dimînît û emrê Xwudê diket. Mela Husênê Doskî, dema ku hêj biçûk, dayîk û babê wî wefat diken. Piştî dayîk û babê wan dimirin, mamê wan Mihyedîn ew hilgirtibûn dev xwe. Mela Husên di zemanê seferberîyê de (dema Şerê Cihanê yê Yekem) derbasî Îraqê bûye. Wî zemanî Mela Husên biçûk bû, temenê wî derdorê dazdeh û sêzdeyan bû. Li Îraqê (Mûsil) mektep xwand. Dema ku ji Îraqê zivirî piştî demekê mamê wan Mihyedîn ew her du ji bo xwandinê birine dev Mela Mecîd. Mela Mecîd nasê Mihyedînê mamê wan bû û li Îranê dirûnişt. Qederekê li dev Mela Mecîd xwandina xwe domand. Keyfa Mela Mecîd bi Mela Husên zor dihat. Jixwe piştî hingê Mela Mecîd keça xwe dayê. Navê keça Mela Mecîd jî Gulşah bû. Mela Husên 'alimekê zor zana û navdar bû. 'Alim û melayên gelek zana jî gava di hindek pirsan de tengav biban, ji Mela Husên re dihinartin. Gelek 'alim û mela di vê çendê de piştpahnên wî bûn. Ji ber ku Mela Husênê Doskî ne ku tenê di qadekê de pispor bû, ji mijarên dînî bigre heta astronomî, matematîk, ziman (Farisî, Erebî), tip, dîrok û hwd. serwext bû. Di Komara Mihabadê de wezîrê dad û 'edaletê bû. Salekê nekêşa Komara Mihabadê xirab bû ew jî hate ve Geverê. Mela Husên çu nenivîstibû, bênivîs çû. Heta ku wefat jî kirî li Geverê ma. Birayê wî Mela Hesen berê Mela Husên ji Îranê hat û çû ser milketa babê xwe ya gundî. Heta dawîya jîyana xwe jî li gundê xwe ma. Di destpêka salên 1980yî de em hindek xwandevan ji bo dersan diçûne Camîya Hecî Îskender. Mela Husên ne melayê mizgeftê yê fermî bû, lê ew jî dihate wêrê, ders dida me. Mela Husên hindî ku mirovekê zana bû, hind jî baş bû. Di roja Newroza sala 1993yan de çû rehma Xwudê (Îliş, 2021: Dîdar).*

[15] Ji bo pêhtir agahîyên derheqê Mela Husênê Doskî de lê binêrin: Kerem Engin, *Li Herêma Doskîyan Çend Deqên Edebîyata Kurdî,* Teza Lisansa Bilind, Wan: 2019, r. 6-9.

Ji van gotinên Gulordî dikarin bêjin ku Mela Husênê Doskî ne tenê mela bû, di alîyê zanînê de xwedîyê kesayetîyeke piralî bûye. Kesayetîyeke wisa ne mumkûn e ku xwandekar û feqe nebin. Mela Husên hem li Îranê û hem jî li Geverê melatî kiriye û ders dane. Li gor gotina Engîn gelek kesan li nik Mela Husên xwandin kiriye û hin ji wan ev in: "Li Îranê Feqî Muhemed, Seyîd Xalit, Seyîd Qesîm; li Geverê jî Mela Mecit Basmacı, Mela Xalid Qewal, Mela Mecit İliş, Mela Birahîmê Zînê, Mela Xalid Yıldız û Mela Şerafedînê Gulordî li ber destê Seyda feqîtî kirine (Engin, 2019: 7)."

Çend heb nimûne ji helbestên Gulordî yên ku li ser Mela Husên nivîsandînî:

*Seydayê min Mela Husên*
*Rehma Reb li canê te bî*
*Beheşt bo te bibe mesken*
*Cennet 'eden cihê te bî*

*Tu seydayê tev 'aliman*
*Qazîyê hemî hakiman*
*Mertalê dijber zaliman*
*Şehadet merteba te bî*

*Wekî roja Kurdistanê*
*Şewqa te dabû cîhanê*
*Heta axirê zemanê*
*Dewama wê dê her hebî (Seydayê Min-1,2,3)*

*Rojek ji rojêt Xwudayî*
*Gundê me yê nav çiyayî*
*Di bera hizar nehsedê*
*Berê xwe b'de vê hikmetê*

*Xwuda çawa biket teqdîr*
*Kes neşêt biketin texyîr*
*Zarek çaw li dinê vekir*
*Ew bi navê Huseyn nav kir*

*Paşê çend salan bi dûra*
*Birayek hatîye jê ra*
*Ew Huseyîn yê dî Hesen*
*Pêk ve jîyan bi keyf û ken (Serguzeşta Seyda-1,2,3)*

*Dilê min ji kûr birîn e*
*Ah û fixan naken karî*
*Dermanê dil min çu nîn e*
*Roja rohn li me bû tarî*

*Roja rohn li me winda bû*
*Xêra 'ilmî nav me rabû*
*Ûstad çû ji me cuda bû*
*Stûxwar mayne ber dîwara*

*Stûxwar mayne em bêxwedî*
*Di 'ilmê fen û şer'etî*
*Mislê ustad me kes nedî*
*Di hukm da bide biryarê (Dilbirîn-1,2,3)*

### 1.2.4. Hin Têbînî li ser Helbestvanîya Mela Mecîdê Gulordî

Derûn û meseleyên derûnî rihên kûr di jîyan û kesayetîya mirovan de hene. Di nava wan rihan de jî tesîra zimanê dayîkê û motîvasyona hilberandina berheman, bi taybet jî berhemên edebî/hunerî, girîng e. Ji ber vê jî têkilîya jîyana hunermendî ya ligel berhema wî bala gelek derûnnasan kêşaye. Di serî de sazkerê psîkanalîzê Sigmund Freud, Jung, Adler, Lacan, Rollo May û hwd. gelek derûnnasan bi nêrînên xwe yên cuda li ser vê mijarê sekinîne. Mesela Freud (1856-1939) ji bo têgehiştina cîhana nivîskarî ya hundirîn, li pey jîyana nivîskarî ketîye. Lê Jung (1875-1961) berevajiyê vê rêbazê ji bo analîzkirina cîhana nivîskarî ya hundirîn, berhema nivîskarî esas girtîye. Adler (1870-1937) jî giringîyê didete metnên edebî û bi rêya van metnan analîzên xwe yên derbarê cîhana nivîskarî ya hundirîn de pêşve dibet. Peywendîya ku Lacan (1901-1981) di navbera zimannasî û psîkanalîzê de didane girîng e. Ji bo destxistina hind argumanan *"ziman"*î çalak dibîne. Rollo May (1909-1994) jî wekî Freud piranî li ser jîyana nivîskarî çûye. Elbet gelek derûnnasên din hene ku behsê vê mijarê kirine.

Derbarê vê mijarê de nêzîkatîya her derûnnasekê cuda jî be, hemû jî ji bo têgehiştina mijarê mişterek in. Em jî dê hewil bidin ku li gor hind teorîyên derûnî helbestvanîya Gulordî îzah bikin. Belku bi vî awayî em ê bikaribin helbestvanîya Gulordî ya "*direngmayî*" baştir fêm bikin. Hêz û qabilîyeta Gulordî ya helbestvanîyê ji ciwanîya wî dest pê diket. Lê heta salên xwe yên pîratîyê ev revanbêjîya xwe ya helbestan nerêtîye ser rûpelan. Tişta balkêş ew e ku di temenê xwe yê pîrîtîyê de, di demekê kurt de, ev hêz û qabilîyeta xwe ya nivîsîna helbestan derxistîye pêş û gelek helbest li pey hev nivîsîne. Pirsên me jî tam li ser vê kompleksê ye. Gelo di temenê wî yê pîrîtîyê de tişta ku ew hewceyî nivîsîna bi zimanê dayîkê kirî çî ye? Dixwazît bi vê lezûbeza xwe ya helbest-nivîsînê xwe bigehînite ku derê?

Têkilîya zarok û dayîkê zarok hêj di rehma dayîkê de dest pê diket. Dîsa -di şertên normal de- her mirovê ku tê ser rûyê dinyayê pêşîyê dayîka xwe dinase. Di serdemên pêşîyê de zarokê sava bi her awayî girêdayê dayîka xwe ye û berpirsyarîya wî hemû li ser dayîkê ye. Ev têkilîya zarok û dayîkê ji halê jîyanê yê rêzê zêdetir, ji bo têgehiştina xwezaya mirovan xwudanê rihên kûr in. Ji ber vê jî "Psîkiyatrê Siwîsrî û sazkerê ekola psîkolojiya analîtîk Carl Gustav Jung di xebata xwe ya bi navê *"Çar Arketîp1"* de ewil li ser *"arketîpa dayîk"*ê radiwestit û ji bo bingeha gelek kompleksan jî her dîsa vê arketîpê nîşan didet (Tek, 2014: 5)." Herwiha Jung peyva "*dayîk*"ê li dor hizreke berfireh pênase dike û aliyên wê yên derûnî li gor hind mekanên fizikî û razber dinirxîne. Ji bo mekanên fizîkî Jung ji van mekanan mînakan dide: "Rehma dayîkê, welat, ax, bajêr, zevî, baxçe, mexber, çal, tabût, şikeft û hwd. (Jung 2015: 22)." Mirov dikare van minakan zêde bike. Lê ya bi mijara me ve eleqedar sembolên razber in ku yek ji van jî zimanê dayîkê ye. Tekilîyeke xurt di navbera zimanê dayîkê û cîhana mirov ya hizrî de heye. Jixwe "tixûbên mekanên zihnî û hissî jî bi rêya zimanê zikmakî dihêne tesbîtkirin (Tek, 2014: 8)." Herwisa Geverî têkiliya arketîpa dayikê û malzarokê bi zimanê zikmakî ve girêdide û wisa dibêje: "Çawa ku rehma dayikê, malzarok û ax û welat û semtê ku mirov lê hatiye dinyayê ji bo mirovî penageh û stargeh bit, zimanê mirov yê dayikê herwisa penageh û cihê emniyet û aramiyê ye (Tek, 2014: 8)."

Li gor van zanînên jorî em dikarin helbest-nivîsîna Gulordî ya bi zimanê zikmakî jî li gor vê "*arketîpa dayîk*"ê binirxînin. Elbet helbest-nivîsîna Gulordî ya bi zimanê zikmakî di şoq û trawmayekê de peyda nebûne û mekan jî ne mekaneke fizîkî ye. Dema ku mirov pîr dibin dixwazin di bîra mirovan de bimînin, yanî bibine "nemir". Huner jî

mirovan nemir diket. Meseleya Seyda jî tam ev e. Gulordî ji tirsa mirineke manewî xwe spartîye zimanê zikmakî. Dixwaze ku li pey xwe tiştekê bihêle da ku piştî mirinê neyê jibîrkirin, navê xwe li ser vê dinyayê bihêle. Ji ber vê zimanê dayîkê ji xwe re kiriye stargeh û xwe bi zimanê zikmakî ewle û aram dibîne. Em vê komplekse tenê di nav şaîr, hunermend û nivîskaran de nabînin, belku hemû mirov xwudanê vê derûnîyê bin. Em dikarin ji bo vê kompleksê mînake biçûk bidin: Mesela berê dema ku cihek bi betonê dihate çekirin em zarok diçûn me li ser betona ter navê xwe û dîroka wê rojê lê dinivîst. Yanî ev derûnîye bi temenî ve eleqedar nîn e, lê dibe ku ber bi pîrîtîyê ve ev komplekse zêdetir be. Ev jî di xwezaya mirovan de helwesteke normal e. Bêguman helbestvanîya Gulordî em tenê nikarin bi vê sedemê ve girêbidin. Ligel vê sedema sereke, hind sedemên xwe yên din jî hene. Ya ku me pê derxistî Gulordî xwudanê hafizayeke xurt e û qabîlîyeta wî ya ji bo vehûnandina helbestan gelek e. Li gor gotina Gulordî, bi saya helbestan vê hafizaya xwe diparêze û ji hêla zihnî ve zînde dimîne. Êş û azarên xwe bi rêya helbestan der dike û ruhê wî sivik dibe. Ev jî derfeteke ji bo tenduristîya wî. Dîsa haya wî ji çand û edebîyata Kurdî heye û qîmeteke mezin didete zimanê Kurdî. Em vê qîmetdayînê jî wekî sedemekê dibînin. Qedirnasîya wî ya ji bo zimanê Kurdî di çend helbestên wî de jî dibînin. Wek nimune:

*Hişyar ken hûn evî qewmî*
*Ziman b'ken lîsanê fermî*
*Pêşve biben pêkve hemî*
*Şirîn e zimanê Kurdî*

*Şirîntir e j'qend nebatê*
*Biken rehber bo heyatê*
*Hûn b'ken xizmeta civatê*
*Şirîn e zimanê Kurdî*

*Lîsan nasnamek olî ye*
*Xizmet wecibek qewmî ye*
*Ferz e li ser her Kurdî ye*
*Şirîn e zimanê Kurdî*

*Min bang zanayêt ciwakê*
*Edîp xwandîyên vê xakê*
*Bilan rabin bi çalakê*
*Şirîn e zimanê Kurdî*

*Minnet ji Xwuda ku Kurd im*
*Ne zulimkar im ne xurt im*
*Min xebatek kir bi ziwt im*
*Şirîn e zimanê Kurdî (Zimanê Kurdî, 8-9-10-11-12)*

Berhema nivîskaran, nasnameya nivîskaran ya derûnî ye. Di berhemên wan de em digehijine cîhana wan ya hundirîn. Bi gotineke din berhem, di navbera xwandevan û cîhana nivîskarî ya hundirîn de materyalek e. Sigmund Freud jî şibandinekê li ser hunermend û zarokan dike û dibêje: "Hunermend jî 'eynî wekî zarokekê ku dileyîze tevdigere. Ew jî ji xwe re cîhaneke xeyalî ava dike jê bawer dike. Anku bi hestên dewlemend dixemilîne û bi sînorên teqez ji realîteyê cuda dike (Freud 2007: 105)." Her nivîskarek an hunermendek, ji xeynî cîhana heyî, wekî zarokên ku dileyizin cîhaneke nû li gor qaydeyên xwe ava dikin. Di vê cîhana nû de hizr û hestên xwe bi awayekê azad bilêv dikin. Freud bi cihana nivîskaran ya hundirîn ve gelek serê xwe êşandîye û têkilîyekê di navbera berhem û jiyana nivîskarî de didane. Nivîskar di jîyana heyî de rasterast hizr û hestên xwe kifşe nakin. Bi rêya hunerê yan jî nivîsê derîyekê ji xwe re vedikin. Bi vî awayî kesayetîya xwe ya nîvcomayî bi berhema xwe temam dikin. Bi kurtasî em bêjin kesayetî/cîhana wan ya hundirîn delîla binhêşê wan e, em ê xelet nebin. Heta "Li gor Freud nivîskar/hunermend ew e ku yê cesaret dike ku destûr bidet binhêşê wî biaxive (Cebeci 2004: 117)."

Gulordî jî bi rêya helbestan cîhaneke xeyalî ji xwe re ava kiriye û xwe spartîye wê cîhanê. Dema ku mirov bi awayekê baldar helbestên Gulordî bixwîne mirov cîhana ku wî ji xwe re ava kirî dê baştir fêm bike. Ji bilî helbestên wî, di pêvajoya tezê de axiftinên ku wî ji me re dikirin jî ev tahlîlên ku li jorî hatine kirin piştrast dikirin. Xwastina wî ya ku "*hêj ez nemirîmî min divêt kitaba xwe bibînim"* ji me re balkêş dihat.

# BEŞA DUYEM

# METN Û LÊKOLÎN

## 2.1. JI ALIYÊ NAVEROKÊ VE TAHLÎLA HELBESTÊN GULORDÎ

Helbestên Gulordî ji alîyê mijaran ve dewlemend in û tê dîtin ku li ser mijarên wekî; dîn, civak, eşq û xwezayê pêhtir helbest nivîsîne. Helbestên Gulordî yên ku ewil nivîsînî piranî li ser eşqê û xwezayê ne, lê piştî demekê giranahîya xwe didete ser mijarên dînî û civakî. Gulordî, ligel van mijarên sereke di helbestên xwe de cih daye hind mijarên rojane û li ser hind şexsîyetan jî helbest nivîsîne. Mexseda me jî ew e ku em di vê beşê de li gor hind mijar û cureyan helbestên wî tesnîf bikin û bi mînakan nîşan bidin.

### 2.1.1. Helbestên Dînî û Çavkaniyên Wan

Edebîyata Kurdî ya Klasîk, edebîyata miletekê Rojhilata-navîn e. Kurdan jî di seyra tarîxê de dînê Islamê qebûl kirine û çanda Islamê li ser hemû jîyana wan tesîr kiriye. Edebîyata Kurdî ya klasîk jî para xwe ji vê tesîrê girtîye û ‘alim û edîbên Kurd di helbestên xwe de cih dane mijarên dînî. Di mijarên dînî/Islamî de Qur‘ana Pîroz û hedîsên Muhemmed Pêxember du çavkanîyên sereke ne. Lê wekî ku Adak jî dibêje: “Ji bilî van, zanistên Eqaîd, Kelam û Fiqhê û kesayetên dînî û tarîxî jî ji bo edebîyata Kurdî ya klasîk çavkanî ne (Adak 2015: 36-37).”

Gulordî jî wekî helbestvanên berê xwe li ser mijarên dînî helbest nivîsîne û ji van çavkanîyan sûd wergirtîye.

#### 2.1.1.1. Xwudê

Di baweriya dînê Islamê de “Xwudê” afirînerê her tiştî tê qebûlkirin. Nehwêt û neh (99) navên Xwudê hene ku her navekî wî taybetmendîyeke wî nîşan didet. Ji ber vê dibe ku di nav sinorên Rojhilata-navîn de berhemeke edebîyata klasîk bê ku nav û sifetên Xwudê hatibe nivîsîn, nebe.

Gulordî bi awayekê rasterast li ser Xwudê û Muhemmed Pêxemberî helbest nivîsîne. Di van helbestan de Gulordî methê Xwudê û Pêxemberî diket. Dîsa di helbestên xwe de cih daye gelek nav û sifetên Xwudê. Gulordî, di helbestên xwe de bi gelemperî bi nav û sifetên Xwudê şefaet, alîkarî û efûyê ji Xwudê daxwaz diket û xwe dispêre meznahî û rehma wî. Hind navên Xwudê yên ku di helbestên Gulordî de derbas

dibin ev in: Barî, Burhan, Cebar, Ellah, ‘Ednan, Mewla, Qahir, Reb, Rebê Cebar, Rehman, Seburî, Semed, Xaliq, Xebîr, Xefar, Xudê, Xufran, Zul-Celal. Bo nimûne:

*Xwuda çawa kirye ferman*
*Bicih bîne ‘emr û nehyan*
*Tu pêk bîne ‘emrê **Barî***
*Hêj tu neçûy cihê tarî (Behsek ji Dinyayê, 5)*

*Dîlberan derdê giran e*
*Kes nakeşît qehra wan e*
*Me îmdad zatî **Burhan** e*
*Ew nebîte seyda kebed*[16] *(Dilê Tejî, 6)*

*Hawar dikeyn navê **Qehar***
*Bînte karî hukmê **Cebar***
*Te'dîd*[17] *biket dujminê har*
*Ewan biket şermûzar e (Ya Reb, 4)*
*Şivanî qesem kir bi navê **Ellah***
*Gotê ez Muhemmed im resûlallah (Hicret, 46)*

*Çu neîna destwala ye*
*Naw hewalan ser çemya ye*
*Yê serxoş e pêş **Mewla** ye*
*Bi ax û of û nalîn e (Were Bira, 13)*

*Tu **Xaliq** î tu **Rehman** î*
*Hemî şolan tu dizanî*
*Agir barît ji esmanî*
*Me neman sebr û qerar e (Ya Reb, 2)*

#### 2.1.1.2. Pêxember

Wekî ku tê zanîn pêxember qasidên Xwudê ne û rêya heq li nav civakê belav dikin. Piştî ku li nav civakê tên qebûlkirin, bi nasnameyên xwe yên dînî derdikevine pêş. Sekn û helwestên wan tesîrê li ser civakê dikin û pêşengîyê ji civakê re dikin. Piştî

---
[16] Cerg.
[17] Te'dîd (‘E): Terbîyekirin.

mirina wan jî ev rastîye zûbizû nayê guhertin. Jîyana pêxemberan bala edebîyatnasan jî kêşaye û ji bo edebîyata klasîk bûne çavkanîyên sereke. Di berhemên edebîyata klasîk de an bi hunera telmîhê têne destnîşankirin an jî rasterast li ser wan helbest hatine nivîsîn. Tê dîtin ku di helbestên Gulordî de navê gelek pêxemberan derbas dibe. Pêxemberên ku navên wan di helbestên Gulordî de derbas dibin ev in: Adem, Dawud, Eyûb, Harûn, Îbrahîm, Îsa, Lût, Muhemmed, Mûsa, Nûh, Suleyman, Yehya, Zekerya.

#### 2.1.1.2.1. Hz. Adem

Hz. Adem, di her çar kitêbên pîroz (Tevrat, Zebur, Incil û Qur‘an) de mirovê ewil e û pêxemberê ewil tê qebûlkirin. Di Qur‘ana Pîroz de gelek ayet derheqê wî de hene û piştî navê Hz. Lût, 25 caran navê wî derbas dibît. “Di gelek hedîsan de jî wekî *‘‘Ebu’l-Beşer’’* derbas dibît, yanî babê mirovahîyê (Pala 2007: 5).”

Ji alîyê Xwudê ve derxistina wî ya ji beheştê, bi rêya hunera telmîhê, ji bo helbestvanên klasîk jî bûye mijar. Di helbestên Gulordî de pênc caran navê Hz. Adem derbas dibît. Gulordî, di du cihan de behsê dema ku Hz. Muhemmed şeva Mîracê diçe erşê esman, rasthatina Muhemmed Pêxemberî ya ligel Hz. Adem diket. Disa Gulordî hind helbestên xwe rasterast li ser Xwudê nivîsîne û di van helbestan de jî navê Hz. Adem bi meznahî û efûyê derbas dibît. Bo nimûne:

*Dergeh ‘esmanan wan vekir*
*Selamek li bab* ***Adem*** *kir*
*Nebî pirsyar ji Cibrîl kir*
*Bo min bêje Qudretullah*

*Xitabet gel bab* ***Adem*** *kir*
*Seyr li ‘esmanê ewil kir*
*Çavdanyek li melekan kir*
*Çi qas zor in ev Cundullah*[18] *(Mîrac, 10-11)*

*Nûra te sebebê hebûna ‘alem*
*Ismê te bû sebebê ‘efya* ***Adem*** *(Rabe Hebîb,9)*

[18] Leşkerên Xwuda.

*Kir xelîfe li rûyê erdê*
*Got melekan pêş herne secdê*
*Melekan pêş **Adem** secde bir*
*Ew bo insanî bûye qedir (Hemda Xwuda, 7)*

*Te çêkirin rewz û cenet*
*Ji **Adem** û hindî hikmet*
*Te înayne karê sin'et*
*Bi qudreta gird û garî (Qudreta Xwuda, 4)*

#### 2.1.1.2.3. Hz. Dawud

Hz. Dawud pêxemberekê Xwudê ye û ji nav çar kitêbên pîroz de, ya bi navê "*Zebûr"* jê re hatîye. Navê Hz. Dawud şanzde caran di Qur'ana Pîroz de derbas dibe û di ayeteke Qur'anê de behsê wî wisa tê kirin: "Bi rastî jî me hind pêxember di ser hinde pêxemberan re girt; ji Dawut re jî me *Zebur* da (Sureya Îsrayê: 17/55)." Di heman demê de Hz. Dawud nêzî çil salan hukumdarî jî kiriye. Hz. Dawud di dema hukumranîya xwe de bi dilnizmî û adîlaneya xwe dihate naskirin. Gulordî di helbesteke xwe de cih daye çîrokeke serdema hukumranîya Hz. Dawud û di vê çîrokê de jî hukmê 'edaleta Hz. Dawud derdikeve pêş. Serê çîrokê wisa dest pê diket:

*Da biçine Quds û Xelîlan*
*Berê xwe bide fêl û hîlan*
*Li zemanê nebî Dawudî*
*Feqîrek hebû yê bêxwedî*

*Rexê şehrî malek xirab e*
*Zarokekê bêday û bab e*
*Bi salan zikra Xwuda dikir*
*Her dem du'a ji Xwuda dikir*

*Ya Rebî feqîrek im bêtab*
*Xwazim rizqê helal bê'ezab*
*Bi salan wehe dewam dikir*
*Xwuda du'a wî bo qebûl kir*

*Bo Xwudayî xalis û muxlîs*
*Feqîrê bêçare û muflîs*
*Rojek rûnişt li derê xanî*
*Fikrî halê xwe û zemanî (Zemanê Dawud Pêxember 1,2,3,4)*

#### 2.1.1.2.4. Hz. Eyûb

Hz. Eyûb pêxemberekê Xwudê ye û navê wî di Qur'ana pîroz de derbas dibît. Di serî de mirovekê dewlemend bûye. Pişt re mal û milkê xwe hemûyê di rêya Xwudê de didet. Li ser vê feqîrîya madî, nexweşîyeke pir giran jî digire. Lê ji ber bawerî û tewekula xwe ya ji bo Xwudê, dîsa digehije siheta xwe ya berê. Ekinci vê rewşê wisa dinirxîne: "Êş û elemên Hz. Eyûb divê wekî peyameke dînî û exlaqî were nirxandin. Lewra di çîroka Hz. Eyûb de êş, hêsta mirinê nîn e. Xwenasîn, Xwuda nasîn û têgehiştina evdbûnê ye (Ekinci 2016: 28)." Ev jî sebr û tewekuleke bêhempa divêt. Ji ber vê çendê çîroka Hz. Eyûb ji her bawermendekê girîng e û sebr û tewekula Hz. Eyûb jî bûye mijara gelek nivîskar û helbestvanan.

Gulordî jî di helbesteke xwe de bi hûnera telmîhê vê çîrokê bibîr tîne û balê dikêşe ser sebra wî. Di helbestên Gulordî de tenê di cihekê de em rastî navê Hz. Eyûb hatin:

*Ji Musa heta Îsa yî*
*Bû cihê wehya Xwuda yî*
*Warê Dawud û Urya yî*
*Memleketê Suleyman î*

*Cihê **Eyûb** û sebra wî*
*Gel Zekerya û zebha[19] wî*
*Hem luqman û hikmeta wî*
*Erdê Tevrat û Levhan î (Îsra, 15)*

#### 2.1.1.2.5. Hz. Harûn

Hz. Harun birayê Hz. Mûsa ye û sê salan jê mezintir e. Hz. Mûsa ji Xwudê daxwaz diket ku birayê Harun jî ji bo alîkarîya wî bikete pêxember. Bi vî awayî daxwaza Hz. Mûsa li nik Xwudê qebûl dibît û her du bira di heman serdemê de pêxemberên cihûyan. Di Qur'ana Pîroz de gelek caran navê wî derbas dibît.

[19] Zebh ('E): Serjêkirin.

Gulordî di helbesta xwe ya bi navê *"Mîrac"*ê de navê gelek pêxemberan zikir kiriye û yek ji van jî navê Hz. Harûn e. Di helbestên Gulordî de carekê tenê navê wî derbas dibît. Ew ev çarîna jêrî ye:

*Di çaran da Idrîs nebî*
*Di pêncan da* ***Harûn*** *nebî*
*Ser û rihên hemî sipî*
*Şeş da Mûsa Kelîmullah (Mîrac, 16)*

#### 2.1.1.2.6. Hz. Îbrahîm

Hz. Îbrahîm di bawerîya her sê dînên mezin (Mûsewî, Xirîstîyanî û Islam) de xwudanê cihekê girîng e. Lewra di serjêkirina qurbanê de, avakirina Kabeyê û berxwedana wî ya li hemberê Nemrud xwudanê kesayetîyeke sembolîk e.

Di Qur'ana Pîroz de *"Sûreya Îbrahîm"* heye. Di vê sureyê de ji bo rêya heq gelek hişyarî li mirovan têne kirin. Gulordî ji ayeta "Me her pêxemberek bi zimanê qewmê wî hinart, da ku emrên Xwudê bi wan baş bidin zanîn. Xwudê, yê bixwaze ji rê derdêxe û yê bixwaze jî tîne ser rêya heq. Ew, xwudanhêzekê teqez e. Xwudanê hukm û hikmetê ye (Sûreya Îbrahîm, ayet: 4)." îstifade kiriye û balê dikêşîne ser zimanê dayîkê. Gulordî bi vê ayetê gotinên xwe yên li ser zimanê dayîkê tesdîq biket. Bo nimûne:

***Sûra Îbrahîm*** *ayet çar*
*Pexember hatne hemî car*
*Bi lîsanê qewm berpisyar*
*Da bo bêjît her tiştekê*

*Bi zimanê wan beyan ket*
*Emr û nehyêt Xwuda b'cih ket*
*Ferz û sunetan zikir ket*
*Da nebît mesûl carekê (Zimanê Dayîkê, 12-13)*

Herwiha di vê çarîna jêrî de jî navê Hz. Îbrahîm derbas dibît.

Me dewam kir li ser wê rê
Heftan da **Îbrahîm** wêrê
Ber derê Beyt'ul-Me'mûrê
Şiklê 'Ehmed Resûlullah (Mîrac, 17)

#### 2.1.1.2.7. Hz. Îsa

Li gor riwayetên dînî Îsa pêxember bi qudreta Xwudê, bê bab hatîye dinyayê. Ji ber vê jî di nav Xirîstîyan de bi navê "Ruhê Pîroz" tê qebûlkirin. Ji alîyê Xwudê ve kitêba bi navê *"Încil"* ji bo wî nazil bûye. Ne tenê di nav Xirîstîyanan de, ji bo hemû bawermendan bi mucîzeyên xwe meşhur e. Saxkirina mirîyan, saxkirina kor û nexweşan hind ji mucîzeyên wî ne. Riwayetên ku li ser hêla wî ya mucîzeyê hatine gotin, tesîra xwe li ser metnên klasîk jî kiriye. Mucîzeyên Îsa pêxember ji helbestvan/nivîskaran re bûye çavkanîya îlhamê û di metnên edebî de wek motîf hatine bikaranîn. Mucîzeyên wî di helbestan de sembola "başkirin û vejînê" ye. Yanî "di helbestên klasîk de nefesa meşûqê wekî nefesa Îsa pêxember e. Ew çawa mirîyan sax diket, yar jî evîndarê xwe wisa sax diket (Onay 1996: 283)."

Gulordî jî di helbestên xwe de du caran ji vê motîfê sûd wergirtîye. Heskirina yarê ji xwe re wek hêvîyeke vejînê dibîne û hatina yarê jî wek dermanê êş û azarên xwe nîşan didet.

*Eger bêjim bi 'umrê sed salan nakem terka yarê*
*Belku bît Îsayek bînte jînê wî laşê mirde ye (Sosin û Nergiza Ez... 7)*

*Hatna te li min dewa ye*
*Dîtna te li min şefa ye*
*Luqman hekîm kî ve maye*
*Wek Îsa min divejînî (Were bi Qameta Şeng, 5)*

#### 2.1.1.2.8. Hz. Lût

Lût pêxember, birayê Îbrahîm pêxember e û ji alîyê Xwudê ve bo qewmê Sodomê hatîye hinartin. Qewmê Sodomê qewmeke jirêderkeftî bû û hemû xirabî di nav wan de hebûn. Ji bo rêya heq Lût pêxemberî gelek tekoşîn kir lê pir kêm mirovan bawerîya xwe bi wî înan. Dawîyê ew û du keçên xwe û çend kesên din ji nav qewmê Sodomê hicret kirin bo cihekê din. Pişt re Xwudê xezeba xwe li ser vî qewmî barand û hemû helaq bûn. Jina Lût pêxemberî jî bawerîya xwe bi rêya heq neîna û di nav vî qewmî de ew jî helaq bû. Di Qur'ana Pîroz de li çend cihan li ser vê mijarê behs tê kirin. Di Sûreya Hudê de wisa tê gotin: "Me jî ew, ji bilî jina wî, hemû ferdên malbata wî rizgar kirin.

Jina wî ji yên mayîn (kafir) bû. Û me li ser wan baraneke ji beran xezebek barand. Vêca bibîne dawîya gunehkaran çawa dibît! (Hud 82-83).”

Gulordî di helbesteke xwe de ji bo rêya heq cih daye şîretan û vê çîrokê bi bîr tîne:

*Hevsera Lût pêxemberî*
*Gel xiraban kir hevkarî*
*Bi xirabyê neçû serî*
*Wêran kir mala nubwetê (Were Gelo, 11)*

### 2.1.1.2.9. Hz. Muhemmed

Muhemmed pêxember, pêxemberê dawî yê dînê Islamê ye. Di nav miletê Musulman de wekî mirovekê gelek maqûl tê dîtin. Jîyana wî bûye mijara berhemên helbestvanan û wekî çavkanî jê sûd tê wergirtin. Mesela derheqê jîyana wî de “Mewlûdname” wekî cureyekê serbixwe hatîye nivîsîn. Ji bo mehtkirina wî gelek “medhîye” û “ne’t” hatine nivîsîn. Adak jî wisa dibêje: “Derheqê tevî jîyana wî de “sîyerên menzûm”, derheqê taybetmendîyên wî yên bedenî û ruhî de “şemaîl” û derheqê mî’raca wî de “mî’racîyye” hatine nivîsîn (Adak 2015: 38).”

Di helbestan de Muhemmed pêxember bi gelek nav û sifetan tê zikirkirin. Ev nav û sifatên ku ji bo wî tên bikaranîn bi taybetmendîyên wî ve eleqedar in. Gulordî di helbestên xwe yên dînî de nav û sifatên wî gelek bikarînane. Wekî nimûne; Ehmed, Hebîb, Hebîbullah, Mehemmed Mustefa, Mehmûd, Mustefa, Nebî, Resûlullah, Resûlê Ekrem û hwd. Herwiha Gulordî li ser cenabê Muhemmed pêxember çar helbest nivîsîne. Di van helbestan de methê wî diket û heskirina wî ya ji bo şexsê wî tîne ziman. An jî em dikarin bêjin helbest-nivîsîna wî ya li ser cenabê pêxemberî jî girêdan û heskirina wî ya ji bo cenabê pêxemberî nîşan didet. Çend mînakên jêgirtî:

*Tu hebîbê hey suphan î*
*Resûlê şahê xufran î*
*Dermanê ruh û qelban î*
*Meded ya şahê ‘Ednan î*

*Mucesem*[20] *enwer û nur î*
*Hebîbê heyyê Sebbur î*
*Bi taç û textî meşhur î*
*Nebîyê zatê Burhan î (Tu Hebîb î, 1-2)*

*Emir kiriye ew Xwudayê mezin*
*Selatan bidene ser Hebîbê min*
*Her ew e hebîbê ewel û axir*
*Li ba min kes nîn e wek wî bi qedir*

*Her ew e bûy xatemê pêxemberan*
*Selam li ser wî û al û eshaban*
*Ji ber wî min çêkirin kewn û mekan*
*Selam li ser wî û al û eshaban (Selat li ser Wî bin, 1-2)*

*Ey nebîyê cumle 'alem*
*Resûlê şah û subhan î*
*Divê sala ku tu matem*
*Bo te hat lûtfa rehman î*

*Xwuda lutf li te zêde kir*
*Dergê rehmê ser te vekir*
*Xema giran li te kêm kir*
*Tu bûy mêvanê sultanî (Îsra, 1-2)*
*Nûra Muhemmed xuluqand kulî-şey*
*Bîl-cumle hazir kirin emwat*[21] *û hey*

*Ew ruh û beden û şeklê di kamil*
*Ji ew qalib û sifat û hem aqil*

*Hatne ew ji sin'etê me'bûdê heq*
*Ji nûra Muhemmed xuluqand mutleq (Rabe Hebîb, 5-6-7)*

---
[20] Mucesem ('E): Cism an jî yê di rewşa cism de.
[21] Emwat ('E): Mirin.

### 2.1.1.2.10. Hz. Mûsa

Mûsa pêxember ji qewmê Yakûb pêxember e û ji nav çar kitêbên pîroz Tewrat ji bo wî hatîye hinartin. Xwudanê xwe gelek mucîzeyan e. “Li çîyayê Tûrê axiftina wî ya ligel Xwudê, têkoşîna wî ya li hemberê Fîrawûn, bi gopalê xwe kerkirina Kızıldenizê, spîbûna destê wî û rêhevaltîya wî ya ligel Xizir tê yadkirin (Gider 2017: 36).” Ji ber van serpêhatîyên wî di Qur‘anê de navê Mûsa pêxember gelek derbas dibît.

Gulordî îlhama xwe ji çavkanîya Mewlana Celaleddînê Rumî (1207-1273) girtîye û çîrokeke li ser zemanê Mûsa pêxember bi cureyê helbestê nivîsîye. Mijara çîrokê bi kurtasî wisa ye: Zelamekê dewlemend diçe dev Mûsa pêxember, da ku zimanê heywanetan bizane, ji Mûsa pêxember du’a dixwaze. Piştî gelek daxwazkirinê Mûsa pêxember du’ayekê jê re diket û du’aya wî qebûl dibît. Lê şahîdîya axiftinên heywanan dawîya dewlemendîya wî tîne û roja mirna xwe dizane. Dîsa bi tirs diçe dev Mûsa pêxember û derdê xwe jê re dibêje. Mûsa pêxember dibêje min ji te re gotibû, lê te ez guhdar nekirim û bawerîya xwe bi min neîna. Ev du’aya te ji min xwastî ne tiştekê biçûk bû. Dibêje kesê li pey siran dikevin xema canê xwe nînin!

Ji helbestê:

*Du‘ayek ji Xwudayê mezin*
*Ew hikmetekê bidete min*
*Bizanim gotna heywanatî*
*Ji teyran heta wehşiyatî*

*Bi sirêt wan bibim xeberdar*
*Bizanim çi dibêjin her car*
*Bi ezmanê wan xeberdar bim*
*Gel wan bi ‘ilm û behredar bim (Mûsa û Xwudanê... 6-7)*

*Mûsayî gotê vê nexwaze*
*Eve şolekê bêmiraz e*
*Evê bo te çu kar tê nîn e*
*Wê xwestekê tu bibirîne*
*(Mûsa û Xwudanê Heywanan, 10)*

Ji bilî vê çîrokê, careke din tenê navê Mûsa pêxember di nav helbestên Gulordî de derbaz dibe ku ew jî bi rêya hunera telmîhê bikar înaye. Ji ber ku Mûsa pêxember ligel Xwudê axiftîye, hêjayê sifata *"Kelîmullah"*ê hatîye dîtin. Ev sifata Mûsa pêxember di çarîneke Gulordî de wisa derbas dibît:

*Yûsif 'esmanê sêyan da*
*Ser û rûyan rewnaq veda*
*Selamek li zatî wî da*
*Ji wê fedla Subhanellah*

*Di çaran da Idrîs nebî*
*Di pêncan da Harûn nebî*
*Ser û rihên hemî sipî*
*Şeş da **Mûsa Kelîmullah** (Mîrac, 15-16)*

### 2.1.1.2.11. Hz. Nûh

Tofana Nûh pêxemberî ji bo gelek berhemên edebî bûye çavkanî. Golurdî jî bi navê *"Keştîya Nûh"* helbestek li ser vê meselê nivîsîye. Helbest wisa dest pê diket:

*Eger em bikeyn behsek ji keştîyê*
*Pêwîst e biçin zemanê pêşîyê*

*Gelek baş li mêjûyê em binêrin*
*Em çawêt xwe li heqîyê bigêrin*

***Nûh** ji bo qewmê xwe bûye pexember*
*Bi sêsed salan ew bûye newheger[22] (Keştîya Nuhî, 1-2-3)*

### 2.1.1.2.12. Hz. Suleyman

Suleyman pêxember kurê Dawud pêxember e û nêzî çil salan di nav qewmê Benî-îsraîlan de hukumdarî kiriye. Li gor hind riwayetan Suleyman pêxemberî ji zimanê çûkan dizanî, hukmê xwe li ser bager, heywan û cinan dikir. Li ser serdema hukumdarîya wî gelek çîrok hatine vegotin. Golurdî jî di nav helbestên xwe de ciha daye van çîrokan û penc helbest li ser zemanê Suleyman pêxember nivîsîne. Li gor gotina Gulordî (İliş, dîdar: 2021) wî ev çîroke di pirtûka Muhemmed Cerîrê Taberî (P.z.

[22] Newheger ('E): Hewarker.

839-923) ya bi navê *"Tarîxa Taberî"*yê xwandine û paşê van çîrokan bi tarzê xwe, bi cureyê helbestê dinivîse. Çirok bi beytan hatine nivîsîn û di çîrokan de nesîhet û peyamên dînî hene. Bo nimûne:

*Bikeyn behsek bi insaf û 'edalet*
*Tê da hene 'ecêb û hem îbaret*

*Hûn bi zêhn û zekawet lê binêrin*
*Gelek sir tê da hene gel bişevrin*

*Kurê padşahek hebû li meşrîqê*
*Mezin bû û kurik bûye murahiq (Şehzade, 1-2-3)*
*Bikeyn behsekê ji wan her sê birayan*
*Mîna şeva tarî em rohn ken çirayan*

*Me ji 'umirdirêjî girt bersivêt xwe*
*Vê carê dê biket behsê birayêt xwe*

*Sebebê pîrî cahêlî hem yê kone*
*Kanên ev sebebe hemî çî û çine (Behsa Sê Birayan, 1-2-3)*

*Da bo hewe bikem behsekî berê*
*Ji mebhesê sîmirxê û qederê*

*Nebî Suleyman xwedî seltenetê*
*Rojekî rûniştibû li ser textê*

*Ji insan û cin û hemû wehşîyan*
*Dora textê wî cema bûn ser pîyan (Sîmirx û Qeder, 1-2-3)*

#### 2.1.1.2.13. Hz.Yehya

Yehya pêxember kurê Zekerya pêxember e û di serdema Îsa pêxember de jîyaye. Di temenê xwe yê 34 salîyê de ji alîyê qewmê wî ve tê şehîtkirin. Gulordî di helbesta xwe ya bi navê *"Îsra"*yê de tenê carekê navê wî zikir diket:

*Cihê landka pêxemberan*
*Erdê nebî û serweran*
*Warê* ***Yehya*** *û dijberan*
*Cihê Zebûr û xwendinê (Îsra, 17)*

### 2.1.1.2.14. Hz. Zekerya

Zekerya pêxember ji qewmê Benî-îsraîlan e. Bê zarûret bû, ji ber vê çendê ji Xwudê du'a kir û Xwudê du'aya wî qebûl kir. Babê Yehya pêxember e. Lê li gor hind riwayetan her du jî ji alîye qewmê xwe ve hatin şehîtkirin. Gulordî di heman helbesta bi navê *"Îsra"*yê de navê Zekerya pêxemberî jî zikir diket:

*Cihê Eyûb û sebra wî*
*Gel* ***Zekerya*** *û zebha*[23] *wî*
*Hem luqman û hikmeta wî*
*Erdê Tevrat û Levhan î (Îsra, 15)*

### 2.1.1.3. Kesayetên Dînî

### 2.1.1.3.1. Çar Xelîfe

Piştî wefata Muhemmed pêxember, Serdema Xelîfeyan dest pê diket û ev serdeme nêzî sih salan berdewam diket. Di vê serdemê de çar kesan rêveberîya dînê Islamê kirine. Ev çar xelîfe (Ebûbekir, Umer, Usman û Elî) ji bo pêşketin û serfirazîya dînê Islamê gelek kar kirine. ji ber vê çendê jî li dev bawermendên dînê Islamê qedrê wan gelek e. Bi nasnameyên xwe yên dînî ji bo gelek metnên edebî, dîrokî û zanyarî bûne çavkanî.

Di helbestên Gulordî de navê van her çar xelîfeyan derbas dibin. Ev jî bi hunera tenasûbê yan jî bi hunera telmîhê hatine bikarînan. Bo nimûne:

*Kesera dil cennet bîtin*
*Mekan bo te 'eden*[24] *bîtin*
*Cînar bo te Hebîb bîtin*
*Heval* ***'Ebubekr*** *û* ***'Umer*** *(Mela Temer, 5)*

*Kan* ***Ebûbekir*** *kan* ***'Umer***
*Kan* ***'Usman 'Elî Heyder***

---
[23] Zebh ('E): Serjêkirin.
[24] Navê beheşta herî jorî ye.

*Kanê Telhe kanê Zubeyr*
*Kanê emînê ummetê (Were Gelo, 7)*

*Ji bo koçberîyê tu bike tedbîr*
*Xwuda refîq kiriye **'Ebûbekir***

*Resûlullah ji **'Elî** kir daxwazî*
*Ka tu were di cihê min da razî (Hazirî, 24-25)*

### 2.1.1.3.2. Bîlalê Hebeş

Wekî ku tê zanîn cara ewil Bîlalê Hebeşî bang daye. Di serdema Muhemmed pêxember de jîyaye. Gulordî navê ligel xelîfe û kesayetên dînî navê wî jî bibîr tîne:

*Kanê Hemze kanê 'Ebas*
*Kanê **Bîlal** Selman Faris*
*Kanê Zeydê îbnî Haris*
*Kan mustecabê de'wetê (Were Gelo, 8)*

### 2.1.1.3.3. Cu'eyl Kurê Dumeyr

Sahabekê pêxemberî bû. Li Uhudê cara ewil ew tête şehîdkirin. Berîya ku şehîd be ji pêxemberî re parve kiribû. Di helbesta Gulordî de navê wî derbas dibît:

*Kanê Se'îd kanê Cehfer*
*Kanê Mus'eb îbnî 'Umeyr*
*Kanê **Cu'eyl Îbnî Dumeyr***
*Kan îbnî 'Ewfê biheştî (Were Gelo, 9)*

### 2.1.1.3.4. Ebdurehmanê Kurê Ewfî

Sahabekê pêxemberî ye. Hêj di saxîya xwe de mizgînîya biheştê jê re hatîye. Di helbestê de navê wî derbas dibît:

*Kanê Se'îd kanê Cehfer*
*Kanê Mus'eb îbnî 'Umeyr*
*Kanê Cu'eyl Îbnî Dumeyr*
*Kan **îbnî 'Ewfê** biheştî (Were Gelo, 9)*

#### 2.1.1.3.5. Hemze û ‘Ebas

Her du sahabe mamên Muhemmed pêxember in. Gulordî di helbestê de navê her du mamên pêxemberî li gelêk zikir diket:

*Kanê* ***Hemze*** *kanê* ***‘Ebas***
*Kanê Bîlal, Selman Faris*
*Kanê Zeydê îbnî Haris*
*Kan mustecabê de’wetê (Were Gelo, 8)*

#### 2.1.1.3.6. Luqman Hekîm

Luqman Hekîm bi eqil, zanîn û fikrên xwe derkeftîye pêş. Şexsekê welî ye. Heta li gor hind riwayetan wekî pêxember jî tête hesibandin. Di Qur‘anê de sûreyek bi navê Luqman heye. Di edebîyatê de qînayet e bo dermanê derdan. Di helbestên Gulordî de jî em rastê vê kînayetê tên:

*Hatna te li min dewa ye*
*Dîtna te li min şefa ye*
***Luqman hekîm*** *kî ve maye*
*Wek Îsa min divejînî (Were bi Qameta Şeng, 5)*

#### 2.1.1.3.7. Mus‘eb Kurê ‘Umeyr

Sahabekê pêxemberî bû ku gelek rengê Muhemmed pêxemberî dida. Pehlewanekê gelek zîrek bûye. Di şerê Uhudê de bayreqdarê pêxember bû. Golurdî navê wî jî bi bîr înaye:

*Kanê Se‘îd kanê Cehfer*
*Kanê* ***Mus‘eb îbnî ‘Umeyr***
*Kanê Cu‘eyl Îbnî Dumeyr*
*Kan îbnî ‘Ewfê biheştî (Were Gelo, 9)*

#### 2.1.1.3.8. Se’dê Kurê Ebûweqas

Sahabekê pêxemberî bû. Di şerê Uhudê de bi tîr-avêtina xwe meşhûr bû. Di serdema îmam Umer de fermandarîya leşkeran kiriye. Gulordî di helbeta xwe de bi hunera mecazê navê wî bikar înaye:

*Kanê Hemze kanê ‘Ebas*
*Kanê Bîlal Selman Faris*

*Kanê Zeydê îbnî Haris*

*Kan **mustecabê de'wetê**[25] (Were Gelo, 8)*

### 2.1.1.3.9. Se'îdê Kurê Zeyd û Ce'fer

Se'îd kurê Zeyd, kurmamê îmam Umer e. Hêj di saxîya xwe de mizgînîya biheştê jê re hatiye. Cehfer kurê Ebûtalib, kurmamê Muhemmed pêxemberî ye. Gulordî di helbesteke xwe de her duyan gelêk bi bîr tîne:

*Kanê **Se'îd** kanê **Cehfer***

*Kanê Mus'eb îbnî 'Umeyr*

*Kanê Cu'eyl Îbnî Dumeyr*

*Kan îbnî 'Ewfê biheştî (Were Gelo, 9)*

### 2.1.1.3.10. Selman Faris

Selman Faris, bi eslê Îranî ye. Sahabekê Muhemmed pêxemberî ye. Berê şerê Hendekê fikra xwe ligel Muhemmed pêxemberî parve kiriye. Ew fikra kolandina xendekan ya wî bû.

*Kanê Hemze kanê 'Ebas*

*Kanê Bîlal **Selman Faris***

*Kanê Zeydê îbnî Haris*

*Kan mustecabê de'wetê (Were Gelo, 8)*

### 2.1.1.3.11. Telheyê Kurê Ubeydullah

Sahabekê Muhemmed pêxember yê qedirbilind e. Hêj di saxîya xwe de mizgînîya biheştê jê re hatîye. Gulordî di helbesteke xwe de bibîr tîne:

*Kan Ebûbekir kan 'Umer*

*Kan 'Usman 'Elî Heyder*

*Kanê **Telhe** kanê Zubeyr*

*Kanê emînê ummetê (Were Gelo, 7)*

### 2.1.1.3.12. Xizir û Ilyas

Di nav civaka Islamê de her du wekî du pêxember nemir tên dîtin û salê carekê, di meha gulanê de têne devêk. Di nav gel de çanda *"xidilyasê"* bi sedan sel e ji vê hevdîtinê têt. Xizir li ser rûyê erdê alîkarîya kesên di tengasîyê de diket û heman demê jî

[25] Mustecabê de'wetê, ji kesê ku du'ayên wan têne qebûlkirin re tê gotin. Li vir qesta helbestvanî Se'dê kurê Ebûweqas e.

sembola bereketê ye. Ji ber vê jî di metnên edebî de bi wesfên bereket û alîkarîyê derdikevine pêş me. Gulordî jî ji vê wesfa wan sûd wergirtîye û di helbesteke xwe de wisa behs diket:

*Êş û xem li min sivik kirin*
*Tu d'bêjî **Ilyas û Xizir** in (Rojek ji Meha Tîrmehê, 32)*

### 2.1.1.3.13. Zeydê Kurê Haris

Hêj Xetîceyê şû bi Muhemmed pêxemberî nekirî Zeyd kolê wê bû. Cara ewil wî bawerî bi pêxemberî înaye. Heman demê dibe kurê Muhemmed pêxember yê manewî. Di helbestê de wisa derbas dibît:

*Kanê Hemze kanê 'Ebas*
*Kanê Bîlal Selman Faris*
*Kanê **Zeydê îbnî Haris***
*Kan mustecabê de'wetê (Were Gelo, 8)*

### 2.1.1.3.14. Zubeyr

Zubeyr sahabekê pêxemberî ye. Di nav deh kesan de yek jî ew e ku hêj di saxîya xwe de mizgînîya biheştê bo hatîye. Gulordî di helbesteke xwe de navê wî û Telhe li gelêk bikartîne:

*Kan Ebûbekir kan 'Umer*
*Kan 'Usman 'Elî Heyder*
*Kanê Telhe kanê **Zubeyr***
*Kanê emînê ummetê (Were Gelo, 7)*

### 2.1.1.4. Milyaket

Hebûna milyaketan manewî ye û ji nûrê hatine afirandin. Ji bo pêkanîna emrên Xwudê hatine peywîrdarkirin. Bi taybetmendîyên xwe ve ji mirovan vediqetin. Hejmara milyaketan nayê zanîn lê di nav milyekatan de Cebraîl, Mikaîl, Îsrafîl, Ezraîl çar milyaketên mezin in.

Di edebîyatê de yarê dişibînine milyaketan. Milyaket kînayete bo delalî, pakî û paqijîyê. Em di helbestên Gulordî de rastê şibandineke wisa nehatin, lê di helbestên Gulordî de navê sê milyaketên mezin (Ezraîl, Cebraîl, Îsrafîl) bi wasfên xwe ve wisa derbas dibin:

*Got yê genim didirû* ***Ezraîl*** *e*
*Nahêlît piçûk û pîr ne cahêl e (Şehzade, 83)*

***Cebraîl*** *hat û wehî ji bo anî*
*Gotê bike karê koça cîhanî (Hazirî, 23)*

*Pêş wîrûsê man pabeste*[26]
*Hero hizaran tên xeste*
*Mirin ser me qet naweste*
*Mesura* ***Îsrafîl*** *tê bîr (Qorona Wîrûs, 4)*

#### 2.1.1.5. Kitêbên Pîroz

Ji berê heta niha gelek pêxember hatin û çûn, lê di nav wan pêxemberan de çar pêxember tenê xwudan-kitêb in. Bi rêzê; "*Tewrat*" ji bo Mûsa pêxember, "*Zebûr*" ji bo Dawud pêxember, "*Încil*" ji bo Îsa pêxember û herî dawîyê jî "*Qur'an*" ji bo Muhemmed pêxember nazil bûye. Kitêbên pîroz ji bo sererastkirina jîyana civakan û rêya heq gotinên Xwudê yên hişyarker in.

Di helbestên Gulordî de ji bilî Încilê, her sê kitêbên pîroz derbas dibin. Du caran navê Tewratê, carekê navê Zebûrê û sih û du caran jî cih daye navê Qur'anê. Gulordî, di navbera kitêbên pîroz de cudahî nekiriye û jixwe ev emrê Qur'anê jî ye. Lê di nav van kitêbên pîroz de tenê ji Qur'anê îqtîbas hatiye kirin.

*Nekeve nav fend û hîlan*
*Dûr be ji pîs û bexîlan*
*Tu muhtac bî bo delîlan*
*Kelamê heq* ***Qur'an*** *heye (Xwuda Heye, 3)*

*Qesem dikem ez bi* ***Tewrat****ê*
*Tişta duhî û pêr min gotî*
*Çu ji wan direw tê da nîn e*
*Hindî min gotî tev rastî ne (Mûsa û Xwudanê Heywanan, 42)*

*Cihê landka pêxemberan*
*Erdê nebî û serweran*

[26] Pabeste (F): Kesê ku dest û pêyên wî hatine girêdan.

*Warê Yehya û dijberan*
*Cihê **Zebûr** û xwendinê (Îsra, 18)*

#### 2.1.1.6. Tesewuf

Tesewuf, hizreke mistîk e ku li ser esasê nasîna Xwudê û girêdana xwe ya ligel Xwudê hatîye avakirin. Ji ehlê tesewufê re *"mutesawif"* an jî *"sofî"* tê gotin ku xwe ji mal û zewqa dinyewî dûr diket û di halê manewî de dikeve rêyeke ruhanî. Di tesewufê de *"wehdet'ul-wucûd", "wucûdê mutleq" û "husnê mutleq"* têgehên sereke ne. Ev ekola felsefîk di nav erdnigarîya Islamê de belav bûye û paşê bi dem re tesîra xwe li ser helbestên klasîk kiriye. Li gor gotina Üstüner: "Zimanê tesewufê yê helbestvanîyê cara ewil di helbestên Ereb û Farisan de, sedsala 11an û şûnda hatîye bikaranîn (Üstüner 2008; 271)." Ji sedsala 16an û şûnda helbestvanên edebîyata Kurdî ya klasîk jî li dor vê ekolê berhemên giranbuha hûnandine yan jî di berhemên xwe de ji têgehên tesewufî sûd wergirtine. Lê divê were zanîn ku her helbestvanê ku îlhama xwe ji têgehên tesewufî digire û di helbestên xwe de bi awayekê serkeftî bikar tîne ehlê tesewufê nîn e. Gulordî jî yek ji wan helbestvana ye ku meyla xwe daye ser têgehên tesewufê û jê gelek sûd wergirtîye. Sedema vê jî mirov dikare wekî ku asta helbesta xwe bilind biket û helbestvanîya xwe bidete ispatkirin, nîşan bidet. Dema ku felsefeya tesewufê ji bo helbestvanî ji armancê zêdetir bîte amûr, wê de demê belku helbestvan bîte helbestvanekê zîrek, lê nabîte mutesawif. Lewra di nav ehlê tesewufê de hal û merhele hene. Kesê ku di wan hal û merheleyan de derbas nebît nabîte ehlê tesewufê. Helbestvanîya Gulordî ya derbarê têgehên tesewufî de jî mirov dikare wisa şirove biket. Gulordî, kesekê emel-mela ye û di mijarên dînî de pir xurt e. Ev zanîna wî jî li ser zimanê helbestê bi awayekî erênî tesîr kiriye. Gulordî di helbestên xwe de têgehên tesewufê gelek bikar înane û hindek ji wan ev in: 'Arif, ava kewserê, bade, bende, beqa, ehda elest, fena, hîlal û qews, 'irfan, maşûq, meyxane, qamet, qedeh, salik, saqî, secde, sir, sofî, zuhre û hwd. Ji helbestên Gulordî çend nimûne:

*Ew kesê ku dibîte **'arif***
*Bi siran dibîtine waqif*
*Ew kesê ji siran bizanî*
*Ew nakevît ber xema canî (Mûsa û Xwudanê Heywanan, 63)*

*Berê xwe b'de rêka xêrê*
*Her dem kar ke tu bo wêrê*
*Te l'bîr bêt* ***hewza kewserê***
*Carek vexwe tehn namîne (Serî Hilîne, 17)*

*Kolehê dergeha yar e xeyrî wî nînin çu xem*
***Badexwer**ê eşqê ji ber wê nînin wî çu elem (Were Carek Kerem Ke, 6)*

*Aşiqan cih û mesken wan her deman* ***meyxane*** *ye*
*Sadiqê wan b'ruh û qelban huzura Rebê xwe ye (Were Carek Tu Kerem Ke, 8)*

*Ji neşa* ***qedeha badê*** *dil pê tarî û tejî*
*Nîn e hacet bi awê* ***qedeh**a min têra heye (Dinya Derdan, 12)*

### 2.1.2. Hîkayetên Menzûm

Hîkayetên menzûm yek ji wan cureyên edebî ye ku helbestvan bûyereke dîrokî, civakî, dînî û hwd. bi awayekê helbestkî dinivîse. Ev formê helbestê wekî pêdivîyekê hatiye dîtin û ji alîyê teknîkî ve ji sînorên helbestê derneketîye. Bi gelemperî çavkanîya xwe jî ji edebîyata devkî digire.

Em di nav helbestên Gulordî de rastê hîkayetên menzûm tên. Gulordî bi tevahî 16 heb mînakên hîkayetên menzûm dane û hindek ji van çîrokan, bi serenavên cuda berdewama hev in. Gulordî ev helbestên xwe gelemperî bi beytan nivîsîne, lê ev helbestên wî yên bi çarîn jî hatine nivîsîn hene. Gulordî wekî helbestên xwe yên din, ev helbestên xwe jî bi kêşeya kîteyan nivîsîye. Zimanê van helbestan sivik û zelal e. Ji alîyê mijarê ve jî dînî-dîrokî ne. Gulordî îlhama xwe ya van helbestên menzûm, kêm jî be ji berhemên Mewlana Celaleddînê Rûmî girtîye û li gor şêwaza xwe ji nû ve ev hîkayetên menzûm vehûnandine. Wekî gelek hîkayetên menzûm, di nav van helbestên Gulordî de jî mijar li ser bûyeran hatiye avakirin. Lê di gelek cihan de şîret jî hatine kirin. Ji van helbestên Gulordî çend heb nimûne:

*Bikeyn behsek bi insaf û 'edalet*
*Tê da hene 'ecêb û hem îbaret*

*Hûn bi zêhn û zekawet lê binêrin*
*Gelek sir tê da hene gel bişevrin*

*Kurê padşahek hebû li meşrîqê*
*Mezin bû û kurik bûye murahiq (Şehzade-1,1-2-3)*

*Eger em bikeyn behsek ji keştîyê*
*Pêwîst e biçin zemanê pêşîyê*

*Gelek baş li mêjûyê em binêrin*
*Em çawêt xwe li heqîyê bigêrin*

*Nûh ji bo qewmê xwe bûye pexember*
*Bi sêsed salan ew bûye newheger*[27] *(Keştîya Nûhî, 1-2-3)*

*Da bo hewe bikem behsekî berê*
*Ji mebhesê sîmirxê û qederê*

*Nebî Suleyman xwedî seltenetê*
*Rojekî rûniştibû li ser textê*

*Ji insan û cin û hemû wehşîyan*
*Dora textê wî cema bûn ser pîyan (Sîmirx û Qeder-5, 1-2-3)*

*Nekeve pê tiştê nizanî*
*Dê bidorînî tu wî canî*
*Te zor li min kiribû israr*
*Bi siran bibime xeberdar*

*Ew kesê ku dibîte 'arif*
*Bi siran dibîtine waqif*
*Ew kesê ji siran bizanî*
*Ew nakevît ber xema canî (Mûsa û Xwudanê Hey. 62-63)*

### 2.1.3. Helbestên Civakî

Gulordî helbestvanekê civakî ye ku gelek helbestên xwe li ser mijarên civakî nivîsîne. Di nav 227 helbestên Gulordî de 86 helbestên wî li ser mijarên civakî ne. Ev jî

[27] Newheger ('E): Hewarker.

nîşanî me didet ku di nav helbestên Gulordî de pişka herî mezin ji helbestên civakî pêk tê. Di helbestên Gulordî yên civakî de piranî temayên li ser neheqî, nesîhet, gazinde, rexne, hişyarî û rastîyê derdikevine pêş. Elbet sedema van temayan jî bi rewşa civakê ve girêdayî ye. Gulordî jî ferdekê ji vê civakê ye ku bûyerên di nav civakê de qewimînî jê tesîr girtîye û bi rêya helbestan hizr û ramanên xwe anîye ziman. Ev helbestên bi vî rengî jî taybetmendîyên civaka ku Gulordî tê de jîyayî radixîne ber çavan. Ji ber vê çendê metnên edebî yên bi vî rengî heman demê ji bo zanista dîrokê jî dibine çavkanî.

Nesîhet, bi gelemperî ji alîyê mirovên kamil û şareza ve tên kirin. Kamilbûn û şarezatî zimanê nesîhetê derdixîne pêş. Kamilbûn û şarezatîya Gulordî rûyê xwe daye helbestên wî jî. Nesîhetên Gulordî piranî li ser zanîn, exlaq, xwendin, pêşkeftin, dîn, îman, axret, heq û nîrxên civakê ne. Di çarçoveya helbestên Gulordî de civakeke xwanda, pêşkeftî, li gor nirx, çand û exlaqê civakê bi awayekê rast jîyîn, heq û huquq zanîn daxwaza Gulordî ye. Ji bo nimûne hindek bendên wî yên derbarê nesîhetê de mirov dikare wisa rêz biket:

*Insan ew e xwe binasî*
*Ne ku ew bibîte asî*
*'Emrê Xwuda ser me ferz e*
*Xwuda 'ewil kirye 'erz e*

*Bibe mûtî' bo Xwudayî*
*Nebe munkîr li dinyayê*
*Ji rastîyê nebe cuda*
*Ta bo xatra navê Xwuda*

*Nebe şirîkê xiraba*
*Bigre xatra day û baba*
*Bibe tu ji ehlê xêra*
*Rehmet li miryên guhdêra (Behsek ji Dinyayê, 7-8-9)*

*Bibe dijberê zaliman*
*Rûne meclisa 'aliman*
*Bi berge neke çaliman*
*Da nebî ehlê fexarê*

*Fexrê neke nebe qude*
*Baş bifikre kêm xeber de*
*Ya guh lê bûy dev neberde*
*Dê bî xwudanê zererê (Rabe di vê Demê, 26-27)*

*Hişyar ken hûn evî qewmî*
*Ziman b'ken lîsanê fermî*
*Pêşve biben pêkve hemî*
*Şirîn e zimanê* Kurdî *(Zimanê Kurdî, 8)*

Gulordî li hemberê hin qewimînên di nav civakê de nerazîbûna xwe tîne ziman û serî li rêbaza rexneyê didet. Paşdamayîn, xwe-nenasîn, xirabî, nîrdayîna malê dinyayê, neheqî, xapandin, cehalet, zulm û zorî û hwd. temayên sereke ne ku ji bo Gulordî bûne mijara rexne û gazindan. Mesela Gulordî, li ser hecîyekê ku jina wî mirî û pişt re bi yeke ji xwe biçûktir re dixwaze bizewice, helbestek nivîsîye û di vê helbesta xwe de vê nakokîyê bi awayekê îronîk rexne diket. Ji bo nimûne çend rêzik ji wê helbestê:

*Bûk li hubbayê rûniştî*
*Hecyê kal li ber teniştê*
*Cihê henkufyê nehiştî*
*Çawa digel hev ken jînê*

*Lê bilind bû dengê sazê*
*Hecî rabû bi tolazî*
*Girte govendê şehnazî*[28]
*Şaşik şor kir ser difînê*

*Şaşka sor li serî xwar kir*
*Desmal hejand û li ba kir*
*Dewrek govendê temam kir*
*Qelbê wî kewte lêdanê*

*Qelbî lêda lêv lerizî*
*Milet kevte xar û bezê*
*Qut kirin wan dengê sazê*

[28] Serfirazî, serbilindî.

*Hecî birne nexweşxanê (Hecîyê Jin lê Mirî, 8-9-10-11)*

Dîsa Gulordî li ser muxtarê gundekê helbestek nivîsîye û ji ber nezanîn û bê'edaletîya muxtarî rexneyên tûj li muxtarî diket. Pirsgirêkên bi rengî li gundan de zêde ne. Gulordî di helbestê de balê dikêşe ser vê meseleyê:

*Me muxtar rakir ji gundî*
*Cahil û hem zor nezan e*
*Bêoxir e wekî kundî*
*Rû diwarê mehkeman e*

*Rûtirş û naw-çaw girê ye*
*Çawê wî l'fend û hîlê ye*
*Naket pisyara kesê ye*
*Her gav hîvya ruşwetan e (Muxtarê Gundî, 1-2)*

Gulordî, li ser hind zana û meleyên hemdema xwe jî helbest nivîsîne. Li gor gotina Gulordî piranîya wan kesan berhemên edebî nebin jî, di alîyê 'ilm û zanînî xwe de kesên serkeftî û zîrek bûne. Ji alîyê Gulordî ve behskirina wan kesan girîng e. Lewra Gulordî danûstandineke li ser zanînê ligel wan kesan hebû û dibe ku heta astekê li ser Gulordî tesîr kiribin. Ji aliyê dî ve helbestên Gulordî yên li ser wan kesan hatine nivîsîn ji bo nasîna wan dibe çavkanî ku neyêne jibîrkirin. Lewra zana û 'alimên ku xwedî-berhem nebin bi demê re têne jibîrkirin. Ji ber vê jî bi xêra van kesên ku li ser wan helbest dinivîsîn li wê heremê têne nasîn û di nav rûpelên edebî de cihê xwe digirin.

Hind kesên ku Gulordî li ser navê wan helbest nivîsînî ev in: Mela 'Elî,[29] Mela Ebdulmecîdê Xelkanî,[30] Mela Ehmed,[31] Feqe Ehmed Zeydîn,[32] Mela Husênê Doskî,[33] Mela Kerem[34], Mela Mirteza,[35] Mela Nûredînê Satî[36], Mela Temer,[37] û hwd. Dîyar dibît

[29] Mela 'Elî babê Gulordî bû.
[30] Mela Ehmedê Xelkanî, ji gundê Xelkanê bû. Li gundê Gulordî feqetî kiriye û heman demê hevalê Gulordî bû.
[31] Mela Ehmed, xalê Mela Husênê Doskî bû. Bi ilm û zanîna xwe dîhate nasîn. Li ser jîyana pêxemberî mewlûdek nivîsîye. Gulordî hêj di temenê xwe yê ciwanîyê de Mela Ehmed diçe rehma Xwudê.
[32] Feqe Ehmed, gundîyê Gulordî bû. Di alîyê 'ilm û zanînê de pêşkeftî bû lê demek şûn de bi tîcaretê re eleqedar dibît. Çûye rehma Xwudê.
[33] Mela Husênê Doskî ji binemela Doskîyan e û Gulordî li ber destê wî perwerde dîtîye. Ji bo pêhtir zanînê li binbeşa "Mela Husênê Doskî" binêrin.
[34] Mela Kerem, dost û nasê Gulordî ye ku li navenda Colemêrgê dijît.
[35] Mela Mirteza, bapîrê babê Gulordî bû.
[36] Mela Nuredînê Satî, dostê Gulordî yê nêz e. Hêj dîjît û li Geverê muderis e.
[37] Mela Temer, dostekê Gulordî bû. Çûye rehma Xwudê.

ku Gulordî piranî li ser kesên bi ‘ilmê ve mijûl û zana helbest nivîsîne. Armanca Gulordî ew e ku wan kesan bidete nasîn û bi rêya helbestê heskirin û mineta xwe ji bo wan dîyar biket. Çend lib nimûne:

*Yê agahdar be ‘esla xwe*
*Bizanîtin sûlala xwe*
*Dê bizanît jîyara xwe*
*Nezan nabît li cîhanê*

*Babê min nav Mela Elî*
*Herba cîhana ewelî*
*Li Gulordê gundê belî*
*Nehsed û bistê zayînê (Behsê Babê Min, 3-4)*

*Kî bû ew ustadê we yê seîd*[38]
*Hem mela bû hem musteîd*[39]
*Xelkanî bû Ebdulmecîd*
*Bît cînarê hebîbê ekber*

*Eqreba ye digel Xerîb*
*Hindî l’dinê hebît nesîb*
*B’hîwya şefa’eta hebîb*
*Li axretê dûr bin j’seqer*[40] *(Seydayê Berê, 12-13)*

*Ew li cem şahî bû qazî*
*Her kes ji ‘ilmê wî razî*
*Paşê xwe da sîyasetê*
*Çû cem Qazyê Mahabadê*

*Nik qazî cih bû bi şadî*
*Wêrê bû wezîrê dadî*
*Li Komara Mahabadê*
*Bû wezîrê ‘edaletê (Serguzeşta Seyda, 13-14)*

[38] Mirovê li mehşerê xwudanxêr.
[39] Kesê ku di ‘ilmî de rehber.
[40] Li cehnemê ji qismê sar re tê gotin.

*Mela Nurettinê Satî*
*Tu meşhur î l'wî welatî*
*Bi kar û xêr û xebat î*
*Bo min nêzîk wekî bira*

*Nêre l'Xerîbê Gulordî*
*Eql û fikr cehlê firotî*
*Bûye pîrek dil pê sotî*
*Hatime rêza bêçaran (Dostê Sadiq, 12-13)*

Wekî ku tê zanîn van salên dawî nexweşîya bi navê "Qorona"yê li hemû welatên cîhanê belav bû. Ev nexweşîye bû sedema mirina gelek mirovan. Gulordî di helbeste xwe de vê neçarîya li hemberê nexweşîya Qoronayê rewşa mirovan tîne ser ziman. Di heman demê de bibîr tîne ku kesên ku hukmê xwe li mirov û civakan dikin û xwe bi hêza xwe dixirînin hêza wan jî nikarî pêşîya vê nexweşîyê bigre û li hemberê van zordestan meznahîya Xwudê nîşan didet. Bo nimûne:

*Wan zor dan aletêt herbê*
*Fen kar d'ket bo qetl û zerbê*
*Wan şol îna kîn û kerbê*
*Peyda nekir çare sexbîr*

*Pêş wîrûsê man pabeste*[41]
*Hero hizaran tên xeste*
*Mirin ser me qet naweste*
*Mesura Îsrafîl tê bîr*

*Hizaran nexweş û mirin*
*Doxtor hekîm tê d'fikirin*
*Dest wan çare naêt kirin*
*Bo wîrûsê bûne êxsîr*

*Kan yêt Xwuda inkar kirîn*
*Kimya xerdel çêdikirîn*
*Yêt mirov çekêt wan mirin*

[41] Kesê ku dest û pêyên wî hatine girêdan. Peyveke farsî ye.

*Wan zanîn Xwudayê xebîr (Qorona Wîrûs, 3-4-5-6)*

Di navbera salên 2015-2016an li bajêrên Kurdan şerê hendekan çêbû. Gelek mirov hatin kuştin û gelek welatî jî ji cihê xwe bûn. Ji van yek jî Gulordî û malbata wî bû ku ji Geverê koçberê bajarê Wanê bûn. Heta ku şer qedîya li Wanê man. Gulordî, bi hest û ramanên xwe yên neteweyî vê zulm û zordarîya li ser miletê xwe di helbesteke xwe de wiha tîne ziman:

*Şermûzar bin li cîhanê*
*Agir berdan Kurdistanê*
*Nehêlan cihê jiyanê*
*Dil ji dînî kirne sar e*

*Zulmê diken navê dînê*
*Wan şol bûye rêtna xwûnê*
*Dinya kirne cihê kînê*
*Bûne wekî gurêt har e*

*Bûne gurgêt nava pezî*
*Xwûnrêj in ew hemî terzî*
*Rêtna xwûnê qet nabezî*
*Bûne dujmin û xedar e (Ya Reb, 6-7-8)*

### 2.1.4. Helbestên Evînî

Evîn, ji bo berhemên edebî mijareke bingehîn e û di nav cureyên edebî de jî em mijara evînê bêguman herî pêhtir di nav cureyê helbestê de dibînin. Şaîrên edebîyata klasîk li ser têgeha eşqê, çi ji bo eşqa mecazî û çi jî ji bo eşqa îlahî, gelek şibandin û teswîr li ser eşqê kirine û bi nêrînên cuda pênaseya têgeha eşqê kirine. Anku her şaîrekê li gor hêza xwe ya edebî têgeha eşqê şirove kiriye. “Lê ne mumkûn e ku pênaseya eşqê tenê li ser xetekê bête kirin (Kola 2016: 92).” Jixwe eşq jî dilniwazîya xwe ji vê taybetmendîyê digire.

Nimûneyên helbestên Gulordî yên ewil li ser mijara evînê bûn. Piştre giranahîya xwe didete ser helbestên civakî û dînî. Ji ber vê çendê helbestên Gulordî yên li ser mijara evînê ji helbestên civakî û dînî kêmtir in. Lê helbestên Gulordî yên li ser eşqê, ji alîyê bikaranîna mazmûnên edebîyata klasîk ve dewlemend in. Evîna ku bûye mijara

helbestên Gulordî bi gelemperî evîneke beşerî ye. Dîsa di helbestan de yar, sembola delalîyê ye. Di helbestên Gulordî de jî bi teswîrên cûr bi cûr behsê delalîya yarê tê kirin. Yara ku Gulordî kiriye mijara helbestên xwe, yareke delal û şirîn e:

*Bejinbilind rûqemer e*
*Reşrihan e zêrkemer e*
*Dilhelin û xweşesmer e*
*Mislê wê nînim çu derê*

*Mislê wê nînin çu dîlber*
*Rû rewneq û bêhna enber*
*Meleksifat bû ew beşer*
*Nînin wekî wê serwerê*

*Lêv şekir çendî şirîn î*
*Rû wek şana hingivîn î*
*Min tam kirê bi lerxînî*
*Xweştir e j'awa kewserê (Dîtina Te bo Min Heyat e, 6-7-8)*

*Şewq û rohn û xemilîye*
*Zîn, Zuhre[42] l'pêş xecilîye[43]*
*Roj bo qiblê zivirîye*
*Tarî kir şewqa hîlalê*

*Rohnya hîlalê birandî*
*Muhbeta dilan ciwandî*
*Cerg û dil li min helandî*
*Gerdenzera bextî xalî (Şev û Rojan Tu Xiyal î, 15-16)*

Bi gelemperî ji bo aşiqî destxistina yarê her tim xeyalek e. Yara ku helbestvan behs diket her tim ji aşiqî direve. Ji ber vê jî helbestvan her çend bi başî behs û methê yara xwe biket jî, dîsa ji ber azara canê xwe gilî û gazindan jî ji yara xwe re diket. Jixwe aşiq ji ber heskirina yarê xwedîyê îmajeke neyînî ye ku di helbestan de bi gelemperî hestên mîna; êş, elem, xemgînî, bêhalî, bêhevî û hwd. serdest in:

[42] Zîn û Zuhre: Qesta seyda ji van her du navan ne çu kes e, navên xeyalî ne.
[43] Xecilî: Şerimkirin, fedîkirin.

*Te dil şikand wekî camê*
*Ji eşqê nagrim çu tamê*
*Lenger*[44] *im b'awazê amê*
*Her weqt gazî û nalîn e*

*Kirme mestê cam bi dest e*
*Sed caran min destûr xwest e*
*Gel min nekir bend û best e*
*Mirwet û insaf nemane (Muhbeta Dila, 21-22)*

*Eql û zehn li min kir talan*
*Çehra ebrû û hîlalan*
*Nazik û gerdenşepalan*
*Fikr û xiyal wê herifandin*

*Fikr û xiyal wê nehêlan*
*Selwîbala nava êlan*
*Kirme êxsîr nava rêlan*[45]
*Derd û kul li min ciwandin (Cewhera Elmasan, 4-5)*

Herwiha Gulordî di helbestên xwe de ji motîf û têgehên edebîyata klasîk, bi rêya hûnerên edebî gelek sûd wergirtîye. Hin ji wan ev in: ava heyatê, bend, bilbil, heyv, horî, qewsê-hîlal, perwane, perî, şem', xal, zulf û hwd. Bo nimûne:

*Xwezya li te bame mêhvan*
*Ramûsanek ji wan lêvan*
*Dest havêtba sing û sêvan*
*Xweştir ji **ava heyatê** (Yara Delal, 6)*

*Dil şewitî j'işqa çavan*
*Girtîyê wan **bend û davan***
*Çawreş û bejinziravan*
*Em êxsîr û hem **bende** ne (Muhbeta Dila, 9)*

---

[44] Seqet, leng.
[45] Dehl.

*Horîya baxê biheştê*
*Wê diket seyran û geştê*
*Wek* **bilbil** *bi awaz xweş tê*
*Ez dame ber çerxa felek (Meşala Dilî, 4)*

Gulordî, di helbestên xwe de hind kesayetîyên ku ji evînê re bûne sembol jî bibîr tîne. Armanca helbestavanî bi vê ew e ku pileya heskirina xwe ya ji bo yara xwe bîne ziman. Di nav helbestên Gulordî de navê Mem û Zîn, Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şirîn, Kerem û Asli, Tahir û Zehra derbas dibin:

*Jîna min te bicih îna*
*Xilas bûm ji êş birîna*
*Kewtme nav eşq û evîna*
*Ez bûme* ***Mem*** *tu wek* ***Zîn****ê (Were bi Qameta Şeng, 6)*

*Min daxwaz e te bibînim*
*Tu yî* ***Leyla*** *ez* ***Mecnûn*** *im*
*Obe obe digêrînim*
*Belku bibînim bala te (Were Dîlber, 4)*

*Quwwet nîn e milan rakem*
*Toba wê hesretê nakem*
*Neşêm ez wekî* ***Ferhad*** *kem*
*Çîyan ker kem bo* ***Şirîn****an (Agirê Dilî Geş Bû, 25)*

### 2.1.5. Helbestên Li Ser Xwezayê

Wekî ku tê zanîn têkilîyeke xurt û bi wate di navbera jîyana li gundan û xwezayê de heye. Çawa ku bandora mirovan li ser xwezayê heye, herwisa bandora xwezayê jî li ser mirovan çêdibe. Eleqeya Gulordî ya ligel xwezayê bi çand û jîyana gundî ve girêdayî ye. Lewra temenê Golurdî bara pêhtir li gundî derbas bûye. Ji ber vê çendê Gulordî çavkanîya nasîn û heskirina xwe ya ji bo xwezayê ji çanda gundî digire. Em di helbestên Gulordî de vê dewlemendîyê baş dibînin. Gulordî, di helbestên xwe de cih daye hêmanên xwezayê û ji xwezayê îlham girtîye. Di nav helbestên Gulordî yên li ser xwezayê de gelek navên ajalan, gul û çîçekan, darûbaran, deşt û zozanan, cih û waran derbas dibin. Gulordî li ser demsalên salê, karûbarên ku bi xwazeyê re eleqedar helbest nivîsîne. Em her çar demsalên salê di helbestên Gulordî de dibînin. Mesela wekî her

helbestvanekê ji bo Gulordî jî demsala biharê bûye mijara helbestê. Di helbestan de demsala biharê kînayet e bo nûbûn û vejînê. Ev guherîna xwezayê li ser derûnîya mirovan jî bi awayekê erênî tesîr dike û helbestvan vê guherînê bi hêstên kelecanî teswîr dikin. Gulordî jî hatina demsala biharê bi Newrozê ve girêdidet. Destpêka helbesta Gulordî ya li ser demsala biharê wisa ye:

*Hatî Newroz ku bihar e*
*Teyr û tiwal bûn dîyar e*
*Cemed sist bû li nizar e*
*Ji ber tavê di baranê*

*Baran barî hûrdexunav*
*Cemed nema bûye lolav*
*Qaz û quling wê li hindav*
*Ew diken karê hêlûnê*

*Teyr û tuyan hêlîn çêkir*
*Belekan xwe lê bicih kir*
*Befrê karê çûna xwe kir*
*Nema çi ji zivistanê* (Hat Newroz Bihar e, 1-2-3)

Di berhemên edebî de demsala payîzê sembola xemgînî, hesret û xatirxastinê ye. Helbestên Gulordî yên li ser demsala payîzê jî hene ku di helbesteke xwe de demsala payîzê bi temenê pîrbûnê ve girêdidet. Anku şibandinekê di navbera demsala payîz û pîrbûna mirovan de diket. Di helbestê de behsê neçarîya halê xwe û bêrîya rojên berê diket:

*Me payîz hat wextê sirê*
*Hizreta me roja tav e*
*Li seran girtiye befrê*
*Çimen bi xûs û xunav in*

*Min nemaye sebra dilî*
*'Eqlê serê min fetilî*
*Nîn e min zêhna 'ewilî*
*Fikr û xeyal di belav in* (Payîz e, 1-2)

Di helbestên Gulordî de ji bilî çar demsalên salê, wextên wekî; sal, heyv, heftî, roj û saet jî derbas dibin. Dîsa em di nav helbestên Gulordî de rastî her çar unsûrên sereke yên xwezayê (av, agir, hewa û ax) jî tên. Gulordî di helbestên xwe de ji van hêmanan emilîye. Bo nimûne:

*Kewtine bin zor û zulmê*
*Mer û malat*[46] *neman qewmê*
*Birya doyê meşka çermê*
*Çan û kar li me bûn* ***agir*** *(Hatî Bihar, 6)*
*Qehir bûn me weqt û zeman*
*Li me hişk bûn* ***awêt çeman***
*Dem û wext li me çu neman*
*Fêqyê daran me bû kevir (Hatî Bihar, 2)*

Gulordî, li ser cihê ku lê hatîye dinyayê û derdorên wê jî helbest nivîsîne. Ji van cihan hindek ev in: Navçeya Geverê, deşta Geverê, gundê Sûsyan, gundê Gulordîyê û hwd. Di nav van helbestan de jî navê hind zozan û waran jî derbas dibin. Helbestên Gulordî yên bi vî rengî girîng in. Lewma ji bo pêzanîna wan cihan û jîyana wê heremê derfetekê çêdiket. Bo nimûne:

*Rojhelatê Şemzînan e*
*Rojavayê Şakîtan e*
*Qible cihê Doskiyan e*
*Bakur Dirî*[47] *ta Îranê*
*Mehdûd e bi van hudûda*
*Nihêl diçît di navê da*
*Hemî gund in di dorê da*
*Wekî helqê li doranê*

*Meşhur bi bajarê Kengê*
*Nav deşta Pûşûpeşengê*
*Refêt teyran û qulingê*
*Keyfxweşyê dide insanî (Deşta Gewerê, 3-4-5)*

[46] Mer û malat anku pez û heywan.
[47] Dirî, navê eşîrete Geverê ye.

Herwiha:

*Çûme Gulorda rengîn*
*Ew welatek şirîn e*
*Sê tax in bi pêş yêk ve*
*Ew neqşek îlahî ne*

*Rahmo û Kepê Dêrê*
*Şerq û xerbêt gundî ne*
*Kevya Pîra Serkelê*
*Şimal û cunûbî ne*

*Mabeyna wan hudûdan*
*Ew mekanek zêrîn e*
*Cihê seyran û geştê*
*Avêt sar hem şirîn e (Çime Gulorda Rengîn, 1-2-3)*

Gulordî du helbest li ser "Bilbil" û "Gulberoj"ê nivîsîne. Di van her du helbestan de ligel bilbil an jî gulberojê diaxive. Ev her du helbeste helbesta Feqîyê Teyran ya bi navê "Ey Av û Av"ê tîne bîra mirovî. Axiftina helbestvanî ya ligel bilbilî li ser kul û xeman e. Derd û kulên xwe ji bilbil re dibêje. Bo nimûne:

*Ey bilbilê bostanê xemdar*
*Ey aşiqê dil zor birîndar*
*Her dema te bi fîxan û zar*
*Carek nalîyan nabirînî*

*Te dil kovan e ji ber firqet*
*Yan ah û kovan kirne sin'et*
*Tu bêumêd mayî ji weslet*
*Gav û deman bi ah û şîn î*

*Yan dil sotî yî şubhetê min*
*An derdgiran î tu mislê min*
*Were be hevkarê derdê min*
*Yan hevkarya min razî nînî (Ey Bilbil, 1-2-3)*

Gulordî, bi çavdêrîya xwe ya li ser xwezayê, helbestek li ser “Gulberoj”ê jî nivîsîye. Bo nimûne:

*Min gulek dît zor bilind e*
*Ye ciwan û law û rind e*
*Wê mesken baxçe û gund e*
*Ew nebûya gulyaban e*

*Li nav gulan serî rast e*
*Li ber rojê diraweste*
*Nîn e wê daxwaz û qest e*
*Yekemîn gula cîhan e (Gulberoj, 1-2)*

Herwiha hevbestvan gulên wekî; sosîn, alal, rihan, binevş û gulberanê jî gelêk didete axiftin. Her gulek behsê taybetmendîya xwe diket. Di vê helbestê de helbestvan nîşan didet ku her gulekê rengekê xwe heye û hebûna wê bêçune nîn e. Helbest wisa dest pê diket:

*Carekê çûme zozanan*
*Gel celebê şek beranan*
*Min seyrek kir li rihanan*
*Heyran bûm bêhna sosinê*

*Sosin zer e bin yê şîn e*
*Bêhnek heye dil d’helîne*
*Ye rûgeş e rûkenîn e*
*Nînin mislî wê lê dinê*

*Alala min sor û şîn e*
*Gulek lawe bêhn çu nîn e*
*Ye stûxwar û ye xemgîn e*
*Her dem diket ew girînê (Sosina Zozanan, 1-2-3)*

Em di helbestên Gulordî yên li ser xwezayê nivîsînî de jî dibînin ku Gulordî bêrîya rojên xwe yên berê diket. Ji ber vê jî cihê ku lê hatiye dinyayê û lê mezîn bûyî, karûbarê ku di ciwanîya xwe de li gundî kirî, bûye mijara helbestên wî. Li gundan destpêka mehên havînê karûbarê gîyadurînê tê kirin. Di nav Kurdan de ev

karûbarê gîyadurînê wekî çandekê lê hatîye. Gulordî jî di helbesteke xwe de vê çandê bi awayekê coş û serkeftî tîne ziman. Helbestvan bi vî awayî salên xwe yên borî bibîr tîne. Wekî nimûne:

*Li me hat wextê havînê*
*Dest havêt gîyadirûnê*
*Bi dilxweş pêk ve diçinê*
*Kespa helal xweşya jînê*

*Min tirpan hilgirt bûm pale*
*Wek adetê hemî sal e*
*Min zor pê xweş e ev hal e*
*Keyfek xweş bû di wê hînê*

*Me xem nedzanî ka çî ye*
*Şol û kesp û palehî ye*
*Ka te çend texe dirûye*
*Xeber nebû me j'cîhanê (Gîyadirûn, 1-2-3)*

## 2.2. JI ALIYÊ RÛXSARÎ VE TAHLÎLA HELBESTÊN GULORDÎ

Helbestên Gulordî ji alîyê naverokê ve hem folklorîk in û hem jî klasîk in. Lê ji alîyê teşe ve em nikarin vî tiştî bêjin. Em dikarin helbestên Gulordî ji alîyê teşe ve di çerçoveya folklorîk de binirxînin. Wekî ku tê zanîn taybetmendîyeke sereke ya helbestên klasîk yêk jî ew e ku helbest bi kêşa arûzê tên nivîsîn. Lê çû helbestên Gulordî bi kêşa arûzê nehatine nivîsîn. Hemû helbestên Gulordî bi kêşeya heceyê hatine nivîsîn. Helbestên Gulordî bi gelemperî çarîn in û helbestên ku bi beytan jî nivîsînî hene. Gulordî hemû helbestên xwe bi aheng nivîsîne. Serwa û paşserwa ji bo ahenga helbestê du hêmanên sereke ne. Em jî dê di vê binbeşê de helbestên Gulordî li dor mijara serwa û paşserwayê binirxînin û bi mînakan nîşan bidin.

### 2.2.1. Serwa (Qafîye)

Serwa, bi gelemperî di dawiya misreyan de dengên mîna hev re tê gotin. Serwayên ku di destpêk û nava risteyan de jî cih digirin hene. Ji aliyê nivîs û bilêvkirinê ve wekî hev in lê ji alîyê wateyê ve ne wekî hev in. Herwiha wekî ku Saraç jî dibêje:

"Peywîreke din a serwayê jî ew e ku di helbestê de ahengekê saz diket (Saraç 2014; 257)."

Serwa, li gor deng û cih vediqetine du beşan. Em jî dê hewil bidin ku helbestên Gulordî di bin navê van beşan de bi nimûneyan nîşan bidin.

#### 2.2.1.1. Serwayên li gorî Cihî

Ev beşa serwayê jî ji sê binbeşan pêk tê. Di nav helbestên Gulordî de em rastê van her sê cureyên serwayan hatin. Di helbestan de dîyar dibe ku Gulordî zêde bala xwe daye hevdengiya peyvan. Di hemû helbestên Gulordî de ev qaîdeye tê dîtin. Êm ê derbarê vê mijarê de bi çend minakan helbestên Gulordî nîşan bidin.

##### 2.2.1.1.1. Serwaya Kutayî

Ev cure serwaye di dawîya risteyan de cih digirin. Ji helbestên Gulordî bo nimûne:

*Peyda bîtin carek bi w**ext***
*Bo me yar bît talî' û b**ext***
*Li me nehêt ew zor û z**ext***
*Ronahyekê em bibînim (Dûrî Weslet, 5)*

*Were dilo tu bo çiy s**il***
*Çend xirab e eşqa bêd**il***
*Dem borandin me bêşix**ul***
*'Umr xilas bû bi derd û k**ul** (Evîna Bêdil, 1)*

##### 2.2.1.1.2. Serwaya Navekî

Ev cure serwaye li nîveka risteyan cih digire. Di helbestên Gulordî yên ku bi beytan hatine nivîsîn de ev cure serwaye tê dîtin. Lê Gulordî di helbestên xwe de zêde bi kar neînaye. Bo nimûne:

*Bi sed salan hemal**ek** bam piştîkêş nav dikana*
*Bi sed salan seyîs**ek**[48] bam li nava tewilxana (Bi Sed Salan, 5)*

---

[48] Ji kesê ku hespan xwedî diket re tê gotin.

#### 2.2.1.1.3. Serwaya Sereta

Wekî ku ji nav jî tê zanîn ev cure serwaye li serê risteyan cih digire.

*__Bi__rayê piçûk 'umir sed û pênce sal*
*__Bi__ evî 'umrê kêm bûye pîrekê kal (Behsa Sê Birayan-3, 4)*

*__Got__ine 'Elî Muhemmed li ku ye*
*__Got__ê ez nizanim bi ku da çûye (Hazirî, 38)*

#### 2.2.1.2. Serwayên li gorî Dengî

Ev cure serwaye jî di nav xwe de ji çar binbeşan pêk tên. Di nav helbestên Gulordî mînakên vê cureyê serwayê jî pir in. Em ê jî dê hewl bidin ku ji nav helbestên Gulordî hinek nimûneyên van cureyên serwayan nîşan bidin.

#### 2.2.1.2.1. Serwaya Lawaz

Serwaya lawaz, di risteyan de wekheviya dengekê bi tenê re tê gotin (Dilçin 2013; 86). Di helbestên Gulordî de, kêm jî be, em rastî nimûneyên vê cureya serwayê tên. Bo nimûne:

*Ew bilind û hem bez__a__ ye*
*Ye rihet û zor ten__a__ ye*
*Digel me hemyan bir__a__ ye*
*Ewî nînin xirab'emel (Şêr Û Zurafe Û Ker, 11)*

*Piling xurt û hem bez__a__ ye*
*Ew bo me hemyan bel__a__ ye*
*Fîl mexlûqekê ten__a__ ye*
*Leşek heye zor yê tembel (Şêr û Zurafe û Ker, 7)*

#### 2.2.1.2.2. Serwaya Asayî

Ev cure serwaye jî ji du dengên mîna hev pêk tê. Di helbestên Gulordî de nimûneyên vê serwayê gelek in. Bo nimûne:

*Kolehê dergeha yar e xeyrî wî nîn in çu x__em__*
*Badexwerê eşqê ji ber wê nîn in wî çu el__em__*
*(Were Carek Tu Kerem Ke, 6)*

*Ji dîdara te min winda kirin fikr û eq**il***
*Ma heta kengî dê biminî bêsoz û qew**il** (Xwazî Carek, 2)*

*Dujmin wekî gurê h**ar** e*
*Wî ne bext e ne qer**ar** e*
*Hemî deman li ser k**ar** e*
*Nîn e insafa zeman e (Berê Xwe Bide Vê Cîhanê, 8)*

### 2.2.1.2.3. Serwaya Zêdebar

Ev cure serwaye zêdetirî ji du dengên mîna hev pêk tê. Ji bo vê serwayê jî em dikarin ji helbestên Gulordî çend nimûneyan dibin:

*Pêxember û refîqan rê de**wam** kir*
*Xelqê tamahya sed hêştirên **wan** kir (Hicret, 22)*

*Ji Sûreya Nîsa ayeta du**yan***
*Biden malê etîman û sêwî**yan** (Gotina Hedîsê, 21)*

*Di ‘alem da çi zahir bît çi b**atin***
*Hindî ew tiştê ji Xwudayî h**atin** (Rabe Hebîb, 11)*

*Ber pîrîyê me hal n**ema***
*Derd û êş li me bûy c**ema***
*Dil tena nîn e ber x**ema***
*Xweş û rihet dîhar nîn e (Salêt Winda, 6)*

### 2.2.1.2.4. Serwaya bi Cînas

Serwaya bi cînas, ew cure peyv in ku deng, nivîs û bilêvkirina wan mîna hev in lê wateya wan ji hev cuda ne (Dilçin 2013; 90). Di nav helbestên Gulordî de em tenê rastê vê mînakê hatin. Peyva “kevtin”ê di hemû risteyan de bi wateyên cuda hatiye bikaranîn. Di risteya yekemîn de bi wateya “çûyîn”ê, di risteya sêyemîn de bi wateya “dûrbûn”ê û di risteya çaremîn de jî bi wateya “zêhnbûn”ê hatiye bikaranîn.

*Şeva tarî bi rê **kewtim***
*Xewa min hat nerakewtim*
*Min kes nedît zor dûr **kewtim***
*Sitêran fukrîm zêhn **kewtim** (Şeva Tarî, 1)*

### 2.2.2. Paşserwa (Redîf)

Paşserwa, hem ji aliyê wateyê ve û hem jî ji aliyê şiklî ve wekî hev in. Ocek pênaseya paşserwayê wisa diket: "Piştî serwayê û di dawîya risteyan de ji her cure dubareyên ku tên kirin re 'paşserwa' tê gotin (Ocek 2022; 169)." Sê cureyên paşserwayê hene ku ev jî ev in: Paşserwayên bi qertaf, paşserwayên bêjeyî û paşserwayên kombêjeyî. Gulordî di helbestên xwe de ji van her sê cureyên paşserwayan tenê "paşserwayên bi qertaf" û "paşserwayên bêjeyî" bi kar înane. Em ê van her du cureyan bi nimûneyan nîşan bidin.

#### 2.2.2.1. Paşserwayên bi Qertaf

Ev cure paşserwa di dawîya risteyan de tenê ji qertafan pêk tê. Ji helbestên Gulordî çend nimûne:

*Birsî û rûs û pêxas* ***in***
*Bêcih û war û libas* ***in***
*Bêkes û warisnenas* ***in***
*Hemyan derge girtin li wan (Multecî, 2)*

*Cism û nûr çeşmê sîyah* ***e***
*Dîlbera rûqend û mah* ***e***
*Laîqa dîdara şah* ***e***
*Dil û mêlak min kelandin (Cewhera Elmasan, 2)*

*Mucesem*[49] *enwer û nur* ***î***
*Hebîbê heyyê Sebbur* ***î***
*Bi taç û textî meşhur* ***î***
*Nebîyê zatê Burhan* ***î*** *(Tu Hebîb î, 2)*

#### 2.2.2.2. Paşserwayên Bêjeyî

Ev cure paşserwaye di dawîya risteyan de ji bêjeyan pêk tê. An jî ligel bêjeyan, qertaf jî cih digirin. Bo nimûne:

[49] Mucesem ('E): Cism an jî yê di rewşa cism de.

*Derdêd giran peyda* ***neke***
*Bêhna xwe li me teng* ***neke***
*Gotinêt min tu red* ***neke***
*Were da bibin heval e (Dinya Pûç, 2)*

*Destê nazik te sor* ***kirin***
*Tilyê zirav gustîl* ***kirin***
*Dilê dostan birîn* ***kirin***
*Bejin zirav etles*[50] *berda (Bejna Wekî Selwê, 12)*

*Feqîrek pir guneh* ***im ez***
*Sefîlek bêpenah* ***im ez***
*Bi derd ah û fixan* ***im ez***
*Resûlê ins û cinan î (Tu Hebîb î, 7)*

## 2.3. HUNERÊN EDEBÎ

Hunerên edebî, yek ji rêbazeke vegotinê ye ku tesîr û wateya vegotinê dewlemend diket. Edebîyatnas û bi gelemperî helbestvan, ji bo ku gotinên xwe bihêz bikin serî li hunerên edebî didin. Bi vî awayî merama xwe bi awayekê xurt û bi tesîr tînin ziman. Tekiliyeke xurt di navbera edebîyat û hunerên edebî de heye. Metnên edebî tam û lezeta xwe ji hunerên edebî digire. Bozarslan jî têkilîya di navbera edebîyat û hunerên edebî de wisa dinirxîne: “Mirov dişê edebiyatê bişibîne laşekê, hunerê jî bişibîne giyan. Laş çawa bê giyan najî û wezîfe nabîne, edebiyat jî bê hunerê vala û pûç dimîne, bi kêrê tiştekê nayê û nikare dilê mirovan ber bi xwe bikişîne (Bozarslan 2005: 71).”

Gelek qalibên hunerên edebî hene ku ew jî li gor taybetmendîyên xwe vediqetine sê beşên sereke. Anku hunerên edebî di nav xwe de li gor mecazê, wateyê û bêjeyê tên dabeşkirin. Gulordî di helbestên xwe de ji hunerên edebî sûd wergirtîye. Lê hemû hunerên edebî bi kar neînane. Gulordî di helbestên xwe de ji hindek hunerên edebî kêm û ji hindekan jî zêde emilîye. Gulordî ji hunerên edebî yên mîna; întaq (peyîvandin), îqtîbas, kînaye, mubelexe, nîda, telmîh, tenasub, teraduf (hevwateyî), teşbîh (şibandin), tezad û hwd. zêdetir istifade kiriye.

[50] Parçeyekê qumaşê giranbuha ye.

Em ê di vê beşê de bi awayekê kronolojîk cih bidin hinek hunerên edebî yên sereke ku di helbestên Gulordî de hatine bikaranîn. Ligel îzahkirina hunerên edebî dê ji helbestên Gulordî jî nimûne bên dayîn.

### 2.3.1. Întaq (Peyîvandin)

Ji derveyî mirovan, peyîvandina tiştên bi ruh û bêruh re hunera întaqê tê gotin. Mînakên vê hunerê di helbestên Gulordî de zêde hatine dayîn. Peyîvandina bilbil, gulberoj û sosinê ji bo vê mijarê nimûneyên baş in.

Bilbil dibêje:

*Îfşa nakem ez sir û halan*
*Nabêjime dost û hevalan*
*Dihelîyêm bi hemî halan*
*Bi evî derdî nakem jînê (Ey Bilbil, 6)*

*Bi navê xwe gulberoj im*
*Bo hewe ez yê dilsoj im*
*Gel hewe ronkan dirêjim*
*Gulek hemberê min kanê (Gulberoj, 5)*

*Sosin dibêjît dewa me*
*Daxwaza derd û kula me*
*Ez kulîlka ser saxa me*
*Bûme derman bo birînê (Sosina Zozanan, 8)*

### 2.3.2. Îqtîbas

Îqtîbas yek ji hunera edebî ye ku ji bo xurtkirin û xemilandina wateyê bikaranîna ayet û hedîsan e. Gulordî jî di helbestên xwe de li çend cihan hunera îqtîbasê bi kar înaye. Bo nimûne:

*Ez Xerîb im ku Ebdullah*
*Min qeseme b'ismê Ellah*
*Dê bêjim* ***qalû înnalillah***
***We îleyhî racî'une***[51] *(Were Bira/16)*

[51] Ev ayeta Qur'anê ye. Dibêje ku em ji dev Xwuda hatine û dîsa em ê bizivirine ve dev wî.

*Çend bi isyan û xetab im feqîr im umêd heye*
*Na-umêd nabim çu car* ***lateqnetu xitab***[52] *heye (Dad û Feryad/5)*

*Yêt wesa nin dîn dabûne bi 'emel*
***Ulaîke ke'l-en'am bel hum edall***[53] *(Derdê Me)*

### 2.3.3. Kînaye

Kînaye, çi nivîskî û çi jî devkî be, di gotinekê de du wateyan di nav xwe dihewîne. Anku ji hunera kînayeyê du wate derdikevin û ya ku tê qestkirin wateya mecazî ye. Nivîskar an jî helbestvan, tişta ku nexwaze rasterast bêje bi vê hunera edebî gotina xwe bi awayekê mecazî tîne ziman. Gelek caran di hunera kînayeyê de gotinên pêşîyan û biwêj tîne bikaranîn. Di helbestên Gulordî de jî hunera kînayeyê tê dîtin. Bo nimûne:

*Nînin çu gul mislê gula min*
*Gul hesret e ji bo dilê min*
***Agir êxiste nav cergê min***
*Wê nehêlane pê û qedem (Gula Baxê Îrem, 5)*

*Kewtme sala heftê çara*
*Bûyme kalê ber diwara*
***Pişt dane min dost û yara***
*Min birya cihê hawarê (Bûme Meskûn li Tokiya, 10)*

***Dame ber tîra evînê*** *xezala çol û beryan*
*Derd û dax êxîstne dilê min zalimê kuştim ez (Hizar Kul û Derd, 6)*

### 2.3.4. Mubelexe

Ev hunera edebî bi gelemperî ji sînorê mantiqê derdikeve û ji rastiya çêbûnê dûr e. Kocakaplan pênaseya hunera mubelexeyê wisa diket: "Bi tesîra kelecanê, ji mezinkirin an jî ji biçûkkirina bûyerekê re mubelexe tê gotin (Kocakaplan 2014: 107)." Gulordî jî di helbestên xwe de li çend cihan ev hunere bi kar înaye. Bo nimûne:

*Dinalim ez dil birîndar*
*Ciger kul û zor keserdar*

[52] Lateqnetu xitab: Ayeteke Qur'anê ye. Xwuda kerem diket: "Bêhêvî nebin ji rehma min."
[53] Ayeteke Qur'anê ye. Wate: Wekî heywanetî ne û ji heywanî kêmtir in.

***Ronkêt çawan bûne robar***
*Diborinim ez b'tewalî (Şev û Rojan Tu Xiyal î, 2)*

*Bûm mubtelayê evînê*
***Dil pê bûye gola xwînê***
*Kewtime êş û birînê*
*Dil benda zulf û xalan e (Muhbeta Dila ,7)*

***Dinya bo min gelek teng e***
*Nema eql û şekl û reng e*
*Beden helyêt nîn e seng e*
*Bûm teyrê di qefesê da (Dilê Birîn, 14)*

### 2.3.5. Nîda (Bangewazî)

Helbestvan bi rêya hunera bangkirinê hestiyarbûna xwe bi awayekê coş û bi dengekê bilind tîne ziman. Ev bangkirin piranî bi baneşanên mîna; ax, aya, ey, hey û hwd. tê kirin. Em di nav helbestên Gulordî de jî rastî vê hunera edebî tên û Gulordî bi gelemperî baneşana "ey"ê bi kar înaye. Bo nimûne:

***Ey** şirîna min tu bi çend naz û cîlwe yî*
*Bi xemla xwe sor û zer libas û berge yî (Şirîna Min, 1)*

***Hey hawar** û sed mixabin bo wê jîna bê'emel*
*'Umir borand bi hesûdî kîn xirabî dil xelel[54] (Pîş û Kar, 5)*

***Ey** Xerîbê bêçare min sed hîvî û gazî ye*
*Hatime dergahê ya Rebî jê bibe razî ye (Pîş û Kar, 12)*

### 2.3.6. Telmîh (Bîranîn)

Telmîh cureyek ji hunerên edebî ye ku tê wateya bîranînê. Anku "telmîh, behskirina helbestvanî ya ji bo kesekê yan jî bûyereke binavûdeng re tê gotin (Kocakaplan 2014: 149)." Gulordî di helbestên xwe de ji vê hunerê zêde emilîye û bi gelemperî jî bûyer û kesayetîyên dînî bibîr anîne. Bo nimûne:

---
[54] Xirab.

*Nûra te sebebê hebûna ‘alem*
*Ismê te bû sebebê* ***‘efya Adem*** *(Rabe Hebîb, 9)*

*Cihê* ***Eyûb û sebra wî***
*Gel* ***Zekerya û zebha***[55] ***wî***
*Hem* ***luqman û hikmeta wî***
***Erdê Tevrat û Levhan î*** *(Îsra, 15)*

*Tuy* ***îmamê Heremeynê***
*Tuy resûlê seqeleynê*[56]
*Tuy* ***muselyê qibleteynê***[57]
*Xwudanê cum’e ‘eydan î (Îsra, 8)*

### 2.3.7. Tenasub (Guncanbûn)

Hunera tenasubê, di riste, beyt an jî çarînekê de peyvên ku ji alîyê wateyê ve nêzî hev û têkildar re tê gotin. Gulordî jî wekî her helbestvanekê klasîk ji vê hunerê emilîye. Gulordî, di nav hunerên edebî de ev hunere jî zêde bi kar înaye. Ji helbestên Gulordî çend nimûne:

***Merg û çîmen awêt sar*** *bû cihê seyran û geştê*
*Bo dilê* ***dildar û dostan*** *biken seyrê l’wê deştê (Dilê min, 2)*
***Gulek*** *min dît li* ***gulistanê***
*Cih girtîye li nav* ***bostanê***
*Wê birandî* ***bêhna rihanê***
*Ew bûye* ***gula baxê îrem*** *(Gula Baxê Îrem, 1)*

*Şiddeta ji heddî zêde*
***Agir û gurû û pêt e***
*Em kirin* ***şeyda û şêt e***
*Kewtine behra heyretê (Paşdaman, 5)*

[55] Zebh (‘E): Serjêkirin.
[56] Her du dinya.
[57] Behsa du qiblan dike: Ka’be û Beyt’ûl-Muqedes.

### 2.3.8. Teraduf (Hevwateyî)

Di hevok an jî risteyeke helbestê de du yan jî zêdetir peyvên hevwate re “teraduf” tê gotin. Bikarînana vê hunerê ahengekê dide gotinê û bi vî awayî vegotinê dixemilîne. Em vê hunerê di nav helbestên Gulordî de jî dibînin. Bo nimûne:

*Bi sed salan sa’il*[58] *bam gerode sûk û kolana*
*Bi sed salan koleyek bam digel* ***rût û uryana*** *(Bi Sed Salan, 4)*

*Çaw di kor in guh bûne ker*
*Kes li heqyê naket nezer*
*Gel me her dem de’wa û şer*
*Dinya kirne* ***heps û zindan*** *(Were Bifikre li Wî Halî, 4)*

*Her dem di nav* ***êş û kulan***
*Ez kewtime derdê canî*
*Di nav* ***derd û kulan*** *im ez*
*Dê ji kê b’xwazim hisabê (Êş û Jan, 3)*

### 2.3.9. Teşbîh (Şibandin)

Ji bo hunera teşbîhê gelek nav û pênaseyên cuda têne kirin. Lê hemû navên ku lê têne dayîn û pênaseyên wan nêzî hev in. Perwîz Cihanî ji bo hunera teşbîhê wisa dibêje: “Di Kurdî de mirov dikare ji teşbîhkirinê re bibêje ‘wekandin’ an jî ‘mînandin’. Di hunera teşbîhê de gava wekandin di navbera du tiştan da hat kirin, ya hindik yan jî lawaz bi ya xurt an jî zêde tê wekandin (Cîhanî 2013: 40).”

Gulordî di helbestên xwe de hunera şibandinê bi gelemperî daçekên wekî; wek, wekî, weku, mîna û şubhê kirine. Gulordî, di helbestên xwe de herî pêhtir ji vê hunera edebî emilîye. Bo nimûne:

*Ez heliyam* ***wekî*** *momê*
*Bi wî halî nakem domê*
*Li min neken hûn çi lomê*
*Beden* ***wek*** *kur û heriyan (‘Eyda Qurbanê, 4)*

[58] Sa’il (‘E): Xazok.

*Haşa hebin* ***wek*** *te beşer*
*Rû-sorgul û* ***şubhê*** *qemer*
*Bejinbilind û lebşeker*
*Tu nabêy bûm qatilê te (Were Dîlber, 11)*

***Wek*** *Fir'awnî bûyne asî*
*Kes ji dûr wane nanasî*
*Bedxuya*[59] *bexîla*[60] *munkir*
*Bêcewher in* ***wekî*** *resas*[61] *î (Were Bifikre li Wî Halî, 9)*

### 2.3.10. Tezad (Dijberî)

Di heman riste, beyt û yan jî gotinê de bikaranîna hest, raman an jî rewşên ku ji alîyê wateyê ve li dijî hev re "hunera tezadê" tê gotin. Em di nav helbestên Gulordî de rastê vê hunerê tên. Bo nimûne:

*Li 'emelan tu hişyar be*
*Şew û rojan tu li kar be*
*Di 'emrê Rebê Cebar be*
*Hem di subh û hem êvarê (Rabe di Vê Demê, 5)*

*Mêr û jin ji hev ferq nabin*
*Kiç û kur bi hev ra nabin*
*Agir barût vêk ra nabin*
*Zeman me bû dewrê axir (Hatî Bihar, 12)*

*Sed hawar û bi hizar car*
*Şikurdar im bi 'emrê car*
*Teqdîr û ferman yêt wî ne*
*Derd û derman li nik wî ne (Were Dilo Kanê bo Çi, 12)*

---
[59] Exlaqnexweş, te'betnexweş.
[60] Hesûd.
[61] Madenek e.

## ENCAM

Em di vê xebata xwe ya bi navê "Jîyana Mela Mecîdê Gulordî û Helbestên Wî (metn û lêkolîn)" de li ser jiyan û kesayetîya Mela Mecîdê Gulordî ya edebî sekinîn û me helbestên wî ji alîyê naverok û şiklî ve nirxandin. Em dikarin bêjin ku Mela Mecîdê Gulordî helbestvanekê serdema nûjen e û "bi naveroka helbestên xwe" muşterekê edebîyata Kurdî ya klasîk e. Her çi qas ji alîyê naverokê ve di bin bandora edebîyata klasîk de mabe jî şêwazê vegotina wî ji çanda devkî xilas nebûye. Anku helbestên Gulordî ji alîyê naverokê ve hem folklorîk in û hem jî klasîk in. Lê ji alîyê teşeyê ve mirov dikare tenê di çerçoveya folklorîk de binirxîne. Lewra Gulordî çu helbestên xwe bi kêşa 'erûzê nenivîsîne. Hemû helbestên xwe bi zimanekê xwerû û rojane, bi kêşeya heceyê nivîsîne. Ev taybetmendîya helbestên Gulordî jî ahengekê di navbera risteyan de çêdike û jiberkirina helbestên wî hêsan diket. Herwiha Gulordî di helbestên de gelek hêmanên folklorîk bikar înane û ji keresteyên çanda devkî gelek sûd wergirtîye. Ji vî alîyî ve helbestên Gulordî pêhtir dişibine helbestên Feqîyê Teyran. Helbestên bi vî rengî dibe ku ji alîyê naverokê ve di nav hudûdê edebîyata klasîk an jî ya "zimanê nivîskî" de were dîtin, lê ji alîyê şiklî ve ev cure-helbeste folklorîk in ku hêza xwe ji "zimanê devkî" digirin. Ji ber vê jî helbestên Gulordî balkêş in û divê li dor vê nêrînê werin nirxandin.

Me helbest-nivîsîna Gulordî ya bi zimanê zikmakî li gor perspektîfa Jung a "arketîpa dayîk"ê nirxand û me dît ku têkiliyeke xurt di navbera arketîpa dayikê û malzarokê bi zimanê zikmakî ve heye. Di helbest-nivîsîna Gulordî ya bi zimanê zikmakî de ev komplekse sedemeke sereke hate dîtin. Lewra eleqeya Gulordî ya ligel 'ilm û zanînê ji temenê ciwanîyê dest pê diket. Lê di temenê xwe pîratîyê de giranahîyê didete ser nivîsîna helbestan. Ev helwesta wî nîşanî me didet ku sedema sereke ya helbest-nivîsîna Gulordî ev komplekse ye ku dixwaze li pey xwe tiştekê li ser rûyê vê dinyayê bihêle û piştî mirinê neyê jibîrkirin. Îlhama xwe ya nivîsê ji vê kompleksê girtîye. Di gelek helbestên wî de jî em rastî vê derûnîya Gulordî hatin.

Gulordî di bin tesîra hind 'alim û şaîrên edebîyata Kurdî ya klasîk de maye û di helbestên wî de em vê tesîrê dibînim. Herwiha piraniya helbestên Gulordî dînî û civakî ne. Di helbestên Gulordî de zimanê gazindan û şîretan li pêş e. Ev jî nerazebûna wî ya li hemberê kêmasîyên civakê nîşan didet. Gulordî bi terza "mewlûdname"yê helbest

nivîsîne. Ev cureyê helbestên Gulordî li gor rê û rêbazên mewlûdnameyan birêkûpêk nînin. Eger Gulordî mewlûdnameya bi weznê nivîsîba dibe ku tam û lezzeteke xweştir daba mirov. Lewra bi salan e ku guhê me hînê mewlûda bi erûzê bûye û ew aheng êdî heta kûrahîya mejîyê me çûye. Lê dîsa alîyê van helbestan yê dîrokî girîng in. Dîsa bi mijarên dînî ve girêdayî hîkayetên menzûm jî nivîsîne. Ev hîkayetên menzûm qîmeta helbestên Gulordî zêde kiriye û dîyar dibît ku Gulordî di nivîsîna hîkayetên menzûm de serkeftî ye. Di van helbestên menzûm de tê dîtin ku zanîna Gulordî ya li ser çîrokên dînî-dîrokî kêm nîn e.

Ya girîngtir ew e ku cara ewil e hemû helbestên Gulordî ligel jîyana wî bi awayekê berfireh bûne mijara vê tezê. Em hêvî dikin ku helbestên Gulordî jî di nav edebîyata Kurdî de cihê xwe bigre û xebatên wihareng li edebîyata Kurdî zêde bin.

## ÇAVKANÎ


Adak, A. (2014). *Destpêka edebîyata Kurdî ya Klasîk*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.

Adak, A. (2018). "Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de", *Na Nûbihar Akademî Dergisi*, hej 10, sal 5, 11-58.

Adak, A. (2019). *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî Ya Klasîk De*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.

Akün, Ö. F. (2022). "*Divan Edebiyatı*", Ankara: TDV İslam Ansiklopedisi.

Bozarslan, M. E. (2005). *Mem û Zîn/Ehmedê Xanî.* Stenbol: Weş. Deng.

Cebeci, O. (2004). *Psikanalitik Edebiyat Kuramı*. İstanbul: İthaki.

Cihanî, P. (2013). *Şîroveya Mem Û Zîna Ehmedê Xanî*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.

Cihanî, P. (2019). "Feqîyê Teyran'ın Şiirlerinde Üslup". *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi,* hej: 5, sal 10, 101-122 .

Demir, M. E. (2019). *Şîret di Helbesta Kurmancî ya Klasîk da: Nimûneya Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Mele Xelîlê Sêrtî û Seyîd Elîyê Findikî*. (Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Mardin Artuklu Üniversitesi YDE.

Dilçin, C. (2013). *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*. Ankara: TDK.

Doskî, T. Î. (2018). Şerha Dîwana Melayê Cizîrî. Jan Dost(wer.). Stenbol: Weş. Dara.

Dost, J. (2010). *Mem û Zîn/Ehmedê Xanî*. Stenbol: Weş. Avesta

Ekinci, A. (2016). *Bilmek, Anlamak ve Yüzleşmenin Diğer Adı: Izdırap/Acı ya da Acının Tarihi, II. Uluslararası Eyyûb Peygamber Sempozyumu Bildiriler ve Makaleler*. (Şanlıurfa 21-22 Nisan2016).

Engin, K. (2019). *Li Herêma Doskiyan Çend Deqên Edebiyata Kurdî,* (Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Yüzüncü Yıl Üniversitesi YDE.

Erzen, M. H. (2017). "Divan Şiirinde Mahlas Kullanma Geleneği ve Bu Geleneğin Modern Şiire Yansımaları", *Atatürk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi [TAED]*, hej: 59, 41-73.

Gider, A. (2017). *Molla Muhammed Kavarî Dîvânı'nda Din ve Tasavvuf,* ( Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Bingöl Üniversitesi SBE.

Gözeten, İ. (2015). *Mele Xelîlê Sêrtî ve Nehcu"l-enâm adlı eseri (metin ve inceleme)*, (Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Muş Alparslan Üniversitesi SBE.

Hêzil, S. (2015). *Wêjeya Kurdî*. Wan: Weş. Sîtav.

https://islamansiklopedisi.org.tr/divan-edebiyati (Erişim Tarihi: 10.05.2022).

https://play.google.com/store/apps/details?id=com.wqferheng&hl=tr&gl=US (Erişim Tarihi: 10.08.2022).

https://sozluk.gov.tr/ (Erişim Tarihi: 10.07.2022).

https://www.nisanyansozluk.com/ (Erişim Tarihi: 10.09.2022).

İliş, A. (Mela Mecîdê Gulordî), Temen: 1948, Gever-Colemêrg.

Jan, D. (2010). *Ehmedê Xanî Mem û Zîn*. İstanbul: Avesta Yayınları.

Jung, C. G. (2015). *Dört Arketip, (çev: Zehra Aksu Yılmazer).* İstanbul: Metis Yayınları.

Kakşar, O. (2019). *Yadîgarên Komara Kurdistan a Sala 1946an-1*. Enqere: Weş. Sîtav.

Kaplan, M. (2022). Mem û Zîn. (Transkribe: Huseyn Şemrexî). İstanbul: Nûbihar Yay.

Kocakaplan, İ. (2014). *Açıklamalı Edebi Sanatlar*. İstanbul: Türk Edebiyatı Vakfı.

Kola, F. (2016). "Aşka Dair Bazı Tasavvurlar (XVI. Yüzyıl Divanlarındaki Aşk Redifli Gazellerden Hareketle)". *Dergipark,* Cilt 2, hej 2, 1-28

Kurtoğlu, O. (2006). "Divan Şiirinde Mahlas Değiştiren ve Birden Fazla Mahlas Kullanan Şairler". *Bilig Türk Dünyası Sosyal Bilimler Dergisi*, hej: 38, 71-89.

Ocek, N. (2022). *Dersên Edebiyata Kurdî*. Wan: Weş. Sîtav.

Onay, A. T. (1996). *Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar*. Ankara: MEB.

Pala, İ. (2007). *Ansiklopedik Divân Şiiri Sözlüğü*. İstanbul: Kapı Yayınları.

Sadinî M. X. (2020). *Feqîyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.

Saraç, M. ve A. Yekta (2014). *Klâsik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye*. İstanbul: Gökkubbe Yayınları.

Sigmund, F. (2007). *Sanat ve Sanatçılar Üzerine, 3. Baskı (çev: Kamuran Şipal)*. İstanbul: Yapı Kredi.

Tek, A. (2014). “Vegerîna Malzarokê yan jî “Gaia”ya Ramanê: Zimanê Zikmakî”, *Na Nûbihar Akademi Dergisi*, hej 128, 5-10.

Tek, A. (2018). *Hâmisiz Şâir Babasız Metin: Mem û Zîn ve Osmanlıca Çevirileri Üzerine Bir İnceleme.* İstanbul: Nûbihar Yayınları.

Tek, A. (2019). *Melayê Cizîrî (Jiyan û Tesîra Edebî – Şerha Xezelên Bijartî)*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.

Tunç, O. (2021). *Dîwana Melayê Cizîrî Kürtçe-Türkçe* (çev.). İstanbul: Nûbihar Yayınları.

Üstüner, K. (2008). “XIV ve XV. Yüzyıl Divanlarında Tasavvuf”. *Türklük Bilimi Araştırmaları*, hej 24, 271-294.

Varlî, E.M. (2004). *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn*. Stenbol: Erkam.

Zîver, İ. (2013). *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî*. (Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Mardin Artuklu Üniversitesi SBE.

Zivingî, M. E. (2013). *Gerdeniya Gewherî*. Emîn Narozî (Aw.). İstanbul: Avesta Yayınları.

**PÊVEK 1:**

# DÎWANA MELA EBDULMECÎDÊ GULORDÎ

## 1. HELBESTÊN CIVAKÎ-I / Çarîn

### ‘EYDA QURBANÊ

Li min hat eyda qurbanê
Roja keyf û şahiyan
Bûme mehkum nava xanî
Neşêm rabime ser piyan

Pê û qedem li min nemane
Derd û elem li min cema ne
Dilê min behra xeman e
Li bezre bû serê rêyan

Çu rêkan ez wê nizanim
Xwudanê derd û kulan im
Nexweşekî bêderman im
Cerg û dilêt min heliyan

Ez heliyam wekî momê
Bi wî halî nakem domê
Li min neken hûn çi lomê
Beden wek kur û heriyan

Beden xeste nema sihat
Li min cema bûn derd û illet
Sed hawar û dad û meded
Dikem fîxan û gazîyan

Rêka jiyanê bezre kir
Tama heyatê seh nekir
Bo axretê me çu nekir
Bûyne sefîl li her du ciyan

Bûyne sefîl bi derd û kul
Serî neman fikr û eqil
Me barandin soz û qewil
Nemaye cihê xweşiyan

Jiyan xweş e hebît sihhet
Mirowî nebin derd û illet
Keyfa jiyanê ew didet
Nabînin êş û tahliyan

Êş û xweşî muqabil in
Hukmêt Xwuda di adil in
Em ji wane di xafil in
Dikeyn gazin û gilîyan

Gil û gazind heqê me ne
Em feqîr in bêçare ne
Xerîb derdêt te gele ne
Bixwaze dua û hîvîyan

**BEHSÊ BABÊ MIN**

Bi teqdîra şahê qedîr
Dê keyn behsek bo zanînê
Biçin wextê bab û bapir
Lêkolin keyn biranînê

Mirov ‘eslê xeberdar bît
Jîyana wan agahdar bît
Her derê dê ‘ihtibar bît
Di nav civak û ayînê

Yê agahdar be ‘esla xwe
Bizanîtin sûlala xwe
Dê bizanît jîyara xwe
Nezan nabît li cîhanê

Babê min nav Mela Elî
Herba cîhana ewelî
Li Gulordê gundê belî
Nehsed û bistê zayînê

Wî çaw li dinyayê vebûn
Dayîk û bab zor pê şad bûn
Çar bira dî ewî hebûn
Pêk ve rêwingên jîyanê

Babê dana ber xwendine
Bigre cihê babê min e
Serê her tiştî xwendin e
Fayde ew e bo insanî

Dana lalî Mela Ehmed
Hafizeke zor bi quwet
Wî xwendin fiqh û şerî’et
Heta bab çu dilovanê

Bab gehişte rehma Xwuda
Li çardê bab jê bû cuda
Çar bira man di destî da
Ma li gel bira xêzanê

Mela Ehmed ew ber neda
Hemî cih û hemî erda
Nehêla gehte çu ferda
Ji ber terbîya xwandinê

Da ber xwandin û terbîyê
Heta sala çil û sêyê
Paşî ew çû eskerîyê
Çar sal bûn di wê zemanê

Paşî çar sal hat teskerê
Çil û heftê meha berê
Bûna min sala paştirê
Ber dewam dersû çandinê

Zekayek tîj û belaxet
Fiqh û ‘ilm û hem ‘ibaret
Wer’u teqwa û ‘ibadet
Fera’iz[62] jiber dizanê

‘İlm û hisab û fezayê
Tarîx û hem coxrafyayê
Ayet hedîs û me’nayê
Zor rewan bû li Qur‘anê

Bo tecwîdê yê pispor bû
Di fiqhê da şehreza bû
Bo cewaban muheya bû
Kelam hazir xeberdanê

Axivtinê zor xetîb bû
Rêberyê da pêşewer bû
Ehlê sulh û hem xêrê bû
Civatê zor guh didanê

Mixabin ji me bû cuda
Çû ber dilovanya Xwuda
‘Umrê pênceh û şeşan da
Veda kir ji vê cîhanê

[62] Fera’iz: ‘Ilmê heq û huquqa mirovan ya ligel êk.

Sal û roja me dilnexweş
Ser me da hatî roja reş
Hizar nehsed heftê û şeş
Der-wext û sala zayînê

Yêk muherem roja şembî
Hezar sêsed koça nebî
Nehwêd û heftên dî ser bî
Di wê hisaba hicrînê

**BEHSÊ NIVIŞTÎYAN**

Biken behsek bo cindîyan
Wan xwudanêt nivişţîyan
Ew li dînê xwe d'ken zîyan
Dîn firotin dan bi serwet

Serwetperest in her demê
Şol nivişţî nav 'alemê
Ew ji Xwuda naken şermê
Firotin Qur'an û ayet

Ayetan bi pul firoşin
Ne di gêj in ne serxweş in
Xweliser û ser bi heş in
Ewan kirin terka axret

Wan agah bi dînî nîn e
Ayetan meta' dibîne
Serwetê bi wan cemîne
Bo dînî nîn e rîayet

Hikmêt Xwuda baş nanasin
Dîn-ze'îf û bêesas in
Bê'emel xwudan-iflas in
Wan negirt rêya se'adet

Se'adet bo xwe negişţî
Wan sin'et bûyne nivişţî
Pê distînin hemî tişţî
Ew axretê d'bin xusaret

Kesê çêtket nivişţîyan
Diket stûkra bizn û mîyan
Mekan neman li çu cîyan
Ew dûr dibin ji rehmetê

Bûne wehşî di nav êlê
Nivişt çêkir fend û fêlê
Kirne nava şaxêt çêlê
Ewêt zanît bo xwe serwet

Bêjin şîr dê pê zêde bît
Ber nehisan çawîn nebît
Ev nîmete zayî nebît
Ew bi vê diken qena’et

Wan bawerî bi wê heye
Nabên şolek bi zede[63] ye
Zerera dînî tê heye
Bo xwe dizanît bereket

Ew kelamê Rebê mezin
Hatye ji bo insan û cin
Da pê zanin dinya û dîn
Da peyda ken rêka axret

Nehatye bo niviştîya
Yan xwendina ser miriya
Ew kelam e bo zindîya
Bi wê ne ‘ilm û ‘ibadet

Bêhurmetya ayetan e
Lazim e her kes bizane
Ayet kelamê Xwuda ne
Divêt nebine bêhurmet

‘İlm û dîn pê têne zanîn
Xwuda resûl pê tên nasîn
Ka’înat û insan û cîn
Waqif d’bin bi hal û hikmet

Ka’înat aw û hewayî
Erd û ‘esman û fezayî
Hindî tiştêt Xwuda dayî
Tînte dîhar kar û sin’et

Pê dizanin sûn’a barî
Sema û erd û biharî
Deşt û çîya awêt carî
Pê dizanin hal û wehdet

---

[63] Zede: Xirab, zerer.

Bi wê d’zanin keşf û halan
Heq û huquq qewl û qalan
Enbîya û ‘umr û salan
Rêya tarî bo me ron ket

Ew kelamê Rebê barî
Bîst û sê sal hatye xwarê
Ta ebed hukmê wê carî
Kes neşêtin inkar biket

Nîn e mumkûn bo inkarê
Hindî dinya bêt qirarê
Hukm û sir têne dîharê
Xerîb jê ra şahde didet

**BEHSÊ PÎRÎYÊ**

Bikeyn behsek bo hevalan
Jin û mêr û pîr û kalan
Fikr û bîr bêne zimanî
Da zanin hal û ‘ehwalan

Bi halî bibin xeberdar
Bi pîrî rabûme serkar
Beden bi êş û birîndar
Dest havête qîl û qalan

Dest havête me bi jarî
Dilkovan û bi evîndarî
Pişta kûr û çawêt tarî
Paşî ‘umrê heftê salan

Heftê sal û heftê beste
Min nisret[64] ji Xwuda xweste
Bo cahilan bît guldeste
Bîr bêt civat û sersalan

Li civatan bilorînin
Navê me bi vê vejînin
Fathekê bo me bixwûnin
‘Umir li me bûye talan

[64] Nisret (‘E): Alîkarî.

**BERÊ XWE BIDE VÊ CÎHANÊ**

Berê xwe b’de vê cîhanê
Nema ber bên ji ‘esmanê
Li ser bû kafiristan e
Nemaye xweşya jiyanê

Xweşya zemanî çu nîn e
Dinya bûye qetl û xwûn e
Aramyek li nav me nîn e
Nemaye sebra insanî

Şer û fesad kewtye cihî
Ronahyek li me naxwuhî
Kes di wê şolê nagehî
Nemaye qiymeta canî

Wê bû bazara mirovan
Mirov bûne wekî hovan
Xwûn diçîtin wekî coyan
Me nama cihê jiyanê

Nema hurmet bo insanan
Xatir nema pîr û canan
Her gav şer e nav kolanan
Me nema rehma îmanê

Ulkêt Islam gola xwûn e
Mislimana hal xwe nîn e
Girtin û kuştin û şîn e
Bûne mufsidêd[65] cîhanê

Heta kengî dê dewam ket
Hindî diçît yê xirab ket
Mislimanan jêk cuda ket
Bûne kole j’bo duşmanî

Dujmin wekî gurê har e
Wî ne bext e ne qerar e
Hemî deman li ser kar e
Nîn e insafa zeman e

[65] Mufsid (‘E): Fesadker e.

Insaf nîn e bo mûmînî
Mûmîn kewte dest dujminî
Tucar in bo xwe b’me d’kenî
Em firotin bi erzanî

Bi erzanî kirne pare
Bûyne sefîl hem bêçare
Dilê me gel yekduy xar e
Bûyne xirabêt vê xanê

Em xirab in me rê dûr e
Kovana dil gelek kûr e
Ji îmanê bûn qusûr e
Misilmanê xalis kanê

Dîn zeîf e dujmin b’quwet
Me bo dîn nekir riayet
Me terk kirin hedîs ayet
Lew kewtne nav êş û janê

Dîn ji dest çû dinya nema
Qehwe û baran bûn cema
Dînî nav yêt destê me ma
Nemaye hukmê Qur‘anê

Hukmê Xwudê pêxemberî
Bo me maye xwelîserî
Cih neînan bûn dijberî
Neman xwudanêt wijdanê

Wijdan nema nav islamê
Em bûyne mezlûmêt amê
Bo dujminan ken xulamî
Dewra xilafetê kanê

Xerîb im bi jana dilî
Çantkê xeman daye milî
Werne ser rêya ‘ewilî
Terîqa[66] rast bo me kanê

[66] Terîq (‘E): Rê.

**BENDAV**

Ey dinya bêbext û xayîn
Te em bo dayne zehmetê
Te bi dawet em lêbandin
Te êxistin nav zehmetê

Meha tirmeh roja sêzdan
Sala du hizar û nozdan
Em çûne gundê Dirbêsan
Kewtine nava zulmetê

Çu zulmet bû li me barî
Roja rohn me kirne tarî
Hawar û sed hizar carî
Ecel hat û bi xefletê

Ecel hat û li me bû sir
Min çûn xwarza û cotek kur
Mesûd xwarza Olcay Ozgur
Bûne rêwingên axretê

Olcay pazde kêm sê meh in
Ozgur salêt wî sêzdeh in
Digel Mesûd sê rû-meh in
Taze berx in negiheştî

Roj kel bû ji germa tavê
Ecel ew êxistne davê
Ew meşyane ser bendavê
Bûne rêwing bo xurbetê

Hisamedîn got Nûrsenê
Tu heram ke xeml û xenê
Heta bêt roja mirinê
Da keyfxweş bin qîyametê

Nûrsen day ke xwedyê rehmê
Sebirker e digel hilmê
Bîr naket bendav û curmê
Heta bêt roja rehmetê

Nûrsen got ‘emrê Rebî ye
Hat bo me rojek tarî ye
Roja reş min bû şembî ye
Ya Reb zexîr bît axretê

Di roja heq û hisaban
Piçûk tên cem day û baban
Wan li terazya sewaban
Day û baban d’ben biheştê

Min daxwaz ji Rebê barî
Me rohn bibin rojêt tarî
Rehma Xwuda ser me barî
Ew zêde ket se’adetê

Ez Xerîb im nesîhet da
Xem û girîn naden fayda
Hûn meşxul bin zikra Xwuda
Da bigehne mukafatê

**BÊWEXTÎ**

Xerîb rabe di bêwextî
Zaliman te kir bêbextî
Zalim hatine ser textî
Bo me l'dinê nema jiyan

Jiyan bo me ye aloz e
Me neman 'eyd û Newroz e
Ciwat lêk naket pîroz e
Kewtne xiyal û xwaziyan

Ciwat dûr ma ji 'adetan
Ji cum'ê û cema'etan
Li dinê û çar qurnetan
Birya hub û rehm û viyan

Rehm rabû ji nav 'alemê
Hemî pêkve kewtne xemê
Vir û qabosê vê demê
Seranser girtiye cîhan

Dinya tev ji ber felişî
Leş û beden ber herişî
Yêt sax bi dujminî kujî
Kewtne hawar û gaziyan

Xiyalêt min tev heriftin
Wesel[67] xilyan ne bi ziwt in
Du sê meh jor nederkevtim
Ew demsal li me bû ziyan

Jiyan li me kirine jehir
Wîrûs hat bi derd û qehir
Nema bo me bêhn û sebir
Cerg û dilêt me heliyan

Dihelin em hemî deman
Xirab hate ser me zeman
Xistime derd û eleman
Birya li seyrana ciyan

[67] Gehên dest û pêyan e.

Nema seyra bi dilxweşî
Nema kenya bi rûgeşî
Bi zoriyê sal nameşî
Şêlû têt awa kaniyan

Awa kanyan li me tal e
Xirap bûn l'me dem û sal e
Ker û gêj in ezman lal e
Neşên siran bikeyn eyan

Gazî û fixan her demê
Derdêt me tên ji 'edenê[68]
Sotin em agirê xemê
Bela wê tên wek reniyan

Bela hatin bi ser me da
Xayînan dewre li me da
Dost û bira l'me bûn cuda
Rehêt bedenî qetiyan

Jêk belav gehêt bedenî
Me cih nema l'wî ewrenî
Dujmin bo xwe me dikenî
Ne giheştine hevriyan

Hevrêyan hêlan li cihî
Me xuya nabît ronahî
Her dem şîn e nabît şahî
Kewtine kokê xaniyan

Xan û mal hemî li dor dan
Mebest ji yekûdu berdan
Bûyne koçer gel revendan
Ne sir-i eşq ma ne viyan

Sir û kovan man di dil da
Nemaman[69] ser li me hilda
Xirab kar kir ji ewwel da
Kewtine çol û berûyan

[68] Tebî'et, felek.
[69] Kesê ku li hemberê mirovî. Dijmin.

Çol û berû me mekan in
Bêcih û war û wetan in
Gurêd çiyan bi me d'kenin
Kewtne daxwaz û hêviyan

Du'a hêvî nabin qebûl
Dil bi kovan her gav melûl
Cih nehatin 'adet usûl
Me nema cihê şahiyan

Bêkeyf û her dem şîndar in
Bêcih û mal û şûnwar in
Her ji Xwuda hêvîdar im
Me dûr bêxît j'xirabiyan

Xirabkar in me xêr nekir
'Umrê xwe da me çu nekir
Xerîb ji dinê fam nekir
Em kewtine dûmahiyan

## BI ÇEND CÎHET[70]

Bi çend cîhet nezerdar bûm
Derman nedît li çu erdan
Ez ji xwe ne xeberdar bûm
Kevtîme nav kul û derdan

Dînyayek bi derd û kul e
insan ji heyatê sil e
Me xweş nebû çu car dil e
Leş û beden me heder dan

Derdêt dinê gelek zor in
Reng û sîmayan guhorin
Çerxa felek dewrûdor in
Têxte benkî şêremerdan

Şêremerdan diket êxsîr
Zengînî zû diket feqîr
Feqîrî ew diket wezîr
Lezet nîn e bo çu ferdan

Vê dinyayê ev e qanûn
Felekê tîr barîn ji gerdûn
Dilêt keyfxweş diket mehzûn
Xweşî nîn e bo çu ‘ebdan

Kes bi dinê nabît keyfxweş
Çerxa felek bîte serxweş
Geh durist e geh ê qeleş
Xirap d’ket tam û lezetan

Tam û xweşyê dibirînît
Xîyalan diherifînît
Tanc û textan wergêrînît
Xilas nabin lêb û fendan

Lewm û lêb gelekan hene
Me hîle û fêl mişe ne
Derdê dinê me gele ne
Xêr û çakî dest xwe berdan

[70] Cîhet (‘E): Alî, rex, hêl.

Xêr wê biryar bûye rîya
Şeref wijdan çûne çîya
Me nema wextê xweşîya
Gelek şolêt xwe zerer dan

Kar û xebat bûne zerer
Ji dinyayê bûne veder
Biryane imdad û mefer
Me neman qewl û xeberdan

Nema cihê xeberdanê
Me cih teng bûy vê cîhanê
Têkçû zurûfê zemanê
Xweşî nîn e li çu erdan

Çu cihan nema rehetî
Xirapkarî û bêbextî
Koç û talan û mişextî
Me gelekê mal û ser dan

Kewtine fitna zemanî
Neman serwet mal hem xanî
Ya Reb tedbîrê tu d’zanî
Xerîb fikr û bîr heder dan

**BI RÊKEWTIN**

Ji Gewerê bi rê kewtim
Berew Enqerê ez hatim
Ji êşan zor nerahet im
Hatim ji bona şifayê

Bo şifa hatme hekîmî
Bi tenê me wek êtîmî
Birim cihekî herimî
Bêhna min li wêrê nayê

Îhtîyac hebû refiqê
Min bibete servêsekê
Peyda nebû şev rojekê
Mabûm di nava xelayê

Paşî bi saya doxtorî
Ez birme qateka jorî
Cih û halêt min guhorî
Hatbûme cihê sefayê

Bû rahetî xwarin hebû
Wêrê min keyf cihê xwe bû
Hurmet wêrê ye zêde bû
Mirovî naden cezayê

Ez ji cezayê xilas bûm
Her şolê bi keyfa xwe bûm
Bi cihê taze pir şa bûm
Şikurxwaz im ji Xwudayî

Şikurxwaz im Rebê mezin
Umêd û sebr bidete min
Êş û xem sivik bin ser min
Nebînim ez vê cefayê

Cefa nebînim çu deman
Derkevim ji kul û xeman
Nebînim derd û eleman
Ez jî carek bikem şahî

Ji dinyayê wextê biçim
Ez nizanim dê çawa çim
Min daxwaz e b'xêr ve biçim
Ez nemînim bo dûmayê

Şahya min li mehşerê be
Kitab li destê rastê be
Qama xêran ye zêde be
Nemînim li nîva rayê

**BORÎN SAL Û ZEMAN**

Min ji dil tên ah û kovan
Li me borîn sal û zeman
Narehet in em her deman
Rohnkên çawan wekî çeman

Rohnkên li çawan hişk nabin
Derd û xem li me kêm nabin
Derûdor ji me venabin
Rahet nînin em çu deman

Çu wextan nîn e rahetî
Her dem keder û zehmetî
Qelb bûne cihê xefletê
Li me tînin derd eleman

Derd û elem tejî erdî
Dizî û talan û cerdî
Kes nabêjît tu çi ferd î
Qedr û qîmet bo me neman

Qedr û qîmetan nanasin
Kî zengîn e ew ‘esas in
Şeref berge û libas in
Jibîr kirin ol û raman

Dîn û ol wêt bûne serwet
Nemaye namus û hesyet
Xerîb pîrî hatye xîret
Bizane em wêt paşda man

**BÛME MESKÛN LI TOKÎYA**

Bûme meskûn li tokîya
Bînayeke wek hisara
Neşêm biçim çi cîya
Mayme li çawrê biharê

Bo min zustana ‘umrî ye
Kar û ‘emel dûmahî ye
Pişmanbûnê fayde nîye
Berew qebrêt çîne xarê

Min roj heft kanûna duyê
Xilas bû sal heftê sêyê
Nemaye cihê hîvîyê
Meh û roj bûn belgêt darî

Evroke sersala min e
Salek dî çu j’umrê min e
Bûme kalek ber mirinê
Min pê dana heftê çar e

Ev sal zustana ‘umrî ye
Ser û rihdin befra spî ye
Çok û milan quwet nîye
Hemî hal kewtme xwusar e

Me bi xwûnsarî ‘umr borand
Me firset ji dest xwe dorand
Çerxa dinê çep zivirand
Bo me nema cihê karê

Kar û bereketa jînê
Wext û xweşîyêt evînê
Jiyarêt çaxê gencînê
Borî li min bû êvarê

Êvarîya wext direng e
‘Umir çu min nema reng e
Digel derdan şer û ceng e
Nemaye keyfa jiyanê

Jîyanek bi derd û elem
Her dem êş û jan û hem xem
Naên ber min pê û qedem
‘Umir siha li ber tawê

Kewtme sala heftê çara
Bûyme kalê ber diwara
Pişt dane min dost û yara
Min birya cihê hawarê

Gazî hawar naên ji min
Kanên dost û hevalêt min
Suwal nîn e ji halê min
Qet yêk naketin pisyarê

Werin carek we bibînim
Ne çi d’xwazim ne çu tînim
Belku xema xwe b’revînim
Kan cerebe ken wê carê

Car bar werin bi dostînî
Bibînin wî dilbirînî
War payîz e kund lêt xwînî
Malan bar kir çûn ji warê

Me mal nema li wê dinê
Karê xwe b’keyn bo mirinê
Xerîb mirye l’ber şûştinê
Bêratib dê çît seferê

Seferî ye rê pir dûr e
Qebr tarî ye teng û kûr e
Xetê hisabê pir hûr e
Cewab çî ye nav xubarê[71]

Di nav qebrêt çala kûr da
Perasû diçin navêk da
Xerîb nîn e gazî nîda
Ji xeyrî zatê Xefarê

[71] Toz û dûman.

**BÛME XERÎB**

Bûme Xerîb bi cahêlî
Şev û roj bi gir û kalî
Jiyan li min kirne cehnem
Bûm êxsîrê pîr û kalî

Ew qet henkufê[72] min nîn e
Ser û rihdin hemî spî ne
Zêhn û bîrêt wê nemayî
Pîrek kewtî heştê salî

Ez kewtime bin lêhîyê
Dayme gel pîrehewîyê[73]
Kît zanît derdê dilê min
Day û baban dame b'malî

Kewtme zeçra[74] kal û pîrî
Her weqtî şînî û girî
Kes li halê min napirsît
Her deman min ax û nalî

Day û baban ez firotim
Bi cerg û mêlak ez sotim
Lêbandim ez bi qederê
Kirme reben wek 'evdalî

Dinya li min kirne zindan
Kalê xirab kewte fendan
Çare û umêd min nînin
Me hawar ma Rebbê 'Alî

Min qêrî gazî hawarî
Feryada min li pêş Barî
Ji xeyrî wî nema umêd
Hawar gazî çine lalî

Min got derdê kiçka bêtab
Da pê zanin dost û ehbab

[72] Hember, laîq.
[73] Hewya pîr.
[74] Ezap, îşkence.

Kes nebînît ewî derdî
Ber giryê wext nîn e xalî

**CEFAKARÎ**

Çi dinya ye zor bi cefa
Nadet kesê ew çu wefa
Kes nabînît tê da mefa
Meqsed nîn e li vê xanê

Ev xan e cihê xiraban
Ne dost têlît ne ehbaban
Hazir nînin bo hisaban
Me çaw da ‘eyş û jiyanê

‘Eyşê dinya me pêş da bir
Me hisaba qebrî nekir
Me j’bîr kir cehnem û agir
Bûn muşterî j’bo mîranê

Bûn muşterî j’bo gunehan
Bi vî ‘umrê sal û mehan
Destê xalî û bêbiha
Bûn feqîr li ber mîzanê

Ber mîzanê destê xalî
De’wedar wê tenê lalî
Xêr nemane ew dinalî
Nemaye cihê xufranê

Cihê sebrê me çu nîn e
Xer û îbadet j’dil nîn e
Gel cînaran reftar nîn e
Hawar nîn e îmdad kanê

Hawar gazî şîn û girî
Zebanî l’dorêt zivîrî
Wê ditirsît ji agirî
Guh de feryad û fîxanê

Binere l’halê miskînî
Bo çi xêran tu naînî
Nîn e bo te çu mizgînî
Nemaye rehma îmanê

Îmandaran dilîy saf e
Nura qelban lê keşaf e
Me miraz e nebît xaf e
Ji xêran nebît uryan e

Bêxêr li wir dil bi kul e
Dost ehbab jê bûye sil e
Derd û keser tejî dil e
Dikewne xem û gumanê

Fikr û guman tirs û wehm in
Bêselat û zikr û sewm in
Xirabkarê di nav qewm in
Bo nema cihê emanê

Me sin'et bûye xew û xwarin
Rûniştin me pîş û kar in
Lewku elem li me d'barin
Ber perçiftin wek hinbanê[75]

Dil û mêlak dişewitin
Eql û fikr me naxebitin
Çu cihan em natebitin
Em wêt bûn ehlê xusranê

'Umir xwusar me xêr nîn e
Kar û 'emel qet çu nîn e
Ber mîzanê me rû nîn e
Di mehrum in ji cinanê[76]

Bûyne mehrum rû di reş in
Pê narabin qet nameşin
'Emelxirab ser bi heş in
Bûyne 'ebdal li meydanê

Qama xêran çu tê nîn e
Çaw bi rondik dil xemgîn e
Bêfayde ye rû çu nîn e
Carek dî nadet îmkan e

[75] Kevlê heywanan yê hişkkirî ye. wekî torban bikardianîn. Bi vî awayî tiştên xwe muhafize dikirin.
[76] Cinan ('E): Cinnet, beheşt.

Bo me firset carek hebû
Îmtihan û ‘umrê me bû
Me ew qimet li bîr nebû
Carek dî naên cîhanê

Ev firsete j’dest me borî
Dinya derbaz kir bi korî
Bo me ma şerm û serşorî
Xirabkar hem peşêmanî

Peşêman in dil bi keser
Bêxêr in me nîn e mehder
Ber mîzanê bûne ebter
Kewtine nava xusranê

Di xusar in bêxêr û kar
Nînin çu imdad û hawar
Mayne li meydanê stûxar
Xerîb imdadê Burhanê

**ÇERXA DINÊ**

Çerxa dinê l’min zivirî
Min nezanî ka çi reng e
Miraza dil necebirî
Wext li min bûye direng e

Aşûtek hat bi ser me da
Min nezanî çi bû xeta
Mulk û derdan me li der da
Li me zeman bûye teng e

Xweşî li me nehêlandin
Keder dilê me da çandin
Gulêt dilê min qetandin
Bo min neman çu aheng e

Kewtine der û kolanan
Me terk kir çûna zozanan
Ji pîran hetta ku canan
Me nemane pêjn û deng e

Babeliskek li me rabû
Wek agirekî dujwar bû
Dilê me j’jiyanê sar bû
Me nemane şewq û şeng e

Felek xayîn dil bi kul e
Dil ji heyatê bû sil e
Li me birya eşqa dil e
Tebdil bûn l’me rû û reng e

Dost û heval min çu neman
Dil kelî ji agrê xeman
Dinya xweş l’me kirne zindan
Me neman çak û çeleng e

Çak û xirab kewtne navêk
Rê ve naçît ew digel yêk
Her dem dibin dijberî yêk
Li me bûye sewt û seng e

Êş û jan kewtne hestiyan
Xwe nagirin li ser piyan
Li me bû wextê xweşiyan
Me dil bûne tejî jeng e

Dil ji qirêj tejî bûne
Demaran de hişk bû xwûn e
Me her dem tazî û şîn e
Me bû daxwaz qebrê teng e

Mirin bo me bûy derman e
Dest naêt karê rojane
Me dil bûy cihê kulan e
Kewtine pêş me asteng e

Engel kewtine berê me
Talan bûn cih û warêt me
Sotibûn xan û malêt me
Me neman zana pêşeng e

Zana pêşeng wêt biryayî
Jiyan li me rawestayî
Kewtin bin renya çîyayî
Me nemaye saz û çeng e

Se' û bizav yê biryayî
Mayn dest û pê girêdayî
Reb tebdil ket wî hewayî
Em nemînin halê teng e

Deng û dewa l'me nemaye
Kewtine ber hurû[77]ba ye
Xerîb im ji rê vemaye
Dinya wê lê bûye teng e

[77] Bayê dijwar, xurt.

## ÇI DIBÊJÎ BO VÊ DINÊ

Tu çi bêjî bo vê dinê
Naîne cih em çu şertan
Hindî d’çîtin xirabtir in
‘Ilm û îrfan me bi qer dan

Bûyne qerdar vê cîhanê
Me nema cihê wijdanê
Nema dinya me dîn kanê
Sefîl in em di ser girdan

Terka ‘emel kirne sefîl
Bêta’et in xar û bexîl
Me nînin çare û delîl
Me kir terka zikr û wirdan

Kan îbadet kanên zikir
Kanên aqil kanên fikir
Hemî tiştêt xwe jibîr kir
Nema karek di nav destan

Şer û ‘ilim me çu nînin
Wird û tesbihan naxwînin
Ne bi his û ne di dîn in
Dîn û dinya j’dest xwe berdan

Hemd û şukur jibîr kirin
Ji rêya heq em dûr kirin
Bi aqlê xwe nafikirin
Xirabkar in hemî erdan

Kanên rica kan hîvî ye
Rêya heq me j’bîr kiriye
Heq û huquq neman cî ye
Li me birin wan bi cerdan

Me dest hêla ji vê dinê
Şola me bû girî şîn e
Berê xwe b’dê qetl û xwûnê
Qurbanî me can û ser dan

Me sin’êt bû xirabkarî
Rojêt rohn me bûne tarî
Hindî d’ken gazî hawarî
Deng nagehîte çu ferdan

Deng û gazî l’me birandin
Qed û qamet nehêlandin
Meta’êt[78] me wan şelandin
Bûn muhtacêt hemî ‘ebdan

Xeberdan me qedexe ye
Hebûna me qet çuneye
Kesek ji me hay j‘kes neye
Dilê me bû cihê derdan

Dil tejî bû ji hesretê
Em nabînin çu derfetê
Kewtine behra heyretê
Xilas nebûyn kul û derdan

Em xiraban xwe ciwînin
Me çaw tiştî ters dibînin
Em hemî d’gel yêk xayîn in
Nema cihê şêremerdan

Merdemêr kewtine xanî
Kes çu j’wî tiştî nizanî
Her kes kewte derdê canî
Wek aşûtek hat ser me da

Kewtine binê renîyê
Nabînin em bînahîyê
Roj bi roj çine tarîyê
Bi direw me soz û sir dan

Bûyn muhtacê hemî tiştî
Kes li me nagirît piştê
Sermaye bo me nehiştê
Ji me naêtin xeberdan

[78] Meta’ (‘E): Mal, serwet.

Xeberdana me çu nîn e
Quweta dînê me nîn e
Du’ayêt me xêr tê nîn e
Hindî me kir kar çu nedan

Me kar nema l’vê cîhanê
Bûyne xirabêt vê xanê
Mayne êtîmêt zemanê
Kesê xwe l’me nekir xwudan

Me Xwuda ma zatê Xaliq
Me du’a ne b’qelbê sadiq
Ji bo dinya nebûn layiq
Naîne cih em çi we’dan

We’d û sozêt me çu nînin
Dilxelel û hem xayîn in
Gel yekûdu sadiq nînin
Me xirabî paşve nedan

Me hawar e l’dergê barî
Rehim ser me bîte carî
Rohn bin rojêt me yêt tarî
Me hisêb ket rêza ‘ebdan

Şola Xerîb du’akirin
Bo wî nêzîk bûye mirin
Hindî hîvî rica kirin
Qet kesekî çu pê nedan

**ÇÛNA TAZÎYÊ**

Rabûm bi qesta tazîyê
Ez çûme hewşa mizgeftê
Rûniştim li ser kursiyê
Min serxweşî da malbatê

Piştî sax û selametan
Kewtne qese û suhbetan
Me dest havête şîretan
Behsê mirin û axretê

Me behsek kir ji mirinê
Bo ewî wextê bi tinê
Çi lazim e bo wê dinê
Min dît yek ket îşaretê

Îşaretan didete min
Hat heta ber kursiya min
Ew çemîya ber guhê min
Şerm nekir ji cema'etê

Ez rabûm ve ji cihê xwe
Min şerim kir ji halê xwe
Çûme lalê hevalê xwe
Tu çid bêy bi îşaretê

Ev e min teqsî înaye
Kurê min evro zava ye
Cema'et hîvya te maye
Em dê biçine dawetê

Wî ez birim ji camîyê
Hilgirtim ez bi teqsîyê
Ez birme cihê şahîyê
Kewtîne nav xedawetê[79]

Giheştin nav dawetîyan
Siwar bûn em li teqsîyan
Kewtîne ser cahd û rîyan
Em çûne cihê xefletê

[79] Xedawet ('E): Xirabî, nebaşî.

Xweş li me kirin pêşwazî
Hind bi zurnê hind bi sazî
Hind tilîlî hind bi gazî
Rûniştîne nik heyetê

Piştî ku sax û selaman
Rûniştin goft û kelaman
Digel nas û xas û ‘aman
Kewtîbûne xweş sohbetê

Rûniştin em sira sira
Hind ber sihê hind çadira
Pîr û can û jin û mêra
Li cihî naken tebatê

Çend sohbetek pêk ve kirin
Saz û zurna bi kar kirin
Govenda xwe rast ve kirin
Were bibîne îbretê

Îbreta dijberî ‘adet
Qamek tazî ya dî dawet
Kê dîtye ew bênecabet[80]
Mirov bi eql rê nabetê

Eve şola eqlî nîn e
Hind bi şîn in hind şahî ne
Hind bi girî hind kenî ne
Lew kewtîne muşkûlatê

Muşkûlat li me dibarin
Em digel yek du neyar in
Bê ‘emel û xirabkar in
Lew nabînin se‘adetê

Se‘adet nebûye nesîb
Bêîlaç mayne bêtebîb
Li cîhanê bûyne xerîb
Kewtîne nav vê mihnetê

[80] Necabet (‘E): Maqûlî, esalet.

Pir mihnet û zehmetkêş î
Sed êş û kovan-nexweş î
Bêkesp û kar û berdoş î
Em kewtîne nav hesretê

Hesretkêş û dilbirîn in
Her du çawan bigirîn in
Em ronahyekê nabînin
Kewtîne behra heyretê

Em li şolan diheyirin
Dûmahiyê nafikirin
Hemî ji yekdu meztir in
Hatîne ser wî haletê

Çi halekê baş me nîn e
Ne kesp û kar ne zanîn e
Hemî wexta dûmahî ne
Em wê nakeyn çi xebatê

Rêya xebatê me nîn e
Leşê me derd û birîn e
Kesê hay ji kesê nîn e
Bi xêr nakeyn kelîmatê

Tekelluma xêr me nîn e
Tev axa yek xulam nîn e
Yek bigotna yekê nîn e
Kewtîne halê mematê

Çi halekê xirabkar e
Dîn û îman bûne par e
Me ne sulh e ne reftar e
Bêzar bûne ji heyatê

Heyat zor e nema xweşî
Tu dilkul bi derd û êş î
Bi êş elem hem nexweş î
Xwuda bidetin necatê

**DAXWAZÎ JI KÊ RA**

Werin hûn guh bidêrin
Ewêt heyî bidayet
Li gotinan binêrin
Kê ra bikem şikayet

Daxwazan kem ji kê ra
Min dost nemane wê ra
Felekê dewrek gêra
Ji me dûr xist hidayet

Ne hadî man ne sadiq
Musellet bûn munafiq
Hewar dikeyne Xaliq
Rawestin ew felaket

Felaket zor zêde bûn
Bo zulmê bûyne zebûn[81]
Rê û derge nevebûn
Me d'barin derd û îllet

Wek baranê derd dibarin
Bi gazîn û hewar in
Dujmin wek gurêt har in
Zêde bû tarî zulmet

Tarî zulmet zêde ne
Cem'a derdan yêt me ne
Bo dujmin şemate[82] ne
Nehêlan mal û serwet

Ne mal maye ne xanî
Kewtine derdê canî
Kesê nekir şivanî
Biryane eql û xeyret

Eqlê seran bû iflas
Gel me nemaye ixlas
Me şol bûne bêesas

[81] Zebûn ('E): 'Êxsîr, bindest.
[82] Şemate ('E): Pêkenîn.

Ji dest me çûne firset

Firset hem li me borî
Bûyne mirîyêt gorî
Ser bilind nabît jorî
Neman bo me çu derfet

Derfet borand nezanî
Bûn ‘ebdalêt zemanî
Naderkevin ji xanî
Me neşya b’ken reqabet

Reqabet dest me nehat
Me nekir kar û xebat
Bûn êxsîrêt nav welat
Me nekirin selahet

Selahet nebû nesîb
Ji dûr ve maye Xerîb
Hîmeta zatê hebîb
Me nebarin musîbet

Musîbet tên ji Xwuda
Em jêk nebine cuda
Lutf û ihsan bi me da
Me pê nezanî qîmet

**DILO BÊJE**

Dilo rabe bo min bêje
Ji derdê canê birîndar
Te ez mirandim dinyayê
Term û laşê min neveşar

Ez rêwing im li dinyayê
Dîn bûme di nav belayê
Kewtme pê te şev û rojan
Carek bi min nebûy dîhar

Te neqşek da ser dilê min
Girêdan dest û pêyêt min
Cîhanê te kirme girtî
Bêxeta te kirim sûcdar

Kirme sûcdarê evînê
Bi saxî ez nakem jînê
Mirî d'girîn bi halê min
Te ez kirme dîn û hejar

Êşan wê daye dilê min
Der bûne dax û kulêt min
Min bo wê nînin çu çare
Derd li min wêt bûne hizar

Bi hizaran derd cema ne
Dil 'embara kederan e
Ferd nizanin ew çawa ne
Bo min jî heq bûye qeder

Bi hizara kewtme derdan
Nîn e derman li çu erdan
Derd û birîn li min zor in
Dilê Xerîb bibû guhdar

## DOSTÊ DELAL

Were nik min dostê delal
Te j'halê min nekir suwal
Min jiyan bû xewn û xiyal
'Umir çû bûy heftê û du sal

Heşt sed û şêst û çar meh in
'Umir çît vêra nagehim
Weku giyay em dibehin
Bo min nema umîd û hal

Mecal û wext bo min neman
Dil kewte ber kul û xeman
Sed hawar û dad û eman
Kewtime ez bûm pîr û kal

Evro min roj heftê sê ye
Heftê kanûna duyê ye
Du hizar bîstê salê ye
Wê bûm kalekî dest-gotal

Bi dest 'esa ez digerim
Ji pîrîyê kor û ker im
Bo nesaxyan bêhember im
Her dem bi ax û nalenal

Ji derdê beden bêhal im
Bêserwet û bêpergal im
Kewtime dest dostek zalim
Nema dostek sadiq li bal

Mal û serwet min heba bûn
'Eql û quwet min nemabûn
Ruh û beden pêkve mabûn
Ew jî li ber yek bûne tal

Talatya ruh û bedenî
Bi 'umrê xwe nebûm xenî[83]
Nema carek ji dil kenî
Êş û xem bo min bûn heval

[83] Dewlemendî.

Bûm hevalê kul û derdan
Derman nemaye l'çu erdan
Nekevme destê çu ferdan
Ya Reb neçim bêqewl û qal

Qewl û qalan cih çu nîn e
Pîr û kalan hurmet nîn e
Dermanê pîrîyê nîn e
Bûme gizîrê[84] nava mal

Dermanê derdê Xerîb î
Şifaya destê tebib î
Çareya wî bênesib î
Nê her tu yî ya Zel-Celal[85]

Xerîb im bi derd û hisret
Bo jînê nema çu firset
Dixwazim xufran[86] û rehmet
Min cih bêt ew firset û hal

[84] Bekçî.
[85] Navê Xwudê yê zîrekatîyê ye.
[86] Anku efûkirina Xwuda ye.

**DOSTÊ SADIQ**

Min dost hebû zor î sadiq
Her dem digel min î wafiq[87]
Dûr bû ji ehlê munafiq
Me suhbet dikir gelek cara

Suhbeta me gelyêk hebû
Ber dostînya babêt me bû
Sidqa me dewama wê bû
Me guh neda çan û kara

Me guh neda wan xiraban
Ber hurmeta day û baban
Hevpeyman bûn her hisaban
Me guh da soz û qiraran

Soz û qerarêt me li cih bûn
Digel yek bi çaw û guh bûn
Ne dûr bûn nêzikî hev bûn
Em nihe bûne wek fîraran

Bi fîrarî bûne jêk dûr
Min erzî-hal kir ji dilê kûr
Ji sihhetê bûyme qusûr
Birîndar im ji cîgerê
Birîn kewtine cergê min
Dost waqif bû bi halê min
Soz dabû bête sera min
Bendê mam subh û êvaran

Min halê xwe bo kire erz
Soz dabû min ser bûye ferz
Neîna cih bo bûye qerz[88]
Mirow tên girêdan bi xeberan

Xeberê xwe daye paşê
Qudeyên bi ilm û şaşê
Zengînê parew muaşê
Li qama dî ew naken karan

[87] Hemfikir, li gel hev
[88] Deyn, qer

Ez dizanim tu yî satî[89]
Xwudan ‘ilm û xweş-ustad î
Her dem tu l’bîra min hatî
Lew li te bûm sitemkaran

Sitemkar im ne bi kîn im
Her dema dostan dibînim
Êşekê li xwe nabînim
Zustan[90] çît min bît biharan

Bihar tête ber dilê min
Hûnik bin derd û kulên min
Quwet têt cok û milêt min
Tême umrê bîst û çaran

Mela Nurettinê Satî
Tu meşhur î l’wî welatî
Bi kar û xêr û xebat î
Bo min nêzîk wekî bira

Nêre l’Xerîbê Gulordî
Eql û fikr cehlê firotî
Bûye pîrek dil pê sotî
Hatime rêza bêçaran

[89] Satî navê gundê dostê seyda ye.
[90] Zivistan

**DOSTÊ ŞIRÎN**

Min dostek heye zor şirîn
Bestevan e yê dilbirîn
Stranbêj e b'işq û evîn
Binase b'navê por befr in

Pirç sipî ye weku befrê
Xwuda b'detê zen û sebrê
Min daxwaz e bibin hevrê
Gelêk sitranan vehûnin

Pêk ve kar keyn em bi hev ra
Wehûnin sitran û şe'ra
Bine xewas nava behra
Em duran jê biderînin

Jê derxin dur û mercanan
Çêkeyn beste û sitranan
Bideyne destê hozanan
Bi dengê xweş bilorînin

Bilorînin bi dengbêjî
Kulêt dilan pê birêjî
Weku ebdal û sergêj î
Xemêt dilan pê b'revînin

Da xemdar xeman sivik ken
Derd û kulan hûnik biken
Car û baran me hizir ken
Demekê me bîr xwe bînin

Gavek bilan me fikir ken
Xem û derdêt xwe hûnik ken
Kul û derdan pê sivik ken
Rehmetan bo me bixwînin

**DÛRÎ WESLET**

Ji wesletê dûr mame ez
Perîşan û dilbirîn im
Bêçare derdgiran im ez
Bi ah û derd û kovan im

Bi ah û derd û fîxanan
Bibîne derd û kovanan
Nemame l'rêza insanan
Wek wehşan çolan dimînim

Kewtme çolan wek wehşîyan
Bûm pepûkê li ser rîyan
Suwal d'kem ji teyr û tuyan
Belku carekê bibînim

Belku carek bibît peyda
Her weku rawan û seyda
Min xilas ket kul û derda
Di vî halî da nemînim

Peyda bîtin carek bi wext
Bo me yar bît talî' û bext
Li me nehêt ew zor û zext
Ronahyekê em bibînim

Ronahyek li me bît peyda
Em verisyan ji nav qeyda
Bi xweşî b'keyn sersal 'eyda
Di cih da rehet bimînim

Rehet bimînî b'keyfxweşî
Bi serbilind û rûgeşî
Ji nav me rabît nexweşî
Ez jî dostan xwe b'ciwînim

Derkevin ji tev zehmetan
Cih bînin ol û 'edetan
Bigrin usûl hem şîretan
Wan 'edetan bicih bînim

Cema kem dost û ehbaban
Dûr kevin em ji xiraban
Bo kes em nedeyn hisaban
Carek dî êşan nebînim

Dost cema bin bi sanahî
‘Ewir biçin bîte sahî
Carek Xerîb biket şahî
Ez nav xeman da nemînim

**ÊDÎ BES E**

Xerîb rabe êdî te bes e
Hişyar be ji xewa xefletê
Te ne dost e û te ne kes e
Ji xeyrê padşahê qudretê

Nekeve nav xew û xwarinê
Bo hindê nehatine dinê
Bikeyn karê xwe û mirinê
Da bigehne wê se’adetê

Rêya se’adetê j’bîr kirin
Me terka ferz û sunnet kirin
Xêrat û sersal me nekirin
Bûyne tarîkêt îbadetê

‘Ilm û îbadet me çu nîn e
Helal û heram ferqî nîn e
Me bawerîb dînê xwe nîn e
Em kewtîne nav xîyanetê

Me xîyanet kir digel ferdan
Xirabî û xeybeta ‘ebdan
Me cih nemaye li çu erdan
Çare nîn e evê ‘adetê

Ev ‘adete hetanê kengî
Dê bimînîtin bi vî rengî
Dilî paqij ken ji nav jengî
Neken kînê û hesadetê

Kîn û hesûdiya nav dilan
Barek giran e li ser milan
Xweşiyê nadete hamilan
Dûr diket ji rêya axretê

Me rêka rast li xwe bezre kir
Me bêbextî li qewmê xwe kir
Me bi vî halî çu kar nekir
Em dûr mayne ji merhemetê

Merhemet ligel me çu nîn e
Rehm û ‘edalet gel yêk nîn e
Xirabî û kerb û hem kîn e
Me birya rêya bereketê

Kar û bereket nîn e l’nav me
Fitne û fesad bûn karê me
Çu rê nemane li berê me
Xwuda bidetin selahetê

Selahetî me wê birandî
Tovêt xirabyê me wêt çandî
Bi sed hîle û fêl û fendî
Bûne şaqîyêt[91] vê ‘ummetê

Bûne şaqîyêt vî zemanî
Me nemaye umêda canî
Biryan ‘adaleta insanî
Kewtîne jiyara wehşetê

Bo me jîyar hewayî nefs e
Em qet nabêjin êdî bes e
Me daîma dinya hewes e
Xwuda xêr biket aqubetê

Me aqubet bête ser xêrê
Xerîb tê dem nema li wêrê
Bo dujmin bûn berxê ber kêrê
Xwuda xilas ket ji zilletê

Hindî ku dibînin zehmetan
Terka wan usûl û ‘adetan
Kes guhê xwe nadet şîretan
Hemî kewtine pê firsetê

[91] Şaqî (‘E): Eşqîya, rêgir.

**ÊŞ Û JAN**

Dil sojît bi êş û janê
Nîn e ew hal ket tebatê
Kewtme gazî û fîxanê
Hekîm nadetin cewabê

Ji min tên hawar û gazî
Sebr û tebat min çu nîn e
Têk werbûme di nav êşan
Bi van derdan û ’itabê

Her dem di nav êş û kulan
Ez kewtime derdê canî
Di nav derd û kulan im ez
Dê ji kê b’xwazim hisabê

Dê danime nava xetê
Da dilbirîn wê bixwûnin
Bizanin derd û êşêt min
Da hişyar bin ew ji xabê

Hisaba derdan min nîn e
Dê helgirim dilê xwe da
Dê bimînim digel derdan
Dê bêxme rêzêt kitabê

Ji xew rabin bi hişyarî
Bilan rêka xwe ron biken
Bînin jîna evê dinê
Da nemînin wekî babê

Nemînin ew bêxêr û kar
Rêka heqyê ew bizanin
Bi nezanî neçne heşrê
Akubet da b’çin turabê[92]

Hekim şaş e ji derdê min
Ew li rexêt min zivirin
Çare nîn e bo wî derdî
Ji ber wê naken xitabê

[92] Turab (‘E): Ax.

Xitab naken gelek derd in
Nîn e dermanê wan derdan
Dê çi b'kem çu çare nînin
Ew direvin ber cewabê

Dergê nexweşxanê vekir
Li nivînê kirme mehkum
Mirin dana ber pîyêt min
Berê xwe b'de vê 'iqabê[93]

Her yek fikrekê d'bêjîtin
Nîn e yêk gotina yekî
Wehman tîne ber dilê min
Bi wihe dil tena nabî

Dil nesax e zor bi kul e
Hekim agir ser hildiken
Dişewitît di gavê da
Tiştek nîn e dil pê şa bî

Kewtime nav bend û qeydan
Dest û pê bendim ez dîsa
Di wan 'eyd û 'erefatan
Wer carek tu bi sewabê

Xerîb daxwaz berew malê
Di nava wan rojêt xêran
Gel cinar û 'eqrebayan
'Eydê keyn xêr û xitabê

[93] 'Iqab ('E): Ezap, ezîyet.

**ÊTÎMÊ JAR**

Min ew dît bi çawêt rondik
Ne xanî heye ne kolik
Wî ne berge ye ne solik
Bûye xazok li nav sûkê

Wî dest dirêj e yêt xwazît
Yêt kene girî û gazî
Hemî jê bûyne ne razî
Maye b'tenê bi biçûkî

Ma hizreta nan û avê
Zengînan çaw vê nakevê
Gava bînin jê dûr kevî
Ew ji Xwudê şermê nake

Dewrek hatî çend zalim e
Feqîr jar rût û êtîm e
Kes gel naket lam û cîm e
Nîn e gel wan biken çakê

Çakî l'bîra kesê nema
Ne cahil ne jî 'alima
Kewtine kibra çalima
Gel feqîr naken xêrekî

Zalim û çend bêinsaf in
Çu hed û hudûd nanasin
Bêbingeh û bêesas in
Lewku ew naken karekî

Agah kes ji kesê nîn e
Zengîn haj ji feqîr nîn e
Hemî lêk bûyne xayîn e
Kes nadet kesê behrekê

Kar û bereket nemane
Tehdîla erd û insan e
Heq û huquq çu nemane
Wergerya çerxa felekê

Kar û bereket me neman
Dinya l’me bû kafiristan
insanyet nema l’çi cihan
Kes pisyar naket carekê

Kesê pisyar bi kes nîn e
Bêşol in hemî birsî ne
Aramyek di nav da nîn e
Kes xwe nagrît li barekê

Kes agah nîn e j’feqîrî
Bûne reben wek êxsîrî
Kesê xatir nema l’bîrê
Hemî mayne hîvya karî

Kes bernadet karê xêra
Rastî peyda nabit b’zêra
Her kesekê derdek pêra
Tu peyda nakey dostekê

Dost û biratî nemane
Her kesek çaw li lêbane
Ne wextê soz û we’dan e
Herek diket direwek e

Direw bo me bûne sin’et
Lêbandin wê bûye firset
Bêşermî yê bûye ‘edet
Herek peyda d’ket rêkekê

‘Edetêt xirab tev hene
Sûc û guneh tev eve ne
Xirab ji çakan zêde ne
Xerîb pê nabet fikrekê

Xerîbê dilbirîndar im
Bargiran im pê nikarim
Bo vî halî zor fikar im
Me xwar hat çerxa felekê

## FELEK DÎSA

Felek dîsa te çerx danî
Li me ferman rakir îro
Xem û keder ser me anî
Roj li me tarî kir îro

Bi navê firqete zerbek
Yan te hebû gel me kerbek
Te we kir digel me herbek
Zerba giran danî îro

Te zerb dana gelek mezin
Di malbatê da mêr û jin
Hemî bi wî derdî d'sojin
Te cuda kir Xelîl îro

Te cuda kir bi punhanî[94]
Qeder bûye wî zemanî
Çu naêt destê insanî
Bi 'umrî şa nebû îro

Çi insaf e çi wicdan e
Felek qehra te çawa ne
Karê te qetl û talan e
Te l'me ferman rakir îro

Nîn e isyan me l'pêş barî
Em mutî'[95] in bi her karî
Ya Reb rehma te bibarî
Me sebir wacib e îro

Sebir bît l'ser musibetê
Xwuda def'eket afetê
Ruha Xelîl[96] çît cennetê
Bexşîne b'edenê îro

Mizgîn bît cenneta eden
Ew cuda bû cism û beden

[94] Tiştê veşartî.
[95] İtaetkerina bi her karî.
[96] Birazayê seyda ye.

Bû tarikê[97] mulk û weten
Hate ber rehmetê îro

Giheşt ber rehmeta barî
Ya Reb ron ke qebrê tarî
Beden heram l'mişk û marî
'Umrê xwe şa nebû îro

Nebît zehmetkêşê qebrê
Qebir bo bît cihê sebrê
Melek jê ra bibin hewrê
Pişmanê cih nebît îro

Nebît pişman di çi wextî
Cih cennet bît li ser textî
Bi rehmet bûye mişextî
Xerîb hêla b'tenê îro

Pişman nebît bo dinyayê
Xilas bû j'erdê fenayê
Giheşte mala beqayê
Bar kir ji dinyayê îro

Du hizar bîst îlon bîst heşt
Mêrdînê ecel pê giheşt
Bûye rêwing berew biheşt
Kovana dil Xelîl îro

[97] Terkkirin.

**FEQ EHMED ZEYDÎN**

Feq Ehmed bi navê Zeydîn
'Ilm û fiqhek baş dizanîn
Di 'ilmî da ew yê zengîn
Wi lê nekirbû xwudanî

Got di 'ilmî da zengîn im
Bo xwe reqîban nabînim
Li muhîtê[98] yekemîn im
Min dana muhra xwendinê

Wî gelek kirbû feqatî
Laîq bû ji bo ûstadî
Li wî xweş nehat melatî
Meslek girt bi bazirganî

Tercîha wî bû tîcaret
Cema kirin mal û serwet
Îraq û Îran bû yêk xet
Wî li bin pîyê xwe danî

Bin pîyê wî bûn sê dewlet
Geryan bo xwe kirbû sin'et
Kirîn firotin bûn 'adet
Tucar bû ewî zemanî

Kewte nav kar û xebatê
Dûr ji tehsil tedrîsatê
Geh li Îraq geh welatê
Heta dawî li jî anî

[98] Muhît ('E): Derdor, hawirdor.

**FESLA BEREKETÊ**

Me hat fesla bereketê
Jê ra bêjin ev havîn e
Ji bo xelkî wextê şolê
Ew bo me qehr û tawun e

Tawunek ser me da hatî
Wergirtim ji kar xebatê
Nema l'min rêka heyatê
Dil û mêlak tev birîn in

Birînêt min cerg û dilan
Quwet nema çok û milan
Kewtime nav êş û kulan
Min nemaye halê jînê

Hal û jîyan l'min xirab bûn
Bi kovanan muptela bûn
Keyf û xweşî l'min xela bûn
Her dem kul û xem û şîn e

Kewtme kuncê xestexanê
Xerîbek im vê cîhanê
Aciz bûm l'xwe û jîyanê
Hal û keyf û jîn min nînin

Kewtme şerê mirn û jînê
Ji demaran d'kêşin xwûnê
Çaw hişk nabin ji girînê
Sihet xweşî min borîne

Bêsihet bêtab û jîn im
Nexweşê b'êş û birîn im
Her wext ecêbekêt bînim
Kewtme xemêt ji mêje ne

Xem û derdêt min ji mêj in
Pê ve mayme her dem bêjim
Ji ber derdan ker û gêj im
Çawan d'rêjim aw û xwûnê

Me xwûn kewte cerg û dilan
Kewtime bin êş û kulan
Ruh û beden weku salan
Mîslê min zêrih çu nînin

Ew êş neçîte wehşîya
Hirç û gur nebin ser çîya
Ber nahewin li çi cîya
Min taqeta êşan nîn e

Bûm exsîrê dest hekîma
Şev û rojan bin seroma
Bûm pêkeynê gef û loma
Em b'vî halî şemate ne

Dujmin ser li me helandî
Bi hîlan em êt lêbandî
Ehmeq mane hem nexwandî
Bi îftiraw sûnd bext nîn e

Rebî necat lê birandî
Ne ji bo Reb ne bo 'ebdî
Xwudan-eqil pê bûn bendî
Xêr û kar bo kes çu nîn e

Xerîb im dikem xeberdan
Guh bi dêr in gelî merdan
Nebne namerd gel çu ferdan
Mal çû insan nav dimîne

**GERYAN**

Geryanek min kirye dûr e
Qestî j’canê min doxtor e
Havîn e germeke zor e
Roj disojît wek bihar e

Roj dikelijît bi tawê
Min zeryek dît wekî awê
Ziravbilind e bejna wê
Bi ism û navan Öznur e

Rewneq girtye wê ji nûrê
Qet lê nabînî qusurê
Rehma dil wek behra kûr e
Şol û qewlan mutaber e

Şewq û rehm e hindî bêjî
Şekir ji lêvan dirêjî
Hemî halan laîq hêjî
Her şolekê bêqisûr e

Bêqisûr laîq û rind e
Şikl û sîman weku find e
Şirîn û law hem ye rind e
Kan zumrûd e yan feyfor e

Bi min zumrûd û enqa ye
Bala bilind û le’la[99] ye
Wek sosina ser şaxa ye
Her gav l’min neyê zuhûr[100] e

Her dem nabînim bi zahir[101]
Min bi wê hey gelek bawir
Wê d’gel min nînin çu tewir[102]
Min meraq ji dilê kûr e

[99]Me’denekê gelek bi qîmet e. Herwekî mucewheran e.
[100] Dîyarbûn, berçavbûn.
[101] Dîtbar, berçav.
[102] Eleqe.

Ji kûrya dil ah û nal im
Nexweşekêy bêmecal im
Li nexweşxanê dinalim
Bûm laîqê qebr û gor e

Bûm laîqê qebristanê
Nîn e taba nexweşxanê
Dil dikelît wek buryanê
Şîfa bo min êdî dûr e

Dûr bûm ji halê şîfayê
Tab nakem qehra dinyayê
Me ‘umir kewte dûmayê
Li pê me hisabek kûr e

Wextê hisaban wê hatî
Nehêle bo gaveka dî
Belku firsetê b’te nadî
Xirabyan tu bîne bîr e

Xirabyan hindî ku bêje
Hemyan lalî xwe pavêje
Xerîb kula dil birêje
Mirnê nînin çepûçûr e

**GÎYADIRÛN**

Li me hat wextê havînê
Dest havêt gîyadirûnê
Bi dilxweş pêk ve diçinê
Kespa helal xweşya jînê

Min tirpan hilgirt bûm pale
Wek adetê hemî sal e
Min zor pê xweş e ev hal e
Keyfek xweş bû di wê hînê

Me xem nedzanî ka çî ye
Şol û kesp û palehî ye
Ka te çend texe dirûye
Xeber nebû me j'cîhanê

Dinya hind bû hindî me dît
Roja betal ji bo me 'eyt
Harikarî ji êk didît
Hingê hebû mirovînî

Mirovînî hingê xweş bû
Dilê insanan yê geş bû
Heyat hingê ye pir baş bû
Nebû cihê kerb û kînê

Bo bêçaran zibare d'kir
Şolê gund bi hevkarî d'kir
Bi xeberê rihspîya d'kir
Gel yêk bûn mirin û jînê

Yêk nesax ba hemî lalî
Avahî netmane xalî
Mer û malat bi helalî
Kerêt pezê d'hatne danê

Çêl û pezêt xwe didotin
Şîr û penîr netfirotin
Xwe b'rîyakarî netsotin
Sade bû heyat zemanî

Jîyana xweş me hingê d'kir
Xiyanet gel yêk-du netkir
Kuran babê xwe red netkir
Dinya wan cihê seyranê

Bûkan xwesû nedkirne der
Kur ji baban nedbûn veder
Me nebûn ew kul û keder
Me ew jîyane dizanî

Xêr û bereket gelek bûn
Kur û bab jêk bir nedibûn
Xatir qîmet gel yêk hebûn
Mal maldarî û şîwanî

Suhbet meselêt mezinan
Sitare bû bergê jinan
Şede poşî û kesrewan[103]
Zirawbilind û ciwanî

Zînet beden berçaw kirin
Şerim ji holê rakirin
Hukmê Xwuda inkar kirin
Bi singê rûs çûn geryanê

Serkol û milrûs dimeşin
Bi wê rûsîyê dilxweş in
Nav alemê di rûreş in
Dê çi bên roja mîzanê

Hindî jin bi nav namûs in
Nihet serkol pelek-rûs in
Bi mislê teyrê tawûs in
Xerîb bo neke gumanê

[103] Şede, serpêça jin û mêran tê gotin. Poşî û kesrewan jî serpêçên jinan tê gotin.

**HAT BIHAR ZOR DIRENG E**

Hatî bihar zor direng e
Me nema şekl û ne reng e
Nefes çikya nema deng e
Beden helya nema seng e

Me bihar e wextê cotî
Dil heliya cîger sotî
Bê peygar[104] in bêzireet
Xirab bûne ‘urf û ‘adet

Erd kêlan me wê birandî
Cahil mayne em nexwandî
Mer terk kirin gund û xanî
Me bû daxwaz kerê nanî

Ga û cot ê me biryayî
Zewî mane nekêlayî
Cot û kotan[105] me nemane
Dexl û dan li me biryane

Kespa helal zor bereket
Cot, kêlan û hem zire’et
Me nemane ga û gêre
Zekat birya nema xêr e

Me karê baş zire’et bû
Gelek xêr û bereket bû
Genim nema li coxînê[106]
Cihê me bûy gola xwînê

Nanê helal li me birya
Bûyne koçer hemi cîya
Çu car em nediman mehtil
Bereket li me d’bû hasil

Dexl û dan û beql û nok e
Kixso kartol tıwr û silk e

---

[104] Bêdezgeh.
[105] Amûrekê erdkêlanê ye.
[106] Cihê ku genim lê kom dikin.

Şiwtî û gundor û bacan
Me diçand hemî li baxçan

Dar û fêqî oncew giya
Genim bilind nabît zeviya
Xêr û bereket nemaye
Dexl û dan li me xela ye

Me birandin mer û malat
Xirab bûne war û welat
Nemaye xweşya xwezayê
Zeman bo me hat dûmayê

Bergê beden me bû dujmin
Kewtne sûkan hem mêr û jin
Bab û kur û kiç û bûk e
Wan mesken cahdeh û sûk e

Kewne şehrî hemî berdoş
Newexarî bûne serxoş
Ya Reb halê me tu d'bînî
Gêj û mest hayl xwe namînî

Me xweş nîn e ew bihare
Xwuda l'halê me b'ket çare
Bêt ser me rehm û 'edalet
Me hebît xêr û bereket

Xêr û bereket nazil bît
Rihetyek li me peyda bît
Xerîb ji Xwuda bû hîvdar
Wesîla xêrê bît bihar

## HATÎ BIHAR

Hatî bihar nema befir
Şew sahî ne roj bi ewir
Erzaq nema çaw û şekir
Weqt û dem li me bûn qehir

Qehir bûn me weqt û zeman
Li me hişk bûn awêt çeman
Dem û wext li me çu neman
Fêqyê daran me bû kevir

Fêqî li me hat daxwazan
Bûyne muhtacê pîwazan
Nanê genim hat mirazan
Me nemane bêhn û sebir

Sebir nema kewtne derdî
Cot û kêlan nema l'erdî
Kur bêjte babî çi ferd î
Me bû daxwaz mirin û qebr

Mirin xweştir e l'wê jînê
Her dem çaw diken girînê
Xeyam[107] nema li cojînê[108]
Her gaw li me zor û cebir[109]

Kewtine bin zor û zulmê
Mer û malat[110] neman qewmê
Birya doyê meşka çermê
Çan û kar li me bûn agir

Agir kewte dewr û dorê
Pez êdî naêt guhorê
Me terk kirin warên jorî
Biryan sertû û jajk û bir[111]

---

[107] Genimê hûrkirî.
[108] Cojîn, cihê genimkutanê ye.
[109] Tişta ku bi zorî tê kirin.
[110] Mer û malat anku pez û heywan.
[111] Giyayê ku dikine nav lor û penîrî.

Genim nema bûne tayîn[112]
Rastî nema bûne xayîn
Xesû û bûk pêkve najîn
Lêk bûne dujmin bab û kur

Rehim nema bab û kura
Kewtne pê yêk wek sixwura
Lêk naborin eyb û sura
Têne têne yêk şûr û keybir

Şûr û keybir kewtne holê
Kes bo xwe naket çu şolê
Leyze ber dengê daholê
Dawet e serçopî min bir

Dawetî ne em her demê
Çi hatye serê wê qewmê
Jinan havêt perda şermê
Mêr tebdîl bûn kiçêt bakir

Mêr û jin ji hev ferq nabin
Kiç û kur bi hev ra nabin
Agir barût vêk ra nabin
Zeman me bû dewrê axir

Çi b'ket Xerîbê Gulordî
Mam daxwaza gay û cotî
Bûn muhtacê kûtek sotî
Girde û kade l'min bûn bezr

[112] Nanê somin.

**HAWAR JI DESTÊ FITNEKARAN**

Hawar ji dest fitnekaran
Hesûd xirab û neyaran
Wê l’me cema bûyn wek haran
Em jêk dûr kirin pê zordaran

Hesûd kewtne navbeyna me
Wan xirab kir reftara me
Bûn manîyê evîna me
Ew şermê naken çu caran

Wan şerm nîn e li ser rûyan
Tub’et wekî yê wehşîyan
Bûn qurbana gurêt çîya
Naken hindî wan zeraran

Hirç û gur hind xirab nînin
Kîn û kerbêt wan çu nînin
Jîyana xwe didomînin
Jêk bir naken dost û yaran

Fesadîya wan çu nîn e
Wan dijberî tub’et nîn e
Tecesus wan fiîl nîn e
Nebûn fêlên xirapkaran

Xirabî karê wan nîn e
Xiyanet digel da nîn e
Daxwaza wan tenê jîn e
Nebûn tabi’ xerezdaran

Xirabî insanan pîş in
Bo day baban derd û êş in
Bêdîn rojî û niwêj in
Nebûn serokêt dîndaran

Bi ezman gelek di baş in
Hem heval û arkadaş in
Şirîkxweş û hem sirdaş in
Hetta key gazî hawaran

Me hawar ji Rebê mezin
Parastna xwe jê dixwazin
Ji insanên dilxeraz in
Me hafiz ket hemî caran

Xerîb im bi derd û birîn
Heyat xweş e pêkve bijîn
Nebin wehşî yekdu kujîn
Neşkênin dilê dildaran

**HECIYÊ JIN LÊ MIRÎ**

Heciyekê jin lê mirî
Wî rum havêt meydanê
Xwudê wêj lalî birî
Bi pîrî rabû jinxwastinê

Mal bermal yê digeryêtin
Jineke ciwan divêtin
‘Umrê wî l’bîrê naêtin
Bûye laîqê mirinê

Bi ‘umrê heştê salan e
Didan devî da nemane
Derkeftî j’halê jinan e
Bûye kewtar li wê dinê

Kewtarekî beden-kevil
Lê nemane fikr û eqil
Bedenekî bi derd û kul
Tu bo xwe hazir ke kefenê

Heciyekî xwudan pare
Wî berûk tejî dolar e
Peyda kir feqîrek jar
Kiç jê stand bi qelen e

Pîrî b’xeberê kes nekir
Jin bajartî wekî şekir
Bûk xemiland sor û zer kir
Kire dawet li salonê

De’wetî dan xelk cema[113] kir
Zengînek bû xelk tama kir
Qad û salon wî tejî kir
Nema cihê rûniştinê

Bûk li hubbayê rûniştî
Hecyê kal li ber teniştê
Cihê henkufyê nehiştî
Çawa digel hev ken jînê

[113] Komkirin.

Lê bilind bû dengê sazê
Hecî rabû bi tolazî
Girte govendê şehnazî[114]
Şaşik şor kir ser difinê

Şaşka sor li serî xwar kir
Desmal hejand û li ba kir
Dewrek govendê temam kir
Qelbê wî kewte lêdanê

Qelbî lêda lêv lerizî
Milet kevte xar û bezê
Qut kirin wan dengê sazê
Hecî birne nexweşxanê

Hecî b'nexweşxanê ra gihandin
Hekîm li dorê werhatin
Bûk di bin xêlyê[115] da hêlandin
Ew kewte fikr û gumanê

Bûka delal hejde salî
Digel heciyê pîr û kal î
Kan hewserî kan hewalî
Bo nema keyfa jiyanê

Bûk li bin çarêyê b'girîne
Babî pare wergirtîne
Bo keyfa wî mani' nîn e
Yê d'ket hisaba dukanê

Babê bûkê tamahkar e
Çaw tarîbûn ji bo para
Kiçkê nemabûn çu çare
Diket feryad û fîxanê

Deng û gazî ji bûkê hatin
Pîr û berbûk pê werhatin
Serpêç ser çawan havêtin
Dîtin rûyê wê ciwanê

---

[114] Serfirazî, serbilindî.
[115] Çarik, dersok.

Gotin sed heyf û mixabin
Kiçêt wehe peyda nabin
Day û babêt çend xirab in
Mislê wê kêm in li cîhanê

Got qedera îlahî ye
Tu jî pê bibe razî ye
Bo wê çu çarêd dî nîye
Digel hecî b'ke jiyanê

Hecî kewte qirîza dilî
Qelbê hecî naşuxulî
Hêla ew bûka xemilî
Hecî anîn serom danê

Hecî nesax bûke jar e
Dawetiyan şîw neware
Jêk belav bûn tarûmar e
Xerîb aqubetê Xudê d'zane

**HEQÊ BEŞERÎ**

Evroke dehê kanûnê
Bû roja heqê insanan
Berê xwe b'de wê qanûnê
Wê tên kuştin nav dukanan

Bo kuştinê zor kar kirin
Bi çend curan çek çêkirin
Kêmya xerdel hazir kirin
Ji bo kuştina ciwanan

Serwet hemî kirne silah
Ew kuştinê bînin mubah
Çu caran ew nabin iflah
Binêre tu l'nexweşxanan

Salek e dinya heyirît
Mirin têt qet narawestît
Çu çare bo peyda nabît
Me nedît se'ya dermanan

Nexweşxanan cih çu nîn e
Kes canê xwe emîn nîn e
Millet hemî tew birsîne
Kewtine derdê jiyanan

Tirsa birsîn û mirinê
Musellet bûye ser dinê
Nexweşxane tên girtinê
Ji eqlê wan qudemanan

Aşî derman peyda nabin
insan li xwe xwudan nabin
Dijber wîrusê narabin
Kewtne dawet û salonan

Tazîye salon wek berê
Qelebalixe her derê
Em êxistine kederê
Nema keyfa sal zemenan

Zeman hate me b’tawunê
Şûna şahyê kewtne şînê
Naçin paş ji rêtna xwînê
Kuştin û bimbardiman e

Bo kuştinêt muheyya ne
Çek û silah di cema ne
Bo sihhedê bêdewa ne
Biryan xwudanêt wijdanê

Wijdan nema bûne zalim
İnsaf birya neman ‘alim
Kes nefsa xwe nabît hakim
Bû cihê qetl û talanan

Bo insanan bûne pale
Bo nehêlan mulk û mal e
Ka pirsa heram helal e
Xweşî nema çu demsalan

Bera xwe b’de Xutba Veda
Nebîy nesihet bo me da
Ew mucubê[116] ‘emrê Xwuda
Hûn bînne bira insanan

Beyannama ewrenselê
Nebî ferman kir j’ewelê
insanîyet pê d’kemilî
Guh neden sozên dujminan

Dujmin daim me d’lêbînin
Ewên d’bêjin cih naînin
Her dem li gel me xayîn in
Nabine dost çu zemanan

Dostînya wan ye xwusar e
Dujmin in wek gurê har e
Fırsetker in hemî carê
Nabin dostêt musulmanan

[116] Îcabet.

Gerek ‘emrê Xaliq bigrin
Wan muşrikan dost negrin
Muşrik bo me wek agir in
Hîlekar in wek şeytanan

Bûne şeytanêt dinyayê
Mu’min êxistne xelayê
Her dem bene ser belayê
Dişelînin me b’talanan

Bo kuştinan dest helînin
Çek û silah ceribînin
Bo sihhetê derman nînin
Ew e karê bêwijdanan

Insaf wijdana kafirî
Mu’minan dîn serî firî
Ji kafiran xirabtirê
Be du’akerê mu’minan

**HEST Û BÎR**

Êş û nexweşî zêde bûn
Kewtme naw fikr û xiyalan
Reng û sima l'min xirab bûn
Min kir bîra wan hevalan

Ew hevalêt cehêlîyê
Me xuşke d'kir ser kevîyê
Bûyne reweng gel bêrîyê
Nergiz kirin me j'nihalan

Nergizêt sirta Kevya Pîr[117]
Jinan wêrê sîyabo dikir
Gulberanan xemla xet kir
Me kirin bîra alalan

Ew alalêt li Baska Xanê[118]
Bêhna catrê û rihanê
Pancarçin kewtne dîlanê
Şêxanîye danga malan

Şêxaniya rast û çepik
Cahêl hat me b'şel û şepik
Li ser milan sor bûn cuxik
Bû wextê hatina palan

Pale tên giyadirûnê
Ew emelê wê havînê
Hîn bûn warêt Kend Bahdînê[119]
Seyrek xweş bû bin reşmalan

Palan bêhn da tên meydanê
Pîr û can kewtne holanê
Bezbol ew bûye l'cîhanê
Emrîka welatê felan

Wî wextî ez cahêl bûm
Ber ciwanyê tejî hur bûm

[117] Navê zozaneke wê heremê ye.
[118] Navê heremê ye.
[119] Navê heremê ye.

Bi se'[120] û geryan û gur bûm
Xweş bû geryan gel riwalan[121]

Seyra wan sirt û nizaran
Kerêt mih û berx û karan
Koçber bûne li ser waran
Ew adetê hemî salan

Nihe ne war ma ne mexel
Ne kanî man û ne sîpel
Hemî yêt bûyne gomexel[122]
Ew cih hemî kirne talan

Ne sûsin man û ne solîn
Ne kew mane û ne hêlîn
Bo pezê xelkî bûn palîn
Bû cihê gîsk û kewalan

Ew der bûye cihê amê
Em jê nagirin çu tamê
Nemaye cihê encamê
Xerîb sojît bo wan halan

[120] Tevger, hereket.
[121] Heval, genc.
[122] Cihê komkirina hêwanreşan e.

## HEVALÊ WEXTÎ

Min wextî da hebûn heval
Nihe kes ji wan nabînim
Dûr bûn ji min naêne bal
Mayme we b'tenê dimînim

Xwe dane paş hemyan ji min
Bûn nehis û dijberê min
Nizam çi sûc dîtin ji min
Niha ji wan dûr dimînim

Dûr mayîme bêdost û kes
Biryan li min keyf û hewes
Sîne bo dil bûye qefes
Ez dê sebrê bi çi înim

Pirs û suwal ji min nîn e
Dinya bo min yê rohn nîn e
Deng û gazî min çu nîn e
Di hicranê xerîb mînim

Mayme nav teng û bela yê
Kanên xwudanên wefayê
Her çi dişêt det cefayê
Ji derdê wan dilbirîn im

Çend dûr bî ji dost û kesan
Dê rihet bî j'xwar û xesan
Tu nabînî derdêt wesan
Hingê j'derdî tena mînî

Derd hesûdya eqreban e
Hindî dişêy dûr be j'wan e
Tu nekeve telka wan e
Qet neşêm jê dûr bimînim

Ewê ji pismam dûr mayî
Rahet dijît li dinyayê
Her çi nêzîk yêt cefayê
Di nav wan da dilhezîn im

Hesûd nahêlin bim dilxweş
Dilê hemyan jêk kirne reş
Nav eqraban nabin rûgeş
Xweşyê dûr ya wan dibînim

Ne j'eqreba ne ji dostî
Bawir neke tu b'duristî
Ba yêk ji wan nîn e rastî
Her dem ji wan ne emîn im

Emîn nebe tu j'nû dostî
Hemî hal yê l'me guhistî
Dê te gurin hêlin postî
Êdî tu wî qet nabînî

Dostêt sadiq çu nemane
Dostêt xayîn ew bela ne
Telka ber pîyê çaka ne
Her dem ew dê te lêbînît

Ew dostê ku li pê hîlan
Gel têt kewte fend û fêlan
Heta çi cem te nehêlan
Êdî l'dûryê jî nabînî

Dost pisyarê êdî naket
Mala min êdî nas naken
Ji dûr ve jî nezer naken
Nihe j'dostan dûr dimînim

Dost sedaqet xirab bûne
Hevalêt rast me nemane
Çare umêd l'me biryane
Di nav taryê da dimînim

Xerîb ma bêbehs û pisyar
Tenê maye bêdost û yar
Pîr e neşêt biket çu kar
Dostê sadiq Xwuda bînim

**HEVPEYVÎN**

Were da em bikeyn peyvan
Me nînin seray û eyvan
Ew baxê min nadet meyvan
Payîz hat û hemî hişk bûn

Sêv û hirmî û wan xoxan
Nema keyfa şeng û şoxan
Kewtine ber zext û zoxan
Hasilatê mehrum mabûn

Ew gula min ya sor û zer
Xûs û xûnav kevtiye ser
Ji wan gulan neman eser
Ew ji xîyalêt xwe dûr bûn

Min gul çandin gelek rengan
Bilbil li ser naket dengan
Sixar kewte ber û bengan
Rihan weryan hemî hûr bûn

Rihan hişk bûn per bo neman
Ser me da hat bayê xeman
Bo me nema keyfa deman
Kul û kovan li me kûr bûn

Birîn kûr in derd giran e
Ne ku şola çend peyvan e
Xema dilan zor punhan e
Bêhn û sebir li me çik bûn

Sebir nema ez tab nakem
Bêhna gulan ez his nakem
Fikr û xiyal bezre nakem
Gulêt dilî sernuxûn[123] bûn

Ez ji cih û waran kirim
'Umr û salêt min kurt kirin
Xwe ser pîyan ez nagirin
Bîrînêt dil zor wêt kûr bûn

[123] Sernişîv.

Dinyayê da me cih negirt
Xiyala qelbê min herift
Me heyat çû bi zext û xift[124]
Mah û sersal min çu nebûn

Kanê ew mah û rojêt min
Ew de'wa û hem doza min
Ew ehd û peymana d'gel min
Digel qehrê ew bezre bûn

Bezre kirin qedr û qîmet
Barîne ser me musîbet
Ne qanûn ma ne şerî'et
Çand û huner nav me rabûn

Me nîn e çanda qewmanî
Xet û qelem me bîyanî
'Ezmanê daykê nezanî
Rêkêt jînê me nemabûn

Rêka jînê winda kirin
Bi eqlê xwe nafikirin
Bo çi em dersêk nagirin
Di nav dewra xirab werbûn

Dewr û zeman zor xirab in
Xayînêt 'eslê bêbab in
Ew çu car ji me venabin
Weku guran bo me har bûn

Wek haran rabûne ser xwe
Ew nanasin xwudanê xwe
Wan derd maye berûka xwe
Hemî tiştêt wan winda bûn

Winda kirin wan erka xwe
Nebûn xwudan li 'esla xwe
Kar nekirin wê fesla xwe
Xerîb pêş ve kovandar bû

[124] Xift ('E): Tirs.

**JIYARA DINÊ**

Were wî tiştî bizane
Nebe xafil tu ji wan e
Tu dê b'bînî ecêbyan e
Jîna dinê ye çawan e

Jiyan xweş e b'keyfa dilî
Çû nebin gazind û gilî
Dil û mal pêkve b'xemilî
Êş û eleman nebîne

Dinya xweş e bi sihhetê
Mal û serwet gel quwetê
Bo jînê rihê didetê
Xeyrê wê dinya çu nîn e

Sihhet li min xirab bûye
Saxî nebît mal bo çî ye
Wext û deman dilkulî ye
Xêra jiyanê çu nîn e

Hatme bi qesta şîfayê
Kewtime nava cefayê
Girtme li hucra cezayê
Dewa nîn e derd zêde ne

Girêdayme bi cîhazan
Ez neşêm bikim daxwazan
Min nema cihê mirazan
Şîfa bo vî halî nîn e

Nema şifa bûye ezyet
Ev acîle l'min bû zehmet
Ji min çûn bîst û çar se'et
Birim bo cihê emîn e

Ew dem û hal l'min guhertin
Beden û ruh bûne rehet
Bo min bûne cihê sihet
Tiştê xirab verê nîn e

Ez rehet bûm ji zehmetê
Bûme nesaxê dîyetê
Gel min hatine şefqetê
Zehn û fikir kar kewtine

Zehn û fikir hatne karî
Ser min da çu wextê tarî
Xweş kirin dilê wî jarî
Sebr û sihet min hatine

Eqlê Xerîb hate karê
Nedît ew rûnête xarê
Ji subhê heta evarê
Rawestan qet min çu nîn e

**KAL Û PÎRÎ**

Were dîsan tu di wextî
Zeman çû û bo me nema
Nebûn hevkar digel bextî
Sal borîn û ‘umir nema

‘Umir hat û li me borî
Befrê girtin serêt jorî
Me nêzîk bû çûna gorî
Helya beden quwet nema

Li evrazyan bêhn ye teng e
Sernîşîvî çokan keng e
Çaw nabînin te çi reng e
Dîtna çawan bo te nema

Nav hestîyan dohn helîya
Quwet nema dest û pîya
Neşêy tu biçîy çu cîya
Bo geryanê taqet nema

Hindî pirs dikem dermanî
Pîrî hat û min nezanî
Êşa li gehan da canî
Demar hişk bûn xwûn tê nema

Êş û janêt nav bedenî
Tu yêt girîy xelk yêt kenî
Bûyne kurîşk rû û enî
Rengê ciwan bo te nema

Zêhn û beden gel yêk nîn e
Axivin te guh lê nîn e
Êşa hêstîy goştî nîn e
Xweşya beden bo te nema

Pişt ye kûr e mil di xul in
Çok lerizin çaw melûl in
Guh ker bûne bêmijûl in
Eqlê serî bo te nema

Qelb şeqî ye cerg birîn e
Gûrcîsk her du kar kewtîne
Mîde ûlser xwarin nîn e
Xweşî sihet bo te nema

Ne xwarin e ne te xew e
May bi derd û êşêt xwe ve
Kêm û têr xwarin wek hewe
Tama xwarnê bo te nema

Heb û şurûb kar tê nînin
Bo pîrîyê derman nînin
Dostêt berê te nabînin
Kul û kovan te bûn cema

Pirç werîya ser ê rût bûy
Didan kewtin lêv yêt şor bûy
Geh yêt têk çûy bejn yê kurt bûy
Qameta rast bo te nema

Diaxivî qîmet nîn e
Hatin û çûn hurmet nîn e
Çi b'key bêjin ew yê dîn e
Zêhna berê bo te nema

Gel gopalî te pê sê ne
Şew û rojêt te tinê ne
Bergê beden nadet têhn e
Xwûna kel beden da nema

Li çu cihan tu nahewî
Nav civatan naaxivî
Jor da mayî dernakevî
Seyr û geryan bo te nema

Yê te dixwurin kur bûk in
Te heval nevyêt biçûk in
Qedexe kolan û sûk in
Be'î bazar bo te nema

Çawa zû çûn sal û zeman
Bihar havîn tu nav xeman

Her çar dem sal bo te zustan
Xweşya salan bo te nema

Li te birya xweşya dinê
Tu mayî çawrê mirinê
Xwuda berê nebet jinê
Xweşî jiyan bo te nema

Gava yêk mir yêk dimînît
Xewn û xîyalan pê d'bînît
Hest ket xwe vê ra gehînît
Mal ji qebrî pê ve nema

Gotna min pîran ra nîn e
Cahêl îbretan bibîne
Çare hebît tu cih bîne
Yê li pêş me hat kes nema

Gotinêt wan kal û pîran
Şiretên zana xebîran
Hûn wan neben zêhn û bîran
Eqildaran cih bo nema

Nesihetên min bîr neken
Gotinêt rast hûn red neken
Neheqîyê gel xwe neken
Peşêmanan cih bo nema

Hindî kesêt peşêman in
Lew mekar û dilkovan in
Bendîyêt eqlê nezan in
Wext û firset bo te nema

Heçyê firsetê bît wafiq
Ew nîmete têt ji Xaliq
Bicih bînît dilê sadiq
Xema dilî bo wî nema

**KANÊ BIRATÎ**

Werin gelo kan biratî
Dost me neman bû cudatî
Kan sedaqet kan wefatî
Hemî bûyne faydê zatî

Her kesek karê xwe heye
Dostanî mal ser fayde ye
Kan sedaqet li kî ve ye
Nema rastî l'nav ciwatê

Ciwat nema l'qaydê berê
Gotna rast nema l'çu derê
Ji ber kewtine keserê
Nema cihê selahetê

Dost û wefa bûne direw
Çak û xirab bûn tevlihev
Hîle dizî firar û rev
Nema cihê seadetê

Nema cihê jiyara me
Cudatî kewt navbera me
Nagirin em çu emcaman
Bûye cihê xiyanetê

Xayîn kewtine nav me da
Em hemî jêk bûne cuda
Sed awaz û deng û seda
Kes wê guhê xwe nadetê

Kesê guh çakiyê nîn e
Bira l'gel biray xayîn e
Pismam gel pismam bi kîn e
Nema cihê eqrebatî

Eqreba eqreb û mar in
Xwudan kîn û xwudan jehr in
Bêzerer ji te nabohrin
Kan insaf kan mirovatî

Ew hesûd û dil bi kîn in
Gel yekûdu di xayîn in
Heqê eqarîbî cih naînin
Nik wan nîn e sedaqetî

Sedaqet wê li me birya
Bin qurbana gurêt çiya
Hatine rêza wehşiya
Ispat in bi heqiqetê

Mirov mirovan d’firoşî
Aşkera d’ken bêserpoşî
Bo wihê nînin çu xamoşî[125]
Ispat in bi besîretê

Heqiqet e li ber çawan
Hemî halan têxne dawan
Şermê naken j’dîtna çawan
Kewtine nava xefletê

Di xafil in wek zaliman
Guh naden gotnêt ‘aliman
Wan dest ser darê ruman[126]
Bo şerî gerin hecetê

Ewan fikir şeraret e[127]
Xirabî û hesadet e
Nîn e taba selahet e
Kewtine nav delaletê[128]

Xeflet bo wan bûye ‘adet
Kîn xirabî û rezalet
Nîn e wan şewqa îbadet
Kewtine nava zulmetê

Hidayetê ew nanasin
Aşiqê fexr[129] û libas in
Teb’et hişk û bêesas in

[125] Bêxeber.
[126] Rum: Alekete şerî ye.
[127] Şerxwaz in.
[128] Anku keftine nav tarîtîyê.
[129] Xwe mezinkirin.

Kewtine nav şeqawetê

Kewtine ber fêl û hîlan
Gel hesûdan û bexîlan
Dest j’xirabîyê nehêlan
Dûr bûne jinsaniyetê

Ji halê beşerî dûr in
Xwudan fisq[130] hem û ficûr in[131]
Ji heqiyê gelek dûr in
Bûyne ehlê xiyanetê

Xayîn in digel qewmê xwe
Bezir kirye wan rêka xwe
Nizanin ‘esaleta xwe
Bûne korêt qiyametê

Xerîb im derdê xwe dirêjim
Sotîyê gelek ji mêj im
Ez heqiqetan dibêjim
Nîn e wê cihê heyretê

[130] Fasiq.
[131] Ew mirovên zulmê bi şiddetê dikin.

**LI SER KIRINÊN MIROVÊN VÎ ZEMANÎ**

Were bira tu guh bidê
Ji insanêt vî zemanî
Yêt keftne xewa xefletê
Wan jibîr kir muslimanî

Muslimanî ewan hêla
Mulkê dinê xeflet kêla
Tovê cuhlê[132] çand û hêla
Bera xwe da bo meyxanê

Berê xwe dan xirabîyê
Naçin nêzîkê çakîyê
Nezanî rêka camîyê
Mirin bîra xwe neanî

Mirin nehate bîra wan
Di meşqûl bûn hemî gavan
Qumarkirin bû fêla wan
Çi ji axretê nezanî

Bo axretê nekir çu kar
Nivêj nekirin wan çu car
Bûne munkîr ew hemî car
Xwarin rojyêt remezanê

Remezanê rojî xwarin
Direw û sûnd pîş û kar in
Wan mesken qahwe û bar in
Nivêj çi ye wan nezanî

Nivêj çi ye wan nas nekir
Li ser masan wext berze kir
Pîrî hat wan şerim nekir
Fîl û ferez[133] kaxezanê

Sin'et okêy û domîne
Wextê diçît hal xwe nîn e

[132] Cuhle ('E): Nezan, cahîl.
[133] Fîl û Ferez: Navê leystikekê ye ku jê re dibêjin Santranç.

Hec û zekat borandîne
Şehda wan li ser ezmanî

Şehda wan çi fayde neda
Xwe ji xirab paşve neda
Şerm nekir ji zatê Xwuda
Bûne şirîkê şeytanî

Şeytan bûye rêberê wan
Bû mani'ê 'emelêt wan
Direw û sûnd in karê wan
Rûniştin cihê şeytanî

Rûniştina wan qehwe ye
Ne cema'et ne cum'e ye
Dibên şertî dilê me ye
Melan ew tişte nezanî

Dibên mela gêrîcî ne
Em yêt nihe medenî ne
Dublek min vexwar çu nîn e
Gel hevalan bi mêvanî

Mêhvanî û de'wet kirin
Şûşêt vîskê xalî kirin
Nehate bîra wan mirin
Ku dê çine qebristanê

Nehate bîra wan qebir
Îşê wan bû zor û cebir
Wan ne insaf e ne sebir
Nabin xwudan li 'ezmanî

'Ezman bela serê wan e
Ne şeref e ne wijdan e
Ne hesyet e ne îman e
Mehrûm ji 'emrê Qur'anê

Qur'an nedizanî çiye
Ne tewbe ye ne hîvî ye
Agah ji 'emrê Reb nîye
Hîs nekirin çu pişmanî

Peşmanî fêlêt xwe nebûn
Bang û sela guh lê nebûn
Ew dijberî dînê xwe bûn
Jibîr kirin musilmanî

Musilmanî ewan hêla
Ji pîran heta cahêla
Dest havetne hemî fêla
Şehwetperest û heywanî

Şehwetperest heywansifet
Ne tesbîh e û ne ta‘et
Ne bext heye ne ‘edalet
Milet ji wan d’ket emanê

Milet diket zarî ji wan
Faîz û riba şolê wan
Şîret eser naken li wan
Bûne munkirêt zemanî

Munkirya xwe ew nizanin
Heramî helal dizanin
Di sefîl û perîşan in
Borandin ‘umr bi xusranî

Bi ‘umrê xwe ‘emel nekir
Bi sefîlî wext berze kir
Qîmeta ‘umrî fam nekir
Heba kir ‘umrê cîhanê

Te ‘umr bi xusranî borî
Ji kar û xebatan dûr î
Çi qas te hebin qusûrî
Hewar ke xwedyê Xufranê

Bi nezanî ‘umr wê borî
Tu nezanek bi qusûr î
Hîvî bike ji Xefûrî
Xerîb tu bixwe nezanî

**ME DERBAZ BÛN SAL**

Me derbaz bûn sal û zeman
Derdê dilê min giran e
Kewtine nav derd û xeman
Min nezanî hêj çawan e

Zeman çû û ez çu nebûm
Weqît borî her wek xwe bam
Derd û xeman da bezre bûm
Çare hekîm min nemane

Hindî d'çît derd girantir in
Hal û wext l'me xirabtir in
Bo me nêzîk bûye mirin
Dinya bo me bûy wêran e

Difikrim halê dinyayê
Hindî ku tête dûmayê
Xirabtir e ji berayê
Nagirît ew çu encam e

Roj li ser me wê d'xeyirî
Tarî zulmet diewirî
Yê xayîn bûy bab li kurî
Paqil[134] û rêber nemane

Li me bûye mij û bager
Tarî bû me roja enwer
Wext e bên ser me ax û ber
Me xanî û war berdane

Terk kir warê bab bapîran
Nehe li me bûye zindan
Pêş çawêt me bûn çolistan
Nevêt biken seyra wan e

Bi wî derdî bûne bedbext
Me nemane umêd û wext
Gel koçeran bûyne mişext
Deşt û çolan bûn rewan e

[134] Bi aqil.

Bûyne bextreş bê xan û mal
Dest me naêt kespa helal
Me dûr kewtin mal û ‘eyal
Derdê dil li me giran e

Hindî dikem nabît xweşî
Bêkar û bext û rûreşî
Rastî diçim wext nameşî
Her kesek çaw lê hîlan e

Dinya bi hîlan rê naçît
Bi xirabyan dirust nabît
Hetta xayîn rast rê nebît
Dinya nabît ew seyran e

Seyran biryan bûne qefes
Keyif biryan nema heves
Zulm û zorê nabêjin bes
Nema jîyara binsan e

Jîyar nema kerb û kîn in
Dil bi kul û hem xemgîn in
Em hîvya jiyanê nînin
Cîhan bo me bû wêran e

Werane ye kavlê xirab
Nemane me dost û ehbab
Dil bi xem in ciger kebab
Kula dilan zor giran e

Rê û rastî bezre kirin
Çak û xirab ferq nekirin
Rêka qedîm bezre kirin
Xerîb te derd bêderman e

**ME HAWAR E**

Min ji dilê kûr hawar e
Kewtime nav şîn û zar e
Dest nezanît dîn û har e
Me pê nebirin çu çare

Dê çi keyn j'destê nezanan
Derkevtin j'rêza insanan
Bibin qurbana heywanan
Bûyne wekî gurêt har e

Hilm û şefqet wan çu nîn e
Direwîn hem hileçî ne
Misliman pir lêbandine
Lew me dil jê bûye sar e

Îbretan ji wan nagirin
Ma nizanin ku dê mirin
Sûc û isyan nafikirin
Em jî bi wan bûn şermzar e

Ya lazim ew e hişyar bin
Bi mirinê em guhdar bin
Ne j'wan kesêt bêqerar bin
Dêp çin peya çi b'siwar e

Axret e mala heqîqî
Peyda ke bo xwe ref û rê
Nebe dûr ji wê terîqê
Wêrê nebe bendewar e

Soz û we'dan bicih bîne
Dilê kesê neêşîne
Dinî bo kes nedorîne
Li rêya berê b'zivire

Her kesê aqil hebîtin
Ew dê ser ehda xwe bîtin
Eslê xwe cuda nabîtin
Rêya dî gelek ya dûr e

Vê dinê neke bar piştî
Gelek wek te wê yêt kuştî
Li ser dînî ew ne hiştî
Zengîn mezin fuqare

Bab û bapîrêt me kuştin
Kesek jînê da nehiştin
Me destê j'canê xwe şûştin
Me dil jê nebûye sar e

Bo me meqsed bûye dinya
Rehm û rahet ser me birya
Kewtine nav xem û girya
Bêdînî l'me bûy dîyar e

Dinya zevya axretê ye
Cih ji bo kar û xêrê ye
Carekê det firsetê ye
Bizane dinya mirar e

Xwudan-eqlan dinyadarî
Bo axretê îna karî
B'ken hisaba qebrê tarî
Xwe bi xêran ken stare

Wê dema heq û hisaban
Xwendina defter kitaban
Dê bînin çakan xiraban
Kî xwudanê i'tibarê

I'tibara j'bo wê rojê
Bo kesê neçîte dojê
Agir qet ewî nasojê
Ew dê li wir bît dîhar e

Ew kesêt teqwa wî hebît
Ew mutî'ê Rebê xwe bît
Dê b'rûyek spî jê xilas bît
Dê l'siratê çît suwarî

Min li te sed car nesîhat
Bo Xwudê b'ke zikr û ta'et

Be tabi’ê ‘ilm ‘ibadet
Da nebî j’ehlê xwusarê

Yêt xwusar bêîtibar im
Ber mîzanêt şermûzar in
Ew in yêt bêsoz qirar in
Dê bine ehlê seqerê

Xerîb bê‘ilm û îbadet
Min nînin zikr û îta’et
Hatme ber dergê ‘edalet
Nekey mexdûr pêş neyar e

**MELA KEREM**

Kerem kar kir bi ikramê
Kitab dana bi ilhamê
Cefa kêşa ji bo ‘amê
Fidakar e di vê rê da

Fidakar û mucahîd e
Bi mislê mah û xurşîd e
Ronahî daye muhît e
Xebatkar e di dewrê da

Xebatkar e li ser şolê
Şew û rojan ew li holê
Di behsê raman û olê
Te nav hêla di ‘esrê da

Di ‘esrê da tu navdar î
Çu wext nekirin xusarî
Sebr û sebat xêra carî
Dem û gavan di şolê da

Se’y û ‘emel dîhar kirin
Xet û kitabet çêkirin
Xwe bi dinê da naskirin
Nemir mayî di dinê da

Nemir mayî li cîhanê
Nebûy xusarê vê xanê
Zeman neçû bi kislanê
Zor çalak î di olê da

Di olê da tu serwext î
Qelem gêra bi xweşbextî
Çand û hunera vî wextî
Te destnîşan bo xwe lêda

Te mohr dana kitabetê
Xebatkarê se’adetê
Xwuda zêde ket xîretê
Berdewamî di holê da

Berdewamî tu her gavê
Xwudanê se’y û bizavê
Wekî rojê didey tavê
Te zuhur bît di şerqê da

Ji şerqê ta gehî xerbê
Qelem helgirt ji bo hebê
Şerê cehlê nabît zerbê
Hest û fikr di kitabê da

Hest û fikir dîhar bibin
Sir û se’adet kar bibin
Çak û xirab dîhar bibin
Bûy ronahî di xêrê da

Tuy ronahya rêya tarî
Pir zehmet û cefakarî
Xerîb heye ricadarî
‘Emel nemînît navê da

**MELA TEMER**[135]

Ey seydayê Mela Temer
Hem zana yî hem tu serwer
Min j’te nezanî çu xeber
Ey ‘alimê b’ilm û rehber

Gelek zeman ji tey dûr im
Ji bedenê xwe b’qusûr im
Bo geryanê zor mexdûr im
Vêt wergirim ji te xeber

Keyf û halê te pisyar kem
Di vê ‘eydê xêrek kar kem
Du’ayekê j’te rica d’kem
Tê cih bibît hewza kewser

Te mesken bît kewsera baqî
Horî ji te ra bibin saqî
Binoşî tu bi muştaqî[136]
Da l’dilê te nebît keser

Kesera dil cennet bîtin
Mekan bo te ‘eden[137] bîtin
Cînar bo te Hebîb bîtin
Heval ‘Ebubekr û ‘Umer

Te cînar bît Hebîbullah
Muşahid[138] bî Cemalullah
Tu meşxul bî Kelamullah
Digel ‘Usman Elî Heyder

Digel şeş sehabêt guzîn[139]
Wan eşerêt mubeşer in[140]
Digel Hesen hem Huseyîn
Bi refaqetya Bîlal û Ebazer[141]

[135] Dostekê seydayî bû. Ew jî berê mela bûye.
[136] Heyranî, evîndarî.
[137] Navê cineta herî jorî ye.
[138] Anku tu şahid bî bi dîtina Xwuda.
[139] Anku sehabên meşhur, yanî yên nêzîkên pêxember.
[140] Ew deh kesên ku hêj di saxîya xwe de mizgînîya cinetê bo hatine dayîn.
[141] Sirdaşê pêxemberê Xwuda bû.

Tevahê sehabên guzîn
Em jî digel refa wan bin
Ber mizanê nebin xemgîn
Şefa'eta xeyr'ûl-beşer

Şefa'et bibîte nesîb
Vexweyn ji kewsera hebîb
Qebûl bibît du'a Xerîb
Bo xatra nebîyê ekber

Bo xatra nebiyê axir
Sed menzil dûr bin ji agir
Muaxiz[142] nebin b'kebair[143]
Nemînin bêxêr û xeber

Xeber didem bi şîretan
Hindî dibêjim qissetan
Dûr nemînin ji rehmetan
'Efya Xwuda nebin veder

Xerîb bes ke j'xeberdanê
Xwe hişyar ke l'wê cîhanê
Nemînî ehlê nîranê[144]
Nebîy rû-eswedê beşer[145]

[142] Dadgeha guneha mezin.
[143] Guneha mezin.
[144] Navekê cehnemê ye.
[145] Eswed tê wate reşîyê. Rû-eswed anku rûreş.

## MELAYÊT GULORD MALA XELÎFE

Mezintir zatê ‘ilimdar
Xelîfe bû l’vî dîyarî
Hem ‘alim û hem terîqdar
Meşhur bû li vî welatî

Ew xwudan sir û kiramet
‘Ilim bo xwe kirbû serwet
Bû îcraker bo şerî’et
‘Abid bû bo îbadetî

Xelîfê Şêxên Nehrîyê[146]
Ehlê terîqet wê rêyê
Meşhur bû li evî cîyî
Xwudan ‘ilm û fezîletê

Mutesewuf û muderîs
‘Alimekê ji Xwudê tirs
Bo mala şexî bû berpirs
Salikê ser terîqetê

Sofîyê rêya heqîqet
Rehberê ‘ilm û re’îyet
Qaziyê hukmê şerî’et
Xwudan qelbê besîretê

Bapîrê Mela Mihyedîn
Mela Hesen û Huseyîn
‘Alimêt mezin jê rabûn
Rehberêt dîn û ummetê

Niştecih li taxê Xazyan
Xwudan mulk û xwudan mekan
Meşhur bûn der wext û zeman
Bêxeber im ji qisetê

[146] Navê Mela Xelîfe yê rastî “Xanemîr” bûye. Di serdema Şêxên terîqata Nehrîyê de jîyaye û di nav karûbarên terîqata Nehrîyê de cih girtîye. Ji ber vê jî jê re “Mela Xelîfe” gotine.

**MULTECÎ**

Were seyra multeciyan
Pîr û biçûk û sêwiyan
Rûs û pêxas û birsiyan
Li me heram bûye jiyan

Birsî û rûs û pêxas in
Bêcih û war û libas in
Bêkes û warisnenas in
Hemyan derge girtin li wan

Evro bîst û heftê adar
Sal du hizar û bîst bihar
Dinya bo wan zulm û xedar
Bêumêd çare û perişan

Esker polîs lê dixwurin
Ew b'çawêt melûl d'fukirin
Ronkêt çawan dil ker kirin
Kan insanî kan musulman

Musulman tev biban bira
Kewtne ber bextê kafira
Wan mumîn dan dest gawira
Secde û rukî ku ve man

Musulman lêk bûne dujmin
Gel kafir biran dikujin
Hemî xwûna yek du d'mêjin
Dewir bûye yê zaliman

Zulim hetta nihayetê
Xwuda d'barînît afetê
Fen û 'eqil rê nabetê
L'wan bezre bû serê riyan

Aqildaran rê bezre kir
Wan çu hisab gel xwe nekir
Ew afat li ser xwe heq kir
insan li pêş heyirî man

Dinya şaş bû ma heyirî
Rêveberan reng xeyirî
Tirs û xeman ‘eqlê birî
Gêj û mest in hemî ciyan

Li cîhanê bûy zelzele
Bêbizav û kel û pel e
Rom û ûris çîn û fele
Hemî kewtine nav xeman

Ewêt gotin em Cebbar in
Xwudan-teknîk û pur kar in
Bi quwweta xwe dijwar in
Şaş bûne ew di perîşan

Şaş bûne ji ber wîrûsê
Amerîka Çîn û Rûsê
Dujminêt dîn û namûsê
Dîn çû û nemaye wijdan

Xwudanêt fen û teknîkê
Bûne mehkum di gavekê
Neşên bibînin çarekê
Hemî pêkve bûn sergirdan[147]

Pêkve şaş û hemî gêj in
Xwûna muminan dimêjin
Musulmanan ew dikujin
Bo kesê nehêla jiyan

Fitna wan bûy tejî erdî
Zulm û xedra li ser ‘ebdî
Ji wan d’kêşin hemî derdî
Nîn e bext û namûsa wan

Insaf û dîn wan çu nînin
Dujminêt insan û dîn in
Hîlekar in me d’lêbînin
Me d’barînin jehr û bomban

[147] Nezan.

Em bi hîlêt wan tên kuştin
Rêka jînê l'me nehiştin
Zalim bo hevkar û pişt in
Tanc û text lê bibne wêran

Xwuda tirs da dilê wan e
Xew nakevît çawêt wan e
Bendî man dest û ziman e
Ew disojin dil bi kovan

Dilkovan in b'wê keserê
Di zalim in li her derê
Kiryarêt wan bêne berê
Xwuda firsetê nede wan

Xwuda firset jê bistîne
Dilê me ji wan bi kîn e
Ya Reb zulm bo wan nemîne
Zivirîne ser serê wan

Multecî hatne bîrkirin
Ber wîrûsê ew terk kirin
Bênan û aw xwe d'zivirin
Mane we ber gaz û bomban

Xarna wan bombe û gaz in
Bêumêd û bêmiraz in
Îmdadê j'kafiran d'xwazin
Birand hêvî j'musulmanan

Musulmanan jî dikuştin
Destêt xwe ji dînî şuştin
Qur'an sunnet cih da hiştin
Bûn qatilên wan mûmînan

Mûmîn kujerê mûmînî
Ew didete dest dujminî
Xwe xwûna wan kirin xenî
Wan dîn li xwe kirne wêran

Şaşk û cubban nabin mûmîn
Xwûnrêjên zor in ew mezin

Pîr û biçûk ciwan û jin
Bêsûc helal kir qetla wan

Qetl û aman ken cîhanê
Dijberêt 'emrê Qur'anê
Bûne Fîr'awnêt zemanê
Wan ne dîn heye ne îman

Wan dîn îman tac û text in
Lewku zalim û bêbext in
Cengêz û Hîtlerê wext in
Wek wehşiyêt dehl û çolan

Yêt bûy qatil bûne wehşî
Aşê wan zulmê dimeşî
Cîhanê nehêlan xweşî
Wan kar qetl û zulm û talan

Ji ber zulmê bûne koçber
Hemî ji xanyan kirne der
Mal û emlak dest dana ser
Serwet û mulk bo nehêlan

Derxistin ji axa wan e
Ew bixwe çûn cihê wan e
Zulma giran li ser wan e
Mirov disojît halê wan

Kirne derê ew bi zorê
Bi saxî êxistne gorê
Gazî keyne Rebbê jorê
Defê ket zulma bêeman

Dinya cihê zaliman e
Bo feqîr nema jiyan e
Ya Rebî em bêmewa ne
Dûr kirin ji mulk û malan

Çetek înan navê da'êş
Zulma wan tejî erş û ferş
Bo me nehêlan jîn û eyş
Dûr bûn erdê hizar salan

Talan kir eywan û mal e
Ew cihê çend hizar sal e
Jê revîn bêcil û pal e
Sotin wan seray û eywan

Namûs û serwet hindî mal
Qetl û amel me kir helal
Derbeder bûn şuphê ebdal
Heq û huquq li kî ve man

Heq û huquq me çu nînin
Dîndar in em di emîn in
Mixabin gelêk xayîn in
Hemî ber me diken hîlan

Hemyan lêba xwe l'me kirin
Em mezheban parçe kirin
Bi lîsanan parve kirin
Pêkve bo me telke danan

Dane ber me wan kemîn e
Em lêbandin navê dîn e
Gelo heqê te çu nîn e
Navê me da gel xiraban

Çen sal bezre me kewkeb[148] e
Felek li me xar û çep e
Li me xayîn çar mezheb e
Me d'xapînin hemî qaman

Çar mezheban em lêbandin
Lîsanan em peritandin
Kok û binyat me qelandin
Zulim naêt çu hisaban

Zulm û zora nav islamê
Cîhan êxist nav xemamê[149]
Fîr'ewnek rabû li Şamê
Zulma wî geha esmanan

[148] Stêr.
[149] Mij.

Zulm û şedadê cîhanê
Vê carê rabûl Tahranê
Bo dinê d’xwazît meydanê
Dujminê dîn û insanan

Bûne qatîl ew û hevkar
Li me dujmin her çar diwar
Me d’kujin bi zulma xedar
Bo Fîr’ewnî bûne Haman[150]

Bendkê kuştnê li stûyê me
Şûrê qetlê ser serê me
Nîn e umêd û gazya me
Xerîb gazî l’Rebbê rehman

[150] Vezîrê Fîr’ewnî ye.

**MUXTARÊ GUNDÎ**

Me muxtar rakir ji gundî
Cahil û hem zor nezan e
Bêoxir e wekî kundî
Rû diwarê mehkeman e

Rûtirş û naw-çaw girê ye
Çawê wî l'fend û hîlê ye
Naket pisyara kesê ye
Her gav hîvya ruşwetan e

Ruşwetê zik kir dahol e
Bo gundî nekir çu şol e
Kar û îş wî qereqol e
Her kes ji wî bi guman e

Her kes ji wî bêumîd e
Tejî xwe ye kibr û tund e
Bêt ez im muxtarê gund e
Kî ye bêjît ne wesa ne

Kî ye rabît hemberê min
Nîn e kes bît dijberê min
Kes naşkênît xeberê min
Qewl û gotin ne ya wan e

Bêyî min kes naket şolê
Dê b'kêşime qereqolê
Min ser xwe danaye holê
Muhr li destê Ehreman e

Xwudanê muhrê muxtar e
Xwe rast bike nebe xwar e
Te zor malê xelkî xwar e
Bi zext û zor û gefan e

Tu l'gundî kewtiye gefa
Ewan nede ber hedefa
Bo te namînît ev sefa
Tu rojek dê bî pişman e

Dê bî pişmanê gundiya
Tu neke şola wehşiya
Bo gund çêke cad û rêya
Ew e xizmeta insan e

Tu muxtar î ke xizmetê
Tu newergire ruşwetê
Te hey me'aşê dewletê
Li kes nekeve lêban e

Navê muxtaran te pûç kir
Ji hevalan şerim nekir
Xîyaneta muhra xwe kir
Reşlekeya muxtaran î

Lêb û hîle te bûn sin'et
İnsaf nema digel te qet
Muhur her tiştî hel naket
Ew şol ne laiq wicdan e

Muxtarî direwker nîn e
Te xwar rûn û hingiwîn e
Dilê te gel wan xayîn e
Ew hevkaryê sûtaran e

Muxtar derkewt bû ji xanî
Ew çû cem wî komutanî
Dê ket behsê kîj kesanî
Şeref wicdan nik nemane

Şeref wicdana muxtara
Bûye cemakirna para
Wan guh nemabû l'cînara
Ye wehe ye şola wan e

Muxtaran şol bûne sexte
Nemane wicdan û bext e
Gundî ji ber bûn mişexte
Digel gundî bi de'wa ne

Dibêjît muxtarê gundî
Min got bi ciwan û rindî

Ji te d'xwazim cotek hindî
Te bo nekir herêndan e?[151]

Mirîşk û hindî nemabûn
Gîsk û kavir yêt winda bûn
Muxtar 'eza l'hev cema bûn
Dê xwen malê feqiran e

Feqîrêt bêmal û serwet
Bo jînê wan nîn e firset
Muxtarê lê kewtye derfet
Feqîran gazîw fîxan e

Feqîr nema rêka jînê
Muxtar gel kewtiye kînê
Çaw tena nabin j'girînê
Bûn xerîb derdê 'eza ne

Wan bo gundî çu nehêla
Xwarna wan bû doyê çêla
Muxtar pê texsîw modêla
Dinya namînît bo wan e

[151] Qebûlkirin.

**NEÇARÎ**

Ez gelek neçar û dîn im
Min fikir bêhed yê şaş e
Bîr û hizran cih naînim
Min eqil her dem li paş e

Di her karî dûmahî me
Ji zanînê ez b'xalî me
Xiyalan da vemayî me
Gel eqlê xwe nebûm aş e

Min gel eqlî şêwir nekir
Çawan çi dît ew fikir kir
Ji zêhn û eql xwe veder kir
Min gel eqlî kir sewaş e

Eql bi başî nehat şolê
Bi nezanî kewtme çolê
Zêhn û bîr nehatne holê
Qîmeta 'umrî belaş e

Biha umir min xela ye
Zêhn belav nabît cema ye
Beden kur sifet nemaye
Dest û pê l'min bûne kaş e

Dest û pê naên xebatê
'Umir bo min bêbiha tê
Kewtime nav karesatê[152]
Me îş gelek bûye yaş e

Wextê xêr zêhn nehat karî
Rojêt rohn li min bûn tarî
Nihe b'zêhna pîr û jarî
Ser li min wê bûye taş e

Ser min bûye wekî berî
Çu tê naçît evî serî
Bêfikr û hem kor û kerî
Felek bo me bû qelaş e

[152] 'Emelê xirab.

Felek xirab zeman xayîn
Beden helya b'derd û birîn
Çaw bi rondik her gav girîn
Nîn e carek keyf û neşe

Keyfa dilan min nemaye
Zaliman ser me hildaye
Kewtin telka xayîna ye
Eqreba wê d'ken temaşe

Felek xayîn eqil kislan
Mijûl nebûm bi çend feslan
Negiheştme xwudan neslan
Kewtne rêka min teraş e

Li rêka min çêbûn engel
Çar demsal bêkesp û 'emel
Ciwanî çû û bûm tenbel
'Umr û fikir çûn belaş e

**NEXWEŞXANE**

Evroke tîrmeh bîst heşt
Merhemet bi min ra giheşt
Mayme ez bi gav û se’et
Nesaxek im zor giran e

Min nemaye taba jînê
Kul kewtine ser birînê
Êş û jan her dem zêde ne
Yêt helîyêt ev bedene

Çare û rê bezre bûye
Umêda jînê nemaye
Ev hal dê biçîte kîrê
Xwuda dizanit tedbîrê

Razî me ser qehra dinê
Derd hecet in bo mirinê
Her seet cem doxtorekê
Xêr çu nîn e di vê yekê

Her yêk yê dî xirabtir e
Gotna yêkî ya dî nagre
Ne min kes e biçme lalî
Ji xeyrî zatê Te’alî

Nîn e ‘eyş û xweş û neşe
Bi vê nesaxyê nameşe
Lê rêz û hurmet zêde ne
Baş li hemî cihan hene

Bo xizmetê bêqusûr in
Rûgeş in û dilsirur in
Zor bi xwudan hilm[153] û rehm in
Nazik berê xwe dene min

Wek zarokan min d’nêrin
Destvala û zor bi xêr in
Şev û roj di xizmetê da
Bêhember in mirwetê da

[153] Hilm (‘E): Nazik.

‘Eyd wê têtin dê derkevim
Hes nakem jê re dûr kevim
‘Eyda Xerîbî çu nîn e
Ema çûn bi destî nîn e

Sê roj ji tîrmehê maye
Sal du hizar û nozde ye
Bêtab Xerîbê Gewerî
Berew malê dizivirî

**PAYÎZ E**

Me payîz hat wextê sirê
Hizreta me roja tav e
Li seran girtiye befrê
Çimen bi xûs û xunav in

Min nemaye sebra dilî
'Eqlê serê min fetilî
Nîn e min zêhna 'ewilî
Fikr û xeyal di belav in

Hizr û bîr qet nafikirin
Çok û pê min naragirin
Sima û rû dixeyirin
Geh û mefsel hemî d'xav in

Pê û mefsel kewtin j'karî
Guh di ker in çaw di tarî
Derd û êş in û hawarî
Dest û milêt bêbizavin

Bizav nema çok û milan
Êş kewtiye ruh û dilan
Êxistme ber xem û kulan
Yê d'sojît cerg û hinav in

Hêstî hemî mayne xalî
Kes nabinît evî halî
Bûme nêzîk heştê salî
Yêt çûy didan guh û çaw in

Derd û êş û bang û gazî
Nîn e dostek dil pêrazî
Carek bêtin bi şehnazî
Bêbehs û pirs û silav in

Nîn e pisyara wî jarî
Dinya bûye cihê karî
Bo Xwudê kes naêt yarî
Hemi b'hîle û qeyd û dav in

Hemi xaîn gel feqîrî
Bêhîvî ne ji kal pîrî
Por û rihdîn wekî şîrî
Zêhn û ‘eqil ne d’tewaw in

Zêhna ciwanî lê barî
Pê dana ser lêwa gorî
Sûc û curman heq biborî
Xerîbê bê day û bav in

## QORONA WÎRÛS

Mikrob e qorona wîrûs
Bo insanan bûye qabûs
Yê punhan e wekî casûs
Kewt cîhanê zor bi tesîr

Bi şiddet hat ser insanan
Tirsek zor da dilê wana
Dinya felç kir bi yek an e
Nîn e li pêş wê hebît tedbîr

Wan zor dan aletêt herbê
Fen kar d'ket bo qetl û zerbê
Wan şol îna kîn û kerbê
Peyda nekir çare sexbîr

Pêş wîrûsê man pabeste[154]
Hero hizaran tên xeste
Mirin ser me qet naweste
Mesura Îsrafîl tê bîr

Hizaran nexweş û mirin
Doxtor hekîm tê d'fikirin
Dest wan çare naêt kirin
Bo wîrûsê bûne êxsîr

Kan yêt Xwuda inkar kirîn
Kimya xerdel çêdikirîn
Yêt mirov çekêt wan mirin
Wan zanîn Xwudayê xebîr

Yêt xwe Cebar hisap kirin
Musulman qetil dikirin
Bo xwe ticaret wan d'kirin
Ew hêlan bêçare feqîr

Wehm û tirsek hat dinyayê
Hind û Çîn ta Ewropayê
Emrîka zorbê dinyayê
Bêxeber ji Rebbê qedir

[154] Kesê ku dest û pêyên wî hatine girêdan. Peyveke farsî ye.

Ne d’fikirîn ku dê mirin
Wan mirin hizir nekirin
Xwuda gelek pêkve birin
Wan nîn e tehmûl û sebir

Ev mikrob bû xurtê xurtan
Tirsa dilê xwudantextan
Xewf û tirs dabû bêbextan
Bizanin hukmê Rebbê kebîr

Da zanin qudreta barî
Rohn bît dilê wan yê tarî
Bo ew kesêt li ser karî
Da nezer ken ‘eqla besir

Bi nezera heq çaw lê vebin
Qetl û kuştin ser kes nebin
Pêkve bijîn dijber nebin
Nekujin bi silah û şûr

Xwuda dinya da bo jînê
Ne ji bo şewat û şînê
Ey rehberêt rêjin xwînê
Zanin hûn dê bin Xwuda-gir

Dê Xwuda-gir bin mehşerê
Bin webalê naên derê
Hûn dê bin ehlê seqerê
We l’cehnemê cih bû agir

Dê bînin sotna cehnemê
Zulma hûn diken ‘alemê
Dê mesûl bin mehkemê
Bi qetl û guneha kebîr

Ew zulme bi we namîne
Xwuda wî heqî bistîne
Mehşerê hûn dê bibînin
Xwuda l’wêrê diînte bîr

Xwuda dê bînte bîra wan
Qetl û kuştin û xedra wan

Ew zulm talankirina wan
Bûn şirîkê iblisê pîr

Dê bin rezîlêt mehşerê
Wan cih heq kirye l’seqerê
Nîn e wan cihê mehderê
Mekan dê bîte bi’sel nesîr[155]

[155] Tebeqeya cehnemê ya herî jêr e.

**SERSAL**

Bûme meskûn li tokîyan
Bînayek wekî hîsarê
Neşêm biçime çu ciyan
Mayme li çawrê biharê

Min hat zustana ‘umrî ye
Kar û emel dûmahî ye
Peşeman im fayde nîye
Berew qebrit çine xwarê

Min roj heft kanûna duyê
Xilas sala heftê sîyê
Nemaye cihê hivîyê
Meh û roj bûn belgêt darê

Evroke sersala min e
Salek dî çû j’umrê min e
Bûme kalek ber mirin e
Min pê dana heftê û çarê

Ev sal zustana ‘umrî ne
Ser û rihdin befra spî ne
Çok û milan qewet nîn e
Hemî halan kewt xwusarê

Me bi xwusarî ‘umr borand
Firset ji destê xwe derand
Çerxa dinê l’me zivirand
Bo me nema cihê kar e

Kar û beraketa jînê
Wextê xweşyê û evînê
Jîyarêt çaxê gencînê
Nihe l’min bûye êvar e

Êvar e zeman direng e
‘Umir çû min nema reng e
Gel derd êşan şer û ceng e
Nemaye keyfa jîyanê

Jîyanek bi derd û elem
Her dem êş û jan û xem
Naên ber min pê û qedem
‘Umir bû sîbera darê

Min pê dana heftê çara
Bûme kalê ber diwara
Pişt dane min dost û yara
Xwuda li Xerîb ket çarê

**SERGUZEŞTA SEYDA**

Rojek ji rojêt Xwudayî
Gundê me yê nav çiyayî
Di bera hizar nehsedê
Berê xwe b’de vê hikmetê

Xwuda çawa biket teqdîr
Kes neşêt biketin texyîr
Zarek çaw li dinê vekir
Ew bi navê Huseyn nav kir

Paşê çend salan bi dûra
Birayek hatîye jê ra
Ew Huseyîn yê dî Hesen
Pêk ve jîyan bi keyf û ken

Çend salan pêk ve jîn kirin
Day û babêt wan lê mirin
Bûne êtîm bêxwedî man
Ew kewtine derd û xeman

Paşê seferberlîk rabû
Xelkê warê xwe berdabû
Bi zehmet û gelek zorî
Berê xwe dane Başûrî

Îraqê li Kurdistanê
Bûn feqe li dibistanê
Wextekê man wî welatî
Berê xwe dan Rojhilatê

Paşê ew çûne Îranê
Li tekya Şêxê Burhanê
Bûn feqî ew li medresê
Ser narabît ji ber dersê

Çend salan li wêrê mayî
Herba dinê bû dûmayî
Ew zivirîn bo welatî
Dest dane kar û xebatê

Mamê wan Mela Mihyedin
Gotê ey feqî Huseyîn
Min bo te fikrek wê kirî
Biçin dev Melayê Dirî

Ew pir xwudan ‘ilm û huner
Belkî qebûl bikî eger
Çend salan wêrê bimîne
Li cem seydayî bixwûne

Çûne dev Mela Mecîdî
Ustadekî zor berkewtî
Bi salan ma nik seydayî
Bû ew nehingê[156] dunyayê

Paşê bo xwe kire zava
Sed caran mala wî ava
Wî kiça xwe Gulşah dayê
Bû xwudanmala dunyayê

Ew li cem şahî bû qazî
Her kes ji ‘ilmê wî razî
Paşê xwe da sîyasetê
Çû cem Qazyê Mahabadê

Nik qazî cih bû bi şadî
Wêrê bû wezîrê dadî
Li Komara Mahabadê
Bû wezîrê ‘edaletê

Ew paş Ûrisê bêbawer
Komara wan lê xirab kir
Şahê Îranê Pehlewî
Hucûmek îna zor qewî

Qazî dîl girt û mehkûm kir
Hola Çarçira îdam kir
Gelek wextî ew ma bi tirs
Li Îranê bû muderis

[156] Nehing, ji kesê di karê xwe de serkeftî re tê gotin.

Çend sal borîn bi wî halî
Wextê wî nedima xalî
Bi emrê şahê Îranê
Bû qazî li Kurdistanê

Gelek salan mabû qazî
Bi wê hukmê nebû razî
Kewt nav fikra û xiyalan
Bi roj û gav meh û salan

Qirar kir ji bo seferê
Qest kete welatê berê
Welatê bab û bapîran
Xweştir ji Şam û Cizîran

Hat bo gundê xwe yê berê
Bi cih bûn ew li Geverê
Heta sala nehwêd û sêya
Li qeza Geverê jîya

Di bîst û yekê Adarê
Di serê fesla biharê
Ferman kir xwudanê sozê
‘Emrê heq bû li Newrozê

Bi teqrîb ‘umrek sed salî
Bi teqdîra Zul-Celalî
Bo hat ‘emrê Rebê Qadir
Ruh çû bal meqamê kebir

Xilas wî ‘umrê dunyayê
Wext hat bo çûna uqbayê
Ruh cuda ji cismê fanî
Çû ber ‘efûya rehmanî

Ya Reb çend hey belgê daran
Hindî xîzê dev rûbaran
Hindî hey qetrêt baranê
Diveresin ji ‘esmanî

Em hind rehmetan dixwazin
Ji bo muderisê mezin

Ya Reb rehmê bike ewî
Bêpar nebin ji ‘ilmê wî

Guh lê bidêrin hûn serwer
Ew ‘emel çi xêr bît ya şer
Hindî tişt min bihîst zanî
Min tev gotin bi lisanî

Min du‘a li dergê Xwuda
Ji rehma xwe neket cuda
Min du‘a ji lutfa barî
Wekî diçin cihê tarî

Min hîvye nebin rûsiya
Ji mucrîm û ne asiya
Bo xatra zatê Zul-Celal
Nebin pişman bi dest-betal

Roja heşrê li meydanê
Wextê hisab û mîzanê
Rûreş nemînin şermizar
Qerdar nebin em gunehkar

Ev serguzeşta seydayî
Me got û ew bû dûmahî
Bizan me rêz şêst û sê ne
Bi hejmar ‘umrê nebî ne

Min hîvî ji eqlşinasa
‘Efû ken ew kêm û kasa
Min nivîsye bi nezanî
Tê da hey gelek noqsanî

Niha nexweşek bêtab im
Xwe mujûl d’kem da tena bim
Xeletî gelek tê hene
Rica dikem pê nekene

## SEYDAYÊ BERÊ

Min berê seydayek hebû
Ehlê ilm û xwudan huner
Ilim bo bît mubarek
Bo zanînê bibû rehber

Bibû rehber di nav ‘amê[157]
Xwudanê fikr û îlhamê
Rohn û safî wekî camê
Di nav xelkî bibû serwer

Bibû serwer ku seyda ye
Di ilmê da canfida ye
Bi xeyret û muheya[158] ye
Yê encam e ev bêhember

Bibû seyda l’camiya me
Digel dost û xwas û ame
Hem suhbet kar û keyfa me
Weku rojê bibû enwer

Ronahî bû di wî cî da
‘Alimek bû di muhît[159] da
Muderrîs bû di dersê da
Hem zana û xwudan xeber

Xwudan xeber û bawermend
Ew seyda bû ez jî karmend
We’z wî d’kir min xutbe d’xwend
Gotinêt wî l’min bûn eser

Min guhda wî û neshetê
Got ter ke j’kar û zehmetê
Tu bigre rêya axretê
Dê pê bibîye behrewer[160]

[157] ‘Am (‘E): Xelk, gel.
[158] Muheya (‘E): Amade, hazir.
[159] Muhît (‘E): Derdor, dever.
[160] Pişkdar, parmend.

Dest berde j'kar û emela
Were l'camyê bibe mela
Bide bangan bike sela
Bo agirî dibîte çeper

Were guh bide şîretan
Derkeve j'kar û zehmetan
Bike we'z û nesîhetan
Ew e karê roja mehşer

Ew e şîreta seydayê min
Ew ustad û rehberê min
Dostinyek qedîm bû bo min
Digel yek bin ser hewza kewser[161]

Seyda digel min adaş e
Hem sadiq û hem sirdaş e
Ew ustadek çend î baş e
Bûye warisê Peyxember

Kî bû ew ustadê we yê seîd[162]
Hem mela bû hem musteîd[163]
Xelkanî bû Ebdulmecîd
Bît cînarê hebîbê ekber

Eqreba ye digel Xerîb
Hindî l'dinê hebît nesîb
B'hîwya şefa'eta hebîb
Li axretê dûr bin j'seqer[164]

---

[161] Li beheştê avek e. Dibêjin kesê ku carekê ji vê avê vexwet êdî careke din têhnî nabît.
[162] Mirovê li mehşerê xwudanxêr.
[163] Kesê ku di 'ilmî de rehber.
[164] Li cehnemê ji qismê sar re tê gotin.

**SEYDAYÊ MELA ‘EHMED**

Were dunya tu çawan î
Nabî dost digel kesê da
Bezir dikî bi punhanî
Kes nehêla vê dinê da

Tu bo kesê nabî heval
Yêt gel te borandî çend sal
Te neda wan jî çu mecal
Te çal kirin di erdî da

Te ne şêx hêlan ne welî
Ne ‘alim hêlan ne delî
Te ew hemî kirne xwelî
Bezir kirin nav xebrê da

Di nav tozê da bezr kirin
Hemî bêpisyar te birin
Te bi mirinê navkirin
Di helgire di gavê da

Tu bo kesê nebû meded
Ka stêra me Mela ‘Ehmed
Kanê ew ‘ilm û şerî‘et
Te ew jî ji me kir cuda

Xwudanê zanîn û ‘ilmê
Bi wê şewqetê wê rehmê
Te nehêla li nav qewmê
Ew bû kovan dilê me da

Bûye kovan ser dilê me
Tinê nebû melayê me
Roj bû ew li welatê me
‘Abidek bû di dinê de

Xwudanê wer’ û teqwayê
Mala wî wekî tekyayê
Hemyan bera xwe didayê
Xaneqa bû muhîtî de

Xwedyê fiqh û fesahetê
Bi xîtab û belaxetê
Xwedyê rehm û ‘edaletê
Bi qîmet bû nav qewmî da

Nav qewmî da ronahî bû
Bo muhîtî bînahî bû
Bi şikl û fi’lan welî bû
Mutteqî bû di dinê da

Yarîkarê feqîr jara
Digel dostan û neyara
Çu car nedbû cudakara
Bo wî yekbûn di rehmê da

Ew ‘Ehmedê sofî Xelîl
Bo ‘alemê bibû delîl
Ji wî digirtin fikr eqil
Wefat bû ew pişt sedê da

**SEYDAYÊ MIN**

Seydayê min Mela Husên
Rehma Reb li canê te bî
Beheşt bo te bibe mesken
Cennet ‘eden cihê te bî

Tu seydayê tev ‘aliman
Qazîyê hemî hakiman
Mertalê dijber zaliman
Şehadet merteba te bî

Wekî roja Kurdistanê
Şewqa te dabû cîhanê
Heta axirê zemanê
Dewama wê dê her hebî

Ew ‘ilmê wekî deryayê
Te belav kire dinyayê
Bo vî ‘esrî tu deha yî
‘İlmê Qur‘an di gel te bî

Ew ‘ilmê wekî xizînê
Te vekir dergê zanînê
Tu bûy muceddîdê dînî
Baxê îrem te behre bî

‘İlmê fen û şerî‘etê
Hukmê hedîs û ayetê
Belav kire vî miletî
Bi kurmancî û ‘erebî

Bi tirkî û bi farisî
Ji bo nebî tu waris î
‘Aliman ji te dipirsî
Tacê ‘ilmî l’serê te bî

Bo zanînê bûye rehber
Li nik te bûn ‘ilm û huner
Te cih li ser hewza kewser
Digel Muhemmedê nebî

Gulordîyê me yê ‘alî
‘Umir borî bû sedsalî
Bo ‘ilmê te ‘alem nalî
Cihê te di qelbê me bî

**SEYRA ÇÎYAN**

Min seyrek kir serê çîya
Ez fikirim gil û gîya
Min dest havête xweziya
Dil rihet bû bi seyranê

Seyran xweş e di nav gulan
Ew vediket bêhna dilan
Ew sosinêt serê milan
Rehmet in ew ji bo canî

Axîn hatine dilê min
Piçûkahî hat bîra min
Ew bû bihara umrê min
Payîz e hişk bûne kanî

Jîyaneke bêtam û reng
'Umir zû çû nema direng
Gel jîyanê bi şer û ceng
'Umir xilas nîn e xanî

'Umr û zeman bêqîmet in
insan nihe bêqîmet in
Qîmet mal û hem serwet in
Rûmet nemaye insanî

Qîmeta insanî nîn e
Kuştin û hem qetl û xwûn e
Kurî agah ji bab nîn e
Biryaye xweşya jîyanê

Naçît serî vî hesabî
Kur bûye dujminê babî
Zeman borît bi xirabî
Mal şirîntîr e ji canî

Zeman bûye yê xiraban
Kan ewladêt day û baban
Kur ji bab xwazît hisaban
Nemaye gund û cîranî

Gund û cînar pêk ve najîn
Bira d'gel bira bû xaîn
Hesûdî kewt rûyê zemîn
Xirab bû halê zemanî

Zeman bûye neqencîyê
Bûke ratbîte xwesûyê
Xwesû dibertet girîyê
Kur yêt bêjît min nezanî

Xwesû û bûk her gav şer e
Kurê malê kor û ker e
Bûk bêjte xwesyê j'mal here
Pîra reben kir ser banî

Pîra reben yê digirî
Kur wê l'dayîkê dixwurî
Tu gotna bûkê nagirî
Da l'vê derê key jîyanê

Kur bûye hevkarê jinê
Dayîk hêlaye bi tenê
Bîr kir wê înaye dinê
Kurê zalim vê nizane

Bo çi insan tebdil bûne
Day û ewlat lêk sar bûne
Bab û kur lêk hesûd bûne
Kewtine çerxa zemanî

Zeman xirab insan xaîn
Dil bi xem in çaw bi girîn
Li me çênabin derd birîn
Kanê çakî kan biranî

Bo çi tub'et xirab bûye
Rehm li cîhanê kêm bûye
Zeman li me xaîn bûye
Borî 'umir bi kislanî

Kislanî hat bi ser me da
Kewtine gel şêt û beda

Xirabkaran û neqeta
Bi derd û kul û kovanî

Xwezya serî heba aqil
Me zanîba l'dinê şixul
Me nekirban cerh[165] û qetil
Neba dizî û talanî

Ji me dizîn fikr û aqil
Em kirin kolê dil bi kul
Me nezanî ew hîl fi'il
Bûne xafil di vê xanê

Dinya bû xana xiraban
Ewlat dûr bûn ji day baban
Xerîb j'kêt xwazî hisaban
Te 'umr borand bi nezanî

[165] Cerh ('E): Birîndarî.

**ŞEVA TARÎ**

Şeva tarî bi rê kewtim
Xewa min hat nerakewtim
Min kes nedît zor dûr kewtim
Sitêran fukrîm zêhn kewtim

Tawa heyvê hat rûniştim
Tê fikirim cih nehiştim
Fikr û xiyalan bişkiftim
Tawê hilat germê piştim

Germa tawê l'min zêde bû
Ez birsî bûm nan çu nebû
Çûme gundek nas kes nebû
Malan nêrim derkek vebû

Me nan jê xwest got çu nîn e
Mame l'hîvyê got nemîne
Min got bo çi got nas nîn e
Min got xêrê got xêr nîn e

Çûme dergek gel silavê
Got neraweste ber tavê
Ez rûniştim oda navê
Li min cema bûn wê gavê

Gotin kî yî bo me bêje
Mêhvan nehatne ji mêj e
Çi heye hemyê birêje
Me b'sedayê neke gêj e

Min dest havête suhbetê
Behsê jiyan û muhbetê
Keyfxweşî hat cema'etê
Bûne ehbab wê sa'etê

Me sohbet dewam lê kirin
Firavînek law çêkirin
Me hemyan zik pê têr kirin
Me xatir xwest ew terk kirin

Me ser danabû rîyekê
Gihiştne ser kanîyekê
Me jê wexwar ne b’carekê
Hate me dengê gazyekê

Kesêt nenas herin j’êre
Yê nas nebît naêt êre
Min got rêwîngek feqîr e
Me dît hat bi destê kêr e

Em ji wêrê dûr êxistin
Çol û çîyan em êxistin
Me newêra l’wir rawestin
Geştme pîran got em d’westin

Em rûniştin me bêhn veda
Şev tarî bû hat ser me da
Cihek nîn e çine d’bin da
Em mayn di nava çolê da

Em wê şevê man l’çolê ne
Hem têhnî û hem birsî ne
Kesê agah bi me nîn e
Şev borî û em rêwî ne

Ji birsyanê me xew nehat
Sibê zû ye roj me hilat
Em zivirîn qesta welat
Zor zehmet û dilê b’şewat

Dilşewat û zehmetkêş î
Me ji gerê nedît xweşî
Me dîtin gelek nexweşî
Paşve hatin zehmet tejî

Xerîb nezan bû l’geryanê
Tam nedît ji wê seyranê
Hemî cihan zehmet danê
Wegerya ve bi pişman e

**TAHIR**

Were dîsan tu binêre
Dinya xayîn gel me çi kir
Dewir dana ne bi xêr e
Tîra qeder qelbî b'cih kir

Dîsa wekî meha berê
Helbijartin wê seferê
Kes navegerît qederê
Dinya dîsan te ya xwe kir

Dinya bûye xayîn gel min
Şikandin her du milêt min
Helandin cerg û dilê min
Mêlak li min kire agir

Te agir kir nav hinavan
Ronik hişk nabin ji çawan
Min nîn e taqeta ewan
Li me biryan bêhn û sebir

Herê dinya tu çawanî
Zerbê d'danî bi punhanî
Zû bezir d'key tu insanî
Te Tahir ji me cuda kir

Te cuda kir hêşta zû bû
Ew teqdîra îlahî bû
Me ne isyana 'emrî bû
Me hesret ji bona wî kir

Herê dinya çend bedfêl î
Nîn e te xêra 'emelî
Te bir Wanê bo ecelî
Te ew jî li me bezre kir

Bezir kirin te b'xefletê
Te ew birin bi derfetê
Xwuda b'gehînte rehmetê
Nêz bît bo nebiyê axir

Bîte cînar ji bo Nebî
Ber rehmeta Rebbê xwe bî
Pişmanê dinyayê nebî
Bîte refîqê[166] Ebubekir

Xwudanxêr bî tu her demê
Di axretê l’wê ‘alemê
Çu car nekevît xemê
Bi qudreta Rebbê Xebîr

Me hawar e j’Rebbê mezin
‘Efya xwe em ji wî d’xwazin
Bo cenneta wî bibezin
Nemînin b’gunehê kebîr

Nebin guneh xwudanxêr bin
Em li jor û ne li jêr bin
Bo Rebbê xwe em guhdêr bin
Bi xatra nebîyê beşîr

Min du’a ye j’wî Sebburî[167]
Ji rehma Rebbê Xefur î
Gunehan li me biborî
Xerîb l’mehşer nebît feqîr

[166] Şirîk.
[167] Navekê Xwuda ye.

**TAWUN**

Tawunek hat bi ser me da
Navê qorona wîrûsê
Çar eqlîman bûye nîda
Ji ber mikroba qabûsê

Berê xwe b'de vê îbretê
Dunya ve hatye xîretê
Kes nebû manî' afetê
Tirs û wehm e wek casûsê

Ji Îspanya heta Çînê
Dunya kewte derdê jînê
Li me zêde bûy bêdînî
Kes wihê ji xwe napirse

Berê xwe b'de van îbretan
Halê wan şehwetperîstan
Yê dewam d'ken bêrawestan
Nema qîmeta namûsê

Qîmet nema d'nav insanan
Hatne rêza wan heywanan
Bûyne cahîl nav kolanan
Bûne ehlê fexr[168] û sûsê

Bûn wehşî yekdu dikujin
Xwûna yekdu dimêjin
Nizanin dê b'agirî sojin
Pêk ve bûn ehlê filûsê[169]

Ehlê filûs in dîn berdan
Bûn zalim li hemî erdan
Xwuda barînît afetan
Ew nizanin vê hadîsê

Helal heram nik çu nîn e
Xwarin gorey şerî nîn e
Wexwarin qola reqî ne

[168] Fexr ('E): (Xwe) qudekirin, mezindîtin.
[169] Filûs: Navê parêkê berê bûye. Ji parê kêm-qîmet re dihat gotin.

Ew bi heram d'ben hewesê

Xwarin kêjal û kisel in
Kirm û mahr û hem dexel in
Bo bedenî ew xelel in
Xwe nadin paş wan xusûsan

Paqijî lalî wan nîn e
Temîzya dînî nedîtne
Bi heyata wehşî jîne
Tahir nînin çu xusûsê

**WERE BIFIKRE LI WÎ HALÎ**

Were bifikre l'wî halî
Me derbaz kir zeman xalî
Kewtine derdê dinyayê
Şew û rojan ah û nalî

Şew û roj li me bû zindan
Ne şeref maye ne wijdan
We'd û sozan pêk naînin
Li me xayîn gund û cîran

Xaînêt me dewr û dûr in
Her dem zulm û cevr û zor in
Çakîyê qet pê nizanin
Ji heqiyê çaw di kor in

Çaw di kor in guh bûne ker
Kes li heqyê naket nezer
Gel me her dem de'wa û şer
Dinya kirne heps û zindan

Bi de'wa û hem hesûd in
Bêsoz û qerar û sûd in
Dijber in her dem digel me
Bedfêl û hem lêb û lod in

Lêb û hîle wan digel da
Mal û milkan serê wan da
Bûne heris[170] ew bo malî
Dîn û îman wan li der da

Dîn dixwazît soz û we'dê
Rastî û wefa bi ehdê
Ew xislete[171] wan çu nîn e
Kewtne pê hîle û fendê

Bêfêhl û fend û fesad in
Hem xwudan kîn û înad in
Nîn e wan însaf û rehmek

[170] Azwerî, hezkirina zêde.
[171] Exlaq, teb'et.

Şubhî Nemrud in şedad in

Wek Fir'awnî bûyne asî
Kes ji dûr wane nanasî
Bedxuya[172] bexîla[173] munkir
Bêcewher in wekî resas[174] î

Xerîbê bêkar û sin'êt
Hindî xeberday nesihet
Hişk e mejî wekî berî
Xeber gûza serê gumbet

Nesihet kir dirêj kurtî
Wan guh ji heqyê nesumtî
Serê wan yê hişk û req e
Qebûl naken ew çu tiştî

Hîwya ewî jarê feqîr
Min şîret da b'wî 'umrê pîr
Her demê ew ters û inkar
Wan dest ji heqyê wê şuştî

[172] Exlaqnexweş, te'betnexweş.
[173] Hesûd.
[174] Madenek e.

**WERE BIRA**

Were bira tu bizane
Dost û biratî nemane
Bû cihê kar û paran e
Sidq û wefa l'me biryane

Wefa bûye tamahkarî
Çawêt insanan bûn tarî
Ferq nîn e helal mirarî
Dil çîte mulk û paran e

Dostînî bû kar û serwet
Rastî bû rîya û minet
Kal û pîran nema hurmet
Qîmeta 'umrî çu nîn e

Qîmet nik me winda bûye
Her kes serê xwe rabûye
Malbatî ji me dûr bûye
Kes agah bi wihê nîn e

Bêagah in j'hemî şolan
Mezin bûne wekî holan[175]
Zik mezin kir wek daholan
Tewazu l'nik me çu nîn e

Hemî b'icb û tekebbir in[176]
Pê libasan fexir[177] kirin
Nîn e çu car sebir kirin
Qude ne dil tejî kîn e

Bi kîn û kerban bûn tejî
Xwudan mal û mulk 'umr û jî
Yeqîna wan dê her bijî
Qebr û mexberê nabînin

Ewî dê b'kêşne hisabê
Aza dê l'ser den xitabê

[175] Ji mirovên sifet-heywan re tê gotin.
[176] Icb û tekebbir: Xwe zêde ecibandin an jî xwe kudekirin, mezin dîtin.
[177] Xwe mezinkirin.

Dê çawan bidet cewabê
Deftera xêran j'ku bîne

Weqtê xêr û şerkêşanê
Guneh wene te xêr kanê
Her tişt we ye li meydanê
Were tu bixwe bibîne

Were binêre 'emelan
Şer û guneh sûc û belan
Nîn e cihê bang û selan
Xêr û çakî winda bûne

'Emelêt xêr te çu nînin
Hemî guneh qetl û xwîn in
Talan û hem şer û şîn in
Rûreş û hem dilbirîn e

Winda bûne 'emelêt xêr
Dîhar[178] nînin 'emelêt kêr
Bûye rûreş ser wê li jêr
Destxwalî ye çu tê nîn e

Çu neîna destwala ye
Naw hewalan ser çemya ye
Yê serxoş e pêş mewla ye
Bi ax û of û nalîn e

Bêîmdad e zor bêçare
Hecet nîn e şol dîyar e
Yê d'ket qêrî û hawar e
Wê feryadê wer bibîne

Feryad fîxan tejî erdî
Neête serê çu ferdî
Ya Reb tuy dermanê derdî
Te nav Xefur'ûl- Miznibîn e[179]

Ez Xerîb im ku Ebdullah
Min qeseme b'ismê Ellah

[178] Dîyar.
[179] Navê Xwuda yê efûkirinê ye.

Dê bêjim qal û înnalillah
We îleyhî racî'une[180]

[180] Ev ayeta Qur'anê ye. Dibêje ku em ji dev Xwuda hatine û dîsa em ê bizivirine ve dev wî.

## WERE DILO BO MIN BÊJE

Were dilo bo min bêje
Kanê bo çi her dinalî
Te ne şev e te ne roj e
Dikey gazî wek ‘evdalî

Te nema wextê xweşîyê
Tu jibîr bike ciwanîyê
‘Umir hate dûmahîyê
Tu pîrekê êdî kal î

Tu kalekê bedensist î
Derd û êşan tu êxistî
Bo halê xwe narawestî
Qebûl nakî ewî halî

Ewî halî tu ke qebûl
Çok verisyan mil bûne xwûl
‘Umir geha wextê zelûl[181]
Bûye êxsîr nava malê

Bûye êxsîr li nav xanî
Li te nema xweşya canî
‘Umir borî bi xusranî
Qet te nema wextê xalî

Te wext nema dikî gazî
Dinya ne cihê mirazê
Bo axret bike daxwazê
Hewar bike Rebbî ‘alî

Hewar d’kem ji Rebbê barî
Ji derd û êşan b’ket ‘arî
Bête hewara vî jarî
Derman ket derdê ‘evdalî

Lal û ker im ez kor û gêj
Bûme ‘ebdal babê Derwêş
Hindî hebin min derd û êş
Qebûl in ji Zul-Celalî

[181] Zelûl (‘E): Belengaz, jar. Dema keftina pîrîyê.

Qebûl in nakem gazinda
Ger b'sojim wek mom û finda
Razî me ez mam li benda
Min nabît nexweş û talî

Êş û derd tên ji Xwudayî
'Emr û fermanêt wî dayî
Li ser serê min geda yî
Dê qebûl kem bi hevalî

Bawer im bi xêr û şerê
Îman îna bi qederê
Dê biçin ser eslê berê
Wextê ecel bîte halî

Wextê ecel hat cîhanê
'Emir hat ji bal rehmanî
Ruh cuda ji cismê fanî
Kes neşêt b'ket qîl û qalê

Bi qîl û qal kes nikare
Ew 'emrê Rebbê Cebbar e
Mirinê nînin çu çare
Gava 'Ezraîl têt lalî

Çi tedbîr nînin mirinê
Kes muflis neçît ji dinê
Hebît karê roja tinê
Çare nîn e wî ehwalî

Kar û 'emel me çu nîn in
Destxalî û dilbirîn in
Ji rehmê bêumîd nîn in
Hewara me Rebbê 'alî

Bes e feqîr tu çend jar î
'Umir borand bi xwusarî
Piştî pîryê rabû karî
Bi vî 'umrê heftê salî

**WERE DILO KANÊ BO ÇI**

Were dilo kanê bo çî
Hindî tajom zeman naçî
Dê bêjî roj girêdaye
Dem û wext wê rawestaye

Roj li min bûne meh û sal
Li min teng bûn bêhn û mecal
Her deqîqek min se’etek
Şevê li min bûye mehek

Tajom naçît kêşim naêt
Yan nisreta Rebbê me bêt
Şevêt tarî min zindan in
Rojêt rohn ber min giran in

Ku b’kem ya Reb tu derman î
Tuy delîlê bêçaran î
Heyirî mayn rê nizanin
Bêçare û hem perîşan in

‘Eyd wê têtin ku qurban e
Lêk pîroz keyn gel hemyan e
Kêmasî ye j’bo malbatê
Rojêt ‘eydê dûr ciwatê

Paşê eydê dê bême we
Ew derdê min yê maye we
Yê musellet bûye serê min
Xwuda dûr ke ji dora min

Kes nebînit ewan derdan
Xwuda nedete çu ferdan
Çu kes pê nebin giriftar
Ev derde l’kes nebin dijwar

Kes nekewte nav vî halî
Hindî dikem ah û nalî
Ber bi vî derdî dihelyên
Dil û ciger pêkve d’kelyên

Nesaxî derdek giran e
Xwuda nedet ziruhan[182] e
Bin vî barî da nikarim
Her dem gazî û hawar im

Sebr û sukûn min çu nîn e
Dil û ciger min bû xwûn e
Kul kewtine nav hinavan
Nema l'min ronahya çawan

Çaw bi girîn dil şewat e
Xwuda daye ew afat e
Musîbet da b'nesaxyan e
Cerg û dil min kir buryan e

Sed hawar û bi hizar car
Şikurdar im 'emrê Cebar
Teqdîr û ferman yêt wî ne
Derd û derman li nik wî ne

Xwudan mulk e di mulkê xwe
Xwudan hukm e di hukmê xwe
Çi hes ket mulkê xwe da d'ket
Çu lazim e ew wê diket

Kes nîn e lê b'ketin karê
Kes nîn e dijber qirarê
Qadir e qudret ya wî ye
Rehm û 'edalet nik wî ye

Xaliqê xwudanê rehmê
Naket li 'ebdê xwe zulmê
Her çî ya d'ket heqê wî ye
Hukm û 'edalet yêt wî ne

Xerîbê jar û feqîr im
Xwudan êş û derd û pîr im
Her dem j'hukmê Xwuda razî
Selametyê ji wî d'xwazî

[182] Zîruh: Hemû tiştên xwudanruh.

**WERE DILO TU ÇAWANÎ**

Were dilo tu çawanî
Beden helya bi erzanî
Min nemaye xweşya canî
Kewtime nava zehmetê

Zehmet pir û nîn e şefqet
Derd û kul in zor bi zehmet
Şîfaxwaz in dad û medet
Mayne li çawrê rehmetê

Bi qudreta şahê mezin
Hindî elem li min hebin
Derdêt Nebî Eyubî bin
Nakem kufran û nî'metê

Dê j'Xwudayî şukirdar bin
Dê j'Rebbê xwe efûdar bin
Ebd im zeîf im dê jar bim
Wî nînin cihê hecetê

Min ji Xwuday gazind nîn e
Rica hîvî hem lahîn[183] e
Hemî halan muxtac wî ne
Di jiyan û hem mematê[184]

Jîn û mirnê ew e didet
Beyî wî kes nîn e çu b'ket
Ew didet û ew e dibet
Nemaye cihê heyretê

Heyret netêgehiştin e
Heq ji Reb minet girtine
Kiryaran dibêjiît ya min
Nizanît xwedyê qudretê

Qudreta Xwuda nanasin
Bêdîn û hem bêesas in

[183] Daxwaz, xwastek.
[184] Memat ('E): Mirin.

Bêqible hem bêqîyas in
Ji Xwuda naken xeşyetê[185]

Gelek wêt bûyne qomînîst
Hindek wêt bûyne sosyalîst
Hindek wêt bûyne ateîst
Inkar diken heqîqetê

Heqîqetê qebûl naken
Ayet hedîs bawer naken
Xwuda pêxember nas naken
Kewtne heyûla tab'etê

Bên mirin hey rabûn nîn e
Ev tişte kes nedîtîne
Tiştek esehî çu nîn e
Xelkê d'xapînin xefletê

Bawer neken hûn ji wan e
Bêjin hemî heyûlan e
Ew ne kelamê Xwuda ne
Dilêbînin we b'cennetê

Ken behsê cennet horîyan
Xweşya cennetê fêkîyan
Xiyal in nabên rastîyan
Nînin eslê vê qisetê

Bi hîlan we dilêbînin
Bi gotnêt direw d'xapînin
Bi wî eqlî ew çû nabim
Agah nîn e kâinatê

Ger kitêbê bixwînin
Dê heqyê çawan bibînin
Dê zanin bêîlham dîn in
Inkar diken heqîqettê

Dîn û îmanan nanasin
Heyûla bi heq dinasin
Ji rehma Xwuda xelas in

[185] Xeşyet ('E): Tirs.

Inkar in ji bo axretê
Bo axretê bûy mûnkir
Bi fikrêt xwe bûne kafir
Gel şeytanî ehlê agir
Nema cihê hîdayetê

Qebûl naken ew Xwudayî
Nabêjin wî em yêt dayî
Day û baban em înayî
Qebûl naken xulqîyetê

Ew naken behsê cehnemê
Nebû û nabît çu demê
Me bi wê têxine xemê
Me bi vê bawerî netê

Her dem ken behsê horîyan
Me dilêbin hemî cîyan
Çû şol çênabin hivîyan
Bera xwe b'den jîn heyatê

Dibêjin jîna dinyayê
Weku çûn kes paşda nayê
Bûne cahil wek giyayê
Wêt kewtine nav zilletê

Zillet ne laîq wicdan e
insan diwêt xwe bizane
Xwe neînte rêza wan a
Da bigehte heqîqetê

insan baş in rast bibînin
Heq û niheqyan cih bînin
Cefaya dinê kişînin
Da bigehne heqîqetê

Fezîlet naskirna xwe ye
Hem nasîna Rebbê xwe ye
Xerîb derdê te gele ye
Hişyar be ji helaketê

**WERE TÊ BIFIKRE BIZANE**

Were tê bifikre û bizane
Çi dewr e çi zeman e
Çak û durust me nemane
Ne çare ye û ne derman e

Bê çare û bê îlac in
Feqîr in em zor muhtac in
Bêronahî bêsîrac[186] in
Mayne em bê ruh û can e

Ruh û can kewtne xeterê
Me nemaye keyfa berê
Pê hatine cihê serê
Zeman yê fend û fêlan e

Zeman bû yê fêl û hîlan
Bargir çû cihê kehilan[187]
Me bû hizret doyê[188] çêlan
Xêr û bereket nemane

Xêr û bereket wê biryay
Golik girêdan nîrê gay
Gawan rûniştî l'cihê axay
Rovî li cihê şêhran e

Rovî çeqel kewtne holê
Guhdirêj hakimê şolê
Meymun wê lê d'det daholê
Kewtar û piling b'de'wa ne

Piling l'pê neçîrê bezî
Gurg bûye şiwanê pezî
Hirç nobedar e l'naw rezî
Kîsel bûye pehlewan e

Kîsel pêlingê meydanê
Me mêrxas neman l'cîhanê

[186] Lampe, çira.
[187] Hespê bezandinê.
[188] Dew, av-mast.

Rêber zengînêt zeman e
Qewl û gotin her ya wan e

Mêrxasî maye bona ehlan
Ji bo kêmas û bed-eslan
Nîn e pirsa xwudan-eslan
Teyrê bum bû nêçîrwan e

Kund dibêjît ez bûme bazî
Ez nêçîrwan im hem tazî
Kî ye meydana min d'xwazî
Ez bûme mîrê teyran e

Mêrçakî ma bo qeleşa
Suhbet ma b'hîvya serxweşa
Şerim ma b'hîvya rûreşa
Eyb û sir l'me bûn talan e

Eyb û siran naweşêrin
Kitik bêjin em jî şêhr in
Sûtar bêjin em camêr in
Bûye xela xweşmêran e

Dinya wê l'me bûye tebdîl[189]
Nemayne mêrxasêt esîl
Hatne nav me pîs û bexîl
Jiyanê em bûyn pişman e

Pêşeman in dil bi keder
Cahil û ehmeq bûn rêber
Kêmasêt cih ne xwudan xeber
Rispî û mezin winda ne

Dewr bûye yê xwuda paran
Ew dixurin çan û karan
Kes pê nabetin çu çaran
Qewl û gotin her ya wan e

Qewl û qeraran ew d'bêjin
Me pîr û kal ker û gêj in
Hûn kewtiyên ji mêj in

[189] Guhartin.

We zêhn û fikr ne cih da ne

Zêhn û fikr li me winda bûn
Rêber û mezin nemabûn
Êş û derd li me cema bûn
Hemî halan paş da mane

Xerîbê bi derd û êş im
Ez neşêm duran darêjim
Kula dilê xwe pê d’rêjim
Zêhn û ziman min bela ne

## XEMDARÎ

Dem dazdeyê meha îlon
Sal du hizar bîst yek zayîn
Di nav huzûn û der-xem bûn
Me qest bibîte xembirîn

Zulm û tarî ser me da hat
Xwar û xesêt nava welat
Bi fikra xwe kirin xebat
Wan dilê me kirin hezîn

Dilêt xweş wan xemgîn kirin
Namûs û dîn dest me kirin
Ew qiphetan nafikirin
Nehêla wan dinya û dîn

Bi ‘ezmanî musulman in
Bi fêlan şuphê şeytan in
Dujminêt dîn û îman in
Ji edebê em dûr kirin

Nîn e hurmeta namûsê
Wek xayînan kewtne pusê
Bibin qurbana ûrisê
Li namûsê bûne xayîn

Dujminêt namûsa ‘ebdan
Nagirin hurmeta ferdan
Tub’et-beraz hemî erdan
Bed-namûs in ew der-zemîn

Bûne wehşî çend nezan in
Her kiryarê baş dizanin
Bêdîn û hem bêraman in
Gel her kesê hesûd û kîn

Bi hesûdî leh û le’eb
Mehrum in ji terz û edeb
Ne tedbîqa dîn û neseb
Her demêt wan bi şer û şîn

Şer û şînan xilas naken
Gotinêt heq qebûl naken
Çi hudûdan ew nas naken
Bo xirabyê her dem zemîn

Bingehêt fitne fesadê
Dijberêt karê xeyratê
Bûne nehs digel civatê
Ew eblehêt şeytan-hebîn

Bo şeytanî ew ummet in
Her dem bi sûc û qibhet in
Bêrê û terz û ‘adet in
Bo her kesê bûn xem-cemîn

Bûne kula peçeşêrê
Ya Reb dûr bêxe ji wêrê
Bin qurbana felêt dêrê
Dûrya wan da rehet bijîn

Xwezya xilas ban wan cihan
Fitne hilêt wan eblehan
Wan şeytanêt xwedyê rihan
Gelek ji ber wan digirîn

Kul û derd in bo welatî
Fitne fesadêt civatî
Dujminêt dîn û axretî
Xerîb pê bû hesretkêşîn

**XERÎB RABE**

Xerîb rabe tu ji wêrê
Tu bo nakey şola xêrê
'Umir çû nayê bi kêrê
Bo çi tu nakey tedbîrê

Te 'umr bo heftê û du sal
Nemaye milk nemaye mal
Te cih vebûye qebr û çal
Ji ew paş dê çîye kîrê

'Umrê dinê te bû bela
Salêt 'umrî te bûn xela
Tu dê b'çî mala 'emela
Tu bo wêrê ke sexbîrê

Te l'dinyayê risq kêm maye
Hevalan tu wê hêlayî
Xêr û 'emel dane bayî
Bifikre tu bi xemdarî

Nebêje hêştanê zû ye
Te 'umrê dinê borîye
Ciwanî l'te bezre bûye
Bo mirnê tu d'çî suwarî

Ecel têtin wek dujminî
Ji kin ve têt tu nabînî
Li çaw rê kesê namînî
Pişta hespî tînîd xarê

Her gav têtin bi xefletê
Namînît hîvya de'wetê
Ezraîl silavê d'detê
Namînît cih bo inkarê

Inkarkirin ye 'ebes[190] e
Qebûl naket rica kesê
Gava hat bêjîtin bes e
Dê b'cih bînît 'emrê borî

[190] 'Ebes ('E): Bêfayde.

‘Emr û ferman gava hatin
Kes neşêt gazindan ketin
Dem û gavêt me b’se’et in
Qebûl naket çu te’xîrê[191]

Emrê Xwuda te’xîr nîn e
Gava giheştê ew hîn e
Deqîqe li paşve nîn e
Dê bêt cih ew li ku derê

Nebû me’lum bo insanî
Dê l’kîrê teslîm ket canî
Ew maye l’emrê rehmanî
Xwuda d’zanît ewê sûre

‘Emrê Xwuda jîn û mirin
Em ji wexte rojek biçin
Me bi êşan tab nekirin
Bûn rewingê ser seferê

Sefer kewtîye berê min
Ji êşan nîn e halê min
Derd nivîsîn qedera min
Xwuda d’gel me bêt rehmetê

Tîrmeh bîst û sê germ şidet
Nesaxî l’min bûye zehmet
Rêwing im ez duyê se’et
Xwuda li me b’ketin çare

Sal du hezar û nozde ye
Êş wê l’min bûye zêde ye
Rêka min bo Enqerê ye
Ya Reb ke sefera xêrê

Sefer xêr bît Xwuda digel
Umêt hebît ‘emel digel
Êş û derd û birînêt gel
Kefaret in cihê xêrê

[191] Te’xîr (‘E): Paşveman.

Êş û elem kefaret in
Bo axretê ew serwet in
Bela musibet nî’met in
Şukirdar bît digel sebrê

Ronahî ne ew l’mehşerê
Weku diçine wê derê
Êş û sebr xêr têne berê
Terazya xêran têt xarê

Hindî êş û her elemek
Heta çît destî kelemek
Pê bezr dibîtin gunehek
Xwuda ev ‘emr kirye carî

Xerîb bawerî pê heye
Derd li axretê fayde ye
Di hedîsan da ev heye
Min bawer e bi mehşerê

**YÊKÊ ÎLONÊ**

Roj li me bû yêkê îlon
Bûye roja heqê insan
Gelek roj li ser me da çûn
Kanê mirov kanê insan

Beden-mirov çend gele ne
Xwudan-libas û berge ne
Li ser erdî zort qude ne
Tib'ê beşer nîn e gel wan

Sahibêt mal û serwet in
Bî kîn û kerb û hesed in
Xwe nanasin çi tib'et in
Gel nemaye rehm û îman

Bi ezmanî zor yê çak in
Berge û libas di pak in
Ji insafê di helak in
Zereyek gel nîn e wijdan

Bêwijdan mîna gurgan in
Dijberêt dîn û îman in
Karê wan qetl û talan in
Bûne şirîk di gel şeytan

Mirovkuj in li cîhanê
Dijberê 'emrê Qur'anê
Gel Xwuda kewtne isyanê
Li bîr nahêtin mirna wan

Mirn û hisap li bîr nînin
Li pêş te zor di şirîn in
Dil û qelbêt wan bi kîn in
Mirovê rast li me biryan

Mirovkuj in ew hemî dem
Xwûnrêj in ew bêtirs û xem
Qetlê bo xwe naken elem
Mal birin xelk hêla uryan

Şekl û sîma wek yê beşer
Fêl û ‘emel wehşêt beter
Ji insanan bûne veder
Xirapkar in meh û salan

Dîn û dewlet talan kirin
Edep exlaq winda kirin
Qewm û milet cuda kirin
Fitnekar in hemî halan

Fesad û fitnêt zemanî
Qedexe dan ber insanî
Çand û hûnerêt qewmînî
Hemî pêk ve kirne talan

Qel û talanên dinyayê
Tebdîlkirna vê xwezayê
Çêkirna gaz û kîmyayê
Pê d’kujin jin û etfalan

Dinya vê zulmê dewam d’ket
Kes xeyrî xwe qebûl naket
Bo dinya xwe dîn inkar d’ket
Nahêlît pîr û mindalan

Qetilkirna jin û mêra
Helalkirna malî pê ra
Xanî û mulk nehişt jê ra
Kanê insan ka musulman

**ZIMANÊ DAYÎKÊ**

Ewro bîst û yek e sibat
Roja zimanê zikmakî
Li me biryan kar û xebat
Nemane me xêr û çakî

Daykêt zik da em gêrandî
Bo dinyayê em înandî
Li ber singê xwe gêrandî
Ma tu şermê qet jê nakî

Meh û salan şîr daye te
Şûştin û xwudankirna te
Ew lorînkêt ber landka te
Tu bo çi wan fikir nakî

Bi şîrê xwe mezin kirî
Tu net razey bo te d'girî
Bo te xwe avêt agirî
Zimanê wê 'emel nakî

Çend gelek e heqê dayê
Eda nabît li dinyayê
Te gotnêt wê li bîr nayê
Ji hukmê Reb bawir nakî

Dayîk bo me taca ser e
Emrê Xwuda pêxember e
Hem ustad e hem rehber e
Tu bo vihê îdraq nakî

Xwudan kir bi ruh û canî
Tu ezmanê wê nizanî
Xeber nadey wî 'ezmanî
Heqê dayê inkar dikî

Nezanê zimanê dayê
Ew ehmeq e li dinyayê
Ewî jîyan wek gîyayê
Tu reda eslê xwe dikî

Yê nezanît lîsanê xwe
Neaxivît zimanê xwe
Bilan bigerît babê xwe
Kanê dê çawa peyda ket

Ezman nasnama insan e
Ji Xwuda hatî vê zane
Ferd zimanê xwe insan e
Kes neşêt inkarê biket

Roja Xaliq insan dayî
Zimanek yê bi wî dayî
Eve qanûna Xwudayî
Bo çi vihê bawir nakî

Sûra Îbrahîm ayet çar
Pexember hatne hemî car
Bi lîsanê qewm berpisyar
Da bo bêjît her tiştekê

Bi zimanê wan beyan ket
Emr û nehyêt Xwuda b'cih ket
Ferz û sunetan zikir ket
Da nebît mesûl carekê

Binêr li hukmê ayetê
Sêzde ji Sûra Hucratê
Nas cuda hatne xil'etê
Kî emrê Reb inkar dikî

'Esl û ziman bûn xulqîyet
Hatne ji padşahê Semed
Kes neşêt vê inkar biket
De bît munkir bi hukmekî

Terka zimanî û 'eslê
Inkara qewmê û neslê
Dûr e ji islam û 'edlê
Nîn e wê cihê karekê

Du hizar bîst û yek sibat
Rojek girîng bû li me hat

Şukur pîroz kir neborand
Xerîb bîr tînît dayîkê

Sûrey Rom te nexwandîye
Binêr ayet bîst û duye
Kanê ‘emrê Xwuda çî ye
Bo çi evihê sah nakî

Tu ‘emrê Xwuda bifikre
Hukmê ayetê hazir e
Xulqa insan curbecur e
Lewn û lîsan cuda dikî

Gel û ziman curbecur in
Xwudan eql ayet hazir in
Bo bi hikmet tê nafukrin
Da xêrekê tu kar bikî

Hukmê Xwuda û Qur‘anê
Hatna insan û cîhanê
Nebî Nuh heta vê anê
Di ispat in her cihekî

Ziman zengînya insan e
Nasnameya qebîlan e
Şeref hesyet û wijdan e
Nebe kole ji bo xelkî

Xerîb bêjît wer bibîne
Zimanê daykê şirîn e
Bi tamê wek hingivîn e
Jê wergire tu tamekî

**ZIMANÊ KURDÎ**

Ewro pazdey meha gulan
Bûy roja zimanê kurdî
Xwuda daye me ew lîsan
Şirîn e zimanê kurdî

Lewn[192] û lîsan Xwuda dane
Ferd b'lîsanê xwe insan e
Em lê nebûyne xwudan e
Şirîn e zimanê kurdî

Şirîntir e j'hingivîn e
Xwezya kesê b'zane xwîne
Dê hingê tamê bibîne
Şirîn e zimanê kurdî

Ziman nasnama insan e
Ew zimane zor ciwan e
Yê nexwûnît ne insan e
Şirîn e zimanê kurdî

Sal du hizar bist û yek e
Bo lîsanî b'ken destpêk e
B'zane ew zimanê dayîk e
Şirîn e zimanê kurdî

Pêşvebirna wî lîsanî
Ferz e ew li ser insanî
Da l'dinê nebît bîyanî
Şirîn e zimanê kurdî

Bûyn dijberê zimanê xwe
Me şerm kir ji lîsanê xwe
Me kir terka nasnama xwe
Şirîn e zimanê kurdî

Hişyar ken hûn evî qewmî
Ziman b'ken lîsanê fermî
Pêşve biben pêkve hemî
Şirîn e zimanê kurdî

[192] Şikl, teşe.

Şirîntir e j’qend nebatê
Biken rehber bo heyatê
Hûn b’ken xizmeta civatê
Şirîn e zimanê kurdî

Lîsan nasnamek olî ye
Xizmet wecibek qewmî ye
Ferz e li ser her kurdî ye
Şirîn e zimanê kurdî

Min bang zanayêt ciwakê
Edîp xwandîyên vê xakê
Bilan rabin bi çalakê
Şirîn e zimanê kurdî

Minnet ji Xwuda ku kurd im
Ne zulimkar im ne xurt im
Min xebatek kir bi ziwt im
Şirîn e zimanê kurdî

## 2. HELBESTÊN CIVAKÎ-II / Beyt

## BARÊ GIRAN

Barê giran da ser milan bi eqlê nezan me dabû rê
Rêyek rast em çûn bêwest her çiya me xwast hebû li werê

Me bar birin çûn xweş kirin me rê kurt kirin pê rehberî
Rehber bi eqil şol bûn sehil bêgoftûgil çûn seferê

Sefera xweş bi rengê geş em çûn bi meş wek cara berê
Ewrek reş da ber roja geş li me bû nexweş li her derê

Baran û deng birûs û terg dunya li me teng ber lêserê[193]
Nihal û dol çîya û çol bûn behr û gol wekî Hezerê

Nebûn xewas em bêqiyas cihekê nenas bûn mexdûrî
Rê li me birya ber stirya li çol û çîya ber qederê

Sefer ewraz rê bû diraz rêber bêmiraz kewt xeterê
Bar li me bû zor rê li me bû dûr gelyek kûr şêr kewte rê

Sefer dûr bû dahbe pir bû hirç û gurg bû yêt kewtne berê
Rê bû çîya dehl û gîya me neşêya li ewê derê

Barê bi seng ber me asteng li me bû direng zor bû tarî
Rê tarî bû me nedîbû zor herî bû ber me nikarî

Bar gelek e ne hindik e me digot we neke kederê
Em bêsebir rê bezre kir dor me agir kewtin çenberê

Rê bezre bû rêber nebû deşt fireh bû kewtine gerê
Geryan cih da jêk bûn cuda zor bûn fida li wê defterê

Hind fida bûn hind winda bûn hind bende bûn bi wê keserê
Çend bende ne çend bezre çend cihê xwe ne ew li kî derê

Destê diraz ji Xwudê daxwaz her çi miraz wê ket berê
Me hîv ye ji îlahî ye ya baş çî ye me di qederê

---

193 Lehî, avrabûn.

Ji şahê mezin em dixwazin bi xem û hezin wek berê
Binêrît halî cih bû xalî nebît talî gel xeterê

Hal nexweş e dil ney geş e bextek reş e kewtin ber sirê
Çenber sitûr e şikandin zor e dujmin har e kewt perê

Ya lazim çî ye tiştek dî ye veşartî ye ber çeperê
Ku bikeyn gelo rabin hilo dilê kulo biçne serê

Li seran sir e befra hur e ewr û gur e ber nezerê
Befr û baran tarî û duman em nav da man nahên derê

Li me bû şev mayn di xew negiheştne hev di nava hurê
Mayn ber derî şev li me tarî wext me borî bêmehderê

Keser kûr e xetek hûr e rêber dûr e naêt texyîrê[194]
Dîtin bi hikmet ew xweş ‘adet bêmuşeqet gel beserê

Eqlek nema kewtne xema em her dema xwûna cigerê
Ciger buryan her dem giryan em li hev civyan bo xeberê

Xeber nexweş dil pê bû reş têk bûn ateş her wek seqerê
Dil bû seqer jê girt xencer xwê kirne ser wekî mikserê

Dilê me sotin naêt gotin em firotin li wê derê
Hebît eser yar bît qeder xilas xeber bi muxteserê[195]

[194] Texyîr (‘E): Guhartin.
[195] Muxteser (‘E): Kurtahî, kurtî.

**BI SED SALAN**

Bi sed salan bimînim ez di nav qeyd û zindana
Bi sed salan bigeryêm ez li çol û çolistana

Bi sed salan ez dûr bimînim ji dîtna insana
Bi sed salan ez bijîm digel wehşî û heywana

Bi sed salan têhnî bimînim ez li beristana
Bi sed salan nexweş bimînim kunçê nexweşxana

Bi sed salan sa'il[196] bam gerode sûk û kolana
Bi sed salan koleyek bam digel rût û uryana

Bi sed salan hemalek bam piştîkêş nav dikana
Bi sed salan seyîsek[197] bam li nava tewilxana

Bi sed salan saqîyek bam şerabgêr li meyxana
Bi min çêtir e bimînim nik cahil û nezana

[196] Sa'il ('E): Xazok.
[197] Ji kesê ku hespan xwedî dike re tê gotin.

**DERDÊ ME**

Ya Reb çi tirs lerz hat bi ser me da
Xewf û wehmet kewtiye dilê me da

Bo me nemane çu sebr û aramî
Seranser girtî dinya we b'temamî

Nîn e kesek ji xwe emîn bîtin ew
Bo heyata xwe bi umêd bîtin ew

Ku hizaran nesaxan nalenal e
Ber dergê nexweşxanan kalekal e

Hindek gelek pîr in û ew di kal in
Hindek cahêl in ber êşê dinalin

Halekî çendî xirab û xeter e
Memleket wêrane û bêrehber e

Nexweşxanan nînin tê da çu derman
Doxtor nemane ji tirsan û wehman

Ew derde ne tenê di nav me da ye
Li çar iqlimê dinyayê bela ye

Her dem tirsa mirinê ber serê me
Nabiryêtin carek ew ji zihna me

Kesê çu xeberek ji kesê nîn e
Her kesek bi derdê xwe ve dimîne

Zengîn kewtiye xema serweta xwe
Feqîr yê kewtiye derdê canê xwe

Zengîn meşgul e b'hisaba mulk malî
Ji ber wê nîn e wî çu wextê xalî

Hisab û hisret her dem wê li fikrê
Namînît cihê îbadet û zikrê

Her gav bi hisab û kitabê meşgûl
Nîn e deftera wî ‘emelek meqbûl

Hesûdî û hisret ser bûne hakim
Her dem meşgûl e bi cem’a derahim

Nîn e weqit ku mirin bîrê bêtin
Ewî mal ji can şirîntir diwêtin

Ger meqsed mal bît axret naêt bîrê
Fam naket ku kal û ker kor û pîr e

Ewî cema kir bi sed derd û zehmet
Waris belav d’ket bêendazer[198] du qet

Waris kom nekir ku zanît qîmetê
Bêfayde diçît keda wê zehmetê

Ew ji insanêt ku heyat-xwusar in
Mal cema kirin ne xêr û ne xwarin

Ew bûne kole bona mal û serwet
Di nav destêt ‘eyal da bûyne ibret

Yêt wesa nin dîn dabûne bi ‘emel
Ulaîke kel en’am bel hum edal[199]

‘Emrê Xwuda heye bo wan yê bariz
Ew in yêt xirabkar bo ‘emelî diz

Ne qelban idrak çawnezar ne guhdar
Her wext û kar dijberê dîn û inkar

Dîn bi mal guhorin îbadet bi şol
Bi heramî zik perçivand kir dahol

Nîn e tirsa roja mirnê û mehşer
Mehrum in ji wexwarna awa kewser

---

[198] Bêpergal.
[199] Ayeteke Qur‘anê ye. Wate: Wekî heywanetî ne û ji heywanî kêmtir in.

Ey xwudan lutfê erhemê rahimîn[200]
Ey xwedyê narî û cenneta mubîn

Ey padşahê Zul Celal ‘alî ‘elem
Ey xafirê[201] sûc û zenban pir kerem

Hîvîdar im bo rehma te xufranê
Dûr nebim ji ‘emrê te û Qur‘anê

Nebim perîşan û rûreş mehşerê
Nebim digel ehlê doj û seqerê

Xerîb im bi sed fîxan dad û meded
Hîvîdar im ez li dergahê Samed[202]

Min bi hizaran sûc û guneh hene
Hemî nav lutf û rehma te bezre ne

Tu qebûl key du’ayêt wî Xerîbî
Hîvîdar im ‘efû key bênesîbî

Cih bigirît ew jî li cenneta te
Xerîb ‘efû bît bo xatra rehma te

---

[200] Ev her du sitafên Xwuda yên rehmetê ne.
[201] Xafir: Efûker.
[202] Navekê Xwuda ye. Wateya wê ewe ku her kes muhtacê wî ye lê ew muhtacê kesê û çu nîn e.

**DINYA DERDAN**

Min mêze kir li dinya derdan dinya ne wiha ye
Xweşî û rehetî nînin me nedît çu sefa ye

Rihet û zewq û xweşî nînin bûne xem û keder
Diltengî û lêbandin û hîle ew karê me ye

Me vîya dinya rehet ba wek meydanê lê nebû
Bûye cihê kul û derdan ‘umr pê bû bêbiha ye

Xêr nemaye şer û ceng e her dem dibînin ewan
Bûye cihê kîn û kerban rehetî lê nemaye

Me zemanek zor xirab hat xêr û bereket nema
Winda bûne mal serwet esbab û alet nemaye

Bûn fidayêt vî zemanî li me rahet qet nema
Bû cihê jar û feqîran xweşî li me xela ye

Mal bûne talan berbûyne nava çol û nihalan
Hatine rêza gîsk û kewalan nema çi rê ye

Nemane insaf û ‘edalet bûn zalim lêbelê
Bûn gurgêt nav pez bêexlaqî heddê istiwa ye

Nexweşî û derd û kovanan dibînin her demê
Fikr û xayret çu nînin bûn dumana ber hewa ye

Peyda nabîtin me rehberek hebît yî rêşinas
Bînte rêkê xar û xesen mucrum û hem asî ye

Eger ‘emr û fermanek hebîtin ji Rebbê mezin
Bo emr û fermana wî me dijberî qet çu nîye

Ji neşa qedeha badê dil pê tarî û tejî
Nîn e hacet bi awê qedeha min têra heye

Nîn e keyfek min di dil da ji xeyrî vê kederê
Êş û derdan dê cuda keyn bîne ser rêya berê

Rêya rast me xuya bît lê bimeşin em her demê
Tabi’ rêya heq bin bo me gelek ye bi fayde ye

Fayde û kar qet nemabûn bû xwusar û hem zerer
Nîn e cihê çakiyê kar bo me bûyne bela ye

Wextê xêrê hate ser me me nezanî dê çi keyn
Jan di dil da bûn waqî bo me bû êş û bela ye

Bike şukrê bo Xwuda yî xirabtir lê naêtin
Daîm ji qelbî du’a bike ji bo mûmina ye

Bo Xerîb bike du’ayê çend sale b’derd û elem
Qisseya derdê dinê te dirêj kir pir zêde ye

**DILÊ MIN**

Bi qasî dilê min ye fireh e deşta Gewerê
Lê şîn bûne gul û sosin kûlîlkêt luleperê

Merg û çîmen awêt sar bû cihê seyran û geştê
Bo dilê dildar û dostan biken seyrê l'wê deştê

Bo dilhezinan xemêt dil pê b'revînin demekê
Jibîr biken xem û kulan tena bibin bêhnekê

Da nêrin li cama dil derkevin ji behra xeman
Pavêjin derd û kulan derkevin ew ji eleman

Da dil û can pêk ve keywxeş bin biken şahya dila
Ji nû ve ruh bêt ber da xwûn şol ket li dest û mila

Dîsa dil tebdil bibin wekî nû têne jiyanê
Da dilêt sitemkar pêk bên gel yêk biken dîlan e

Te kirin nav êş û kulan ey dilê xirab tarî
Te em dûr kirin ji wê dîsan dikeyn şîn û zarî

Ka were carek ku bikeyn seyranê li wê deştê
Were da demek pêk ve biken em seyran û geştê

Berê xwe deyn refêt teyran dengê kuling û qaza
Pêk ve destan bilind ken ji Xwuda biken daxwaza

Berê xwe bidene qaz û qumrîyan çend bi keyf in
Da em jî her wekî wan bi keyf bin û digel hev bin

Dildar bi keyfa dil binêrin li rêya dildara
Nezerdar bin bi pêş yêkûdu ve di nav gulzara

Kul û derdan pê sivik ken di nav gul û çîmenî
Bin dermanê dilan derd û kul nemînin bedenî

Dermanê dilêt birîn çawanê dê derman bibît
Jê wergirît îlacek da derd dermanî bibînît

Were bes ke tu ji evîna dîlberan dûr here
Ewêt kewtiye di nav da çu caran navegere

Evîn dilhelîn e disojît dilan û cîgerê
Derd û xeman bes bicemine razî be b’qederê

Ewê teslîm bît bi qederê ew dilan ron dike
Xaliq çi teqdîr kirbît tu jî ewê qebûl bike

Yê bi dinyayê muptela bît serî tên sed bela
Derd û elem fikr û eqlan nahêlît bît muptela

Xerîb were bes ke ji dinê tu li ser seferê
Tu bûy birîndar û bêhes maye wê li wê derê

## DINYA DIREWÎN

Ew dinya direvîn te ne lêbînît ey heval
Xaîn û xedar e bo kes namînît ey heval

Ew xana du derge ye yê danayê dê biçît
Bi çend rojan mêhvan e ew li wêrê namînît

Xirabeke wêran e ew te neînte lebê
Lawînya wê û ciwanya wê bîne hisabê

Bax û bostanêt xweş in ema di bêdewam in
Yêt xwudan-eqil çu caran bi wê qanih nabin

Ew cîhanek bêbeqa ye tu bizane ey dost
Fanî û bêbiha ye bizane rast û dirust

Jîyan digel wê ye bêesas û ye heba ye
Xwudan-eqlan çu car xwe pê ve girê nedaye

Yê eqlî aşîna bît hewes naket dinyayê
Yê bêmeqsed û bêmurad e ew bo dûmayê

**EZ DIXWAZIM**

Ez dixwazim xeman ji dilî der kem pavêjim
Ez êş û eleman ji xwe dûr kem rahavêjim

Min dil tejîye ji xeman ez neşêm bikêşim
Dil yê birîn e ez neşêmê xwe jê vekêşim

Dost û ehbaban xwe j'min dûr kir bêsûc û xeta
Bûme xemnakê derd û kulan her dem ez gêj im

Kanê dostêt heqîqî ji bo min nabin peyda
Kan ew derddaşêt ez derd û gazindan bo d'bêjim

Dîsan wek caran ez êş û derdan bo pejmêrim
Agirê derdê dilê xwe bişêm bo wan bêjim

Bigeryêm li şar û gundan bi seyah û rêkan
Peyda kem yêt wek xwe derd û gazindan bo bêjim

Nanasim ecêb wekî min bi derd û kul hene
Ez ne geryam ji derdê beden ma dê çi bêjim

Derdê beden û cîlwa yarê kirim pîr û kal
Tenê xeyala min e her dem ronkan dirêjim

Tab û teqet min çu nînin bê pê û ker û kor
Bedenê bi derd û elem bêfikr e ji mêj im

Kewtime ji geryan û seyranê bê pê û dest
Xerîbê bêçare mayime bi derd û êş im

**HERÊ DAYÊ**

Bi şev û roj dibêjim herê dayê
Tu şirîntir î ji her tiştê dinyayê

Çawan dê bişêm heqê te eda kem
Pisyara zana û ‘aliman dikem

Nîn e kes bişêt heqê te cih bînît
Ew zehmeta tu b’ewladî ve d’bînî

Çu car naête cih ew li dinyayê
Eda nabît heqê te çu car dayê

Te di zikê xwe da em ê d’gerandî
Ber singê xwe helgirtî û mêjandî

Rabûn, geryan û razan hemî b’zehmet
Te şîrê memkê xwe da me bêminet

Tu çêtirîn insanî li dinyayê
Dizanim kes mislê te nîn e dayê

Lorîn bo min digotin li ser landkê
Ber min te ser nedana ser balgekê

Wextê xelkê di xew de xewn didîtin
Te lalik di ber lanka min ra gotin

Ez mezin kirim çend b’naz û delalî
Gawa digirîm tu bo min dinalî

Xwezya hizar salî bam li dinyayê
Ez axa bin pêyêt te bama dayê

Tu bêrîvan bûyî bo jiyana min
Malê da kabanî bûy bo rizqê min

Sir û serma tu qet nedirûniştî
Şev û roj kar û emel şol û piştî

Hemî ji bo xatra min te dikirin
Çawan ew heq dê bête jibîrkirin

Te rizq nedixwar hêla we ji bo min
Te heq gelek êxiste ser pişta min

Tu helal nekey heqê xwe li ser me
Biheşt heram dibîtin ji bona me

Gel emrê Xwuda gotna day û baban
Yê miti' bît xilas e her hisaban

Du'ayêt qebûl yêt day û baban in
Du'ayêt bo ewladan qet red nabin

Bi emrê Xwudê û gotnên pêxember
Day û baban bo xwe bikene rêber

Fermana pêxemberî baş bizanin
Bo me biheşt bin pêyêt dayîkan in

**MALE-ŞÊX**

Male-şêxek hebû zor ‘ilimdar
Em bi ‘esla wan nebûn xeberdar

Ew xwudanêt ‘ilm û fezilet bûn
Di ‘ilmî da ew zor bi huner bûn

Xwudanêt siran û hem kiramet
Ehlê zikrî û hem yê ‘ibadet

Malbatek bû ew ji malêt qedîm
Xwudanêt welayet û hem helîm

Ew maleke xwudanê ‘irfanê
Wan nifş li kuran qut bû cîhanê

Em ji ‘esl û nesla wan nezanin
Kan ji kîjan qewm û qebîlanin

Xwudanêt mulk û mal û hem serwet
Meşhûr bûn bi mustecab û de’wet

Dûmaya wan hat bi Mela Elî
Zatekî baş û hem tub’et-welî

Xitama neslê Mela Elî ye
Ewî bi tenê kiçek hebûye

Ew da feqyê xwe Mela Mirtiza
Mulk û dertan wî danê bi riza

Mela Mirtiza zava qebûl kir
Mal û serwet jî hemî hube kir

Erdê dest me da mayî ji wan e
Em pê ‘emel dikeyn xêra wan e

Mela Mirtiza rûnişt cihê wî
Xalî nehêlabû postê ewî

‘Alimek baş bû ew yê muderis
Muteqî bû û hem ji Xwudê-tirs

Wî mal û serwet hêlan ji bo me
Mixabin ku ew naên bîra me

Dinyayeke zor ye bêwefa ye
Nizanin ka bo me ji kê maye

Min ew tişt zanîn ji bapîrê xwe
Danan nav rêzêt nivîsîna xwe

Ku nifş bizanît û xeberdar bin
Bo xwudanêt berê minetdar bin

Bizanin ji kê bo ewan maye
Mulkê dinê nabîtin heba ye

Xerîb wêt nivîsî ‘eseha wê
Du’aker bo ew li xwudanêt wê

**ROJA DAWÎ**

Roj dawî bûn ez dê biçim
Bênetîce ez ku ve çim

Derdan ez girtme çenberê
Li min nehişt şewqa berê

Dûr bûme ez ji heyatê
Nagrim tam keyf hem lezetê

Her fikr û xiyala dil e
Bi êş birîn derd hem kul e

Dûr im ji mal ez bi tenê
Bûm tarikê b'hîvya mirnê

Her li hîvyê me bi sebrê
Westam dê biçime qebrê

Hekîman paşve rêkirim
Ne hîvî ne bihvî kirim

Hêlam mabeyna du tirsan
Nîn e min cewaba pirsan

Çi hekimê jê d'kem suwal
Bêezman e ew ker û lal

Wî nevêt bidet cewabê
Ew çawa dê ket xîtabê

Fikr û wehm li min zêde ne
Êş û jan tejî beden e

Bêîlaç mayne diltarî
Her bi girî û hawar î

Du heftî ye nav nivînê
Min nebihîst behsê jînê

Guh lê nebûm gotna şirîn
Ji tahlîyê pê ve nedîn

Berxê ber kêra qesab in
Ne dimirin ne dirabin

Li maybeyna mirn û jînê
Me şol maye gel nalînê

Hekîmê heq her Xwuda ye
Min ji zatê wî rica ye

Şifa b'det bi navê Şafî
Rehma wî bo me ye kafî

Ew nedet nînin çu derman
Her tiştî ew diket ferman

Derd û derman tev bi wî ne
Şafî ji xeyrî wî nîn e

Şifa d'vêt ji zatê Burhan
Ew e dermanê tev derdan

Derd û îllet lalî wî ne
Şifa hikmet pîvya wî ne

Min 'erz e ji zatî Barî
Hebît derman bo wî jarî

Xweş ket dilê wî ji êşê
Bidetê sihhet hem neşê

Keyf û şahyan ew biketin
Tama jînê seh biketin

Roja reş lê bît çira ye
Ew jî peyda ket şifa ye

Şifa bît ji teref Rehman
Xilas bîtin ew ji eleman

Pêda ket xêr û şifayê
Xilas bît ji vê cefayê

Bes bît bo wî cefakarî
Şifa bît destûra Barî

Xilas bîtin ji zehmetan
Efû bîtin ji ‘illetan

Xerîbek bêliv hereket
Nehişt bo quwet û qudret

Şev û roj lê bûyne zindan
Ya Reb tu l’me bibe xwudan

**ROJEK JI MEHA TÎRMEHÊ**

Rojek ji wê meha tîrmehê
Hûn guh bidene vê qisehê

Zor nexweş bûm li nav nivînê
Ji ber germa-gura havînê

Min neşya ji cihê xwe rabim
Bêquwet û zor yê bêtab im

Neşêm ez biçime geryanê
Digel hevalan û seyranê

Ez mîna teyrekê bêper im
Neşêm rabim û ne bigerim

Bûme mehkum nava nivînê
Ez dirêjim rondikên xwûnê

Kesek naket li min pisyarê
Çaw nêhêrim sibê êvarê

Carek dilê min hûnik nabît
Êşa li beden sivik nabît

Ez mabûm di nav wî halî da
Meh û rojan di nav xanî da

Rojekê digel sibê zûyê
Hate wextê têştê gehîyê

Telefona min zengek lêda
Heyirî mam di wê gavê da

'Ecêb kî ye di vî zemanî
Ku wî ez li bîra xwe anî

Wan pisyar kirin bi derhalî
Gelo herê kan tu li mal î

Min nas kirin du dostêt berê
Ji Colemêrg hatbû Geverê

Mela Kerem yêk Mela ‘Elî
Gotin edresê bike belî

Ew hevalê nav Mela Kerem
Gava ku tu rûnîye li cem

Sohbetxweş û hem rû bi kenî
Cem wî xem mirovî namînî

Giheştbû dostê Mela ‘Elî
Min nezanî şêx bûn yan welî

Di wî zemanê min yê berteng
Li min ron kirin roj û hem reng

Li derî dan û gazî kirin
Bi lez çûm û der bo vekirin

Min dît hatin ew her du heval
Bi jor kewtin û hatine mal

Bi selam kelam hem keyfxweşî
Ji bîra min çûn çend nexweşî

Qet êş û xemek li min nema
Keyfxweş bûm weku her dema

Dinya tarî li min ron kirin
Dem û wextêt min zor xweş kirin

Ciwanîya min hat bîra min
Ruh hate ber dest û pêyêt min

Mela Kerem zor xeberxweş e
Reng û rûmet wek gula geş e

Cem min rûnişt wek hemî caran
Dest havête behs û pisyaran

Mela ‘Elî jî guhdarî d’kir
Min pisyara babê wî jê d’kir

Kanê çawa ye bi çi hal e
Pîremêrekî gelek kal e

‘Umir borîy ji heştê salî
Min neşîya biçime lalî

Digel hevalan d’kem sohbetê
Ji ber nedîtnê û hesretê

Êş û xem li min sivik kirin
Tu d’bêjî Ilyas û Xizir in

Herwekî hekîm û luqman bûn
Ew ji bo min ruh û hem can bûn

Ji nû ve bi hiş û hizr hatim
Mîna Rostem û hem Ferhad im

Me sohbet kirin digel çayê
Mixabin wext hate dûmayê

Êdî rabûn xatir xwestin
Me ehd û peyman pekve bestin

Soz û peyman me dabûne yêk
Nêzîk da bêyne ve lalî yêk

Ew her du hevalêt wet şirîn
Hindî ku li dinyayê bijîn

Serfiraz û hem serbilind bin
Ew xwudanêt ‘ilm û huner bin

Xeman nekêşin li dinyayê
Xwudanxêr bin ew li uqbayê

Hîvî dikem ji zatê Xwuda
Ji rastîyê nebine cuda

Du’ayek bû min ji Xwuday xwest
Bimînin li ser ehda elest

Ez ne mecnûn im û ney dîn im
Bi sergêjî ez divehûnim

Hîvî dikem Gulordîyê Jar
Jibîr neken hûn ewî çu car

## SELAMA BIRAYÎ

Selam ser te bin ey exî min bira
Te rumet ron bîtin her wekî çira

Kanê gelo te birme ji bîra xwe
Silawa min qebûl bike ji bo xwe

Nebêje ez hatime j'bîrkirinê
Em jêk nabin illakî bi mirinê

Biratiya her kesî bi lisan e
Biratiya me bi qelb û dilan e

Xwuda l'te qewî[203] ket qelb û îmanê
Mumînek xas bî di hukmê Qur'anê

Xwuda te b'ilm û îbadet biketin
Te bi quwwet û sihhet cemîl ketin

Xwuda te b'îmanê kamil biketin
Rehm û fedla xwe l'ser te zêde ketin

Me dostanî gelek e xweş û şirîn e
Dostanî çawa ne 'alem bibîne

Dostanya me nemaye tenê bi dev
Bo sedaqetê em giheştine hev

Tu dibînî dostanya me zelal e
Ne l'ser menfeetê ye ne l'ser mal e

Li cem kes nemaye dostanya we rast
Tu dibînî dostêt menfe'et-perest

Dostanya kesê tu neke sedaqet
Çaw lê ye ew hîlekê li te biket

Li nik kesê nemaye bextê temam
Çi axa bît çi geda bît çi xulam

---

[203] Zêde, bi qewet.

Çi cema’et çi kasib bît çi îmam
Dostanî bi hemî şeklan bûye xam

Ewil dê bi dostane dê bên cem te
Paşî bi hîle dê bixwen malê te

Sed sûnd û we’d û hem sed hizar qesem
Dê cih bînît hêj nerabûyî ji cem

Sed soz û we’d û sed hizar sûnd we’îd[204]
Carek dî tu nabînî û te nedît

Carek dê l’nav milêt te zerbê danî
Tu nabînî ne li sukê ne xanî

Nav ciwakê nîşan te didet hurmet
Bi tenê tu nabînî çu car û wext

Xwe l’te diveşêre da tu nexwazî
Gava b’xwazî ew dibîte ne razî

Sedaqeta pêş çu cihan nemaye
Dinya l’qerara xwe nerawestaye

Ey birader guh bidê gelek cara
Soz û we’dêd xwe nehêle çu cara

Min kir suhbet tu qebûl ke nesihet
Wêhê ji bona xwe bikene ‘adet

Hûn guh bidene nesihetê her car
Di jiyarê de hûn dê bin xwudan kar

Her çiyê nesihetan guhdar bîtin
Dê li nav ciwatê serfiraz bîtin

Nesihetên Xerîb neken hûn jibîr
Bicih bînin heta dibin kal û pîr

[204] Sozdayîna gelek tiştan.

**SIHHETA MIN**

Min li dinyayê dîtin gelek derd û elem
Nav zemanî kewtine sihhet bûyne elem

Leşkerê kul û derdan li min hat hucûmê
Hate ser min bi afad û derd û elemê

Çend nesaxî hene bêne ser min tîj û tîr
Dame ber zerban bi rumhan û keybir û şîr

Her kesê hes ket derdan bibînît bilan bêt
Bibînît û bizanît kan çi ji destî têt

Bûme nexweşxana derdan û eleman rast
Nîn e şûrê herbê min di dest da bikim qest

Da pê bikim ceng û difa' ji bona canî
Çend derd û êş hene min ciwyan di yêk anê

Bilan bizanin kan çend derd li min yêt hene
Vî halî kes neşêt biket tab êş zêde ne

Min şêst salan bi sihet 'umir wê borîye
Hindekê jî bi derdan biçît heqê wî ye

Li dinyayê derd û elem xêr in bo axret
Hemyan tîne hisabê bela û musîbet

Xweşya dinyayê ezab e ji bo axretê
Nê ji ber hindê ye bît mani'ê cennetê

Dostêt sadiq çu nemane siran pê bidem
Evro dost im sibê defka te dê lê bidem

Ew têt nik te bo îhtiyaç tu xweş zilam î
Gava bêminnet bûn xirab nezan hem xam î

Min dîtne gelek ew tiştene wext û deman
Bûme şahîd bo wê ispat in hemî zeman

Min ji destêt wesan kêşane gelek cefa

Roja heşr de'wacî me hizûra Mustefa

Ji Xwuda zêde dost çu nînin sadiq ew e
Satirê sirran û 'eyban her derê ew e

Îmdad û harîkarî ji Xaliq xwestiye
Şafîyê derd û êşan xeyrî wî kes nîye

Ey Xaliq tu Rebê 'alî xwedî keremê
Tu bi lutfa xwe bibarîne ser me rehmê

Xerîb xwe bispêre Xalîqê Rebbê 'ezîm
Bêje Qed tewekelna 'Elellahî-l kerîm[205]

[205] Anku, bi qesem tewekulîya xwe didem Xwudayê sahib-kerem.

## 3. HELBESTÊN DÎNÎ-I / Çarîn

## ‘ELAMETÊN MINAFIQAN

Xwuda Rebê Zul-Celal
Wesfa kesêt xiraphal
Bi qewl û şekl û şemal
Bo me diketin dîhar

Xwuda ye bo me raziq
Gotna nebîyê sadiq
Behsê ‘ebdêt minafiq
Yêt cih bûy esfelê nar

Wan cih bijart nav narî
Kes nîn e bête yarî
Direw û sûndêt xwarî
Ew yêt bêsoz û qirar

Ewan ‘elamet sê ne
Her sê nehyêt Xwudê ne
Ew ‘emelêt fitnê ne
Rastî wan nîn e çu car

Yê ewil direwîn e
Rastî di gel da nîn e
Dilê wan yê xayîn e
‘Umir direw bû xusar

Rastî nîn e nav devî
Hene direwêt qewî
Rext rastîyê nakevî
Dev her gavê yê mûrdar

Li cem Xwuda kazibîn[206]
Gunehkar û muznibîn[207]
Ji Reb dûr şeytan hebîn
Xirapkar in dev û zar

[206] Kazibîn (‘E): Direwker.
[207] Muznibîn (‘E): Gunehker.

Duyê bêqirar û soz
Bi we’de û kîn û doz
Bûye arê mirov soz
Dil bi kîn û her xedar

Soz û qirar cih nînin
Ser we’dêt xwe namînin
Gel muminan xayîn in
Mumin jê bûne vêzar

Hizar sûndan dixwînin
Ew muminan lêbînin
Di ser ve rûşirîn in
Bin da wekî koremar

Yê direw kirye sin’et
Bûye laîq bo le’net
Kes qîmetê pê nadet
Yê mayî bêitîbar

Yê sêyê lê b’key dîqet
Sebr û soz û dîrayet
Li wî naket surayet[208]
Di her demê xirapkar

Li emanet xîyanet
Direw û sûnd in sin’et
Fend û hîle hem firset
Gel her kesê yê dilxwar

Soz bidê bi emanet
Nik namînît yêk se’et
Dê zû ji dev xwe berdet
Dê geryêt li nava şar

Xayînêt emanetan
Xirap diken ‘adetan
Diherifînin sin’etan
Hemî jê dibin dilsar

[208] Surayet (‘E): Tesîr, bandor.

Dibên em musulman in
Xwudan-îman Qur‘an in
Digel we dil û can in
Me dilêbin hemî car

Wan qelb bi nesaxî ye
Kar û îş xirabî ye
Gel her kes xayînî ye
Di her dem bûne neyar

Hindî ku ew minafiq
Dijberêt ‘emrê Xaliq
Çu car nabine sadiq
Bo heq ew nebûn guhdar

Heq li fikra wan nîn e
Wan kar hesûd û kîn e
Bawerî bi Reb nîn e
Di her demê ew inkar

Xerîb ev tişte gotin
Eql û zêhn pê firotin
‘Ezman û dev xwe sotin
Hewar kem Rebê Cebar

**BEHSEK JI DINYAYÊ**

Bikeyn behsek ji dinyayê
Ji wê mesken û serayê
Ye fanî û bêesas e
Ey gelê aqilşînas e

Ger bifikrî dê bizanî
Tu bide xatra rehmanî
Xwe hişyar ke ji xefletê
Bike karî bo axretê

Şew û rojan tu bi kar î
Hindî te beden dikarî
Hindî beden hebît sihet
Dest û pîyan hebît quwet

Bike tu zikra Xwudayî
Nebe ehlê paşvemayî
Tu nebe ji wan na-ehla
Ji xirab û 'emel cehla

Xwuda çawa kirye ferman
Bicih bîne 'emr û nehyan
Tu pêk bîne 'emrê barî
Hêj tu neçûy cihê tarî

Bike tewbe di wextî da
Nebe rûreş di heşrê da
Were guh de nesîhetê
Bibe ehlê 'îbadetê

'İnsan ew e xwe binasî
Ne ku ew bibîte asî
'Emrê Xwuda ser me ferz e
Xwuda 'ewil kirye 'erz e

Bibe mûtî' bo Xwudayî
Nebe munkîr li dinyayê
Ji rastîyê nebe cuda
Ta bo xatra navê Xwuda

Nebe şirîkê xiraba
Bigre xatra day û baba
Bibe tu ji ehlê xêra
Rehmet li miryên guhdêra

**BEHSÊ EDEBÊ**

Were bira min hîvî ye
Guh de ’emrê îlahî ye
Bo insanan pêdivî ye
Baş bizane edeb çî ye

Edeb meşhûr bi sê herfan
Rimûzên e ew bi ‘irfan
Neken terka ewan wesfan
Bo mûmînan mecbûrî ye

Ya baş ew e insan bixwe
Xwudan bîtin li devê xwe
Bişêwirît gel eqlê xwe
Neket sûcê insanî ye

Baş bifikrît baş xeber det
Her kelam ji dev neberdet
Sir û halan dê heder det
Biket hifza lîsanî ye

Şirazî kirye xeberdan
Dinya bi lewzek bît weran
Rûvî tînte rêza şêran
Xirabziman nezanî ye

Guh de hedîsa pêxember
Zor guhdar be kêm de xeber
Xêr xeber de ya sukûtker
Ew terzekê edebî ye

‘Ezmanê req li her derê
Xwudanî têxte xeterê
Dema xirab tête derê
Ew nazivirîte cîye

Kilam pêje paşî bêje
Bi sozan duran darêje
Hewayê xwe nehavêje
Dê zivirîte ganê te

Sir êxsîrê xwudanê xwe
Tu ewê pêle lalê xwe
Nebe êxsîrê lewza xwe
Bifikre çi li dû heye

‘Emrê Xwuda bicih bîne
Zana nezan wek êk nîn e
Nezan cahilêt nav dîn e
Fermana heq vî şeklî ye

Fêla xirab şola xelel
Destan nede karê dexel
Li axretê dê bî mehtel
Ser te dê den şahdehî ye

Destan nebe şola xirab
Bîne kar bo tiştê sewab
Da li mehşer bidey cewab
Da giran bêt terazî ye

Axreta xwe neke wêran
Tu giran ke qama xêran
Gel sehaban merdeşêran
Da nemînî dûmahî ye

Dest û ziman te bi xêr bin
Kar û ‘emel te bi kêr bin
‘Emr û nehî te guhdêr bin
Li mehşerê ronahî ye

Cil û bergan xwe rûs neke
Usûla dîn xirab neke
Şermê ji Rebê xwe bike
Perdê heyay pêle cîye

Perdê edeb nedirîne
Zirxê namûs nelivîne
Eve terzêt îslamî ne
‘Edeteke cîhanî ye

Destan nebe xirabîyê
Be dijber hiz û dizîyê

Qebûl neke zordarîyê
Her tişt cih bêt bi heqî ye

Çaw nede namûsa ‘ebdan
Nexwe tu heqê çu ferdan
Nebe mufterîyê merdan
Tehlîkeka civatî ye

Nekeve hukmê nefsa xwe
Be xwudan dest û çawêt xwe
Nebe xayînê ruha xwe
Ew şoleka bêeqlî ye

Xwudaneqil çakyê diken
Xirabîyan men’e diken
Her du dinyan ew kar diken
Bîte zatek axretî ye

Axret kar d’bît li dinyayê
Bin xwudanxêr li dûmayê
Wêrê nekevne cezayê
Ew dibine biheştî ye

Yê li dînê xwe bin xwudan
Jîyarê d’ken heq-musulman
Gehne ber rehmeta Rehman
Biheşt bo wan ebedî ye

Biheşt heq e bo wan kesan
Ew dûr bûn ji xar û xesan
Ye herwe nîn e ew wesan
Lazim xeyretek kulî ye

Kulî wext û hemî hînan
Yê ‘emr û nehî cih înan
Nekevît heram û xwûnan
Rêka wan bi sanahî ye

Ewêt rêke bezre kirî
Kîn li qelbê wan ewirî
Bi gunehan dil reş kirî
Rêka ewan ye tarî ye

Rast rê neçî ye xeter e
Muxalif eqlê beşer e
Te li berê hey sefer e
Da sebir bêt li qebrî ye

Sebr û tebat wêrê zor e
Hukmet Xwuda lê nebore
Tu ‘edetan neguhore
Dijber ‘emrê îlahî ye

Xerîb rêya te çawan e
Sal û rojêt te kêm mane
Soz û fêlan be xwudane
Bi xêr bêtin dûmahî ye

**BEHSÊ RIBAYÊ**

Da biken behsê ribayê
Ceza zor e li dinyayê
Hilak bûne li ‘uqbayê
Xwuda jê dûr ket muminî

Riba bi du çeşîdan e
Her duk jî bi zedehya ne
Êk zêdehya ji we’dan e
Ya dî zêdehya der-anî

Her du bi ayet heram in
Gunehêt wê qet narabin
Yêt dijber ‘emrê Xwuda bin
‘Efû nabin pêş rehmanî

Ew kesanêt ku riba-xwer
Tên mehşerê din û efter
Ji ber ku gotin ew xeber
Ew bazareke cîhanî

Xwuda be’î helal kirye
Ribakirin heram kirye
Tewbekirin ‘emir kirye
Bêtewbe bûye nîranî

Xwuda ribayê d’birînît
Sedeqe berdewam d’mînît
‘Emrê Xwuda wihê tînît
Rûreş e li cihê fanî

Ew îmandarê bi bawer
Bêriba dûr e ji agir
Neçe li pê fê’la kafir
Da bimînît musulmanî

Xwe bide paş tu we neke
Şerê Xwuda resûl neke

Cih li cehnemê xweş neke
Bi re'sûmal[209] bibe qanî

Ne mezlûm be ne zulumkar
Dîn bi riba neke xusar
Rojek dê b'key gazî hewar
Çu imdadan tu nabînî

Nebî got bi hedîsekê
Zina û riba li cihekê
Wan heq kirye 'ezabekê
Afatê ji Xwuda tînî

Sehabê pêxember Cabir
Ji resûl wî rîvayet kir
Le'net li ribaxwerî kir
Şahid û hem yê nabeynê

Riba kedê heba diket
Ji rêka Xwuda cuda d'ket
Ji bo agir muhayet d'ket
Cih cehnem e gel şeytanî

[209] Re'sûmal ('E): Sermaye, sermîyan.

**BIFUKRIN LI DINYAYÊ**

Bifukrin em li dinyayê
Çi cîhanek bêwefa ye
Mekanê fitne û xewxayê[210]
Cazîbeyek bêbeha ye

Pê dixafin hemî gavan
Ye şirîn e dîtna çawan
We l'ber me kewtiye davan
Em lêbandin bi hîle ye

Fitne û fêlêt dinyayê
Em înan cihê belayê
Me jiyan kir wek gîyayê
Nekir çi kar û fayde ye

'Umir bêfayde diborî
Sed soz û qewl û qusûrî
Me borandin bi çawsorî
Me l'bîr nehat mirin heye

'Emelê xêr me l'bîr nehat
Me borandin hec û zekat
Bêsunnet û sewm û selat
Me çaw da mulk û para ye

Em kewtin zewq û sefayê
Mabeyna mudbax helayê
Me borand 'umrê dinyayê
Bi kîn û kerb û çîle ye

Şev û rojan kîn û hesed
Ne xwandin û ne îbadet
Gel cîranan bi xiyanet
Kesp û kar me xirabî ye

Kesp û kar me bûn heramî
Ne cema'et ma ne camî
Dev ji xeybet tena nabî
Îftira sûc hem fitne ye

[210] Xewxa: Cihê xirabîyan.

Suhbet îftiraw xeybet in
Direw û sûnd me sin’et in
Faîz riba ew serwet in
Helal heram ferqê nîye

Heramî bûye ticaret
Heq nemaye bûye ruşwet
Dîn nemaye bûye serwet
Li me d’barin sed bela ye

Musibet yêt êne ser me
Pîr û canan nema şerm e
Berge nemaye li ber me
Mode geryan bi rûtî ye

Sing û mil her du di rûs in
Çok û pê mislê Tawus in
Oje boye ew jî sûs in
Jin li xwe nabin xwedî ye

Jin di rûs in li nav sûka
Berê xwe b’de halê bûka
Ew di rûs in wek meymunka
Perdê şermê dirandîye

Perde şermê wan rakirin
‘Ededêt dîn jibîr kirin
Terka ramanêt xwe kirin
Edeb nizanin kan çî ye

Edeb û heya nemane
Li me bû axir-zeman e
Tu d’bînî bela çawan e
Terk kirin jiyara olî ye

Divêt jin hemî bizanin
Bi qewl û soz musulman in
Xwudan-îman û Qur‘an in
Wan emrê Xwuda şkandîye

Ristka zêran li ser singî
Bi keyf û şewq û ahengî

Wê d’leyizît destê xelkî
Çaw li şermê niqandîye

Şerim nema jin û mêran
Li me birya rêka xêran
Zêhn û qelb yêt bûye wêran
Ey gelo kan derman çî ye

Derman rêya se’adetê
Jin sitar bin emrê Xwudê
Bizanin rêka axretê
Wegerne ve ser dînî ye

Wegeryên em bo çakîyê
Dest berden ji xirabîyê
Dînî neken dijberîyê
Dîn ji bo me ronahî ye

Dîn ji bo me se’adet e
Dîndarî bi kiramet e
Bo axretê ew rehmet e
Xerîb dibêt bêşik we ye

**BIHIŞHATIN**

Rabe gelo xweb hiş bîne
Eqlê serê xwe cemîne
Vê dinyayê biha nîn e
Bigre rêka heqîqetê

Rêkê bigre di gel sebrê
Gel ta'etî bibe hewrê
Li bîr bîne çûna qebrê
Di nav tarî û zulmetê

Cihet tarî û zulmet e
Emel nebin ye zehmet e
Îmdad gazî bêqîmet e
Dê kevîye nav xefletê

Zehmet pir û bêimdad in
Kan Naşid yan Nazi'ad in[211]
Bi rehmet û yan afad in
Bi tirs û sam û heybetê

Bi xewf û tirs têne lalî
Kar çi nebît destê xalî
Dê mînît wekî 'evdalî
Di vî wextê sekeratê

Hind ser singî hind ser pîya
Hind d'girin dil û gewrîya
Ruhêt kêşin ji hestîya
Kan bi ezab yan rehmetê

Wextê ruhê jê distîne
Kesê hay wî halî nîn e
Hevalêt wî ji dûr d'bîne
Ruh çû naket hereketê

Paşî diben tenaşîrê
Bêjnê xesal were wêrê

[211] Naşid û Nazi'ad navên milyaketên ruhstandinê ne. Naşid ruha mirovan bêezab dikêşe, Nazi'ad jî ruhê bi ezab dikêşe.

Yê xilas bûy şer û xêrê
Bûye rêwingê xurbetê

Yêt kete gazî hewarî
Kes nabihît gazya jarî
Yêt ben wî bo qebrê tarî
Gehişt qonaxa axretê

Mal û serwet bi paşda man
Digel bûn ‘eqreba cîran
Hemî di paş da vegeryan
Taze wê tête xeyretê

Hatne lalê Nekîr Munkur
Bi sam û tirs û gef û gur
Tu bo çî hatîye li vir
Tu nebûy ehlê rehmetê

Bo me bêje Xwudayê xwe
Dîn û qible nebîyê xwe
Xwûşk û bira ‘emelê xwe
Gel me were xitabetê

Bawerîyek kamil nîn e
‘Emel îbadet çu nîn e
Bêjne axê ka şidîne
Da nasît şahê qudretê

Ax gelekê dişidînît
Perastîyan têk borînît
Ezabêt qebrî da d’bînît
Peşîman e bo rehletê

Ewê rehmet jê bûye dûr
Dinê bi gunahan qusûr
Mesken cehnem e çala kûr
Gotna şefî’ê ummetê

Ew kesê ku ehlê xêra
‘Ebdînî kir ji Xwudê ra
Harîkarî heye jê ra
Ji Xwuda d’bînît şefqetê

Ewê rehmet vê ra giheşt
Qebr bo dibît baxê biheşt
Hemî gavan seyran û geşt
Cih digirît nav cennetê

‘Ebdê Xwuda jê d’bît razî
Ew hasil dibît mirazî
Ji Xwuda diket daxwazî
Ew digehte fezîletê

Fedla Rebî têt der ane
Seyr û rehet heqê wan e
Ya Reb Xerîb bît ji wan e
Nemînît ew nav zehmetê

**BISMILAHÎ**

Ya Reb kes nîn e xeyrê te
Bi navê te d’bêm bismillah
Ser deftera ye ismê te
Hemd laîlahe îlallah

Her tiştek li bin hukmê te
Çu quwet nînin bêyî te
Her tiştê hey bi emrê te
Qed tevekelna ‘Elellah[212]

Hemû gav û hemû deman
Hemû cih û hemû zeman
Di şahî û derd û xeman
Em dibêjin hesbîyellah[213]

Kulû wext û kulû hînan
Hatina xêr û mizgînan
Di ‘umrê sihet û jînan
Lewza me elhemdulîllah

Hindî ku emrê me hebît
Nefesa ji singê me têt
Dê tesbîha zatê te bît
Di her gavek subhanellah

Tu Xaliqê mexlûqatan
Xwudanê çarde sifatan
Heyata ruh û nebatan
Li hikmeta te maşallah

Sahibê hukm û hikmetan
Sani’ê kulû sin’etan
Hostayê nar û cinetan
La quwete îlla bîllah

Qa’înat û hindî heye
Erd û ‘esman çi tê heye

[212] Qesema bawerîya bi navê Xwuda.
[213] Hebûna Xwuda têra me heye.

Jîn û jîyan rehma te ye
Evehe ye qudretullah

Qeza û qeder û ni’met
Nesaxî û derd û îllet
Bela afad hem mûsîbet
Her gav bêjin înnalîllah

Dikirna sûc û gunehan
Xilafa soz û we’dehan
Nekirna rûku’û secdan
Dibêjin estexfîrullah

Gava xêran û ni’metan
Wextê sevab û serwetan
Digel jîyan û sihetan
Her dem diken em şukrullah

Her ji Xwuda şukurxwaz in
Bi nîyaz bang û awaz in
‘Efûyê ji Xwuda xwazin
Xerîb daxwaz e Lutfullah

**DA BIPIRSIN**

Da bipirsin ji dinyayê
Dîn wê li me bûye xela
Kewtîne zewq û sefayê
Me terk kirin bang û sela

Bang û sela me terk kirin
Cum‘e cema‘et nekirin
Helal heram ferq nekirin
Şerab vexwar bi peyala

Vexwarin ê bûye reqî
Mela hemî bûne feqî
Nema li dinyayê heqî
Sebir nema ewan mela

Wan ‘aliman nema sebir
Şerî‘etî nema qedir
Hesûdî û buxl û xedir
Li me barîn derd û bela

Derd û elem li me barîn
Bey’u şîran[214] hîlekar in
Di serxweş û ne hişyar in
Bi xefletê em mubtela

Em yêt kewtine xefletê
Daîm wê dikeyn xeybetê
Nekêşe tu wê zehmetê
Tewbe bike ey ‘Ebdullah

[214] Bey’u şîran (‘E): Kirîn û firotin.

## DERGAHÊ ‘EDLÊ

Hatme ber dergahê ‘edlê
Min sûc û guneh gele ne
Mam li benda rehm û fedlê
Derd û kulên min gele ne

Derd û kul li min cema bûn
Hal û wext li min nemabûn
Eql û fikrên min winda bûn
‘Ecêb wek min nezan hene

Kewtme sûcan bi nezanî
Pir guneh û bi isyanî
Dîn li me çû wek talanê
Em rûreşê fêlêt xwe ne

Kewtîne nav fêl û fendan
Dîn û îman me li der dan
Me cih nema li çu erdan
Ya Reb hîvya rehma te ne

Mayne hîvya zatê barî
Qelbê me wê bûye tarî
Me bi nefsa xwe nikarî
Xaliq tu yî em bende ne

Bende ne me pê nezanî
Curm û guneh tijî xanî
Defter bi sûcan me anî
Rûsiyah û şermînde ne

Şermînde ne destê vala
Kewtne pê fikra hevala
Gel bira û mam û xala
‘Eyb û sir li me mişe ne

‘Eyb û sir me bi hizara
Gel gundî der û cînara
Xirabî nayên çu kara
Zulm û zor bêhed zêde ne

Me guh dabû zulm û zora
Gel êtîm û şil û kora
Bîr nehat li mirn û gora
Xerîb gazin ji kê hene

**DEWRA ZEHMETÊ**

Da bikeyn behsê qisetê
Bo cema’et û guhdaran
Xwuda bidetin firsetê
Da em pê bikeyn xeberdan

Bo lutfa Rebê ‘izetê
Me nîyet kir ji dil û can
Dinya li dewra zulmêtê
Nemaye qîmet bo insan

Kewtine nava xefletê
Kuştin û qetl û hem talan
Ya Rebî bide rehmetê
Ser me rabîtin tarîstan

Ew cihê rehm û şefqetê
Zalim yê lê diken seyran
Bûne inkarêt qudretê
Jibîr kirin Rebê rehman

Xwuda didetin ‘afetê
Du’an naken em çu deman
Dev yê kewtiye xeybetê
Bo kesê nehêlan eman

Cema diken ew serwetê
Yêt bûne Fir’ewn û Haman
Ji dîn ra naken xîretê
Ew bêtirs û hem bêguman

Kewtine pê seltenetê
Rojek dê bibin peşêman
Nabînin ew hîdayetê
Ev dinya ye dewr û zeman

Dê bin sefîlêt axretê
‘Ezman naketin kelaman
Kewtine pê hûrîyetê
Tinê nebûne musulman

Sed car lê bikey neshetê
Naçîte nava guhêt wan
Dûr bûne ji selahetê
Derkewtine rêza insan

Ew nizanin heqîqetê
Kewtine nava heraman
Ew nabînin bera'etê
Sefîl dimînin perîşan

Diçin kufrê bi sûretê
Digel wan nemaye îman
Tê nabînin çu derfetê
Sebir û sukûn çu neman

Ji xwe dikeyn em nefretê
Nebûne mani'ê ewan
Tub'et wekî berê bestê
Her dem karê wan e isyan

Ji kes nagirin şîretê
Ne ji hedîs ne ji Qur'an
Nanasin xwe û heyatê
Çend ji bo bêjî bi ziman

Bûne herwekî nebatê
Ne cismî dizanin ne can
Her gavê di nav zilmetê
Ew xilas nabin ji xeman

Li bîr naînin mematê
Ew naken terka heraman
Sûc li dilê ewan xweş tê
Nabînin ew çu meraman

Inkar diken qîyametê
Wê dehşetê û qîyaman
Wê tirsê û wê heybetê
Ew red diken hemî qaman

Wê hisabê û şîdetê
Xêr û şer û hem gunehan

Kê diwergirin ruxsetê
Wextê mîzan tête danan

Xerîb li ewê se’etê
Bo te hal dê bîte çawan
Çî ye ew ji destê te tê
Bo kiryarên sal û zeman

**DEWR Û DOR E**

Çerxa felek dewr û dor e
Têgehiştin çend ye zor e
Dem li jêr û dem li jor e
Bezre bûn ‘adet û tore

Berdewam nadet qîyamê
Mirazan naket temamê
Geh li textan geh xulamê
Ewel heyat paşê gor e

Gah feqîr e gah yê zengîn
Demek keyf e demek xemgîn
Demek tahl î demek mizgîn
Gah yê şîn û gah yê sor e

Reng û sifatan zivirî
Li barekê xwe nagirî
Kesêt pê ve ‘umir birî
Li dinyayê bûne kore

Yêt xwe pê ve kore kirin
‘Umir jîyan pê ve birin
Xweşî rehet cih nekirin
Kewtne nav behreke kûr e

Kewtine ber pêl û mewcan
Gel xiraban hemî qencan
Li seray eywan hem burcan
Geh şirîn û geh ye şor e

Sed mixabin me nezanî
Felekê çerxa xwe danî
Em hêlayn bi dilkovanî
Bayê mirnê horehor e

Mirin wek baranê d’barî
Dinya li me kirye tarî
Ne peya man ne suwarî
Me hewar li Rebê jor e

Mirin westanê nizanît
Her demê ev bi punhan têt
Emr û ferman ji Rehman têt
Mirna bi wirûsê zor e

**DILBIRÎN**

Dilê min ji kûr birîn e
Ah û fîxan naken karî
Dermanê dil min çu nîn e
Roja rohn li me bû tarî

Roja rohn li me winda bû
Xêra ‘ilmî nav me rabû
Ûstad çû ji me cuda bû
Stûxwar mayne ber dîwara

Stûxwar mayne em bêxwedî
Di ‘ilmê fen û şer‘etî
Mislê ustad me kes nedî
Di hukm da bide biryarê

Hukmê hedîs û Qur‘anê
Felsefe û fena dinê
Weku bedî‘ê zemanê
Kutûpxaneke seyarî

Ew bi mislê kutûpxanê
Aciz nedbû ji cabdanê
Wesa deng dabû cîhanê
Kes me nedî bi wî karî

Kes nedît wek wî bi sebir
Xwudan ‘ilm û xwudan qedir
Hisaba kîmya û cebir
Fizik û tibê haydar î

Bi tip û astronomiyê
Bi tarîx û coxrafiyê
Hendese[215] û erdnasiyê
Di hemyan da endazyarî

Endezyarekî cîhan î
‘Ilm û hikmet te dizanî
Me ji ‘ilmê te nezanî
Bi pêşeman û xwusarî

[215] Hendese (‘E): Mihendis.

Bo me maye peşêmanî
Tu nas nabî bi ezmanî
Filozofekî cîhanî
Bibî laîq lutfa barî

Bibî laîq rehma Xwuda
Ew wesfêt di besta me da
Ji rastiyê nînin cuda
Xwuda tu pê agahdar î

Xwuda ‘ilm û fikr pê dabû
Ji ‘alimêt dî cuda bû
Ew xwasê rêya Xwuda bû
Lew meşhur bû vî diyarî

Ez ji Xwuda hîvîdar im
Nexweşekê merezdar im
Bi derd û êşan nikarim
Rehmê biket li vî jarî

**DINYAYA FANÎ**

Dinya fanî û bêbiha
Nebû cihê se'adetê
Xaîn î li hemî ciha
Bû me bûy cihê xefletê

Em lêbandîn hemî dera
Êxistin kul û kesera
Jêk dûr kirin bab û bira
Te em kirin nav hesretê

Te em gelek jêk dûr kirin
Te yêt nêzîk winda kirin
Day û ewlad jêk bir kirin
Te birne cihê xurbetê

Bûyne xerib ji bo babê
Te ew birne nav turabê[216]
Kî dê j'te pirsît hisabê
Ji xeyrî şahê qudretê

Bi qudreta şahê mezin
Hindî heyî insan û cin
Hemî ji te dixaricin
Marûmûr û hem wehşetê

Ew teyr û wehş û ewên din
Xwuda hemî j'te çêkirin
Daye te rûyekê şirîn
Kes ji te neket lewmetê

Kes nîn e bêyî te bijît
Mirovan ber te dikujît
Dîn û îman difiroşît
Tu jê nastînî minnetê

Tu nahêlî qet çu kesan
Ji erdî heta asîman
Ji cin û wehş û hem insan
Dibey tarî û zulmetê

[216] Turab ('E): Ax, xak.

Tu dibey nav toz û xebrê
Bo kesê tu nakey sebrê
Pêxember j'te birne qebrê
Bûne rêwing bo axretê

Pêxember heta sehaban
Nehis û dost û ehbaban
Ji çakan heta xiraban
Te nehêlan li ser erdî

Çi insaf nîn e gel te da
Gelek bo te bûne feda
Te qurt kirin zikê xwe da
Behr û muhîta heyretê

Te gelek yêt winda kirî
Zikê xwe da qurda kirî
Gulordyê Jar bo xwe bigrî
Tu wext e biçî rehmetê

**DIKEM FÎXAN**

Di zulmeta şewa tarî
Dikem fîxan dikem zarî
J'borîna wextê xusarî
Bêfayde borî zemanî

Bêfayde çû li me zeman
Em kewtîne derd û xeman
Ronkê çawan wekî çeman
Wê dibarin wek baranê

Mislê barana biharan
Rohnik nayêne qiraran
Dibarînim hemî caran
Bêfayde ye peşîmanî

Peşêman im bi xusarî
Rojêt rohn û şewêt tarî
Dikem gazî û hewarî
Ah û fîxan çûn 'esmanî

Sed fîxan û dad û meded
Hewar dikem Rebê Semed
Dermanê derdan ew didet
Me qebûl b'ket bi xufranî

Cihê 'efyê lalê wî ye
Min hewar û sed gazî ye
Em nemînin cehnemî ye
'Efû bibin wê cîhanê

**DILÊ TEJÎ**

Şukra Xwuda dil bû tejî
Aramî ji Rebê Semed
Qelbê ji işqê disoje
Şîfa têj wahidê ehed

Qelban heye ji Xwuda ye
Nûra qelban ewî daye
Muhbeta zatî sefa ye
Ger bizanît bîte ebed

Em kewtne hubba dîlberan
Şewq û cemala esmeran
Kewtme li gel rûqemeran
Kewte ber çawêt me remed[217]

Dîlberan girtne çenberê
Dav danan wek seyda berê
Xistne riste li seferê
Qelb û zehn li me kirne qeyd

Em xistine qeyd û davan
Kuştin em bi tîra çavan
Sotne bi cerg û hinavan
Qelbî dan tîrbê bêeded[218]

Dîlberan derdê giran e
Kes nakeşît qehra wan e
Me îmdad zatî burhan e
Ew nebîte seyda kebed[219]

Ya Reb qeyda wan nehêle
Xilas ke j'wan fend û fêl e
Me bi eqlê me nehêle
Em kewtne nêçîra esed[220]

Nêçîra eşq hatne ser me

[217] Perdê ber çavan e.
[218] Bêhejmar.
[219] Cerg.
[220] Şêr.

Xal û xet danane ber me
Ji Xwuday naken çu şermê
Wan li pêş nînin bend û sed

Kewtin ber neçîra şêhra
Me nema çu cihê xêra
Bûme qurban li ber kêra
Bo me neman çu kar û ked

Kar û ked li me bîryaye
Kewtine çol û çîya ye
Bo Xerîb çu hal nemaye
Hawar d'kete şahê semed

**DI RÊ DA MAYÎ**

Rabe gelo dîsan bilez
Bo çi tu mayî di rê da
Te zêde bûn derd û merez
Te xêr nedît vê dinê da

Vê dinyayê xerîb im ez
Bêtali' û nesîb im ez
Bêşifa û tebîb im ez
Nîn e şafî xeyrî Xwuda

Bêse' û hem bêbizav im
Dilşikestîyê zêhnxav im
Bendîyek fikirbelav im
Mayme girtî di qeydê da

Girtîyê bend û qefes im
Exsîrê bêdad û res im
Mihnetkêş tub'et-ebes im
Bûme masyek di tore da

Weku masya di nav golê
Neşêm seyrê bikem çolê
Fikr û bîr nehatne holê
Di vî zemanê xêrê da

Bêper mabûm wextê seyrê
Ne di rojê ne di bedrê
Gel xîyalan bûme hevrê
Zererdar bûm di vê rê da

Me zerer kir wextê karî
Zêhna me girt perdê tarî
Sal û wext çûn bi xusarî
Me kar nekir vê dewrê da

Vê dewrê da me zerer kir
Xewn û xîyalan kar nekir
Çarêk 'esrek me zîyan kir
Bezir bûn ew di çerxê da

Negeştme xewn û xîyalan
Zêhn û fikir bûne talan
Dûr mame ez ji hevalan
Mam ez di nava zecrê da

Nebûm xwudan her du dinyan
Vê cihanê rût û uryan
Me ‘emel bûn sûc û tuxyan[221]
Eql û beser nebûn peyda

Bi xirabyan ‘umir borî
Şer û şîn û şehdezorî
Bo me man eyb û qusûrî
Ew kul mane di cergî da

Wextê ciwanî fam nekir
Bi lêbûlod wext bezre kir
Pîrî hat şerim jê nekir
Nehe mayne di hicrê da

Di hicrê mayn bi dilkulî
Ji xwe gazinde û silî
Me nahêt wextê ‘ewilî
Wext borandin me di xew da

Kewtîne xewa xefletê
His nekir mirin pê me tê
Kewtîne halê zehmetê
Xerîb pişman wê fikrê da

[221] Tuxyan (F): Isyankarî.

**DU’A MIN**

Şukur ji halê dinyayê
Dest bilind bin bo du’ayê
Kan ciwanî paşda nayê
Gazinda pîryê kem jê ra

Min gazinde j’bedenê xwe
Du’an kem ji Xwudayê xwe
Qebûl ket du’a ehdê xwe
Bibam heval ciwanyê ra

Rawestame ber li qible
Du’a min nehwêd neh cumle[222]
Ber min vebin derge qifle
Hema xweş bim bi yarê ra

Sewda dilî qet pîr nabît
Xwesteka min xilas nabît
Beden pîr d’bît dil pîr nabît
Dixwazît seyra b’yarê ra

Êşa dilî qetmer nabît
Dil ji bê evînê nabît
Umêd çu car bezre nabît
Hest û daxwaz hene pê ra

Evîn û daxwazêt di dil da
Daîm hest ket yar bît tê da
Bendewarê di wê rê da
Zehmetkêş e bi zecrê ra

Soz û we’êde pêkve dane
Bi dil yek beden cuda ne
Aşiq bo yêk canfida ne
Di benda yar û dewrê da

Di fesla pîr û kalîyê
Xeml û xêzêt dûmahîyê
Nîn e wê cihê xweşîyê
Me şol maye bi sebrê ra

[222] Îşareta navên Xwuda dike.

Me lazim e bergê sebrê
Gel hemsalan bibin hevrê
Ji dûr xweş e dîtna yarê
Tebesûmek hebît pê ra

Tebesûmê ji dûr biket
Dergê dilê min dê veket
Her çi hes ket ew dê biket
Xerîb nîn e inkar jê ra

**EY DIL**

Niza çi dixwazî ey dil!
Di vê fesla zivistanê
Nebûy ‘endelîb û bilbil
Bigeryî bax û bostanê

Min neman çu bax û bostan
Payîz borî hat zivistan
Ne deşt maye ne kohistan
Ku tu mala xwe lê danî

Min nema cihê kûnê te
Xirab bû seyrangeha te
Kanê keda havîna te
Fayde nakin peşêmanî

Pêşmanî te xilas nakin
Ew derdê te derman nakin
Çare li halê te nakin
Nema digel te ciwanî

Ji ciwanyê tu yê borî
Ji pîrîyê tu yê kor î
Hesabê bike bo gorî
Li bîr bîne qebristanê

Goristan e qonaxa te
Bax û bostan ‘emelê te
Kes naête hewara te
Ji xeyrî zatê sultanî

Hîvî ke ji zatê barî
Tewbe ke hêj tu dikarî
Wextê biçî cihê tarî
Nebe cahil û nezanî

Cehaletî teb‘etê te
Nefsa xaîn rehberê te
Hirs û şehwet hakimê te
Ew bela serê te anî

Bela pîryê hat ser te da
Quwet nema çokêt te da
Neşê bikey zikra Xwuda
Ji axreta xwe nezanî

‘Umir borî bi nezanyê
Heta geheşte dûmahyê
Izraîl bigre gewrûyê
Pîrî hat û bi xusranî

Pîrî derdek bêderman e
Qîmeta wextî bizane
Gotina nebî wesa ne
Zeman borî bi ziyanî

Xerîb nezanê Gulordî
Ji te çû gencî û xortî
Pîrî hat û ku tu girtî
Bûy peşmanê vî zemanî

**GULDEXWÛN**

Tu ey gula guldexwûnê
Te d'kem gazind û gilînê
Tu bo gelek nakey jînê
Tu sernişiv û xemgîn î

Tu jî gulek ji gîya yî
Tu şîndîbî li çîyayî
Her gav serê te çemyayî
Te reng wergirtîye j'xwûnê

Te rengek dî boçî nîn e
Te 'umr kêm e gele nîn e
Te bo çi per werandine
Her dem serşor û xemgîn î

Nêrim gulan berewraz e
Dihijyên bi niz û naz e
Wan ji Xwuda hey daxwaz e
Tu bo çi her bi girîn î

Bînim alal gul û xara
Şîndbin ser şax û nizara
Bûn daxwaza dost û yara
Kesê tu li bîrê nînî

Ewê kir qesta cewabê
Ne b'ezman hal hat xitabê
Tu ji mit xwazî hisabê
Tu bi fehm î yan yê dîn î

Min zanîba tu çi kes î
Pirsa giran ji mit pirsî
Ew xwudanê erş û kursî
Ji nebatê înan dinê

Ger bi eql bixwîn çend car
Surê Esra ayet çil çar
Emrê Reb bo gîyay ber dar
Ew çawa diken 'ebdînî

Min şerm ji zatê Xwuda ye
Bo zikrê min can fida ye
Ber hindê min ser çemyaye
Wek insan narêjim xwûnê

Min ji Xwuda şermûzar e
Ez şîndibim ser mezar e
Xêra min bo ‘ebdêt jar e
Ez nagirim kerb û kînê

Min jîn kêm bi emrê barî
Her dem dikem şîn û zarî
Min rû nîn e l’pêş Cebarî
Ji Xaliq çu dî nezanî

Qude nînim serewraz e
Min ji Xwudê kir daxwaz e
Bo min hasl kir ev miraze
Serbilind im roja dînî

Nakeyn isyanê em çu car
Hazir in li emrê Cebar
Dizikirin subh û evar
Bi emrê Reb dikin jînê

Mutî’ê emrê Xaliq in
Ne bi isyan net fasiq in
Hemî halan em wafiq in
Sernuxwûn her dem bi şînê

Sernuxwûn in çaw di tarî
Wextê d’çin hizura barî
Serbilind in rû bi ‘arî
Wek hewe nabin şermînî

Me ji Xwudê kirye şerim
Ne bi xwarin ne bi xew im
Wek hewe bi şernakevin
Lewra em kêm diken jînê

Xerîb ji suhbet şermîn may
Ber cewaba kata gîyay

Bi çi rû çîye pêş mewlay
Bêfeyda çû ‘umrê dinê

## HATIME DERGAHÊ REHMET

Hatme ber dergahê rehmet
Pir xeta û zor hewce me
Bi guneh terkê ‘ibadet
Ez rûreş û şermînde me

Ez lixwe yê bûme xaîn
Min nehêlan insaf û dîn
Hem bê ‘emel û muznib in
Ez êxsîrê nefsa xwe me

Êxsîrê nefsa xirab im
Bênesîb û bêsewab im
Dê ji dostêt xwe cuda bim
Ez pişmanê fêlêt xwe me

Peşêmanê fêl û hîlan
Hevkarya pîs û bexîlan
Dê ji ku bînim delîlan
Ya Reb hîvya ‘efya te me

Mayme li hîvya xufranê
Bidet min piçek îmanê
Rûreş nebim li meydanê
Ez li benda rehma te me

Bendewar im ji bo rehmê
Min nîn e quweta curmê
Dê çi kem li pêşî qewmê
Tûleyê dergahê te me

Te rehm ji qehrê pitir î
Min nîn e taba agirî
Her du çavan dikem girî
Li ber dergê ‘edla te me

**HAWAR REBÊ BARÎ**

Li me hat serê kanûnê
Befir barî wekî cara
Nema me cihê jiyanê
Kewtîne qeyd û zincira

Bûyne bendî di qeydê da
Şeş mehan di nav befrê da
Em hişk dibin di sirê da
Hewar dikeyn ji Xwudê ra

Hewar dikeyn Rebê barî
Tu qadir î hem cebbar î
Şûna befrê rehm bibarî
Em bijîn wek çan û kara

Jiyan bo me ye xweş nîn e
Ya Reb rehmê bibarîne
'Ebdêt tey ne bi hîvî ne
Bawermend in hukmê te ra

Her çi dikey hukmê te ye
Me par ji fedla te heye
Ser me barît rehma te ye
Xerîb bît ji ehlê xêra

**HEMDA XWUDA**

Were bike hemda Xwudayî
Ewî Xwudayê ku em dayî
Em ji neyê înan heyîyê
Em nîmet kirin bi Islamê

Em kirin xwudan eql û lîsan
Ewî çêkirin em Musulman
Ewî daye me ‘eql û zanîn
Em kirin xwudan îman û dîn

Em ji neyê înan wucûdê
Da ji bo wî biçin sucûdê
Ew me‘bûd e em jê ra bûn ‘ebd
Da ji bo bikeyn em îbadet

Daye me kelam û hem xeber
Em kirin ummet bo pêxêmber
Xemilandin bi pênc hewasa[223]
Zînet kirin eql û namusa

Ruh û beden çêkirin qedîm
Binav kirin ehsenê teqwîm
Em ji ax û kurê çêkirin
Bi ruha xwe em ‘ezîz kirin

Ruha xwe pif kir bedena me
‘Ehda elest dana berê me
Ji milyaketan mezintir in
Eşrefê mexlûq em çêkirin

Kir xelîfe li rûyê erdê
Got melekan pêş herne secdê
Melekan pêş Adem secde bir
Ew bo insanî bûye qedir

‘İnsan çêkir bi eql û zeka
Qedirtir ji cin û melekan
Binêr mîraca pêxemberî
Bû mînak ew ji bo beşerî

[223] Pênc hest, pênc sehker.

insan û ruh ji zatê wî ye
Lew ji her tiştî ew cuda ye
Hind nebî ne bûne pêxember
Hind resûl in ew xwudan-xeber

Rêkirin em bo imtihanê
Kî dê baş kar ket li cîhanê
Dinya kirye zevya axretê
Dê kî bi xêr çît pêş hezretî

Ew e qedîm û xwudan-qudret
Hem xwudan-hikmet û seltenet
Ne şirîk û malxwê û wezîr
Ewî nînin ewel û axir

Kesê bawermend bît bi Xwuda
Nakevîte nav fikrêt cuda
Yê ji Reb bawer kir mûmîn e
Her kî bawer neket bêdîn e

Bawer b’ke ji heyya melekan
Paşê ji suhûf û kitaban
Bi qeder û xêr û hem şerê
Bi mirin û roja mehşerê

Reb b’nase bi çarde sifatî
Hind zatî ne û hind sibûtî
Bixwûne da binasî Xwuda
Da tu neçîye rêyêt cuda

Bicih bîne sewm û selatan
Here hecê bide zekatan
Zekat bo feqîran bizane
Nebe mani‘ bo heqê wane

Feqîran destxalî nehêle
Bêmeta‘ bî dilxweş bihêle
Neêşîne tu çu kesana
Birsî nehêle tu insana

Bi rûgeş pêşwaz b’ke insanî
Bi dilxweşî rêke mêhvanî
Kîn û kerban nik xwe pavêje
Nebe hesûd û dilqirêj e

Heyya kesê nebe dilgiran
Her dem dilsax be bo musulman
Tu nebe dilreş û çawhavêj
Da nebîye ji yêt dilqirêj

Ji zatê Xwuda bike şermê
Neke xirabiya çu qewmê
Li kî rê bî Xwuda dibînî
Da pêş Xwuda şermîn nemînî

Tu çu wextî neke direwan
Nekeve xewa roj û şewan
Nebe pir xab û xem û xwarin
Ew tişte zerer in ne kar in

Bi dev û dilan bibe wafiq
Da nebî ji ewêt munafiq
Bi du devan qet xeber nede
Edebê ji dest xwe bernede

Bi rastî bijî li dinyayê
Nekeve nav zewq û sefayê
Çu caran neke şahdezorê
Li axretê dibî qusûrî

Me kir suhbet bigre nesîhet
Li ser xwe evê bike ‘adet
Serfiraz bijî li dinyayê
Dê xwudanxêr bî li ‘uqbayê

Em hîvîdar in ji rehma te
Umîdwar in bi ‘efya te
Te ‘efû pitir ji cezayê
Bixefirîne ‘Ebdulayî

**JI DINYAYA XEMAN**

Were bira wek her deman
Neke ji dinyayê xeman
Hindî hatin çu jê neman
Ne ji cahil ne ‘aliman

Çi cahêl bîtin yan xwendî
Çend zana bît wek pur fendî
Kes namînît ser vî erdî
Dê biçîtin ew bêguman

Nemaye bo pêxembera
Pê mujûl bûn xwelya sera
Xwudanî têxte kesera
Bûye cihê kerb û loman

Bûye cihê xwûn û qetlan
Li cergan tînît birînan
Bûye hevkar gel xaînan
Jê bikin hewar û eman

Bizane dinya xaîn e
Wê ne bext e û ne dîn e
Muştaqê wê hay xwe nîn e
Hem sefîl hem bû pêşeman

Pêşeman in ji dinyayê
Perîşan in li dûmayê
Ewêt ‘umrê xwe pê dayê
Bûne miflis û sergirdan

Dibin miflis bi destxalî
Dîn dorandî[224] bo ‘eyalî
Îmdat kî ye biçît lalî
Bi sed hewar kul û kovan

Sergirdan kevne bin barî
Bar giran e pê nikarî
‘Umir pê dibît xusarî
Axretê dibît bêxwudan

[224] Jidestxwekirin, berzekirin.

Gulordîyê Jar bi xem î
Li dinê bi derd elem î
Du‘an b’ke nebî cehnemî
Li axret bî xwudan îman

## KES NÎN E JI XEYRÎ TE

Di fesla vê bihara min
Te heram kir jîyara min
Were Sêmîn ‘İzara min
Bike rehmê tu ey zalim

Min kes nîn e ji xeyrê te
Xwe tavêm tor û bextê te
Rehm û şefqet bêt dilê te
Bibîne tu rewş û halim

Min sing nîşanê tîra te
Bûyme êxsîrê çawêt te
Ez heyran im bo buryêt te
Carek cih bêt ev xîyalim

Xîyalêt min herifandin
Derd û elem min civandin
Hemî terzan te lêbandin
Şew û rojan ah û kal im

Kalêna vî dilê xemdar
Dermanê bêkesan her car
Pirs ke carek Xerîbê Jar
Êtîmek bêcih û mal im

Dilê Xerîbî tu xweş ke
Çirayê wî tu bo geş ke
Bi eşqa xwe tu serxweş ke
Hat û borîn mah û salim

Meh û salan hîvya te bûm
Xewn û xîyal min bi te bûn
Bo eşqa te bûyne zebûn
Nemane sebr û mecalim

Bêsebr mayne dê bêy kengî
Te wext li min kir direngî
Tu bo dimînî vî rengî
Heriftin fikr û xîyalim

Fikr û bîr bo min nehêlan
Kirme ‘ebdal di nav êlan
Wext e dîn bim biçme rêlan
Nemane çu qewl û qalim

Zor dikêşim êş û janan
Kul danaye ser kovanan
Kes guh nadet bêxwudanan
Nemayne dost û hevalim

Dostê dil birye bi talan
Terk kirim dost û hevalan
Bi ‘umrê heftê çar salan
Yeqîn key ez dilzelal im

Dilzelal im ne bi hîle
Eşqa mecaz min wesîle
Terîqa heq min sebîl e[225]
Talibê rehmet-wesîl im

Bo wesilê bibme laîq
Ji terîqê nebme fariq
Rast û durist dilê sadiq
Daxwazê rehmet-delîl im

[225] Sebîl (‘E): Rê.

**MULKÊ BEQA**

Me ‘esl ji mulkê beqa ye
Ne ji cîhana fanî ye
‘Eslê ruhê ji Xwuda ye
Cism e ji xaka cîhanî

Ferqa fanî û beqayê
Heçyê zanî li dinyayê
Se’ya wî nabîte zayî
Xebatkar e li vî xanî

Xebatkarîya bi eqlî
Zayî naketin çu feslî
Dê xwe zanîtin bi ‘eslî
Dê cismî det ji bo canî

Can gelekî bi biha ye
Eqil qudîya Xwuda ye
Ev xelat Xaliqî daye
Her tiştekê pê dibînî

Me qelb û aqil mir’at in
Ew bi wesf û hem sifat in
Ev cewher ji Xaliq hatin
Eqil e vihê dixwûnî

Eqil hakimê beden e
Ewî me'rîfet gele ne
Hemî tişt bi ewî hene
Ew nebîtin tu çu nînî

Wekî eqlî nînin serwet
Ligel eqlî ye me’rîfet
Eqil bi zanîn rê ve dibet
Her ew e rehberê dînî

Hindî eşya û mewcûdat
Hem bi eflaq û qa’înat
Bi ‘esl û wesf û hem sifat
Fedl e ji zatê burhanî

‘Eqil kenzek ji ‘irfan e
Qelb jî mekanê rehman e
Heya bergeyê îman e
Gotina şahê ‘ednanî

Eql e Xwudayî dinasî
Ji wî hostayê ‘esasî
Qa’înatê ‘am û xas î
Di rehberyeke zengînî

Qelb navend e ji bo Allah
‘Eza ji bo bûyne sîpah
Bi xwe dişuxlin Maşallah
Eqil wê diket mizgînî

Eqil di ser da hefîz e
Çend cewhereke temîz e
Beden bi wî ye ‘ezîz e
Eger xwe tê bigehînî

Bêeqilan heyat nîn e
Jîyara ewan xweş nîn e
Dûmaya ewan rohn nîn e
Bo têtin meqamek sanî

Xerîb ji ber xwe dibêjî
Yê diaxivît bi gêjî
Hûn lê binêrin bi mêjî
Hîşyar biken wî xemgînî

**PAŞDAMAN**

Evro paş da mame ez
Kewtme xem û xefletê
Bêcih û war û mal im ez
Mayme di nava hesretê

Hesret her dem li min heye
Derd û elem min zêde ye
Rahet li min yê bezre ye
Mayme di nava xurbetê

Bûyme êxsîr xurbetkêş im
Gel agirî dil dimeşim
Ji hesretan ez serxweş im
Nîn e çarê vê îlletê

Îllet derdekê giran e
Rê û çarêt min nemane
Kewtime zulma zeman e
Her dibînin em şiddetê

Şiddeta ji heddî zêde
Agir û gurû û pêt e
Em kirin şeyda û şêt e
Kewtine behra heyretê

Ji hesretê man di cî da
Kul û kovan di dilî da
Xem û xiyalan serî da
Kes nizanît vê hikmetê

Ewê hikmetzan Xwuda ye
Derd û elem ewî daye
Me l'pêş 'emrê wî riza ye
Nîn e cihê çu hecetê

Ya Xwuda emr û usûl e
Ya beniyan her qebûl e
Ya Reb rehmê ke nizule
Tu li me were şefqetê

Bo şefqetê em hewce ne
Ya Reb em jî ‘ebdêt te ne
Li ser kok û ‘esla xwe ne
Bo çi dibînin zehmetê

Ezîyet zêde ye ser me
Guh de deng û awazê me
Carek nezer ke halê me
Tu bide me yek firsetê

Firset û bext me zivirî
Min ji çawan êtin girî
Kes bi şiddet min nexurîd
Ez jî bibînim qîmetê

Min hebît qedrê insanî
Guh dene tiştê min zanî
Bibim ferdekê cîhanî
Li min neken kes lewmetê[226]

Lewmeta şexsan xirab e
Guneh û derd û îtab[227] e
Ji bo kes dijber nerabe
Ya Reb dixwazin derfetê

Min carek derfet divête
Dilê me agir û pêt e
Rehmeta te b’ser me bête
Em bigehin se’adetê

Firsetek hatiba b’rastî
Min qelem girtiba l’destî
Daxwazî Xwuda bixwestî
Me bexşinît bi cinetê

Min biheşt divêt j’Xwudayî
‘Emr û fermanêt wî dayî
Min qebûl in bi tebayî
Xerîb bigehte rehmetê

[226] Lome, gilî, gazin.
[227] Ezaba axretê ye.

**QUDRETA XWUDA**

Ey Xaliqê ‘erşê ‘ezîm
Tuy ‘alimê ‘ilmê ‘elîm
Te çêkirin nar û cehîm
Tekmîl kir qudreta barî

Te çêkir ew çerxa felek
Dîhar kirin hikmet gelek
Ewel xuliqandin melek
Te bi wan hukim kir carî

Erd û ‘esman xuliqandin
Melek li dorê civandin
Hemî yêk car afirandin
Gelek zor in bi hejmarî

Te çêkirin rewz û cenet
Ji Adem û hindî hikmet
Te înayne karê sin’et
Bi qudreta gird û garî

Sema û erd te çêkirin
Hindî eflak te kar kirin
Hizaran sal nezer kirin
Heta hat wextê jîyarê

Ka’înat û hemî ‘alem
Te înabûn ew ji ‘edem
Te çêkirin lewh û qelem
Qudreta xwe kir dîharî

Bi qudret te teqdîr kirin
Bi şeş rojan tekmîl kirin
Şeş hizar sal hisêb kirin
Paş te înan halê karî

Sema û erd behr û hem ber
Stêr û heyv û roja enwer
Ew cin û insanêt beşer
Çêbûn ‘alem bi hizarî

Bi hizaran ‘alem te dan
Milyaket û cin û insan
Teyr û tuyûr wehş û heywan
Heta masyêt nav biharî

Hejde hizar ‘alem te dan
Te zikir ken hemî deman
Hukmê te bin ‘emr û ferman
Da nebin ehlê xusarî

Xusar nebin vê dinê da
Bifikrin ew cîhanê da
Ka’înat û tiştên têda
Da xwe bigrin li qerarî

Hikmet û qudret bibînin
Wecîbet xwe bicih bînin
‘Ehd û we’dan neborînin
Da nekevne nav zererê

**RABE DI VÊ DEMÊ**

Gelo rabe di vê demê
Bike tu karê seferê
Em kewtne xab û xwarinê
Nizanin dê b'çin kî derê

Bo çi hatî dê kî ve çî
Bêşol û kar û destmiç î
Bi ser rût û kefenpêç î
Bizan 'eslê xwe yê berê

Tu hatî bo imtihanê
Tu guh de 'emrê Qur'anê
Bêhiş nebe li cîhanê
Da nekevîye xusarê

Vê cîhanê nebe sefîl
Bê'emel û xêr û bexîl
Li axretê dibî zelîl
Gava ku çûye wê derê

Li 'emelan tu hişyar be
Şew û rojan tu li kar be
Di 'emrê Rebê Cebar be
Hem di subh û hem êvarê

Nekeve nav fêl û hîlan
Nebe şirîkê sefîlan
Bo xwe peyda ke delîlan
Da nebî ehlê xusarê

Xusar nebît ew emanet
Li 'umrî neke xîyanet
Ger hez key biçîye cinet
Bawermend be bi qederê

Bawermend be ji Xwuda ra
Bi kitaban û deftera
Ferqê nede pêxembera
Bi qeder û xêr û şerê

Tu bicih bîne wan şertan
Dev û destan bibe xwudan
Di bin şahid li ser insan
Roja diçîye wê derê

Ew şeş rukun me gotîne
Di rêzêt me da borîne
Nebejê min hay jê nîn e
Tu mesûlê vî xeberî

Îmanê tu ho binase
Rût e îbadet libas e
Vihê bo xwe b'ke esas e
Ew e xilasya beşerî

Şahde û sewm û hem selat
Fitre û hec û hem zekat
Xwuda bo me kirne xelat
Emir bûye roja berê

Nivêj sitûna dînî ye
Ew mîraca mûmînî ye
Yê nekir ji dîn dûr bûye
Dê rûreş bît li her derê

Dibît rûreş cem sultanî
Ew kesê nivêj nezanî
Yan terk kirî ji kislanî
Bêîman d'bît bi inkarê

Nivêja me temîzî ye
Ji qirêjê paqijî ye
Ew xêrek e me'newî ye
Guhdarya 'emrê Cebarî

Nivêj xêr e di wextî da
Bête kirin ji bo Xwuda
Xwudan-nûr e di heşrê da
Ji rûyan rewneq dibare

Ewê xwudanê nivêjê
Nasujît bi narê dojê

Heram bûye di wê rojê
Li huzûra pêxemberî

Xwudanê sewm û selatan
Gel cum‘e û cema‘etan
Mexdûr nabît ev çu wextan
Hekî diçîte mehşerê

Xwudanê zekat û sewmê
Ew nakin çu caran şermê
Serfiraz e li nav qewmê
Hekî diçît bo huzûrê

Rojîgir be bo mewla ye
Zekata heqê Xwuda ye
Hêlay ji bo feqîra ye
Eda b’ke da b’gehye xêrê

Guh b’de gotna pêxember e
Biheşt bi saya feqîr e
Vî şertî neke jibîr e
Jibîr neke wî feqîrî

Hec bi beden û bi mal e
Tu nebêje hêj zûsal e
Min ne zewicand ‘eyal e
Ew ferz e bila nebore

Şertê islam û îmanê
Bicih bîne gel Qur‘anê
Li xwe bigre tu ‘ezmanî
Nebe ji yêt xeybetkirî

Ji heramî û xeybetê
Ji rîyakar û hesedê
Bi qerdar neçe axretê
Dê bî ji yêd zulimkirî

Xwe b’de paş ji zulm û zora
Xirab ‘adet û wan tora
Bigre destê şil û kora
Da b’bî hevkarê feqîrî

Bibe dijberê zaliman
Rûne meclisa ‘aliman
Bi berge neke çaliman
Da nebî ehlê fexarê

Fexrê neke nebe qude
Baş bifikre kêm xeber de
Ya guh lê bûy dev neberde
Dê bî xwudanê zererê

Çu car neçe siyasetê
Dê te bete hilaketê
Gel xwe neke xîyanetê
Dê ji rastyê bibî berî

ji rastîyê cuda nebe
Li emanet xaîn nebe
Xwudanê gotina xwe be
Li hedîs nebe dijberî

Tu evê bi başî bizan
Bicih bîne tu sunetan
Nebe ji wan kesêt kislan
Ji ber dê b’kêşî keserê

Nebe kesera ‘emelan
Hêj quwet may çok û milan
Bicih bîne fi‘l û selan
Hêj nehatî kal û pîrî

Çok û milan bikarbîne
Hindî dişêy tu bixwûne
B’ke duha û ewabîn e
Ji wextê ra bike girî

Bigrî ji bo wextê xalî
Bike qêrî bike nalî
Tu neşêy biçîye lalî
Ji bo wextî keserdar î

Qîmeta wextî bizane
Da tu nebî pêşîman e

Guh de soz û hedîsan e
Hêj zeman nebû êvar e

Qîmeta wextî girîng e
Min nemane dest û ling e
Heft dert hene min gel ceng e
Kerb vebûn ji eqlê berê

Rabe li ser wextê şewê
Mabeynekê bide xewê
Ger te Xwudayê xwe bivê
Dê biçît qeyd û defter e

Deftera xwe tijî bike
Karê sefera dûr bike
Bo xwe hisabê hûr bike
Têr zad here bo seferê

Sefera me gelek dûr e
Rê li ser behreke kûr e
Gemî gelek bi qusûr e
Ya Reb tu bike tedbîrê

Sefer dûr bo qebrê kûr e
Tejî tê da marûmor e
Me hewar Rebê Xefûr e
Were bo me li hewarê

Ya Reb tu bo xatra xwe ke
Ji sûcdaran hisab neke
Gulordîyê Jar dûr neke
Nebin ruswa li mehşerê

**SALÊT WINDA**

Xerîb rabe tu di cih da
Gelek sal te kirin winda
Zêde mayî tu di xew da
Hiş û eqlê xwe cemîne

Rabe feqîrê bêçare
Te ‘umrê xwe kir xusar e
Sê meh kêm heftê û çar e
Hizar çarsed çil û sê ne

Tu kewtîye xema canî
Çend tembel û xewgiran î
‘Umir çû û te nezanî
Bo çi te hay ji xwe nîn e

Gel xwe xaîn û xirab î
Dorand te ‘umrê şebabî
Xirab-emel bêsewab î
Bo mehşerê te rû nîn e

Bi umrê çûy ra nagehin
Heftê sê sal û neh meh in
Mîna sed salî dixuhin
Du hizar bîst yek zayîn e

Ber pîrîyê me hal nema
Derd û êş li me bûy cema
Dil tena nîn e ber xema
Xweş û rihet dîhar nîn e

Wextê cahêlî fam nekir
Bi leh û lêb wext bezre kir
Pîrî hat û me his nekir
Ji ber êşan me hal nîn e

Hal û wext li me bûye teng
Sal û zeman me bûn direng
Nema quwet û qewl û reng
Ked û karan xêr tê nîn e

Ked û kar me hemî sexte
Ji kuhnîyê[228] nema wext e
Wext e bibîne mişexte
Mirnê hurmet bo kes nîn e

Em bilez diçin bo qebrê
Mirin bû kes naket sebrê
Melek kengî dibît hevrê
Ev jî bo me me’lum nîn e

Hazir nînin bo wê derê
Xer û çakî kan kî derê
Nîn e ratiba seferê
Ji bo wêrê destxalî ne

Bêratib sefer ye zor e
Em li dinê bûne kore
Rê bi asteng jêr û jor e
Xeyrî Xwuda imdad nîn e

Bawerî heye bi Xaliq
Hebît ‘emelekê sadiq
Ji rêya heq nebin fariq
Ya Reb Xerîb neêşîne

[228] Kuhnî: Pîrê li ser xwe, pîrê ji teqet neketî.

## SEFERA METARÊ[229]

Gehiştme hol û meydanê
Dê zivirim bo Gewerê
Derkevtim ji nexweşxanê
Dest havêt karê seferê

Sefer teyarê nêzîk e
Ema çi b'kem dil xudûk e
Me nemane rê û sûk e
Kewtine derd û kederê

Keder bo me bûye refîq
Dixwazim ji Xaliq tewfîq
Nînin wek zatê wî sedîq
Kî dê bîte wek wî hemrê

Hevrêkî ji wî dixwazim
Her dem ji wî bi miraz im
Laîq nabît kes dî b'xwazim
Ew e laîqê herîkar

Gazî hawar min kes nîn e
Qîrêna min hay lê nîn e
Ji xeyrî wî eman nîn e
Ew rohn diket dilê tarî

Dilê tarî ew e şifa
Her karekî ew e wefa
Li cem ewî ne hem sefa
Xeyrî wî kes nadet karî

Kar û zerer di dest wî ne
Bêyî wî kes dî çu nîn e
Min hawar şahê emîn e
Rehma wî ye ser me carî

Li ber dergê rehma wî ne
Ew Xaliq e em benî ne
Her gav muhtac rehma wî ne
Ew e xwudanê qudretê

---

[229] Metar ('E): Balefirgeh.

Xerîb ji Reb bi umûd e
Vihê nînin kem û zêde
Ya Reb tu qelemî lêde
Efû key tu ewî jarî

**SELAT LI SER WÎ BIN**

Emir kiriye ew Xwudayê mezin
Selatan bidene ser hebîbê min
Her ew e hebîbê ewel û axir
Li ba min kes nîn e wek wî bi qedir

Her ew e bûy xatemê pêxemberan
Selam li ser wî û al û eshaban
Ji ber wî min çêkirin kewn û mekan
Selam li ser wî û al û eshaban

Her ew e bûye resûlê seqeleyn
Her ew e bûye îmamê heremeyn
Selat û selaman her dem û gavan
Bide ser Muhemmed û hem eshaban

Her ew e resûlê insan û cinan
Her ew e bûy şefî‘ê muznibînan
Selat û selam bi her dem û gavan
Bide ser Muhemmed û hem eshaban

Her ew e çûye seyra asîmanan
Wî mîrac kiriye li lamekanan
Selat û selam bi her dem û gavan
Bide ser Muhemmed al û eshaban

Bi saya nûra wî em musulman in
Em xwudan îman û xwudan Qur‘an in
Selat û selam bi her gav û deman
Bide ser Muhemmed al û eshaban

Her ew e bûye rehberê mehşerê
Her ew e bûye şefî‘ê mehderê
Selat û selam bi her gav û deman
Bide ser Muhemmed al û eshaban

Her ew e yê xwudanê mu‘cîzatan
Her ew e yê bûy fexrê qaînatan
Selat û selam bi her gav û deman
Bide ser Muhemmed al û eshaban

Bi îşaretekê wî heyv parçe kir
Li pêş çawêt muşrikan wî eve kir
Selat û selam bi her gav û deman
Bide ser Muhemmed al û eshaban

Bi tilîya îşaret kir seneman
Veresyane erdî û çu jê neman
Selat û selam bi her gav û deman
Bide ser Muhemmed al û eshaban

Hizar caran hizar selat û selam
Li ser wî pêxemberê xeyrul-enam
Bêhejmar selatan û hem selaman
Rê dikeyn ji bo resûl û eshaban

**SERÎ HELÎNE**

Hilo rabe ser helîne
Destan dinyayê b’kişîne
Dinya li me ye xayîn e
Bêşik bo kesê mal nîn e

Dinya nabît mulkê kesê
Kes pê nebet çu hewesê
Eqlî neêx nav qefesê
Mirina xwe li bîr bîne

Te l’bîr bêtin roja mirnê
Dê d’qebrî da mînî b’tenê
Bo te şerik karê dinê
Hawar û îmdad çu nîn e

Hawar û gazî naken karî
Qebir teng e kûr û tarî
Ew hêlûna mişk û marî
Çar teref leşî d’şidîne

Ew perast û têk diborin
Sorg û suwal gelek zor in
Mezin piçûk lê naborin
Qet çu tiştek bezre nîn e

Eqlê xwe tu bîne karî
Şol ke tu bo qebrê tarî
Neçe qebrî tu bi jarî
Xwe b’dinyayê nelêbîne

Xweşya dinê neyê lêbê
Tu baş bike wê hisabê
Dê b’din destê te kitêbê
Xêr û gunehan bibîne

Her kes di destî du kitab
Yek guneh in ya di sewab
Gelek ye hûr e ew hisab
Wê hisabê b’xwe bibîne

Dê bên tu bixwe lê b’nêre
Kan guneh pitir yan xêre
Sûcdaran ser wê li jê re
Ew ji tirsan difetisin

Xêr û guneh gava hatin
Melek bi dorê werhatin
Reng û rûbar di berbat in
Kesê bawerî b’xwe nîn e

Kesê hay ji kes dî nabît
Dil ji tirsê tena nabît
Çaw ji giryan xilas nabît
Gazî hawar hem nalîn e

Gazî nalînêt wê anê
Ax û ofêt ber mîzanê
Çu karî nadet insanê
Pişmanî l’wir fayde nîn e

Pişmanî baş e l’dinyayê
Hawar gazî b’ken Xwudayî
Da efû bin li dergayî
Da li wir xemgîn nemîne

Gazî hawar biçin Xwuda
Terîqa heq nebin cuda
Da b’gehne ber rehman Xwuda
Da li wir nebît şermîne

Da şermîn nebît axretê
Xwuda xêr ket aqubetê
Da b‘gehîte wê lezzetê
Ji cenet mehrum nemîne

Keyf û lezzeta l’axretê
Qesr û horîyêt cennetê
Cihê heyat bo ebedê
Xwe b’wêrê ra bigehîne

Berê xwe b’de rêka xêrê
Her dem kar ke tu bo wêrê

Te l’bîr bet hewza kewserê
Carek vexwe tehn namîne

Cennet û awa kewserê
Bo wan ken terka wê derê
Nebin mexdûrên wê derê
Xerîb bi mexdûr nemîne

**SUBHAN JI TE**

Subhan ji te Rebê mezin
Tuy hakimê hemî hukman
'Alem hemî te çêkirin
Xuliqandin cin û insan

Xuliqandin 'alem cuda
Her yek bi sifetek te da
Hemî li bin hukmê Xwuda
Tuy Xaliqê erd û esman

Qa'înat û tiştê hebe
Erd û esman û kewkeb e
Nîn e xeyrî hukmê te be
Li ser wan tu bûye sultan

Tu sultan î tu rehman î
Xwudanê hemû hukman î
Hebît nebît tu dizanî
Bêy te heyat nîn e tiştan

Te her tişt îna ji 'edem
Te çêkirin hemî 'alem
Tu nazil î her gav û dem
Rê ve dibey tu bênoqsan

'Alem ji neyyê çêkirin
Bi sûretan sifet kirin
Meqsed ew bû te zikirin
Tu melîk î ji bo hemyan

Te zikir dikeyn her demê
Tuy Xaliqê vê 'alemê
Xwudanê lutf û keremê
Li ba tene jîn û jîyan

Jîn û jîyan 'emrê te ne
Rizq û qismet pîşê tene
Qeder tali' hukmê te ne
Tuy raziqê hemû rizqan

Zahir batin tu dizanî
Çak î xirab î ferman î
Îta’et û hem isyan î
Navê te sahibê Xufran

Sûc û guneh têne ba te
Xêr û çakî ber çavê te
Xelet nîn e hisaba te
Tuy qadirê hemû hukman

Xeta û isyana em diken
Istixfarê ji te diken
Hîvî daxwazêt xwe diken
Hewar diken zatê burhan

Me hewar ji zatê barî
Ew e rehmê diket carî
Nebin ji ehlê xusarî
Bike rehmê ser me ‘ebdan

‘Ebdin xwudanên xetayî
Sûc û guneh li dinyayî
Ne sin’et in bêdûmayî
Tu efû bike hemîyan

Laîq te ye efûkirin
Me ‘ebdînî bo te kirin
Ji rehma te hîvî kirin
Hatne ber dergê Xufran

**SUBHAN JI TE (2)**

Subhan ji te şahê qedîm
Padşahê bi ‘ilmê ‘elîm
Hem rehman î hem tu rehîm
Hîvîdar in li dergê te

Hatne dergah curm û guneh
Xatra navê nehwêd û neh
Nebin rûreş û şermindeh
Tu Xaliq î em ‘ebdêt te

Te em hemî xuluqandin
Şekl û sifet afirandin
Fe’l û fêlêt me danandin
Bang û gazî me lalî te

Tuy bexşindeyê zor letîf
‘Ebdêt te ne jar û ze’îf
Ji kes ra me nîn e teklîf
Hîvîdar in ber ‘edla te

Hîvîdar in hemî halan
Bo gunehêt meh û salan
Me li dînê xwe kir talan
Hatine ber xufrana te

Tuy Xefurê kulî zemban
Tuy settarê kulî ‘eyban
Tuy Xaliqê kulî şeyan
Hatîne ber rehmeta te

Me li dinê ‘emel nînin
Me dil û mêlak birînîn
Bo axretê me rû nînin
Tên pêş Burhan û zatê te

Hemî halan bi isyan in
Tarikê ferz û xêran in
Xwudanêt fend û fêlan in
Hîvîdar in ji fedla te

Min rû nîn e ji bo qebrê
Çawan ez dê bikem sebrê
Destê xalî di nav xebrê
'Efûdar bim bi 'efya te

Li dinyayê bûne sersem
Xirapkar bûn her gav û dem
Bi şahî bûn nebûn çu xem
Umêdwar in bi rehma te

Me borand 'umrê cîhanê
Xwudanêt sûc û isyanê
Dê şermîn bin ber mîzanê
Eger nebît xufrana te

Ber mîzanê em rûreş in
Dest xalî û serbiheş in
Me pê li werê nameşin
Benda axir hebîbê te

Me li dinê çu xêr nekir
Me tirs ji cehnem û agir
Me hewar li dergê te kir
Şermîn nebin huzûra te

Li pêş te nebin şerminde
Li mehşerê nebin bende
Pirê biçin gel rewende
Bin rewingê biheşta te

Bibin rewing bo cennetê
Cih bigirin gel ummetê
Xwuda li me bêt rehmetê
Bine mesherê 'efya te

'Efûker î bi zatê xwe
Xwudan-rehm î bo 'ebdê xwe
Me bibexşî cenneta xwe
Bibin laîqê rehma te

Xerîb maye zor bêçare
Ji 'efya te ricakar e

Li mehşer nebît ‘eware
Bigehîte rehmeta te

**ŞAHDA DİREW**

Were bira wext û hînan
Guh de şahda direwînan
Wan bêbextan û xayînan
Ev lêtbînin cema'etê

Emrê Xwuda pexemberî
Wan heram kir şahdezorî
Ew gunehên kebairî
Xwe tavêne helaketê

Mezintirîn ji gunehan
Êk ji wan kirna direwan
Yê li 'ezman nebît xwudan
Dikevîte felaketê

Direwkirin xirabî ye
Yê direwîn cehnemî ye
Biheşt bo wan heram bûye
Ev cih nagirin cinetê

Çar tişt hene 'elamet in
Bo minafiqan sin'et in
Kesê bi wan 'emel ketin
Nema cihê hîdayetê

Ya 'ewil kirna direwan
Di xilafa soz û we'dan
Ji heqyê dûrkewtna 'eyan
Çar xayînya emanetê

Gunehek mezin ji wane
Qetl û kuştina insan e
Cem Xwuda eve isyan e
Nîn e cihê merhametê

Kî bikujît musulmanî
Dest çîte qetla insanî
Xirap diket ew cihanî
Ev bi qatîl têt axretê

Sûra Nîsa nehwêd û sê
Yê neheqî kujît nefsê
Narê hazir d'ket qefesê
Wî nîn e cihê rehmetê

Xezeba Xwuda ser wî ye
Ew laîq le'netê bûye
Ew nik Xwuda xezebî ye
Bînît 'ezap û zulmetê

Sûra Ma'îde sih duya
'Emrê Xwuda bo îsraîlya
Qetla şexs bi neheqî ye
Wek qetla tev beşeryetê

Ger xilas ket yêk bi tinê
Wek hemî insanêt dinê
Xilas kirin ew ji mirnê
Xwuda lê diket rehmetê

Sûra Esra ayet sih sê
Heçyê biket qetla nefsê
Kes bo 'efyê naket behsê
Wî cih agirê zulmetê

**ŞUKURDARÎ**

Şukurdar im ji Xwudayî
Dayme bin êş û ezaban
Razî me derdêt wî dayî
Kirme heval gel kitaban

Bûm meşqûlê kitabetê
Ez dûr mam ji cema'etê
Dev tena ye ji xeybetê
Mam pîvya xwe û hisaban

Ne tucar im çav li hîlan
Dûr im ji pîs û bexîlan
Nakem leyza feres fîlan
Kewtme nav goft û xetaban

Ne li qehwê ne li barî
Mam di xanî da bi jarî
Şew û rojan hîvîdar î
Ji ber êş û izdiraban

Ne okêy e ne domîne
Min dest xwûna beraz nîn e
Min wextê leyîzan nîn e
Em naken terka sewaban

Fikr û zêhn me dane xêrê
Me zeman kêm ma li wêrê
Ji pîryê paş çime kîrê
Min pê nahêne rikaban

Pê edî min naragirin
Bi xîyalan xwe pîr kirin
Me nêzîk bûye bo mirin
Nemaye seyra mehtaban

Me berda rêya sewabê
Zor ditirsim ji hisabê
Nizanim çîyet kitabê
Neême rêza xiraban

Ne mehtab in ne meyxane
Dinya li me taristan e
Me rohn nîn e ew cîhane
Naveken perde hicaban

Perde hicab ne livandin
Me taryê da wext borandin
Dinya xaîn em lêbandin
Me nekir terka liqaban

Me liqab man bi vê xanê
Nebin sefîl vê cîhanê
Kêr nahêt terka ramanê
Ne bo pîran ne şebaban

Xirapkarî me zêde bû
Rêka rast li me berze bû
Xusareta keda me bû
Guh neden dost û ehbaban

Mayne em bin perda tarî
Agirê zulmê wêt barî
Kes wê nahête hewarî
Ji ber me raket niqaban

Perde niqaban pelînin
Dost û ehbaban cemînin
Mesilheta xwe cih bînin
Da nekevne nav iqaban

Me iqab wêt kirne heq e
Me tib’et wek berê req e
Zimanê me şer û şeq e
Dor li Xerîb girt kilaban

**TIRS Û XEM**

Kewtime nav tirs û xeman
Her dem bi ah û nalîn im
Dil bûye cihê eleman
Bi talî û xem û şîn im

Şîn û girî min her dem e
Nîn e sebr û tebata min
Helîyam ji tirs û xeman
Ciger sot û dilbirîn im

Dilbirîn û bi kovan im
Xweşya jînê min çu nîn e
Ji tirsa wirûs fetisîn
Ji halê xwe êmîn nînim

Çu halekî zor xeter e
Neşêyn xwe jê biparêzin
Ji ber dawet û tazîyan
Çi şeklî çare nabînim

Çare nîn e j'rûyê şermê
Tamahkar in ji bo malî
Heyat erzan li bal wan e
Meqsed mêhvanan şelînin

Heqê saz û zurnan bêtin
Êdî min şol çu dî nîn e
Kî nesax bît kî dê mirît
Çu xemê ez pê nabînim

Bi fend û fêl dişelînin
Bi sed mekr û lêb û hîle
Gazî diken xas û aman
Ez 'alemê dê b'cemînim

Wî cemandin ehl û 'alem
Saz û zurna bikar înan
Nîn e tirsek ber dilê wî
Xeman bo kes nakişînim

Xema wî bûn mal û serwet
Di dinyayê çu dî nînin
Wî guh dabû mal û para
Çu xem dî xwe nacemînim

Dinê hemyê dene yekî
Nabêjît êdî min bes e
Wek Qaronî zengîn bîtin
Nabêjît ez yê zengîn im

Kifnê berûk pê ve nînin
Mal nabeye di qebrî da
Hisab pê te gelek zor e
Ez wê xema te d'kişînim

Xem li dinê xilas nabin
Çaw ji dinyayê têr nabin
Ku çaw tejî bûn ji axê
Hingê em dê wê bibînin

Mal û serwet bi hisab in
'Umr û 'emel bi kitêb in
Nîn e cihê şubhê wane
Xerîb im her dem difikrim

**TU HEBÎB Î**

Tu hebîbê hey suphan î
Resûlê şahê xufran î
Dermanê ruh û qelban î
Meded ya şahê ‘Ednan î

Mucesem[230] enwer û nur î
Hebîbê heyyê sebbur î
Bi taç û textî meşhur î
Nebîyê zatê Burhan î

Tu bedra[231] fatih û nasir
Hebîbê ekberê qadir
Nebîyê ewel û axir
Tu nûra erş û rehman î

Tu behra nûr û xufran î
Xwudanê nûr û Qur‘an î
Şefî’ê roja mîzan î
Beşîrê şahê sultan î

Tu yî behra nûr û hikmet
Tuy resûlê şahê qudret
Bo alemê tu bûy rehmet
Nezîrê kenze[232] îrfan î[233]

Tu yî derman ji bo derdan
Tuy seyyahê erd û esman
Tu xelas ke me ji derdan
Tu yî nûra dîl û qelban

Feqîrek pir guneh im ez
Sefîlek bêpenah im ez
Bi derd ah û fîxan im ez
Resûlê ins û cinan î

---

230 Mucesem (‘E): Cism an jî yê di rewşa cism de.
231 Bedr (E): Ronahîya heyvê.
232 Kenz (‘E): Xezîne, gencîne.
233 Nezîr (‘E): Hişyarker. Navekê pêxemberî ye.

Me hewar şahê nûrî ne
Îman zeîf nema dîn e
Şefa'ata me b'cih bîne
Şefî'ê zenb û isyan î

Ji xafletê bûme asî
Ji zilmatê çu nenasî
Tu nebîyê am û xasî
Tu melceyê asîyan î

Bi nezanî bûme wehşî
Min guneh kir bi rûreşî
Bo min nema çi rûgeşî
Bêçare me tu eman î

Min guneh kir wekî guryan
Exlaq nema wekî duryan
Dil helîya ciger buryan
Şefî'ê kullî zenban î

Ji ber nefsê me kir zarî
Ji dilê kûr me kir qarî
Hewar nîn e bo vî jarî
Tu yî hamîyê îmanê

Çi wehşî bû li min peyda
Ez dîn kirim wekî şeyda
Me dinya girt û dîn berda
Xwudanê nûr û Qur'an î

Fikr û beden nema mecal
Êş û elem bûne heval
Ji heqîyê dev bûye lal
Nûr û qendîla erşan î

Bes e Xerîb tu bi derd î
Curm û guneh tejî erdî
Bi ezmanî bûye bendî
Hewar ya şahê 'ednan î

**WERE**

Were gelo tu we neke
Çawêt qelbî li xwe veke
'Umrê dinê ne gelek e
Bo mirnê karê xwe bike

Heta kengî dê bimînî
Tu ney gêj î neyî dîn î
Destan dinyayêt werînî
Bo axretê hisabê b'ke

Dê bimînî heta kengî
Bûyî xafil bi wî rengî
Qelbî bişo tu ji jengê
Ji gunehan xwe paqij ke

Ji gunehan xwe b'ke arî
Te dil bûye şeva tarî
Te bêfayda weqît borî
Karê sefera rast bike

Heçyê rast şol ket li dinê
Bîrê bît halê mirinê
Bît tarîqê zewqa dinê
Ew axretê karî dike

Karê axretê 'emel in
Îbadetî ne d'tenbel in
Ne j'wan in yêt bê'emel in
Dew û qelban fikir yek e

Bibe pişman li wî 'umrê
Dema tu biçîye qebrê
Dê b'kevîye nava zecrê
Ji xirabyan tewbe bike

Ji qelbî bike tu tewbê
Gel gunehan bike herbê
Terk bike înad û kerbê
Bo axretê karî bike

Çunkî tu yî gunehkar î
Bike tewbê bi sed carî
Rojêt rohn û şevêt tarî
Xirab‘emelan terk bike

Ji êvarî heta sibê
Hindî ku ‘umrê te hebe
Te hawar bît li pêş Rebî
Her dem ‘efyê rîca bike

Dûr be tu j’hevalê xirab
Dînî nede b’dost û ehbab
Tu zivire rêya sewab
Ser rêka rast karî bike

Dirust bike li xwe halî
Mexrur nebe tu bi malî
Wextî neborîne xalî
Şev û rojan zarî bike

Neke b’malî qudehîyê
Dê pişman bî li dûmahî
Ser dinyayê ke qencîyê
Bo dinyayê dîn terk neke

Din bi dinê neguhare
Li tewba nesûh[234] zivire
Kêm xeber de zor bifikre
Qedera heq jibîr neke

Xetê qeder gelek hûr e
Qehrê tarî gelek kûr e
Sebir tê da gelek zor e
Heq hesaban jibîr neke

Li dinyayê nebe zordar
Neçe qebrî tu gunehkar
Dê musellat bin mişk û mar
Heqê beşer jibîr neke

[234] Anku tewba ku xirab nebît.

Li dinyayê nebe serxweş
Gel ‘alemê nebe qelleş
Axretê dê bîye rûreş
Şermê ji halê xwe bike

Te li dinê keyf gelek kir
Şer û zulm û te guneh kir
Bo axretê te çu nekir
Leh û lêban terkê bike

Binêre kan fayde çî ye
Te çi mehsulat kiriye
Defter xalî yan tejî ye
Tu karê xwe û rê bike

Li dinyayê gelek xiryan
Çûne qebrî rût û uryan
Di qebrê de diken qaryan
Tu xwe j’miryan hisab bike

Dinya nebû mala kesê
Kes pê nebet çu hewesê
Dê l’qebrî kewte qefesê
Ji dinyayê xwe dûr bike

Gelo tu l’dinyayê har î
Ber gunehan dil bû tarî
Dê b’çî qebrî bi dilsarî
Hisaba qebrî baş bike

Tu l’dinyayê kewtye xewê
Te bo Xwudê ser natewê
Kî ve d’çî l’kîrê rakewê
Cihê qebrê xwe kifş bike

Sivik rabe ser helîne
Wextê xêran neborîne
Tewba mezin nedorîne
Tu terka dinyayê bike

Carek halê xwe b’fikire
Rûne bo halê xwe bigrî

Şeytan tu yê ji rê birî
Tu recma wî le'în bike

Tu şeytan ji xwe dûr pêxe
Neke şerîkê karê xwe
Neke serbar ewî bo xwe
Tu wî bo xwe bargir bike

Hêj l'dinya kar ke axretê
Paş mirnê kes nagehîtê
Neborîne wê firsetê
Da l'nik Xaliq karî bike

Xerîb te l'dinê çu nekir
Bûye 'ebdal xwe nas nekir
Gel derd û kulan pêk nekir
Te j'wê dinê êdî bes e

**WERE GELO**

Were gelo lezê bike
Nekeve xewa xefletê
Ji bo axretê kar bike
Nebe j'yêd dûrê rehmetê

Ji Reb bixwaze xufranê
Nekeve lêba cîhanê
'Emelêt xwe û îmanê
Bike laîqê axretê

Îmandar be bi Qur'anê
Digel 'emran û peymanê
Were gelo gel îmanê
Tu bo xwudanê qudretê

Min hîvî ji zatê mewla
Dikem gazî Resûlullah
Ji bo xatra Kelamullah
Biket ehlê hîdayetê

Hîdayetê biket nesîb
Kanê nebî kanê hebîb
Kanê luqman kanê tebîb
Kan xwudanê şefa'etê

Kanê serwer kanê beşîr
Kanê resûl kanê nezîr
Kan hebîbê Heyê Qedir
Kan rehberê 'eresatê

Kan Ebûbekir kan 'Umer
Kan 'Usman 'Elî Heyder
Kanê Telhe kanê Zubeyr
Kanê emînê ummetê[235]

Kanê Hemze kanê 'Ebas
Kanê Bîlal Selman Faris

[235] Li vir qesta helbestvanî 'Ebû'ubeydê kurê Cerah e. Hêj di saxîya wan de, ji bo deh kesan mizgînîya cinetê hatîye. 'Ebû'ubeydê Cerah jî yek ji van deh kesan bûye.

Kanê Zeydê îbnî Haris
Kan mustecabê de’wetê[236]

Kanê Se‘îd kanê Cehfer
Kanê Mus‘eb îbnî ‘Umeyr
Kanê Cu‘eyl Îbnî Dumeyr
Kan îbnî ‘Ewfê biheştî

Ew her dehêt xwudan-mizgîn
Digel wan eshabêt guzîn[237]
Digel rewza mûtehirîn[238]
Em bibin gel wê heyhetê

Hevsera Lût pêxemberî
Gel xiraban kir hevkarî
Bi xirabyê neçû serî
Wêran kir mala nubwetê

Ew seyê Eshabû’l-Kehfan
Ewî terk nekir bo xwudan
Digel insanî hat ‘ezman
Digel ewan bû biheştî

Ya Rebî seyê şivanan
Giheşt insana gel xwudan
Bi ‘emrê Xwuda hat lîsan
Bû nobedar derê şkeftê

Ya Reb ew se ez insan im
Bi ism û cism musulman im
Xwudan-îman û Qur‘an im
Nekey ehlê şeqawetê

Tu bo xatra ewan zatan
Pêxember û mucîzatan
Sehabe û kiramatan
Wergirim ez bera‘etê

[236] Mustecabê de’wetê, ji kesê ku du’ayên wan têne qebûlkirin re tê gotin. Li vir qesta helbestvanî Se’dê kurê Ebûweqas e.
[237] Guzîn (‘E): Xwudanqedr.
[238] Cihê rabûn, rûniştin û qebrê Muhemmed pêxemberî bûye. Anku cihê ku lê dima.

Ya Reb ‘Ebdullah ‘ebdê te
Bûme seyê ‘eshabê te
Ez ‘efû bim li dergê te
Xilas bibim ji zehmetê

**XALIQÊ MEZIN**

Tu xaliqê heyyê[239] mezin
Te em dane vê cîhanê
Xuliqandin insan û cîn
Li me bike tu îhsanê

Îhsan biket gel me jaran
Me guneh kirin hizaran
Curm û sûc naên çu karan
Nemaye cihê wijdanê

Nemaye cihê çakîyê
Meşxûl bûn bi xirabîyê
Neçûn li rêka rastîyê
Ya Reb tu rehm hem rehman î

Tu rehman û hem Xefur î
Xaliqê hey û Sebur î
Rehmê biket gel vî pîrî
Xwuda bidetê îmanê

Hebît îman digel xêrê
Hisab nebînît li wêrê
Derbaz bîtin li ser pirê
Bigehte nava cennetê

Cennet bo me bibît mesken
Cih bigrin cenneta eden
Hindî hebin guneh û zen
Efû bibin bi xufranê

Ya Reb Xefar[240] navê te ye
Sûc û guneh min zede ye
Mam l'hivya 'efûya te ye
Nebime ehlê isyanê

Nebim asîl 'emrê barî
Rehmê biket gel wî jarî

[239] Hey ('E): Sax û bi quwet. Tê wateya nemirinê.
[240] Xefirandin ('E): Navê Xwuda ye û tê wateya efûyê.

Neçim pêş bi gunehkarî
Rûreş nebim ber mîzanê

Nebim ji ehlê isyan e
Ber mîzan nebim pişman e
Me hisab nedît giran e
Xilas bin em ji mîranê[241]

Xerîb ne j'ehlê isyan e
Li wir nebît pêşîman e
Bi qudret şahê sultan e
Ew bigehte ber xufran e

[241] Mîran ('E): Cehnem, dojeh.

## XERÎBÊ SÛSYANÎ[242]

Rabe Xerîbê Sûsyanî
Bi wî aqlê xwey nezanî
Behran dikeyn melevanî
Tu dê xerq bî di awê da

Ne xewas î ne bi gemî
Kovandar û dil bi xem î
Te dest naêne qelemî
Bûye bendî di malê da

Bûye bendî te çu nekir
'Ilm û zanîn te j'ber nekir
Bi nezanî wext bezre kir
Cahil mayî di dinê da

Kes bê'ilm nabîte seyda
Te 'ilm bo xwe nekir peyda
'Umr û salêt xwe heder da
Bezir bûne di gavê da

Te bezr kir 'umrê ciwanî
Bo te maye pêşêmanî
Ne te xwend û ne te zanî
Bûye xwusar di vê rê da

Di vê rê da leşgiran î
'Umir borî bi nezanî
Kanên te karê cîhanî
Te dorandî di cehlê da

Di cehlê da 'umir borî
Bo gunehan te kir gorî
Te b'xefletê zeman borî
Weku siha di tawê da

Weku sihê bo te nema
Te dil kewtiye nav xema
Derd û pîrî l'te bû cema
Tu kewtiye di navê da

[242] Navê gundekê Geverê ye.

Di nav mayî tu li gundî
Nav cahilan bûye bendî
Were hişyar be kêm xwendî
Ji dinyayê here wê da

Tu j'dinyayê destî berde
Gel cahilan ne xeber de
Têr dîtine kul û derd e
Bes êdî jê bike veda

Heta kengî dê weha bî
Ji vê rêkê cuda nabî
Bo te derman peyda nabî
Nîn e îlaç mirnê wê da

Mirin wê têt ye nêzîk e
Daweteke ye bêbûk e
Zava b'keyf e yan xudûk[243] e
Ew yêt meşyeta Xwudê da

Xwuda dizanît wî halî
Kan keyxweş e yan dinalî
Dest tejî ye yan jî xalî
Di nava qebrê tarî da

Xwezya kesê baş kar kirî
Destê xêran dirêj kirî
Ew dêy dûr bît ji agirî
Li bin axê di qebrê da

Me qebir rêka axretê
Bo pîsan cihê zehmetê
Xwuda ket cihê rehmetê
Nekevin bin sûc û derdan

Dikem hawar bo Xwudayî
Bi vê 'umrê piçek mayî
Bi xêr bînît me dûmayî
Ruswa nebim nav amê da

[243] Xemgînîya bêdeng e.

**XWUDA HEYE**

Were bira tu guh bide
Min nesîhet bo te heye
Nekeve nava zehmetê
Xeman neke Xwuda heye

Bi xeman şol naçne serî
Bi eqlê xwe ke rehberî
Ji rêya heq neçe derî
Te dost bivêt Xwuda heye

Nekeve nav fend û hîlan
Dûr be ji pîs û bexîlan
Tu muhtac bî bo delîlan
Kelamê heq Qur'an heye

Ger bi heq î tu yî rast î
'Eqîda xwe neke sistî
Te murşît bivêt duristî
Bizane pexember heye

Pexember murşit bibîne
Zengînî eql û zanîn e
Xwe bi malî nexapîne
Bizane qena'et heye

Qena'etê key nîyazî
Bi halê xwe bibe razî
Ger meşxulyê tu bi xwazî
Îbadet têra te heye

Yê meşxul bît îbadetê
Ji kes nagirît minetê
Eger bixwazî îbretê
Bêjin mirin têra heye

Her tişt xilas bît mirinê
Nebe muptelayê dinê
Hes key binasî dujminê
Nefsa xayîn têra heye

Qebûl nekey tu evane
Bawer nekey wan peyvane
Vihê heqîqet bizane
Narê cehnem têra heye

Ewa Xwuda teqdîr kirî
Her dem pê bîne bawerî
Cih çêneke nav agirî
Tu bawer ke qeder heye

Bi xeberê nefsê neke
Ji hirsa xwe bawer neke
Xirabîyê gel xwe neke
Pêle îrada heq heye

Bi malê xwe nebe mexrûr
Tu bi malî nabye mesrûr[244]
Ev agir e ji xwe b'ke dûr
Mal xêr nebît bêfayde ye

Bo malî tu nebe mecnûn
Cema neke wekî Karûn
Dê te bezir ketin gerdûn
Çengek ax têra te heye

Binêre xwudan-eqilan
Mal nekir bar li ser milan
Zengîn ye qen'eta dilan
Sebr û şukur têra heye

Sebirkerê li dinyayê
Xwudanxêr e li uqbayê
Dinya hat dewra dûmayê
'Elametan têra heye

Hewayê nefs nefikire
Li dînê xwe bizivire
Bo Xwuday baş bizikire
Dawyê qebûl têra heye

[244] Mesrûr ('E): Bikeyf, dilxweş.

Xwe neînye lêbê çu car
Xwuda bîra te bît her car
Şeytanê xwe bike heswar
Zevtkirna wî têra heye

Bizane can emanet e
Ruhê neke xîyanet e
Dînê xwe nede ‘adet e
Dîn da rast be têra heye

Xerîb çend nesîhet kirin
Xwezya wan kesên bigirin
Gel eqlê xwe bişêwirin
Eql û fikir têra heye

**YA REB**

Ya Reb navek te Cebbar e
Hikmê te her dem li kar e
Li ser me agir dibare
Tu l'halê me bike çare

Tu xaliq î tu rehman î
Hemî şolan tu dizanî
Agir barît ji esmanî
Me neman sebr û qerar e

Ma ew zulme heta kengî
Bimînîtin bi wî rengî
Li sebra te bûy direngî
Qehra xwe tu bîne kar e

Hawar dikeyn navê Qehar
Bînte karî hukmê Cebar
Te'dîd[245] biket dujminê har
Ewan biket şermûzarê

Şermûzar ket wan zaliman
Def'e ket wê zulma giran
Bela xwe b'det ser serê wan
Îflah nebin ew çu carê

Şermûzar bin li cîhanê
Agir berdan Kurdistanê
Nehêlan cihê jiyanê
Dil ji dînî kirne sar e

Zulmê diken navê dînê
Wan şol bûye rêtna xwûnê
Dinya kirne cihê kînê
Bûne wekî gurêt har e

Bûne gurgêt nava pezî
Xwûnrêj in ew hemî terzî
Rêtna xwûnê qet nabezî
Bûne dujmin û xedar e

[245] Te'dîd ('E): Terbîyekirin.

Bûn dujminê qewmê me
Heqê jînê nadene me
Bûn hevkarêt xayînêt me
Qehir bin ismê Qehar

Qehra Xwuda li ser wan be
Îmana wan ji Şeytan be
Cehennem mekanê wan be
Îflah nebin ew çu car e

**ZECRA FELEKÊ**

Ji qehra te felek dîsa
Nemane min çû keyf û hal
Kewtîme zecra te dîsa
Xirab hatin min meh û sal

Dem û salêt min bûn jahir
Dewr û dorêt min bûn agir
Hemî rojan zor û cebir
Bo min neman sebr û mecal

Sebr û mecalêt wê demê
Êxistin keder û xemê
Meded ji Rebê 'alemê
Li bal wî ne tehwîl û hal

Keyf û halêt vî zemanî
Hal û isyanêt cîhanî
Kerb û kînêt gel insanî
Te me'lûm in ya Zel-Celal

Li nik 'ilmê te me'lûm e
Ew talan qetl û hucûm e
Bo çi her wextî didome
Berdewam e her wext û sal

Berdewam in hemî karan
Di her wext û hemî caran
Sotina wan dehl û daran
Bo insan kuştin kir helal

Helalya namûs û qetlê
Nemana insaf û 'edlê
Nebûna ikram û fedlê
Li xurbetê bûyne 'ebdal

'Ebdal in em di nav 'amê
Kîn û kerbêt nav islamê
Bi wî hal naket dewamê
Me hîvî ye biryêt qital[246]

---

[246] Qital ('E): Şer, pêvçûn.

Bibiryên qetl û nexweşî
Bêne ser me feslêt xweşî
Mirov li sûkan bimeşî
Em bibîne dost û heval

Em digel yêk baş cîran bin
Ser tewhîdê musulman bin
Mûcibê hukmê Xwuda bin
Da bin xwudan-husn û kemal

Husn û kemal nabne serwet
Yêt qelb bi kîn û ‘edawet
Mani’êt rehm û ‘edalet
Çawêt me têt awa zelal

Xwedyên qerawet-kursîyan
Dixwen ew malê sêwîyan
Mekan nema li çu cîyan
Cehnem bo wan maye betal

Ew kesêt desthelatdar in
Malê nas bi xedir xwarin
Zulim ji devî dibarin
Ew in xwudan-fitn û qital

Qetl û ‘amêt dinê kirî
Dîzya malê xelkê kirî
Zik tejî kir bi agirî
Bo agirî bûne hemal

Ew hemal in bo agirî
Cehenem wan baş digirî
Şerîkêt zulma kafirî
Wan nemane çu qewl û qal

Qewl û qalêt wan namînin
Dil xedar û qelb bi kîn in
Dujminêt insan û dîn in
Heq û rastî kirne ixlal

Bûn mani’ê heq û nasî
Nehêlan cihê esasî

Zulim kirne heq-şinasî
Bi şer û şîqaq[247] û cêdal[248]

Ew şerîr û fitnekar in
Gel zaliman ew hevkar in
Digel xedrê ew dibarin
Nema gel wan fedl û kemal

Cewr û cîdal pîş û kar in
Fitne û fesad dîhar in
Di her gavan xirabkar in
Dest da nîn e tiştek helal

[247] Şîqaq: Vêkraberdan.
[248] Cêdal (‘E): Nîqaş, şerenîx.

Helal nîn e heramxwer in
Ji ku hatye tê nafukrin
Kîsê xelkê serwet kirin
Wek Qarûnî bûn xwudan-mal

Wek Qarûnî cema kirin
Xwe heramî zengîn kirin
Mirina xwe his nekirin
Xerîb dê ji wan bît suwal

**4. HELBESTÊN DÎNÎ-II / Beyt**

**‘EYD E JI BO HER KESÎ**

‘Eydê her kes yê digeryêtin li dost û ehbaba
Ez neşêm sera kes bidem ne ji çak ne xiraban

Ez yê mayme bêdest û pê û bêçeng û yê bêper
Bû hesret li min neşya biçme mezarê day baban

Eger derd û kul û hem êşêt min bêne zimanî
Bawer ke ew naên hisaba defter û kitaban

Min ji qehra felekê her demê tîr wê têne dil
Cerg û dil û mêlak li min biraştî wek kibaban

Ez yê bûyime êxsîrê çarxa felekê îro
Li min naket rehmê çu car her dem diket ‘itaban

Ya Reb ma dê her wehe bimînit ev hale li min
Yan Xwuda navê min nivîsye deftera xiraban

Mehrumê sihhet bûme nebim mehrumê rehmetê
Hîvya rehmê me bi xêr bêt ber me wextê hisaban

Ma heta kengî dil dê bi kul û xem bîtin ya Reb
Nebim mehrûm ji ‘efya te ku neşêm dem cawaban

Bûme êxsîrê derd û êşan di destê felekê
Lewra cefa wê digel min naêt hed û hisaban

Xerqî nav xeman kirme feleka bêbext û xaîn
Bûm hilakê nefs ey kaşifê siran bi dil û can

Hîvî kem ismê te yê şafî bexş sihhet bît beden
Xerîbê bi ta û lerz im di nav çerx û dolaban

Beden li min tarûmar bûye fîxan diçin ewraz
Cîhan bo min bû zîndan dûr bûm ji dost û ehbaban

**DAD Û FERYAD**

Dad û feryadê min li pêşberî şefî’ mehşerê
Bê’emel şerminde û rûreş ez mayme l’ber derê

Leşgiran û tenbel im bi terkê ta’et her derê
‘Umrê şebab min telef kir pir guneh wextê berê

Êxsîrê nefs û hewes bûm xerqî zen[249] bû pir guneh
‘Umir bi dawî bû b’xwusarî min êdî wext nema

Mam bin barê giran pir xeta derd li bin bûn cema
Min hîvî da ‘efya te ey Xwudayê min padişa

Çend bi isyan û xetab im feqîr im umêd heye
Na-umêd nabim çu car lateqnetu xitab[250] heye

Min tewekel da rehma te çunkî te ‘ef zêde ye
Ey xwudanê lutf û rehm ev feqîre zor hewce ye

Derdgiran im bê tebîb im ah û kovan bêhisab
Ta û lerzî têne min her dem dê çawan dem cewab

Kewtme nav behra zenban xerqî xetam e bêsewab
Sûc û curm min hene bêhed dest û pê dê bên xitab

‘Eza û dest û pê l’ser min bibne şahid we demê
Defter reş bû j’gunehan dê çawa bera xwe b’demê

Rûsîyah û şerminde bimînim ez di nav xemê
Sed hizar car hawar dikim ji Rebbê vê ‘alemê

Rêya heq neçûm rêvyê rêya xirab im pir xetîr
Dê bi çi rû biçim mehşer pêşber mewlayê xebir

Hawar sed hawar bo sefihê guneh û zor feqîr
Hatme dergê ‘efyê tu yî Xafirê zenbê kebîr

Ez Xerîbê Gulordî xêr û çakî nînin di dest
‘Abdal û dîn im her demê serxweş im ez gêj û mest

[249] Zen (‘E): Guneh.
[250] Lateqnetu xitab: Ayeteke Qur‘anê ye. Xwuda kerem diket: “Bêhêvî nebin ji rehma min.”

Westam hîvya rehma Rebê ‘alî min jê xufran xwest
Min soz û we’da xwe li bîr e mam ser ehda elest

**DILÊ REŞBÛYÎ**

Were dilê reşbûyî neke tu çu car isyanê
Bes ke tu ji sûcan ji Xwuda bixwaze xufranê

Giranbar xirabkar hem sermizar neçe meydanê
Defter hêş û dil nexweş û rûmet reş l'ber mizanê

Hisab wene sûc gele ne de'wa yê li wê derê
Wext xeter bêjin were ew defter e ka mehderê

Dê bên ka bêj defter bi qirêj te nekirin niwêj
Şol dîyar hatin cînar bûn de'wedar tu ker û gêj

Nîn e cewab hazir kitab çune sewab l'wê derê
Cab çî ye hecet nîye îmdad kî ye korbeserê[251]

Meded nîn e dil birîn e dost revîn ma bi tenê
Tenê maye reng nemaye rê birya wek mirinê

Înan kitab vekir hisab zor bûn xirab sûc bûn pir
Xêr bûn heba guneh teba ma bende bi 'eyb û sir

Çi biket wê demê reş bûy lewmê ew kewt elemê
Lê kom bûn demê xêr çûn hemî bi curm çû cehnemê

---

[251] Beser ('E): Dîtin. Anku korê qîyametê.

**DINYA DIREWÎN**

Were nîk min bi destînî û sedaqet
Tefekkur ke li dinyayê tu bi diqqet

Dinya direwîn te nelêbînît heval
Ye xayîn û xedar e bo kes nabît mal

Yê têt danayê yê danayê dê çîtin
Bo kes nebû mal û bo kes namînîtin

Mehvanîyek bo kismekî ji zemanî
Pê ve nedorîne bêxêr tu wî canî

Xanek du derge ye dê b'çî jor derkevî
Xirabek wêran e bo axret bû zevî

Bi bax û bostanêt xwe zor ye ciwan e
Tenê bo dîtin û lêbandna çawan e

Xwudan-aqil xwe pê ve qet nalêbînin
Bêaqil 'umrê xwe pê ve diborînin

Cîhanek bêbeqa û ye bêbeha ye
Çu kes bi wê nabîtin xwudanwefa ye

Jîna gel wê bêesas û ye bêcih e
Eqildaran zanî ew ye bêbingeh e

Yêp aqlî waqif hewes naket dinyayê
Bêmeqsed û bêmiraz e bo dûmayê

**ESRARA ÎLAHÎ**

Ji esrara îlahî kes neşêt jê b'ket xeberdan
Menbe'a[252] 'ilmê xeybê li nik Xaliq e wê bizan

Kes neşêt ji zanîna siran xeber detin çu car
Ji 'alim û zana şêx û welî ta pêxemberan

Her kesê jê xeber det ew nizanît heqîqetê
Kilîla 'ilmê xeybê nik Xaliq e ew e xeyb-zan

Xeyrî wî nizanin xeyba Xwuda ne ins ne melek
Bi 'ilmê xeyb kes bi xeber nîn e ne cin ne insan

Dibêjin em xeybzan in ji her tiştî diden xeber
Bi gotna xwe ji dîn derkevin bin bêdîn bêîman

Her ew dizanît çi heye ew e xeybzan nîn e kes
Kî ye zanît hikmeta xeybê ne melek nej cinan

Qet xwe neke şirîkê 'ilmê Xwuda bi xeybzanî
Nekeve nava gunehan bi xeybzanîna siran

Kanên gelo tu dibêjî her tiştî ez dizanim
Bi gotna xwe dibîye mufterî[253] bi qelb û ziman

Pêxember siran nizanin eger wehî nebîtin
Bi nezanî ne laîq e sirêt Xwuda xeberdan

Bi qelemê ezel hatye nivîsin çi xêr çi şer
Bi qedera xwe razî be her çi ya kirye ferman

Di ezel da çi hebît Xwuda çi hes ketin ew e
Bi hukmê wî razî be bêinkar û bêisyan

Dijberî emrê wî nebe her dem tu bibe mutî'
Tu umêdwar be bi 'efya wî hem bi rehm û îrfan

Tu xwe neke wekil ji Xwudê ra bi xêr û hem şer
Rehmeta wî gelek zor e her ew e rehm û rehman

[252] Menbe' ('E): Jêder, serekanî.
[253] Îftiraker.

Tu nebe mexrûrê îbadet çi wext û çi deman
Her dem du’aker be ji Xwuda tu bo qebûla wan

**GILÎ Û GAZIND**

Ya Reb bi qelemê esrarê te ye ezel da
Ji derd û kul û xeman nemînim ez yê cuda

Min sûcê ‘ebdînya te kirbît bi xeta bim ez
Cihê min jî heye di deftera ‘efya te da

Te ez mehrumê sihhet kirime nê te îro
Nê me jî par heye di rehm û xufrana te da

Te felek li me neyar kir min dirahijînît
Yan ew qedere bo min niwîsîy di ezel da

Sebr û aramek me nîn e ji ber derd û êşan
Ya Reb bi lûtfa xwe ke me xilas ke ji derda

Ka bes e çerxa felek bi rex me biziwirî
Ji cewra felekê direvim bi hawar nida

Te digel çerxa cîhanê kirme ebdal û kor
Qismet nebûye carekê dost bît di gel me da

Tali’ û bext bo me şaş e her demê bûye ters
Bûye şirîkê zaliman her wext digel me da

Bo feqîran ma nîn e rehmek te bi carekê
Felek hevkar zulma zaliman e dijber me da

Ey Xwuda min sebir kêm bûye ji derd û êşan
Carek bi rehma xwe binêr wî feqîrê geda

Min gelek cewr û ezyet dîtin ji qehra felek
Kî ji zulma wê dikarît ya baş jê bin cuda

Wê mal li min kirye zindan wê zalima bêbext
Êxistme nav behra xeman hêlam nav ‘ezab da

Em kirin xemdarên dinya cih nehêla bo me
Nahoş û mest im nema fikr û eqil gel me da

Na-umêd nînim ji lutf û ihsana te ya Reb
Çaw nehêrim bo ‘efyê te ser me hebît rida

## GOTINA HEDÎSÊ

Were guh de gotinêt pexemberî
‘Emrê ji bo mûmînan û beşerî

Eve ne heft gunehêt zor giran in
Xwe jê biden paş ku hûn musulman in

Yêk şirîkçêkirin e bo Xwuda yî
Ya dî sehirkirna li dinyayê ye

Ya sê qetla nefsa bi neheqî ye
Ya çarê xwarna malê êtîmî ye

Ya pêncan ji wane riba-xwarin e
Ya şeşan terka şerê pêş dujmin e

Ya heftê ji ewan gunehêt giran
Iftira namûsê bo yêk musulman

Ya ku gorey imamê şafi’î ye
Dû şirkê ra kuştna bi neheqî ye

Nisêhetên resûl ji bona mumin
Bi kuştna yêk nebne kafir piştî min

Hûn baş guh dene min û wan gotinan
Xwe bidene paş ji xedr û kuştinan

Bizane xirapkirna cîhanekê
Nabît mislê kuştina muminekê

Kesê xwûn nekiriye nav destê xwe
Muhafize maye li ser dînê xwe

Temamê ehlê asîman û erdî
Têkel bibin bi kuştina yêk ‘ebdî

Xwuda hemyan dê bikêşte mehkemê
Ser sûretan bizelinte cehnemê

Kes nahêt kuştin illa bi sê eger
Yêk ew xwudanzewacê ku zinaker

Du ewê bi neheqî katilkirin
Şûna meqtûlî[254] tête qisaskirin

Yê sêyan ew e yê dibîte murtet
Ew e yê inkara dînê xwe diket

Ew dibîtin bêne kuştin derhal e
Dîn ji bo wan nadetin çu mecal e

Xwuda ‘emr kir xwe nekujin destê xwe
Rehmetê bixwazin ji Xwudayê xwe

Ewêt bi benkî xwe dixendiqînin
Di cehnemê de berdewam wêt bînin

Ewêt dûmahya xwe bi jahrê tînin
‘Ezabê bi jahra dojê dibînin

Ji Sûreya Nîsa ayeta duyan
Biden malê etîman û sêwîyan

Malê wan têkelî malê xwe neken
Agirî di zikê xwe da hilneken

Sûreya Nîsayê ayeta dehan
Xwudayî wê ‘emir kiriye wahan

Male êtîman xwe têkelî neken
Agirî tujî zikê xwe da neken

Bê-izin tu têkel nebe malê wan
Da tu nebîye mesûlê heqê wan

Pexemberî vihê yê ‘emir kirî
Bi tilîyêt xwe yê îşaret kirî

Ez û kefîlêt êtiman wehe ne
Di biheştê da ez û ew pek ve ne

[254] Meqtûl (‘E): Kuştî, qetilkirî.

Hindek ji wan nesîhetan me gotin
Ji bo Xerîbî nebîte xwe-sotin

YK

## PÎŞ Û KAR

Kewtme naw çerxa zemanî min neman umêd û hal
Hub û hesret man di dil da bûm şuyuxek[255] pîr û kal

Bi hizaran sal ‘umir bît akubet her mirin e
Malê Qaron[256] te di dest bît malbirin her kifin e

Teşbihê xewn û xiyalan dê biçît wek yêk dem e
Nîn e keyf û lezzeta wê kul û derd û elem e

Kewtne hewesa jiyanê me mirin naête bîr
Se’[257] û xîrêt me çu nînin sûc û curm gunhê kebir

Hey hawar û sed mixabin bo wê jîna bê’emel
‘Umir borand bi hesûdî kîn xirabî dil xelel[258]

Dilxirab û qelbqirêj zimantûj û zaxelbeser[259]
Nîn e karek wî di destî dilêt kovan û keser

Qîmeta ‘umrî nezanî kanê ji bona çi ye
Xêr û çakî wê birandin pîş û kar xirabî ye

Ferqa xêr û gunehê nekir ji hev ma di nav da
Nehêt bîrê dûmahî ew kewtye di nav xeman da

Çendî zor e rûreş û şerminde çûna mehşerê
Pêş mewlayî nîn e cihê îtiraz û xeberê

Min hawar û gazî j’vî halê giran û bêmefa
Nekevne nav vî derdê nexweş bo xatra Mustefa

Mayme bi destê xalî çu tiştek baş nîn e tê da
Bûyme miflisê axret mayime di nava rê da

Ey Xerîbê bêçare min sed hîvî û gazî ye
Hatime dergahê ya Rebî jê bibe razî ye

255 Peyveke erebî ye. Tê wateya pîrîyê.
256 Eqrebayekê Hz. Musa bû. Gelek dewlemend bû û xwudanê gelek zêr û zînetê bû.
257 Xebat, kar.
258 Xirab.
259 Çavê hesûdîyê.

**RABE HEBÎB**

Tu rabe ey hebîbê Rebê rehîm
Te ism nivîsye li ser erşê ‘ezîm

Ji nûra navê te afirand felek
Hindî ku eşya û mewcûdat gelek

Kulû tiştek ewî înane wucûd
Bo nebî wesif dana xulqê mehmûd

Tu bûyî hebîbê Xwudayê lareyb[260]
Sahibê wehy û ilham û sir û xeyb

Nûra Muhemmed xuluqand kulî-şey
Bîl-cumle hazir kirin emwat[261] û hey

Ew ruh û beden û şeklê di kamil
Ji ew qalib û sifat û hem aqil

Hatne ew ji sin’etê me’bûdê heq
Ji nûra Muhemmed xuluqand mutleq

Nûra te ye ser defterê qa’înat
Ji wê nûre çekirin tev mewcudat

Nûra te sebebê hebûna ‘alem
Ismê te bû sebebê ‘efya Adem

Çi lahûtî[262] û eger çi di nasûd[263]
Çebûne hemî tişt kirine mewcûd

Di ‘alem da çi zahir bît çi batin
Hindî ew tiştê ji Xwudayî hatin

Bûne aşiqêt nûra cemala te
Ew muşahid in nûra kemala te

260 Lareyb (‘E): Bêguman.
261 Emwat (‘E): Mirin.
262 Lahûtî (‘E): Aşkera.
263 Nasûd (‘E): Veşartî.

Melek negihiştne fezîleta te
Beşer xilas d'bin bi şefa'eta te

Hindî weku eyb û qusûrêt insan
Hindî ku li dinê heyî musulman

Ew li hîvya şefa'etê dimînin
Ji bo te muştaq[264] û hem dilhezîn in

Tu dibîye şefî'ê ewan li mehşer
Tu yî li wê rojê dibîye mehder

Bo xatra te Xwuda rehmê d'ket carî
Gunehkar xilas d'bin hemî ji narî

Xilas bin ji meydana 'Eresatê[265]
Derbas dibin ji pira selewatê

[264] Miştaq ('E): Dilxwaz, xwazyar.
[265] Navê meydana roja mehşerê ye. Anku cihê kombûna mirovan ya mehşerê ye.

## 5. HELBESTÊN EVÎNÎ-I/ Çarîn

### AGIRÊ DILÎ GEŞ BÛ

Li min geş bû agrê dilî
Sotin û derd û birîn in
Pê bezir d'keyn fikr û 'eqlî
Qêrîn û ah û nalîn in

Ah û nalîn û hem gazî
Bêumêd hem bêmirazî
Kewtme çola pêxas tazî
Cerg û mêlak min birîn in

Birîna cerg û hinavan
Tarî kir ronahya çavan
Kewtime nav qeyd û davan
Her bi nalîn û girîn im

Min girî têtin bêwestan
Xet çêbûn li ser sûretan
Ronkêt min wek awa şetan
Wer ibretan jê bibînin

Agrê dilê min nizanin
Sed keder derd û kovan in
Daw û derman lê nihan in
Bang û girîn û 'inîn e

Bang û qêran dil kir kebab
Her dem min çu nînin tebab
Dinya li min kirne xirab
Derd û kovan û axîn in

Derd û kovan min hizar in
Ber dihelyên ber nikarin
Bi şev rojan ah û zar in
Dujmin bi me dikenînin

Keyfa dujminan me înan
Dil êxiste nav birînan
Pê naket ew hêj yeqînan
Êş û zecra l'min nabînin

Êşa dil wê daye canî
Ronkêt xwûnê co û kanî
Dost li min bûye zebanî
Can û beden şewitînin

Can û beden dane zecrê
Li min nema cihê sebrê
Bi saxî êxistme qebrê
Dost gel min bi kerb û kîn in

Kul û derdê ji ber dostan
Bihara min kirne zustan
Xistime nav qed û ristan
Daw û bendan min d'şidînin

Ah û derdêt xurbeta min
Kul û derd û hesreta min
Bergê ebdalan kir ber min
Me l'cîhanê digêrînin

Li cîhanê bûme seyyah
Digel kulan bûme hemrah[266]
Bi van halan nîn e îflah
Hindî diçît min d'helîne

Ez helandim bi xerîbî
Dax û derdêt bênesîbî
Bi ser min înan ecêbî
Min çu sefhan negehînin

Kirime rêwî li rêkan
Geh li çol û geh li sûkan
Terk kirim ez wek pepûkan
Xewn û xiyal herifînim

Xewn û xiyal min nemane
Kewtme bin barê giran e
Dinya li min kir zindan e
Çar eqlîman dizivrînin

[266] Hevrê.

Ez ji xerbê birme şerqê
Bi fêlan nekewtme ferqê
Bi nezanî kewtme xerqê
Rê û rêbazêt min nînin

Şubhet ewrî mam hewayî
Kewtime ber gura bayî
Dê ji bo bibim fidayî
Ger mizgînyek min b'gehînin

'Umr û jiyan min fena bûn
Derd û îllet min cema bûn
Digel kovan ew belav bûn
Dost û ehbab bi girîn in

Min kêm bûne dost û cîran
Wê kewtme rêza esîran
Min pirs e j'eql û xebîran
Ew gel min bi sewt û zar in

Zar û fixan min di dil da
Ratiba rêkê di mil da
Min ferqa şol û şuxul da
Ji çawan têt aw û xwûn in

Xwûna çawan bûye kanî
Kes ewan derdan nizanî
Neşêm bînme vî zimanî
Wan di dil da dicemînin

Cema d'kem kul û kederan
Dil req bûne wekî beran
Guh nahilgirin xeberan
Ronahî l'çawêt me nînin

Çaw xilas bûn ji dîtinê
Nema l'me hizra mirinê
Kewtine hesreta dinê
Her dem xiyalan dibînin

Quwwet nîn e milan rakem
Toba wê hesretê nakem

Neşêm ez wekî Ferhad kem
Çîyan ker kem bo Şirînan

Dil herikî b'iştîyaqê[267]
Sotna bi derdê afaqê[268]
Bigre tu ehd û mîsaqê[269]
Bo xerîban rê çu nînin

[267] Hewes, meyl.
[268] Aso, esman.
[269] Peyman.

**BEJNA ESMERÊ**

Min dît bejna te esmerê
Nav baxî xwe dihejînî
Were dostê wekî berê
Tu bo çi xwe dinazînî

Neke nazan li min tu yar
Ew soza te gel min qirar
Bigre tu wekî hemî car
Sotim gelo tu nabînî

Sotim te ez weku findê
Ew çi zerb in tu li min dî
Enguşteriyek[270] te min dî
Qaşa li serê nigînê[271]

Qaşnigîna wekî zêrî
Rûyê xwe ji min wergêrî
Xal û xetan diveşêrî
Ji min revî tu şirînê

Rûyê xwe li min te kir star
Çi aşiqan nîn e inkar
Ji xeyrî yarêt xerezdar
Wan ‘eyban tu wê dibînî

Ewên li xwe diken şer im
Ez weku teyrê bêper im
Bo dîtna te dilkeser im
Ma tu heqîyê nabînî

Heqî nema digel te da
Ew çi kîne dilê te da
Were tu bo navê Xwuda
Belku ji dilî derbînî

Ji dilê xwe tu derbêxe
Firsetekê ber min bêxe

[270] Enguşterî (F): Gustil, gustîrk.
[271] Nigîn (F): Gustil, gustîrk.

Ji vê cefayê derêxe
Vî halê min tu dibînî

Çi halek xweş li min nema
Rondikên çawa wek çema
Dibarînim hemî dema
Weku wî ‘ewrê baranê

Weku ew barana bihar
Derya ji ewran hate xwar
Sosin şîn kirin li nizar
Bûm kewa li çolê d’xwûnî

Bûme kewa keftî davê
Keftye ber min tu bi ravê
Çaw û buryan dihilavê
Cerg û dilan dihelînî

Cerg û mêlak l’min helandin
Dil û beden l’min kelandin
Birînêt min te êşandin
Her gav xwê lêt direşînî

Her gav birîn li min xwê kir
Tijî qelbê min atêş kir
Dilê birîn te bi êş kir
Xwe ber min ra dihejînî

Dihejî bi qameta şeng
Bi dîbayê xwe yê heftreng
Pirsek ji min bike carek
Kirme mehkûm û zindanî

Heps kirim wekî êxsîran
Êxistme qeyd û zincîran
Nîn e pirsek ji feqîran
Qed li bîra xwe naînî

Zanim laîq pirsê nîn e
Belku jibîra kirîme
Hîvî ji Rebbê rehîm e
‘Efû ket evî nezanî

**BEJNA WEKÎ SELWÊ**

Min bejnek dît wekî selwê
Dihejîtin nav baxî da
Digel min naketin xilwê[272]
Çi kem gelo kirim sewda

Kirim sewda kirim Mecnûn
Bi wan çeşmêt eswed ‘uyûn[273]
Cerg û mêlak li min kir xwûn
Tîra qewsî dilê min da

Tu li min digirî stêrê
Nîn e ewê cihê xêrê
Her gava te dest ser kêrê
Min keyber[274] key di gavê da

Ew derba te li min dayî
Ew çawêt reş te kildayî
Ew reşkezî te berdayî
Bûn ejderha bi min veda

Wan reşmaran ku ez geztim
Bi zulfa xwe te ez bestim
Xal û xetan ez êxistim
Wan turincêt[275] baxê te da

Ew çi narinc in çi xox in
Ew çi sêv in ew çi şox in
Aşiq ji dûr ve diêxin
Çi girtne di singê te da

Ku ew baxê te avdayî
Ew armîşê te dadayî
Ew çi bisk in te badayî
Li ser rûyan rewneq veda

---

[272] Hevdîtna nepenî, veşartî.
[273] Çavên reş
[274] Rimeke dirêj e, ji bo nêçîrê tê bikaranîn.
[275] Fêqîyeke ku dişibe pirteqalan û tahma wê ye tirş e.

Ew sûretê rewneq dayî
Wekî heyva li çarda yî
Qelbê tarî d’ket ronahî
Min xwe dît di rûyê te da

Ew rûmetê wey sor û zer
Ew çawêt reşbirû li ser
Bi difna ziraf xizêm l’ser
Enya sipî xunav veda

Enî geş û rûmetgul î
Birû reş û xal-filfil î
Guhar şorbûne ser milî
Dur û sedef devê te da

Dur û sedef te bijartin
Lêvêt tenik te bizavtin
Misk û ‘enber lê rêşandin
Destê nazik te xena da

Destê nazik te sor kirin
Tilyê zirav gustîl kirin
Dilê dostan birîn kirin
Bejin zirav etles[276] berda

Bejinbilind navteng zirav
Xalgerden û rûmetxunav
Lêvêt tenik sedef di nav
Şeker barand li ser me da

Ji lêvan şekir dibarî
Ew tiliyêt qaş-mirarî
Rehmê bike gel vî jarî
Ma insaf nema gel te da

Dilê xwe bi insaf bîne
Ew wesfêt te me gotîne
Zekata heqîyê nîn e
Hindî mabûn zêhna min da

[276] Parçeyekê qumaşê giranbiha ye.

Hindî wesfêt te dibêjim
Ji derdê te ker û gêj im
Nisaxek bi derd û êş im
Me xem danan ser kula da

Li min civîn derd û elem
Eda neman çok û qedem
Digel derdan bûme hemdem
Me li dinê maye veda

Bes ke Xerîb tu ji van e
Nebêje tu wan tiştan e
Ew derdekî bêderman e
Eşq bela ye serê te da

**BI HEVALÎ**

Were dildar bi hevalî
Saf î wek awa zelal î
Qelbê min nehêle xalî
Min tu d’vêy ger bî sed salî

Tu bo min bûy dost û heval
Bo te qurban kem can û mal
Ey dilbera rûmet-hîlal
Nakem terka te b’çu halî

Bi dilbendî bûm giriftan
Bûm rehîn bi dilê efkar
Sond dixwem bi hizaran car
Bûm kalekî b’heftê salî

Zehmet nede evî pîrî
Azad ke tu vî êxsîrî
Destan berde j’xeste girî
Kewtye ew bi ah û nalî

Ah û nalîn bi hizaran
Miflisê her dem û caran
Hatime rêza xwusaran
Xilas bûme j’ser û malî

Ger tu nebî min kes nîn e
Min çaw li milk û mal nîn e
Min cih li dinê çu nîn e
Dinya bo min bûye xalî

Hewes nakem milk û mala
Ger bijîm ez dused sala
Wer negehme zulf û xalan
Jiyan bo min kul û tal e

Min jîyan nevêt bêevîn
Dixwazim em pêkve bijîn
Digel yek bin ken û girî
Tu j’bo min bîye bermalî

Pêkve bijîn bi dildarî
Em rohn bikeyn şevêt tarî
Jîn û mirin ye b’reftarî
Dinya axret bi hevalî

Dinya xweş e b’hevalbendî
Rast û durist û bêfendî
Xerîb kewtîye bin derdî
Hawar gazî wek ‘evdalî

**CAREK NEZER DA**

Were seyrana van erda
Tê dilê min êxist der da
Carek bi min te nezer da
Eql û fikir min heder da

Ji fikr û bîran revandim
Êş û jan li min civandin
Kul û derdan em helandin
Kewtme ber talan û cerdan

Evîn li min bû derd û xem
Her demê bi şîn û matem
Helyam puxte û şewatan
Nema li ser soz û we'da

Te d'geryêm nihal û dolan
Dest û berû deşt û çolan
Kirme masya li nav golan
Çend bendê mam ne xeber da

Xeber neda gel min carek
Dil da hel kir ewê narek
'Eyd li min nekir mubarek
Ne sersal û qurbanê da

Mam li tora çawxezalê
Min çaw gêran wê şepalê
Çaw bi kil û rû bi xalê
Rewşa ber dilê lewenda

Min ew dît 'eyda sersalê
Bûm aşiqê rûhilalê
Wê şirîn rind û şepalê
Min dest ruh û canî berda

Ewêt dil bi eşqê sotî
Wê rê da beden firotî
Natirsît ji melkemotî
Wî ser danaye ber derda

Seyran hat û yê kemilî
Bi çend rengan yê xemilî
Were gula evî dilî
Dest bikêş ji fêl û fenda

Çend delal rind û şirîn e
Were demek cem min rûne
Da çawê dil tê bibîne
Ca neket gil û gazinda

Tu evîna dilê min î
Hemî şewan xewna min î
Nizanim perî yan cin î
Rûyê eşqê nîşa min da

Eşqa te ye daye dilî
Bejinselwa çaw bi kil î
Xwe dûr neke tu bi sil î
Hêba neke se' û keda

Te qonax dilê min dana
Şev û rojan nav kovana
'Ezîza rind û ciwana
Min 'umir da rêya te da

Min 'umir wê rê da borî
Ruh û beden kirne gorî
Hêşta tu li min d'key zorî
Li min birand deng û seda

Deng û awazê min birya
Kewtime ji dest û pîya
Min nema cihê hîvîya
Min cih nema li çu erda

Erdê Xwuda min teng bûye
Rehberek min kes çu nîye
Ya Reb teybîra min çî ye
Min heye ev di qeder da

Mayme li hîvya qederê
Min xêr nedît li çu derê

Hêmî erdan dam kederê
Bênesîb im di ezel da

Bênesîb im tali’ û bext
Min nemane çu hal û wext
Her deman dil bûye mişext
Xerîb were rêya Xwuda

**CEWHERA ELMASAN**

Cewhera berq û elmesan
Dîlbera dildar û xasan
Xemilî berg û libasan
Cîsm û can li min helandin

Cism û nûr çeşmê sîyah e
Dîlbera rûqend û mah e
Laîqa dîdara şah e
Dil û mêlak min kelandin

Bo min bela bêmecal e
Ah û rûyê çawxezal e
Muhbeta dilan li bale
Eql û fikrêt min revandin

Eql û zehn li min kir talan
Çehra ebrû û hîlalan
Nazik û gerdenşepalan
Fikr û xiyal wê herifandin

Fikr û xiyal wê nehêlan
Selwîbala nava êlan
Kirme êxsîr nava rêlan[277]
Derd û kul li min ciwandin

Derd û kulêt wan şepalan
Dîtina wan zulf û xalan
Suhbeta sahib-kemalan
Ruh û beden jêk qetandin

Beden bûye cihê kulan
Nema biket seyra kulan
Mislê şalûl û bilbilan
Gul û bilbil jêk revandin

Şalûl bilbil kewtne şînê
Her ji ber kula evînê
Derdê horî-nazenînê
Xunce-gulan belg werandin

[277] Dehl.

Xunceya gula şirîn e
Em kirin mecnûn û dîn e
Taze vebû l'min birîn e
Cerg û dil wê şewitandin

Sotin em bi şu'beya[278] wê
Bûm êxsîrê dîtina wê
Nîn e murwet û şewqa wê
Weselêt min wê xilandin

Wê sebr bo min nehêlaye
Eşqê kirme mubtela ye
Huba xwe l'min kir xela ye
Şewq û hub wê l'min birandin

Şewq û hub l'min yaxme kirin
Êxsîr û mubtela kirin
Ji hubba xwe mehrum kirin
Hizr û bîr li min şelandin

Mehrûm bûm ji hizr û bîran
Kirme bendê nav zincîran
Înam rêza wan êxsîran
Heps û zîndanan hêlandim

Bi neheqî kirme hepsê
Dil bûye mecruhê qewsê[279]
Nemaye çu cihê keysê
Teyrê dilî l'min firandin

Huba dil kire hebayî
Şewqa işqê daye bayî
Bûme kole l'bendê mayî
Qebr û gor bo min kolandin

Bi saxî êxistme qebrê
Nîn e hisaba wê cebrê
Kî ye li vê biket sebrê
Ez ji dîdarê revandim

---

278 Şu'be: Rewneqa rûyê wê.
279 Birîndarê birûyan.

Mubtela me bo dîdarê
Çaw nihêrim ber hisarê
Carek bibînim kubarê
Şev û rojan em lêbandin

Her gavê îname lêbê
Bêbextê wê bêkitabê
Bo Xerîbî nadet hisabê
Kesp û karêt min birandin

Se' û kar wê nehêlane
Çaw wê li hîvya te mane
Benda xufrana Xwuda ne
Tux[280] û ala wê çeqandin

Tux û ala te vedane
Meclis û eywan û xane
Şêx û 'alim bendê mane
Li eywana xwe ciwandin

Te l'eywanê kirne bendî
Te ew girtin bi kemendê
Bo rehayê[281] mane l'bendê
Te l'qesr eywanê xirandin

Xemlandin te b'naz û nîmet
Nîn e carek lutf û rehmet
Êxsîran nedaye zehmet
Mirwet û insaf birandin

Wer carek be xwudan-mirwet
Nedaye ber me tu zehmet
Em bûyn bendîl nava xurbet
Di zulmetê fetisandin

Mayne di nava zulmetê
Bûyn payîbendê wesletê
Mehrum kirin te j'suhbetê
Em di 'erzê sekinandin

[280] Tux: Tîx an jî mizraq. Aleteke şerî ye.
[281] Xilasbûn, rizgarbûn.

Sekînîn û bêrê mayne
Zindana xurbetê dayne
Bêumêd meqsed û ray ne
Dûrî destî qehirandin

Qehir bûn ber pêl û mewcan
Dost xuya nabît ji burcan
Perîya rindan û gurcan[282]
Soz û we’dêt xwe birandin

Soz û we’de nehêlane
Nadete min çu eman e
Her gav bi ‘emr û ferman e
Şar û gundan em gêrandin

Xerîb çû wextê geryanê
Pîrê kewtye nava xanê
Muhbeta dil daye canê
Ber ji heqî zivirandin

[282] Xelkê gurcî, welatê Gurcistanê.

**ÇÛME GUNDEKÊ**

Çûme gundek bi mêhvanî
Bi keyf û xweş û seyranî
Min çêbû xweşya giyanî
Rihet bûm ez ji êşanî

Ez ji êşan bûme xalî
Min zeryek dît li ber malê
Wê xemilî wek alalê
Dimeşît bi kesrewanê

Wê rîşî berdane xwarê
Bejinbilind wek spîndarê
Baş binêrim ez vê carê
Ji dil derînim kovanê

Min kovan e te bibînim
Tu dizanî dilbirin im
Aşiq im ez cegerxwûn im
Were nik min tu ciwanê

Were nik min tu bi carek
Li te bikem ez silavek
Ji destê te vexwem awek
Bo min bibî şifa canî

Şifa bigrim ji destê te
Têr binêrim ez rûyê te
Carekê bême serê te
Dê bim kolê derê xanî

Dê bim kole bibim geda
Carek rûnim di gel te da
Têr bifikrim wan rûmeta
Ewan xalêt li gerdenê

Rûyê te yê bi xal û xet
Ew rûmetê rewneq didet
Enya sipî şefeq didet
Birû reş in wek kovanê

Birû reş û çawêt bi kil
Veşartne ji min bûye sil
Ew wê li min bû derd û kul
Xilas bûye ji îmanê

Ji îmanê ji insafê
Neşêm jê bikem ewsafê
Bît ke‘be biçim tewafê
Digel ‘eyda wê qurbanê

Tewaf bikem bi çend şevta
Dubare kem hemî hefta
Ewê nîn e bo min xeta
Da nebêt dostê min kanê

Li dostînîyê bin xwudan
Nekî bi keyfa her deman
Xerîb tu nekeve xeman
Ev e qanûna cîhanê

**DERDÊ GIRAN**

Min zêde bûn derdên giran
Neşêm ewan bikêşînim
Derman nema li çu erdan
Hekîman ez ji ku bînim

Hekîm nînin bo evînê
Were carek bi kenînê
Li ser textê dilî rûnê
Da ez rûyê te bibînim

Bibînim rûyê wek gula
Bisk berdane li ser mila
Bo min bûy xîyala dila
Da ez xeman birevînim

Dilê min gelek bi xem e
Hûnik nabîtin çu dem e
Yar xeyidî rû nadet me
Dibêjit te nahebînim

Were nik min dilê temîz
Sing-'ebyeda[283] esl û 'ezîz
Bi kêr naêt min bûye zîz[284]
Digel te bêkerb û kîn im

Kerb û kînan ji xwe pavê
Carek weku têy ser avê
Ji dûr tu bikey silavê
Dê bawiryê bi te bînim

Ya herî baş bawirî ye
Guh nede gotnêt xelkê ye
Şola xelkê fesadî ye
Bawiryê bi wan naînim

Bawirî b'eşqê rastî ye
Eşqa heqîqî sûc nîye

[283] 'Ebyed ('E): Sipî.
[284] Silbûn.

Ew têt ji nava dilî ye
Çu dil dîtir nacivînim

Xerîb bi eşqê şa nebû
Hewes dilî da kêm nebû
Daxwaz dinê qebûl nebû
Li hîvya axretê d’mînim

**DILÊ BIRÎN**

Kul û kovan min di dil da
Dilbirîn im ez bi derda
Min nevêt mineta ‘ebda
Gelek mayme ez di xew da

Mayme di xewn û xiyalan
Kewtime benda şepalan
Ez kirim mehkumê xalan
Insaf nîn e digel wan da

Insaf û murwet birandin
Daw û qeyd li min şidandin
Wê bi eşqê em mirandin
Ez hêlame vê derê da

Rê da mayme b’cefakarî
Wê dilê min kirye tarî
Her demêt min şîn û zarî
Tîra evîn dilê min da

Bi evînê kirme êxsîr
Girêdayme b’qeyda zincîr
Çu car neînayîme bîr
Kirme ‘evdal vê xanê da

Kirme ‘evdal bi evînê
Cerg û mêlak dihelînî
Min nemaye cihê jînê
Felek xayîn digel me da

Felek li me ters zivirî
Dil disojît bi agirî
Wê lê bûye pêt û gurî
Hêlandim wê ez bi derda

Dil û mêlak dihelînî
Min l’gund bajaran d’gêrînî
Nîn e carek bêt mizgînî
Ber çawêt min bûye winda

Xwezya carek dîtba l'vê derê
Daba min xeberek xêrê
Balan dil ker kirba kêrê
Bûm qurban di rêya wê da

Eger carekê bibînim
Demekê di gel da rûnim
Dest gerdena zer werînim
Pîroz keyn sersal û 'eydan

'Eyd û ciwatan peyda bît
Li ber çawêt min xuya bît
Dilê min dê gelek şa bît
Bilan bimrim wê gavê da

Mirna heq li min peyda bît
Zecra[285] giran ser min rabît
Beden ji derdan reha bît
Xilas bim di vê qeydê da

Bilan Ezraîl kerem ket
Dem û 'umr li min xilas ket
Min ji vê qeydê xilas ket
Bilan nemînim dinê da

Dinya bo min gelek teng e
Nema eql û şekl û reng e
Beden helyêt nîn e seng e
Bûm teyrê di qefesê da

Dinya l'min kir cihê zecrê
Min nema çu cihê sebrê
Dê ji kerb biçime qebrê
Nemînim di benda wê da

Xerîb im bi ah û hisret
Sotîye bi derdê xurbet
Jîyar li min bûye zehmet
Bo mirnê mam di bendê da

[285] Zecr ('E): Jan, êş, derd.

**DILSOTIN**

Dil disojît bi agirî
Nîn e sebr û tebata min
Birîna dil necebîrî
Êşan wê daye qelbê min

Ji tîran dil birîndar e
Agir tê da hûnik nabît
Mîna kiska li ser sêlê
Dihelyêtin ev dilê min

Disojim ez bi wî halî
Suwal nîn e ji halê min
Xwuda çi b’kem ji birînan
Bûye keser nav dilê min

Kesera min gelek kûr e
Eş û zecrê det bedenê
Nîn e hekîmek jê b’zanît
Hizar xîyal têt dilê min

Xewn û xîyal biban rastî
Dil tena ba ji ber êşan
Mirad hatiban husûlê
Cih hatiban xîyalêt min

Dil kevte derdê hicranê
Şew û rojan şîn û zarî
Îlac ji bo peyda nabît
Zecrê da maye dilê min

Davka yarê da mam girtî
Xuya nabîtin carekê
Hesretkêş im hemî deman
Xeber nîn e bi halê min

Nobedar im dil şewitî
Intizar im şew û rojan
Her dem hîvyê me ku bêtin
Silavekê bidete min

Şubhet teryê perweryayî
Mayme bêçare û xerîp
Ne d'şêm firim ne rê biçim
Qeyd û bendan tavête min

Mayme di nav qeyda yarê
Kewte dil da jan û birûsk
Kewtime çembera dostê
Carek xweş naket dilê min

Siharan dengê bilbilî
Guhdarî kir bi dil û can
Demekê dil pê xweş bibît
Bibiryên ah û nalêt min

Felek xaîn ez dûr kirim
Mehrûm bûm ji dîtna yarê
Gelo kanê heta kengî
Yar dê bête serdana min

Kengî dîsan bibînim ez
Tali' û bext min zivirît
Nêzîk da bibînim dîsa
Belku xweş ket ew dilê min

Li bîr înabam carekê
Bi şeklê xwe bedr û hilal
Hembêz biban em digel hev
Biba sersal û 'eyda min

Di rojêt 'eyd û sersalan
Wê şeng û şox û şepalê
Di roja 'eyd û hacîyan
Bilan kurban ket canê min

Hatiba subh û siharê
Weku stêra şefeq geş ba
Şewqa wê daba cîhanê
Ron kirba tarya dilê min

Tarî neba li çu erdan
Ne li dinê ne li dilî

Keyfxweşî ba ku her demê
Carek şah biba dilê min

Pê geş biban gul û gulşen
Ser çîmenên xunavgirtî
Sosin û alalan pêk ve
Silav dabane dosta min

Binevş û nergiz û lale
Pê xemla xwe zor ye ciwan
Şerminde ne li pêş yarê
Wekî ew d'bînin cana min

Dîtiban ew ebrû-hilal
Bes bûn 'umir li dinyayê
Bilan Ezraîl hazir ba
Der-gav kêşaba ruha min

Gava têt bi zulf û xalan
Mîna hilala çardeyî
Birandî rewneqa kewkeb
Gel wê keyfxweşî tête min

Bi çendan ku ez keyfxweş bûm
Dilxweşî hate Xerîbî
Demek xem ji bîrê çûne
Zehn û hiş têne serê min

**DI NAV AGIRÊ DIL DA**

Nav agirê dil da me ez
Disujim şuphê perwanê
Bi sozan û qeyd û bendan
Were carek bi peymanê

Bi dîtna çawan wek findê
Dihelyêm ez şew û rojan
Di wesla te nezerdar bim
Paydar bim li vê cîhanê

Nezerdar bim bi çeşmê dil
Bibînim pêşber muqabil
Cema bin fikr û hizrêt min
Bibînît sîne dermanê

Fikr û bîr li min bûn telef
Nîn e carek bêtin bi xef
Cerg û mêlak kirne hedef
Tîr daye mala kivanê

Bi şuph û seyd û nêçîrê
Dibînim xencer û tîrê
Ji destê dîlbera nûrê
Wekî yexma û talanê

Bi yexma têtê ganê min
Bi talan têtе malê min
Ew e qest e bo canê min
Ruh fida ye li meydanê

Ruh û dil wê kirne talan
Kirme êxsîr wek ‘evdalan
Dûr kirim dost û hevalan
Xerîb seferî li cîhanê

**DINYA PÛÇ**

Were bezre neke sebrê
Sebir bo me xweş heval e
Da em pêk ve bibin hevrê
Dinya pûç e ye betal e

Derdêd giran peyda neke
Bêhna xwe li me teng neke
Gotinêt min tu red neke
Were da bibin heval e

Bibin hevkar digel yek da
Me sozek gel hevûdu da
Çu car em jêk nabin cuda
Eşqa me bigrît kemal e

Kemala eşqê ye saf e
Li ber aşiq ew keşaf e
Nîn e lazim bi seraf e
Dilê aşiq wek şemal e

Ger xwazî b'gehye meqsedê
Gel sebrê bike mihnetê[286]
Nebe ji ehlê xefletê
Te ez kirme pîr û kal e

Digel sebrê bibe hevrê
Li dostê xwe neke qehrê
Bi dostî ra here l'ser rê
Me borandin gelek sal e

Xwudan-sebir ehlê xêr e
Dilfireh û bi tedbîr e
Sebirkirnê dil yî têr e
Sebir 'emrê Zul-Celal e

Bi sebrê insan d'bît hişyar
Xwuda yek e derge hizar
Xwudan-sebir nabît neçar
Pîr û genc û hem ruwal e

[286] Mihnet ('E): Cefa.

Eşq pîr û gencyê nizanî
Te agir berda vî canî
Ji bona min tu derman î
Were nik min xemla al e

Min daxwaz e dîtna gulê
Deng û xwendina bilbilê
Pê derman ken derdê dilî
Te 'eqsa pîran li bal e

Dil ceger li min nehêlan
Kirme êxsîrê nav êlan
Gel me kewtine nav fêlan
Te ez kirme gêj û lal e

Te gêj û lal û şêt kirim
Te ji eql û fikr dûr kirim
Bi hesreta te kal kirim
Bi evîna çawxezalê

Her çaw û bejn û bala
Rûmetan û xeml û xala
Carekê were ber mala
Bûm êxsîrekê bêhal e

Min çaw maye li rêya te
Kengî bêtin teşrîfa te
Xuya bibît cemala te
Bo min bibîte wusal e

Her demê ez bi xiyal im
Çawnêrê yara delal im
Bêkes û hem bêheval im
Min nîn e wext û mecal e

Wext û halêt min xirab bûn
Dav û derman peyda nebûn
Dost û ehbab jî winda bûn
Çaw nihêrim derê malê

Rojek were bi xêra xwe
Da bibînim dildara xwe

Nemînim ez b’xiyala xwe
Nîn e min hikmet li bal e

Hikmet û sir min çu nînin
Aql hiş serê min namînin
Ne bi aqil in ne dîn in
Be’ û bazar min betal e

Xerîb im bêhal û hikmet
Şev û rojan kewtme xîret
Nemane min hal û sihhet
Bûme reben wek ‘evdal e

**DÎTINA TE BO MIN HEYAT E**

Dîtna te bo min heyat e
Xwezya min dîtbay wê derê
Keyf û jîn û hem sebat e
Nezara wê reng-esmerê

Nezera wan xal û rûyan
Muhbeta wan goftûgoyan
Dest dana bisk û kezîyan
Şirîntir e j’qend nebatê

Şekir û qend û nebat e
Dîtinek bo min heyat e
Bûm fidayê gerdana te
Dest pavême ser kemerê

Kemer pişta xwe şidandî
Xwe bi zêran xemilandî
Enya b’xunav yê deqandî
Nav lêvan sedef mirarî[287]

Dur û sedef di diyar in
Rista zêran ser hizar in
Min dît çend bi kar û bar in
Reng girtîye wê j’qemerê

Bejinbilind rûqemer e
Reşrihan e zêrkemer e
Dilhelin û xweşesmer e
Mislê wê nînim çu derê

Mislê wê nînin çu dîlber
Rû rewneq û bêhna enber
Meleksifat bû ew beşer
Nînin wekî wê serwerê

Lêv şekir çendî şirîn î
Rû wek şana hingivîn î
Min tam kirê bi lerxînî
Xweştir e j’awa kewserê

[287] Ev herdu me’denek in û kînayet in bo didanên spî.

Kewsera cemet min tam kir
Ke’be bû min ew tewaf kir
‘Erefê weqfê temam kir
Mînayê[288] can qurban kirê

Qurbana şewq û şemalê
Sing wek hinara Şengalê
Bi hurmeta rû û xalan
Were ser soza xwey berê

Te soz dabû b’dev û lêvan
Sûnd xwaribû xox û sêvan
Her dem dê te b’keme mêvan
Nademe te çu keserê

Kesera dil gelek kûr e
Evîna dil bo min dûr e
Min di işqê wext qusûr e
Kewtime nav naêm derê

Te dil bi evînê şa kir
Rûyê xwe te l’min xuya kir
Te b’eşqê sotim wek agir
Nîn e kes biket mehderê[289]

Mislê rojê l’min xuya bû
Rewneqa wê l’dilî dabû
Sebr û sikûn min nemabû
Eşqê êxistme çemberê

Eşqê dilê min kelandî
Cerg û hinav min qelandî
Evîna xwe dil da çandî
Dil wergerande seqerê

Dilseqer im ber evînê
Bûm nexweşê l’nav nivînê
Li min nema xweşya jînê
Kirme êxsîr li ber derê

[288] Mîna: Li hecyê cihê serjêkirina qurbana ye.
[289] Şefe’t, berevanî.

Êxsîrek im derê xanî
Min nema siheta canî
Te ez kuştim kes nizanî
Te dil ker kir bi xencerê

Dilê Xerîb kêrê ker kir
Dil helandî xwe veder kir
Nezardarî te lê terk kir
Êşa dilî da cigerê

Cergê Xerîbî yê kul e
Tu j'Xerîbî bûyî sil e
Te ew hêlay di xecîl e
Nîn e cihê çu xeberê

Xeberê xêrê tu bêje
Kula Xerîb pir ji mêj e
Xwûna dilî lê nerêje
Ji heqîyê neke derê

## DÎTINA ZERÎYÊ

Dîtina zeryê heyat e
Nedîtin derd û şewat e
Bendê mam çû û nehat e
Min neman zikr û selat e

Bang û selat min li der dan
Fikr û eqil ji dest berdan
Xwuda nedete çu ferdan
Ez wê kirme şêt û şeyda

Derd û xem ser min dibarin
Bêşol ‘emel kesp û kar in
Bêdad îmdad û hawar in
Me ji çawan xwûn dibarin

Xwûna dilî co û kanî
Dad û feryad çûn esmanî
Carek yar bêt bi nihanî
Dê bo fida kem wî canî

Can û beden nema sihhet
Dest û piyan nema quwet
Di nav da mayme bûm îbret
Min xilas nebûn ew hisret

Dad û gazî çûn ‘esmanan
Ji ber êş û xem û janan
Dil cihê kul û kovanan
Bûyme dînê çolistanan

Kewtme derdê çawbelekê
Nadete min firsatekê
Dinya min ronh ket carekê
Da bêm rêza insanekê

Min zor kêşan derd û cefa
Min li dinê nedît wefa
Wek xerîb dûr mam ji refa
Kewtme ber êşan û gefa

Kes gel min naket wefayê
Kewtme nav êş û cefayê
Min nedît cihek sefayê
Bo min bûye cihê tayê

Xerîb im yê jar û feqîr
Kes min nedît bît destegir
Xwe hişyar ke bigre tedbîr
Mirna xwe nebe tu jibîr

**EVÎNA BÊDIL**

Were dilo tu bo çiy sil
Çend xirab e eşqa bêdil
Dem borandin me bêşixul
‘Umr xilas bû bi derd û kul

Dilê min e cihê derdan
Min xêr nedît li çu erdan
Te ez kirme gêj û sewda
Li min naxebitîn dest mil

Eşq û evîn bêdil nabît
Aşiq maşûq bayek nabît
Derd û birîn lê xweş nabît
Bo me neman fikr û eqil

Min bi evînê nikarî
Rojêt rohn li min bûn tarî
Min derbaz kir ‘umr bi jarî
Li me borîn wext û fesil[290]

Me wext çû bi êş û derdan
Bûy êxsîrê destêt rindan
Neqşê xwe ser singê min dan
Bi awaz têm mislê bilbil

Min heyat çu li ber sîyê
Bêfeyde wek dara bîyê
Min feryad e dest zerîyê
Ber min neman bergav û dil

Serweta min jîna eşq e
Dara min belg hebûn hişk e
Min terk kirin bira xwîşk e
Qest û mirad nebûn hasil

Min mirad evîndarî bû
Ew l’ber çawêt min tarî bû
Eşq û vîyan nenasîbû
Di nav da mam siqet û şil

[290] Demsal.

Deryê dilê min nevekir
Dilê min b'evînê ker kir
Te ronkêt ji çawan der kir
Dilê min te kirye tebdil[291]

Birîn kir te dil bi kêrê
Kirme reben l'derê dêrê
Bo min nema cihê xêrê
Xerîb ma bêşol û şuxul

[291] Guhartin, guhastin.

**EVÎNA BI HÎLE**

Were dilber wehe nabe
Evîn bi hîlan çênabe
Derdêt dilê min pir zor in
Wek agirî hûnik nabe

Min b'evînê 'umir borî
Eşqa dilî diket zorî
Bo min nîn e çu destûrî
Bo çi d'gel min ye xirab î

Min ji dilî birîn neke
İşqa dilî bi sir neke
Şev û rojan bo te d'nalim
Bilan dil bi eşqê şa bî

Dîlber dibêt ez ciwan im
Ne laîqê çu kulan im
Heyfa min û ciwaniyê
Xiyala dil xirab bibî

Xweş e evîn bi ciwanî
Ne borîtin ew j'zemanî
Pîr û kalî hat ser te da
Bi min ev evîn çênabî

Dilê b'evîn tu nizanî
Te ne bihîst Şêx Sen'anî
Heştê sal yê bûye aşiq
Dilê b'birîn îlaç nabî

Dinyayê min neke tarî
Gel evînê b'ke hevkarî
Hemî wextan ez bi xem im
Dil disojît wek kebabî

Barê giran ser milêt min
Hûnik nabît qet dilê min
Were ji min nebe cuda
Belku te jî dil tê hebî

Tu j’min vebe min dil nîn e
Eşqa min d’gel te çu nîn e
Te ‘umr borand bi sefîlî
Nemaye gel te şebabî[292]

Xerîb nêçîr e davê da
Nêçîrvanî ew girêda
Maye l’bendê ku derkevît
Ji seyyadî xilas nabî

[292] Ciwanî, gencî.

**EY BILBIL**

Ey bilbilê bostanê xemdar
Ey aşiqê dil zor birîndar
Her dema te bi fîxan û zar
Carek nalîyan nabirînî

Te dil kovan e ji ber firqet
Yan ah û kovan kirne sin'et
Tu bêumêd mayî ji weslet
Gav û deman bi ah û şîn î

Yan dil sotî yî şubhetê min
An derdgiran î tu mislê min
Were be hevkarê derdê min
Yan hevkarya min razî nînî

Belku te dert ji yê min ferq e
Min dil di xeman da yê xerq e
Tîra dilê min mislê berq e
Belkî qasê min dilhezîn î

Min êş heye ji dil û canî
Neşêm bêjim ez bi ezmanî
Min îmdad e ji bo sultanî
Nakeme îfşa bi yeqînî

Îfşa nakem ez sir û halan
Nabêjime dost û hevalan
Dihelîyêm bi hemî halan
Bi evî derdî nakem jînê

Tena nabît ew dil çu caran
Her dem sojît bi nûr û naran
Mîna li sêla li ser daran
Dil û mêlakan dihelînî

Mêlak helîya dil şewitî
Mêjî li serî naxebitî
Eşqa di dil da natebitî
Keyf û halan tu qet nabînî

Di xema dilî ez xerîq im
Bêîlac û hem bêrefîq im
Her dem bi agirî herîq im
Dilê bûye behra evînê

Dil behreke bi mewc û coş e
Yê dikelîtin bêserpoş e
Ji ber nemane eql û hoş e
Her demê bi ah û enîn î

Min axîn diên ji neçarî
Nîn e dermanê evî jarî
Rojêt rohnî lê bûne tarî
Çu ronahîyan tu nabînî

Ronahî nema dil û çawa
Bû kewtîyê bendan û dawa
Roj dereng e lê bûye ava
Ne mayne ji bo keyf û kenî

Me kenî nema bûye girî
Bi batin sûjim bi agirî
Kes nizanîtin bi zahirî
Nîn e kesek bo hemnuşînî

Hemnuşînek nebûye dîhar
Ji sibê û heta ku êvar
Digeryêm ez li çol û dîyar
Li min nemaye zîndegînî

Jar û zeîf û bêmecal im
Belkî bê seda soz hem qal im
Kewtime nav dewrekê zalim
Beden çû belku dîn bimînî

Dinya ji bo min bûye zîndan
Dîn zeîf ‘ecêp maye îman
Hemî tev sefîl û perîşan
Bo çi li ser dînî namînî

Me di eşqê da nedît miraz
Me di dînî da nekir nîyaz

Mayne bêsoz û qewl û awaz
Me bi xêrê nîn e mizgînî

Me ji xîyalan dil nekir pak
Gel bilbilê xwe bûne xemnak
Xerîb te ah tejî kir eflak
'Ecêp aqil î yan yê dîn î

**EY FIRAQ!**

Te dil ji min bir ey firaq[293]
Wê li cergê min kir eser
Gav û deman bi îştiyaq
Dil wê li min kirye seqer

Neman eql û zêhn dil hezîn
Her dem bi feryad û girîn
Sed ah û fixan û enîn[294]
Dewran li min tên ger bi ger

Geryam ji ‘eczê û xeman
Bêseyr û soz û her deman
Dîdara zulf û perçeman
Wê dîlbera nazikbeşer

Beşer misal reng afitab[295]
Sotim te ez kirme kebab
İhsan kirba te yek şerab
Hûnik biban dil û ciger

Dused nalîn û ah û zar
Yê tên ji cergê birîndar
Şev û rojan naêt qerar
Bêçare îmdad û mefer

Bi gazî ah û feryad im
Bêmefer derman û dad im
Bêhal û wext û murad im
Min zêde bûn derd û keder

Çend derd û keder min hene
Seet bi seet zêde ne
Ew hesreta rûyê te ne
Rûşenrûya şûphê qemer

Rûbeşera qemer-sifat
Te l’min înan derd û îllet

---

[293] Di dildarîyê de jêkdûrbûn.
[294] Nalîn.
[295] Roj.

Ah û fîxan bûyne sin’et
Se’ û xebat bûne heder

Se’ û xebatan kar nekir
Ji hicra te me tab nekir
Zêhn û fikir te yaxma kir
Dil û mêlak kirne hecer[296]

Dil û mêlak te l’min sotin
Ji min naêt qewl û gotin
İşq û muhbet te firotin
Li min bûn kovan û keser

Kewtme nav keser û xema
Aramî nedît çu dema
Kul û keder min bûn cema
Bo min bûye hal û qeder

Qeder bo min çep zivîrî
Me j’çawan kêm nabît girî
Dil bû pêtek ji agirî
Ji giryanê kor bûn beser[297]

Kor bûn beser rohnî nema
Nema l’min keyfa her dema
Dost her gavê b’reqs û sema
Carek li min naket nezer

Nîn e d’gel min biket wisal[298]
Ew delala gerdenxezal
Da işq û muhbet bûn kemal
Ji burc û pacan bête der

Ew li min perde-hicab e
Cewra gel min bêhisab e
Bêsoz û qewl û xitab e
Çaw nihêrin bi her siher

[296] Peyveke erebî ye. Tê wateya “kevir, ber”.
[297] Çav. (E).
[298] Gehiştina hev.

Siharan wextê sibê da
Bilbilê fecirê lêda
Dîlbera min yê d'xewê da
Xwezya min selam daba ser

Min selam daba sibê da
Yar min dîtba di xewê da
Destgerden bam di xilwê da
Bo min nedbûn sûc û xeter

İşq û muhbet sûc çu nîn e
Evînî b'êş û birîn e
Nalîn û ah û hezîn e
Dilşewat e û dax li ser

Sed dax ser qelbê birîndar
Yek demê l'min biba îzhar[299]
Wê jiyan li min kir xwusar
Dîn bûm wê ez kirme ebter

Ebter kirim ez kirme wehş
Bi derdê dil kirme nexweş
Sotim ji bo wan çawêt reş
Dinya l'min kir zîr û zeber[300]

Dinya xirab kir wê li min
Qîyamet rakir bêyî min
Hindî heyî insan û cin
Li hemyan kir xewf û xeter

Wextê qîyamet sa'etê
Nûra hebîbê rehmetê
Dê bît şefî' ummetê
Her ew e qewlê mu'teber

Mu'teber bêjin kelaman
Şerbeta derdestê xaman
Nagehînte çu encaman
Ew dê bimînît bêeser

---

[299] Ispat.
[300] Zîr û zeber: Serûbin.

Esera qelbê Xerîb î
Maye d’gel yara hebîbî
Ji Xwuda b’xwaze nesîbî
Ew bû kelamê muqteser[301]

[301] Kurtgotin.

**GULA BAXÊ ÎREM**

Gulek min dît li gulistanê
Cih girtîye li nav bostanê
Wê birandî bêhna rihanê
Ew bûye gula baxê îrem

Bilbil ji bêhna wê serxweş in
Gul çirmisîn ji wê rûreş in
Em bi ditina wê dilxweş in
Digel keyfa me bûye hemdem

Dîtin û bêhna wê çend xweş e
Digel eşqa dilan dimeşe
Bi rengê xwe wek moma geş e
Li me birandin keder û xem

Gulek e ji baxê ‘izetê
Bo dîtinê kewtme hisretê
Carek bibînim ez firsetê
Namînin li min derd û elem

Nînin çu gul mislê gula min
Gul hesret e ji bo dilê min
Agir êxiste nav cergê min
Wê nehêlane pê û qedem

Bêhna te gelek li min xweş tê
Dixwazim gel da bikem geştê
Wek gera li dor berê reş tê
Se’î û tewaf û hem kerem

Seyr û tewafêd digel gulê
Deng û hevkarîya bilbilê
Ew cih û mekanê ewelê
Digel eşqê diketin hemdem

Min gul heye ji baxê welat
Bayê seba li ser wê helat
Ew bo min bûye kar û xelat
Li wextê der-xeman û herdem

Tu gulekê ji Rojhelat î
Kovandar î ji bo welatî
Li ser çawêt Xerîb tu hatî
Ji hicranê mayîne matem

**LI SER DERDÊ EŞQÊ**

Ez bûm aşiqê bejna te
Ey dîlbera rast û durist
Tîra bi jehr ser destê te
Li cergê min da ruh derxist

Ew ruha di min da mayî
Sebebê lutfa Xwudayî
Yek car nezer te berdayî
Kir ebter ji rê derxistî

Ebter kirim zor şuphê min
Nedît jînî nedît mirin
Ne ta‘et û zikirkirin
Ji rêya heqêyê derxist

Ji rêya heqyê dûr kirim
Reng ebleh û feqîr kirim
Ji dost û biran dûr kirim
Eqil ji serê min derxist

Eqil nema ber belayê
Dîn bû Mecnûn bo Leylayê
Wekî Tahir bo Zehrayê
Ferhad bo Şirîn ruh derxist

Ferhad yara xwe bezre kir
Ewî qesta canê xwe kir
Kerem bo ‘Esliyê çi kir
Ruha xwe bi sotin derxist

Bi narê sot û bû xwelî
Binêre Yûnisê welî
Ji eşqa Xwuda bû delî
Ser bi çol û çiyan êxist

Bera xwe da çol û çîya
Memê Alan Zîn divîya
Qeyd û zincîr kirne pîya
Bo zindanê ew verêxist

Birin havêtine çalê
Heta hepis geha salê
Zînê qest kir bo wîsalê
Cesed bêruh bû derêxist

Bo mezaran cesed birin
Neditirsyan ku dê mirin
Xwe bi eşqê feda kirin
Ewan dinya paş xwe êxist

Ewan kir terka dinyayê
Bûn seferî ba ‘uqbayê
Keremek bû Xwuda dayê
Ewan axret pêş xwe êxist

Dinya terk kir wan bi merdî
Melek bo wan bûn da’wetî
Belku tu jî bi eql kewtî
Xirabî te paş xwe êxist

**MAM LI HÎVÎYA BIHARÊ**

Evîndar im ez yarê
Terkê nakem çu carê
Mam li hîvya biharê
Sûnd dixwem hemî carê

Her dem çaverê te me
Şev û roj benda te me
Nehatî dil bi xwe me
Carek bêye vê derê

Mayme wekî pepûkan
Digrîm wekî biçûkan
Kewtme kolan û sûkan
Mayme li nav keserê

Dinalim ez bi jarî
Etîm im ber duwarî
Dilê min kirye tarî
Kes nahêtin hewarê

Kewtime derdê dinê
Sebra min nahêt tinê
Mayme hîvya mirinê
Xwuda tu b'key taqdîrê

Sîtemkar im ji te ra
Te insaf nema pê ra
Nînin xwudanêt xêran
Carek jê b'kem pisyarê

Bêçare me bendewar
Min neman sebr û qirar
Biryan li min kesp û kar
Xwuda yê may qirarê

Wê 'umrê min heba kir
Dilê min kirye agir
Wê eşqa dil xirap kir
Existim nav xusarê

Bi ax û derdan kuştim
Hêlam di cih da hiştim
Rûs û pexas bêtişt im
Dûr ve sotim bo yarê

Dûr ve hêlam bêmewa
Dilbirin tîra çawa
Min xiyal bû wan zewa
Nema ser soza berê

Ne roj dîhar ne bi şew
Min heram kir xwarn û xew
Sotim gûrî û elew
Me cih nema vê derê

Cihê Xerîb nemaye
Di nava rê da maye
Tovê çandî sava ye
Negehişte bêderê[302]

[302] Cihê ku genim lê tê qutan.

**MEŞALA DILÎ**

Min dil da heye agirek
Wê jê bilind bin meşale
Nîn e min sebr û aramek
Dil birîna sotye gelek

Her demê min ah û nalîn
Qêrîn û derd û fîxan in
Berdewam e mah û sal in
Derdê ahuya çawbelek

Çawêt belek wê kil kirin
Biskên xelek wê şil kirin
Cerg û dilêt min kul kirin
Tête pêş ew horî-melek

Horîya baxê biheştê
Wê diket seyran û geştê
Wek bilbil bi awaz xweş tê
Ez dame ber çerxa felek

Çerxa felek li min ba kir
Bi eşqê dil kirye agir
Sotim û pêt û duman kir
Her dem bo min dibît kulek

Bilbil her dem li bostanê
Ahu ye li kohistanê
Gel min naketin jiyanê
Dûr kirim bi çend menzelek

Dûr kirim bi mah menzilan
Bûy birîna cerg û dilan
Li min bûye behra kulan
Wê kirme mislê heykelek

Kirme heykel bêruh can e
Derkewtim rêza insan e
Kewtme bin derd û pirsan e
Nîn e min sebr û aramek

Sebr sikûnet min nemabû
Dil bi xeman heliyabû
Umêda weslê nemabû
Dîtba min bi tenê carek

Dîtba li ser halê berê
Xwe pavêm bextê qederê
Carek xuya bît vê derê
Bo dilê min bît qerarek

Çend şay kul kirne dilê min
Barek giran ser milê min
Rehm û insaf nîn e gel min
Bûm êxsîr û hem bêçarek

Bêçarekî zor xerîb im
Dinyayê ez bênesîb im
Derdgiranek bêtebîb im
Me li jînê hebît parek

**MIN TU DÎTÎ NÊ DI XEW DA**

Min tu dîtî nê di xew da
Bûme aşiq bûme sewda
Hiş û eqil min li der da
Te digel min ne xeber da

Were d’gel min xeberdanê
Şirînê rindê ciwanê
Kulîlka heyva nîsanê
Li ser çiyan revneq veda

Tu nergiz î l’serê çiya
Bêhna te dabû geliya
Min tu dîtî dil heliya
Kewtime nav fikr û derda

Kewtime derdê evînê
Dilberê rûhingivînê
Reşruhanê xemrevînê
Kew gozela d’nav qefes da

Çawêt te çawêt kewan in
Reşbirû wekî kivan in
Singê te mîna rezan in
Sêv û hinar di navê da

Te sing baxçe xox û sêvan
Te şekir dibarît ji’lêvan
Bo min xewn e roj û şevan
Enî heyva di çardê da

Enî tirêj ji rojan e
Didan wekî sedefê ne
Lêwêt tenik wek kazê ne
Tilyêt zirav gustil tê da

Tilî-zirav dest-biçûkê
We xemilî wekî bûkê
Min ew dît li ber neynûkê
Xwezya heval bam digel da

Bame heval bi hewserî
Pêkve jiya bayn b'hemberî
Têr dîtiba b'çawê serî
Ew xiyal nemaba dil da

Xewn û xîyal bûne rastî
Dest girtiba min bi destî
Pêkve jîban bi duristî
Bi mirnê jêk bibayn cuda

Heta roja em dimirin
Gelêk jîban ken û girîn
Digel yêk ban xwîn û birîn
Hetta ku me can li der da

Hetta bijîm li dinyayê
Nakem terka hebîbayê
Xwuda husn û cemal dayê
Wê cih girtî d'qelbê min da

Min pê dane ruh û beden
Bi roj fikr û bi şevê xewn
Ew perîya nazik beden
Canfida me di gavê da

Canê şirîn min kir gorî
Du'an d'kem ji Rebbê jorî
Sûc û xetan min biborî
Ez dê xwe bo b'keme feda

Xerîb bêjît ey şirînê
Dê qurban kem ruh û jînê
Ew hebîba xemrevîn e
Gel yek ban di biheştê da

**MIN ZERÎYEK DÎT LI GUNDÎ**

Min zerîyek dît li gundî
Wê jê têtin bêhna gula
Bejinzirav û bilind î
Xwe hejînî eşqa dila

Sergovendê dikişîne
Ew desmalê dihejîne
Çawêt belek l'min niqîne
Li cergê min tîne kula

Li cergê min ket eserê
Singsedefê dêmqemerê
Reşkezî li ser kemerê
Bisk berdane li ser mila

Pirç berdaye li ser xalan
Sûret sor in wek alalan
Eqlê min bir wê bi talan
Dihelînît cerg û dilan

Mêlak li min kire kebab
Wê zalima gerdenşebab
Ji min sil bû nakin xîtab
Çim silavê deskê gula

Cerg û dilê min givіştin
Birînêt min bi xwûn şuştin
Bi tîra çawan ez kuştin
Bi eşqê kirin mubtela

Mubtela bûm bi evînê
Yê xemilî wekî Zînê
Bi wî halî nakin jînê
Can wê li min bûye xela

Canê min êxist xeterê
Bêhnrihanê rûqemerê
Digel hev ban li her derê
Bi ‘umrê sih heta çila

Pêk ve jîban bi hewserî
Xilas bibin ji keserê
Digel hev ban li her derê
Nûra Reb biba tecella

Nûra Xwuda li vê derê
Me dîtba bi çawê serê
Ji her tiştî ew xweştirê
Di xilas bibayn ji bela

**MUHBETA DILA**

Mubeta dilan bela ye
Ew şewq û hub û sotin e
'Umr û jiyan bêbiha ne
Kul û derd û hem cefa ne

Kul û derdê işq evînê
Sotin û derdê birînê
Ey nazka dîlber şirînê
Te bejin rewşa dilan e

Te sotim derdê evîn e
Te vekirin min birîn e
Ji çawan têt aw û xwîn e
Tab û taqet min nemane

Min nemaye sebr û quwwet
Te nîn e insaf û mirwet
İşqê nînin çu reqabet
Muhbet mir-ata[303] dila ye

Min di mir-atê tu dîtî
Hubba dil wêra d'gehîtê
Cezba işqê l'min şedîd tê
Agir û derd û birîn e

Agirê işqê min helda
Behra evînyê min kelda
Ez kirme dîn û şeyda
Gurî pêtan dilî dane

Bûm mubtelayê evînê
Dil pê bûye gola xwînê
Kewtime êş û birînê
Dil benda zulf û xalan e

Birindar im bi dil canî
Tebîbê dilê min kanê
Bûme girtî bendî xanê
Sotin û derd û kelîn e

303 Neynik, kotî.

Dil şewitî j'işqa çavan
Girtîyê wan bend û davan
Çawreş û bejinziravan
Em êxsîr û hem bende ne

Êxsîrê bend û davan im
Kewtîyê belek çavan im
Bi ah û kul û kovan im
Kuştîyê bêruh û can e

Kuştîyê qehra reqîbê
Girtîyê zulfa hebîbê
Rohnîya çawêt Xerîb î
Çaw li hîvya wesletan e

Çaw hasret in bo dîtinê
Lêw hişk bûne j'bo mêhtinê
Dest mane l'hîvya girtinê
Qed û qamet min nemane

Dest giheştibane destî
Didana sûret bi geztî
Şerbeta lêvan bûm mestî
Şer li ser zulf û xalan e

Giheştbame xal û xetan
Bisk û têlêt ser sûretan
Min rakirban ji muhbetan
Sûc û xeta tê da nîn e

İşq û muhbet bêxeta ye
Dûrbûn e ji cewr cefa ye
Nexweşî lerzîn û ta ye
Dilkul û pê mubtelan e

Muhtela û bênesîb im
Ji dîtina wê xerîb im
Çawnihêrek bênesîb im
Min fîda ye ruh û can e

Ruh û canan dê fida kem
Dilê birîn pê dewa kem

Xeyrî wê dostê nas nakem
Cism û can nik bêbiha ne

Aşiq im ez mubtela me
Bi derd afat û bela me
Şev û rojan hîvyê mame
Carek bêt horî-cîhan e

Horîya d'baxê îrem da
Sorgula rûmet-şefaq da
Min ji eşqa can li der da
Qelb hecera dil bi kîn e

Tub'et hişk û dil bi kîn î
Carek dost li bîr naînî
Were b'nêre dil birînî
Kerb û cefa ma bes nîn e

Te dil şikand wekî camê
Ji eşqê nagrim çu tamê
Lenger[304] im b'awazê amê
Her weqt gazî û nalîn e

Kirme mestê cam bi dest e
Sed caran min destur xwest e
Gel min nekir bend û best e
Mirwet û insaf nemane

Carekê bo min mecal de
Fikr û qelban bibe sade
De Xerîbî camê bade
Careka di wî b'ruh bîne

Wejîne tu ewî zatî
Mehbuba enwersifat î
Wek loqmanek ji nû hatî
Bûm nesaxek bê xwudane

Nesaxê b' hubba wê mabû
Hubba cismanî nemabû

[304] Seqet, leng.

Wê j’nûra heq şu’le[305] dabû
Çaw li cismê te dibîne

Çaw dibînin nûr û tavê
Wek gula girtî xunavê
Bêşubhe aşq e di navê
Diket zarî û fîxan e

Ah û nalînêt bilbilî
Bi wî têt sebra wî dilî
İşqê nînin kîn û silî
Ew tişt ji hubbê derve ne

Ew kesê hub ji Xwuda bît
Qelb ji nûrê xalî nabît
Dil ji zecrê safî nabît
Evîn derd û hem sotin e

Sotin û agir û pêt e
Min qedeh ji destî rête
Li bendê me kengî bête
Ew bi çawê heq bibîne

Min lazim e ku bibînim
Aşiqê dil yê bîrinim
Cerg û dilan pêt helînim
Min xeyrî nîn e gotin e

[305] Rewneq.

**NAVA SÎNE**[306]

Min nav sîne hebû dilek
Ew jî li min bir dîlberê
Di şûnê da çandî kulek
Beden tev êxist xeterê

Beden bêdil naket jînê
Dil cihê işq û evînê
Were dîlber neke kînê
Nemay tu l’ser ehda berê

Soza berê te l’bîr nîn e
Rehma ewil gel te nîn e
Dilê te b’xelel û kîn e
Te dil ji bo min seqer e

Te bo çi dil ji min revand
Pişta pîrî te lê tewand
Cerg û mêlak te lê keland
Hêla nav kul û keserê

Dîlberê got qeder heq e
Nik Xaliq têt ew mutleq e
Yê bawer neket ehmeq e
Nezer ke b’eyne’l-beserê

Nezer ke b’çawê heqîyê
Sebr ke heta dûmahîyê
Huba mecaz nadet xweşyê
Eqlî nahêlêt eserê

Nezer ke tu b’çawê qelbî
Her dem te eqil rehber bî
Di nav me tu dê serwer bî
Dê b’gehî rêya rehberî

Bi qederê bawer heye
Se’ û ‘emel destê me ye

[306] Sîng an jî sing, ev peyve di zaravayê hewramî û dimilkî de tê bikaranîn. Herwiha di zimanê farsî de jî ji bo sing “sîne” tê bikaranîn.

Ya dixwazim îrade ye
Te çu kar nekir vê derê

Se'ya beşer b'cih neîna
Cuzê xîyar[307] b'kar neîna
Mînak negirt ji Mem Zîna
Ji hubê nema cihê eserê

Min sûcdar nekeb nezanî
Bifikre l'cîhana fanî
Hişyar be j'ruha nefsanî
Dê bîye j'ehlê xeberê

Me ruh hatîye j'sultanî
Ew baqî ye cism e fanî
Ehda elest tu dizanî
Ew dana bera qederê

Qeder û se' û hem 'emel
'Emrê heq bûn ew di ewel
Her çi bi wan nekir 'emel
Ew rast nastînît defterê

---

[307] Îxtîyar, pîr.

**NEBÊJE ZÛ YE**

Were zeryê nebêj zû ye
Min tu dîtî dil vebûye
Awa saf ber te tarî ye
Bejna te dara selwî ye

Te gerden wekî ya qaz e
Te şirînê rind û nazê
Were da b'gehne mirazê
Bikeyn em keyf û şahîyê

Selwîbejin reşruhan î
Gerdenqaz û stû mercan î
Kulîlka heyva nîsan î
Te rûmet wek gula spî ye

Te rûmet wergirt ji gulê
Sor û zer tu wê xemilî
Min tu dîtî dil xecilî
Ez helandim reşkezîyê

Min çaw kewte cotkezîyê
Eywanê d'rêsît teşîyê
Min selamek da zerîyê
Bi daxwaz û rica hîvîyê

Subhan ji Rebb çend delal e
Bilind zirav çawxezal e
Evîndar im ah û nal e
Were em bibin hevrê ye

Hevrê bin bi dil û canî
Ez malxwê bim tu kebanî
Bi evînî û ciwanî
Me dinya b'çît bi xweşîyê

Jîyana xweş evîndarî
Tama işqê ye dildarî
Xeyrî wê d'bîte xwûnsarî
Dilê dîtî d'det şehdeyê

Were guhde dilbirînî
Agirê dil tu nabînî
Xwazya te daba mizgînî
Cewab bêt bi erênî ye

Tu ji min xatir nexwaze
Dîtina te l'min miraz e
Te qebûl ban ew daxwaze
Bo min bibaye şahî ye

Xerîb im her dem bi şîn im
Bi derd û kul û hezîn im
Şahîya dil da bibînim
Cewaba xweş bo min nîye

**NEZERDARÎ**

Min ciwan dît derê xanî
Min silav kir b'dil û canî
Got kerem ke tu mêhvan î
Dergeh vekir ez çûm xanî

Rûniştim li ser mînderê
Min got zeryê te esmerê
Ka berê xwe b'de vê derê
Da l'rûyê te kem nezerê

Got mêvan şol nabin wehe
Nezer gelek ye b'guneh e
Tu nebe cahil ebleh e
Tu ji Xwudê ke tewbeh e

Nebe cahil bi nezanî
Xwe hişyar be tu mêvan î
Bigre qîmeta insanî
Nebe şirîk bo şeytanî

Got te der vekir bûm mêvan
Girnijek ji her du lêvan
Dîtina mercan û sêvan
Bûy daxwaza roj û şevan

Zanim mêvan hurmet heye
Min meqsed dîtina te ye
Ez bibînim rûyê te ye
Nezerek bo min hewce ye

Te vekir dergê dilê min
Eşqê tejî kir qelbê min
Yek nezer helal e bo min
Ew xalelê[308] nadet dînê min

Tu mêhvan î behnê vede
Edebê xwe tu pêhn nede
Heya j'destê xwe bernede
Bi kêr naêt ew 'edete

[308] Xalel (F): Zerer, ziyan.

Em insan in bi esl û neseb
Muslim in bi terz û edeb
Hatina te hebît sebeb
Beyan ke b'usûla edeb

Got min tu dîtî bûm aşiq
Min divêt dosteke sadiq
Ger tu min bibînî laîq
Ji te ra dê bibim refîq[309]

Ez hatme tu min bibînî
Bim laîqê te û dînî
Te dil hebît eşq evînî
Em dê gel hev biken jînê

Gote min taze tu hatî
Tu zewicîy yan î xort î
Tu zengîn î yan î rût î
Ez nizanim ka tu j'ku tê

Tu rêwing î bêmiraz î
Selte zelam[310] rût û tazî
Bi wî rengî qîz dixwazî
Bi kêr naêt ew daxwazî

Got tenê me ez ser bixwe
Min çu nîn e kesanê xwe
Mayme ez pîwya serê xwe
Ez bi xwe bûm xazgînyê xwe

Min ne bab heye ne da ye
Êtîmek serê xwe maye
Tewekul dabû Xwuda ye
Qerar ferman ew ya te ye

Got kor bin çawêt qederê
Min çi xwast çi hate berê
Te kar rast bêt li her derê
Carek dî dê bêy vê derê

---

[309] Heval, dost.
[310] Anku zelamekê bêmal û serwet.

Tu vê carê paş da here
Carek dîtîr şûn da were
Yêkî bo xwe ke rehber e
Da qebûl kem vê qederê

Dê min b'xwazî ji babê min
Ew naketin bêdilya min
Dê ket karê daweta min
Xerîb şahid nikaha min

Bawer e ji eşq evînê
Mij te vêt edebê dînê
Heq û huquqa cih bîne
Da em pêkve bikeyn jînê

Pêkve bijîn bi hevalî
Rojêt xweş û şin û talî
Bin xwedyê 'erz û 'eyalî
Bi izneha Rebê 'alî

**PÊXAS Û TAZÎ**

Were nik min çi dixwazî
Te dil bi çi dibît razî
Kewtim rê pêxas û tazî
Kal bûm ji derdê evînê

Min evîn kovana dilî
Dilê min bi wêt kemilî
Were nazdar tu bo sil î
Derkeve ji şaneşînê

Şaneşînê û serayê
Meşxûlê seyr û sefayê
Kar tê nîn e bo dinyayê
Ger bi hîzar sal bimînê

Dil bêevîn kar tê nîn e
Eqlê serî xwe cemîne
Dinya mulkê kesê nîn e
Ji xew hişyar be şirînê

Xwe dûr pêxe zewqa zêra
Yaqut û mercanêt pêra
Nîn e wan çu karê xêra
Dê ‘ezaba wan bibînî

Tu ‘ezabê nede ber min
Guh de awaz û derdê min
Rehmê bibe bi halê min
Were terk b’ke kerb û kînê

Min ji dil heye daxwazî
Her deman hawar û gazî
Carek dîtnê bibe razî
Dil-gawira xaçhebînê

Te ji halê min nizanî
Gawir î yan musulman î
‘Ezab d’dey bi ruh û canî
Tu carek libîr xwe bînê

Xewêt şewan min heram kir
Evîna dil te wêran kir
Dilê birîn kirye agir
Li min nema cihê jînê

Te dil sot û cîger vêra
Eql û fikir birin pê ra
Nizanim dil hey bi kê ra
Em êxistine kemînê

Kemîn dana pêşberê me
Şer û şîn înan serê me
Bextreşkirin bû karê me
Çi bikeyn piştî vê hînê

Tu nizanî min hal çî ye
Dilhelyan te ne dîtîye
Xirabî karê kes nîye
Bi kêr nayêt peşêmanî

Peşêmanya li dûmayê
Çi faydeyek pê ve nayê
Xusaret e ser dinyayê
Tu bawir be b'ke yeqînê

Yeqîndar be hemî wextan
Bawir neke ji bêbextan
Xerîb maye gel mişextan
Nebin hevkar gel xayînî

**SEYR Û SEYVAN**[311]

Were xanim bi van xalan
Bibîne seyr û seyvanê
Te dilê min bir bi talan
Xwe d'hejînî l'wê eywanê

Koçk û seran mesken dana
Feqîr hêlan nav kolanan
Kir terka dîn û ramanan
Nezer nakîy vê cîhanê

Nezer neda dildarî
Tu mêhvan î li vî warî
Digel dostî tu dilsar î
Bo çi naêye seyranê

Me seyran bû li nav baxan
Da b'guhurin wan qonaxan
Me cih nema digel saxan
Dê b'keyn terka vê meydanê

Meydan li me gelek teng e
Roj êvar e l'me direng e
Dil tarî ye tejî jeng e
Bûyne xusarêt vê xanê

Li vê xanê te seyran kir
Eşqa dilî te talan kir
Te aşiq rût û uryan kir
Nehêla qedrê vîyanê

Qedrê eşqê te nehêla
Dil kewte ber mewc û pêla
Kirme wehşî l'nava rê da
Kewtme ber dax û kovanê

Dax û kovan tejî dilî
Min nema hizra ewilî
Nizanim bo çi yê sil î
Were bike vê beyanê

---

[311] Nîşanxweş, sêrevan.

Ispata eşqê ye zor e
Wê nînin ‘edet û tore
Kêm û kesan min bibore
Nekeve nav xilwexanê

Neçe girdaba evînê
Dê xilas bî eql û dînê
Dê bikî girî û şînê
Te nabît cihê jiyanê

Jiyana bi eşq û muhbet
Nîn e wê çu keyf û lezzet
Her dema wê b’derd û mihnet
Derd û kul gehne kovanê

Kovana eşqê nekêşe
Ezab û her dem diêşe
Xiyalan nik xwe pavêje
Xerîb dixwaze emanê

**SILAVA RÛYAN**

Min silave li ser rûyan
Ji hubba xal û ebrûyan
Gerdena zer û murîyan
Dil talan kir bi evînê

Evîna wê dil birîn kir
Jîyana min wê qehir kir
Xweşya jînê l'min zehîr kir
Kewtme nalî û girînê

Nalîn û girîn her gavan
Rohnkêt xwûnê tên ji çawan
Agir kewte nav hinavan
Ez helandim nazenînê

Nazk û nazdar û şepalê
Birû wek qewse-hîlalê
Rûsorgul e wek alalê
Rewneqa rû min d'helîne

Rewneqa wê da rûyê min
Eşqa wê daba dilê min
Fikr û zêhn bir ji serê min
Çu tiştî naket yeqînê

Bi yeqînê naket rehmê
Wê çaw daye qehr û zulmê
Ji Xwuda naketin şermê
Her dem min têxîte şînê

Were bes ke tu ey zalim
Binêre l'wez û halê min
Pîrê kal û bêmecal im
Gel min neke tu çu kînê

Kîn û kerban tu pavêje
Evîndar im ez ji mêj e
Vîyana j'dil nehavêje
Were da dil te bibîne

Dilê birîn tu derman î
Tu şîfaya ewî canî
Min nefiroşe b’erzanî
Bilan bes bît dil hezîn e

Xema dilê min tu kêm ke
Her dem lutf û kerem bike
Bes tu min dûrerê bike
Ji çawan tên ronkêt xwûnê

Ronkêt xwûnê dibarînim
Dilkulekê pir hezîn im
Hez kem carek te bibînim
Ruha mirî bêt vejînê

Da ruh û can pêkve şa bin
Êş û janêt min tena bin
Sebr û aramî peyda bin
Xilas bin em ji nalînê

Em derkevin ji zehmetê
Min nevêt bikşêm minetê
Naxwazim jîna b’zîlletê
Min divêt hesyet bimîne

Hesyetê nahêlim erdan
Nabim li pira namerdan
Naxwazim mineta ‘ebdan
Da mirov serbilind mîne

Serfiraz bim li her erdî
Naxwazim himmeta ferdî
Xwazim dostya şêre-merdî
Da bişêyn serî helînin

Serbilind bin nik Mewlayî
Fedl û ihsana wî dayî
Ser me nebîtin hebayî
Da Xerîb mexsedê bînî

**SOTIM BI AGIRÊ DILÎ**

Sotim bi agirê dilî
Cerg û mêlak wê digel da
Perîşan im bi dilkulî
Ruh û beden hemî tev da

Nema bo min xweşya ganî
Şev û rojan dihelyêm ez
Were bibîne wî halî
Îlaç bo min nebû peyda

Derdê dilê min gelek e
Her gav bi ah û nalîn im
Were carek tu Dîbayê[312]
Bikem seyrê di wextî da

Wext û mecal min çu nînin
Agirê dil d’kelijîtin
Carek were bîne sebrê
Hêj me jêk nekirî veda

Min ji eşqa dil ateş e
Nîn e sebr û sikûna wî
Dilê wekî berê req bît
Dihelyêtin di gavê da

Kesê eşqa dilî hebît
Nîn e sebr û sikûna wî
Dişewitît şev û rojan
Kewtine hicr û zecrê da

Çîyê dîtî derdê eşqê
Bûne xerîb nav da mane
Ew dilsoj in bi derdê min
Tebat nîn e di wê rê da

Çîyê mihnet ji işqê bît
Bi zulfa yarê têt bestin
Bît bendî ji bona dostê
Tête girtin di qeydê da

[312] Navê jinekê ye. Ev navên bi vî rengî xeyalî ne.

Jan û birûsk kewtne dilî
Hûnik nabît dil çu caran
Wekî berqa birûskê bû
Wekî sêla agir bin da

Cerg û hinav l'min disojin
Dem û gavan ez dihelyim
Ku min canê feqîr îro
Daye qurban di vê rê da

Ji hubba dîlberê dîsan
Bêhal û serxweş im îro
Ku mehbub dûr kirim çendî
Hêlam di nava qeydê da

Helyam benda hebîbê ez
Weku girtîyê zindanan
Bi çawê dil bibînim ez
Perwane bim di dorê da

Xwezya min dîtiba dîsa
Firseta wesletê bêtin
Hembez kem bi dil û canî
Nebît keser dilê min da

Mah û rûyê weku nûrê
Disojîtin min ji dilî
Dayme ber tîra evînê
Yarê derbe li cergî da

Bi zerban kuştime yarê
Bi min ew rehmekê naket
Zeyînî ye ew bi xemlê
Mislê rojê di şerqê da

Ji şerqê rewneqek rabû
Wekî heyva li çardê bû
Li pê têt kewkeba fecrê
Êxistme nav nar û pêt da

Kewtme nav agirê dilsoj
Dihelyêm her wext û deman

Nîn e aramîyek bo min
Her gav dil yêt nav xwînê da

Dil di nav xwûnêt geriçî
Cerg û hinav hemî sotin
Kewtime berd û girdabê
Bûme kalê di vê rê da

Kirme kole di zindanan
Em li bîrê naên carek
Dizanim ku yêt şubhê min
Fida bûn di vê cehdê da

Fidakar im bona yarê
Ji can û dil ez hazir im
Ruha şirîn bikem gorî
Bo min mizgînî bît peyda

Dil bi mîzgîn eger şa be
Ruh dê bête ber bedenî
Keyfxweşya can û bedenan
Min şahîyet wê ‘eydê da

Li bendê mam gelek caran
Min nedît carek xuya bît
Ger bibînim wê sîmayê
Bo min tali’et wê salê da

Talî û bext bi zivirim
Dil û ciger tena bibin
Bîte ‘eyd û sersala min
Dê bim qurban di ‘eydê da

Min can feda ye j’bo yarê
Ger dete min ew cewabê
Muxateb bît bi şexsê min
Min biheşt dît di dinê de

Biheşta min digel yarê
Di seyrana ez gel da bim
Hema xweş bim bi yêk demê
Min seyr e Baxê Îrem da

Bûm hesreta heftê salan
Ku têr bibînim ez carekê
Bi keyfa dil lê mêze kem
Min bes e jîn di dinê da

Jîyan xweş e digel yarê
Mirov li bihara ‘umr bît
Hemdeng bîtin digel dostê
Bilan kevît di çolê da

Xerîb gava bibye nêzîk
Yar jî gel te bîtin razî
Li dinyayê te meqsed dît
Te îş maye di heşrê da

**ŞEV Û ROJAN TU XIYAL Î**

Şev û rojan tu xiyal î
Nîn e tiştek min li balî
Kirme êxsîr wek evdalî
Gav û deman ah û nalî

Dinalim ez dil birîndar
Ciger kul û zor keserdar
Ronkêt çawan bûne robar
Diborinim ez b'tewalî

Dem û gavan li bendê me
Hêvîdarî wesletê me
Evîndarê xurbetê me
Bi ah û gazî û nalî

Gazî û kalîn her demê
Şev û rojan ez di xemê
Gihiştibame li cemê
Wext û zeman nîn e xalî

Wext û deman ah û hisret
Nîn e çu însaf û murwet
Kirme rêwî xistme xurbet
Rehm û wicdan nîn e lalî

Bêwicdan û xerezdar e
Bi kîn û kerb û xedar e
Bo min nemane çu çare
Dem û gavan êş û talî

Êş û talî kul û kovan
Dema d'bînim bejna ciwan
Çawêt belek biryet kivan
Neqşê Xwuda j'Rebê alî

Neqş û sifat Xwuda danê
Mislê wê nînin cîhanê
Kirme ebter daristanê
Perîrûya çawxezal î

Çawêt belek bilindbêjn e
Wexte bêtin zeman hêj ne
Gava d'bînim bo min cejn e
Pirsîba hal û ehwalî

Pirsî min ji halê yarê
Taze ruh bam wek biharê
Dê biryaban şîn û zarî
Ji dîdarê rû-cemalê

Rû-cemal e sifat-perî
Rind û ciwan sor û zerî
Bûm zêrevan li ber derî
Çaw nihêrim derê malê

Nobedar im derê xanî
Bibînim bi şad û manî
Dê qurban kem ruh û canî
Da pêkve gehne kemalê

Kemala işq û evînê
Sotin û derdê birînê
Carek wer halêm bibîne
Zuhreya horî mîsalê

Horîya d'baxê îrem da
Şerbeta lêvan bi min da
Ta edeb ez kirme sewda
Rohnîya şewq û şemalê

Şewq û rohn û xemilîye
Zîn Zuhre[313] l'pêş xecilîye[314]
Roj bo qiblê zivirîye
Tarî kir şewqa hîlalê

Rohnya hîlalê birandî
Muhbeta dilan ciwandî
Cerg û dil li min helandî
Gerdenzera bextî xalî

[313] Zîn û Zuhre: Qesta seyda ji van her du navan ne çu kes e, navên xeyalî ne.
[314] Xecilî: Şerimkirin, fedîkirin.

Gerdenzera nazik-beden
Selwîbala horî ‘eden
Aşiq li pêş ve ruh diden
Kewtime ber êşa dilî

Dil şewitî cerg helîya
Te êxistim ji dest pîya
Kirme ebter li çol çîyan
Bi wî ‘umrê pîr û kal î

Kal û pîr im bêderman im
Aşîqê wan rûmetan im
Koleyê çaw û biryan im
Wer xwudana xeml û xêz î

Te l’xwe kir xemla zêrîn e
Carek wer halim bibîne
Min wextê jiyanê nîn e
Serxweşê derdest peyal î

Serxweş im agah min nîn e
Dilbirîn û mêlakxwîn e
Umêda weslê çu nîn e
Mam piwya xewn û xiyalê

Şev û roj xewn û xîyal in
Her dem bi gilî û gaz in
Dîdara dostî dixwazin
Zalimê nadet mecalê

Ew xwudana sûc û curmê
Li dostî diket ew zulmê
Carek gel min naket rehmê
Bi lutf û sewq û hevalê

Bi xweş û lutf û şirîn e
Min muhbet işq û evîn e
Bi şahî keyf û mizgîn e
Leb-şeker gerden şemalê

Şeker-lebat e rû bi ken
Sotin li min qelb û beden

Min nemane sebr û esen
Mayne b'hivya qîl û qalê[315]

Wext û mecal derbaz kirin
Evînê pîr û kal kirin
Hem jî dîn û dinya kirin
Wer bibine tu wî halî

Hal û wext li xwe bezre kir
İşq û evîn min tam nekir
'Umir borî min fam nekir
Zehn cema bû b'heftê salê

Piştî heftê sal te borî
Pîyê te l'ser lêva gorî
Evînê l'te kire zorî
Ey Xerîbê fikr betalî

[315] Qîl û qal: Gotûbêj.

**TOVÊ DILÎ**

Te tov çand di dilê min da
Eşqa te li serê min da
Bûm kewtîyê kul û derda
Hesret mayme bo evînê

Her dem nahêy tu bi xweşî
Ber çavên min tu dimeşî
Li dilê min bît nexweşî
Dikewme girîn û şînê

Ez neşêm çawêt xwe westim
Geh yê gêj û geh yê mest im
Awirya çavan ez best im
Tu neke hîle û kînê

Her dem mînim hîvya qewlî
Çend bêsoz û çend bêfêl î
Carek were tu bi eqlî
Derman ke tu vê birînê

Wek tifalan ez dinalim
Birîndarekê bêhal im
Were carekê tu zalim
Min bîne halê vejînê

Hîvya te mam meh û salan
Te bend kirin zulf û xalan
Wer bibîne rewş û halan
Carek şa ke vî xemgînî

Xema dilê min ka çend e
Wer carek bêfêl û fend e
Bes bide min kul û derd e
Carek bide tu mizgînî

Bes ke êdî dilan soje
Te dinya li min kir doje
Şevêt min tu bike roj e
Te ez kuştim ke yeqînî

Te ez dil da nehewandim
Di kovanan da hêlandim
Dil û ciger te helandin
Rondik yêt barin ji xwûnê

Wer xwe bide gel dilê min
Dergê dil veke ji bo min
Nîn e umêd bo jîna min
Bes e hind min dihelînî

Her du dilan tu cemîne
Dilê te qirêj û kîn e
Ciwanya min nehelîne
Bes ke êdî sorşirîn î

Tu min şa ke bi hatna xwe
Nebirîne şefqeta xwe
Xerîb pêxe nav dilê xwe
Carek biket ew kenînê

**WERE BI QAMETA ŞENG**

Wer esmer bi qameta şeng
Çerxan li dor me didanî
Perîrûyê te mah û reng
Rûmetgul û bêhnrihanê

Singsipiyê rû bi rewneq
Bejinzirav enî şefeq
Sûret sorîn enî bi deq
Wer tu bide min jîyanê

Jîyanê l'min neke tal e
Têy pêş min bi xemla al e
Gerdenzirav rû bi xal e
Were sertextê evînê

Bi evînî were carek
Ji halê min ke pisyarek
Şev û roj bi tenê carek
Bibît melhema birînê

Hatna te li min dewa ye
Dîtna te li min şefa ye
Luqman hekîm kî ve maye
Wek Îsa min divejînî

Jîna min te bicih îna
Xilas bûm ji êş birîna
Kewtme nav eşq û evîna
Ez bûme Mem tu wek Zînê

Wekî Zînê nezer da min
Bi evîn bû qedera min
Şekirlêb û şirîna min
Suhbetxweş û xemrevîn î

Şirînkelam xweşxeberê
Meleksifet rengbeşer î
Min nedîtne wek te zerî
Cil-etles û dilhelîn î

Dilhelîn î qametşeng î
Perîrû û zehrûreng î
Dê bimînin heta kengî
Te nahêlim ke yeqînê

Te nahêlim ez çu cara
Çaw nihêrim bi sihara
Têr bibînim car û bara
Reşrihan û nazenînê

Nazenîn û bedsirûşt î
Cerg mêlak li min biraştî
Zahirî dîn l'me nehiştî
Batinîyê heq dizanî

Zahirî dîn da xwusarê
Bêinsaf û dilxedarê
Kewtime ber hukmê yarê
Nîn e rehma wê xaînê

Xaîn nebe tu li dostî
Ger heqîqet dîn durist î
Min nerake ji serpostî
Dê rêya axretê b'bînî

Wê rêyê tu neke inkar
Ewê xemlê nînin çu kar
Perde rake da bî dîyar
Xerq bûme behra evînê

Wer tu bi çeşm û cemalê
Niqaba ser rûyê xalê
Rake da b'gehne wisalê
Bi cemala dilhebînê

Rûcemal û mah û tabê
Rûnişîn perde nîqabê
Bes e li min ke 'îtabê
Ez bona te dikem şînê

Dikem şînê û giryanê
Digel feryad û fîxanê

Dê dest bidem girîbanê[316]
Ji derdê wê rengnûrînê

Nûranî ye wekî berqê
Dê bêj roj derket ji şerqê
Bi heza wê ketme ferqê
Tu sunbil û ya nesrîn î

Sunbil bi dîdara gula
Sor bûn ew bi eşqa dila
Seyra wan karê bilbila
Bi keyf li ser wê dixwûnî

Ew dixwûnît dilhezîn e
Her bi eşq û hem evîn e
Gava ew gula dibîne
Ew diket ah û nalînê

Bilbil aşiqê gulan e
Dil jî mehbûbê dilan e
Her du pêk ve bi biha ne
Dilê geş vihê dibînî

Evîn muhbeta dilî ye
Dil ligel maşûq rêwî ye
Qonaxa wan cihek dî ye
Li axretê wê dibînî

Eşq bînahya çaw û dila
Dihelîne cerg û dila
Bes e bêje tu 'Ebdulla
Neke gazind û gilînê

[316] Girîban: Kiras.

**WERE CAREK TU LEYLAYÊ**

Were carek tu Leylayê
Bigerin pêk ve dinyayê
Min daxwaz e te bibînim
Te binêrim ber serayê

Keserdar û dilbirîn im
Demek li nik te ez rûnim
Suhbetekê bi hev bikeyn
Xemên dilan birevînin

Xema dilê min gelek e
Ne hindik e ne gavek e
Demek tu sebra min bîne
Ew jî ji bo te xêrek e

Ger te hebît dilê xêrê
Carek were nik min vêrê
Were dilê min xweş bike
Çêtir e ji çûna dêrê

Were carek bikeyn geştê
Bigerin li nava deştê
Daxwaz e ji Rebbê mezin
Bigehime ber teniştê

Li nik te ez rûnim carek
Ji eşqê tu bide parek
Di dinyayê li min bes e
Li axretê bît mubarek

Mubarek bît bi xemla xwe
Were carek bi şemla xwe
Bi wî halî te bibînim
Min qebûl e mirina xwe

Bi xemla xwe dibî xuya
Bisk berdane li ser rûya
Yêt mislê min te dîn kirin
Mal terk kirin çûne çiya

Çûne çiya wek ebteran
Bûne wehşî li wan deran
Te ez kirme kolê êxsîr
Kul danane ser keseran

Ew kul û derd li min civîn
Li min nehatibû evîn
Ma bes nîn e te ey zalim
Hero dikem ah û girîn

Ah û fîxan dikem zarî
Ji çawêt min xwûn dibarî
Nehatye rehmê digel min
Îdar nabît bi vî karî

Naçî serî bi wî rengî
Dê li bendê bî ta kengî
Ne bes bît Xerîb Gulordî
Wexte biçî tu bêdengî

**WERE ÇAWXEZALA MIN**

Dê were çawxezala min
Şirînê xweşhevala min
Rûmetgul û şepala min
Tu sed caran bi xêr hatî

Bi xêr hatî şirîna min
Were xweş ke birîna min
Digel te ez bikem jînê
Bide min sebr û tebatê

Digel te dê bikem sebrê
Bi hev ra em bikin seyrê
Digel yêk em bibin hevrê
Digel dostan li civatê

Gel civatê tevî ‘amê
Mah û rûyê xweşkelamê
Dilgeşê eywanmeqamê
Rûnêyne guşa suhbetê

Suhbet bikeyn hemî pêk ve
Seyra bikeyn di gelêk ve
Hema xweş bîn bi halê yêk ve
Di her gav û hemî wextê

Bi suhbet bin hemî gava
Bes e îşareta çawa
Nede ber min qeyd û dava
Tu didey min ceresatê[317]

Qeyd û bendan bihelîne
Soz û we‘dan bicih bîne
Ez nizanim ew çi kîne
Bes e êdî xweş-luxatê[318]

Xweş lixatê te şirînê
Te bi agirê evînê

[317] Ezîyetdayîn, acizkirin.
[318] Luxat: Ziman.

Ez xistime nav nivînê
Em dûr mayne ji wesletê

Bo wesletê gelek dûr in
Em xwudan ‘eyb û qusûr in
Bi hîle û çep û çîr in
Reb me bînte hîdayetê

Hîdayet bo me ye fer e
Bin ummet bo pêxember e
Xerîb dê kanê tu were
Temam bike vê qisetê

## WERE DILO SERÊ XEMAN

Were dilo serê xeman
Sal û wextan hîvya te mam
Te dil kirye cihê xeman
Me rohnik tên wekî çeman

Dil xweş nîn e her dem girîn
Eql û fikir te l'min birî
Dil disojît pêt û gurî
Kewtine nav derd û xeman

Xem cema bûn li dora me
Derd û kul bûne para me
Kes naête hawara me
Eqil çû û hiş çu nema

Min hal bû şînî û girî
Nema sax im ne jî mirî
Beden helya reng zer kirî
Mirin bo min bûye derman

Min guneh çi bû vê derê
Te guh neda soza berê
Were tu zeryê esmerê
Bilan soz li bîra te ban

Nemane te soz û we'de
Te l'min girtin rê û cadde
Ji he paş nîn e çu fayde
Carek li me nebûy xwudan

Xwudanî nekir j'wî jarî
Jê diçin qîr û hawarî
Nîn e bo wî harîkarî
Yê sûcdar e l'hemî erdan

Xerîbê bêsûc û guneh
Te girt û ew kire bendeh[319]
Bêumed e jîna d'gel teh
Tu li ser serî bûy sultan

[319] Kole, hizmetkar.

**WERE DÎLBER**

Wer dîlber bi bejna şirîn
Bibînim ez cemala te
Dîwana Xerîb aşiqîn
Binivîsim bi eşqa te

Ji eşqa te ez ê dîn im
Hero carek te nabînim
Xeman gel te birevînim
Şev û roj bi xiyala te

Şev û roj tu li min xiyal
Were şirîn dosta delal
Diyar bikin ew zulf û xal
Min daxwaz e dîtina te

Min daxwaz e te bibînim
Tu yî Leyla ez Mecnûn im
Obe obe digêrînim
Belku bibînim bala te

Belku peyda kem ez yarê
Felek bibî dost vê carê
Digel min bigrît qirarê
Kewtme ber tûr û bextê te

Çi bêbext î pirsê nakî
Birînêt min derman nakî
Çu car rehmê gel min nakî
Ronahyek bête dilê te

Dilê te carek hişyar bît
Nûra Xwuda lê izhar bît
Belku digel min qerar bît
Cefa nebînim ji dest te

Ji te nebînim cefayê
Gel min bike tu wefayê
Ehdê dikem bo Xwudayî
Serî dê danme rêka te

Serê xwe dê bikem gorî
Perî-rûya sifet-horî
Sûnd dixwem bi Rebbê jorî
Min kes nedîtye şubhê te

Kes min nedît şubhê te bî
Bi qed û bala rûmet-spî
Ew rengperî dinê hebî
Çu nînin qet ji xeyrî te

Haşa hebin wek te beşer
Rû-sorgul û şubhê qemer
Bejinbilind û lebşeker
Tu nabêy bûm qatilê te

Evîndar! Bes e nebejê
Kula dilê xwe nerêje
Derdê eşqê pir ji mêj e
Tinê nehatye serê te

**WERE GELO KA TU BÊJE**

Were gelo ka tu bêje
Min tu nedîtî ji mêj e
Kewtin nav şolêt qirêj e
Bûme kor û ker û gêj e

Bûm evîndarê bejna te
Nabînim ez cemala te
Xewn dîtin bi xiyala te
Bo min tiştek tu nabêjî

Evîna xwe izhar bike
Eşqa dilî inkar neke
Kula giran tu der neke
Bila dujmin pê bisoje

Tu were j'kerba dujminî
Tu dermanê derdê min î
Tu ruha nav qelbê min î
Aşkera wer tu bi rojê

Şev û rojan ferqî nîn e
Der û cîran gel me b'kîn e
Bilan eşqa me bibîne
Bilan çawêt wan birije

Çawêt dujminan tarî ke
Cewabekê j'min ra rêke
Xemla şirîn bo xwe çêke
Dilê wan dê j' pêş ve b'soje

Min neket nav zehmetê
Da nekevne nav xefletê
Carek gel min ke suhbetê
Da dilê min bîte xweşî

Nalîn ji min xilas nabin
Kulêt dilê min der nabin
Çawêt belek dîyar nabin
Wer dilbera sor û kejê

Min tu dîtîbay carekê
Li te bikem silavekê
Kan bêt qasidê felekê
Min nevêtin çu ‘umr û jî

Gel te mabam carek tenê
Bilan biba wextê mirnê
Razî bûm çûna j’vê dinê
Bilan dilê te nesoje

Dilsotinê fayde nîn e
Jîna gel te tam tê nîn e
Ne suhbet e ne dîtin e
Bûy zemanek gelek mêje

‘Umrê Xerîb wê kêm bûye
Sihheta wî xirab bûye
Bo axretê ew rêwî ye
Biçît defter xêran tejî

**WERE ZERYÊ**

Were zeryê te muhbetê
Rû qemerê lêw şerbetê
Ez zivirîm çaw pê ketê
Hikmet ji şahê qudretê

Muhbet min dît derê malê
Kemer bestî şûna şalê
Gerdenzerê çaw xezalê
Xwuda rûyê xwe bidetê

Gerdenzirav çawbelek e
Bejinbilind pirçxelek e
Dil heliya tu kul neke
Xwudana reng û rumetê

Rumet wekî gula zer e
Bestil piştê zêr kemer e
Min gazî kir ka tu were
Rûneyne goşa suhbetê

Suhbet bikeyn em bi hev ra
Xwe dûr keyn ji bab û bira
Cih peyda ken bin çadira
Bikeyn karî bo dawetê

Dawet keyn em bi evînê
Xwezya daba te mizgînê
Em xilas bayn ji girînê
Em ji b'bayn xwudanê bextê

Xwudan bext bayn bi viyanê
Bibayn hevrê di jiyanê
Rind û şepal şehzemanê
Lêv-şeker her wek nehatê

Lêv-şirîn rumet alal î
Gewr û rind û rûhîlal î
Rûgeş û hem çawxezal î
Sebr û sukûna min b'te tê
Tu sebr û heyata can î

Şirîn û rind û ciwan î
Ahuya çol û bergan î
Karxezala b'çolan kewtî

Çawxezal û gerdengaz î
Rûşirîn û pir bi naz î
Her dem bera te l'ewrazî
Bo min nakey ri'ayetê

Bo çi d'gel min ye xayîn î
Xwe gelekê dinazînî
Çi qas rind û ye şirîn î
Xwudana rewş û heybetê

Were xwudan xeml û xezê
Min tu dîtî l'nava rêzê
Singê te lala Tebrîzê
Çawêt te mîna yaqutê

Wek yaqut û cewheran î
Bejna te qata ruhanê
Gula nav rind û qîzan î
Rewşa dilê cema'etê

Tu rewş û rind û hebîb î
Dilbera dilê Xerîb î
Ji Xwuda d'xwazim nesibî
Ew li me bête rehmetê

Rehma Xwuda bêy insafê
Gel min nekey tu xilafê
Ser rûyan bikem tewafê
Xerîb nemînît hesretê

Hesreta Xerîb ye kûr e
Dil şewitî b'nar û nûr e
Evîn li min bûye dûr e
Nemaye wextê xelwetê

**XÊLÎ-NIQAB**

Were xêlî-niqaba min
Şirîn û mahitaba min
Gerdenzer û şebaba min
Bêy te nîn e tebata min

Roja li te bûm evîndar
Min nemayne sebr û qerar
Wext û zeman bûyne xusar
Dil da kovan bûyne hizar

Te birîn dil da vekirin
Sed fend û fêl bi min kirin
Te bi kovan reng zer kirin
Neşêyn wan derdan helgirin

Min nine wextê evînê
Bes e dilî d’key birinê
Bi xeml û xalêt zêrînê
Te dil kirye cihê şînê

Te ez bo har û din kirim
Dil û mêlak birîn kirim
Bo evînê êxsîr kirim
Te dûr hêlam mehrûm kirim

Min ji can şirîntir nine
Dê qurban kem bi mizgîn e
Bo evînyê em bendî ne
Di eşqê da em mirî ne

Mirin hebît di vê rê da
Can û beden di gavê da
Me cih hebît di sebrê da
Nemînin zulm û xedrê da

Hindî zulim heye ser me
Gelek hal hatine ber me
Nîn e xîyal û fikra me
Çu kes nema hevkarya me

Te evîn li min kir talan
Jîyar nema bi çu halan
Terka min kirye hevalan
Bûm serxweşê nava malan

Malwêran im ez bêhember
Dilê hey bi kul û keser
Ji ademyê nîn e xeber
Li cîhanê mayn bêeser

Yê te dil lê sotî ez im
Birîndar û dilmerez im
Dem û gavan pê te d'bezim
Bêkîn û qest û xerez im

Bilbil im per ji min kêşan
Te dayme bin derd û êşan
Da dest min kotkê derwêşan
Ji kar kewtim bûm perîşan

Perîşan im bi her karî
Roj li min kir şewa tarî
Êxsîr im dil sot bi narî
'Umr û sal min bûn xusarî

Meh û salêt wextê jînê
Te êxistme xem û girînê
Neşêm çu b'kem sûr-şirînê
Seyra min d'key şeneşînê

Şeneşîn û şehliqayê[320]
Êxistme cewr û cefayê
Carek bi rex min ve nayê
Bo çi we d'key bêwefayê

Mayme li çawrê rêka te
Nîn e mirwet û rehma te
Carna hatbam li bîra te
Feqîrek kewtye dawka te

---

[320] Sahane: (Tiştê) pir xweşik, têkûz û mukemel

Xerîbek bêdest û pê me
Di dawka eşqê da mame
Kî dê bêtin hewera me
Nînin xeyrî Xwudayê me

**XWEZIYA**

Xweziya ez xizêmek bama
Kewtbame ser kep û lêvêt te
Di her gav û deman da ku ez
Gel biskan bam li ser rûyê te

Xweziya ez guharek bama
Ye zêrîn hejyabam guhê te
Biba dew û min kezîya herdem
Li ser stû û rû û milêt te

Xwezya têlek bam ji biska te
Kewtibama ser van rûmetan
Gel bay werhatim xizêma te
Carûbar hatbam ber çawê te

Bay hêjandba gel guhara te
Da ez çemyaban bin çena te
Da min çawê dilê xwe dîtban
Xal û xetên bin gerdana te

Bilan sorgulek bam ber bêhna te
Da min dîtba lev û rûyê te
Xwezya mijûlankek bama ez
Li hindava belekçawêt te

Xweziya kilçîyek bama ez
Di nava kildankê te da bam
Wextê ku te çaw kil dikirin
Da têr dîtban reşbîbokêt te

Xweziya ez pişkokek bama
Ber singê girîwanê ber te
Hemî wextan xunav girtibam
Bi xuh û xunava singê te

Xwezya ewrîyek armij bama
Pêçayî bam ser û rûyê te
Ez bi dilê xwe axivtibam
Evîna dil gotba guhê te

Bilan tasek awa zelal bam
Hatibam ser dev û lêvêt te
Têhnîya te bi min şkestiba
Bam sihhet şîfa bo canê te

Dê bilan ez momek geş bama
Hatbame ser tilyêt destê te
Di wan şevêt gelek tarî da
Da min rohnî daba rûyê te

Xerîb im di şev û rojêt min
Fikra evîn bi xiyala te
Zêhn û fikrêt min winda bûne
Bûm gêj ji bona weslata te

**YARA DELAL**

Min yareke delal heye
Rû-sorgulek bi xal heye
Rind-şepaleke pak heye
Ew carna tête suhbetê

Suhbet dikeyn bi eşq evîn
Dest dene hev em digerin
Maçek ji lêvêt şekirîn
Tu li min ke vê minetê

Minnet ke tu şirîna min
Evîn û xemrevîna min
Were hevpar be jîna min
Gerdenzer û rûmir'at î

Bi xeml û xal û evîn î
Her dem di dil da dimînî
Were carek bi mizgînî
Li ser çawêt min tu hatî

Hatina te pîroz bikeyn
Sersal û Newrozan bikeyn
De'wetiyan qebûl bikeyn
Bi mêhvanî şev-beratê

Xwezya li te bame mêhvan
Ramûsanek ji wan lêvan
Dest havêtba sing û sêvan
Xweştir ji ava heyatê

Jîn ew e bi eşq û evîn
Maçek ji wan lêvêt şirîn
Ew sûretê wek hingivîn
Bi tamtir e ji nebatê

Şekir qend hem nebata min
Were rind û şepala min
Evîn û çawxezala min
Dûr nebim dem û sa'etê

Ji dûrya te nakem tabê
Xweşkelamê mah û tabê
Carek gel min ke xîtabê
Dikem feryad ji firqetê

Dikem feryad dikem gazî
Bi min şirîn û şehbazî
Ew çi ye ji min dixwazî
Di ber ‘eyd û ‘erefatê

Li min ‘eyd e te bibînim
Dest gerdena zer werînim
Perde li ser rûy hilînim
Ramûsanek ji xal xetê

Wan rûmet û xal û xetan
Biskan vedem ser sûretan
Lê binêrim bi se‘etan
Xweştir ji çûna cinetê

Beheşta min di gel te ye
Bê te biheşt bêfayde ye
Qonaxa min li cem te ye
Eger biçî zulûmatê

Werê dostê wekî berê
Pêk ve bigerin her derê
Gel te dê pîr kem seqerê
Bêyî te naçim cinetê

Cinet min da li rêya te
Bo min xweş nîn e bêyî te
Min horî dît ser rûyê te
Wexte bêt roja rnematê

Wefat heq e dê bêt nêzîk
Paşa û beg mîr û mulûk
Aşiq feqîr mezin piçûk
Dê vexwen ew wê şerbetê

Şerbeta mergî ye tal e
‘Ebdullah pê bibe hal e

Te ‘umir bû heftê sal e
Li te hat wextê ematê

## 6. HELBESTÊN EVÎNÎ-II / Beyt

### DELALA MIN

Delala min tu çend ciwan û şirîn î
Meh li qayî sorgula baxê evîn î

Neqş û hikmet wê li nik te ey delalê
Karxezal î mah û rûyî dilhelînî

Heliyam ez ji eşqa te ey mahî tab
Te dil ji min birî neman min eql û tab

Te rû bi gul kir çaw bi kil kir ey zerî
Were carek zuhreya rûya zemînî

Were nik min tu zuhreya enqa bilind
Çawxezal û pur şepal û tu gewr û rind

Ahuya te dil ker kir ey şepala min
Wek biharê wer carek tu bi mizgînî

Bi mizgînî bêt nik min carek ew perî
Bibînim bejna wê ji pîyan ta serî

Dê gorî kem ruh û canan ez wê demê
Dê bît eyda dil û çawan têr bibînî

Bibînim reqs û semaya bisk û guhar
Birîna dil pê derman kem ez car û bar

Şerbeta lêvan ez tam bi kem carekê
Da bo min bît zîyafet ew bêxemgînî

Bi mizgînî min dîtiba ew sema û deng
Dîtba min ew rûyê şirîn û dêm û reng

Cenga zulf û xalan li ser rûyê rohn
Min tam kirba sureta bi dilê tênî

Lêv şerbet e her dem şekir yê di nav da
Min wexwarba heta pê dibûme sewda

Ger dabane min dê bibe dermanê dil
Dê biba melhema derdê wê birînê

Xwezya ew melhema birîna dilî ba
Bilan jehra destê Zehra çaw bi kil ba

Bila dilê min pê biba pêt û elew
Ew dê bo derdê min biba xemrevînî

Xem revandiban ewê bi zulf û xalan
Destan sêv û hirmî kiribane talan

Da min derdê dilê xwe pê revandiba
Ew nazik rind û delala mehcivînî[321]

Mah û sîma rû bi xal û xweş hebib î
Tu dax û kovana ber dilê Xerîbî

Te kir mehrumê dîdar yê dil perîşan
Ji wî 'umrî paşve tu dê çi bibînî

Birîna derdê evînê derman nîn e
Agrê evînyê sotna derd û birîne

Ger ji zeryê hatiba bo min teklîfek
Derman ban derd û kul xilas ban j'girînê

Min dîtba carek rûqemer û cemal î
Dilbera mehbûb û şirîn xweşheval î

Nîn e mislî te hebît çi cih û erda
Berqa işqê te da min mam dîn û sewda

Te sotim bi derdê evînê dîlberê
Rind û şepal û qametşeng û gewherê

Nîn e min sebr û tebatek ji bêyê te
Carek min silav ba bêhn û rû bi kenê

Dabam kenandin te bi carek qemerê

[321] ????

Bûme ebdal li çolan di nav keserê

Carek te ez kirbame mêhvan di xilwê
Bibayne hembêz digel yek bi evînê

Nazenîna bêwicdan û rehm û şefqet
Bêmirwet û bêînsaf û bê‘edalet

Min ji bo te hizaran kirne gazî qîr
Tu xwudana zulm û xedra rû-zemînî

Li dinê kirme şêt û Mecnûn û Zelîl[322]
Kewtme pença işqê bêrehber û delîl

Kelim di nav behra işqê ez bêmecal
Xerîb im te kuştim bi derdê birînê

[322] Mexdûr, bêçare.

**EŞQ Û EVÎN**

Min ji ewwel ta nehe işq û evîn hebû
Ew bi ‘umrê pîrî çend qatan min zêde bû

Mislê rûbaran bi coş hat û ew newesta
Wek berqê li dil da mewz û pêlan zêde bû

Di subh û şaman muhbeta we l’min xuya ye
Çerx û girdanê eşq im agrê dil zêde bû

Ger xuya bît pê nezer bim bêt tebîta dil
Ger dil temaşa bît husn û hubbek te heye

Husn û hubba wê xweş nîşana levhê dil e
Cih girt wê di dil da bo yek dî cih çuneye

Dil pê rohn bû wekî şewq û şemalan û berq
Rewneq da tac û eywan seray û perde ye

Ger dil da cer’eyek hebît ji nûra Xwuda
Xeberdar e qaînatê çawî dil heye

Ya ez Reb dixwazim çawê qelbê min hebît
Da bizanim qaînat da kanê çi heye

**HIZAR KUL Û DERD**

Kul û derdêt min hizar in her di nav da mame ez
Ne li hîvya wesletê me her li bendê mame ez

Nehat sebra dil û canan min ew bi carek di wext
Derd û agir kewtne dilê min cerg û dil sotim ez

Min birîn kûr bûn di dil da sed fîxan û ah û nal
Êş û talî hatne b'ser da bi gazî fîxan im ez

Dinya l'min kirne zindan agirê dil kirme puxte
Bêhîvî me nav agirê dilî bêçare me ez

Nê ji dûrya dilbera min sebr û sebat çu nîn e
Kirme dil êş û birîndar xisme nav birînan ez

Dame ber tîra evînê xezala çol û beryan
Derd û dax êxîstne dilê min zalimê kuştim ez

Min hewar û gazî tên ji dilê kûr ne razî me
Dil û hinav hişk bûn wek qedîdê ber tavê me ez

Bûyme teyrê perşikestî ne çûn û ne firîn e
Bi tenê mame ji hevrêyan vêmayî şaş im ez

Te êxistme xwûna dilî şev û rojan bêtebat
Sorgewez bûm ez di xwûnê bêkar û mefer im ez

Kewtime nav xewn û xiyalan her demê bêfikir
Agrê dilê min bûye êtun[323] sotim can û dil ez

Terkî dinya bûme mal û serwet min qet nemane
Bûme penaber li çolan im dîn û ebter im ez

Xema dilê min ji dinyayê pitir e bi çend qat
Bûme sergirdan û miflis bêkes û warîs im ez

Emr û ferman ji Xwuda bît delîlek bo me hebît
Feyz û lutfa Xaliq bête ser me rasterê bim ez
Ji berqa çawan bûme evîndar bi derd û birîn

[323] Cureyekê berê spî ye. Bi agirî dikirne kirêç.

Bûm xerîbek bêdost û ‘ehbab bêçare mayme ez

**RONAHIYA DIL**

Were ronahya dilê min dermanê kul û derdan
Bûye perde te tarî kir ronahiya çawêt min

Tu bûyî manî bo dilê xemgîn firsetim neda
Bes e hêdî nede ber min qeyd û bendan rêya min

Xîyal û daxwazêt dilê te nehêlan ey zalim
Bi dildara xweş nekirim daxwaz vala kir li min

Hub û husna wê dilê min da berq û birûsi bûn
Wekî biharê taze û rind ew li pêş çawêt min

Hicab û perdeyan rake bibînim wê cemalê
Bi heft rengan xemilî naz û cilve l'ber çawê min

Yê xemlê diket zêr û zumrût û enber pêrane
Rûgeş û kibar û nazik dimeşît pêş çawê min

Dîlê paqij û temîz d'ket yaxma û talan her dem
Namînin fîkrêt min her dem mişeweş[324] e eqlê min

Min dil daye ber rehma sani' ji xeyrî nîn e hacet
Bi şewq û nûr û serwerî cezba işqê daye min

Were li min tu dilî şa ke bi hub û husna xwe
Dilê xemnak û birîndar bêderman e derdê min

Bi dilxweş û şadî were carek xweş ke dilê min
Wekî rojê şewq û tavê bide wî bedenê min

Bi sed caran dikem hîvî û rica ji zatê te
Nebim dûrê rehmet her demê nazir bî tu li min

Dûr mayme ji her tiştî bi xîyalan vemame ez
Bibî nêzîk bi dilê kûr pirsyar bikî halê min

Bi insaf be digel dostî nebîye dil kîn û req
Ji rehma Rebbî bixwaze du'a ji bo xwe û min
Bike sebrê b'hemî halan hemî kar û hemî dem

[324] Tevlêhev.

Ji Xerîb neke kînê efû ke her xetaya min

## SOSIN Û NERGIZA EZ DIBÎNIM

Sosin û nergiz xuya bûn ez dibînim bêperde ye
Kirme zindanî di hepsê nizanim çi ferman daye

Ji dîdara işqa çaw û biryan mest û sergirdan im
Bûm girtîyê wan çawêt belek bûm serxweşê bêbadeye

Muhbeta wê di dil da dîn kirime şeyda û gêj im
Derkewtim ji dest bûm ebdal terkî qible û secde yê

Şev û rojan wesf û husnêt wê min zikre ser zimanî
Kî xeberdar e b’halê min ecêp agah bi min heye

Nexweşê işq û evîn im ez bêhal û bêpirs mayme
Dê qeyd û zincîran bişkênim qilf û mifteh derge ye

Navê yar du’a û tilisma ser devê min her demê
Gav û deman pê mijûl bim bo min wirda bêşuphe ye

Eger bêjim bi ‘umrê sed salan nakem terka yarê
Belku bît Îsayek bîte jînê wî laşê mirde ye

Belku bibime zînde ez miryê bêruh û can fîl-hal
Bi du’a û hîvîyan rica û kiramet secde ye

Her dem û wextan bibînim ez ewê şox û şepalê
Ew roja ‘eydê bo min qurban û tawaf û weqfe ye

Dîsa min kiriba tewafa wan xal û xetan jidil
Nê ji bo min wek destdana hecerê-eswet[325] qible ye

[325] Navê berê reş ê qiblê ye.

**ŞIRÎNA MIN**

Ey şirîna min tu bi çend naz û cîlwe yî
Bi xemla xwe sor û zer libas û berge yî

Eqlê min te kir yaxma û talan ji min bir
Bi çeşman te şahleyê qesta canê min kir

Perçem û ew xal û xet girtine wan biska
Rewneqa rûyan birand ew nadin çariska

Tutiya sebr û sihar im her dem li ber derî
Qiblegah î bo min her dem pêşber rehberî

Ew perî min dît di sihar da behna enber
Şepal û rind û gul di nav baxi sor û zer

Bi zulf û xalan hate pêş min ew rûperî
Wesf û halêt wê wek meh-cemal û qemerî

Ew neqş û hikmet te ji ehsane'l-xaliqin[326]
Min nedît mislê wê hebin şepal nazenîn

Bes bike digel min cîlweyê işqê bi naz
Cerg û dil te l'min kelandin neman çu niyaz

Min sebr û can dan belaş ku nezer kem her demê
Dîdarê husn û cemal bim xet û perçemê

Lem'a işqa te li min da bûn pêt û 'elew
Ez xerîbê bênesîb im roj l'min bûye şev

Ji evînê şev li min dirêj in naêt fecr
Di wextê zikr û ta'et di xew da mam bêecr

Ne mirn û ne jîn heye di nav halê xeter
Sebr nema Xerîbî ji wî halî bête der

[326] Ayeteke Qur'anê ye. Tê wateya mirovê herî xweşik û jîr.

**WERE CAREK TU KEREM KE**

Were carek tu kerem ke bide min yêk teselî
Da fikr û bîrêt min cema bin nemînim ez delî

Îllata işqê di dil da fikr û eqlan ew dibet
Hizaran kirne dîn û şeyda nizanît çi diket

Mubtelayê eşqê bûye riswa di nav ‘alêmê
Ji işq û muhbetan yê mest û gêj e ew her demê

Ecib nîn e bo wî ku her demê yî serxweş bîtin
Mest û dîdarê eşqê ye ji ber hay xwe nabîtin

Aşiq li cîhanê pêkenî ye her wext û deman
Ji xeyrî eşqa xwe ew nakêşîtin ew çu xeman

Kolehê dergeha yar e xeyrî wî nînin çu xem
Badexwerê eşqê ji ber wê nînin wî çu elem

Evîndarê hay li xwe nîn e her demê gêj û mest
Meşxulê bi ah û nalan şev û rojan pa yê best

Aşiqan cih û mesken wan her deman meyxane ye
Sadiqê wan b’ruh û qelban huzura Rebê xwe ye

**XWEZÎ CAREK**

Xwezîka carek min dîtiba tu bi çawê dil
Ey nazika rind û şepala tu yî çaw bi kil

Ji dîdara te min winda kirin fikr û eqil
Ma heta kengî dê biminî bêsoz û qewil

Ji bo dîdara te pir hezîn û dilkovan im
Cihê sebrê nema dil li ber pêl û evîn im

Sewdaserê dîtna te me ez yê dilbirîn im
Bûme êxsîr li çolan digerim te nabînim

Kewtme nav girdaba eşqê ne sebr e ne tebat
Bûyime ‘erz û dîdar her demê dil bi şewat

Şev û roj di nav pêlêt evînim bêkar xebat
Bûm seyyahê cîhanê çi erdan nîn e sebat

Şu’leya[327] ateşê eşqê dil li min kir kebab
Xistme çengala eşqê bûm sûcdarê bêsewab

Hewesdarê dîtna te dîlbera gerden-şebab
Carek gel min bêye rehmê bidey şirîn-cewab

[327] Şu’le (‘E): Ronahî.

**YARA 'EZÎZ**

Min yarek 'ezîz dît wechê dîlberê
Ewê rûmet wekî gula reng û geş

Mayme li hîvya hatina wê carek
Min nedît ku yek car bêtin ew bi meş

Hîvya wesletê me şev roj bi xiyal
Nahêt nik min ne bi roj û ne şevreş

Her dem bi fîxan û nalîn im bi dil
Kuştim zalimê bêruh kirim bûm leş

Min dit cemala wê bedra hilalê
Dixwazim bête nik min yara qeleş

Bigrim carek ji destê wê qedehek
Ji dildarê zehîr bît bi min ye xweş

Ji min birin fikr û aql mehcemalê
Dinya tev li ber çawêt min ye reş

Ez di behra xeman da mam heyîrî
Eşq evîn û mirn jîn ber dilê min xweş

Wesf û husnêt wê naête terîfan
Rûcemal horîliqa ye xal hebeş

Ez helandim bêhna xal û rûyê wê
Sûsin û reyhan ji behna wê bûn heş[328]

Wek qaz û qumrîyan dimeşêt bi naz
Min dil dihelyêt wekî d'bînim çawêt reş

Ruh û can dê kem şabaş[329] di rêya wê
Ger carekê digel min bît ye dilxweş

Berxwe kir dîba[330] û etlas[331] xeml û xêz

[328] Xwelî.
[329] Bexşîş.

Dîn kirim ser min werkir xwelî û heş

Helyam behna bisk û xalêt rû-mehê
Bêhna misk û enberan ber ye nexweş

Fikr û xiyal herifandin kirme dîn
Min hîvîye neçme mehşer rûyê reş

Êxsîrê çaw û biryan im li bendê
Roja nabînim hal çu nînin keyf eyş

Ger bînim yek car nûra wê ezîzê
Dê dem canî ne bi kerek pênc û şeş

Wer ezîza ber dilê min tu şahî
Bûm zêrevan ber derê te çîlekêş

Dildara dilê min bibînim carek
Nezara rûy neda min yara qeleş

Xwezya carek dîtba halê Xerîbî
Mirye bêruh û can bûye term û leş

[330] Parçeyekê qumaş yê bi kîmet e.
[331] Ev jî qumaşekê stûr û qîmet e.

## 7. HELBESTÊN LI SER XWEZAYÊ

## ÇIME GULORDA RENGÎN

Çûme Gulorda rengîn
Ew welatek şirîn e
Sê tax in bi pêş yêk ve
Ew neqşek îlahî ne

Rahmo û Kepê Dêrê
Şerq û xerbêt gundî ne
Kevya Pîra Serkelê
Şimal û cunûbî ne

Mabeyna wan hudûdan
Ew mekanek zêrîn e
Cihê seyran û geştê
Avêt sar hem şirîn e

Bi bax û sêv û fêqî
Hemî mêrg û kanî ne
Bi rez û gûz û hirmî
Mixabin kes lê nîn e

Çerînin bax û sêvan
Heyfekê pê nabîne
Xirab d'ken rez û mîwan
Kes di gundî da nîn e

Cihê bab û bapîran
Bêxwudan wêt hêlayne
Mekanek wek wî erdî
Li dunyayê çu nîn e

Cihê xweşya jîyanê
Tamek jê bihelîne
Sê sed û heftê kanî
Bawer ke wer bibîne

Wê zozan şanzde war in
Pezî lê biçêrîne
Li seran kevyêt befrê

Ta îlonê dimîne

Digel heyva gulanê
Reşmal waran rêz bûne
Birêt berxan û mihan
Li nizar girt palîn e

Hêroyn û Biharedan
Kende Bahdîn û Mukreyn
Kanya Diza Nisirî
Ew warêt serekî ne

Wek êvarê pale tên
Keyfa wan tu bibine
Holanê û şêxanî
Adetek ji mêjî ne

Govend û seyr û keyf e
Zerî xwe dihejîne
Bi kiras û fistanan
Kesrewanêt rûşî ne

Şivanan pez da danî
Tijî nav da bêrî ne
Barbara berx û karan
Dilê mirov helîne

Ji gazgaza şivanan
Kew li palê dixwûne
Bêhna sosin alalan
Diltengyê dibirîne

Bêhna rihan beybûna
Biheştê li bîr tîne
Ew dilêt ku birîndar
Xeman lê direvîne

Bes e xerîb ‘Ebdullah
Kesê bawer pê nîn e
Wê kitêba xwezayê
Êdî ka tu nexwûne

**ÇÛME SERÊ ÇÎYA**

Çûme serê çîyayekî
Bilind wek stûnê esmanê
Min ew dîtbû bi carekê
Hero ba ye wek zustanê

Nêz bûme Meydan Belekê[332]
Şîn û xweş û merg û kanî
Cihê geştê û seyranê
Serî rast wekî deştekê

Befr û ba ye li wê derkê
Weku meha wê kanûnê
Me şek çerandin salekê
Bi vê xweşîya jîyanê

Muhît her weku qodyekê
Tête pêş çawêt insanî
Mirov bînît her derekê
Ew her weku nava xanî

Min firset heba carekê
Dîtiba bi saxya canî
Gehiştbam nik sosinekê
Gotbayê nesaxya canî

Dê bêjte min ew carekê
Bîte dermanê bedenê
Ez wê bêhn bikem carekê
Da dil bi wê têr bikenî

Ez li wêrê bûm feslekê
Sosin hişk bû ser û bin e
Şîn dibît her biharekê
Carek dî tête jîyanê

Xwuda dane bo karekê
Di nav nizama cîhanê

Her gavek em li barekê
Ew diket zikra Xwudayî

[332] Navê zozaneke Geverê ye.

Her yêk bi reng û rûyekê
‘Emr û fermana wî dayî
Di ‘emrê wî her gavekê
Me nîn e karê isyanê

Em pêk tînin her ‘emrekê
Tên ziman ‘emrê rehmanî
Xerîb jê bigre eqlekê
Ji ewê gula cîhanê

**ÇÛNA SEYRANÊ**

Dixwazim biçme seyranan
Di nav gul û gulistanan
Seyrê bikem li zozanan
Xeman revînim vê carê

Nav sosinan li ser şaxa
Digel dostan û ortaxa
Pêk ve bigeryên qonaxa
Bo dilan bînin biharê

Bi dilxweş bikeyn geryanan
Digel alal û reyhanan
Bideyne destê cîwanan
Bigeryên em bi hevkarê

Wekî bilbil digel gulan
Biken em seyra wan dilan
Aş bikeyn em zîz û silan
Li xwe rohn keyn şevêt tarî

Şevêt reş bîne jîyanê
Silav kem ez li rihanê
Tayek dem destê ciwanê
Da keyf bêtin bi vî jarî

Keyfa gel alal beybûna
Digel dost û xizm û xwûna
Bîte melhema birîna
Wek dermanê nivişdar î

Qest dilxweşîya dostan e
Seyra nav bax û bostan e
Evîna dil gel yaran e
Eşq û muhbet pê dibarî

Eşq bo hindekan bela ye
Dîn û îman pê fida ye
Ew ji heqîyê cuda ye
Xirabyêt diken dijwarî

Eşq miraza dildara ye
Qetrek ji huba Xwuda ye
Evîn dilê temîz da ye
Têt ji rehma Rebbê Barî

Dil xwazît cejn û seyranê
Digel yaran li zozanê
Gel hev wek şem’ û perwanê
Xerîb ditirsît ji narê

**DEŞTA GEVERÊ**

Berê xwe bide vê deştê
Rast e wekî nava xanî
Parçek ji baxê beheştê
Xwuda daye vê cîhanê

Deştek rast e û ya şîn e
Di nav da gundan bibîne
Hemî dura û zevî ne
Cihê malat û heywanê

Rojhelatê Şemzînan e
Rojavayê Şakîtan e
Qible cihê Doskiyan e
Bakur Dirî[333] ta Îranê

Mehdûd e bi van hudûda
Nehêl diçît di navê da
Hemî gund in di dorê da
Wekî helqê li doranê

Meşhur bi bajarê Kengê
Nav deşta pûş û peşengê
Refêt teyran û qulingê
Keyfxweşyê dide insanî

Keyfxweşya kiç û riwalan
Jin û piçûk heta kalan
Hemî pêk ve dibin pale
Giya durûn bi tirpanê

Palehîya li wê deştê
Nabin şeqî mirov xweş tê
Herwekî diçiye geştê
Rûniştna ser Mahrankanî

Avêt şirîn û yê tezî
Hindî vexwey jê nabezî

Gera Birêm wek Erezî

[333] Dirî, navê eşîrete Geverê ye.

Derdikevît bin helanê

Kanyêt xweş û ava zelal
Wexta biharê nû bû sal
Li wê deştê teyr û tuwal
Li welat diken ciwanê

Ciwaniya deşta Gever
Wextê xemilî kesk û zer
Çiyayêt bilind befr li ser
Hewayê wê şifa canî

Hewayê xweş li zozana
Çiyan şax havêt ‘esmana
Eve neqşekê Xwuda ye
Ew hikmet e me nezanî

Neqşê wî nayêt xeberdan
Neqşê wî ye zor yê ciwan
Dor deştê nêre li çîyan
Wek dîwarê dora xanî

Li dora deştê bilind in
Serî zozan nav da gund in
Mil dane hev bi govend in
Dest girtine bi şêxanî

Deşt girtin mil bi hev ra ne
Serê çiyan tev zozan e
Barbara berx û mihan e
Wextê ku pez tête danî

Pez tê danî bêrî nav da
Xwezya şivan bam gel wan da
Hevpar bam jîyana wan da
Dê zanîba tama jînê

Xwudanpez bam serê çiya
Geh li deşt geh li geliya
Ez jîyar bam gel wehşiya
Çêtir ji ferdêt zemanî
Ez şivan bam li zozanê

Hero pez înaba danî
Wextê şîr dikir qazanê
Vexwarba siheta canê

Şivanî li te bû hewes
Tu pîr bûyî êdî te bes
Xanî li te bûye qefes
Tu, ey Xerîbê Sûsyanê

**GULA MIN**

Min gulek dît nav gulzara
Bêhn birandî zor xemgîn e
Bêhna wê wek ya enberê
Nihe ew bêhn pêra nîn e

Gula min çûye zozanan
Seyrê diket gel şivanan
Bêrî ye gel bêrîvanan
Bêyî wê min sebr çu nîn e

Min seyrek kir li zozanê
Kewya Pîr û Singemanê
Da b’zanît gula min kanê
Sebr û qerara min nîn e

Min pirs kir ji hemî gula
Serêt bilind şax û mila
Gul bûne kovana dila
Got wesfêt gula te çi ne

Gulek rengê keskesor î
Şîn dibît çîyayêt jorî
Beyî min zeman naborî
Nebînim rawestan nîn e

Got wext xilas gul çirmisîn
Direngwext e gul qerisîn
Ji xunavê gul fetisîn
Nihe wextê gulan nîn e

Min pirs e ji payîza reş
Te dilê min kire nexweş
Te l’min bezre kir gula geş
Hal û wext li min birandin

Xeta min nine l’vê derê
Bera xwe b’de befr û sirê
Bo min neman mesken û rê
Min hay ji gula te nîn e

Befrê gul yêt bezre kirî
Çaw bo gulê diken girî
Dil bûye cihê agirî
Cihê xweşyê min çu nîn e

Paşî befrê têtin bihar
Kî dimînît kî d’bît xwusar
Xerîb tu b’dilê birîndar
Bihar bo te çi kar nîn e

## GULA ‘UMRÎ

Gula ‘umrê min şîn bû
Di fesla vê biharê
Bêhn û bûya wê xweş bû
Wek sosina nizarî

Bilbil ji ber serxweş bû
Xwûnît fîxan û zarî
Havîn hat û ku zer bû
Neşêm bikem çu çarê

Payîz dê bêt û hişk bû
Ji ber kewtme xusarê
Dê şîn bîtin ji nû ve
Carek dî bêt diyarê

Gula ‘umrî darek e
Li ser jîna heyatê
Fêqî didet carekê
‘Esil ji xak û av tê

Hijyana wê zikrek e
Ew diket tesbîhatê
Xwarina wê karek e
Her kî zanît qîmetê

Her kî qîmetşinas e
Dê bizanît dunyayê
Nakin ‘umrê iflas e
Wek xermen daye bayî

Ne xwarin û libas e
Wê mesken û serayê
Bi xwudan û esas e
Heta kata giyayî

Ew ûstayek zor xwas e
Tişt çêkir bêkêmayî
Bênoqsan û kêmas e
Ew nîmetê wî dayî

Neqşê danay etles e
Erd sema hem fezayê
Ew qise êdî bes e
Em lê bikeyn dûmayî

Sin‘et ji sani‘ b’nase
Bike zikra Xwudayî
Bike mu‘mînek xwas e
Ya Reb tu ‘Ebdullayî

**GULBEROJ**

Min gulek dît zor bilind e
Ye ciwan û law û rind e
Wê mesken baxçe û gund e
Ew nebûya gulyaban e

Li nav gulan serî rast e
Li ber rojê diraweste
Nîn e wê daxwaz û qest e
Yekemîn gula cîhan e

Guleke li nav zevîyan
Naçît serê şax û çîyan
Hevkar e digel gundîyan
Wê mesken girtî l’bostan e

Wê mesken bax û baxçe ne
Bi rûyê insan dikene
Bêjît bo we bi fayde ne
Bi me hûn diken jîyanê

Bi navê xwe gulberoj im
Bo hewe ez yê dilsoj im
Gel hewe ronkan dirêjim
Gulek hemberê min kanê

Guleke ji gulan cuda
Abid in bi emrê Xwuda
Me dohn bo we d’bîte xida
Bo we dibît rizqê xwarnê

Hûn abid in qible ke’be
Em jî digel wey ne teb’e
Wiha nînin lêb û le’be
Digel me werne wijdanê

We îbadet tirsa doj e
Me hisab nîn e çu roj e
We ke’be qibl e me roj e
Me nîn e qibleke sanî

Em li pê rojêt zivirin
Şûn û zer in reş d'fikirin
Towekî j'rojê digirin
Ew tête halê çandinê

Çandin û şînbûn sin'et in
Dindik û rûn jî nîmet in
Ji bal Xaliq hat hikmet in
Rizqek e daye insanî

Gulberoj im dilbirîn im
Her dem belgan diwerînim
Zikra Rebê xwe cih tînim
Nabime ehlê isyanê

Nîmet im bi emrê Cebar
Xwarin im bo yêt gunehkar
Bi nezanî bûn cenewar
Asî bûn emrê sultanî

Nîmetên dane me zor in
Pê nizanin em nankor in
Bi curm û guneh qusûr in
Bi nîmetan kir kufranî

Gulberoj dibêt feqîrî
Tu dît bi ciwan û pîrî
Tu nezan î nexebîr î
Cerg û birîn dilkovan î

Xerîb im ser bi heway
Nebû hindî kata gîyay
Li nexweşxanê bendê may
Kewtîye fikra zemanî

**HAT NEWROZ BIHAR E**

Hatî Newroz ku bihar e
Teyr û tiwal bûn dîyar e
Cemed sist bû li nizar e
Ji ber tavê di baranê

Baran barî hûrdexunav
Cemed nema bûye lolav
Qaz û quling wê li hindav
Ew diken karê hêlûnê

Teyr û tuyan hêlîn çêkir
Belekan xwe lê bicih kir
Befrê karê çûna xwe kir
Nema çi ji zivistanê

Nema befir dunya reş bû
Bihara me çi qas xweş bû
Min silav li gula geş bû
Mala xwe lalê vedana

Me çadir dana ba gulê
Sosin şîn bûn serê milê
Deşt û çiya tev kemilî
Xweş têtin bêhna rihanê

Xweş têtin bêhna alalan
Zerî û genc û riwalan
Keyfxweşiya pîr û kalan
Pêk ve ew diçin seyranê

Seyrê diken hemî pêk ve
Şahî diken ew gel yêk ve
Mizgînîyan didin yêk ve
Digeryên li nav çîmenî

Çîmen çêbû wekî sala
Têt bêhna sosin alala
Nêrgiza xwe da nihala
Bilbil digel wan dikene

Şalûl û bilbil dixwûnin
Şivan mihan diçerînin
Cotyar ê tovî diçînin
Borî bîst çarê nîsanê

Nîsan borî wekî cara
Berx û miyan barebar e
Birin bo bihara war e
Li me hat wextê zozanê

Li me hat wextê çadira
Me danabû mêrg û gira
Reşmalêt me sira sira
Pez wê li ber tête danî

Pez hat danî bêrî nav da
Jîyan xweş e digel wan da
Mirov ji keyfa d’bît sewda
Xwezya ‘umrê vî zemanî

## HEYF E KU NAVÊ WÊ GÎYA

Min sosinek dît ser çîya
Heyf e ku navê wê gîya
Daxwaza nexweş tawîya
Birînan ew dikewîne

Birîna leşî hişk diket
Dilê evîndara xweş d’ket
Şeva tarî ew geş diket
Ben û rengan ye zêrîn e

Rengê wê wek zerê zer e
Bêhn û bûya wê enber e
Wekît xemilî dîlber e
Mîslê te nînin vê dinê

Bêhna te wek ya biheştê
Rengê te li mirov xweş tê
Xwezya gel te bikem geştê
Xema dilan direvînî

Tu sor û zer î wek findê
Serê şaxan û bilinda
Daxwaza lawan û rinda
Li rûyê mirov dikenî

Nesrîn ji te ye şermîn e
Bêhna xwe vê ra b’gehîne
Bila nemînît xemgîn e
Ew jî bilan bêt jîyanê

Carekê ew bi te şa bît
Di nav gulan da xuya bît
Serê wê bi ewraz rabît
Carek biket ew kenînê

Ya dikenît canemerg e
Cil û bergan ew ye kesk e
Ew dibêjît ‘umrî bes ke
Bo biharê be mizgînî

Mizginya wê ye şirîn e
Çaw di kesk in reng yê şîn e
Li ser erdî kêm dimîne
Diçît ew bi dilhelîn e

Dil hezîn e gel Xeribî
Ji dinê nagrît nesîbî
Zû diçîtin bi ecêbî
Bi kovan û dilbirîn e

## PAYÎZ E

Payîz e daran belg werandin
Gul hişk bûn rihan per ruxandin
Nemaye bêhna sosina zer
Wê ji ber befrê ser nuxandin

Ser nuxandin li bin çadirê
Hişk bûn ew ji ber befr û sirê
Reng nemaye ji mij û hurê
Bêhn û rengêt wane birandin

Bêhn û reng li wane nemane
Serê çiya tarî duman e
Nava deştê mij û moran e
Cihê bo seyrê nehêlandin

Bo me nema cihê seyranan
Zerî wê naçine zozanan
Sir û serma kewte kolanan
Qeyd li piyêt me şidandin

Befir bo me her wekî qeydê
Nemaye cihê rav û seydê[334]
Xerîb tu yê kewtiye bendê
Te nemaye wextê geryanan

[334] Seyd (‘E): Nêçîr.

**SOSINA ZOZANAN**

Carekê çûme zozanan
Gel celebê şek beranan
Min seyrek kir li rihanan
Heyran bûm bêhna sosinê

Sosin zer e bin yê şîn e
Bêhnek heye dil d'helîne
Ye rûgeş e rûkenîn e
Nînin mislî wê lê dinê

Alala min sor û şîn e
Gulek lawe bêhn çu nîn e
Ye stûxwar û ye xemgîn e
Her dem diket ew girînê

Sosin dibêjte alalê
Hey te jarê te 'evdalê
Tu neke we kalekalê
Tu bo çib xwe razî nînî

Razî be tu b'lawînya xwe
Bicih bîne wacîba xwe
Nekeve derdê bêhna xwe
Xwuda em înan heyînê

Gazindan neke j'Xwudayî
Her yekê lawînyek dayê
Her yek bo tiştekî dayê
Ji bo hindê înan dinê

Min nav sosin yê te alal
Tu min bo xwe neke mîsal
Xwuda b'min da ye bêhn û hal
Nîn e cihê xeyîdînê

Sosin dibêjît dewa me
Daxwaza derd û kula me
Ez kulîlka ser saxa me
Bûme derman bo birînê

Rihan dibêt ez jî heme
Ez meşhurê bêhna xwe me
Ne kêmtirê rêza we me
Bêhna xweş dev min dibînî

We jibîr kirme rihan im
Xwudanê bêhna ciwan im
Daxwaza law û gencan im
Bûm miraz ji bo evînê

Evîndar aşiq in bo min
Ber bêhna wan e kata min
Daxwaza wan e bêhna min
Were da behnê bibîne

Bêhna min wek ya dî nîn e
Wextê bayî dihejîne
Katêt min bêhn dibarîne
Çan û karan tînte jînê

Binevş d’bêt ez jibîr kirî
Aşiqan bi min zikr kirî
Navê min li gencan kirî
Bo wihê înkar çu nîn e

Înkar nîn e vê gotinê
Hindî d’ken behsê rihanê
Sosin meşhur e l’cîhanê
Dilê me kewte girînê

Her gav rondikan d’werînin
Di sernişîv û xemgîn in
Bo wek hevalên xwe nînin
Em diken girî û şînê

Gulberan bêjît navê min
Bo nabêjin hevalêt min
Rohnkêt reş tên ji çawêt min
Dilê min wê bû xemgîn e

Hubra ewil j’min çêkirin
Xet û kitabet min kirin

Bo çi hatme jibîrkirin
Dawet dikem bo zanînê

Gulan hemyan reng ji min in
Bo min şahid gulêd dînin
Min reng hene bêhn çu nînin
Bo çi naken ew wîjdanê

Em gul hemî yêk nebat in
Sifet cuda ji yêk zat in
Bi hikmeta Xwuda hatin
Bixwînin emrê Qur‘anê

Çi insan bît çi nebat e
Murada wan bo yek zat e
Xerîb dilsoj û şewat e
Bi nalî ah hem evîn in

Şîn dibim li sirt û çîyan
Ez rewş im li hemî cîyan
Bûm hubrê xet û yazîyan
Bûm murekebê zeman e

Min cih çîya û zozan e
Li ser şax û zinaran e
Ez bûm hubrê qeleman e
Xetê bi min çend ciwan e

Bi navê xwe gulberan im
Xenaya destê lawan im
Rewşa war û zozanan im
Min mesken sirta Singeman[335] e

Ciwanya xetê katiban
Bi min dikir ewel zeman
Hubir nebû hemî deman
Xerîb bo şahidê min e

[335] Zozaneke gundê Gulordê ye.

## 8. HÎKAYETÊN MENZÛM

### HAZIRÎ (1)

Paş mirna Xetîce û ‘Ebûtalib
Ji xeyrî Xwuda neman ewan sahib

Ev zêde diçûn bo Hebeşîstanê
Li wan teng bû çar eqlîmê cîhanê

Li ser wane zêde bû zulm û şiddet
Jîyan li ewan bûye zor û zehmet

Ji Medînê ew hatin çend qebîle
Ewan hec ji bo xwe kirbû wesîle

Wan dîtin şidetek zor ye giran e
Ehlê Medînê gotine ewane

Kan werin koçber bibine Medînê
Hûn dê digel me xweştir biken jînê

Mûşrîkan dîtin ew her du qebîle
Ew musliman bûne bêfend û fêl e

Mekkehê muhasire zêde kirin
Rêya jînê li mû’minan teng kirin

Şewê da bi punhanî koç dikirin
Du du sê sê qesta Yesrîbê d’kirin

Wextê dît sehabe çûne Medînê
Ew dê li wêrê gel me kewne kînê

Ew dê rojek wê tolê ji me veken
Nihe da nehêlin ku ew koç biken

Rêya ticareta me wê derê ye
Ewan li me girtin derge û rê ye

Mezinêt wan kewtine nav telaşê
Li me girtin rêka jîn û me’aşê

Li Dar'ud-Nudwê[336] da hemî cema bûn
Rê û tedbîr wan ji bo xwe danabûn

Di navbeyna Xwuda şêwirek kirin
Nabîtin Muhemmed bête koçkirin

Gotne 'Ebûcehlî fikra te çî ye
Kuştinê zêdetir çare çu nîye

Gotnê Haşimî gelek in pehlewan
Me nîn e quweta xwûnê digel wan

Her qebîle yêk biçîte kuştinê
Hingî neşên biçine tolvekirnê

Dê mecbûr bibin ew ji bo dîyetê
Neborînin ku hûn evê firsetê

Hemîyan qebûl kirin ev tedbîre
Bo kuştinê hatin bi rumh û şûr e

Hatine dora xanîyê pêxember
'Ebûcehl û Hakem bi wan ra hember

'Ebûleheb û hem Ibnî Umeyye
Çendek dî ji mûşrîkan gel wan heye

Cebraîl hat û wehî ji bo anî
Gotê bike karê koça cîhanî

Ji bo koçberîyê tu bike tedbîr
Xwuda refîq kiriye 'Ebûbekir

Resûlullah ji 'Elî kir daxwazî
Ka tu were di cihê min da razî

Da nezanin ku ez wê derkevtîme
Nobeta wan dora xanî bidome

Da fikir biken ez di nav cihan im

[336] Navê cihê kombûna muşrikên qebîleya Qureyşîyan bûye.

Ca refîqê xwe hişyar kem bizanim

Gelek emanet di destê min da ne
Ewan bikeyî teslîma xwudan e

'Elîyê Xwudanê wechê mukerem
Raza ser doşeka resûlê ekrem

Bi ser xwe dada hirqeyê wî yê şîn
Pêxember derkevt gel xwendina Yasîn

Ewî wextî resûlê Rebê Semed
Ewilê Yasîn ser çengek axê xwend

Ax havête ser serê wan û derkevt
Mane we kor û qer û gêj û sermest

Hevalekî wan hat û lê nezer kir
Got hûn hatine vêrê hewe çi kir

Got em nobedar in derê Muhemmed
Got Muhemmed çûye berê çend sa'et

Ax havêtye ser hewe bûne gêj e
Bi xwe jî wê çûyî gelek ji mêj e

Pê kenî û gotê xwe bi hiş bînin
Wê axê tozê ser xwe bihelînin

Gotinê Muhemmed wêhe razayî
Paşî dîtin 'Elî ye cih da mayî

Gotine 'Elî Muhemmed li ku ye
Gotî ez nizanim bi ku da çûye

Şaş û gêj mane we ew di cihî da
Mekke serûbin kir nedîtin tê da

Wan di nav şehrî da şayî'e kirin
Ew gotinete ewan beyan kirin

Me ev şerte yê danaye meydanê

Her kî yê Muhemmed bînît vê anê

Em dê bideynê zêdey sed hêştira
Digel qumaşî û zêr û hem para

Geryan li çol û deşt û hemî çîya
Peyda nekirin çu mekan û cîya

**ÎSRA (2)**

Ey nebîyê cumle ‘alem
Resûlê şah û subhanî
Di vê sala ku tu matem
Bo te hat lûtfa rehmanî

Xwuda lutf li te zêde kir
Dergê rehmê ser te vekir
Xema giran li te kêm kir
Tu bûy mêvanê sultanî

Şevek di xew da razayî
Cibrîl hat ‘emrê Xwudayî
Boraq îna muheyyayî
Tu de‘wet kir bi mêvanî

Tuy mêvanê şahê ekrem
Te seyran kir Cibrîl rehber
Boraq anî yaqût cewher
Pêrûyek[337] xas bo te anî

Boraq reng spî ji nûrê bû
Hêz û çûyîn ji berqê bû
Beyna merkeb hestirê bû
Bû suwar li wî heywanî

Bi ‘emrê Xaliqê baqî
Suwar bû ev li Boraqî
Bû rêwing berev afaqî
Firî bo Qudsa nûranî

Her gavek bi hukmê çavan
Mekan têk çûbûn ji bo van
Gehişt wêrê ev bi seyran
Bûy îmamê enbîyanî

Tuy îmamê Heremeynê
Tuy resûlê seqeleynê[338]
Tuy muselyê qibleteynê[339]

[337] Ji heywanên bar û suwarîyê re tê gotin. (xelet e. Perû yanî “diyarî” ye. belkî mecazen boraq e.
[338] Her du dinya.

Xwudanê cum’e ‘eydan î

Tu îmamê pêxemberan
Şefi’ê cin û beşeran
Xwudanê rewz û kevseran
Tu serwerê esfîyan î

Boraq derê beytê bend kir
Ruh’ul-Qudûs[340] rehberî kir
Pês ve bîr wî îmamî kir
Li pêş ruhêt enbîyanî

Du rek’et wan kirin nivêj
Ne kurt bûn û ne jî dirêj
Paşîn Cebraîl hate pêş
Du qedeh ji wî ra anî

Yek şerap tê bû ya dî şîr
Di her duyan fikrî Beşîr
Şîrî li wî kirye tesîr
Wî hemd dît siheta canî

Cibrîl kir hemda Xwudayî
Bo xwarna şîrê înayî
Bo ‘Ehmed xêr kir dûmayî
Şerap ‘elamet bo isyanî

Ji Musa heta Îsa yî
Bû cihê wehya Xwuda yî
Warê Dawud û Urya yî
Memleketê Suleyman î

Cihê Eyûb û sebra wî
Gel Zekerya û zebha[341] wî
Hem luqman û hikmeta wî
Erdê Tevrat û Levhan î

Ev cihê jîna beşeran
Warê wehya pexemberan

---

339 Behsa du qiblan dike: Ka’bê û Beyt’ul-Muqedes.
340 Ruh’ul-Qudûs: Cebraîl.
341 Zebh (‘E): Serjêkirin.

Erdê feqî û şeceran[342]
Pîroz bû ‘emrê Qur‘anê

Cihê landka pêxemberan
Erdê nebî û serweran
Warê Yehya û dijberan
Cihê Zebûr û xwendinê

Mesken bo dînêt îlahî
Cihê ref’a ruhullahî
Gel berê Sexretullahî
Hemî dîtin bi yêk anî

Piştî ku isra temam kir
Mîrac li wêrê cuda kir
Guhdarya ‘emrê Xwuda kir
Mîrac ket xurfet’ul-eynî

Dê mîrac ket hizr û sur’et
Tejî tê da sir û hikmet
Bi ‘emrê wî şahê qudret
Mû’cîzat danîn meydanî

[342] Şecer (‘E): Dar.

**MÎRAC (3)**

Di wê Qûdsa zor mubarek
Teşrîf kirê Resûlullah
Taze çêbûn ev bi carek
Nebî digel Xelîlullah

Tu dê biçî bo Mîracê
Xwudanê fexr û mînhacê
Sahibê textî û tacê
Dê Mîrac ket Resûlullah

Çû ser berê mûelleqî
Bi ‘emrê Rebê mutleqî
Dê bît mêvanê Xaliqî
Dê Mîrac ket Resûlullah

‘Uruc[343] bît eşrefê beşer
Refîq bû namûs û ekber
Dê çît ba Xaliqê serwer
Dê Mîrac ket Hebîbullah

Xwudanê fedl û ihsanê
Nebî îna ji cîhanê
Da b’ket seyra lamekanê
Bo ‘esman çû Nebîullah

Suwar bû li asansorê
Bo keşfa hikmet û sirê
Xwudayî dana ber ew rê
Dê seyîr ket Resûlullah

Esansor bo ji îlahî
Bo nazil kir bi sanahî
Lê suwar bû keyf û şahî
Dê rûcû’ ket Hebîbullah

Nesîb nebû ins û cana
Tu dûr bûy wext û mekana

Bi rê kewt berew ‘esmana

[343] ‘Uruc (‘E): Bilindbûna ber bi ‘esmanê.

Dê Mîrac ket Nebîallah

Seyrek xasî pêxemberî
Dûr e ji eqlê beşerî
Bêqudret in bo xeberî
Me bawir e Resûlullah

Dergeh ‘esmanan wan vekir
Selamek li bab Adem kir
Nebî pirsyar ji Cibrîl kir
Bo min bêje Qudretullah

Xitabet gel bab Adem kir
Seyr li ‘esmanê ewil kir
Çavdanyek li melekan kir
Çi qas zor in ev Cundullah[344]

Nezer da gelek ‘ecêban
Ew nahên hed û hisêban
Nizanim danme kitêban
Bawer naken ‘Îbadullah

Tu xêr hatî salih ewlat
Fedla Xwuda ji bo te hat
Ji xeyrî te nebû qismet
Nesîb te bû ew Lutfullah

Rêwing e qonaxa duyê
Melekan helgirt çûn rûyê
Gehîşt ‘esmanê sanîyê
Dîtin Yehya û Ruhullah

Yûsif ‘esmanê sêyan da
Ser û rûyan rewnaq veda
Selamek li zatî wî da
Ji wê fedla Subhanellah

Di çaran da Idrîs nebî
Di pêncan da Harûn nebî
Ser û rihên hemî sipî
Şeş da Mûsa Kelîmullah

[344] Leşkerên Xwuda.

Me dewam kir li ser wê rê
Heftan da Îbrahîm wêrê
Ber derê Beyt'ul-Me'mûrê
Şiklê 'Ehmed Resûlullah

Dest pê kir qonaxa çarê
Melek mane li wê derê
Ser perê Cibrîl dabû rê
Qesta lalê Celîlullah

Got Cibrîlî bilind kirim
Nêzîk 'erşê Xwuda kirim
Dengê lewh qelem his kirim
Neqşê qeder bi Emrullah

Hatin Sidr'ul-Muntehayê
Darek mezin bênihayê
Ser cennet sema dinyayê
Kete sîber Qudretullah

Ew nihayeta mekanan
Hudûdê 'ilm û kelaman
Bo melek û ins û canan
Ew der xas e Mekanullah

Cibraîl izhara xwe kir
Şehsed qened per wî vekir
Resûl bi hikmet seyir kir
Ji ewî sûn'ê Maşallah

Gote Cibrîl nebyê serwer
Nehe paş jî bibe rehber
Da ez nemînim bêxeber
Dereng nemînim Iznillah

Gotê ey seyîdê enwer
Bi nav û namûsê ekber
Da bi hev ra biçin pêşber
Muşahid bin Cemalullah
Got min quwet nîn e carek
Neşêm ez pavêjim gavek

Dê bisojim ez der anek
Dê bim asîyê Emrullah

Bo min rûxset bû ev dere
Dûr e ji eqlê beşer e
Suwar be ref ref pêş here
Da cih bînî tu Wehyullah

Ref ref hat û wî selam kir
Me ji heyya wî fam nekir
Helgirtibû ew suwar kir
Bire pêşber Cenabullah

Resulê her du kewneynê
Zemanê turfet'ul-'eynê
Gehişte qabe qewseynê
Li wêrê bû Kelîmullah

Bi xelatan ew ikram kir
Sir û hikmet bo beyan kir
Lamekanan da seyran kir
Wî bi emrê Qudretullah

Sê xelat ji bo kirne 'erz
Ewel nivêj ser kire ferz
Digel weqtan usûl û terz
Emir kiribûn Hukmullah

Nivêj sibê û êvaran
Xwuda bo îna pênc caran
Terka wan nîn e çu karan
Wextî da b'ken Selatullah

Xelatê duyê bo xêrê
Du ayet dawya Beqerê
Kirne mizgîn li wê derê
Da bicih bêtin Emrullah

Xelatê sêyê bûye we'd
Yê wî nasît Rebê Semed
Li cehnemê nabît ebed
Dê xilas bît bi Lutfullah

Vegerya bi emr û ferman
Înan wî ji Rebê rehman
Bo mû'minan kirne beyan
Îzah kir Mû'cîzatullah

**JI MÎRACÊ ZIVIRÎN (4)**

Çûna Mîrac girîng e islamê da
Isra û Mîrac pêk ve şevekê da

Mû'cîzek mezin e bona mû'mînan
Nahête hedê 'ilmî û xwandinan

Derkevt hudûdê zeman û mekanî
Gelek wêvetir çûne ji 'esmanî

Hind geryan û seyranî ewî dîtin
Sirêt xeybê Hikmetullahî dîtin

Hind kelam di gel Xwudayî xeber dan
Di nav 'alema xeybê da kir seyran

Dîtina ewan biheşt û cehneman
Dengê nivîsina lewh û qeleman

Axivtin nehwêd hizar peyvan zêde
Vegerya ve hêj ta nebû sipêde

Di şev da zivirî û hat Mekkehê
Kewte naw fikr û gumana qisehê

Wextê vegerya ev qise kir beyan
Mûşrîkan pêk ve inkar kirin heman

Pêxember çu caran neçûbû Qudsê
Qureyşî waqif bûn bi wê hadîsê

Gotinê were tu rûnê li qayê
Bo me b'ke behsê Mescîd'ul-Eqsayê

Ji mescîdê gelek pirsyar jê kirin
Xwuda ber çavên wî perde rakirin

Ji 'elametan ket ket kirin pirsyar
Hebîbê Xwuda cewab kirin yêk car

Ji dergevan heta neqş û nebatan
Situn û şebak û ewan mûşkatan

Wek û mir'atî hemî tê da dîtin
Şûna îmanê gelek tişt dî gotin

Kewtine nava inadan û hîlan
Dest havêtin pirsyar û fend û fêlan

Hindek dî pirsyar înane wucûdê
Kanê bêje karwanê me li ku tê

Tesadûf kir te digel karwanê me
Tu tiştek jê bizanî bêje bo me

Gotê min dît karwanê wan kesan e
Li Rewhayê karwan dibû rewane

Hêştirek berze bibû lê digeryan
Yê nêzîk bûye bo wane vegeryan

Ser barê hêştirek hebû ava sar
Têhnî bûm min av rakir û jê vexwar

Paşî karwanê da çend mirov hebûn
Çend bar û çi eşyayên wane hebûn

Hêştirek turincî hebû di nav da
Ser barî xeralek dirûyî ser da

Filan rojê di wextê Rojhelatê
Karwan dê dîhar ketin li welatê

Roja beyan kirî sihara wê da
Karwan dîhar kir di Rojhelatê da

Çûne nîk 'Ebûbekirî wê demê
Pêk ve cema bûn di nava heremê

'Ebûbekir got hewe çî ye xêr e
Bo çi hûn hemî cema bûne wêre

Gotin em hatne da siran beyan ken
Rastî û direwan em jêk cuda ken

Hindek gotin hevalê te gotine
Di nav eqlê beşer da cih çu nîn e

Kanê gotina te ji bo van çî ye
Ev gotine layîqê eqlî nîye

Sidîq got ger ‘Ehmed bêjît yeqîn e
Çunkî muxalif gotin ne gotin e

Leqeba Sidîqyê ji wêrê wergirt
Tesdîq kir û pişta hevalê xwe girt

Paşî gotin ev sêhreke mezin e
Me bawerî bi wihê çu car nîn e

Dîsa inkar û hem reda wê kirin
Li ser kufra xwe man û israr kirin

Mû’cîzat ji eql û fikran cuda ne
Li navbeyna Xwuda û nebîyan e

Mû’cîzata mezin bo me Qur‘an e
Eve sir û hikmet tejî tê da ne

**DESTPÊKA SEFERÊ (5)**

Piştî bo wî hatî ‘emrê hicretê
Rabû ve resûlê Rebê izzetê

Çû bo mala ‘Ebûbekirê Sidîq
Bo hicretê ji me ra hatî tesdîq

Tuy refîqê min ji bo vê hicretê
Tu dê bîye refîqê min cinnetê

Li wêre îmkanê teblîxê nîn e
Rabe dê koç kene şarê Medîne

Di bey’eta eqebe[345] soz bi min dan
Dê min biparêzin bi ruh û hem can

Rabe bike lezê da em derkevin
Bi me nehesyayî jê re dûr kevin

Min nemaye tehemûla ‘ezaban
Ev zulma li ser min û hem sehaban

Terka mekanê muqedes cihê min
Jê dûrbûn zortir e ji mirina min

Ema dê cih bînin ‘emrê îlahî
Me dê teblîx li wêrê bît sanahî

Bi punhanî derkevtin çûne Sewrê
Bo Medînê ew her du bûne hewrê

Wextê pîlanêt wan bicih nehatin
Hemî bi dor ‘Ebucehlî werhatin

Ji her qebîleyekê yêk pehlewan
Ew mucehez kiribûn bi sîlehan

Ji qebîla Ben-î Muclid du rehber

[345] Eqebe: Navê cihê ewil e ku hindek muşrikan soza piştevanîyê dane Muhemmed pêxember. Peyva “Bey’et”ê jî di wateya sûnd û peymanê da hatiye bikaranîn.

Gotê zû peyda ken rêya pêxember

Wan înan heta ber derê mexarê
Xwuda du mehluqat êxistin dewrê

Wezîfedar bûn bo resûlê cîhan
Yekê tewin lêda yê dî hêk danan

Gotin çu kesek nehatîye vêrê
Pêş ‘umrê Muhemmed hêlûn li wêrê

Ew li wêrê nedîtin û vegeryan
Hatin û belav bûne serêt rêyan

Evarya pêncşemê çûne mexerê
Cum’e şembî û êkşembî man wêrê

Amir hebûye ew kurê Fûheyrî
Şivan bû ber pezê ‘Ebûbekirî

Hero pez dîîna dora ewane
Wî şîr didot ji bo wan her duyane

Sê şev û sê roj ew man li mexerê
Heta ku wehî bo hatîye xwarê

Kurê ‘Ebûbekrî navê ‘Ebdullah
Ciwanekî paqil bû ew maşallah

Sibe zû radibû heta êvarî
Gel mûşrîkan digerya ew li şarî

Pezek kirne qeyle ji bo rêka wan
Digel qabekî awê û hindek nan

Ratib hazir kirin ji bo refîqeyn
Aîşe û Esmaya zûn-natiqeyn[346]

[346] Dema ku Muhemmed pêxember xwe ji muşrikan diveşart (ji bo demekê) li ba ‘Ebûbekir dimîne. Wê demê Hz. Aîşe û Esma ji wan re ratib dibirin. Dîsa carekê gava ji wan re ratibê amade dikin, Hz. Esma kemera xwe ji navtenga xwe vediket, dikete du parçe û pê devê her du ratiban girêdidet. Muhemmed pêxember ji vê rewşê re dibe şahid û jê re leqeba “Zûn Natiqeyn” li navê Esmayê zêde diket. Peyva “Zûn Natiqeyn” tê wateya “Kemera cot”. Muhemmed pêxember mizgînîyê didete Esmayê ku roja axretê dê bi cot-kemereke zêrîn bête xelatkirin.

‘Ebdullah hebûye kurê Ûreyqid
Zelamek bû li wan rêyan yê warid

Kurê Sidîq ûcreta ewî dayê
Gel heştiran hate binê çîyayê

Meh rebî’ûl-ewel[347] bû roja çarê
Her du refîq derkevtin ji mexarê

Du hêştir înane pêşya refîqan
‘Ebûbekir got kerem ke ezqurban

Gotê hêştira herî law eve ye
Lê suwar be eve ji bona te ye

Gotê bihayê wê çî ye bizanim
Malê min nebîtin ez suwar nabim

Min pê daye hêştirek heştsed dîrhem
Min eve ji te ra firot der-andem

Kirîye min eve ji filan şexsî
Ji bo te biha wê nahête behsî

Bi navê Quswa ew hêştir binav kir
Heta wextê ‘Ebûbekir ‘umir kir

Biha wê bo ‘Ebûbekrî eda kir
Lê suwar bû wî dest bi hicretê kir

‘Ebûbekir kolê xwey reş aza kir
Kole bû rêwing û xizmeta wan kir

[347] Li gor hisaba hicrî navê heyva ‘esmanî ye.

**HICRET (6)**

Suwar bûne her du hevalêt wê rê
Ewan da rêya sahilê û behrê

Gehiştin çadira ‘Ummû Mabe’da[348]
Rawestane li wêrê behna xwe da

Pirsyara xurme û xwarinê kirin
Ema çi tişt wêrê peyda nekirin

Pezeke şil li wê derê wan dîtin
Qesta wê kirine ji bona dotin

Gotin zeîf û şil û şîr tê nîn e
Gotê musade bike tu bibîne

Got redkirina mêvanan ne baş e
Şîr tê da peyda bibîtin bidoşe

Resûlullah got kan qabekê bînin
Hikmeta Xwuda û rizqî bibînin

Bismillahî gotî dest da guhanî
Tejî wê qabê şîr kir da xwudanî

Hindî li wêrê hemyan têr vexwarin
Şaş bûne hemî li pêş intizar in

Qabê duyê ewan du car jê vexwar
Ew mû’cîzatek bû wêrê bû izhar

Qabê sêyê kir bo Ummû Mabe’dê
Hêla û xatir xwestin li wê erdê

Paşî ‘Ebûmabed[349] hat got çi şîr e
Ewan hadise gotine ji wî re

Jinkê got qesem dikem ne bi carek

[348] Navê jineke koçer ya wê demê bûye.
[349] Navê mêrê koçer e, malxwê Ummû Mabe’dê bûye.

Me zatek dît û ew zor yê mubarek

Her kesek ku ewî zatî bibînît
Bêhemdê xwe dê heyranî bimînît

Zewcî[350] gotê bêje wesfêt wî zatî
Beyan ke bi qamet şikl hem sifatî

Çav û birû reş zor û ciwan qamet
Nazik û kibar û xwudanê himmet

Jinkê got nahête te'rîfê şerîf
Ne kurt e ne bilind e ew yê letîf

Zewcî gotê ewê hat bêjî mutleq
Qureyşî ye bûye pêxemberek heq

Xwezîya min dîtba bibame tabi'
Bêqeyd û we'd û şirût bûne mani'

Ummû Mabe'dê ku rîwayet wê kir
Ew pez heta zemanê 'Umer jîn kir

Giranîyek çêbûye wî zemanî
Me jîyara xwe bi wê pezê tanî

Pêxember û refîqan rê dewam kir
Xelqê tamahya sed hêştirên wan kir

Wextê ku derkevtin ew ji Qudeydê
Ibn-î Malikê Sûraqe gehiştê

Ew 'Ebûbekre Xwuda jê yê razî
Li pêxemberî Xwuda kirî gazî

Resûlullah gotê neke çu xem e
Xwuda yê bûye şirîkê digel me

Nêzîk bû hespê wî axê şitilî
Wî neşêya cihê xwe biniqilî

[350] Zewc ('E): Mêr, zelam.

Wî hewar kire zatê pêxemberî
Du’a b’ke min xilas ke ji vî dêrî

Ez we’de dikem bi navê Rebê te
Dê bim fidaîyê ewê rêka te

Xatem’ûl-Enbîya bo wî du’a kir
Xwudayî du’a wî jê re qebûl kir

Sûraqe bi wî şeklî xwe xilas kir
Ehd û peymanek gel resûl imza kir

Bi şertê sê roj wêrê nobedar bît
Hem sirê punhan ket li rê hişyar bît

Qureyşî hatin got kes êre nîn e
Min ew muhîte hemî seh kirine

Dûmahyê ‘Ebûcehilî ew zanî
Şi’rên ku nexweş li ser ewî danî

Piştî fetha Mekkê şerê Huneyna
Sûraqe hat ahidnama xwe îna

Îman îna bi zatê pêxemberî
Bû têkelê wan sehabên serwerî

Resûlullahî gotê tu çawa yî
Mizgîn li te bîlezikêt Kesrayî[351]

Em bêyne ser mevzûya xwe û hicret
Resûlullah dewamê li rê diket

Cuda bûne ji mekanê Qudeyda
Şivanek dîtî ewan devê rê da

Şîr ji şivanî xwestin û got nîn e
Peza şîr tê da nav pezî da nîn e

[351] Wê demê navê padişahê bajarê Medayînê bûye.

Bizinek heye ji şîrî hişk bûye
Me ji mêj e ew bizin nedotîye

Nebî gotê biznê êreve bîne
Gote ‘Ebûbekir metalî bîne

Dot û tejî ser metalî şîr kirin
‘Ebdullah û ‘Emmar û ‘Ebûbekir

Her sêyan ji wî şîrî têr vexwarin
Dîsa dot û bo xwe kire du carîn

Şivanî got bo min bêje çi kes î
Tu ji kî ve yî ji xwe bike behsî

Tu sûnd bixwe min nedeye nasînê
Ez jî dê xwe bo te bidem zanînê

Şivanî qesem kir bi navê Ellah
Gotê ez Muhemmed im resûlallah

Got tu ew î ji dînê xwe zivirî
Tu heq-resûl î min heye bawerî

Berdewam bûne ew li ser rêka xwe
Lez kirin ewan ji bona çûna xwe

Dîtin karwanek têtin ji Medîne
Silavek da wane zor ya şirîn e

Zubeyîr bû ew her du xelat kirin
Bi bergê sipî her du libas kirin

Ehlê Yesrîb her roj dibûn nobedar
Kengî teşrîf diket resûlê muxtar

Li ser ban û cihêt bilind diwestan
Çawarê resûl û hemî sehaban

Yêk yahûdî dît hatina nebîye
Gotê rabin mizgînya min we bûye

Resûlê we têt bergê spî di ber da
Nûra wî ye li Yesrîbê şefeq da

Girêdan rumh û şûr û gurz temamî
Çûn pêşyê bi kemal û ihtiramî

Sêzde sal çûn nibuweta Muhemmed
Der çardeh rebî’ul-ewela ‘Ehmed

Gehişt Medînê di rojek gerim da
Li Qubayê rûnişt û wî bêhn veda

Bi rêya sa’etek dûr e ew ji şar
Bûye mêvanê yekî Ben-î Necar

Çend rojekan Qubayê îkamet kir
Du heftî ma û mizgeftek wî çêkir[352]

Pêk ve hatin teşrîfê pîroz kirin
Soz û we’det xwe bo wî taze kirin

Meşhûr şa’ir Ibn-î Sabît Hesen e
Qesîdek pê çêkir zor ya resen e

Bi sê roj paş ve ‘Elî bi dûra hat
Medîne ji bo xwe kirine welat

Qelek muhkem bû zor ye bi bereket
Wêrê bûne meskun ta bi qîyamet

---

[352] Di dîroka islamê de mizgefta ewil e. Li gundê Qubayê hatîye çêkirin. (Wê demê Quba gund bû.)

**ŞEHZADE (1)**

Bikeyn behsek bi insaf û ‘edalet
Tê da hene ‘ecêb û hem îbaret

Hûn bi zêhn û zekawet lê binêrin
Gelek sir tê da hene gel bişevrin

Kurê padşahek hebû li meşrîqê
Mezin bû û kurik bûye murahiq

Gelek şirîn û nazdar hem êkan e
Çu tiştê dixwest babê net gotê ne

Xwuda hubba nêçîrê xist dilê wî
Şev û rojan nêçîr bû ‘emelê wî

Rojekê çû dev babê xwe bi edeb
Gotê ey padşahê bi eql û heseb

Min divêtin nêçîra li deryayê
Hem dixwazim bigeryêm li dinyayê

Ez bo nêçîr û rawan bûme heyran
Hes d’kem bigeryêm li ade û behran

Şehzade da ligel ‘emirek bawir
Genim û pir erzaq jê ra hazir kir

Gel hebûn sîlah û nêçîrwan tazî
Hesp û tule û başot û hem bazî

Bi sê roj û şevan gemî hajotin
Adekê bi dar û mezin derkewtin

Bi qasî heftîyekê man wê derê
Her roj bo nêçîrê diçûn seferê

Paşî keştîyên siwar bûn rêkewtin
Bûn seferî ji adayî derkewtin

Bi du rojan berdewan bûn li çûnê

Paşî kewtne ber zivirka firtonê

Keştî jêk girtin û hemî bin-aw bûn
Xeyrî melîkzade hemî winda bûn

Melîkzade tek ma ser qedek darî
Şilqa awê lê da havêt kenarî

Sê rojan şerê mirin û jînê kir
Paşî li qeraxê cawêt xwe vekir

Li rexê behrê binê gîya dixwar
Wextekê ma û keştîyek bû dîyar

Du rojan mabû li rexê deryayê
Roja sêyê bûbû roja dûmayê

Rabû ve berê xwe da dewr û doran
Çi cihan nizanît may weku koran

Cihek bilind rawesta û mêze kir
Dît sitûna keştîyekî dîyar kir

Wî îşaret dayê û kire gazî
Keştî hat û gotnê tu çi dixwazî

Kurkî dît hemî tucar bazirgan in
Xwudanê mal û serwet û barxan in

Kurkî silavek cema'eta wan kir
Wan selam wergirt û hem pisyar jê kir

Got babê min tucar bû em li sefer
Gemî bin-aw bû şilqê havêtme der

Mabûm ser textêkî darê gemîyê
Awê înam havêtme vê adeyê

Ger yek ji we min qebûl ket hizûrê
Ez xizmeta wî da nakem qisûrê

Ew gotin kirin dilsotî bû girî
‘Amilê xizmeta Suleyman kirî

Wî gotê were ez dê te qebûl kem
Çu tiştê lazim bît dê bo te bikem

Kurkî bi hurmet destê wî maçî kir
Wî jî kurik îna nik xwe teselî kir

Kemer û du gustilên yaqut gel da
Ji xwe vekiribûn di torbeyî da

Kurkî destek cilan kirî û ber kir
Wî dest bi xizmeta ‘amirê xwe kir

Paşî çend roj dî li bajêr derkewtin
Keştîyê peya bûn bo şar rê kewtin

Mala ‘amirî di wî şarî da bû
Xwudanê mal eywan hem serayan bû

‘Amil hat û melikzade di gel da
Ew her du pêk ve hatine di mal da

‘Amil yê memnun bû ji wê xizmetê
Got bêje çi demete bo xelatê

Got zêdeyê ‘umr û malê te divêt
Ji xeyrî wê min çu tişt dîtir nevêt

‘Amilî gelek keyf bi gotna wî hat
Got Rebî çi ji wî ra bidem xelat

Paşî ku salek temam bû li ser wan
Melîkzade got emirê Suleyman

Ez hez dikem bigeryêm û bibînim
Bi çavkanya Nîlê ra bigehînim

‘Amilî got tu piçûk î nizanî
Rê dûr û nexweş li Hebeşîstanê

Got min qirara xwe daye bo çûnê
Çu rê nînin ji bo min û neçûnê

Got tu guhê xwe nadeye min piser
Çû xezînê vekir tiştek îna der

Gote wî ewe da min Suleymanî
Her kesê qîmeta vihê bizanî

Dê ezmanê mexluqatan zanîtin
Wê sirê ji bo jinan nebêjîtin

Bilan çu jin wê sirê pê nezanî
Bizanin dê ji dest berdeyî canî

Ji 'amilî xatir xwest û bi rê kewt
Qasî mehek çû li şehrekî derkewt

Ji şehrî derkewt hat daristanekî
Darên fêkî hene bi her curekî

Hindek fêqî xwarin ji ewan daran
Çawê xwe gêrabû li çan û karan

Dîtin hindek fêqî patan pêçayî
Ew li dor û rexêt xwe d'ken ronayî

Çu rê jê nebirin ma we di nav da
Wê demê cema'etek hat bi ser da

Padşahê şehrî û cema'eta xwe
Hatibû geştê digel meclisa xwe

Kesê nezanîbû ew sir û hikmet
Padşahî l'xwe xir kirin ew cema'et

Paşî wehe gote koma wezîran
Min suwal bi wê sirê kir çend caran

Hewe nedabû destê min xeberek
Qesem d'kem qebrê babê xwe mubarek

Hûn her heft xeberê bo min dê bînin
Yan hûn li ser rûyê dinê namînin

Serokê wan gotê ey padşahê min
Li vî şehrî wezîr bû bapîrê min

Wî nezanîbû em dê çawa zanin
Vî şolî da aciz û sergirdan in

Ger lazim bît wê sirê em ispat keyn
Em musada xwe ji te rîca dikeyn

Paşa derê xizînê vekir bo wan
Gelek ji mal û serwetan dane wan

Gotin em dê b'çin bo Hebeşistanê
Dê bigeryin çar eqlîmê cîhanê

Em dê pirsê bikeyn ji dîrokvanan
Ji zanayan û hemî xwendevanan

Padişah zivirî ji bo şehrê xwe
Wezîran ser danane ser rêka xwe

Miqtarek çûn melîkzade giheşt wan
Silavek da ser wê cema'eta wan

Ewan wezîran silav jê wergirtin
Gel xeberdan û gotnêt wî helgirtin

Gotnê dê kî ve çî tu b'tenê l'wêrê
Bo me bêje tu ji ku dê çî kîrê

Gotê ez kurê melîkê meşriq im
Revîngek im berew rexê mexrib im

Daxwaza dil min heye dê b'cih bînim
Dê biçim serekanya Nîl bibînim

Gotnê tu jî rêwingî gel rêka me
Wer tu jî bibe şîrikê çûna me

Bi miqtarek çûn rast ‘ecîban hatin
Hin tişt dîtin sirêt wan net ispat in

Ewan hinde tişt dîtin li wê derê
Kes nîn e ji wan şolan det xeberê

Borîn kewte rêka wan kalepîrek
Ser û rihdîn sipî û dît piştkûrek

Pisyar kirin tiştêt dîtî kan çi ne
Min ‘umr sed pênceh e ne şola min e

Birayê min wêdatir e ‘umr pitir
Ew dê ji bo we bêjîtin ya çêtir

Çûn nik birayê wî yê temen kone[353]
Pisyar kirin got ew ne şola min e

Hûn herne nik birayê min yê mezin
Hindî ku ji pisyarêt we jê hebin

‘Umirdirêj e û hem jî dîrokvan
Dê pisyarêt we bersiv ket hemîyan

Çûne wêdatir wan dît gencek rûgeş
Berge û ser û rihdîn hemî di reş

Gotê we çi dîtîye kan hûn bêjin
Bersifêt min kurt in û ne dirêj in

Bi ‘umrê xwe du sed û pênceh sal im
Gelek tişt dîtne gelekan dizanim

Me dît yekî genim durû lê çawa
Gihiştî û şîn û hem jî yê sawa

Dilê me negirt lê bikeyn silavê
Ew genimê didirû tavêt avê

Got yê genim didirû Ezraîl e

[353] Kone, ji zelamê temenê wî ne gelek ciwan û ne gelek pîr re tê gotin.

Nahêlît piçûk û pîr ne cahêl e

Piçek dî em çûyn me dît yekî darker
Neşêya piştî raket hêj kirne ser

Ew mesela insanê xirabker e
Nahêlît gunehê hêj diket ser e

Wêvetir çûn me dît yêk awê d'kêşît
Diket amanêt xelkê yêt xwe têlît

Ew jî mesela kesêt gelek zengîn
Xirabîyê serf ken ehlê xwe têlin

Miqtarek dî em reê çûn û me dîtin
Zevyêt xelkê av d'det yêt xwe têlîtin

Ew jî temsîl e bo van xwudan malan
Biçûkan serf ken bo xatra dayîkan

Em çûn û me li cihek dî da dîtin
Parî d'det xelkê ew birsît mînîtin

Ew jî temsîl e bo hindek 'aliman
Şîretan den xelkê lê nabin xwudan

Em ji wêrê çûn me teyrek şirîn dît
Ji hêlûnê firît car dî tê naçît

Ew temsîl soz e berda ji devê xwe
Êdî ew çû û naête cihê xwe

Em borîn û me gelek gîske dîtin
Qelew bûn van biznêt zeîf dimêtin

Temsîla rêberêt zalim û xurt in
Malê xêlkê zor û hîla dixwetin

Wedatir çûn me mahrek dît di rê da
Heçyê hat diçû mahrî pêve dida

Yê tên û diçin 'alemek gêj û şaş

Çû kesan xwe jê nedidane ve paş

Ev temsîla dinê ye bet bi mirin
Qet ‘ibretan bo xwe jê xwe nagirin

Wêvetir dêhlese me dît bêseda
Çevçewa kuçikan bû zikê wê da

Temsîla insanêt baş in li dinê
Eyalêt wan dora axivtnê nadenê

Em rabirîn ber derê du dikanan
Ewên goştî difiroşne insanan

Yek goştê temîz û taze dîhar e
Ya dî goştê genî û hem mirar e

Ema çaw li goştê temîz taze nîn e
Bo goştê mirar û genî dor nîn e

Hemyan goştê pîs û mirar daxwaz e
Yêt naçîte goştê temîz û taze

Mesela kesên pîs in li dinyayê
Helalêt xwe têlît diçin zinayê

Em ji wêrê borîn çûn cihek dinê
Me dît xezalek d’revît xelk berdenê

Ew mesela dinê ber çaw şirîn têt
insan diberdenê ew jî direvît

Em wêvetir çûn me komek insan dît
Patek spî heye herek bo xwe kêşît

Ew jî mesela kesên xwudan-dîn in
Xeyrî dinê xwe çu dî nahebînin

Her kesek te’esuba dînê xwe ye
Kes nabêjît dînê heq dînê we ye

Ew mesele hemî gotin temamî

Min umêd e pê behrewer bin ‘amî

Xerîb şeqî bûye mal li wê derê
Zêhn belav bû ji wan hadîsêt berê

**MESELA DARAN (2)**

Dîsa b'keyn behsê şehzade û wezîran
Bo bersivan çûn nik zana û xebîran

Mesela daran gotne wan bi serhatî
Gotê ewî bajêrê ku hûn jê hatî

Padşahek hebû l'wêrê bi insaf adil
Wî nethêla çêbin şolêt xirab batil

Rojekê yekê xwudanê mal milketê
Yekî dî peyda kir zevya xwe firotê

Yê kirîy nav zevyê da dîtî xezînek
Ev çû lalê xwudanê berê bê-direng

Got min di zevyê da xezînek dîtîye
Ewe heqê te ye min zevî kirîye

Wî got min zevî ser û bin firotine
Çû tê da hebîtin hemî heq yêt te ne

Pêk nehatin her du çûne lalê qazî
Kes ji wan vê xezînê bo xwe naxwazî

Padşahî ev tişte guh lê bû û zanî
Rêkirne pê wan û ew her du şexs anîn

Padişahî gote xwudanê dûmayê
Tu ji bo çi ber qebûla wê ra nayê

Gotê min ax min kirîye ne xezîne
Heram e eve bo min heq tê da nîn e

Gote xwudanê berê tu qebûl evê
Gotê min firot nakêşim vê belayê

Gotê vê carê min rica ye bi hîvî
Hûn parve ken her du vê bo xwe bi nîvî

Ew jî nehat qebûlkirin ji padşahî
Gotin em d’tirsin ji hisaba dûmahî

Gotne padşahî tu qebûl ke ji bo xwe
Bîne têkel bike nava xezîna xwe

Got çu heq û hisabên min nav da nînin
Dê çawa bin vê vebalê da bimînim

Divêt mutleq bo vihê çarek hebîtin
Lazim e ku ev mal ji wêrê rabîtin

Gotê hewe hene evladêt tam mezin
Yekî got min kiçek yê dî got kurê min

Padşahî got her duyan lêk nikah biken
Xezînê jî hîbeyê her dukan biken

Ev şol kuta kirin wan bi ewî şeklî
Padşahek adil bo milet û ehalî

Padşahek bû yê bi adil û bi insaf
Milletê wî jî bi qena’et û dilsaf

‘Edaleta wî bibû mînak û serwer
Fêqîyêt wan wê salê bûne mucewher

Xwudanê qaînatê û mulkê baqî
Daran cewher pê ve hatin cihê fêqî

Cihab birine lalî wî padişahî
Ew siwar bû û hat ew bi keyf û şahî

Gote milletî raken ew heqê we ye
Milletî got bereketa ‘edla te ye

Kesê bo wan cewahiran temah nekir
Padşahî fermanek nivîst û belav kir

Padişahî got min minnet ji Xwudayî
Ku milletê min kesê nekir temayî

Bînin nav patan bipêçin da bimînin
Evêt dûv me tên bilan ew jî bibînin

Da bizanin padşahêt adil-cîhanî
Temahî nebiriye dinyaya fanî

Da ew bizanin xwudanêt 'edaletê
Da zulimkar nebin di nava dewletê

Wî wextî sih salî bûm di çaxê kemal
Nehe 'umir bûye du sed û pênceh sal

Ji hingî heta nihe sal bûn dused bîst
Me gelek tişt dîtin û hem jî me bîhist

Di nav da hene eqil û hem tercube
Xerîb bêjît bi eqil û çaw û guh be

**BEHSA SÊ BIRAYAN (3)**

Bikeyn behsekê ji wan her sê birayan
Mîna şeva tarî em rohn ken çirayan

Me ji ‘umirdirêjî girt bersivêt xwe
Vê carê dê biket behsê birayêt xwe

Sebebê pîrî cahêlî hem yê kone
Kanên ev sebebe hemî çî û çine

Birayê piçûk ‘umir sed û pênce sal
Bi evî ‘umrê kêm bûye pîrekê kal

Jinek wî heye xirab û hem ye ne qenc
Kelamxirab û zimantûj kula şêrpenc

Feqîr e ji derve di xema malî bît
Jin bêheya ye di mal da huzûr nabît

Si’ud û selametî nîn e digel da
Bi têran diraf[354] bidê namînît dest da

Min bi çend seferan yarîkarî bo da
Jina wî serf kir her di ewê gavê da

Ji ber wê hindê ye base û melal e
Ji ber xeman e ku ew bûy pîr û kal e

Yê duyê ne pîr e ne cahêl yî kone
Sebebê pîrbûna wî bêşuphe jin e

Gelek zengîn e ji derve naket xemê
Di mal da rehet namînîtin yêk demê

Bû mal û serwetan ewî xem çu nîn e
Di mal da jinek heye ew har û dîn e

Ew di mal da çu deman namîtin rehet
Mal bo wî zindaneke bêqeyd û dewlet
‘Umrê vî nihe yê bûye sed û heştê

[354] Diraf: Pare.

Wî kal û pîrî bo hat û zû giheştê

Ez heftê salan ji ewî mezintir im
Ema gelekê jî ewî ciwantir im

Du sebeb ji bona gencînîyê hene
Yek mal û serwet in ya dîtir jî jin e

Zehmeta malê dinê min qet çu nîn e
Jinek min hey ezmanê wê hingivîn e

Ji lawînyê Zûleyxa jê bûy şermînî
Exlaq û te'betê xirab dev nabînî

Lalî wê çu xem û derdan ez nabînim
Hes nakem çu caran ji wê dûr bimînim

Ger bideme destê wê dîrhemek pare
Deh salan lalî bît ew naket xwusare

Ji ber evê hindê ye ez cahêl mayî
Me 'umrê xwe bi şerî nekirye zayî

Ewê ku derd bo hatine bin lihêfê
Dê gelek bikêşîtin axan û ofê

Sed emanet û nesîhat bin ji bo we
Ewa 'umrî derbaz diketin digel we

Wê nehilbijêrin bi reqs û dawetê
Berê xwe dene exlaq û 'esaletê

Da ku hûn peşêman nebin li dinyayê
Xerîb li mebhesê xwe hate dûmayê

**MELÎKZADE Û WEZÎR (4)**

Me di pêş da kirbû behsek ji ewane
Şîret bo melîkzade û wezîran e

Wezîran cewab birin bo padişahî
Melîkzade çûna d‘gel wan kir dûmahî

Wî ser da rê û çû ser kenarê Nîlî
Rewingê rêya dûr bi ‘umrê cahêlî

Bi çend rojan çû giheşte bajêrekî
Bûye rêwing ew digel heval-gencekî

Got melîkzadey tu ji kî derê hatî
Tu çi millet î û yê kîjan welatî

Gotê ez kurê melîkê meşriqê me
Ez rêwingê rêya Hebeşîstanê me

Dê biçim da çavkanya Nîlê bibînim
Bûye xem kewtye dilê min dê derînim

Gotê rêyek dûr e û gelek ye asê
Min daxwazek ji te heye bi dilxwazê

Tu razî be bi evê feqîrxana min
Bi çend rojekan tu bibe mêhvanê min

Tu westayî û dîtîye gelek zehmet
Ez çend rojekan ji bo te bikem xizmet

Melîkzadey qebûl kirin gotinêt wî
Ew her du pêk ve gehiştne mala ewî

Çûn û bire hemamê û berge danê
Bi çend rojan li wêrê ma bi mehvanî

Melîkzade û xanixwê[355] û jina wî
Her sê dirûniştîne li xanîyê wî
Xizmetçî gayê cot îna bire jor da

[355] Xwudanê malê.

Ew li ber tenişta kerî ew girêda

Wî kerî pisyar ji halê gayî kirin
Gotê nebêje bira em pê ve mirin

Çend roj e cot e sibê heta ewarî
Hajotin û qutan bêhn nîn e çu carî

Çu çare û rêke ji bo min çu nînin
Carek betal bibin û bêhna xwe bînin

Kerî got çarekê bêjim ye hêsan e
Ku tu bêhna xwe baş bidey çend rojan e

Gayî gotê kerem ke bo min wê bêje
Te ‘umir bibîtin gelekî dirêj e

Got tu ew şeve alifê xwe dev nedê
Dê bêjin nesax e û te naben cotê

Gayî bi xeberê wî guhdirêjî kir
Alifê xwe hêla û dev lê nevekir

Sibê xizmetkar hatin û ew hal dîtin
Got: Efendî gay nesax e naçerîtin

Gotê ga nesax bît kerî bibe şûnê
Wî ker bir û hajote ber gayî dinê

Ker birin û şûna gayî ew giredan
Cot pê kir heta evarî şivik lêdan

Evarî îna girêda ew dev gayî
Gayî got roja te çawa bû dûmayî

Ewî kerî tedbîra xwe baş dizanî
Axivtin digel gay kirin bi şeytanî

Got sibê da ez diçerim li çîmenan
Cot bi min nekirin ne kewtme çu xeman

Kerî gotê min tiştek bihîst xirab e

Da bo te bêjim çimkî bo te sewab e

Xizmetkar got efendî dê gay çi lê ken
Gotê eger şev neçerît dê serjêkeyn

Gayî dest havête gîya û xwarinê
Sibê zû birine şol û cotkirinê

Melîkzade bi gotina wane kenî
Xwudanê malê pirsyar kir ji mehvanî

Ka tu bêje sebebê kenya te çî ye
Te tiştekê kenyê lalî kîj me dîtye

Got haşa bît ku ez bi hewe nakenim
Meseleka peşîn bû hatye bîra min

Jinkê li malxwê xwe ket gelek zorî ye
Kanê bila bêjtin ew mesele çî ye

Ev sire lalî jinan wî netkir beyan
Got hewce heye bi qelem û diwîtan[356]

Mêrkî jin rêkire malekî cinarî
Melîkzadey sira xwe bo kire carî

Wî melîkzadeyî gote xanixwê xwe
Tu bo min sûnd bixwe nebêje jina xwe

Ez dê sira wê kenyê jî bo te bêjim
Tenbîh bû bo min ku bo jinan nebêjim

Ewî ji bo melîkzadeyî sûndek xwar
Melîkzadeyî ew tişt bo wî kir izhar

Got min ji xezîna Suleyman tiştek xwar
Bi ezmanê heywanetî bûm xeberdar

Gotnên ker û gayê wî hemî bo gotin
Ema divêt dev jinan naêt vegotin

[356] Diwît: Amûrê ku hibir dihat tejîkirin ji bo nivîsînê.

Tu bide wê jinê terbîyetek giran
Bêjê te çu şol heye bi kenya mêran

Ew rabû û ewî jinik baş tumar[357] kir
Jinkê bi sed caran sûnd xwar û tewbe kir

Roja paştirê melîkzadey xatir xwest
Berew Hebeşîstanê ve ew bi rê kewt

Bi çend rojan çû û gihеşte Semavayê[358]
Pîrek dît û ew dizanît ji dinyayê

Ew rûnişte lalî ewî pîremerdî
Got melikzadey tu dê biçîy kîj erdî

Gotê ez dê biçim serekanya Nîl e
Gote melîkzadey ew şolek mişkûl e

Rêya mehekî dûr e ew ji vê derê
Bo te oxir bîtin ser çûna seferê

Çîyayek bilind e gumbet ser serê wê
Serekanya Nîlê ew e li binê wê

Gava weku tu bi wêrê ra giheştî
Bi wê awê destniwêj bigre b'dirustî

Tu du reka'et niwêjê wêrê bike
Daxwaz û du'ayêt xwe ji Xwuda bike

Te çi mirad hebîtin dê bîte hasil
Xwe dûr bêxe ji tiştê xirab û batil

Melîkzadeyî ji wî pîrî xatir xwest
Bi sed mişkulatan bi ser çîyayî kewt

Li ser wî çîyayî dîtin serekanî
Wî daxwaz û meqsed bo xwe bicih anî

[357] Ji perixandina hespan re tê gotin. Li vir di wateya lêxistinê de hatiye bikaranîn.
[358] Navê bajêrekê Îraqê ye.

Zivirî ve ew ji bo Hebeşîstanê
Kir qesta meşriq Serendîb[359] Hindîstanê

Gelek macera tê da çûn û me gotin
Hem eqil tê da ye hem tecrube-girtin

Umêdwar in bibête kar bo ciwatê
Bera xwe biden wê se'î û xebatê

Her şolekê hikmetek wê tê da heye
Se'î û xebatan mutleq karek heye

Me li vê derê dûmayî lê înave
Xerîb pê ve şeqî bû zêhn lê bû xav e

[359] Serendîb, navê Srî Lanka yê niha ye. Navek wê yê din jî Seylan e. Dibêjin piştî ku Xwuda Adem û Hawa ji beheştê derxistin, her du li vir cih bûne.

**SÎMIRX Û QEDER (5)**

Da bo hewe bikem behsekî berê
Ji mebhesê sîmirxê û qederê

Nebî Suleyman xwedî seltenetê
Rojekî rûniştibû li ser textê

Ji insan û cin û hemû wehşîyan
Dora textê wî cema bûn ser pîyan

Ji teyrê sixircîk sûcek bû peyda
Suleymanî qerara ceza pê da

Teyirkî hîvî kir ji pêxemberî
Gotê qezayek bû hey di qederê

Ew teqdîra Xwuda bû qedera min
Bo wê hindê sûc û ceza nede min

Suleyman ‘efû kir ew ji cezayî
Got min qebûl kir qedera Xwuda yî

Sîmirx jî hazir bûye li wê derê
Got min bawerî nine bi qederê

Nebî got tesdîq lazim e her derê
Bêqeza belg naveryêtin ji darê

Gotê tu min bikujî yan bihêlî
Min bawerî nîne bi evê şolê

Keyfa Suleymanî bi gotnê nehat
Rebbê Te’ala Cebraîl bo hinart

Cebraîl nazil bû nik Suleymanî
Ger tu hes key sîmirx şermîn bimînî

Bigre şertekî qewî tu di gel da
Çend şahidakan bigire li ser da

Şev dî jina şahê meşriq kurek bû
Jina padşahê mexrub jî kiçek bû

Ew her du bigehine yekûdunê
Dê bênikah piçûkek bîne dinê

Min di qedera wan nivîsye ew hal
Sîmirx zîrek e bila biket betal

Roja paştirê di wextê dîwanê
Mexlûqat hemî hatine meydanê

Suleymanî pisyar ji sîmirxê kir
Got te mesela qederê çi lêkir

Got tu min bikujî yan bikî azad
Min bi wane qet çu nîne i'tiqad

Nebî mesela piçûkan got jê ra
Got min inkar ne j'qudreta Xwudê ra

Heçîya hes ketin ew dê biketin
Ema eqlê min wê qebûl naketin

Kur û kiçêt li meşriq hem mexrûban
Ev şole çênabîtin wehe asan

Gotê min tu nekirbay mîrê teyran
Min tu ceza kirî cezayê giran

Tewbe bike ji van îş û fikrane
Ya tu dikey li pêş Xwuda isyan e

Ez bawer dikem tu heq-pêxember î
Eqil qebûl naket qeza qederê

Ger te izin hebît bidey tu 'emrî
Ez nahêlim ew şol bêtine serî

Dê bidem iznê ema bi kefîla
Ca dûmayê nekey direw û hîla

Çar teyran dê bikeyn şahîd bo tesdîq
Qelreş qelbalek û uxe sîvyandik

Nebî Suleymanî wehe ‘emir kir
Ehdnameyek digel sîmirxê çêkir

Meclîs hemî bo vihê bûne şahid
Rakirneve ew sened û mu’ahid

Sîmirxê firda û çû berew mexrib
Padşah li nav bax bi girsek ecaib

Zîyafet dabû bo xatra jina xwe
Danabû kenarê landka kiça xwe

Sîmirxê xwe berdaye nava baxî
Lantka kiçkê wê dîtî li qeraxî

Landik ji erdî rakir berhewa kir
Padşah û ehlê xwe dad û fixan kir

Bire nava behrê hebû giravek
Di wê giravê da hebû çîyayek

Darek bilind hebû li ser çîyayî
Çiqêt wê wek xivetê rawestayî

Wê li serê darê hêlûnek dana
Fireh bû bi miqterê deh arşîna

Ji gîya û cismê nehrim bo çêkir
Kiçik dana ser û ewê xweyî kir

Her roj goştê taze û ter bo tînit
Kiçik xwûnê mêjît û qîm pê tînît

Roj li xizmeta Nebî Suleymanî
Bi şev li kiçkê dikir wê xwudanî

Her roj bi çend curan fêqî bo tîna
Sîmirxê mezin kir ew dûrê insan

Kiçkê sîmirx dayîka xwe dizanî
Ne rûyê insan dîtbû ne dizanî

Kurik gerode bû ew li cîhanê
Seferî bû ew li Hebeşîstanê

Wî dizanî ezmanê wehş û teyran
Wergirtibû ji ‘amilê Suleyman

Wî tedbîra zivirîna malê kir
Karê sefera meşriqê û **bab??** kir

Çû ser behrê dît keştî û barxane
Eşya û tucar û hem bazirgane

Pirsî dê çin kîj iqlimê cîhanê
Got dê b’çin Serendîbê Hindîstanê

Melîkzade got ez jî digel we me
Heta ku meşriqê hevalê we me

Got çi kes î ne tucar ne bazirgan
Çi şol te heye bêmal digel karwan

Got ez kurê padşahî melîkzade
Hatbûm çavkanya Nîl bibînim cih da

Nihe min qest e b’zivirme welatî
Dilxweş kem day û babêt lalî hatî

Gelek mal heywan keştîyê bar kirin
Berew meşriq bi dest seferê kirin

Bi qasî deh rojan keştî çû wê rê
Paşî tofanek çêbûye li behrê

Keştî ji berekê girt jêk belav bûn
Mal û mirov û heywan tev winda bûn

Şehzade ma digel sê hespê barî
Ser kerek keştyê avê bir kenarî

Giravek mezin bû di nav deryayê
Du’a kir û got Xwuda bide sebrê

Du hesp man û yê sêyê ji wan ji mir
Ew hespê mirî gura û kevil kir

Ew kevil pê gîyayî baş vepestê
Bera roj kir hişk bû wek berê bestê

Paşê xalî kir û şev tê da d’raza
Kewte nav fikr û xiyal û daxwaza

Çend roj ma sebr nehat li wî mekanê
Gerya li nav girav û daristanê

Gerya li nav wî dehl û çol û dara
Çîyayek bilind dît wekî zinara

Wî qest kir çû bo serê wî çîyayî
Ew şaş bû û hem ecibgirtî mayî

Darek bilind dît çiq çûye esmana
Serê wê hêlûn e wek balexana

Kiçek ser rûniştî wek horîyan e
Kurkî çaw pê kewt ew ma bêziman e

Kurkî gel xeber da ziman nezanî
Kiçik axift û ezmanê wê d’zanî

Her duyan yek du dît û lêk bûn aşiq
Ta êvarê ma bin darê gencê sadiq

Kiçkê hinde fêqî bo hawetne xwar
Kurkî xwarin û ew jor da heta xwar

Ew di paş da hat û çû bo cihê xwe
Bû şev û man bi fikr û xiyalêt xwe

Sîmirx hat û kiçik dîtîye xemgîn
Got te xêr e bo çi tu bûy dilbirîn

Got sebra min nahêt ser darê b’tenê
Sibê danê bêhnekê kem geryanê

Sîmirxê sibê dana erdî û çû
Kiçkê bera xwe da behrê jor da çû

Kurik hat kiçik ne li ser hêlûnê
Kir hewar û gazî berda girînê

Carek dî jor da hate devê behrê
Dît kiçik digeryêtin li wê derê

Her du giheştne yêk û zor keyfxweş bûn
Hev hembêz kirin bi eşqê serxweş bûn

Eşq zêde bû ji hudûdê derkewtin
Her du giheştne yêk bi meqsed kewtin

Man heta êvarî di wê eşqê da
Murad hasil kirin adê behrê da

Êvarî her yêk zivirî cihê xwe
Sîmirx hat û kiçik rakire nik xwe

Sê rojan bi wî halî dewam kirin
Sîmirxê gazinde ji kiçkê kirin

Newêrim te ji ser darê bînme xwar
Neku zererê biden te cenewar

Guh dê kiça min tu wek min nizanî
Ez dê şermîn bim li nik Suleymanî

Kiçik girî bi ax û hem enîn e
Li jêr heye kevilek bo min bîne

Da ez sebra dilê xwe bi wê bînim
Da roja xwe digel wê biqedînim

Sibê kevil îna lalî wê danî
Çû bo hizûra Nebî Suleymanî

Zeman ji mehekê zêdetir derkewt
Kiçik di wî wextî da bi hamle kewt

Hem kiçik hîn bû zimanê insanî
Cebraîl hate li nik Suleymanî

Mesele hemû ji wî ra beyan kir
Suleyman Pexember sîmirx gazî kir

Wextê ku hatî pisyar ji wê kirin
Gotê qeza û qeder te çi lêkir

Got min qeza û qeder def'e kirin
Min ew her du şexs jêkûdu dûr kirin

Da bizanî qeza û qeder nînin
Da 'alem jî bizanît hem bibînin

Suleyman gotê ka here wê bîne
Dê zanî qaza qeder hey yan nîne

Sîmirxê got ez dê bînim beyan kem
Hemî şolan dê bo hewe 'eyan kem

Sibê kiçik xemiland bi ciwanî
Dê te beme hizûra Suleymanî

Kiçkê got ew kî ye li kî derê ye
Sîmirxê got ew nebîyê Xwudê ye

Ew çu ji melîkzadeyî nizanî
Dê bêt cih şertê min û Suleymanî

Ehmeq şertî d'girin gel pêxembera
Nebî xwudan-mu'cîzat in her dera

Gote kiçkê xwe nav kevil bicih ke
Sebrê bike û behna xwe dirêj ke

Çû nav kevil gel melîkzadê ciwan
Her du înan ber hizûra Suleyman

Gazî kirin ‘ifret û cin hem insan
Teyr û mexluq wehşî û hemî heywan

Nebî Suleymanî gote sîmirxê
Tu bêje çîroka xwe û tarîxê

Gotê ya resûlê Rebi’l-Alemîn
Xwudê ‘eyan e çi heye rûy-zemîn

Ez çûm û min landika wê kiçkê bir
Adê behrê heta nihe xweyî kir

Giheştîye min emr û fermana te
Eve min înay danay hizûra te

Min def’e kirin qeza û hem qeder
Bilan bi vihê kes nekêşît qeder

Suleyman ‘emr da ku veken kewilî
Da ew zanît soza xwe ya ewilî

Kevil vekirin di wê meclisê da
Melîkzade û kiçik her du tê da

Wextê sîmirxê dîtin ew ‘ehwale
Şermîn û xecîl ma bêqewl û qal e

Eve te betal kir teqdîra Xwuda
Qesem kem ez dê bideme te ceza

Da bîte ‘ibret ew ji bo ‘alemê
Da behsê te bête kirin her demê

Sîmirx tirsya û lerizî di cih da
Yek care kire qîrên û wê fir da

Ji tirsa Suleyman heybet û safê
Firda û ew çû pişt çîyayê Qafê

Çû û xwe veşart li pişta çîyayê
Paş hingê kesê ew nedît dinyayê

Nebî Suleymanî nikaha wan kir
Dawet û keyfxweşîya her duyan kir

Kurkî navê Nesrawerdî dana ser
Navê kiçkê Semenboy her du hember

Wê gavê ‘emr li bayî kir Suleyman
Ew her du aşiq li mexribê danan

Hem bo padşahê meşriq rêkir xeber
Wî îman îna bi nebîyê pêxember

Ev hadîse çêbû di pazdeh salan
Pênç salêt kurkî çûne ew li çolan

Wê mabeynê dîtin gelek hadîse
Ewan jî cuda me jê kirye behs e

Me temam behsê sîmirx û qederê
Em dê vî behsî pêlin li vê derê

Ev hadîse min girt ji tuberîyê[360]
Da insan xeberdar bin bi mêjûyê

Da xemê b’ken dîrokê baş nezer ken
Da rehmetan bo Xerîb ne jibîr ken

[360] Tuberî, navê kitêba Muhemmed Cerîr e. Ev kitêp di derbarê dîroka islamê de ye. Muhemmed Cerîr bixwe jî hem dîroknas bû û hem jî tefsîra Qur‘anê dikir.

**KEŞTÎYA NÛHÎ**

Eger em bikeyn behsek ji keştîyê
Pêwîst e biçin zemanê pêşîyê

Gelek baş li mêjûyê em binêrin
Em çawêt xwe li heqîyê bigêrin

Nûh ji bo qewmê xwe bûye pexember
Bi sêsed salan ew bûye newheger[361]

Qewmê wî qet guhdarî pê nedikir
Gotnêt wî li qewmê tesîr nedikir

Nê Xwudayî ew kirbû Nebîyullah
Digot bêjin La ilahe illallah

Bi her dem û gav ev gotin dikirin
Hind salan ev gotin zikir dikirin

Di wext û gavan dubare dikirin
Mixabin kesê ew qebûl nekirin

Nebî hawar kiriye zatê barî
Ya Reb ji te dixwazim harîkarî

Ew bawerîyê qet bi min nayînin
Divêm çu ji wan li erdî nemînin

Ji Nûhî ra got ey pêxemberê min
Tu guhdar bike ferman û ‘emrêt min

Soz û we’dêt min nabine muxalif
Her çî ya ku ji te bîte tekalif

Te li nik min hebîtin her çi miraz
Li nik min qebûl in du’a û daxwaz

Tu sebr û sukûna xwe bicih bîne
Rabe wê Dara Sûcê tu biçîne
Çil salan tu li hîvîyê bimine

[361] Newheger (‘E): Hewarker.

Cibraîl dê agahyê bo te bîne

Piştî ku ewî çil sal temam kirin
Nebî Nûhî ji Xwuda rica kirin

Du'ayêt ewî nebîyê ku resûl
Xwuda hemî ji bo wî kirne qebûl

Bi nehsed û pênceh sal 'umrê gelek
Wi hewar û gazî rêkirne felek

Ewî qewmî qet çu qebûl nekirin
Hemyan heyîya Xwuda inkar kirin

Nebîyî hewar bire dergê Cebar
Qadirê her dem û gavan li ser kar

Êwêt ku xirabkar in li dinyayê
Bilan kes ji wan nemînin çu cayê

Fermanek hatî ji wî Rebê Xaliq
Ez im xwudanê we'd û sozê sadiq

Çi lazim e dê bo te ewê bikem
Wan zaliman dê 'ezabê nazil kem

Ez bi vî navê xwe yê Cebar bikem
Dê tofanekê li ser ewan rakem

Dê ava 'ezabê ser wan barînim
Heta li ser dinê muşrik nemînin

Ewan 'emr û fermanêt min red kirin
Van 'ezaba min li ser xwe heq kirin

Ez ê hêlam û bûne senemperest
Qehr û itaba min wan ji bo xwe xwest

Hatî Cîbraîl bi 'emrê îlahî
Şeklê keştîyê îna îznullahî

Dest pavêje wî karê necarîyê

Bo xwe şirîkan çêke li keştîyê

Ji ewil wî înan texte çêkirin
Sed û bîst û çar hizar temam kirin

Bi hisab û hejmara enbîyan e
Ewela îskelet ji bo danane

Bi te'lîm û hizretê Cebraîlî
Keştî dana ewî zor bi tecîlî

Elwah[362] hemî înan ewane lêkdan
Bilez çêdiken wê keştîya giran

Muşrik têne pêş û lê difikurin
Ewehe çi tişte têt çêkirin

Nebî bo wan dikir behsê tofanê
Av dê tejî ketin evê cîhanê

Çi zîruh li ser vî erdî namînin
Ew kesêt keştîyê da dê bimînin

Wan keys û istihza[363] bi nebî kirin
Nebî gotê hûn ewêt bêbawer in

Rojek dê bêt em dê li we fikurin
Hûn dê ji cîhanê bên temîzkirin

Zerfa du salan bêmabeyn kar kirin
Du salan keştîya xwe temam kirin

Bo keştîyeke nû hem ye amade
Bo musulmanan ew bûye mirad e

Ewî bo qewmê xwe keştî kar îna
Mizgînî da mumîn û muminîna

Dirêjî bi zira'an[364] bûne sêsed

---

[362] Elwah ('E): Texte, dep.
[363] İstihza ('E): Henek, yarî.
[364] Zira': Pîvaneke ji enîşkê heta serê tilyan e. Nêzî nîv metreyê ye.

Firehî bi pîvanê pêncî ‘aded

Bilindî sih zira’e bûn temamî
Sê tebeq bo ins û heywan û ‘amî

Hewara xwe kire zatê Burhan e
Kîj wextî dê rabîtin ev tofane

Ger bo tofanê dixwazî zemanî
Ew dema ku tendûr dibine kanî

Erd hemî dibîte co û rûbar e
Ji ‘esmanan derya dirijte xwar e

Di ewî wextî tu gelek zû kar ke
Ins û mexlûqatan keştîyê sar ke

Xwuda ji mexlûqatan ra nîda dan
Bîl-cumle li dora nebî Nûh civyan

Ji insanan çil jin çil mêr suwar bûn
Bi hejmara mexlûqan bêxeber bûn

Ji her cinsekê heywanan bû cotek
Hemî li keştîyê suwar bûn rojek

Çil şew û çil rojane baran barî
Aw wekî rûbarane bûye carî

Dinya hemî kire behra muhîtek
Nebûn dîhar ne mekan û ne cihek

Dehê Recep li keştîyê suwar bûn
Bi şeş mehan ew li ser awê mabûn

Nebî Nûh du’a kir dîsa bi carek
Ya Rebî me danê cihek mubarek

Nebî Nûh gote qelereş tu here
Xeberek bîne zû tu bizivire

Wê leşek dît li ser awê kir dîhar
Çû ser kelexê wê goştê mirar xwar

Direng zivirî nebî kerb jê vebûn
Bi xwarna mirar beddu'a lê kirbûn

Paşanî ewî gote kotrokekê
Kan tu here jê bizane tiştekê

Kotre çû û zivirî ve der-andem
Nûhî gotê tu xweştivî bî her dem

Hate ve ewê ehwal bo beyan kir
Nebî Nûh li keştîyê fermanek kir

Got em evro rojî ne bo Xwudayî
Şukra wê xilasbûna bi me dayî

Peya bûne li ser çîyayê Cûdî
Deh risq mabûn têkel kir aşûr gotê

Heta aw nema xwe wêrê cih kirin
Kirne gund bi Heştîyanê nav kirin

Aw dakeft û hatine bo Cizîrê
Heta wefata nebî Nûh mal wêrê

**MUŞTEZEN**

Di zeman da mirovek ji cîhanê
Feqîr bû kewtibû derdê jîyanê

Ji ewladan tenê hebû wî kurek
Mezin bû û kur bûye pêhlîwanek

Muştezenek bû ew zor bi yê çalak
Babê wî kasibek bû bêmal emlak

Izin ji babê xwe xwast bo geryanê
Got babî hest kem bigeryim cîhanê

Da bi quweta xwe peyda kem malî
Em jî bibin xwudanêt wext û halî

Da ez hunerêt xwe bînme dîharê
Bilan me'rifet neçine xwusarê

Dara odê nesojî bêhnê nadet
Huner bi 'emel nebît rewac naket

Babî gotê kerem bi şolî nîn e
Mal û serwet jî bo zorîyê nîn e

Her muyek beden te hebît hunerek
Ger te bext nebît ji te naêt karek

Ger tali' û aql hebin digel şansî
Tu zengîn û zana û Xwudênas î

Got babî neşêm van cihan bimînim
Dê biçim da ecêban jê bibînim

Hindî day û baban nesîhet lê kir
Wî nesîhetê day û baban red kir

Geryanê dê bînim seray 'eqlîman
Ez ê wergirim dostan û te'lîman

Got kure min sefer tiştek ciwan e
Belê ne laîqê hemî şexsan e

Pênç kes hene laîq in bo geryanê
Kî dera dinê bin dê ken jîyanê

Zumra ‘ewilî ji wane tucar in
Ew kî derê bin daîm xwedyê kar in

Kole carîye di xizmetê da ne
Her gavek ew di meqamekî da ne

Her dem bi teferuc û se’adet in
Mustefîd in ew bi kar û serwet in

Kîrê hes ken dê bigeryên bibînin
Ew çu deran dinê xerîb namînin

Yê duyê ji wan ‘alim û zana ne
Xwudanêt fesahet lîsanê ciwan e

‘Aliman beden zêr ziman cewher e
Li kîrê bît xizmeta wan ye fer e

Hemî cihan heye qedrê ‘aliman
Li kî derê bît dê lê bibin cema

Ew bi ‘ilmê xwe gelek bi qîmet in
Bo wan ‘ilim hem mal û hem serwet in

Yê sîyê xwudanê şekl û sîma ye
Bo wan xizmetkirin xweş û sefa ye

Xizmeta wan bo xwe nîmet dizanin
Bo xizmetê hemî bi dil û can in

Ji mezinan hatîye ev xebere
Cemala kêm ji pir malî çêtir e

Me’rîfet û kemal gel cemalê ye
Rû û qameta law lutfa Xwudê ye

Yê çarê jî xwudanê dengê xweş e
Parê wî hemî bazaran dimeşe

Dengê xweş tesîr heye li cîhanê
Keyf û dilxweşî ye ji bo insanî

Dengbêjan cih girîng e nav ciwatê
Bi seda feth diken dilê cematê

Xwarin û wexwarin xida mîdê ne
Deng û sedayê xweş xida ruhî ne

Yê pêncê jî xwudanê sin’etî ye
Ew çi dera bît xwudanê qedrî ye

Dê sin’etê xwe bînîte meydanê
Neçar nabît çi eqlîmê cîhanê

Meznan gotye sin’et bizana zêr e
Gava hewce bûyê serf ket ji xwe re

Eve ne li seferê bin xwudankar
Yêt bi quwet dixwurin dibin xwusar

Kurkî got ew muxalifê eqlî ye
Her kes risqek hey ema bi se’yê ye

Bi wê quwetê gel fîl dê kem cengê
Şêhr û pilingan dê girim bi çengê

Pêhlîwan ku bît dinya bo meydan e
Êvera wî kîrê bît bo eywan e

Kurkî ji babî xatir xwest û da rê
Çû û rûbarek boş kewtîye berê

Çu pare nebû bidet kelekwanî
Kesê jê qebûl nekir pêhlîwanî

Hindî hîvî ji kelekwanî kirin
Çi hîvyêt wî nehatne qebûlkirin

Rêwing siwar bûn û kelek bi rê kewt
Kurik ma û ew di nava xemê kewt

Kurik ma we û ji xeman qehirî
Kerbê lêda û ew li xwe zivirî

Got kelekwanî min siwar ke gel xwe
Dê bideme te cil û bergeyê xwe

Tamaha xwe bir bergê pêhlîwanî
Dê ji ber biketin ewî qeftanî

Gote gencî wer siwar be li cem me
Tu jî bibe şîrikê vê rêka me

Ser û rindin dane dest pêhlîwanî
Wext bû bidorinît ji dest xwe canî

Qutanek baş ji dest pêhlîwanî xwar
Hindek rêwîng hatin bibûn harîkar

Wan jî para xwe ji qutanê wergirt
Paşî terka ûcreta kir genc hilgirt

Çûn û heta giheştne nava nehrê
Rûbarek boş bû wek firehya behrê

Di nava nehrê da hebû sitûnek
Mabeyna dewlatan da bû hidûdek

Kêlekwanî kêşa ber binê stûnê
Rêwîngan fukrî bi terzê hizûnê

Got kelek xirab bû lazim e çêkem
Harîkarî bo me fer e rica kem

Sê çarek biçne ser serê dîrekê
Bi şirûtê hilkeşim wê kelekê

Da ez kêmasîya wê durist bikem
Dê paşî li reka xwe dewam bikem

Gotnê cihê hindan nîn e li ser stûnê
Cih heye ji bona yekî bi tenê

Gencî got hewce nîn e bi sêy çarê
Bi tenê serê xwe dê hel kem çarê

Ew çû ser dîrêkê kelek bilind kir
Kêlekwanî benik bi kêrê kut kir

Kelek hajot û genc mal ser dîrekê
Mabû bi miqtar du şev û rojekê

Birsî û têhnî xew jî lê giran bû
Weresya nav awê paşî hişyar bû

Kewte ber şilqan û awê bire xar
Nînin bo wî çu îmdad û çu hawar

Destê wî giheşte çiqekê darê
Xwe pêve girt û derkewte kenarê

Hindek belgêt daran xwarin gel gîya
Heta ku piçe can hat dest û pîya

Bêtaqet û tab hate ser bîrekê
Wêrê tasê awê dan bi polekê

Parê nebûn dest havête zorîyê
Hindek qutan û çû bo berahîyê

Hemî pêk ve hatnê û gelek lêdan
Êxistne werê û termê wî hêlan

Wextekêhişyar bû berê xwe da rêkê
Bi wî halî çû giheşt karwanekî

Ew ji dil û beden bibû birîndar
Birsî û têhnî roj lê bûye êvar

Karwanî bar dana karê şevê kir
Tirsê li karwanîyan zor tesîr kir

Pêhlîwanî got tirsa we ji çî ye
Wan got cihê şelandna karwanî ye

Gotê netirsin ez digel we da me
Bedelê pênceh wan nijdekara me

Dilê wan tena bû bi vê gotinê
Têra wî xwarin û vexwarin danê

Ewî xwar û vexwar û paşê nivîst
Pîrek gel wan bû dinyadîtî durist

Gote karwanan hûn keyfê neînin
Hûn eqlî li serê xwe bicemînin

Hûn dizanin ev çi kes e ji ku ye
Ji kîrê hatye ‘emelî wî çi ye

Ditirsim eve hevkarê dizan bît
Bo hîlê ew digel karwanî da bît

Karwanî got fikra te nêz eqlî ye
Bo me bêje kanê re’ya te çi ye

Got ewê nivistî zû hişyar nabît
Baran bar ken bilan ew di cih da bît

Karwanan bar kir û ew ma di cih da
Hingê hişyar bû heta tavê lêda

Hişyar bû ne karwan û ne barxane
Sehra ye û erdekî çolistan e

Birsî têhnî bêxwudan çolê mayî
Ew nizanit dê biçîte kîj layî

Di nav çolê da maye ew bi tenê
Girî û raza xwe terk kir bo mirnê

Şehzadek pê nêçîrê tajot ew dît
Berê xwe dayê ku gencek digirît

Şehzadeyî hesp rawestan di cih da
Gotê tu kî yî di nav vê çolê da

Berê xwe danê qed û qamet cih da ne
Bi hal û cil û rengan perîşan e

Dilê şehzade pê sot û jê pirsî
Tu ji ku we tê kanê tu çi kes î

Bo şehzadeyî got serguzeşta xwe
Şehzade hilgirt ew bire mala xwe

Cil û berg û pare têra wî danê
Mirov dan gel heta cihê wî anî

Muştezen zivirî ve bajarê xwe
Giheştibû lalî day û babê xwe

Sed car nesîhat bo gotna day baban
Xerîb got nekevne fikra xiraban

**MÛSA Û XWUDANÊ HEYWANAN**

Bikeyn behsekê ji pêşîn e
Tu ‘ecêbîyan jê bibîne
Eqlî bide şolî binêre
insanî ka çi heye pê ra

Baş lê nezer ke tefekkurê
Ewa Xwuda daye beşerê
Zemanê Musa pêxemberî
Her çi ya dixwest tate serî

Mirovek hebû zor yê zengîn
Xudperest bû ew yê dûr-nebîn
Zor hez dikir ji mal û heywan
Her daîm meşqûl bû digel wan

Rojekê çû nik pêxemberî
Gotê tu nebîyek serwer î
Heta nehe her çi me xwestî
Bo me çêbûye ew bi rastî

Tu du‘a key Xwuda ket qebûl
Ew li nik me wê bûye usûl
Vê carê jî hatime nik te
Bûye Kelîmûllah navê te

Du‘ayek ji Xwudayê mezin
Ew hikmetekê bidete min
Bizanim gotna heywanatî
Ji teyran heta wehşiyatî

Bi sirêt wan bibim xeberdar
Bizanim çi dibêjin her car
Bi ezmanê wan xeberdar bim
Gel wan bi ‘ilm û behredar bim

Hind dibarin hinda qurên e
Hind dixwûnin û dil hezîn e
Hind gel êk dijîn hind ketket e
Hind bi zerer in hind bi fayde

Zanîba ji hemî halêt wan
Bibame sirdaşek li gel wan
Eve ya kewtiye dilê min
Zor daxwaze eve ji bo min

Musayî gotê vê nexwaze
Eve şolekê bêmiraz e
Evê bo te çu kar tê nîn e
Wê xwestekê tu bibirîne

Ji nik Musa rabû dilxemgîn
Di dilê wî da bû kerb û kîn
Çend rojan ma we bi wî karî
Wî dil tena nebû yêk carî

Di paş da hat vegerya dîsa
Careke dî hate cem Musa
Wekî berê carek dî red kir
Vegerya mal û wî tab nekir

Ji fikrêt xwe ew neçûye paş
Bi şev û rojan ew her yê şaş
Guh dabû dengê heywanetî
Dê çawa bizanît luxatî

Ew şûn da zivirî cem Musa
Xwesteka xwe ewî got dîsa
Min xwe havête ber bextê te
Hîvya min e li cem zatê te

Min hey dîkek reş seyekê şîn
Li nik min xweştivîn e şirîn
Bizanim ezmanê her duyan
Êdî naêm cem te çu wextan

Musa ji wî ra du'ayek kir
Gotê here Xwuda qebûl kir
Hate malê ew bi keyfweşî
Bi tebesum û bi dilgeşî

Zengînek hesûd dilxalî ye
Wî hene kole û carîye

Sibê zûyê li gel siharê
Rabû û derkefte ber derî

Xwe hisêp kir gelekî zana
Ma li benda dengê heywana
Ji keyfxweşîyê ew dikenî
Li cihê xwe ew nasekinî

Caryê sofra nanî daquta
Dîkil xweş bezî û per quta
Dîk ji cih derket bi xar û bez
Hate ser çinkan ew yê bi lez

Ew seyê şîn rabû û meş kir
Didanê xwe li dîkî gij kir
Gotê nê em hevalêt yek in
Xwe bide paş tu ji heqê min

Qina‘etkar be bi heqê xwe
Tu nexwe heqê hevalê xwe
Çinîkên hûr ew heqê te ne
Ew çinkên gir jî heqê min e

Dîkî got bera xwe bide min
Tu baş bike guhdariya min
Emrê te ye li ser serê min
Min qebûl tu birayê mezin

Dizanim para te ya mezin
Kêm e naket têra te û min
Evro bike sukûn û sebrê
Heta gehîte wextê ‘esrê

Hespê xwudanê me wê bimrî
Tu dê jê bixweyî bi têrî
Sibê zûyê di gel siharê
Ku bihîst ew xeberê xêrê

Seyî guh lê bû ew mizgînî
Zor lê xweş hat û ew têr kenî
Seyî got hevalek şirîn î
Çende cindî bû ew mizgînî

Xwudanî guh da sey û dîkî
Rabû û hespê bire sûkê
Zû firot û paş da vegerya
Bedenê wî sot û lê xurya

Hewya wî nehat li çu dera
Ew nav kewte kul û kesera
Gelek ma di xema hespê xwe
Neşya xwe bigrît li cihê xwe

Ta sibê rûnişt nava xanî
Ka dê sibê çi dî bizanî
Sibê rabû di siharê de
Çû rûnişt di cihê berê da

Dîsa carîyê sifra xwe rêt
Berê xwe dayê dîkil yêt têt
Ew zû geheşte cihê sifrê
Çinîk tev rakirin ji wêrê

Hate ganê seyê xurt û şîn
Gote dîkilî hey direwîn
Te duhî bo çi ez lêbandim
Te bo çi ez birsî hêlandim

Tu dibêjî qelbê yê saf e
Digel min nakî tu insaf e
Dîkî got sondê dixwem bo te
Ez xaîn nebûme li gel te

Ez çu car nebûme direwîn
Xwudanê me yê bûye xaîn
Ewî zerer gehand yekî dî
Belê yê mayî tiştekê dî

Hêstirek wî ya barî evro
Dê bimrîtin di wextê nîvro
Zikê xwe têr ke û têr bixwe
Tu pê halî ke hevalêt xwe

Ca tola te ya duh jê we bî
Bila çu caran xaîn nebî

Xwudanî bihîstibûn ew qal
Ew rabûye ser pîyan derhal

Hêstira xwe jî bir bazarê
Firot herwekî roja berê
Firot û hat ew yê dilxelel
Rûnişte malê ew bed ‘emel

Dilê wî zor bi kerb û kîn e
Ema çu çare bo wî nîn e
Sot ew ji bo hisreta malî
Kes nîn e ew biçîte lalî

Roja sêyê rûnişt ber derî
Ka wê rojê dê çi bêt serî
Sibê zû ye li derê malê
Rûnişt ew bi fikr û melalê

Carîyê sifre îna hejand
Çinîk li derê malê reşand
Dîkilê reş kewte bizavê
Rabû ser pîyan ewê gavê

Wî xwe ji cihê xwe qelizand
Perêt xwe gij kirin xwe qidand
Çûyê wekî teyrê elohî
Wî çinîk nehêlan li cihî

Seyî dît û kerb zor lê vebûn
Ewî çaw lê tijî bûne xwûn
Gote dîk sê roj e ez birsî
Zalim tu ji Xwudê natirsî

Ez evroke zor yê bi kîn im
Dê evro stûyê jê qetînim
Dîkilî got nekeve xefan
Li min neke tehdîd û gefan

Qesem dikem ez bi Tewratê
Tişta duhî û pêr min gotî
Çu ji wan direw tê da nîn e
Hindî min gotî tev rastî ne

Sakîn be sebrê bike car dî
Sira wê hatye gayê cotî
Tu guh bide evî şirîkî
Dê bi cih bît gotina dîkî

Dilxweş bû bi evê gotinê
Ma li hîvya gay û mirinê
Mêrkî guh da ewê gotinê
Ji behsê gayî û mirinê

Rabû ji cih û xwe rast vekir
Çû benik ji stûyê gay vekir
Ew jî bire cihê bazarê
Şexsek dîtir wî da xusarê

Herwekî ewan rojêt pêşî
Hate ve bi xem û dilêşî
Wê rojê heta bû êvarî
Seyê jar ma li hîvya karî

Ji bo ewî mexlûqê bêbext
Wê rojê jî nebû zîyafet
Ew şev jî borandî yê birsî
Sibê rabû ew zor bi hirsî

Zor birsî ye û ew çaw-nihêr
Wek pilingî ketiye şikêr
Şev çû û hatî sibê zû ye
Se çaw-nihêr e û birsî ye

Herwekî ewan rojêt berê
Carîye ji jor hate derê
Ewê sibê zûyê siharê
Ewê sifre rijande xwarê

Wî dîkilî didan tîj kirin
Geheştê çinîk hemî birin
Seyê şîn û zexm xurt û hem gir
Ewî serê milan bilind kir

Rabû ser kurya xwe sekinî
Gote dîkî tu dê xwe bînî

Dîkilî gotê ey dostê min
Ka guh de gotin û peyva min

Xeberêt min ji bo te hene
Ew gelek kar û faydê te ne
Seyî hicûm kirê wek şêrî
Dîkil nezanî çîte kîrê

Ew bi tirs rabû û çawtarî
Firda li ser çiqekê darî
Sey xwe bilind kir negehiştê
Gelek li keyfa dîkî xweş tê

Se bi kerb rabû û lê xurî
Êdî nîn e bi te bawerî
Te digot her tiştî dizanin
Xwudankiramet û ilham in

Hem di tarîya nav şevê da
'Îbadet dikeyn di wextî da
Em di taryê da jî bimînin
Wextî dizanin hem dibînin

Bi wê hindê em dibin zana
Bangî didin ji bo insana
Em gelek bi xwudan-îlham in
'İnsan wextê bi me dizanin

Se ji ber birsan radihijya
Nekarî xwe bigre ser pîya
Dîkilî gotê te kir dirêj
Ka guh bide min tu seyê gêj

Evro sira xwudanê me ye
Keyf û dawet ji bo hewe ye
Evro têr biken keyf û şahî
Xwudanê me wext bû dûmahî

Wî xwudanî guh lê bû ew tişt
Ji cihê xwe rabû û rahişt
Ew rabû çû li nik Musayî
Gotê tu bo xatra Xwudayî

Ji bo min bibîne tu çarê
Tu min xilas bike vê carê
Musayî jê pirsî çi bûye
Ka çi bi serê te hatîye

Ji bo Musayî got ew qise
Musayî gotê ka netirse
Gava zeman hat tu dê biçî
Nedişêy xwe bigrî an neçî

Nekeve pê tiştê nizanî
Dê bidorînî tu wî canî
Te zor li min kiribû israr
Bi siran bibime xeberdar

Ew kesê ku dibîte ‘arif
Bi siran dibîtine waqif
Ew kesê ji siran bizanî
Ew nakevît ber xema canî

Yê hatye dinê ji beşera
Ka dê xêran ketin yan şera
Ka guneh pitir in yan jî xêr
Kanê li ewraz e ya li jêr

Kanê Xwudaperest e yan mal
Kanê cih beheşt e yan jî çal
Tu razî nebûy bi halê xwe
Bawer nekir ji nebîyê xwe

Tu razî nebûy bi qederê
Lew te hal înaye vê derê
Mêrik zivirî yê peşîman
Ew bi serek xos û bê-eman

Ew li derê hewşê hate jor
Herwekî serxweşan û yê kor
Bi jor kewt û wî kire qêrî
Gewya wî kewtîye xîrxîrê

Se û dîk her du hatne lalî
Ji hesreta wan ew dinalî

Lêv lerizîn çaw lê bûne zil
Wî riha xwe da bi derd û kul

Ehlê wî bi girî qêrîn e
Se û dîk her du bi şahî ne
Bu karê defnê û taziyê
Dîkil û se kewtne şahîyê

Bû keyfa zîruh û wehşîyan
Keyfxweşya kole û carîyan
Mirna wî şad bûn der û cîran
Pêk ve ew mexlûqat û heywan

Hind şînê diken û hind şahî
Hind çûne pêş û hind dûmahî
Hind xwendevan in bûne rehber
Hind nezan in ew bûne rênçber

Hind li jor in û hind li jêr in
Hind xwudan-guneh hind bi xêr in
Hind dibêjin û hind guhdêr in
Hind bi ‘eyb in hind diveşêrin

Hîvî dikem ji dost û bira
Li min veşêrin ‘eyb û sira
Yê bê‘eyb bîtin her Xwuda ye
Min gelek zehmet pê kêşaye

**ŞÊR Û ZURAFE Û KER**

Şêr hakimê dehl û çîyan
Qiral e bo tev wehşîyan
Digeryêtin hemî cîyan
Çu mexlûq nabine engel

Qiral bi tenê nabîtin
Lazim e wezir hebîtin
Ew şol bê tedbîr nabîtin
Gazî kirin rûvî çeqel

Pirs kir ji eqildarê xwe
Got kê bikem wezîrê xwe
Cewab biden bi eqlê xwe
Lakîn nekene der-ecel

Rûvî got ya qiralê min
Ew nehatîye berê min
Ew dê dorînît serê min
Dê aciz bin ew bed'emel

Şêr got tuy bo min eqildar
Min ji te kiriye pirsyar
Bo min bêje wek hemî car
Da ji bo te nebît xeter

Yêk wek te bi zexm lazim e
Da carna bîte hakîm e
Ew bît dafi'ê heqê me
Bêjme qiralî ji ewel

Piling xurt û hem beza ye
Ew bo me hemyan bela ye
Fîl mexlûqekê tena ye
Leşek heye zor yê tembel

Ew hirç û gurêt heywandir
Me bi wan nînin çu bawir
Beraz ji wan yê xiraptir
Çu exlaq nîn e wî digel

Ew kel û gayêt di kûvî
Me birandîye jê hîvî
Ger qebûl key gotna rûvî
Zurafe laîq wî ‘emel

Gotina rûvî qebûl kir
Wesfêt zurafê suwal kir
Rûvî şolê wî beyan kir
Ew mexlûqekê mukemel

Ew bilind û hem beza ye
Ye rihet û zor tena ye
Digel me hemyan bira ye
Ewî nînin xirab’emel

Qiral zurafe gazî kir
Nesîhetek baş li wî kir
Naqşerêyek bo wî çêkir
Ew rêkire pêşberê gel

Qiral rêkir pê wezîrî
Rûvî got were pêş mîrî
Te wezîfe ma li bîrî
Cih bîne hej roj nebûy kel

Zurafe çû lalî qiral
Dev û ziman lê bûne lal
Ne kelîme û ne jî qal
Ew maye mînanî heykel

Qiralî gote zurafê
Tu baş cih bîne wezîfê
Hişyar be nekeve xafê
Tu şol bike bi mukemel

Tu gazî ke heywanatî
Hindî mexlûqên welatî
Ew çendêt ji der ve hatî
Ji te heta gehte kîsel

Hemyan cema ke û bîne
Belê kerî d’gel neîne
Ehmeq e ew kombijîn e
Ew dê hemyan kete têkel

Zurafe zû hate karî
Çîya û deşt dehl û darî
Gerya bi qêr û hawarî
Heta ku mexlûqêt dexel

Wî cema kirin der-an an
Ew heywanat hemî înan
Got kerî cih nîn e d’gel wan
Ker bi dizî ve hatye gel

Hemî deştekê kom kirin
Cewab bo qiral rêkirin
Mexlûqat hemî hazir in
Ji xeyrî ehmeqê guhbel

Zurafe hemî kirne sef
Gotê kes xwe neket hedef
Qiral hatî bi gurûgef
Tekmîl da zurafê serkel

Qiralî tekmîl qebûl kir
Wî bernezerî teftêş kir
Sipas ji wezîrê xwe kir
Bo şola wî ya bêmesel

Got reyîs-qebîla bîne
Tu ewan berpirs bibîne
Hemîyan deng guh lê nîn e
Da me şol nebin bêtemel

Bilan ew bên nêzîkên min
Da baş guh lê bît nutqa min
Da bicih bêtin ‘emrê min
Me ‘emel nebît bêfesel

Wezîr tev kom kirin lalî
Guh dane nutqa qiralî

Ew hemî pê bûne halî
Bi ewan şolêt muhtemel

Qiral yê nutqa xwe diket
Heywanat yê guhdar diket
Guhdirêj tehmîlyê naket
Ew nik da zirî bêecel

Dengê wî li çîyan veda
Deşt tejî bû deng û seda
Li hemyan bû rev bêeda
Têkel kir ehmeqê naehl

Mexlûq bezîn wek kiêlan
Bera xwe dan dehl û rêlan
Qiralê xwe cih da hêlan
Ji ber wê gazya bêmehel

Qiral qehirî da gefê
Wî wehe gote zurafê
Dê ji te bistînim ‘êfê
Min got nehêt kerê çepel

Zurafî got qiralê min
Vihê da nîn e sûcê min
Wî guh nedaye gotna min
Ewî le’ênê cih-esfel

Ger izna qiral hebîtin
Zurafe dê b’çît bînîtin
Li cem te mehkeme bîtin
Ewî ehmeqê bêeqel

Wezîr berda çol û çîyan
Gerya li deşt û gelîyan
Ehmeq girt ji nav wehşîyan
Hat pêş qiralê bê’edel

Qiral gote ewî kerî
Kî bû yê tu de’wet kirî
Got min bi serê xwe kirî
Kes bo min nebûye engel

Qiral got te bo çi we kir
Te ew girse jêk belav kir
Ew nutqa min te xirab kir
Te bo xwe hazir kir ecel

Gote qiral te ‘emr heq e
Lakîn te got ker ehmeq e
Min gotna te kir tesdîq e
Da gotnêt te nebne hewel

Ger ehmeqî nehêt holê
Kî dê wê zanît li çolê
Min rica nevekey tolê
Qralan ‘ef hey ji ezel

Em xwe nagirin qirarê
Ehmeq in em hemî carê
Bar pişta me naêt xarê
Ber me kes namînît mehtel

Wî qiralî ker ‘efû kir
Ji huzûra xwe def’e kir
Me jî besta xwe xilas kir
Me zor dirêj kir ev ‘emel

**ZEMANÊ DAWUD PÊXEMBER**

Da biçine Quds û Xelîlan
Berê xwe bide fêl û hîlan
Li zemanê nebî Dawudî
Feqîrek hebû yê bêxwedî

Rexê şehrî malek xirab e
Zarokekê bêday û bab e
Bi salan zikra Xwuda dikir
Her dem du‘a ji Xwuda dikir

Ya Rebî feqîrek im bêtab
Xwazim rizqê helal bê‘ezab
Bi salan wehe dewam dikir
Xwuda du‘a wî bo qebûl kir

Bo Xwudayî xalis û muxlîs
Feqîrê bêçare û muflîs
Rojek rûnişt li derê xanî
Fikrî halê xwe û zemanî

Wî dît gayekî sor û çawreş
Ji wê ve têtin ew yê bi meş
Raza ber pê û xwe dirêj kir
Wî dest da kêrê û serjêkir

Ji Xwuda bi bawer bû derhal
Xwuda bo rêkir rizqê helal
Serkê gayî dana kenarê
Ewî goşt hûr dikir bi kêrê

Xwudanê gay kewte pisyaran
Wî gote rex û çan û karan
Gayê min berze ye, kê dîtye
Bi vî rexî ve nehatiye

Gotnê gayek bi rengê sorî
Hat û bi wî rexî ve borî
Ber derê feqîrî çaw pê ket
Ew yê goştê gayî hûr diket

Ma li serkê gayî fikurî
Dît çermê gayî jî xwêkirî
Girte milê wî feqîrê jar
Hindî şêya lê kire hewar

Got te bo gayê min ser jê kir
Gotê Xwudê ji bo min rêkir
Hate kerbê û çaw lê sor bûn
'Eqil bo nema û bû cunûn

Were biçin cem pêxemberî
Tu dê bînî xwe li wê derê
Wî kurik girt û rakêşa bir
Li cem Dawudî wî qise kir

Nebî Dawud ji wî re gotî
Tu gencekî ciwan û xort î
'Îbadet dikir ji Xwuda ra
Bo çi te berê xwe wergêra

Hewkarê xwe bêje ka kî ye
Kê ev kare digel te kirye
Kurkî got ey nebiyê serwer
Xwuda tu yê kirye pêxember

Evî şolî tu dê jê zanî
Ga bixwe hatye derê xanî
Ew razaye li ber kêra min
Min bawer e helal e bo min

Dawud got xwe bigrin ta sibê
Da jê bizanim vê hisêbê
Çûne ve ta roja paştirê
Xwudanê gayî hucûm kirê

Ew çû kurik rakêşa îna
Dil tena nebû ji birîna
Kurik îna pêş û miqabil
Got ey nebîyê rehm û 'adil

Eve min dizê xwe înaye
Kanê hukmê te yê çawa ye

Nebî got bike xeberê min
Dê bo te baştir bît gotna min

Kurkî aza ke ew feqîr e
Nebe de'waker lê bibore
Ewî got heqê xwe dixwazim
Heq çî ye ew e ya me lazim

Got qesa min evro eve ye
Çênebît sibê ji nû ve ye
Roja paştir hatin cema'et
Ka dê çi lê hêt ew şerî'et

Hatin hemî pêk ve rûbirû
Gotin bila xilas bît evro
Nebî pirsî ji xwedyê gayî
Gotna duh qebûl e dûmayî

Got ez vê qet nakem qebûl e
Eve çi terz e çi usûl e
Aşkera ga yê ser jê kirî
Te jî ev hukme yê pê kirî

Gotê hukmê min yê Xwuda ye
Qet ji heqyê nabim cuda ye
Ya min gotî bo te çêtir e
Bo dûmahya te bi xêrtir e

Nebî got hûn ya qenc nizanin
Lewma hûn ji min bi guman in
Xwudanê gayî yê sûcdar e
Lew diket qêrî û hewar e

Ya min bo gotî karê wî ye
Qebûl neket dijberê wî ye
Ya baştir ew e her du teref
Vî hukmî qebûl bikin bi xef

Cema'et hemî bû yêk xeber
Gotinê ey nebîyê serwer
Bila xilas bît ew bi heqî
Li çu kesî nebît neheqî

Bila ew malê xwe nîvekê
Bide feqîrî û eda ke
Ez evro dibêjim hûn bira
Nîvî ken milk û mal û para

Ewê rojê red kir şerî‘et
Ji cih rabû û zor bi hirs ket
Tu qebûl nekî sibê were
Qateka dî dê bête sere

Nav wan bû sebebê xeberî
Rexne dan Dawud pêxemberî
Sûcdar kirin bi şerî‘etî
Tu yê xirab dikî ‘adetî

Got ya min û we jêk cuda ye
Ya ez dibêm wehya Xwuda ye
Roja paştirê dîsa hatin
Bi çar dorêt resûl werhatin

Gotna duh te qebûl e ya ne
Evro qatek dî li ser dane
Got ma pêxemberî weha ye
Eve li serê me bela ye

Eve yê bûy hevalê diza
Malî me distînît bêriza
Roja dî bi kerb û kîn hatin
Ciger birîn û dilşewat in

Rûniştin kewtne xeberdanê
Hevkarêt wî xir bûn doranê
Pirsîn ji pêxemberê Xwuda
Kanê te çi qerarek pê da

Ez evro dê dem qerarekê
Malê xwe bidet bi carekê
Mêrkî xwe li erdî girêl kir
Ax û xwelî bi ser xwe werkir

Got ka werin hûn guh bidêrin
Hûn ji bo çi xwe diveşêrin

Kewte nav zarî û fîxanan
Kire gazî der û cîranan

Milet cema bû hemî hatin
Bi doranêt nebî werhatin
Gotin bawerî bi te nema
Li Dawud kewtne gef û loma

Me bi te nîn e çu bawerî
Tu şerî‘etî diguhorî
Got resûl im bi ‘emrê Xwuda
Ji rastîyê nabim ez cuda

Evî tiştî hûn jê nizanin
Ji ber ewê hûn dilgiran in
Hûn xwe bigrin heta subehî
Dê li şolî bêtin dûmahî

Hûn dê bibînin jê ‘ibretê
Dê bizanin wê heqîqetê
Roja paştirê li Sehrayê
Ew xir bûn hemî bi tebayê

Cema bûn ew li binê darê
Mane li çawrê wê qirarê
Ji milet gotne pêxemberî
Te bo çi em înan vê derê

Heta nehe bawer kir ji min
Bêhnekê hûn guh bidene min
Werin dest û pê lê bibênin[365]
Danin vê derê û bihêlin

Nebî pê dana ser erdekê
Got hûn bikolin evê derkê
Miqtarekê kolandin ew erd
Cesedek ji wê derê derket

Wextê cesed wêrê bû dîyar
Xwudanê gay kir qêrî hewar
Seh ken li paxila wî kêrek

[365] Girêdan.

Li ser wê kêrê heye navek

Dîtin ‘ecayêbek nûmayî
Ser kêrê navê xwedyê gayî
Cema bûn li nik pêxemberî
Gotin tu nebiyek serwer î

Bo me beyan ke heqîqetê
Da xilas bin em ji zehmetê
Got cesed babê feqîrî ye
Tucarekî zor zengîn bûye

Xwedyê gay kole bû di gel da
Li wê derê rûnişt û bêhn da
Şeqî xew giran bû li wêrê
Kole xaîn bû dest da kêrê

Kuşt wî seyîdê xwe li wêrê
Çal kir li bin wê kevnedarê
Dest danane ser mulk û malî
Mêrik ji dilê kûr kir nalî

Feqîr piçûkek bû yê êtîm
Sêwîyek bû yê gelek me‘sûm
Babî hêla hîvya carîyê
Heta zivirît ji wê rîyê

Ew zivirî mal û çawgirî
Xwuda bo me ho yê hez kirî
Seyîdê min li rê wefat kir
Malê xwe jî li min hube kir

Tu dê gel min bikî nikahê
Gel yêk dê gehîne felahê
Kurik mezin bû û bêxwudan
Te‘betek baş û hem musilman

Xwuda du‘a wî bo qebûl kir
Mal bê‘ezab helal bo rêkir
Got vihî bikujin cihê wî
Qisaskirin e heqê ewî
Ew wêrê kuştin û veşartin

Ew heq û huqûq bi cih hatin
Mal û serwet bo feqîrî man
Bû xwedyê kole û carîyan

Kurik bi mal û mulkî xweş bû
Milet ji wê derkê belav bû
Hind heq û huqûqên beşerî
Namînîtin ew bo mehşerê

Xwuda li dunyayê cih tînît
Da insan ‘îbretan bibînît
Da bifikrin nezer biken baş
Da xwe ji xirabyê biden paş

## 8. MEWLÛDNAME

### QESÎDA MEWLÛDÊ (1)

Hatî wextê nûra mubîn bo dinê
Ev nûre dê biçît bo nik Amînê

Paş daweta ‘Ebdullah û Amînê
Rehmetek nazil bû ser ehlê dinê

Zor ecaîb çêbûne hem harîqe
Ji fedl û hikmeta Rebbê Xaliq e

Hem li jinêt Mekkê bû ‘ar û înad
‘Ebdullah gel yekî nekir iltifad

Huba ‘Ebdullah çûbû nik Amînê
Çaw nedabû mal û husneyek dinê

Wan derbaz kir şev û roja xwe şirîn
Bo Amînê wext e bêtin ew mizgîn

Kiça Murre hewa-î meşreb[366] Fatme
Qed û bala husn û rengan xatim e

Dît nûra nibûwet cebhê ‘Ebdullah
Ewê qest kire nûra Hebîbullah

Dil hebû wê nûrê b’xwe ra b’gehînît
Ew rehmet û fezîlet bo bimînît

Xwuda ew bo Amînê kirbû qismet
Kes neşêt wê bistînîtin bi serwet

Hat emrê Xaliqê Rebe’l-Alemîn
Gote Cebraîl rabe tu ey Emîn

Emrê min tu bigehîne melekan
Ji erd û ‘esman û ta heft felekan

[366] Hewa-î Meşreb: Hewesdarê şerebê.

Ridvanê dergevan pê bihesîne
Bilan ew cennetê bixemilîne

Hûn bixemlînin bi horî û xilman
Bo Muhemmed al û ummet sehaban

Ew nûr wê hatîye ji ba îlahî
Hetta ku giheşte nik ‘Ebdullahî

Ew nûr bi fermana Rebbê mezin e
Dê biçîte nik hezretî Amîne

Keyfxweşî kewte erd û asimanan
Şahîya ins û cin wehş û heywanan

Nîdayek hat ji Xaliqê rehmanê
Mizgînî da ehlê erd û ‘esmanê

Ew şev nûra Ehmed çît nik Amînê
Dê rohn biket çar eqlimê dinê

Cibraîl mizgînî da erd û ‘esman
Bûye keyfxweşîya horî û xilman

Bi hizaran melekan per vekirin
Ewan mizgînî li xelqê dî kirin

Serwer û hem xatimê pêxemberan
Resûlê ins û cin û caneweran

Ew sir giheşte temam ka’inatê
Ji insan behr û ber û mewcudatê

Bû heyatek taze bo ins û cina
Bû heyret û ‘ecêbek bo kahina

Wê rojê ‘Ebdullah çûbû nêçîrê
Çû çîyayê ‘Erefê bi suwarî

Ji ser çîyayî ew bi lez hate xwar
Wî dît kanyeka zelal û awek sar

Bo bû ‘ecêbek mezin û nadirî
Min nedîtye awa zelal wê derê

Bi xwe heyîrî ma û hem fikirî
Ya Reb çi bereket te day vê derê

Ez çend geryam li çol û deşt û dîyar
Min nedîtye wê derê aweke sar

Wê derdikevît ji bin berek mezin
Ew bi qudreta padşahê ins û cin

Heyirî ma di hikmeta Xwudê da
Her çi ya hes ket diket di gavê da

Peya bû ji hespî da awê vexwet
Bo wî hat awaz ji mewlayê semed

Giheştê awazê Rebbê Zul-Celal
Têr wexwe bişo cil bi awa zelal

Têr wexwar zor şirîn bû wek berfa sar
Bi wê tamê min nedîdbû aw çu car

Min wexwar û bûme jê têr û tejî
Çu car min nedîtbû tamek we hejî

Piştî wexwarin û bedenşûştinê
Li paş wê ’ecabek dî hate dinê

‘Ebdullah cil û libas ber xwe kirin
Ji awa zelal eser sehnekirin

Yek carê bezre bû ew awa zelal
Hatî awazek ji zatê Zul-Celal

Ya ‘Ebdullah tu wegerye mala xwe
Lez ke zû bigehe dev hevala xwe

Tu zû b’gehe nik Hezretî Amîne
Tu guh bide emr û fermana min e

Tu guh bide vê seda û vî dengî
Qet li çûna xwe neke tu direngî

Ew nûra nibûwet min day cebhê te
Dê xatir bixwazitin ji zatê te

Paq û temîz e ew nûra nibûwet
Dê tehwîl xwudanî bît bi emanet

Ew nûra enwer ya hebîbê min e
Ev şeve dê biçît rehmê Amîne

Îşev dê biçîte rehmê maderê
Rehberê beheştê hewza kewserê

Guh da nidayî ew bi lez hate mal
Amîne hate derê got ey heval

Kan bêje çî ye bi serê te hatî
Zû wegeryayî hem bi lez tu hatî

Got ya Amîne xwe bişo xemlîne
Ev şeve bo te heye xweş mizgîn e

Amîne xemlî bêhna xweş li xwe kir
Hat ba ‘Ebdullah şeva xwe bi nûr kir

Hem bi emrê ‘alîmê ‘ilm û ‘elîm
Hat û çû nik Amînê dura yetîm

‘Ebdullah sibê rabû ew îbtida[367]
Çaw kewte nûra Amînê şu’le da

Got ya Amîne mîzgînî bît li te
Nûra ‘Ehmed bû dîyar li enya te

‘Ebdullah ew nûr li enyê maçî kir
Qesta babê xwe Şeybet’ûl-Hemdî kir

Giheşte nik babî mizgînî pê da

[367] Îbtida (‘E): Pêşî, berahî.

Nûr gehişt Amînê ji min bû cuda

Şeybet'ul-Hemdî bihîst ew mizgînî
Çû dev wê bi keyfxweşî û şirînî

Giheşt nik Amînê beşaret[368] dayê
Amîne naket kelamê dinyayê

Dar û ber ax û gîya lêt ken selam
Neşêt bidet cawabê naket kelam

'Ebdulmutalib got sed mizgîn li te
Nebîyê axir-zeman e kurê te

Amînê got ey seyîdê heremê
Qa'inat bo min diête selamê

Ji hatina wan dengan ez dizanim
Dayka pêxemberê axir-zeman im

Ji erd û 'esman tête guh min nîda
Te pîroz bît nûra nebîyê Xwuda

Ez wê kewtime nav çerxa heyretê
Nizanim cewab deme ka'inatê

Şebeyt'ul-Hemdî guh lê bûn ew xeber
Got ya Amîne wan siran nede der

Bilan ew gotin ji te nebin sadir
Îspat nebît hatna nebîyê axir

Wan tiştan digel kes nekey xeberdan
Bilan sir û gotin bimînin punhan

Amîne got te ferman ser serê min
Ew sir û gotin sadir nabin ji min

Ez dê wan gotinên xwe bicih bînim
Li ser wan soz û we'dan dê bimînim

[368] Beşaret ('E): Xebera xêrê.

Ez dê hişyar bim li fi’l û gotinan
Dê bim dayka nebîyê axir-zeman

## QESÎDA MEWLÛDÊ (2)
**“Behsê Setîhê Kahin”**

Piştî Amîne bo Ehmed bû hamîle
Eqlîmê ereb ‘elamet bûn kamîl e

Kewtine nava goftûgoyan xas û ‘am
Ebdulmutalib bo tîcaret çûbû Şam

Pirsa hebîbê ekber ji Setîh kirin
Ewî sirêt xwe hemî bo ispat kirin

Got ew li erdê Mekkehê dê bêt dinê
Qureyşî ye Haşimî kurê Amînê

Hûn min bigehinne şarê Ummu’l-Qura[369]
Dê bo hewe beyan kem ez gelek siran

Ew helgirtin înane şarê Mekkehê
Birin danane ber dergehê ka’behê

Hatine dev Qureşî û tev xelaîq[370]
Ew Setîhê bi soza qiraran sadiq

Pirsî ji ‘Ebdulmutalib li kiriye
Gotnê bi qesta ticaret li Şamê ye

Gote Ebûtalib kan navê te çî ye
Got ‘Ebdulmenaf Ebûtalib Haşmî ye

Kan bira bi navê ‘Ebdullah te heye
‘Ebdullah hat û ewî got evehe ye

Setîh di rûyê ‘Ebdullahî nezer kir
Paşî ewî qise wehe bo beyan kir

Gotê hûn her du bira werne lalî min
Destêt xwe pêk ve danne ser sûretê min

369 Navê Mekkehê ye ku tê wateya “maka bajêran.” Navê Ummu’l-Qura miletê ‘ereb bikartîne.
370 Xelaîq (‘E): Gel, gelên cihekê. Xelaîq, di zimanê ‘erebî de ji bo qewmên li ba hev dijîn tê bikaranîn. Anku di zimanê ‘erebî de pirjimarîya peyva “xelk”ê ye.

Dest danan ser sûretê Setîhê kahin
Ew axivtye bi hikmeta şahê mezin

Got min heqîqet zanîye ey dil û can
Dê ji we her duyan bên dinê du sultan

Yek ji wan hakim e û yê dîtir mehkum
Yek jê ‘alim e ew bi her tiştî me’lum

Yek nebîyê dînî bo ‘alemê d’bêjît
Yê dî mucahîd e inkarkeran d’kujît

Yek ji wane sultan e ji bo şerî’et
Yek ji wane erkan e ew bo tarîqet

Yekî dê ji wî zahir bîtin nibûwet
Yê dî xwudan ‘ihtiqad e hem mirûwet

Yek ji wan dê bîte can ew li cîhanê
Yê dî dê bîte pehlîwan li meydanê

Yêk dê bîte maşûq yê dîtir jî aşiq
Yê dî li soz û we’ded xwe zor yê sadiq

Yêk jê dê bîte serwerê pêxemberan
Yêk bîte kamil û murşid û serweran

Yêkî cîhan bi destê wî têt felahê
Yê dî dinya şûrê wî tête selahê

Dê ji hewe du kurik bêne dinyayê
Ew her du dê cîhane bînne hîzayê

Yek ji wane nebîyê axir-zeman e
Yê dî serwerê welî û murşidan e

Yek ji wan sultanê dîn û heqîqetê
Yê dî ku dest li ser şûrê terîqetê

Setîhî got fexrî ‘alem ji ‘Ebdullah
Ji Ebûtalib ‘Elî ye welîyullah[371]

Ey Ben-î Şeybe[372] fexrê ‘alem Haşmî ye
Dostê sadiq Ibn-î Ebûtalibî ye

Setîh got Ben-î Haşim dewlet ya we ye
Fexrê ‘alem Mustefa ji nesla we ye

Ey Ben-î Haşim bext û dewlet ya we ye
Nûra hikmet û tancê rehmet ya we ye

Ji bo kes nebûye nesîb ew se’adet
Ji bo kes nebûne qismet ew kiramet

Ebûtalib gote wî Setîhê kahin
Wesf û halêt wan biçûkan tu bêje min

Got min Tewrat û Încilê da xwendîne
Ew gotine ji kitabêt îlahî ne

Ebûtalib Setîh li mal kire mêvan
Sir-i ehwal hemî bo wî kirne beyan

Ew gotin di nav Qureyşyan bû zelzele
Zanîn Amîne bo ‘Ehmed bû hamîle

Heta sibê xew nehat çawê yek ji wan
Hişam[373] kewte fikr û endîşekê giran

Sibe zû gazî kirin hemî qebîle
Got hûn min d’nasin Hişam kurê Henzele

Got ez namînim wan li cih û menzîlan
Heram bûne li min bûne heps û zindan

Ez dê bigrim destê ewlad û eqraban
Dê qest bikeme memleketê ‘eceman

[371] Welîyullah: Welîyê Xwudê. Bi gelemperî vê gotinê Şî’î bikartînin. Di bangê wan de jî ev gotina “Welîyullah” derbaz dibe.
[372] Şeybe navê ‘Ebdulmutalib, bapîrê Muhemmed pêxemberî ye.
[373]Babê Ebû Cehil e.

Pêxember bêt ji qebîla Haşimîyan
Em êdî neşên bijîn li ewan ciyan

Dê lat û uza û menat inkar biket
Dê ji nû ve ‘esasêt me betal biket

Hêşta em neketine nav çu wehşetê
Ez dê bikem terka evî memleketê

Gotnê tu rehber û mezin î we neke
Tu terka cihê bab û kalêt xwe neke

‘Ewil babê Ebû Cehl dijminî dana
Bû dijminê Muhemmed û mislimana

Got ji niha dest pavêne şer û cengî
Da li me nebît bêwextî û direngî

Dê batil bizanît dînê bab û bapîr
Ji ‘ewil em ji bo xwe bikeyne tedbîr

Gotne Hişam mezin î Ben-î Mehzûnî
Çu tedbîran bo me laîq tu dibînî

Gotê hûn hemî hazir bin der deste şûr
Li pêşî Haşimîyan hûn bigrin tedbîr

Lazim e hûn yek gotin û yek xeber bin
Dijberî Haşimyan bi zirx û çeper bin

Ebûtalib bi wan halan bû xeberdar
Haşimî xir kirin hem bi sîlah û kar

Berkirin zirx û ewan şûr û rum di dest
‘Alemê ew dîtin û gel wan kirne qest

Hatne Bethayê ew bi zirx û zirîpoş
Dîtin qebîla Mehzunîyan wek serxoş

Ji Qureyşî û hemî ehlê Mekkehê
Bi sîlah û kar û şer in li Bethayê

Ku Ebûtalib dît Hişam bi wî karî
Lê kire gazî û qêrî hem hawarî

Gotê tu ey qeleşê wan Qureyşîya
Hatna Hebîbullah taze te zanîya

Ew gotin û ew xeber yêt nehe nînin
Ji Adem pê da tên gotin û dimînin

Nûra resûl ji bab hatye nik kura
Ew xeber înaye hemî pêxembera

Hemî kitabêt semawî kirye behs
Ewî xeberî dizanîtin hemî kes

Ewan wesfêt resûlê axirê zeman
Di Tewrat û Incilê da bûne beyan

Çend caran yahudîyan bo me gotine
Behsê hatna resûlê axir-zemîn e

Te guh li heqîqatê wêt kirîne ker
Di nava qewmî da tu wê bûy fitneker

Hişam bi şaşî ew hate xeberdanê
Got li kî ve bûn ew kahinêt cîhanê

Bêdeng û bêseda mabûn ew ji mêj in
Bo çi nehe ewan tiştane dibêjin

Gotê ew nûr giheştiye xwudanê xwe
Ji pişta babî gehişt rehma dayka xwe

Di vî eqlimê da ew yêt bûne şayî
Ew nûr nik birayê min bû Ebdullayî

Ew nûre bi qudreta Rebbê heq Semed
Ew nûr dê bigehîte cebhê Muhemmed

Ji her alî serok û haham û keşe
Rahib û kahin û minecim tên mişe

Ebûtalib got kan herin kahin bînin
Bilan guh lê bin hemî pêk ve bibînin

Setîh înan û danan pêşîya milet
Got ji wesfêt resûl xeber de bi hikmet

Xeber da ji nebîyê axir-zemanê
Di vê salê da ew dê bête cîhanê

Gotê ez bibînim bûkên Şeybetu'l-Hemd[374]
Ez dê bizanim kîjke dayka Muhemmed

Ebûtalib got bêjne jinêt Haşimî
Da bizanin vê sirê pek ve em hemî

Pêk ve hatne hizûra Setîhê kahin
Her çiya dît û got ji min dûr bikevin

Her çiya hat got eve nîn e kir xitab
Ji dûr hat Amîne ev ye perde-niqab

Setîh ji dûr tê fûkrî got wahe kî ye
Gotê eve xwudan-nesl e ye bellî ye

Got bi eslê xwe kan ji kîjan qewmî ye
Got Amîne kiça Wehibê Zuhrî ye

Şu'leya nûrê li nik wê ez dibînim
Bûka Şebetu'l-Hemdî ye ez emîn im

Wî Amîne dît û di cih da lerizî
Paşê ji civat û Ebûtalib pirsî

Di gel kê wê xatunê zewac kiriye
Gotinê ew hewsera 'Ebdullahî ye

Got bêjnê dest danîte ser sûretê min
Da bo we bêjim hinde hikmetên mezin

Rica kir ji hazreta Xatun Amînê

[374] Ji 'Ebdûlmutalib re ev leqebe dihat gotin.

Destê xwe dana ser sûreta kahinî

Setîh ji xwe çû û bêhnek wekî mirî
Ew bêhereket ma û çaw lê zivirî

Bi çendî miqtaran paş ve ew bi hiş hat
Gote Ebûtalib dewleta hewe hat

Got guh dene min hûn bi eqlê kamil e
Ev xatun bo Muhemmed bûye hamîle

Paşî zivirî got Amînê kiça min
Ka tu rûyê xwe veke li ber çawê min

Nûra hebîb li enya ewê şu'leda
Weku birûsyê li çawêt ewan veda

Setîh gote ewan hûn qewmê Qureyş in
Hûn ehlê Herem in û bi tîb û eyş in

Got hûn bizanin nûra hebîbê axir
Wê digel Amîneyê ew bûye zahir

Evê gotinê li serê wane veda
Eqil û fikrêt ewan jê bûne cuda

Babê Ebû Cehl Hişamê xwudan-bela
Bersing dirand û kir hawar û waweyla

Gote qewmê xwe û yêt ku şirîkêt wan
Bikujin Weheb Amînê hem kahinan

Hatin Amînê bikujin ji ber hemlê
Pêk ve hucûm înan da xilas ken şolê

Got li min bo his hemlê min hat bizavê
Hikmetek min dît weku berqê wê gavê

Hemî li ser sûret kewtin wek seneman
Eqlê wan çûbû û wan hay li xwe neman

Ew hereketa pêşber qewmê Haşimyan

Mucîzek bû ji nebîyê axir-zeman

**QESÎDA MEWLÛDÊ (3)**
**“Behsê Kahina Zerqayê”**

Bikeyn behsek ji kahina Zerqayê
Cadûya afaq[375] eqlîmê dinyayê

Sêhirker bû hem ew jinek kahin e
Bihîst behsê ‘Ebdullah û Amînê

Ji Yemamê[376] wê kir qesta Mekkehê
Mekkehîyan ew dît li pêş ke’behê

Hecac Ibn-î Amr pirs kir ji wê jinê
Ey melika mezin te nav day dinê

Bi çi hacet li vî cihî dîharî
Muhim nebît tu nahê vî dîyarî

Got ey gelê meznêt ehlê heremê
Hez nakem dilê hewe pêxme xemê

Min nîn e mexsed mulk û malê dinê
Hûn bûn xafil kewtne xewa mirinê

Hatme we hişyar kem ji xewa giran
Wê têt dinê resûlê axir-zeman

Got tu bo xatra ‘uza lat hem hûbel
Bo me bêje heqîqetê ji ewwel

Ey melîke[377] bêje da em bizanin
Çi lazim e em tedbîra xwe danin

Da ‘ecêbek çêbît li wî mekanî
Nebî têt dê we dîn batil bizanî

Gotinê ew kî ye dê vê biketin
Çi nesl e dê li kîrê bu’sed[378] ketin

[375] Afaq, ji cihê derveyî Mekkeyê re dihat gotin.
[376] Navê herêmeke welatê ‘Erebîstanê ye.
[377] Ev peyve di zimanê ‘erebî de ji bo jina tê bikaranîn û ji bo mêran jî “Melîk” tê gotin. Wekî bikaranîna peyva jin û mêra (bay-bayan) di zimanê tirkî de.

Got hindî kitab hatî ji ‘esmana
Got têt dinê resûlê ins û cana

Temamê muneciman vê dizanin
Bi vê diaxivin ‘alim û kahin

Li Mekkehê ew biçûk dê bêt dinê
Nîn e vêhê cihê şubhekirinê

Ji Adem heta nihe ev heye
Kes wekî wî nebû û nehatiye

Xuluqandina evî ka’inatî
Çêkirî Xwuda bo xatra wî zatî

Husn zerîf xulqê letîf ‘efîf[379] zat e
Ew heq resûl e fexrê ka’inat e

Mislê wî nehatine û çênabin
Piştî wî pêxember êdî narabin

Hukmê wî ji şerqê ta mexrib çîtin
Bal Xwuda kitab dê bo nazil bîtin

Qureyşî pêk ve mayîne heyirî
Reng û sûret li hemîyan xeyirî

Wê demê ‘Ebdullah hat û bi jor ket
Çawê Zerqayê bi rûy Ebdullah ket

Gotê ey genc tu dizanî ez kî me
Kanê te ez li kî derê dîtime

Got min tu dîtbûy li erdê Yemenê
Te da’wet kirbûm xirabî û fitnê

Got wî wextî min nûrek dît cebhê te
Nike wê nûrê nabînim lalê te

Bo min bêje ka ew nûr li cem kê ye

[378] Bu’sed (‘E): Cihê ku jê têt. Cihê hatî.
[379] ‘Efîf (‘E): Narîn, kubar.

Kî xwudana wê lutf û keremê ye

Got min zewac kiriye gel Amîne
Ew nûr niha l'wechê evdeşa[380] min e

Wê demê sot bi agirê dilê xwe
Got ji min ra bêje cihê babê xwe

Babê min li Şamê bo ticaretê
Şûnê 'Ebutalib berê xwe d'detê

Got pêş keve min be cihê rehmetê
Da ligel 'Ebdultalib b'kem suhbetê

Got 'Ebutalib birayê mezin e
Ew e bûye wekîlê babê min e

Bire pêş 'Ebutalib ew sahire
Got eve 'Ebutalib yê hazir e

Gotê tu bûy efendîyê heremê
Te dixwazim gel min bikey keremê

Carek Amîne Xatunê bibînim
Gel xeber dem demekê gel da rûnim

'Ebutalib Zerqa îna eywanê
Rûnişte li nava wê xanedanê

Kir gazî Amînê ew ji der da hat
Xewf û tirsek bi ser cadûyê da hat

Şu'le dabû nûra nebîyê kerîm
Çaw li wê tarî bûn nekir lam û cîm

Bi se'etan ma wê nekir xeberdan
Paşî înan te'am şerbet bo danan

Gotne wê kerem bike ser te'amî
Ne xwar û wexwar rabû ji meqamî

[380] Evdeş (T): Hemmalî, hemnişîn.

Zivirî mala Hecacê Amirî
Ji kerb û kînan ne sax e ne mirî

Got guh dê Heccac niha tu hazir î
Felaket bo Qureyşyan dizivirî

Ew piçûk resûl e bo ins û cinan
Dê bit inkarkerê pût û seneman

Munecim û kahin ber wê disojin
Neşên bibin manî' yan wî bikujin

Cema bûn Qureyşî bi kerb û kînê
Gotin tu bêje dermanê birînê

Gotne Zerqayê bo me carek bêje
Em kewtne wî derdî gelek ji mêj e

Got da xwe gehînme Setîhê kahin
Kanê tedbîr çî ye da em bizanin

Suwar bû li hespê xwe ber da Şamê
Giheştê û dît li bin darek xurmê

Rûniştin û ew bi suhbet axivtin
Xizmetkar û xadim ji xwe dûr xistin

Gote Setîh hatme nik te bo pirsê
Te Mekke terk kir ber da Şam û Kudsê

Gotûbêj suhbet kir digel Zerqayê
Got li Hîcazê tiştek dest me nayê

Erdê Hîcaz bo min gelek tarî ye
Ya dizanim wexte bêt ronahî ye

Bo min îlhamek ji xaîbê têtin
Leşkerek zor bo ser Mekkehê têtin

Dê xirab ket belde gund û bajaran
Mal û serwetan dê biben bi talan

Dê şar û gundan hemyan wêran biket
Dê ehlê Mekkehê perîşan biket

Orduyek bi fîl û eslîhên[381] giran
Têt ser teyrê Ebabîl bûn perîşan

Zerqayê got tedbîrek bo Amînê
Em bi kuştin ewê rakeyn ji dinê

Pîrê kahin got ew şola me nîn e
Me qudret û quwwet bo wê çu nîn e

Ew qest û teşebûs bo hatin kirin
Ji destî tiştek bo wê nehat kirin

Amîne tête parastin li jorî
Kes neşêt destî dirêj ket bi zorî

Ez dê bimînim nav fikr û cefayê
Heta ku ew piçûk tête dinyayê

Zerqayê zanî çu naêt ji dest wî
Zivirî bêumîd û hem bêhîvî

Got bo te oxir bîtin digel xêrê
Heta carek dî diziviryе wêrê

Zerqa zivirî paşda hat Mekkehê
Hate ser karê xwe yê ku eblehê[382]

Kewtne nav fendan bo kuştna Amînê
Ku ew Muhemmed neînte vê dinê

---

381 Eslîh (‘E): Çek. Amûrên şer pê tê kirin.
382 Ebleh (F): Aqilsivik, ehmeq.

**MÛCÎZATA NEBÎYÊ AXIR**

Guh bidêrin xwudanêt ehlê mahir
Sir û kirametêt nebîyê axir

Bi heft salî ew bû xwudan kiramet
Bi xulqê mehmûd[383] bû laîq nibûwet

Hêj sebî[384] sir û welayet zahir kir
Xwudan-eqlan d'zanî nebîyê axir

Bi piçûkî heq heqîqet dizanîn
Ji îlah sirê xaîb wî dianîn

Rojek bapîrê wî ma muşkulê da
Şebet'ul-Hemd di nava ke'behê da

Ji Teyyan[385] merdek bi navî Xelîfe
Ciwan û pehlewan û hem şerîf e

Xwudan qebile û hem 'esl û neseb
Subaşiyê Şam û Îraq û 'Ereb

Muhafiz bû ew bo rewing û karwan
Şev û rojan meşqûl ew bi heqê wan

Ser rêyan nobedar bû şev û rojan
Her karwanî hatî xeber dane wan

Saya wan karwanan hetûçû d'kirin
Seyr û sefer bêkêmasî dikirin

Rojek ji Îraq ve hat yek kerwan e
Serok-kerwan kiçek bi nav Xwudane

Qebîla Ben-î Eclîyan e ereb
Kiça Zeydil 'Eclî ye xwudan neseb

383 Mehmûd ('E): Kesê ku xelk jê razî û pesnê wî bi başî û qencî didin.
384 Sebî ('E): Zarokê nêr, law, gede.
385 Wî zemanî li Hicazê navê qebîleke mezin bû.

Xelîfe pisyar kir kerwan ji ku ye
Çi qebîle ye serok-kerwan kî ye

Baca rêkê biden hûn jî bi ‘adet
Hûn xêr biçin em dê mînin silamet

Hate pêş serokê kerwan Xwudane
Me ji kesê ra çu car bac nedane

Got min ew gotine guh lê nebûye
Min we hisap kir ku te negotîye

Em bo we rêyê diken nobedaryê
Bi dana bacê nabînin kêmahyê

Gotê em bixwe nobedarêt xwe ne
Muhtacya me bi kesêdîtir nîn e

Xelîfe berê xwe da wan ciwanan
Gel hebûn heta ku sih pehlewana

Gote yekî here wî bigre bîne
Da ew bizanitin ka em ji kî ne

Xwudane kiçek bû ew ye kuranî
Xwe perwerde kirbû bi pehlewanî

Her dem bi gurz û rumh û şûr û metal
Pehlewan e wek Rostemê kurê Zal

Pehlewan hat ji terefê Xelîfe
Gotê min bo te heye yek teklîf e

Tu nebe sebebê qetlê ji bo xwe
Bacê bide û here ser rêye xwe

Xwudanê jê ra got were meydanê
Tu kerem bike zerbeya xwe daynê

Ev li meydan zivirî bi gotûbêj
Wî destê xwe havête ruma dirêj

Xwudanê bi metalî zerb paşve da
Ewê nîzek[386] dirêj li singî wî da

Li ser pişta hespî ruh je cuda bû
Leş weresya ser erdî bêruh mabû

Emir Xelîfe ew hal dît û şaş bû
Kire qîr û hawar sert û dijwar bû

Got ka bêje çi kes î te nav çî ye
Kiça Zeydî me navê min Xwudane

Emir bi cewabê ‘ecêbgirtî ma
Kewte nava fikr û xiyal û xema

Got eve çi bela ye hat ser min e
Yê têt meydanê pehlewanek jin e

Emir gote yek dî tu bigre bîne
Me ev ‘ecêbyene qet nedîtîne

Em kewtîne çi wext û çi zemanê
Şûna mêran jin derkewtne meydanê

Pehlewanek dî hate pêş Xwudanê
Hêj kar nekirî leş kewte meydanê

Xelîfe mexlubyet dît û tab nekir
Wî çaw bi Hedhedê kurmamê xwe kir

Ewî hesp hajot û çû bo meydanê
Çû şerî digel wê kiça ciwanê

Hemlek kir wî li wê kiça xwudanê
Meydan bo xwe zivirand qebristanê

Wan ku sê pehlewan kirne qurbanî
Sê kes dî rabûn pêk ve çûne ganî[387]

Wan her sêyan pêk ve hicum birinê

[386] Nîze (F): Rim, mizraq,
[387] Ganî, di wateya (rastî de) ji bo sekinîna li hemberê kesekê yan tiştekê tê bikaranîn.

Çû nezivirîn ji meydana mirnê

Xelîfe ma we xemgîn û bêçare
Got şirîkan dora min e ev care

Lazim e li ser min biçme meydanê
Bidemê cezayê wê kiça hanê

Zirx ber kirin gurz û rumh û şûr bestin
Her duyan bo yekdu ehd û we’d xwestin

Ji sibe zû heta roj bû evarî
Bi zerban lêkdan cenga bêqerarî

Roj direng e û wext bûye êvar e
Wan bi yekûdu nebirne çu çare

Dostê Xelîfe Eş’as kurê Seîd
Hat meydanê bi mêrxasî û egîd

Ew çû mabeyna her du pehlewanan
Got xwe biden paş wek merd û ciwanan

Gote Xwudanê guh de min seyîde[388]
Bikeve rêka xwe dest ji şer berde

Bilan ew tişt li vê derê bimîne
Kesê çu digel te û bacê nîn e

Ew li ser rêya çû û bûye rewan
‘Eş’as çûbû cem wî dostê xwe heman

Gotê ew çi ye tu dikey tu dîn î
Ma tu cenga vê kiçê qet nabînî

Ev kiçe ji qebîla Ben-î ‘Ecal
Di muhît da babê wê nînin emsal

Kiç ji babî bûye gelek zêdetir
Ew ye pehlewan e û hem bihadir

[388] Di zimanê ‘erebî de gotina “Seyîde” ji bo jinan tê bikaranîn û gotina “Seyîd” jî ji bo zelaman tê bikaranîn.

Şeş pehlewan te bo çi dane kuştin
Bêçune te bo xwe çêkirin dujmin

Xelîfe pisyar kir ew ji ‘Eş’asî
Wê kiçê bi ‘esl û neseb dinasî

Ew kiçe zor çalak û pehlewan e
Min zaniba kan zewicî ye yan ne

Kiçeke zor hêja ye wekî şêr e
Niyet kir gelek mêrxas û camêr e

Babê wê gelek mal û cihêz xwestin
Kesê hin mal nebû ku wê bidetin

Xelîfe gote dostê xwe ‘Eş’asî
Tu nêzîk û gelek baş min dinasî

Eger malêt xazît hemya bo bînim
Ez dê wê şêrkiçê ji bo xwe bînim

‘Eş’asî gotê were da em biçin
Babê wê bibînin em jê bipirsin

Her du çûn nik qebîla Ben-î ‘Ecal
Babê Xwudanê Zeydî hilgirtne mal

Ewî di pêşdanê ‘Eş’as dinasî
Qedrê wan girt û bi mêhvanşinasî

Gote ‘Eş’as ewê digel te kî ye
Bi şiklê pehlewan wî huner çî ye

Got ji Tayyan kurê ‘Enbes Xelîfe
Emîrê qewmê xwe û hem şerîf e

Bihadir e subaşyê qewmê ereb
Muhafizê rêyan e bi ‘esl û neseb

Yê amade ye ji bo xizmeta te
Talib e bo Xwudaneya kiça te

‘Esilzade ye û bi eql û edeb
Mal û serwet wî hene di bêheseb

Got kiça min hind maye ber serwetê
Kes nebûye xwudanê wê derfetê

‘Eş’asî pirsî ji babê Xwudanê
Xwesteka te çî ye ji malê dinê

Got hizar şutur hind pez û hind beqer
Bixur[389] û misk û ud kafor[390] û enber

Sefran û zehferan[391] û awa gulan
Her yêk bi dehan bar bêtin bênoqsan

Gava ew tişt hazir li pêş xwe dîtin
Hingê şol dê bi sanahî çêbîtin

Xelîfe ew hemî hazir kir û danê
Dest dane yêk bo nikaha Xwudanê

Xwudane li sefera Îraqê bû
Zivirî û wê ev xeber guh lê bû

Bi çend rojan paşda hat û wegerya
Wextê mesele zanî gelek girya

Gote babî ma ev rewa ye bo min
Te qîmet û hurmet nehêla bo min

Min şekl û rû heye her wek gula geş
Te çawan dame zencîyê qelereş

Gotê tu nekeve xemê kiça min
Min çi jê xwestiye înaye bo min

Çi tiştê min wergirtî hemî bo te
Mêr çak û hem zengîn e hevalê te

[389] Darek e ku bêhna wê gelek xweş e.
[390] Mayeke bênhxweş e. Mirî pê dişuştin.
[391] Gîyayekê bêhnxweş e.

Dawet û zîyafet bo xwe wan kirin
Wan paşê qesta welatê xwe kirin

Ew keyfxweş bûn hemî bi şahîya xwe
Me dûmayî daye evê besta xwe

**BABÊ REŞ KURÊ SPÎ**

Piştî daweta Xelîfe Xwudanê
Pêk ve ew kewtine keyfa jîyanê

Piştî demekê Xwudane hemle bû
Cemkekî kuran şuphê babê wan bû

Navê yekî Temr û yê dî Nemr dana
Her du reş bi mislê qîr û qetrena

Piçûkek dî hat ne wek birayên xwe
Şubheyeke giran înabû ser xwe

Xeyirî man di sin'etê Xwudê da
Hemî pêk ve mane di wê şubhê da

Eqlê wan negehişte wê hikmetê
Kewtine pê iftira û tuhmetê

Bedenek spî û her du çaw di şîn in
Pirçek zer e ew zêrî dişubhînin

Mizgînî dan Xelîfe zor bi tuhmet
Xalîfe hat dît û ma we bi heyret

Ez dê vêhê çawan bêjme qewmê xwe
Xwudane maye ser cih û balgê xwe

Piçûk ne şiklê bab ne yê bira ne
Bo wan 'ecêbîyek zor ye giran e

Hicûm îna hate jinê Xelîfe
Got babê wî piçûkî kîj herîf e

Dest da şûr û hate kuştina jinê
Xeber dan qebîle babê Xwudanê

Zeyd hat û ew yê digel qebîla xwe
Pisyara piçûk kir wî ji kiça xwe

Got ew ji min şuph û gumana diket
Piçûk şiklê wî û kurêt dî nadet

Xwudanê dest havête axivtinê
Neheqî ye li min tête kirinê

Ew sûc û xirabyan tînte lalê min
Ber hindê diket qesta kuştina min

Ma ez qet laîqê ewê şolê me
Ne musteheq e ewê tuhmetê me

Min nîn e tehmûla sûc û îftira
Werne insafê hûn hemî bi hev ra

Zeydî gote Xelîfe tu vê neke
Tu îftirayan bi kiça min neke

Xelîfe got kiça te sûc mezin e
Bo ewan sûcan heq derhal kuştin e

Heqê te ye kuştnê tu bicih bîne
Tu nekey ew şol dê bo me bimîne

Zeydî got te tiştek bi çaw dîtîye
Te dîtibît bêje kanê ew çî ye

Got min ne çu dît ne çu bihîstîye
Ema şiklê wî kuret min jêk nîye

Gotê eve gotna bêeqilan e
Ew ne laîq zana û kahina ne

Ji wan rica kir bo ehlê heremê
Jinêt Xelîfe hatne pêş ‘alemê

Gotin tiştê şuphê nîn e nik jinê
Kes neşêt lekê dante ser wahenê

Xelîfe got şahid kurkê taze ye
Çu dî nîn e biket bo min fayde ye

Her du terefan yêkdu sûcdar kirin
Bû şer û ceng zehf ji her duyan mirin

Pîremêrdek zana kewte mabeynê
Got şer û kuştnê dûmayê bidenê

Hûn her du teref herne nik hakemî
Berê xwe b'den nik seyîdê heremê

Her du teref bi vihê bûne razî
Seyîdê herem qebûl kirin qazî

Pêk ve berê xwe dan Beyt'ûl-Heramê
Wêrê hel dibin muşkulatêt 'amê

**HUKMÊ EBDULMUTALIB**

Guh dane nesîhatên pîremêrdî
Jêk cuda bûn qebîle li wî erdî

Kewtne rêkê pêk ve hem deşt û Sehra
Qest kirin ew hatine ‘Umu’l-Qura

Çûne pêş Şeybeyt’ûl-Hemdî qebîle
Got em hatne bo me bibye wesîle

Got kî ye de’wayê li kê diketin
Her du teref bên li pêş min rawestin

Pêşî soz da Xelîfe de’wa çî ye
Meselê bo min bêje kan çi bûye

Got ey seyîd ew jin helala min e
Salê ewel du kur bû şubhê min e

Her du kur bi şiklekê ew reşbeden
Kurê nihe bi şubhe û fikr û zen

Ez kewilreş im digel her duyêt ber
Yê taze beden spî çaw kesk pirçe zer

Şikl û wesfêt min digel wî çu nîn e
Ez dibêm ew kur ji pişta min nîn e

Ji ber wê me jêk kuştin mirov gele
Kes nebû hel ket vê şola muşkule

Ez hêşta mame li ser wê qerarê
Li ser wê tuhmetê dikim israrê

Şeybeyt’ûl-Hemdî got her sêya bînin
Kan çi şekl in da em jî wan bibînin

Hatne pêş cedê Muhemmed lalîye
Yekî çavşîn û pirçzer beden spî ye

Çu şeklê babî nîn e nik wî kurî
Qureyşî û cema’et pêş heyirî

Kes neşêt bo wê bidetin qerarê
Şeybet’ûl-Hemd heyirî ma wê carê

Hemyan nefes çik bûn ma li çawerê
Kanên dê ew netîce çît kî derî

Hemî ewle bûn ku ne yê babî ye
Bi fikra wan jin xwudana curmê ye

Şeybeyt’ûl-Hemd kewte nav fikrêt cuda
Xwudanê nîn e delîlek di dest da

Bêjît ne belku ji heqyê derkewî
‘Alem jî ma li hîvya xeberê wî

Ebutalib zivirî li Muhemmed
Got tu yî yê muşkulatan hel diket

Awa eqlê min ji serî zêde bûy
Çi pirsgirêk nebûn nik min hel nebûy

Di vê şolê da mayme ez heyirî
Bêje bo min rêkê tu ey serwer î

Li nik te muşkule hemî dibin asan
Tu yî dê bîy rehberê cumle insan

Li vê cîhanê tu yî dê bîy rehber
Tu yî serwerê cin û cumle-beşer

Li vê cîhanê her tişt bo te heyran
Tu yî hebîbê heq resûlê Yezdan

Top û çewken hatine bo berê te
Qewl û gotin dê bine xeberê te

Kes neşêt tavê da rojê nezer ket
Kes neşêt qewl û gotinêt te red ket

Vê tengavyê tu ji berê me rake
Mu’cîzekê ji Rebê xwe peyda ke

Wextê ev gotin ji nebî ra kirin
Got te terefê dî guhdar nekirin

Terefê dî te neînan meydanê
Gotinêt wan jî te bo guh nedanê

Wextê ew gotin ji nebî cuda bû
Bapîrê wî her wekî ji xew rabû

Got Xwudane û babê xwe bên nêzîk
Her du hatin çaw bi rondik dil xuduk

Şeybet’ûl-Hemd gote Zeydî hel bike
Me ji evê zehmetê xilas bike

Zeydî got ez li çolan mezin bûme
Têkelî şolêt hosangîn nebûme

Şeybet’ûl-Hemd got her du werne nêzîk
Min suwal e ji mezin heta piçûk

Got ew kesêt wê jinê baş dinasin
Em bo şahidîyê ewan dixwazin

Nas û cîran hemî hatne huzûrê
Hemyan got xirabî nîn e li dorê

Şeybet’ûl-Hemd gote babê wê jinê
Kesek kîndar heye bo we li dinê

Got min nedîtye nebihîstye ew şol
Me digel kesê nînin çu kîn û tol

Şeybet’ûl-Hemd gote babê Xwudanê
Bi tenê pisyar ke belku bizanî

Ebdulmutalib got bû şev belav bin
Sibê belku muşkulat tev hel bibin

Qureyşyan ew belav kirin li xana
Zîyafet hazir kirin bo mêvana

Ebdulmutalib girt destê Muhemmed
Ji bo mala xwe ew berew bi rê kewt

Zeyd û kiça xwe her du man bi tenê
Babê wê bi tenayî got Xwudanê

Te ji bo babê xwe nîn e qerarek
Da em bo vê şolê bibînin çarek

Wê gote babî tu baş min dizanî
Ez piçûk li xwe d’kir bergê kuranî

Min dil bû pehlîwan û ciwanmerdî
Min nedixwast zewaca gel çu ferdî

Te ez dame wî zencîyê wek hebeş
Ji terzê insanî dûr e wê bûy wehş

Got kiça min li te dikim nesîhet
Meznê herem qerarek xelet bidet

Xwe pavê ber pîyê piçûkê lalî
Nûranî ye rengê wî yê hîlalî

Jê bike rica gazî hem hawarê
Min umûd e bo te ew bînît çare

Şev borî û roja paştir gel sibê
Milet hemî hatine nava ke’bê

Hemî mane li benda Şeybeyt’ûl-Hemd
Kanê ew dê çawan qerarek pê det

Di pêş hemyan da hatibû Xelîfe
Maye li hîvya Şeybeyê Şerîf e

Ebdulmutalib gel ehlê Haşimî
Mudr û Qusey hem qebîla Curhemî

Hatin ew seyîdên ehlê heremê
Pêk ve kewtne muşkulata vê xemê

Hem wêrê bûn çil hemsalên Muhemmed
Qirarê Şeybe yan ‘Ehmed dê bidet

Şeybeyî got bêjne babê Xwudanê
Bête cem min ew li nava meydanê

Gote Zeyd weciba min bi te daye
Kanê te bo me çi ji wê înaye

Ma ez dê çi bînim çu tişt nebûye
Ji ‘esla me tiştek we çênebûye

Şeybet’ûl-Hemd kewte nava fikarê
Gote Xelîfe çit bêjî vê carê

Got bo min nema wextê xeberdanê
Her tiştek yê ispat e li meydanê

Çi hukim lazim e tu wê pê bidî
Ji xeyrî vê min nevêt tişteke dî

Şeybe pirsî ji meznêt Qureyşîye
Di vê şolê da kan fikra we çî ye

Haşa gotin ser gotna te hebîtin
Emr û ferman dê bi soza te bîtin

Bi me ew piçûk yê Xelîfe nîn e
Hem wesf û şiklê wî li nik çu nîn e

Bi her tiştê xwe ji babî yê cuda
Daykê ew ji cihek dî kirye peyda

Ger wesa bît jin bû xwudana curmê
Ewê bigrin û biben cihê recmê

Çendek Qureyşî çûn ew girtin birin
Bo cihê recm û kuştnê ew rêkirin

Bû qîrên û feryad fîxan û gotin
Ah û zarîyêt wê cerg û dil sotin

Çu tehemmûl nekirin qebîla wan
Sed hawar û gazî hem dad û eman

Di nav herem da dengê wan bilind bû
Kesê çu caran ew ‘ecab nedîtbû

Xwudanê bîr hat çalakya zemanî
Xwe havêt û hat nik kurkê nuranî

Hatinê da bigrin wê careka dî
Ebutalib ‘Ebbas rabûn bi ciddî

Wê qest kir hat bo terefê Muhemmed
Got ji min xeyrî te neman çu meded

Hem bi lez hat û hem bi çawêt girî
Heta ku giheştîye nik serwerî

Gotê ey reng-nuranîyê rû-qemer
Min divêtin bo min bibîye mefer

Te reng wekî wê heyva çarde şevî
Min daxwaz e bi sed rica û hîvî

Maç kirin dest û pêyêt ewî zatî
Min dil û can bawerî bi te hatî

Yê dilerizîd wek tura l’ber awê
Dihelîd mîna rûnê li ber tawê

Rohnik çawan da nema xwûn dibare
Ah û fîxan û zarî bêqirar e

Derman quwet neman dest û pêyan de
Dad û fîxanan li çol û çîyan de

Kes nemaye ku min evro xilas ket
Kes nîn e heq û huquqan bicih ket

Min umêd daye te ey ‘alî neseb
Ji bona heqîyê tu bibe sebeb

Ji bo tarya dilê min çira tu yî
Ji bo xelasbûna min hekem tu yî

Tu bo xatra hurmeta wî rûyê xwe
Tu bo xatra ‘esl û hem neseba xwe

Tu bo xatra ewê ke’ba mubarek
Guneh ji min sadir nebûye carek

Kewtme bin zilm û tehdîda kuştinê
Dê dujminan bi min den kenandinê

Ey mahrûyê mislê te ney li dinê
Çu car nakewme ber xema kuştinê

Lê du sebeb hene ji bo xema min
Yêk zilm e ya dî her sê piçûkêt min

Curmek giran evro li ser min heye
Sûcê namûsê ji kuştnê zêde ye

Destê min bigre evro min xilas ke
Bilan cumle ‘alem ‘edla te nas ke

Xilas ke umm’ul sibyan[392] naçar-jinê
Bêsûc e tu riha ke ji kuştinê

Paş ah û zarya bêçare û meded
Ebdulmutalib zivirî rex ‘Ehmed

Ey hebîbê min ciwanê beşer î
Min divêtin tu bikeyî rehberî

Ka bêje bo min ey nûra çawêt min
Ger rê hebît tu bêje ji bona min

Got ez dizanim seyra vê çawan e

[392] Jina ku xwudan-zarok. Anku dayîka zarokan.

Aşkera naêt gotin ye punhan e

Bo min beyan bûn ew sir bi kiramet
Ye bêsûc û bêxeta ye ew hurmet

**HUKMÊ MUHEMMED**

Şeybet'ûl-Hemd gote mêrê Xwudanê
Kanê tu rabe were vê meydanê

Gotinêt Muhemmed hene ji bo te
Guh bidê ka ew dê çi bêjît bo te

Bike guhdar tu bi eqlekî selîm
Neke inkarê li wî zatê helîm

Got ey Xelîfeyê kurê Enbes e
Tu zilmê neke kanê êdî bes e

Ew biçûkê tu jê inkar yê te ye
Tu ji vê baş bawir ke bêşubhe ye

Xelîfe got çi dibêjî ji me ra
Divêt delîlek te hebît aşkera

Da 'alem tev bizanin û bibînin
Da şubhe di dilê me da nemînin

Tiştek we bît ku dilê me b'hebînît
Da kîn û kerb dilê me da nemînît

Muhemmed gotê guh bide min berê
Filan roj û mehê tu çûy seferê

Hinde rojan tu may di seferê da
Ezyet û xeman pir li dilê te da

Filan wextê şev bi mal ra giheştî
Tu li cih û mekanê xwe nehiştî

Tu rast çûyî menzileya Xwudanê
Musaîd nebû bo gel te razanê

Di nav 'uzran da bû te lê kir zorî
Hindî hîvî kirin tu lê neborî

Tu çûye niwîna ewê bi ‘uzur
Lew piçûk çêbû bi şeklê curbecur

Xwûna heyzê gel cewherê têkel bû
Lewma beden sipî çav kesk pirç zer bû

Wê jinê sûc û guneh qet çu nîn e
Ew hind zilm û xedir te lê kirine

Xelîfe guh lê bû bîra wî lê hat
‘Uzr û lêborîna xwe ji hemyan xwast

Got Muhemmed em xilas kirin dîsan
Ewê dest û pîyêt hebîb ramûsan

Ya Muhemmed ew sir te çawa zanî
Bo me bêje te ev tişt ji ku anî

‘Ehmed got cihê siran nik Xwuda ye
Min ji wî girtin zanîn û hikaye

Xelîfe wergirtibûn ew nedamet
Ji cih rabûve ew bi qed û qamet

Çû ewî girte destê helala xwe
Jê xwast wî lêborîn û xetaya xwe

Got tu min efû ke ku min nezanî
Min tu gelek êşand bi ruh û canî

Min ji wan sûc û gunehan helal ke
Heq û huquqan li ser min aza ke

Şik û şubhe hemî li min biryayî
Agirê dilê min yê vemiryayî

Xwudanê dil hûn bû bi wê gotinê
Xilas bû ji sûcê zina û kuştnê

Xwudanê got Xelîfe vê beyan ke
Ew tiştê Muhemmed gotî eyan ke

Da vê şolê hemî ‘alem bizanin
Da ku êdî min gunehkar nezanin

Xelîfe ser cihek bilind gazî kir
Qewm û qebîle hemî pê halî kir

Got ey yêt hûn digel min li seferê
Pêk ve hûn guh dene evê xeberê

Gotnêt hizretî tev ji wan ra gotin
Hevalêt Xwudanê gotin tev rast in

Ew tişt xefî li mabeyna her duwan
Muhemmed hemî ket ket gotine wan

Ger Muhemmed ew tişt gotban bi qîyas
Min qet ew nethelgirtin ew bi ‘esas

Neman cihê sir û halan tev beyan
Cihê şubhê lalî kes ji me neman

Çûne pêş Muhemmed bi terz û edeb
Ey seyîdê herem û bi ‘esl neseb

Girtin dest û pêyêt wî maçî kirin
Gelek minnet ji zatê ewî kirin

Ger tu nebay kes ji me netma bi can
Dê bibayne pêkenî nav dujminan

Hem Qureyşî hemî man û heyirî
Pêş hukmê Muhemmed wan reng xeyirî

Gotne ‘Ehmed sed aferîn ji te ra
Mislê te nînin çu mekan çu dera

‘Ebutalib çemya rih li pê husû
Lê pêş çawêt Qureyşîyan sûbesû[393]

Di vê şolê da heqê ewî hebû

[393] Rûbirû.

Dizanî laîq hukmê Rebê xwe bû

Qewm û qebîle hemî jêk belav bûn
Sir û hikmet ji Muhemmed eyan bûn

Bi piçûkî wî şerî'et dikirin
Xwuda bo ewî kiramet rêkirin

Heftsalî bo xelkê dikir rehberî
Laîqê nibûwet û pêxemberî

**PÊVEK 2**

**ÇEND NUMÛNE JI DESTXETÊN ŞAIRÎ**


**Pêvek 2.1.** Destxetê Mela Mecîdê Gulordî / Naveroka Deftera Helbestên Wî



FIHRIST BIRINCI KISIM

| No. | isim | beyt | sayfe |
|---|---|---|---|
| 1. | Heciyê pir | 20 | 11 |
| 2 - | Eyda qurbanê | 10 | 13 |
| 3- | Dostê sadiq | 13 | 14 |
| 4- | Seydayê berê | 13 | 15 |
| 5- | Were tê bi fikre birane | 18 | 16 |
| 6- | Hati bihar | 13 | 18 |
| 7- | Were bi fikre hewihali | 12 | 19 |
| 8- | Hati bihar zor direnge | 14 | 20 |
| 9- | Muhtare gundî | 21 | 22 |
| 10- | Were bira | 16 | 24 |
| 11- | Kanê birati | 20 | 25 |
| 12- | Selama birayi | 24 | 27 |
| 13- | Doste delal | 12 | 29 |
| 14- | mela temer | 12 | 30 |
| 15- | Felek disa | 13 | 31 |
| 16- | Payize | 10 | 32 |
| 17- | mela kerem | 13 | 33 |
| 18- | Tahir | 13 | 35 |
| 19- | Herê dayê | 20 | 36 |
| 20- | Heqqê beşeri | 20 | 37 |
| 21- | Dilo beşe | 7 | 39 |
| 22- | Bune ğerib | 8 | 40 |
| 23- | Duâ min | 10 | 41 |
| 24- | Hestu bir | 12 | 42 |

**Pêvek 2.2.** Destxetê Mela Mecîdê Gulordî / Cewhera Elmasan



98

23. CEVHERA ELMASAN 28 K

Dil seqerim siber ewinê
Bum nexweşêl naw niwinê — Cewhera berqu elmasan
Li min nemaye xweşiya sinê — Dilbera dil daru xusan 1
Kirme êxsir li ber derê — Xemitiye berqu libasan
Cismu canê min helandin


Êxsirekim li derê xanî
min nemaye sihheta canî — Cis nur çemi siyahê
Te ez kuştim kes nizanî — Dilbera ru qendu mahe
Te dil kerkir bi xencerê — Laiqa dîdana şaha 2
Dilu melak li min kedandin

Dilê gerîb bi kêrê kerkir
Dil helandi xwe wederkir — Bo min bela bê mecale
Nezerdarî tele terk kir — Ahu ruye çaw xezale 3
Eşa dili dayew cigerê — muhbeta dilan tibale
Eqlu fikrêt min rewandin

Cergê ğeribi yî kule
Tuş ğeribi buyi sile — Eqlu zehn li min kirne talan
Te ew helayi dil xecile — Çehreya ehmuw hilalan 4
Nine cihê çu xeberê — Naziku gerden şepalan
Fikru xiyal li min herifandin

Xeberê xêrê tu beje
Kula ğerib gelek şi mêje — Fikru xiyal li min ne hêlan
Xwuna dilê lê ne rêşe — Kirme êxsir li nawa relan
Şi heqqiyê neke derê — Selwi bala nawa elan 5
Derdu kulê min ciwandin

**Pêvek 2.3.** Destxetê Mela Mecîdê Gulordî / Pîş û Kar



55

x 31 - PİŞU KAR 12

1 Kewtime naw çerxa zemani mın neman umedu hal
Hubbu hesret man di dilda bum şuyuxe pîru kal


Bı hizaran sal umur bıt akubet her mirine
2 male qarun te di dest bit mal bırın her kiçine

Teş bı hê xewnu xiyalan dê biçit wek yek deme
3 Nine keyfu lezzetawê kulu derdu eleme

Kewtine hewesa şiyanê me mırın naete bir
4 seêyu xêrêt me ça ninin suçu curm gunhe bebin

Hey hawaru sed mıxabın bo wê sigara bê emel
5 Umur borand bı hesudi kinu xırabi dil xeleb

**Pêvek 2.4.** Destxetê Mela Mecîdê Gulordî / Paşdaman


46

K

27 PAŞDAMAN 16

Ewro di paşda mamee ez — Ji hesretê mayne di cida
Kewtime xema ğeplete — Kulu kuwan di dilida
Bê cihu warumalim ez — Xemu xiyalan serida 6
Mayme dinawa hesretê — Kes nizanit wê hikmete


Hesret herdem liminheye — Yé hikmetet zanit xwudaye
Derdu elem liminzedeye — Derdu elem ewi daye 7
Rahet limin ye bezreye — Mel pêş emrê wî rizaye
Mayme dinawa gurbetê — Nine cihe çu hecete

Buyme esirğurbet keşim — Ya xwuda emru wusulet
Di pel agiri dili dimeşim — Ya beniyan her qebule 8
Ji hesretan ezserxweşim — Yareb rehmepgenuzule
Nine dermanê wê illetê — Tul me wereşepqete

Îlletu derde girane — Boşepqetê em hewcene
Rêwu çaretmin nemane — Yareb emî ebdêt xene 9
Kewtime zulma zemane — Li ser koku esla xwe ne
Her dibinin emşiddetê — Boçi dibinin zehmetê

Şiddeta ji heddi zêde — Eziyet zedeye li serme
Agiru gurumu pête — Guhde dengu awazême 10
Em kirin şeydawu şête — Carek nezerkel halê me
Kewtine behra heyretê — Tub deme yek firsetê 11
Firsetu beat li meb zwirja min ji cawan neetin girî
Kes bi şiddet min ne kuriş ez ji bibinim qimetê

**Pêvek 2.5.** Destxetê Mela Mecîdê Gulordî / Xwezî Carek



114

34 - XWEZÎ CAREK 8


Xwezî ke carek min tiba tu bi çawî dil
Ey nazika rindu şepala çaw bi kil
Şi dîdarada min windakirin fikru eql
Ma heta kengî de bimînitu bê sözu gevgil

Ez jî bo dî darate pur giriyanim (heznu dil)
Cihê sebrê min nemaye dilber pêlu ewinim
Sewda serê ditrate me ez dil birînim
Bume êxsir ez li çolan di pergem tenabinim

Hewtime naw gerdaba eşqe min ne sebre netebat
Buy me erzu dîdar her deme dil bi sewat
Şewu rojan di naw pêlet ewinim bi kare (xebat)
Bume seyyahê cihanê lîçi erdan min nine sebat

Şûleya ateşê eşqe dil li min kirye kebab
Xistme çengala ewînê bume suçdarê besewab
Hewesdarim ez bo ditinate ey dilbera kerden (sebab)
Careket gel min beyî rehme bideyî şirin cewab

**Pêvek 2.6.** Destxetê Mela Mecîdê Gulordî / Bi Sed Salan û Dinya Derdan


25 BI SED SALAN 6 156

26 DINYA DERDAN 10 157